# DÎROKA KURDISTANÊ

## HEVALÊ HELMET

WEŞANÊN OCAXA PKK'Ê YA SAKÎNE CANSIZ-23

# *DÎROKA KURDISTANÊ*

*Dîroka Weşanê:2017*

*Cihê Weşanê: Matbaya Azadî*

# NAVEROK


**PÊŞEK** ......................................................................................5

**DESTPÊK** ......................................................................................7

**JI NÛ VE MEZÎKIRINA DÎROKÊ** ..............................................13

**ERDNIGARÎ Û DEMOGRAFYAYA KURDISTANÊ** ...................23
*-Erdnigariya Kurdistanê* ....................................................................23
*-Demografyaya Kurdistanê* ................................................................51

**DI SERDEMA CIVAKA XWEZAYÎ Û**
**SERDEMA KOLEDARIYÊ DE KURDISTAN** ..............................73
*-Di Serdema Civaka Xwezayî Ya Ewil De Kurdistan* ...........................73
*-Di Serdema Neolîtîkê de Rista Kurdistanê*........................................78
*-Di Serdema Hiyerarşî û Koledariyê De Hozên Kurd*..........................88
*-Konfedrasyona Medan Û Zerdeştî* ...................................................111
*-Piştî Medan Bindestbûna Kurdistanê*................................................133

**DI SERDEMA ÎSLAMÊ DE KURDISTAN** ..................................137
*-Şert û Mercên Derketina Îslamiyetê*..................................................140
*-Derketin û Belavbûna Îslamiyetê* .....................................................145
*-Serdema Xelîfetiyê Û Hatina Îslamê Ya Kurdistanê* .........................150
*-Di Serdema Emevî û Abasiyan De Kurdistan* ...................................159
*-Piştî Abasiyan Mîrtiyên Kurd*...........................................................190
*-Di Serdema Safewî û Osmaniyan de Kurdistan* ................................194

**DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE KURDISTAN** .....................215
*-Di Sedsala 19'emîn De Tevger Û Serhildanên Kurd* .......................215
*-Di Serdema Şerê Cîhanê Yê Yekemîn De Rewşa Kurdistanê*...........244
*-Piştî Peymana Lozanê Rewşa Kurdistanê*.........................................282

**ENCAM**.....................................................................................359

“Rastiya Kurd ku ji welatê xwe yê dayikê hatiye qûtkirin, rastiyeke birîndar û ber mirinê ye. Ji welatê xwe xwedîderneketin, dev ji dîrok û çanda xwe berdayin e. Di dawiya dawî de dev ji jiyana civakî û netewiyeta xwe berdan e. Mirov rastiya civaka Kurd, bêwelat nikare pênase bike; lewma civakeke bê welat nikare hebûna xwe bidomîne, dê ji belavbûyin û ji holê rabûnê nikare xwe rizgar bike.

Her çiqasa li ser wê dagirkerî û metîngehî hebe jî, hebûna Kurdistanê ti kes nikare înkar bike. Heya ku li ser xaka wê kesekî ku bi dîrok û rastiya wê ya civakî ve girêdayî û dixwaze azad jiyan bike bimîne, dê hebûna xwe bidomîne. Ne tenê ji bo Kurdan, dê Kurdistan bibe welatekî ku Ermenî, Sûryanî, Tirkmen, Ereb û hemû çand û kesên ku dixwazin azad jiyan bikin, bi awayekî demokratîk, azad û wekhev parve dikin.”

**Rêber APO**

# PÊŞEK

Dîrok, têgeheke ku li ser gelek nîqaş tên kirin û weke dayika hemû zanistan tê pênasekirin e. Heya niha gelek cure û rêbazên dîrokê pêş ketine. Bi piranî jî dîrok, ji aliyê serdestan ve hatiye nivîsandin. Rûxmî vê gelek hewildanên nivîsandina dîroka rast û giştî jî çêbûne. Bi taybetî Rêber Apo, nirxandin û nêzikbûneke alternatîf ya dîrokê nîşan dide. Di hemû şîrove û nirxandinên Serokatî de mirov vê yekê dibîne. Li gorî vê nêzikbûnê hemû bûyer, hebûn, têgeh û diyardeyan dinirxîne. Ew nêzikbûna dîrokê bingeha paradîgmaya me jî ava dike.

Dema ku mirov bi vê nêrînê Kurdistanê jî digre dest; mirov zêdetir nêzikî heqîqetê dibe û gelek wane û encaman jê derdixe. Li ser vê esasê jî têkoşînek pêş dikeve. Ew xebata di destê we de jî bi mezîkirin û rêbaza Rêber Apo ya dîrokê, Kurdistanê digre dest û ji her alî ve lêpirsîneke dike. Dîroka ku bi hezaran salan hatiye veşartin û qedexekirin derdixe holê. Li ser esasê netewa demokratîk, nêzikbûneke pêş dixe. Dema ku em van tûndî, êrîş û qedexeyên li ser çand û dîroka Kurdistanê jî ber çavan digirin, ew xebat zêdetir bi nirx dibe. Li hemberî van konevaniyan, di heman demê de dibe bersiv. Gelên ku li ser vê erdnigariyê jiyan dikin, xwediyê çand û kevnariyeke çawa ne û ji kîjan pêşketinan re bûne bingeh radixe ber çavan.

Her wiha ji gelek aliyan ve xweserbûneke vê xebatê jî heye. Mijara herî esasî, dîrokeke ku pir zêde bi pergal nebûye û hê gelek aliyan ve zelal nebûye digre dest. Ji bo vê yekê her serdemekê kîte bi kîte lêpirsîn dike, daneyên heyî hildibijêre û dike parçeyekî dîroka Kurdistanê. Ji bo vê jî bi kûranî lêgerîn û lêkolîn pêwîst dike. Mijara duyemîn, pir caran dema ku em dîrokê digirin dest; em kronolojî û bûyerên hatine jiyankirin esas digirin. Lê di vê xebatê de ji gelek aliyan ve bûyerên ku hatine jiyankirin û nêzikbûnên ku dîrokê teng digirin dest jî hatine lêpirsînkirin û şîroveyên dewlemend hatine pêş xistin. Ew yek mirov zêdetir teşfîqî lêkolîn û lêpirsînê dike. Her wiha dema ku em dîroka Kurdistanê digirin dest; ji ber ne agahdarbûnê, an jî tûnebûna agahiyan di mezîkirina me de, Bakûrê Kurdistanê derdikeve pêş. Lê di vê xebatê de ew yek jî hatiye derbaskirin û vê yekê jî zêdetir giştîbûn û dewlemendî derxistiye holê. Ji ber vê yekê hewl hatiye dayin ku ji milê ziman ve jî xweseriya vê xebatê were parastin.

Ji aliyê rêxistinî û nêzikbûnên kadroyên tevgera me ve jî, ew xebata di destê me de gelek perspektîf û nêzikbûnan jî diyar dike. Bi taybetî li ser esasên netewa demokratîk, ji aliyê nêzikbûnên divê bên pêş xistin û pêwîstiya têkoşîn û peywirên demê ve jî gelek encaman bi xwe re derdixe holê.

Ji ber van sedeman, me pêwîstî pê dît ku ev waneya (ders) ku di Dibistana Navendî ya Partiyê ya Mazlum Doxan de hatiye dayin, em bizivirînin xebateke pirtûkê û bigihînin ber destê hevalan. Em bawer dikin ku dê ji gelek aliyan ve sûd jê bê girtin û ji bo xebatên berfirehtir bibe bingeheke esasî.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**Ragihandina PKK'ê**

# DESTPÊK

**H. Helmet:** Îro duduyê tebaxê ye; roja cejna gul e, roja guhertina stratejîk e. Di Duduyê Tebaxê sala 1999'an de, Rêber Apo pêşniyara guhertina stratejîk kir. Tevgera me jî, ew roj weke cejna gulê pênase kir. Em di rojeke bi vî rengî de, di bin tavê de, di rewşeke întîşarê de, li ser dîroka Kurdistanê dest bi waneyeke dikin.

Destpêkê vê rojê, hevalan pîroz dikim. Rewşa ku em îro jiyan dikin, berhema guhertina stratejîk û pengava ku Serokatî di duduyê Tebaxa 99'an de avêtî ye. Dema ku Serokatî ew gav avêt, di nava me de jî hin kesan, bi awayekî rast ew pengav nexwendin û weke ku Rêber Apo di zindanê de radest bûye girtin dest. Lê Serokatî wê demê jî got, "*bi salên dirêj ez lêkolîn dikim û ez gihêştim wê qanatê ku tevgera me û hevalên me fedakar in, lê di stratejî û textîka me de valatî heye. Divê em stratejiya xwe biguherînin. Divê em mûtefîqên xwe jî ber çavan re derbas bikin."* Li ser vê esasê stratejî guhert. Dema ku em jî behsa stratejiye dikin, em li ser esasê stratejiya nû digirin dest, em weke berê nagrin dest. Ew girîng e.

Ne tenê dîrok, dema ku heval her mijarê digirin dest, divê guhertina stratejîk bînin bîra xwe. Îro hinekî rehet e, ew 16 salin em li ser guhertina stratejîk diaxifin. Lê ji 99'an heya 2005-6'an ne rehet bû. Serokatî her digot, "hevalên min herî dirust, di bendewariyeke ku ez berxwedaneke çort bikim de bûn. Dijmin jî hêvî dikir ku ez radest bibim. Lê min ne berxwedaneke çort kir, ne jî radest bûm. Min erka xwe pêk anî. Rengê berxwedanê ku pêwîst dike, min pêk anî. Ez li çareseriyê geriyam û min dît. Sedema ku em ketine vê rewşê, tevgera me bû. Strateji û textîka tevgera me xitimîbû." Bala we jî kişandibe, Serokatî di paraznameyan de dibêje, "Piştî salên 90-91'an ez di nava lêgerînekê de bûm. Lê min nikarî lêgerînên xwe formîle bikim,ev yek jî bû sebeb ku piştî salên 95'an gelek tişt ji bo min dubare bûn. Zindan bo min bû derfetek ku ez bikarim lêhûrbûnên xwe kûr bikim û van lêhûrbûnên xwe bikim çarçoveyekê."

Ji 99'an heya 2005-6'an, Serokatî hem ji milê leşkerî, siyasî ve; hem jî ji milê stratejîk û textîkî ve, nêrînên xwe bi form kirin. Tevgera me çawa ku ji 1972'yan heya 78'an bingeha stratejî û birdoziya tevgera me ya ewil avêtibû, Serokatî ji salên 99'an heya 2005-6'an jî starejî û textîkên paradigmaya me ya nû diyar kirin. Di sala 99'an de got, *"ez destpê dikim.*" Wê demê her tişt şênber nebûbû, gav bi gav diçû. Dema ku destpê kir, gelek fikar çêbûn. Mesela di 99'an de li Başûrê Kurdis-

tanê nivîskarek hebû, navê wî Marûf Xiznedar e. Kesekî dîroknivîs, civaknas û kesekî bi hûrmet bû. Têkiliyên wî jî li gel hevalan hebûn, mirovekî extiyar bû, dostanî dikir. Van salên dawî jî wefat kir. Di 99'an de dema ku Serokatî guhertina stratejîk çêkir, nivîsek li ser Serokatî nivîsandibû. Serokatî û Cemal Evdil Nasir şibandibûn hev. Digot, "dema 1956'an de, li ser Misir, şerê Îsraîl, Brîtanya û Sîvîsê çêbû; Cemal Evdil Nasir çû Rûsya û wê demê li gel Xoroşînov rûnişt. Di hevdîtinê de li ser rewşa Îsraîl û Ereban gelek nîqaşan dikin, piştî ku hevdîtina wan ya fermî xilas dibe, xwarin dixwin. Taybetmendiyeke Rûsan heye, dibêjin dîplomasiya xwe li ser xwarin û vexwarinê zêdetir dikin. Dixwazin xwe bigêhêjînin armanca xwe. Wê demê jî Xoroşînov dibêje, 'Cemal Evdil Nasir, em niha xwarin dixwin, em ne di fermiyetê de ne, ez dixwazim weke dostekî hin pirsan bikim, tu rehet bersiva min bide.' Cemal Evdil Nasir jî dibêje, 'tamam, ez rehet bersiva te bidim.' Xoroşînov dibêje, 'hûn her li dijberî Cûhiyan dirûşmeyan berz dikin, hûn bawer dikin ku hûnê Îsraîlê tune bikin?' Cemal Ebdil Nasir jî dibêje, 'na, em bawer nakin.' Dibêje, 'tu bawer dikê ku Îsraîl bikaribe Ereban tune bike?' Ji wê re jî dibêje 'na.' Xoroşînov dibêje, 'wisa be, çima hûn li hev  nakin?' Cemal Ebdil Nasir dibêje, 'ew pirseke girîng e, lê ger ez niha bibêjim, em li gel Îsraîl rûnin, dê Ereb hemû tifî min bikin, min qebûl nakin. Niha her kes ji min re dibêje Serokê netewî, lê wê demê kes min qebûl nake.' Xoroşînov jî dibêje, 'wisa be tu li gorî ya pêwîst tevnagerê. Dibe ku niha ji te re bibêjin Serok, lê ew karê we bi encam nabe.'" Marûf Xiznedar jî ew şîrove dikir. Dibêje, "ew pencî sale, di navbera Ereb û Cuhiyan de her şer heye û tiştek jî bi ser nexistine. Ji ber ku Cemal Evdil Nasir wêrekiya avêtina gaveke wisa biavêje nîşan neda, ew şer didome." Lê dibêje, "rûxmî ku Serokatî di zindanê de ye jî, wêrekiya vê gavê nîşan da. Ez mezinahiya Apo di vê derê de dibinim. Ger ew gav bi ser bikeve, Apo dikare gelek tiştan bike." Dibêje, "Cemal Evdil Nasir, serokatiya xwe nexist nava nîqaşan; lê Apo serokatiya xwe xistiye nava nîqaşan."

Jixwe heya salên 2004-5'an di nava rêxistina me de ew yek kete nîqaşê. Lewra bi paradigmaya nû, Serokatî ew rewş derbas kir. Ji ber vê asta îro, berhemên ew pengava Serokatî ne. 16 sal beriya îro, Serokatî gaveke wisa avêt û ew gav timam bûye. Serokatî neket gumana, "xelk ji min re bibêje radest bûye , an na." Ger Serokatî ew pengav neavêtana, jixwe em xitimîbûn; em ê an radest bibana, an jî bi berxwedaneke bi rûmet tune bûbana. Lê Serokatî riyeke nû dît, xêra wê em niha gav diavêjin û em gihêştine asta îro. Ji bo wê ew roj girîng e û rojeke wisa dest bi vê waneyê kirin jî mahneyeke xwe heye.

Dema ku em behsa dîrokê jî dikin, hemû hevalan parazname xwendine; di paraznameyan de Serokatî, bi mantiqeke nû dîrokê digre dest. Girîng e ku em li ser wan mijaran kûr bibin. Ji bo vê waneyê (ders) armanca me ew e; mantiqa dîrokê ya Serokatî û nêrîna wî ya li ser dîroka Kurdistanê û civakê fêr bibin. Em ê li ser van mijaran bi taybetî bisekinin. Li gorî derfetên heyî, em ê hinekî jî li ser kronoloji û bûyerên ku çêbûne bisekinin.

Weke qaneat ez dibêjim; divê dibistanên me yên navendî weke Mazlum Doxan, Zeynep Kinaci, Mahsûm Korkmaz ûhwd, em zêdetir û berfirehtir li ser dîroka Kurdistanê bisekinin. Niha dem kêm e, weke heft rojan hevalan dem daye me. Berê kêmtir bû, hevalan digot 3-4 roj. Em behsa dîrokeke kevn dikin, em dibêjin Kurd netewa herî kevn e; lê em dixwazin bi 3-4 rojan behs bikin û beqedînin. Ew ne rast e. Bala we jî kişandibe, Serokatî paraznameyeke pir berfireh li ser vê mijarê nivîsandiye. Em bi hevalên berpirsyarên perwerdê re jî nîqaş dikin, divê demên pêş de herî kêm 15-20 rojan li ser dîroka Kurdistanê perwerde bê dîtin. Ne şert e ku weke waneyeke giştî jî mirov bigre dest, serî carê weke beşekê bigre dest. Demeke dirêj li ser hev waneyek be, mirov tengav jî dibe. Bûyer bi bûyer û dem bi dem mirov dikare bigre dest. Bi kurtasî hefteyek pir kêm e.

Em ê bi hev re hewl bidin ku van rojên xwe bi awayekî dewlemend derbas bikin. Me weke qomîsyon jî nîqaş kir. Heval dikarin pêşnûmeya (taslak) xwe jî bigirin, da ku ew waneya ku li vê derê dîtine, heval biteyisînin cihên din. Ji bo her waneyê wisa ye. Em ê pêşnûmeya xwe pêşkeşî hevalan bikin û em ê li ser wê esasê waneya xwe bimeşînin.

Mijara yekem ku em dixwazin li ser bisekinin, dîrok çi ye? Rêbazên behskirina dîrokê çi ne? Rêbazên ku heya niha hatine ceribandin kîjan in? Em ê hinekî behsa wan bikin. Weke tevger, di demên derbasbûyî de me kîjan rêbaz pêjirandiye û îro pê ve em dîrokê çawa digirin dest? Ew jî mijareke esasî ye. Di vê mijarê de, ya esas em ê li ser fikir û felsefeya Serokatî ya dîrokê bisekinin. Em niha dibêjin, Rêber Apo tenê ne serokê hizbekî ye! Apogerî, zanistek e, felsefe ye. Lewra di hinek mijaran de Serokatî avabûnên nû çêkirine, xûlikarî pêş xistiye. Ger dîrokê ji aliyê fikir û felsefe ve em bigirin dest, Serokatî di dîrokê de xûlikarî kiriye. Bingeha zanistê dîrok e, ger em wê baş bizanibin, em dikarin têkoşîneke baş jî bimeşînin.

Bala xwe bidinê, niha li gelek zankoyên cîhanê teoriya dîrokê ya Marks tê xwendin. Nabêjin ew çep e, an rast e. Dibêjin ew zanista

dîrokê ye. Ger em jî zanista Serokatî rast fêm bikin û bidin fêmkirin, dê cîhan bixwîne. Ew zanist e. Kes nikare bibêje, ew Evdilah Ocalan e û ew jî Serokê PKK'ê ye. Dibe ku PKK jî, ji vê zanistê îstîfade bike, lê gelên din jî dikarin jê îstîfade bikin. Lê heya niha ji vî alî ve kêmasiyên me hene. Mesela niha hevalên me li ser jineolojiyê dixebitin, jineolojî zanisteke nû ye. Ger em bikaribin baş formûle bikin, dê cîhan wê bixwîne. Serokatî pêşêngtiya wê kiriye. Bi vî rengî em dikarin cudabûna Serokatî bidin nîşan dan. Di civaknasiyê de jî Serokatî, gelek nûbûyin û guhertin çêkirin. Ger em bingeha wê baş bikaribin teqez bikin, niha li gelek akademiyan pirtûkên Serokatî dê bên xwendin. Di gelek mijaran de Serokatî nêrîn û felsefeyên nû pêşkeşî civakê kiriye, lê em kêm li ser disekinin. Ji bo vê Rêber Apo teng dîmîne. Di mijara yekemîn de em dixwezin hinekî li ser vê bisekinin.

We li ser şaristaniyê wane dîtiye, ji ber vê barê me hinekî sivik dibe. Lê ji ber ku waneya me dîroka Kurdistanê ye, divê em careke din mezîkirina xwe ya dîrokê vebibêjin. Îlma me ya dîrokê çi ye, em li ser kîjan esasan dîrokê digirin dest? Ji bo vê mijara me ya yekemîn ew e.

Mijara dûyemîn li ser erdnîgariya Kurdistanê ye. Erdnigariya, pozisyona Kurdistanê ji kudera cîhanê ye, rewşa wê çi ye, ji milê jeostratejîk ve girîngiya wê çi ye û nêzikbûna me ya erdnigariyê çi ye? Xeynî vê jî hinekî li ser erdingariya îdarî û siyasî ya Kurdistanê em ê bisekinin.

Di beşa seyemîn de ger îmkan bibe, em ê li ser demografyayê bisekinin. Ango rewşa civaka Kurdistanê ye, civakên ku li Kurdistanê jiyan dikin di çi rewşê de ne? Em ê hem li ser pêkhateyên cuda yên Kurdistanê, hem jî pêkhateyên Kurd bisekinin.

Piştî xilaskirina demografiye, em dixwazin behsa kronolojiya dîrokê bikin. Em ê behsa kronolojiya dîroka Kurdistanê bikin. Di wê derê de jî em ê di destpêkê de, di civaka xwezayî de dîroka Kurdistanê bigirin dest. Em hemû civaka xwezayî nagrin dest, lê di wê demê de em ê dîroka Kurdistanê bigirin dest. Pêşketin û tiştên dîrokî ku di wê demê li Kurdistanê çêbûne em ê vekin, em ê behsa cih û warên dîrokê yên Kurdistanê bikin. Wê demê forma civakê, li Kurdistanê bi çi rengî ye, bawerî çawa bûye? Em ê li ser van mijaran bisekinin. Ger îmkan bibe, di vê mijare de em ê weke du beşan bigirin dest; serdema kevn û serdema neolîtîkê em ê cuda bigirin dest. Herdu jî civakên xwezayî ne, lê du demên cuda ne.

Dema ku ew xilas bibe, em ê dema hiyerarşiye, ango dema ku çîntebaqe çêdibin bigirin dest. Di vê demê de bi taybetî çima çînîbûn, li

Kurdistanê çênebûn? Dema ku çêbûn, li Kurdistanê tesîra wê çi bû, guhertinên ku bi vê merheleyê re di civaka Kurdistanê de çêbûne çi ne? Em ê bi mînakan behsa wê demê bikin.

Em ê heya serdema Medan, wisa bigirin dest. Ew jî dema hiyerarşiye ye, lê em ê hinekî bi taybet li ser serdema Medan û Zerdeştiyê bisekinin. Baweriya Zerdeştiyê, pergala îdare û jiyana wan; rista Kurdan ya wê demê em ê bigirin dest. Piştî wê ji aliyê zanistê ve pêşketinên ku li Kurdistanê çêbûne, bi taybetî ji aliyê astronomiye ve pêşketinên ku li Kurdistanê çêbûne, nirxên ku hatine avakirin em ê bigirin dest.

Mijareke din jî, ji ketina Medan heya serdema Îslamiyetê, em dixwazin weke demeke cuda bigirin dest. Çima Med têkçûn, em ê vê binirxînin. Di vê derê de em ê hinekî li ser xiyanet û berxwedanê jî bisekinin. Serokatî jî di şexsê Harpogos û Astiyeges de digre dest û dinirxîne. Qonaxa ketina Medan heya serdema Îslamê, li Kurdistanê rewş çi bû û çawa derbas bû, em ê hewl bidin vekin. Derdorên ku li ser Kurdistanê bûn deshilatdar kî bûn, çawa nêzikî civaka Kurd bûn, civaka Kurd çawa nêzikî bawerî û formen xwe bûn? Heya hatina serdema Îslamê, em ê weke mijareke bigirin dest.

Mijareke din, derketin û pêşketina Îslamiyetê û hatina wê ya li Kurdistanê ye. Li wê derê jî, em dixwazin bingeha fikra Îslamiyetê û derketina wê û tesîra li ser rewşa siyasî dike, vebibêjin. Li ser cîhanê, bi taybetî li ser Kurdistanê bandoreke çawa kiriye? Heya serdema Abasiyan xilas dibin, em dixwazin di bin navê vê serenavê de vebibêjin. Îslam çawa nêzikî Kurdan bû, Kurd çawa nêzikî Îslamê bûn; pergalê îdarî, di dema Îslamê de bi çi rengî bû? Di ew pergala îdarî de, rista Kurdan çi bû? Di dema Îslamiyetê de têkiliya Kurdan, bi miletên din re çawa bû? Pêşketin û paşketinên di vê demê de li Kurdistanê çêbûne, em ê bigirin dest. Her wiha bawerî û nêzikbûnên derveyî Îslamê yên weke Yarsanî, Elewîtî û tarîqatên pêş dikevin em ê vekin.

Piştî wê hatina Kurdistanê ya Moxol, Tatar, Ak Koyunî, Kara Koyunî, Osmanî û Safewiyan bigirin dest. Ji 1250'î heya 1500'î rewşa Kurdistanê çi bû, em ê wê bigirin dest. Van hêzan li ser Kurdistanê çi dan meşandin? Di vê demê de hêdî bi hêdî wêjeya Kurdî bi pêş dikeve, em ê hinekî li ser wê jî bisekinin. Heya parçebûna Kurdistanê ya 1514'an em ê vê mijarê bigirin dest.

Mijareke din, ji parçebûna Kurdistanê heya sedsala 19'an e. Ji 1514'an heya 1800'î, nêzikî 300 sal rewşa Kurdistanê bi çi rengî derbas bû. wê demê Kurdistan bûbû du beş, beşek ya rojava ya ku di bin destê

Osmaniyan de bû, beşek jî ya rojhilat ku di bin destê Îraniyan de bû. Em ê rewşa herdu beşên Kurdistanê cuda bigirin dest.

Sedsala 19'emîn, em ê weke mijareke taybet ku pergala sermeyaderiyê pêş dikeve bigirin dest. Feraseta netewe dewletê û tesîra wê ya li ser Osmanî, Safewî û Kurdistanê em ê vekin. Serhildanên Kurdan yên sedsala 19'an jî em ê bigirin dest. Heya ku tê sedsala bîstan, wisa ye.

Di sedsala 20'emîn de jî, destpêka sedsalê, heya parçebûna Kurdistanê û peymana Lozanê, Birûkselê û Enqereyê jî em ê weke mijareke taybet bigirin dest. Ev mijar hemû girîng in, bes ew mijar ji bo fêmkirina îro pir girîng e. Çawa ku fêmkirina neolîtîkê, ji bo hemû mirovahiyê pir girîng e; fêmkirina destpêka sedsala 20'emîn û avabûna pergala nû ya cîhanî (yeni dünya düzeni) jî ew qesa girîng e. Heya ew pergal hate avakirin, pevçûn û nakokî hebûn. Ew pergala ku em îro dibêjin, bingeha wê xirab bûye ye, ango divê bingeha wê xirab bibe. Bala xwe bidinê, Serokatî hemû hevdîtinên xwe de gelek caran diçe wê demê, lewra bingeha vê pergalê wê demê hatiye avêtin. Ger em dixwazin pergala îro fêm bikin, divê em wê demê fêm bikin. Pêwîst e, em li ser wan îtîfaqên ku wê demê çêbûne kar bikin û wan biguherînin. Çawa ku em dibêjin, ji bo ku em azadiyê fêm bikin, divê em civaka xwezayî fêm bikin; da ku em bikaribin pergala demokrasiye ava bikin. Ji bo pergala îro jî ew girîng e. Ew jî weke serdemekê ye.

Jixwe piştî wê Kurdistan dibe çar parçe (Bakûr, Başûr, Rojava, Rojhilat ). Em ê hewl bidin ku li ser her parçeyekî bi taybatî bisekinin. Em ê wisa bigêhêjin encamê. Bi vî rengî me pêşnûmeyek amade kiriye. Cihên dîtir jî me ew perwerde daye, lê dema wê kêm bû. Niha hinekî din dem zêde ye. Li gorî wê em ê hewl bidin, dema xwe baş kar bînin.

Weke qomîsyon nêzikbûna me ev e; em ê wisa beş bi beş biçin, em ê li ser her beşe biaxifin, di her beşê de ger axaftin û pirsên hevalan hebin dikarin bikin. Dibe ku pir dema me ya nîqaşê çênebe. Ne weke mijareke felsefîk û teorik e ku wisa bi dirêjî nirxandin bên kirin. Lê di her beşe de em maf didin hevalan; heval hem dikarin agahiyan bidin, hem jî şîrove û nirxandinên xwe dikarin bikin. Tiştê ku em weke destpêkê bibêjin ew e, bila weke pêşnûme van tiştan di destê hevalan de jî hebin.

## JI NÛ VE MEZÎKIRINA DÎROKÊ

Beşa yekemîn li ser dîrokê ye. Dîrok çi ye? Em ê dîrokê çawa fêm bikin, rêbazên behskirina dîrokê çi ne? Ji bo bersivdana wan pirsan divê em hinek tiştan tevlî hev nekin. Em dibêjin, dîrok deshilatdaran nivîsandiye û qet behsa me nake. Lê îro em dibînin ku gelek cihan de behsa me hatiye kirin. Hemû merhele, ne weke hev in. Heya beriya 300 salî dîrok bi rengekî normal hatiye dest girtin Ger bi navê Kurdbûnê be û em dibêjin beriya deh hezar sal behsa Kurdan nehatiye kirin, lê belê beriya deh hezar sal behsa Tirkiye jî nehatiye kirin, behsa Ereban jî nehatiye kirin. Heman dem ev rastî jî heye, yên ku bi ser dikevin, damgaya xwe li jiyan û dîrokê didin. Divê mirov vê bizanibe. Mînak, du mirov li vê derê şer bikin û yek bimre. Eger kes li gel wan nebe, em nikarin îfadeya kesê ku hatiye kûştin bigirin, yê ku îfade dide kujere. Îfadeya wî/ê çiqasa rast be, mirov nizane. Ji ber vê yên ku dîrok nivîsandine, kesên ku bi ser ketine, êdî baş û xirab be ew naye zanîn.

Serokatî dibêje, “ger em ser nekevin, em tên lanetkirin.” Ger em ser bikevin, em dikarin dîrokê binivisînin. Serokatî got, “PKK, tevgereke ku mûdaxaleyî dîrokê dike ye.” Em dixwazin mûdaxaleyî dîrokê bikin û sererast bikin, lê ger em bi ser nekevin; em ne dikarin sererast bikin, ne jî em dikarin tiştekî nû bikin ser. Ji bo vê ew fêmkirin girîng e; yên ku bi ser bikevin dikarin dîrok binivisînin, yên bin bikevin nikarin binivisînin. Naye wê mahneyê ku bi giştî ji holê tên rakirin, lê tesîra wan kêm dibe. Niha em dîrokê dixwînin, yekî weke Manî heya îro tesîra xwe dike, lê ne weke Muhamed e. Yekî weke Mazdek bi tesîr e, lê weke Îsa û Musa nîne. Dibe ku Îsa bi xwe ser neketibe, lê telebeyên wî ser ketin. Divê van mijaran bên zanîn.

Heya beriya 200-300 sal berê hinek tişt cûda bûn. Di wan deman de weke îro dîrok ew qesa înkarkirin tune bû. Kêmtir bû. Hinek aliyên xwezayî yên dîrokê dihatin parastin, lê piştî 1600-1700’î hêdî hêdî felsefe û îlim pêş ket. Li Ewropa ronesans pêş ket, hêdî hêdî her mijarek kirin îlmek. Yek jî wan mijaran dîrok bû, ku bû îlma dîrokê. Gelek kesên weke Hegel û Marks nîqaş kirin; “dîrok çi ye û divê em dîrokê çawa bigirin dest?”

Berê xelkên ku dîrok nivîsandine, dîrok weke mijarên ku hatine nivîsandin girtine dest. Şer û pirsgirekên ku hene, kirine çîrok û nivîsandine. Gotine ev dîrok e. Lê di salên 1700-1800’î de ew tişt hatine nîqaşkirin; “bi rastî jî dîrok tenê ew e?” Hinekan gotin, “na dîrok ne tenê tiştên ku hatine nivîsandin in.” Hinekan jî gotin, “tenê tiştên ku

hatine nivîsandin dîrok in.” Divê em vê nîqaş bikin. Niha jî hinek wê bawer dikin. Hinek jî dibêjin, “dîrok tenê bûyerên girîng in.” Mesela li gor wan kesan îro em bi awayekî xwezayî jiyan dikin, ev nabe dîrok, hin bûyerên weke şer dibin dîrok. Dema dinivisînin jî van dinivisînin, tiştên xwezayî nanivisînin. Ew li ser mejiyê mirov jî tesîr dike. Hinek jî dibêjin, “dîrok, jiyana paşa, qral û kesên girîng e.”

Ev nîqaş pir çêdibin. Hinek dibêjin, “dîrok nivîsandina rastiyan e.” Hinek jî dibêjin, “na, tu çi bibînî divê tu binivisînî, dîrok ev e. Divê dîroknivîs waqa derbasî dîrokê bike.” Mesela ez hatim vê derê, ez çi bibînim, divê ez binivisînim. Ger ez tiştên li gorî dilê xwe binivisînim, rast nabe. Ez nikarim bibêjim, li gorî min rast e.

Di encamê de ew tişt derket; “dîrok tiştekî xwezayî ne, divê dîrok bibe zanist. An jî bibe felsefe.” Li ser vî esasî heya ku tê serdema Hegel û Marks, hinek form digre. “Dîrok zanisteke û aliyê wê yê felsefeye jî heye. Divê dîrok wisa bê destgirtin.” Em çawa digirin dest, divê em jî nêrîna xwe bînin ziman. Lewra hê jî hinek kes li gorî xwe dîrokê dinivisînin. Hinek nêzikbûnên deshilatdaran esas digirin. Hinek miletekî esas digirin. Lê di netîceyê de, dîrok bûye zanistek û aliyê wê yê şîroveyê jî heye. Beriya 200 salan, aliyê dîrokê yê şîrovekirinê tune bû. Dîrok pir sade bû. Kêm be an zêde be, cuda ye, lê sade bû.

Ji ber vê Geothe dibêje, “yên ku dîroka 3000 salan nizanin, rojane jiyan dikin.” Lewra ew tenê dîroka fermî ji bo xwe esas digirin. Ji dîroka Gîrîtê digirin dest. Dîroka Gîrîtê, texrîben li beriya mîladê 700-800 sal e. Ji ber vê dibe 3 hezar sal. Ji bo vê dibêjin, divê mirov dîroka 3 hezar salan nas bike. Wê demê dîroka Ewropa, hêdî  hêdî çawa pêş ketiye, divê tu nas bikî. Lê li gorî me, ew têrê nake; çima têr nake? lewra ne pergala deshilatdariyê li Ewropa destpê kiriye, ne jî dîrokê. Ew tespîta wî, dibe ku wê demê ji bo civakên Ewropa têrê bike, lê ji bo fêrkirina rastiya dîrok û giştî civakê têrê nake.

Ew bi xwe re rêbaza behskirina dîrokê tîne. Heya salên 1800’î, heya serdema Hegel, li cîhanê bi yek rengî behskirina dîrokê hebû. Ew jî şêwaza çîrokê bû. An bi nivîskî, an bi devkî. Hinek devkî weke dîrok qebûl nakin, lê girîng e. Heya vê demê, bi rêbaza çîrokî behsa dîroka kevn dikin, bi yek rêbaze ye. Erebî pê re dibêjin, “serdî tarîxî.” Bi tirkî jî dibêjin, “aktarim.” Mesela hevalekî/ê me diçe peywirekê û dema ku tê tekmîla xwe dide; ew bi rêbazeke behskirinê ye. Balkeş e. Mesela hevalek diçe kongreye; dema ku tê, veguhestina kongre dike. Lê piraniya hevalan, bala xwe nadin nirxandin û biryaran, dibêjin ka li wî koşeyî çi bû, kê got çi û kê çi kir? Ew ûslûbek e û heya demekê der-

basdar e. Bi Erebî pê re dibêjin, “serdî tarîxî.” Bi Kurdî dibêjin, “gêranewe-zivirandin.” Bi Tirkî dibêjin, “aktarim.” Ew ûslûbekî balkêş e. Ew ûslûbê kevn e, sade ye û xîtabî hestên mirov dike.

Jixwe berê şirovekirin û nirxandin kêm bûye, lê niha ew jî pêş ketiye, rûxmî wê hîn (rêbaz)ûslûpê gêranewe-zivirandin bale dikşîne. Ev ûslûp du şêwazên wê hebûne; yek nivîskî ye. Bi nivîsan hatiye behskirin. Mînakên wê, ew nivîsandinên Heredot û ew Efsenayên Sûmer, Babîl û wan in. Şêwaza duyemîn jî devkî ye. Heya sala 1800’î ev rêbaz bi bandor bûye. Lê di vê dîrokê de rista yên ku serketine pir zêde ye. Damgaya xwe li wê dîrokê dane. Serokatî di paraznameyan de jî behs dike, ji vê rêbazê re dibêjin, “efsane, mîtolojî.” Ango weke çîrok û xeyal tevlîhevkirinê tê dest girtin. Mesela behsa Gilgameş tê kirin, weke tiştekî ku xeyal e. Kawayê Hesinkar wisa ye. Ew hem nivîskî ye, hem jî devkî ye. Em niha ji vê rêbazê re dibêjin, çîrok, hîkaye. Qarekter diyar e. Ew heya salên 1800’î ûslûbê yekane ye. Piştî salên 1800’î bi riya Hegel û Marks ew hinekî hate guhertin. Hêdî bi hêdî dewlemend bûye.

Piştî salên 1800’î nîqaşên li ser dîrokê hene, bi Hegel hinek formûl dibin. Lê Marks ew formûl timam kir. Ji felsefe û zanista nû re gotin, “materyalîzma dîrokî.” Beşek ji îlmê, beşek jî felsefê, weke materyalîzma dîrokî tê bi nav kirin. Ew ji bo behskirina rêbaza dîrokê, bû şêwazeke nû. Ya yekemîn jî vegerandin, aktarim bû. Ya duyem jî, weke rêbazeke nû materyalîzma dîrokî bû.

Ew rêbaz, weke beşeke felsefeya materyalîzmê hate dest girtin. Marks ew bi formûle kir. Vê rêbazê got, “rêbaza berê têrê nake.” Gotin “dîrok, tenê weke veguhestinê têrê nake, divê tiştên weke şîrovekirinê bikevin nav.” Ji ber ku Marks ew formûle kiriye, weke beşek ji felsefeya Marksîzmê jî tê naskirin. Hinek bingehên wê hene. Bingeha yekemîn, tehlîlkirina mejî(dîrok) ye. Materyalîzma dîrokî, di esasê xwe de dîrokê analîz dike. Rêbaza analîzkirina dîrokê ye. Rêbaza berê jî, tenê behskirin û veguhestina dîrokê bû. Marks, hinek pîvan û rêgezên dîrokê ji bo vî îlmî danîne û li ser wê esasê ew îlîm pêş xistiye. Ew îlîm, niha li piraniya cîhanê tê xwendin. Gelek zanko û akademiyên cîhanê ku dîrokê digirin dest, ew rêbaza Marks weke îlmeke digirin dest.

Weke tevgera Apoger, di destpêkê de me jî ew rêbaz esas girt. Rêbaza ku ji bo îlmê me esas girt, rêbaza materyalîzma dîrokî bû. Vê rêbazê got, “rêbaza veguhestinê kêm e, divê dîrok bê analîz kirin.” Dema ku Rêber Apo jî dest bi xebatê kir; hem dîroka Kurdistanê, hem

ya cîhanê xwend û li ser vê esasê nêzikî dîrokê bû. Li ser esasê materyalîzma dîrokî, dîroka gerdûnê û dîroka Kurdistanê girt dest.

Hinek esasên vê rêbazê hene; ya yekem, tarîfkirina dîrokê ye. Di Marksîzmê de dîrok, zêdetir weke dîroka çînan tê destgirtin. Dibêjin, "dîrok ji pevçûn û nakokiyên dinavber çînan pêk tê. Dema ku ew çîn, li hev dixin dîrok pêk tê." Bi vî rengî dîrokê tarîf dikin. Gotin, "çîna serdest dîrokê bi rengekî digre dest, çîna bindest jî dîrokê bi rengekî digre dest. Çîna serdest dixwaze, dîroka xwe bide pêş. Çîna bindest jî dixwaze dîroka xwe bide pêş." Marks jî got, "ez dixwazim birdoziya çînên bindest bidim pêş." Ji bo wê felsefeya Marksîzmê pêş xist. Ew nêzikbûn û pênaseyeke dîrokê bû.

Ya duyem, ji ber ku pênaseya dîrokê ji civakên çînî digirt dest, Marks hinekî behsa civakên beriya wê (ilkel kominal) jî dike. Mesela berê digotin, "dîroka sê hezar salan divê mirov bizane." Marks, hinekî qala beriya wê jî dike, lê zêde nakeve nav. Çima? Rêber Apo rexne dike û dibêje, "wê demê behs nekiriye, du sedem hene; yek wê demê agahî kêm bûne, lewra Marks beriya 150 salî ew fikir pêş xistin. Ji bo vê nikariye baş şîrove bike. Ya duyem jî, ji ber ku Marks tarîfa dîrokê bi çînan kiriye, dibe ku dema beriya çînan pir bi wate nebîne. Tiştên ku beriya çînan hebûne, pir bi nirx û bi wate nedîtiye." Ew bûye kêmasiyeke esasî ya Marksîzmê jî. Ji bo wê Serokatî vê terîfê rexne dike. Beriya wê me rexne nedikir, em li gorî wê diçûn. Lê ev 15 salan zêdetir e, Serokatî rexne dike û alternetîfa wê datîne.


Ya din, Marks dîroka civakê bi beşên cûda girt dest. Niha jî biçin dibistaneke û pirtûkeke dîrokê bixwînin; hemû bi civaka seretayî û komînal (îlkel komînal) destpê dikin. Pişt re dema koledariyê û dema feodalîzmê, dema sermayedarî û herî dawî jî weke dema sosyalîzmê digirin dest. Ango Marks, dîrok weke penc deman dabeş kir. Dema yekem, dema seretayî û komînal; dema duyem, dema koledariyê; dema seyemîn, dema feodaliyê (derebeytî); dema çaremin, dema kapîtalîzmê (sermeyaderiyê); dema pençemin û herî dawî jî, dema sosyalizmê ye.

Rêgeza din ku Marksîzmê girt dest jî; gotin, "dîrok her tim pêş ve diçe." Li gorî vê rêgezê, dema nû, ji ya kevn her pêşketîtir e. Her tim pêş ve diçe, paş ve hatin tune ye. Ew rêgaza xeta raste rast pêşketinê ye. Ew weke rêgezeke diyar kir.

Rêgezeke din ku di Marksîzmê de esas hate girtin, diyalektîk bû. "Dema ku yek tê, ya berî xwe tune dike. Ew ji bo civakê jî, ji bo xwezayê jî wisa ye." Mesela dibêje, "dema ku civaka koletiyê hat, civaka xwezayî tune bû. Dema ku civaka feodalîzmê hat, civaka koleda-

riyê tune bû.” Ango ya ku nû tê, ya kevn tune dike. Ew weke rêgezeke şîrovekirina dîrok û civakê hate dest girtin. Berê weke tevger, ev rêgez ji bo me esas bûn. Mesela dema ku me berê behsa dîrokê dikir, me dîrok weke çînên civakî digirt dest. Me civak dikir penc beşan. Me weke civak her pêş dikeve (ilerlemeci), di heman demê de, civaka nû, ya kevn red dike, ji ya kevn jî pêşketîtir e girt dest..

Ji berê ve li ser van esasan hin lêgerînên Rêber Apo hene, lê piştî salên 99’an zêdetir ew mijar xistin bin lêkolînê û di paradigmaya xwe ya nû de, ew bi cih kir. Mijareke esasî ku mirov di paradigmaya Serokatî de bigire dest, ev e. Serokatî hat û ew nû kir. Serokatî got, “rêbaza behskirin û veguhestina dîrokê ne şaş e. Dibe ku kevn be, lê ne şaş e”. Marksîstan digot, “rêbaza çîrokî pir bê mahne ye.” Lê Serokatî got, “ne bi wî rengî ye. Mirov dikare mahne bide û hin tiştan jê derxe.” Bala we jî kişandibe, Rêber Apo ji mîtolojî û çîrokan gelek wane derxistine. Weke wan, naxwîne û şîrove dike. Hinek tiştên xwe jî weke çîrokan e. Rêber Apo qlasîk nêzik nebû, got “divê mirov ji nû ve şîrove bike.”



Rêber APO

Rêbazeke nû ya behskirina dîrokê, Rêber Apo pêş xist. Çawa dibêjin, rêbaza Marks; ew jî rêbaza Serokatî ye. Em berê li ser rêbaza Marks diçûn, lê niha em li ser rêbaza Serokatî diçin. Serokatî, dîrokê weke pevçûna çînan nagre dest. Serokatî dîrokê, weke bûyer û diyardeyeke gerdûnî digre dest. Weke ku hemû gerdûn, hev û din eleqedar dike, digre dest. Divê em vê bi kûrahî bibînin. Serokatî çima dîrokê weke diyardeyeke gerdûnî digre dest? Çima dibêje, "gerdûna yekemîn û gerdûna duyemîn." Çima mirovekî, weke gerduneke dibîne? Lewra Rêber Apo, mirov weke berhema gerdûnê dibîne. Ger em gerdûnê nas bikin, em xwe jî nas dikin. Ji ber vê Geothe dibêje, "divê mirov sê hezar sal dîroka xwe bizanibe." Lê Serokatî dibêje, "bi 3 hezar û 10 hezaran nabe; divê mirov hemû gerdûnê nas bike. Divê lêkolîn û lêgerîneke zêde çêbe." Ew nêzikbûneke Serokatî ye. Serokatî dîrokê tenê bi çînan nagre dest, tenê civakî jî nagre dest. Dîrokê gerdûnî digre dest, ew girîng e.

Ya duyemîn, dema ku tê ser civakê; Rêber Apo dibêje, "dîrok û civaknasî pêk ve ne. Hev û din timam dikin." We parazname xwendin e, Rêber Apo dibêje, "divê em civaknasiyê bikin dîrok; dîrokê bikin, civaknasî." Ji bo çi? Niha em civak in, psîkolojî û hestên me hene; berhemê dîrokekê ne. Beriya hezar salî psîkolojiya ku wê civakê jiyankiriye, ne weke ya îro bûye. Baweriya wê, ne weke ya îro bûye. Beriya 2 hezar sal jî, ne weke ya îro bûye. Dema ku ew dîrok tê jiyankirin, her aliyê civakê tê guhertin. Ger em bixwazin civakê nas bikin, divê em dîrokê nas bikin. Ji bo ku em dîrokê nas bikin jî, divê em civakê nas bikin. Ji bo vê Rêber Apo dixwaze, dîrok û civakê ji nû ve bigre dest. Ji hev û din qut nagre dest. Dibêje, "di zanistê de tiştê herî girîng, divê mirov dîrok û civakê nêzikî hev û din bike."

Ew nêzikbûn û beşeke îlma Serokatî ya dîrokê ye. Ger em bixwazin dîrokê lêkolîn bikin, divê em li ser civakê lêkolîn bikin. Ger em bixwazin li ser civakê lêkolîn bikin jî, divê em li ser dîrokê lêkolîn bikin. Da ku hev û din timam bikin. Yek tişt e. Di mijarê tarîfê de, Serokatî dîrokê cuda digre dest; êdî weke berê nagre dest. Girîng e ku mirov vê rêgezê bizanibe. Ger hevalêk bixwaze li ser dîrokê binivisîne, divê van rêgezan esas bigre. Ger hevalek bixwaze li ser dîrokê pirtûkeke bixwîne û binirxîne, divê van rêgezan esas bigre.

Mijara din ku Rêber Apo digre dest; çawa ku Marks, dîrok beş bi beş girt dest, Serokatî jî beş bi beş girt dest. Lê weke Marks nekir. Serokatî dîrok kiriye sê beş; ya yekem, civaka xwezayî; ya duyem, civaka çînayetî( hiyerarşik-tebaqî- pildarî); ya seyem jî civaka demokratîk e.

Di ya Marks de, penc beş in; di ya Serokatî de sê beş in. Ji bo çi Serokatî wisa kir? Fêmkirina cewhera wê girîng e. Serokatî got, “cara yekem Marks navê civakê, kiriye ‘îlkel komînal.’ Ew navkirina şaş e. Lewra li wê derê, hovîtî-îlkelbûyin nehatiye jiyankirin. Demeke ku mirovan bi xwezaya xwe ve jiyankirin e.” Serokatî got, “rast e, ew weke demekê hatiye jiyankirin, lê navkirina Marks şaş e.” Serokatî vê rexne dike. Dibêje, “divê em vê serdemê re bibêjin, ‘civaka xwezayî.’ Lewra mirov bi xwezaya xwe jiyan dikin. Mirov ji xwazeyê dûr neketiye.”

Dema dûyem, seyem, çarem û pençem ya Marks; Serokatî weke demekê digre dest. Dibêje, “ew ne çar dem in, yek dem e. Ew jî demeke ku çîn-tebaqe hene. Guhertineke cewherî çênebûye. Weke çar deman binavkirin şaş e, ew yek dem e. Ew dem hemû jî dema çîn û tebaqayan e.” Di xwezayê de mirov hene; ajal, nebat, av, ax, agir, hawa heye. Ew materyalên esasî yên jiyanê ne. Di nava xwezayê de ew hemû hene. Di nava civaka xwezayî de jî, têkiliya mirov bi van tiştan ve raste rast heye. Her wiha têkiliya her tiştî bi hev re heye. Têkiliyeke simboyîtîk heye. Weke ku Serokatî dibêje, “yek nebûye obje û ya din jî nebûye sûbje.” Yek nebûye navend û yek nebûye derdor. Têkiliya hemûyan bi hev re raste rast heye. Têkiliya hemûyan bi hev re heye û her kes jî rista xwe dîlîze.

Dema pergal tê guhertin û dema hiyerarşiye tê pêş xistin; mirov dibe navend û tiştên din dibin derdor. Hemû çîrok, mîtolojî û pirtûkên pîroz yên wê demê, mirov dikin navenda gerdûnê. Mirov weke pîroz û navend dibînin. “Divê mirov her tiştî qontrol bike.” Vê yekê di nava xwezayê de bêdengetî (lasengî-nehevsengî ) ava kir, zîhniyeteke berovajî ava kir. Niha em têkoşerên azadiyê ne, lê zîhniyeta me hê jî rast nebûye. Ew denge hê jî me çênekiriye. Dengeya ku di civaka xwezayî de hebû xirab bû. Ew bêdengetiya ku di nava xwezayê de çêbûyî ye.

Bêdengetiya duyemîn jî, di nava civakê de çêdibe. Civakî ye? Jin e, zilam e, ciwan e, zarok e, extiyar e, kesên astengdar in. Di civaka xwezayî de, di nava van mirovan de têkiliyeke xwezayî heye. Vê têkiliyê hevsengiyek çêkiriye. Lê di dema hiyerarşiye de zilam tê navendê û her tiştî dike bin serweriya xwe. Bi vî rengî, êdî di nava civakê de bêdengetî çêdibe. Êdî bi demê re ew tişt, tê qebûlkirin jî. Bi vî rengî tebaqe û bêdengetî pêş dikeve.

Di heman demê de bêdengetiyek din jî çêdibe; li gorî pîşeyan e. Mesela di civaka xwezayî de, ji 200 hezar salî zêdetir ferqekê wisa çênebûye. Her kes her karî dike. Kesek, ji kesekî/ê din mezintir nîne.

Wê demê kar jî wisa pir ne zedene, tevlîhev in jî. Her karekî nirxeke wî heye, mahneyeke wî heye, qîmet tê dayin. Lê di dema hiyerarşiye de, hinek xwe  dixin navendê. Ew kesên ku ji bo xwe kole, evd çêdikin in. Êdî karê wan jî her karî girîngtir e, karên din bê mahne ne. Serokatî dibêje, "ew pergal hate çêkirin, di dema koledariyê de ew pergal qet nehat guhertin. Mirov di nava xwezayê de her xwe navend dibîne, di nava civakê de zilam her xwe navend dibîne."

Serokatî dibêje, "di ew demên navber de, guhertinên pir cuzî çêbûne; feodal hatiye û patika koledar girtiye û avêtiye. Gotiye, 'ew kar bi te naye kirin, ez ê bi xwe bikim.' Dema ku sermayedar tên jî, feodalan re wisa dibêjin. Sosyalist jî, li ser navê dîktatoriya proleterya, bi xwe diçe cihê kapîtalîstan rûdine. Ji bo vê pergal nehatiye guhertin. Tenê kesên ku îdare dikin guherîne." Her yê ku tê jî, hevsengiya civak û xwezayê zêdetir xirab dike. Di yekê de jî guhertineke bingehîn çênabe. Ji ber vê Rêber Apo dibêje, "di cewher de, ew her çar dem jî yek in." Ji aliyê şêweyî ve hinek hatine guhertin. Serokatî dibêje, "dema ku ez weke dema seyemîn bi nav dikim jî, dê ew hersê bêdengetî jî bên sererastkirin. Divê mirov careke din, ji navenda gerdûn û xwezayê derkeve." Divê êdî em xwe navenda her tiştî de nebinin.

Ya duyemîn, divê zilam ji navenda civakê derkeve, tevazûnek çêbibe. Serokatî dibêje, "berê em jî wisa difikirîn û me digot, 'pêwîst dike, em dîktatoran ji holê rakin, em cihê wan rûnin. Lê divê êdî tu kes di navendê de nebe.'" Em civaka demokratîk nîqaş dikin; pevçûn, di navbera rêveberiya demokratîk û deshilatdariyê de heye. Ger bi hev re rêvebirin çêbibe, civakeke demokratîk ava dibe. Ger çênebe, civaka demokratîk jî ava nabe. Ji bo vê Rêber Apo dibêje, "divê em li ser vî esasî sererast bikin û civaka demokratîk ava bikin." Bi vî awayî civak li ser esasê sê merheleyan şîrove kirin rastir e. Ew rêgezeke girîng e. Ger em baş li ser bisekinin, li cîhanê guhertinên girîng dê çêbibin.

Mijareke din ku Rêber Apo li ser disekine; Marks dibêje, pêşketina civakê li ser esasê xeteke rast,  her pêş ve diçe. Hinek kes ew gotina, "dîrok ji tekerûran-dubareyan pêk tê" bawer dikin. Hinek dibêjin, "dîrok di nava xelekekê de her xwe dûbare dike." Marks jî dibêje, "na, her pêş ve diçe." Serokatî jî dibêje, "ne bi wî rengî ye; ne xwe dûbare dike, ne jî her pêş ve diçe. Weke siprîng e, helezonîk e. Rast e, zeman her pêş ve diçe; lê dîrok carna pêş ve diçe, carna paşve diçe." Dibêje, "pêşketin û paşketina wê girêdayî têkoşînê ye. Hêzên ku têkoşîn dikin, paşketin û pêşketina wê diyar dikin." Ger hêzên bi ser dikevin pêşverû bin, pêş ve dibin; ger hêzên bi ser dikevin paşverû bin, paşve dikşînin.

Ji bo vê Serokatî di vê derê de Marks rexne dike û dibêje, “ew rêgeza ku dibêje, ‘dîrok her pêş ve diçe’ mirovan bê têkoşîn dike.” Ger em bibêjin, em kar bikin û têkoşîn bidin meşandin jî, dîrok pêş ve diçe; ger em têkoşîn nekin jî dîrok pêş ve diçe. Wisa be em çima têkoşîn dikin? Em bi rewşeke wisa ve rû bi rû dimînin. Yek jî dibêjin, yên ku nû tên hemû pêşketî ne û pêşverû ne.

Mesela di 2011’an de xwestin Suriye biguherînin. Hinekan digotin, tenê bila Esad biçe, kî tê bila were. Lê niha poşman dibin. Ne bi wî rengî ye. Dibe ku yê bê, ji Esad xiraptir be. Ew mantiq li ser wan tesîr dike. Ew girîng e, divê em li ser kûr bibin.

Mijareke din, Marks dibêje, “civaka nû tê, ji ya berê pêşketîtir e.” Mesela dibêjin, “civaka koledar, ji civaka xwezayî pêşketîtir e; civaka feodal jî, ji civaka koledar pêşketîtir e.” Ew şaş e. Dibe ku hinek tiştên wî pêşketîtir hebin, lê gelek tiştên wê jî paşvetir in.

Yek jî Serokatî got, “tiştê ku nû tê, ne şert e ku ya kevn bi giştî red bike.” Mesela em dibêjin, hê taybetmendiyên civaka xwezayî li ser me hene, taybetmendiyên sosyalîzmê li ser me hene. Ger pergalek bibe deshilatdar, naye wê mahneyê ku hemû feraset û nêzikbûnên din hemû tune dibin. Ew jî Serokatî weke rêgezeke girt dest. Gelek tiştên berê, hê jî di nava me de jiyan dikin. Serokatî dibêje, “zarokek jî di zikê dayika xwe de, taybetmendiyên kevn digre.”

Li ser van tiştan, Rêber Apo hinek rêgezên din pêş xistin. Rêber Apo got, “dîrok zindî ye.” Dîrok diyardeyeke zindî ye, ne miriye. Zindîbûn jî ne di mahneya jiyankirina mirov de,wate bi tevger e û tê guhertin. Mirov nikare şîroveyekê bike û bibêje, “mûtlaq bi vî rengî ye.” Dema mejiyê mirov bi pêş dikeve, zanebûn xurt dibe, xwendinên nû derdikevin holê. Mirov careke din nirxandin dike û netîceyên nû derdixe. Zindîbûna dîrokê ew e, tesîrên cuda li ser civakê dike.

Dema ku Rêber Apo li ser dîrokê disekine, dibêje, “pêwîst e em dîrokê ji deshilatdariyê rizgar bikin.” Kesîkî/ê cuda bi vî rengî negotiye. Divê ji zîhniyeta deshilatdarî, zilamtî, çîniyatî, şaristanî, olperestî, netewe dewletê bê rizgarkirin. Dema ku em çîrokekê bixwînin, divê em baş dahûrandin bikin. Bi rastî jî ew çîrok bi zîhniyeta zilam hatiye nivîsandin, bi zîhniyeta olekî hatiye nivîsandin, bi zîhniyeta şaristaniyê hatiye nivîsandin, an bi zîhniyeta nîjadperest hatiye nivîsandin? Ne ku hemû tiştên wê şaş in, lê divê bi kîjan zîhniyetê hatiye nivîsandin, em bizanibin. Ji bo ku em bikaribin baş tehlîl bikin, divê em vê bizanibin. An na em nikarin xwe, ji wan zîhniyetan rizgar bikin, dema ku me dîrok xwend jî, dê em ê bikevin şaştiyan. Ji bo vê divê em bi giştî rêbaz

û nêzikbûnên behskirina dîrokê dîqat bikin. Ger em Kurd bin, dema ku em behsa dîrokê dikin, divê em miletên din red nekin. Ger yekî misilman behs dike, divê Olên din red neke; ger bajarî be, divê gundiyan red neke.

Van rêgezên esasî yên Serokatî ne, di paraznameyan de jî pir berfirehî tên vekirin. Divê heval van rêgezan bigirin, kûr bikin û di nêrîna dîrokê de ji xwe re bikin bingeh. Ger mirov rast li ser bisekine, mirov dikare weke felsefe û îlma Serokatî bi cîhanê jî bide qebûlkirin.

Em dixwazin li ser esasê vê nerînê; ew nêrîna dîrokê, dîroka Kurdistanê bigirin dest.



## ERDNIGARÎ Û DEMOGRAFYAYA KURDISTANÊ

### *-Erdnigariya Kurdistanê*

Em ê niha derbasî mijara erdnigariyê bibin. Em ê behsa erdnigariya Kurdistanê bikin. Di serî de em dixwazin li ser stratejiya erdnigariya Kurdistanê vegotinên xwe bikin. Hevalan nexşeya cîhanê mezî kirine. Heya beriya sed salî nexşeya cîhanê ne bi vî rengî bû. Heya beriya 400-500 salî jî li gorî zanist û feylezofên cîhanê, cîhan rast-dûz bû. Pişt re fêm kirin ku gilover e. Heya serdema kapîtalîzmê jî, hinek nexşere dihatin çêkirin; aliyek weke Bakûr, aliyek jî weke Başûr nîşan didan. Di serdema sermeyadariyê de, bi serweriya Brîtanya û Fransa, tam dijber bû. Ji aliyê Bakûr re gotin, Başûr; ji aliyê Başûr re jî gotin, Bakûr. Li gorî cihê ku tu temaşe dikê, mirov dikare cîhanê li gorî xwe jî binirxîne. Lê sermeyadariyê şêwazeke mezîkirinê diyar kiriye û her kes li gorî wê mezî dike.

Jixwe ew nexşereyên nûjen hatine çêkirin jî, bi destê kapîtalîstan hatine çêkirin. Ji bo wê xwe li jor nîşan didin. Mesela Brîtanya, Amerîqa, Ewropa û Rûsya bikevin aliyê Başûr, an jî bikevin aliyê jêr nabe. Divê ew her li jor bin. Hêzên Rojavayî, di nêzikbûna dîrok û erdnîgariyê de jî fereseta oryantalîzmê bi cih kirine. Niha em dixwazin xwe ji wan rizgar bikin, lê em bi çavên wan cîhanê temaşe dikin.

Ya duyem, xeteke ku cîhanê parçe dike heye. Weke “ekvator” bi nav dikin. Her tim tav li ser wê xetê stune (amûd)e, dîk lê dixe. Kapîtalîstan nikarî cihê wê xetê biguherîne, ger bikaribûya dibe ku ew jî bibirana Parîsê an jî londonê . Ger her dem tavê bi awayekî dîk li Parîsê bida, dê teqez ekvator ji wir re derbas bikirana. Lê kûreya cîhanê li gorî xwe araste kirine. Berê di dema Abasiyan de digotin, “navenda cîhanê Meke ye.” Seata cîhanê li gorî Mekê hatibû arastekirin. Niha jî hinek extiyar hene, ji vê israr dikin.

Di dema zarokiya me de em diçûn mizgeftê, hinek extiyar hebûn; me digot, “seat donzdeh e.” Wan digot, “na şeş e.” Digotin, “li gorî seata Îslamî seat şeş e.” Pişt re me fêm dikir ku seata kevn e. Seata kevn jî li gorî Meke bû. Lewra wê demê, Meke navenda cîhanê bû. Lê dema ku kapîtalîzm li ser ket, ew navend anîn Londonê. Dibêjin, “ew xeta ji Londonê re derbes dibe.” Em jî dikarin bibêjin, “ji Kurdistanê re derbas dibe.” Li gorî çi tê diyar kirin? Hevalan şaristanî xwendine, divê van tiştan bikin bin lêpirsînê. Lewra ew tiştên ku ji aliyê şaristaniyê ve hatine çêkirin in, ne xwezayî ne. Li gorî xwe pergaleke cîhanê diyar kirine û divê her kes jî li gorî wê biçe.

Ez carna vê mînakê didim; careke yek diçe gundê Xoca Nasredîn û ji gundiyan dipirse. Dibêje, “navenda cîhanê li ku ye?” Kes nikare bersiva wî bide. Dema ku Xoca Nasredîn diçe, hemû gundî dibêjin, “vaye Xoca hat, bila ew bersiv bide.” Ji Xoca dipirsin û Xoca jî dibêje, “navenda cîhanê ecnayê kerê min e.” Zilam dibêje, “çawa dibe?” Xoca jî dibêje, “tu bawer nekê here û bipîve.” Zilam dibêje, “çawa tê pîvandin?” Xoca dibêje, “nizanim, tu bawer dikê bike, bawer nakê jî biçe û bipîve.”

Niha meseleya navenda cîhanê jî bi vî rengî ye. Niha navend kirine Girînîc, lê em bibêjin Amed e, em bibêjin Pekîn e. Kî dikare bibêje nabe; li gorî çi dibe, an nabe? Ji ber ku di sedsalên 18-19-20’an de, Brîtanya hûkmî cîhanê dikir, xwe kir navend. Li ser vê esasê seat jî çêkirin, em niha neçarin ku li gorî seatên wan biçin.

Berê jî nexşe hebû, lê niha renge wê hatiye guhertin. Niha li gorî ew nexşeya nû, Kurdistan dikeve kîjan alî. Beriya 400-500 salî li ser nexşeya siyasî pir zêde rista Amerîqayê tune bû. Li gorî dîrokê, beriya 3 hezar sal, li vê derê jiyaneke xwezayî tê jiyankirin. Lê heya PZ 1500’î pir risteke vê erdnigariyê tune. Di nexşeyên kevn de tenê sê qita hene; Asya, Ewropa, Efrîqa. Li gorî nexşereyên cîhane yên kevn, Kurdistan navendek e. Cihekî jeostratejîk e. Mesela tu biçe bajarekî li taxeke dûr parçeyek zevî bistînê dê bihayê wê erzan be, lê ger heman tiştî navenda bajêr bistînê dê bihatir bibe. Lewra her kes dixwaze navendê bigre. Ji ber ku Kurdistan jî, di cihana kevn de cihekî navendî ye, her tim çavê derdorê li ser wê hebûye.

Li gorî cihana nû jî, girîngiya erdnigariya Kurdistanê heye. Hem sê qitayan digîne hev, hem jî gelek çavkaniyên wê yên bin erd û ser erd hene. Erdnigariya Kurdistanê dewlemend e. Ew jî tesîreke cuda dike. Ew jî dibe sedem ku gelek kes çavên xwe berdin Kurdistanê. Bes Kurdistan, di nexşeyên siyasî yên kapîtalîstan de tune. Lewra pergala ku di sedsala 20’emîn de hatiye ava kirin, Kurd û Kurdistan înkar kir. Vaye xerîteya siyasî ya cîhanê, Kurdistan tê de tune. Dibe ku li gorî pergala cîhanê Kurdistan tune be; lê li gorî rastiyê û li gorî dilê me Kurdistan heye. Em niha dixwazin li ser vê erdnigariyê hinekî vegotin bikin.

Erdnigarî li gorî meridyen û parelelan di nexşereya siyasî de tê diyar kirin. Li cîhanê bi giştî 360 merîdyen û 180 paralel hene. Tevahî cîhanê Pozisyona Kurdistanê, li gorî nexşeya siyasî ya cîhanê herî jêr 30 xetên panî (paralel) dûrî ekvator e. Kurdistan, li xeta 30’emîn ya Bakûrê ekvator dest pê dike. Texrîben li navçeyên Bûyerehmed, Gokiliya destpê dike. Ew cih jî li Rojhilatê Kurdistanê ne. Lewra noxtaya

herî jêr ya Kurdistanê, dikeve Rojhilatê Kurdistan e. Li wî bajarî Lor hene. Aw bajarê Kurdistanê ku cihê herî nêzik yê ekvator e. 30 xet dûrî ekvator e. Heya milê Erdexanê diçe; ew der jî li Bakûrê Kurdistanê ye, heya sînorê Gûrcîstan û Ermenîstanê diçe. Erdexan jî cihê herî dûr yê Kurdistanê ku dûrî ekvator e. Ew jî 41 xetan dûrî ekvator e. Wisa be ji aliyê xetên panî (paralel) ve; Kurdistan di navbera xetên 30 û 41'an de ye. Ango li Kurdistanê 11 xetên panî (parelel) hene.

Ji aliyê xetên dirêjî (merîdyen) ve; me gotibû, xeta ewil ji Girînîc didin destpê kirin. Kurdistan, dikeve rojhilatê Girînîj. Li Kurdistanê bajarê ku herî nêzikî Girînîj, Meraş (Gurgum) e. 36 xetan dûrî Girînîj e. Li Kurdistanê bajarê ku herî dûrî Girînîc jî, li herêma Lorsitan e, ew jî heya xeta 51-52'yan diçe. Ger hemû bê hesapkirin wisa ye. Wisa be li Kurdistanê, 15 xetên dirêjî (meridyen) hene.

Ew xetên paralel û meridyen, ji bo çi pêwîst dikin? Xetên paralel ji bo diyarkirina seqa (îklîm) e. Meridyen jî ji bo diyarkirina seatê ne.

Niha Kurdistan li Rojhilata Navîn cih digre. Ew jî peyveke oryantalist e. Hindek tevgerên Îslamiyan hene, qet pêyva Rojhilata Navîn nadin karanîn. Dibêjin, "ew ji bo me heqeret e." Lewra kapîtalîstan xwe kiriya navend û li gorî xwe jî her der bi nav kirine. Nizanim gotine, ew der Rojhilat e, ew der Rojhilata Nêzik e, ew der Rojhilata Dûr e. Cîhan hemû li gorî Brîtanya hatiye navkirin. Ez bi xwe jî naxwazim vê peyvê bi kar bînim, lê navekî cudatir ku niha tê karanîn tune. Berê ji van deran re gotine, "Rojavayê Asya, Hîlala Zerîn û hwd." Lê niha kes van navan nizane. Dê em ê hemû peyvên oryantalîstî jî biguherînin.

Niha seata me jî li gorî Girînîc hatiye arastekirin. Ger li wir seat 12:30'î be, li vê derê seat 3:30'î ye. Texrîben sê seat di navberê de hene. Niha em li gorî seata Kurdistanê naçin. Li Bakûr, em li gorî seata Tirkiye diçin. Heval di televizyonê de dibêjin, li gorî seata Amedê, lê ne li gorî seata Amedê ye, ya Enqere yê. Li Başûr dibêjin, li gorî seata Hewlêr e, lê ne wisa ye, ew jî li gorî seata Bexda ye. Li Rojhilat jî li gorî seata Tehrenê diçin. Li Rojavayê Kurdistanê li gorî seata Şamê diçin. Ger em bixwazin seata xwe diyar bikin, em ê li gorî xeta 36 û xeta 51'an diyar bikin. Di navbera her xetekê de 4 deqîqe hene, wisa be ji rojavayê Kurdistanê heya rojhilatê Kurdistanê seatek ferq heye. Divê mirov li gorî erdnigariyê hesap bike.

Ger em niha li gorî erdnigariya xwe bi awayekî rast, seata xwe çêkin, di navbera me û Girînîc de 3 seat hene. Ger em bixwazin seata xwe sererast bikin, divê em di demên pêş de seata xwe biguherînin. Divê em li gorî erdnigariya Kurdistanê çêbikin, ne li gorî van dewletan.

Ez hêvî dikim ku di demên pêş de em seata Kurdî çêkin û bidin şixûlandin.

Ji aliyê xetên parelel û îklîm ve mirov dikare van tiştan bibêje. Li herêma ekvator, cîhan demsalekê jiyan dike. Li wir, havîn û peyiz û zivistan û bihar tune. Dem demî baran dibare, nem çêdibe; lê her wek xwe ye. Li ser ekvator, dema şev û roj her 12 seat in. Ango şev û roj nêzikî hev in. Yek yekê dirêjtir û kurtir nabe. Li herêma ekvator, bi piranî şînahî ye. Lewra li wê derê her baran û nem û germahî heye. Lêkolîner dibêjin, ji ber ku ew şert û mercên jiyanê li wê derê hene, ew cih bûye bingeha hûcreya yekem. Lê ji ber ku derfetên berdewamkirina jiyanê tûnebûne, tenê weke bingeha hûcreya yekem maye.

Kurdistan jî, li cîhanê dikeve "herêma çardemsalî." Ew herêm ji xeta 23'emîn dest pê dike, heya xeta 67'an. Her wiha ji başûrê ekvator jî di heman navberê de ye. Ew herêm çar fesilan jiyan dikin. Ji ber ku Kurdistan jî di navbera xetên 30-41'an de ye, dikeve ew herêma çardemsal-çarfesil. Mesela ji ber ku Erebîstana Sûîdî ji aliyekî ve dikeve xeta 23'yan, ew cih pir germ e. Lê Kurdistan, texrîben tam di navenda ew herêma çardemsal de ye. Rûxmî ku Kurdistan tam dikeve aliyê navenda vê herêmê jî, ji aliyê başûr ve li hinek bajaran hê jî germ e.

Tu çiqasa ji ekvator dûr bikevê, ew qesa germahî kêm dibe. Her wiha nêzikbûn û dûrbûna behre jî tesîr dike. Ji ber ku Kurdistan jî nêzikî behre yê, tesîr li ser demsalên Kurdistanê dike. Mesela herêmên Ege û Deryaya Spî zêdatir nêzikî behre ne, ji ber vê di herêma çardemsalî de ne, lê tam çardemsalî jiyan nakin. Lewra hawayê deryayê tesîr dike. Her wiha bilindî û nizmbûna erdnigariyê tesîr dike. Her ku mirov 200 metre ji deryayê bilind bibe, dereceyek germahî kêm dibe.

Li Kurdistanê hin cih hene 200 metre ji behre bilind e, hinek cih jî hene, ji 5 hezar metreyi zêdetir bilind e. Kurdistan demsaleke bi vî rengî jiyan dike. Havînê germ e, zivistanê jî sar dibe. Li Kurdistanê germahî berê heya 40 dereceyî diçû, lê niha heya 50 dereceyî jî diçe. Cihên weke Kobanê, herêma Cîzirê, Mûsil û Hewlêrê carna germahî heya 50 dereceyî derdikeve. Lê bi awayekî fermî nabêjin bûye 50 derece. Lewra li gorî qanûnên navnetwî, ger cihekî germahî bi ser 50 dereceyî bikeve, divê li wê derê kar bisekine. Lewra sermayeder dixwaze karmendên wî/ê kar bikin. Xelk ji germahiyê dimre, lê nabêjin 50 derece ye. Li Kurdistanê van herêmên ku havînê pir germ dibin, zivistanê jî pir sar nabin, herî zêde heya dereceya sifirê tên. Lê herêmên ji aliyê bakûr ve, li Kurdistanê pir sar e.

Niha li Kurdistanê carna sar dibe, lê carna jî germ dibe. Em ji herdû demsalan jî eciz dibin. Em, an dibêjin sar e, an jî dibêjin germ e. Lê ew çardemsalî dihêle ku Kurdistan reng bi rengî be. Mesela navberekê digotin, "li cîhanê 31 hezar cure nebat hene, ji van nebatan 16 hezarî wan li Kurdistanê heye." Ew kêm nîne. Mesela gelek cihan, rengên pir zêde tune. Li herêma ekvator, şînahî pir e, lê reng pir kêm in. Cihekî weke Amazon daristanên pir mezin çêdibin, bes reng kêm in. Ew demsal şansekî cûda dide Kurdistanê.

Ji ber vê mirov dikare her cure çandiniyê bike. Yên herî taybet jî genim û ce ne. Bala we kişandibe, pêşketina mirovahiyê de di; qonaxa herî girîng de genim û ce rista xwe dilîze. Genim û ce welatên weke Kurdistanê çêdibin. Welatên weke Tanzanya çênabin, lewra wê derê her şilî ye; lê genim pêwîstiya wê hem bi şiliyê heye, hem jî pêwîstiya wê bi hişkiyê heye. Divê hem baran, hem jî tav hebe. Bala we jî kişandibe, li Kurdistanê jî hin herêmên weke Serhadê nikarin genim biçînin, lewra qesî ku bes bike tav tune. Tovê genim diavêjin, lê ji ber ku berf û baran zû dibare, nikarin biçînin.

Her wiha ji ber ku demsaleke ew qesa xweş li Kurdistanê heye, ew qesa fekiyên xwezayî hene. Serokatî dibêje, "mirovahî deyndarê hîlala zerîn e." Lewra demsal û derfetên hawayê vir, bingeha jiyanê li van deran afirandiye. Ew girîng e.

Em li ser pozisyona Kurdistanê hinek sekinîn. Erdnigariya Kurdistanê berz û nizm e. Em digêhêjin behran jî, lê li gorî dewlet û desthelatên ser kurdistan ne wisa ye. Erdnigariya Kurdistanê zêdetir çiya ne. Ew erdnigarî, berê weke "Hîlala Zerîn" hatiye bi nav kirin. Dema ku tu ji hawayê ve, ji Zagros û Toros'an mezî bikî, weke hîlal tê xûyakirin. Ji ber ku li van deran derfetên jiyanê jî pir zêde bûne; ji vê derê re gotine, "Hîlala Zerîn-Hîlala Biberhem." Beşeke zêde ya vê hîlalê dikeve nava erdnigariya Kurdistanê. Bi Kurdî weke "Kewana Zerîn" jî tê bi nav kirin. Erdnigariya Kurdistanê ji sê paran du par, çiya ne. Gelek navên van çiyan hene, lê sê xelekên çiyayên (sira dağ-silsile) mezin li Kurdistanê hene. Xeleka herî mezin Zagros e; ji Loristan, Bûyerehmed wan destpê dike, heya Çarçela û Cîlo tê. Hevalên me tenê ji bo Çarçela û Cîlo dibêjin Zagros, lê ew xelek hemû Zagros in. Piraniya wê jî dikeve aliyê Rojhilatê Kurdistanê. Ji milê din ve Toros jî, ji aliyê Gurgumê (Maraş) ve dest pê dike, heya Dersîmê diçe. Çiyayê din jî, xeleka çiyayê Agirî ye; ew jî heya Erzurum û wan derdoran diçe. Ermenî dibêjin, "Ararat." Agirî jî heya milê Ermenîstanê diçe.

Deşt li Kurdistanê pir in. Serokatî digot, “ger deşta Mêrdîn, Amed û Haranê di destê mirovên baqil de be, têra 250 milyon mirov dike. Ew qesa berhem tê de heye. Lê niha em birçî ne.” Heqîqet jî wisa ye. Deştên Kurdistanê pir in, gelek deştên biçûk jî hene. Mesela deştên milê herêma Cizîrê û Kobanê, têra hemû Suriye dikin. Li Başûrê Kurdistanê; deşta Mûsilê, deşta Hewlêrê, deşta Germiyan heye. Hemû jî deştên mezin in. Li Rojhilat jî hemû wisaye. Ger mirov ji van deştan baş xwedî derkeve, avî bike; têra 500 milyon mirov dike. Lê ji ber ku niha di destê dagirkeran de ne, pêwîstî pê nabînin. Li gorî berjewendiyên xwe kar tînin. Bi rastî ger bikeve ber destê kesên ku xizmet bike, mirov dikare li Kurdistanê bi her rengî zîratê bike.

Ji xwe li çiyayên Kurdistanê jî berhemên xwezayî pir in. Ew berhem têra Kurdistanê jî dikin û têra derve jî dikin. Lê ji ber ku niha em ne xwediyê Kurdistanê ne, em ji bo firengiyeke diçin û derve tînin.

Avên girîng jî li Kurdistanê jî hene. Kurdistan ji aliyê ava şîrîn ve; li cîhanê, bi taybetî jî li Rojhilata Navîn cihê herî dewlemend e. Niha li Iraq, Îran û welatên Ereb gelek cihan ava vexwarinê tune. Divê avê bikelînin û vexwin. Lê welatê me, di bin her kevirekî de av derdikeve. Ew welat, diçin û avê dikelinin û dikin şîşeyan, wisa vedixwin. Em jî carna wisa dikin, lê pêwîstiyeke me wisa tune. Piraniya ava Kurdistanê ava şêrîn e, ava vexwarinê ye.

Di sedsala 20’emîn de, ji sala 1960’î ku li Kurdistanê petrol hatiye dîtin û vin ve şerê ku li Kurdistanê dimeşe, beşek li ser petrol e. Lê niha nîqaşeke wisa heye. Dibêjin, “di sedsala 21’emîn de şerê li ser Kurdistanê, bibe şerê avê.” Bala we jî kişandibe, ew 10 salin Tirkiye dest pê kiriye, hemû ava Kurdistanê kom dike. Li hemberî Iraq û Suriye dide karanîn. Ew çend salin, Îran jî avê kom dike. Lewra ger ava Kurdistanê tune be, dê Iraq ji tîna re bixeniqe. Suriye jî wisa ye. Ava şîrîn li Kurdistanê pir e, têra me jî dike û têra xelkên din jî dike. Dilê Kurdan jî bi rehme, dikare bide xelkên din jî, lê divê li ser ava me, me nekûjin. Divê em baldar bin; em sed salî li ser petrole xwe hatin kûştin, sedsalî jî divê em li ser ava xwe nayen kûştin.

Çem û kanî pir in. Hin rûbar (çemen mezin-ferat) jî hene. rûbarê herî mezin, Firat e; ji Torosan dize, ji Bakûrê Kurdistan re diçe Rojavayê Kurdistanê û wir re derbasî Iraqê dibe û heya Baisra diçe. Li gel rûbarê Dîjle, dikeve kendava Baisra. Rûbarê herî dirêj yê Kurdistanê, Firat e. Texrîben 2162 km e. Rûbarê Dîjle jî, bakûrê Amedê derdikeve. Ji Botanê re derbasî Başûrê Kurdistanê dibe, ji Mûsilê re heya Bexdayê diçe. Di dawiyê de bi Firatê ve dibe yek û dikeve kendava

Baisrayê. Dirêjiya wê jî 1632 km e. Firat texrîben 500 km ji Dîjle dirêjtir e. Lê ava Dîjlê, ji ya Firat zêdetir e. Lewra pel û çemen li ser Dîjle pir in. Yên Firat kêmtir in. Cihê ku Dîjle tê, zêdetir hewraz û bilind e. Lez tevdigere. Cihên Firat nizm in û gelek ava Firatê diçe bin erde. Rûbarê din Aras e. Ew jî diçe milê Ermenîstan, lê beşeke wî jî ji Kurdistanê re derbas dibe. Rûbarê din Karûn e; ew jî li milê Rojhilatê Kurdistanê ye. Ji çiyayên Zagros derdikeve, beşek ji Kurdistanê re derbas dibe, beşek jî diçe milê Erebîstanê. Wir re derbasî behre dibe. Ew çar avên mezin in. Hinekên wan li Kurdistanê derdikevin, hinekên wan jî ji Kurdistanê re derbas dibin. Xeynî vê çemen biçûk zêde ne.

Weke av, gol hene, bi kurmanciya jêrîn dibêjin deryaçe. Lê dibe ku peyva golê bi xwe jî Kurdî be. Li Kurdistanê gelek golên biçûk hene, lê du golên me yên mezin hene. Yek Gola Ûrmiyê ye; ji rûber 6 hezar km qare ye. Ji bûşûrê Salmas dest pê dike, heya digêhêje Ûrmiyê. Ava wê şor e. Kûrahiya wê kêm e. Hin cihan 15 metre ye, hin cihan jî 6 metre ye. Ji ber ku kûrahiya wê kêm e, bi germbûna hawa re gol hişk dibe. Hinek rûbarê wê jî kêm dibe. Niha ew jî li Rojhilatê Kurdistanê bûye pirsgirekek.

Gola dîtir jî, Gola Wanê ye. Ew jî 3600 km çargoşe ye. Weke ya Ûrmiyê ne dirêj e, gilover e. Ava wê jî şor e, lê qesî ya Ûrmiyê ne şor e. Kûraniya wê zêdetir e, texrîben kûraniya wê ji 100 metroyî zêdetir e. Ji ber vê ava Gola Wanê jî, ji Gola Ûrmiyê zêdetir e. Goleke din jî heye; ava wê kêm e, lê ava wê şîrîn e. Li cîhanê golên ku ava wan şîrîn pir kêm in. Pê re dibêjin, “Gola Zirêbar.” Rûberê wê 77 km çargoşeye, kûraniya wê di navbera 10-15 metro de ye. Ji ber ku gelek kanî diçin nav, ava wê şîrîn e. Li Rojhilatê Kurdistanê ye, herêma Erdelan e. Ew mînakên berbiçav in.

Li Kurdistanê hinek kanza (maden) jî hene. Yek petrol e. Texrîben li Başûrê Kurdistanê (Mûsil û Kerkûk jî di nav de), nêzikî 110 milyar metre kûbik heye. Ew ya ku hatiye dîtin e, hê jî lê digerin. Li Gare û Qendîlê jî petrol hatiye dîtin. Li Rojavayê Kurdistanê, texrîben nêzikî milyareke metre kûbik petrole heye. Zêdetir jî heye. Jixwe dewleta Suriye, nehêliştiye ku hemû bê dîtin. Li Bakûr jî tam naye zanîn, lewra dewleta Tirkiye vedişêre, lê qesî ku tê zanîn nêzikî milyarek metre kûbik heye. Li Rojhilatê Kurdistanê jî, li milê Kirmenşan û Qasr-i Şîrîn heye. Lê ji ber ku Îran eşkere nake, em nizanin çiqas e. Bi giştî li Kurdistanê qesî ku hatiye eşkere kirin, ji 130 milyar metre kûbik heye. Ger li Kurdistanê 50 milyon mirov jiyan bike, rojane milyonek kûbik têra pêwîstiyên wan dike. Ger Kurdistan, rojê du milyon varîlan derbixe;

200 sal têra Kurdistanê dike. Ger çar milyon varîlan derbixe, têra 100 salî din jî dike. Dikare milyonek varil kar bîne û yên din jî bide şûxilandin. Petrol heya îro madeyeke esasî ye ku ji bo wê Kurdistan tê pelçiqandin e.

Madeyeke dîtir, van demên dawî li çiyayên Kurdistanê Ûranyûm hatiye dîtin. Ûranyûm niha madeya herî biha ye. Ji bo karên nûklerî tê şixûlandin. Berê komir hebû, niha kêmtir tê şixûlandin. Li gelek cihên Kurdistanê hesin heye. Hê gelek madenên din hene.

Ji bo erdnigariya sûriştî ya Kurdistanê ez dikarim van tiştan bibêjim. Heval dikarin li ser van mijaran lêkolîn jî bikin.

Li ser erdnigariya îdarî ya Kurdistanê ez dixwazim hin tiştan bibêjim. Kurdistan bûye çar beş, dabeşî çar dewletan (Tirkiye, Suriye, Iraq, Îran) hatiye kirin. Her parçeyekî Kurdistanê li gorî îdareya wê dewletê hatiye tanzîm kirin. Em ji Bakûr dest pê bikin. Di hûndirê Tirkiye de dimîne. Tirkiye, 781 km çargoşe ye. Tirkiye ji aliyê îdarî ve 81 bajaran pêk tê. Pergala îdarî ya Tirkiye, em rexne dikin, lê li gorî dewletên din baştir e. Hem ji milê bajarvanî, hem jî ji milê îdarî ve.

25 bajarên Tirkiye, yên Kurdistanê ne. Rûberî wê 250 km çargoşeye ye. Hinek kes dibêjin, 270 hezar km ye, lê hin bajarên weke Kîlîs, Sêwaz û Gurgumê ku hemû cihên wê ne Kurdistan in jî hesap dikin. Her wiha hin cihên weke Erzerom û Erzîngan, hinek cihên wê nakevin nava Kurdistanê. Jixwe dewlet wan qet weke Kurdistan nabîne. Em van 25 bajaran bijmêrin; Dîlok (Antep), Gurgum (Maraş), Semsur (Adiyaman), Meletî (Malatya), Qoçgirî (Sivas), Erzîngan (Erzîncan), Erzerom (Erzurum), Erdexan (Erdahan), Agirî (Ağri), Qers (Kars), Mûş (Muş), Çewlîk (Bingöl), Dersîm (Tunceli), Xerpet (Elazih), Amed (Diyarbakir), Sêrt (Sîrt), Elih (Batman), Îdir (Iğdir) Bêdlîs (Bitlis), Wan (Van), Colemerg (Hakari), Şirnex (Şirnah), Mêrdîn (Mardin), Riha (Urfa), Kîlîs (Kilis). Navçe pir in, texrîben nêzikî 150 navçe (şaroçke) hene. Hinek bajaran 3 navçe hene, hinekan 10 navçe hene.

Li tevahî Tirkiye 76 milyon mirov hene. Di serjimêriyê de nasname hemû weke Tirk tên diyar kirin. Ji ber wê li gorî serjimariyan mirov nizane çiqasa Kurd hene. Lê dema ku Kurdistan nû tê parçekirin, di hin belgeyan de îtîraf dikin ku sê beşan beşeke Tirkiye, Kurd in. Ger em her li gorî wê biçin, nêzikî 25 milyonan Kurd li Bakûr hene. Jixwe Kurd zêdetir zarokan jî çêdikin, lê dibêjin gelek Kurd mirî ne jî. Dibêjin “Kurd paşve maye, hatiye pelçiqandin, hatiye kuştin û kêm maye.” Lê texrîben niha li Tirkiye 25 milyon Kurd hene. Ger çend milyonek hatibe bişavtin jî 20 milyon hene.

Ez ji we re behsa çîrokeke bikim. Ya rast ne çîrok e, heqîqetek e. Lê ji ber ku weke çîrok hatiye nivîsandin, wisa dibêjim. Nivîskarek heye, xelqê Qeladizê ye. Navê wî Refîq Pişderî ye. Ez nizanim niha jiyan dike, an na. Heya beriya 15 salan jiyan dikir. Pirtûkeke wî bi navê "Kurd Dijminê Xwe Nas Bikin" heye. Di pirtûkê de behsa civak û dîrokê dike. Hinekî xwe Kurdperwer dibîne û bi mantiqa xwe behs dike. Rexne li ser wî jî hene, lê ew mijareke cuda ye. Dibêje, "di sala 1956'an de mala me çû Bexdayê. Em li wir taxek bûn û nêzikî 100 malî bûn. Ji mala me re digotin, 'mala Kurd.' Piştî 2 salan, dema ku tevgera Abdulkerîm Qasim pêş dikeve û hin mafên Kurdan tên dayin, Kurd hinek serbest bûn. Wê demê 45 mal hatine gel me û gotine 'em jî Kurd in." Hinekan gotiye, "jina min Kurd e." Hinekan digotine, "zilamê min Kurd e." Hinekan jî digotiye, "em herdu jî Kurd in." Dibêje, "me jî gotiye, ew du salin em li vê derê ne, hûn ne Kurd bûn. Ma hûn hemû bi careke re bûn Kurd?" Ew nivîskar dibêje, "ez bawer dikim, ger rewşa Iraqê baş bibe, dê nîviyê Iraqê bibe Kurd." Tirkiye jî wisa ye. Ger rewş baş bibe, dibe ku li wir 40 milyon jî Kurd hebe, lê niha 20 milyon bes e.

Ji bo Rojhilatê Kurdistan; li gorî pergala Îranê hatiye tanzîm kirin. Li gorî pergala ûstan (eyalet) e, ji bajaran firehtir e; Îran bi giştî 31 ûstan e. Pergaleke navendî ye. Îran, 1680'î km çargoşe ye. Texrîben du qatî Tirkiye ye. Bes Tirkiye 81 bajar (il) in, Îran 33 ûstan e. Mesela heval dibêjin, Rojhilat tenê çar ûstan e. Lê ew 4 ûstan, qesî deh bajarên Bakûr e. Li Bakûr, hindek heval tenê navê Mahabadê bîstine. Lê li gorî pergala Îranê, Mahabad ne bajar e, şaristan e. Di dilê hemû Kurdistaniyan de Mahabad cihekî taybet e, lê li gorî pergala Îranê ne bajar e jî.

Li gorî pergala Îranê, li Rojhilatê Kurdistanê ev ûstan hene; yek, Azerbaycana Xerbî ye; navenda wê jî, bajarê Ûrmiyê ye. Makû, Salmas, Xoy, Pîranşar, Serdeşt, Mahabad, Bokan, Nexede, Şino; ew hemû girêdayî Ûstana Azerbaycana Xerbî ne. Qadeke berfireh e. Ji Colemergê heya Îdirê sînorên vê ûstanê hene. Ji aliyê Başûr ve jî heya Sûleymaniyê diçe. Gola Ûrmiyê jî dikeve nava vê ûstanê.

Jêrî wê ûstana Kurdistan heye. Li gorî Îranê, tenê ew ûstan Kurdistan e. Ew jî weke pergaleke îdarî ye, ne siyasî ye. Navenda wê Sîne (Senendec) ye. Şaristanên pê ve girêdayî jî Bane, Merîvan, Saqiz, Dîvantere, Bicar, Kamyaran, Dêgulan, Qurwa ye. Li ser sînoran gelek ji van bajaran tên dîtin.

Jêrî wê ûstana Kirmanşan heye. Demeke navê wê kiribûn Bexteran. Navenda vê ûstanê jî bajarê Kirmanşan e. Kirmanşan bajarekî herî

mezin yê Kurdistanê ye; hejmara wî zêde ye, bajarekî pîşesaziyê ye. Şaristanên bi vê ûstanê ve girêdayî; Ciwanro, Qesr-i Şîrîn, Şahbat, Geylan Xerb, Pawa, Neftşer, Rewanser, Serpêl e. Jêrtir ûstanê Îlam heye. Li gorî ûstanên din, ûstana herî biçûk e. Şaristanên pê ve girêdayî; Delhoran, Mêhran, Şêrwan, Ebdenan, Çardewol e. Ew li sînorên Başûrê Kurdistanê ne.

Dema ku tu hinekî berv bi Îranê ve diçê, ûstanê Loristan heye, ûstanekî Lori ye. Navenda wê Xûremabad e. Jêrtir ûstanê Çarmehalê Bextiyarî heye. Navenda wê Şehirkurd e. Ew jî ûstanekî Lori ye. Ew jî ûstanekî mezin e, şêniyên wê bi piranî Kurdên Lor in. Jêrtir ûstanê Gokilayaw û Bûyerehmed heye. Navenda wê, bajarê Yasûc e. Ew jî sînorê Lorîstan e. Heya sînorê Şîraz diçe.

Ew heft ûstan bi piraniya xwe Kurd in. Lê derveyî vê hin ûstanên din jî bajarên Kurdan hene. Mesela ûstanê Hamadan heye, weke tê zanîn Hamadan peytexta Medan e. Hin bajarên Kurd li wir hene, lê niha navenda Hamadan Kurd tune. Li rojavayê Şîraz û rojavayî Hamadan jî hin şahristanên Kurd hene. Erdnigariya Rojhilatê Kurdistan, ji aliyê îdarî ve bi vî rengî ye.

Min ji bo Tirkiye bîr kiribû; li milê Anatolyayê bajarên weke Konya û Enqere Kurd jiyan dikin, demeke dirêj e, li wê derê jiyan dikin. Li Îranê jî, li mintiqaya Xorasan, çend herêman Kurd hene. Dibêjin, li wê derê jî nêzikî 2 milyon Kurd hene. Ew der dikeve rojhilatê Îranê.

Nûfûsê giştî Îranê, 74 milyon e. Dema parçebûna Kurdistanê de digotin, Ji sedî 20'ê Îranê Kurd in. Li Îranê jî derfet tune ku mirov hesap bike, da ku mirov hejmara Kurdan bizanibe. Jixwe siyeseteke Îranîzmê jî heye. Tê wê mahneyê ku nêzikî 15 milyonî Kurd hene. Ger ji sedî 15'ê Îranê Kurd bin, 12 milyon Kurd hene; lê ger ji sedî 20'ê Îranê Kurd bin, 15 milyon Kurd hene. Niha hinek derdor Loran weke Kurd hesap nakin, hinek Lor jî xwe Kurd nabînin. Ji ber vê hejmara Kurdan kêmtir dikin. Ango herî kêm 10-12 milyon Kurd li Îran hene. Ger derfetên hejmartinê hebin, dibe ku heya 14 milyonî jî biçin.

Li Başûrê Kurdistanê, pergal li gorî Iraqê ye. Iraq bi awayekî fermî, 18 parazgeh e. Vê dawiyê li Başûr Helepçe jî lê zêdekirin, lê Iraqê bi awayekî fermî qebûl nekiriye. Iraq jî weke pergala Îranê ye. Ji zû ve nehatiye guhertin. Rûberê Iraqê, 434 hezar km çargoşe ye. Nûfûsê Iraqê, herî dawî digotin, 34 milyon e. Lê nûfûs tam ne diyar e, ew bîst salin nûfûs nehatiye hesapkirin. Li gorî wêreqeyê xwarinê gotine 34 milyon e.

Pergala îdareya Iraqê 18 parêzgeh e. Çend parazgehên ku an hemû Kurd in, an jî piranî Kurd in hene. Parazgeha herî jor ya Kurd, Dûhok e. Navenda wê jî Dûhok e. 5-6 navçeyên wê hene; Zaxo, Amediye, Akre, Berdereş, Şêxan, Sêmel e. Li Başûrê Kurdistanê parazgeha herî biçûk, Dûhok e. Hem ji aliyê pergala îdarî, hem ji aliyê nûfûs, hem jî ji aliyê erdnigariyê ve biçûk e.

Parazgeha dîtir Hewlêr e. Li Başûrê Kurdistanê, niha bajarê herî mezin Hewlêr e. Navenda Başûrê Kurdistanê ye. Qazayên pê ve girêdayî; Mêrgesor, Diyana (Soran), Rewanduz, Çoman, Şeklawa, Mexmûr, Koysancak, Binesilava ye.

Parazgeha dîtir Sûleymanî ye. Navçeyên wê; Ranya, Qeledizê, Dûkan, Çemçemal, Helepçe, Seîd Sadiq, Şehrezor, Pencewîn, Derbendîxan, Kêlar, Kifrî, Qeredax e. Gelek navçeyên wê hene, ji bo vê dixwazin bikin çend parazgeh, lê hûkimeta Iraqê qebûl nake.

Bajarê dîtir, bajarê Kerkûkê ye. Şer li ser Kerkûk zêde ye. Ji aliyê hûndir ve, li milê Iraqê ye. Berê îdareya Kerkûkê fireh bû. Lê Sadam Hûseyîn, îdareya wê teng kir. Hin navçeyên wê bi Sûleymaniyê ve, hinek jî bi bajarên Ereban ve girê dan. Da ku Kurd li wir kêm bibin. Niha çar navçeyên wê hene. Kerkûk, jixwe navend e. Daqûq heye, Tirk pê re dibêjin Tavûk. Niha hevalên gerîla jî li wir hene. Dûbiz û Hewîc heye. Ew hemû girêdayî Kerkûkê ne. Ew çar bajar, bi piranî Kurd in.

Parazgeha Mûsilê heye; heya salên 1960'î piraniya Mûsilê Kurd bûn. Lê niha piraniya Kurdan jî, Mûsilê weke bajarê Kurdan hesap nake. Jixwe Iraq jî qet hesap nake. Navenda Mûsilê jî beşekê Kurdistanê hesap dikin. Ji aliyê erdnigariyê ve başûr û rojavayê Mûsilê, êdî zêdetir Ereb in. Milê bakûr û rojhilatê wê Kurd in. Navçeyên Kurd ku bi Mûsilê ve girêdayî, Şengal e; Til Efer heye, lê Kurd û Tirkmen in. Piraniya wan Tirkmen in. Şêxan berê girêdayî Mûsilê bû, lê niha kirine ser Dûhokê. Tilkef heye, Qaqûşê heye; ew piranî Kurd in, lê hinekên wan ne di destê Kurdan de ne. Navenda Mûsilê jî çaryekek Kurd e. Hinek jî dibêjin, sê paran parek Kurd e. Ereb zêdetir in, lê xelkên weke Aşûrî û Tirkmen jî tê de hene. Bi giştî parazgeha Mûsilê re, Iraq dibêje Nînova, lê navenda wê Mûsil e. Bi giştî nûfûsê Nînova 3 milyon û nîv e. Navenda Mûsilê, 2 milyon û nîv hejmar heye. Mûsil duyem bajarê mezin yê Iraq e.

Bajarên din ku lê Kurd hene, yek Selahadîn (Tîkrît) e. Navenda wê kêm Kurd hene. Dikeve başûrê Kerkûkê. Bajarokê Xûrmatû heye, piraniya wê Kurd e û girêdayî Tîkrît e. Jêrtir bajarê Diyala heye. Navenda wê Bakûba ye. Ji sedî 20'ê vî bajarî jî Kurd e. Xanaqîn, Mendelî, Sadi-

ye, Celewle jî bajarokên Kurd in û girêdayî Diyala ne. Hinekên wan niha ne di destê Kurdan de ne.

Nûfûsê Başûrê Kurdistanê jî, texrîben di navbera 7-8 milyonan de ye. Li Başûr serhêjmarî hinekî hêsantir e. Berê dema ku serhejmarî dikirin, nasnameya te jî pirs dikirin. Di nasnameyê de jî dihat nivîsandin ku tu Kurdê. Di 87'an de serhijmarî çêbû; wê demê Iraq 16 milyon bû, Kurd jî 4 milyon bûn. Par dema ku gotin Iraq 34 milyon e, gotin Kurd jî bûye 5 milyon. Dema ku mirov ya berê û niha mezî dike, mirov dizane ku ya ku hatiye ragihandin ne rast e. Lê serhejmarî hêsan e.

Suriye jî rûberê wê 185 hezar km ye. Vê dawiyê digotin nûfûsê Suriye bûye 25 milyon. Pergalê wê jî weke ya Iraqê parazgeh e. 14 parazgehên wê hene. Dema ku pergal xirab bû, biryar dan ku parazgehan zêde bikin, dixwestin cihên weke Efrîn û Qamişlo jî bikin parazgeh, lê pêknanîn. Di fermiyetê de Hesekê parazgeh e. Piraniya wê Kurd in. Di navendê de Ereb û Kurd qesî hev in, miletên din jî lê jiyan dikin. Qamişlo, Derîk, Serekaniyê wan deran bi piranî Kurd in. Lê Ereb, Sûryanî û Aşûrî jî li wan deran jiyan dikin. Bajarê Hesekê, navend Heseke ye. Mintiqaya wê Qamişlo, Derîk jî weke navçe tên dest girtin. Ew bajarokên din yên herêma Cîzîrê hemû weke nahiye tên dest girtin.

Parêzgeha Helebê heye. Taxên Şêx Maxsûd û Eşrefiye ku di navenda bajêr de cih digirin bi piranî Kurd in. Efrîn û nahiyeyên wê û Kobanî bi Helebê ve girêdayî ye. Efrîn û Kobanî weke navçe derbas dibin. Yên din nahiye ne. Ezaz jî heye, em niha dixwazin bixin sînorê Kurdistanê, lê hemû ne Kurd in. Bab jî wisa ye. Di navbera Efrîn û Kobanê de ne, lê Kurd li wir kêm in.

Li Raqayê jî gelek Kurd hene, lê niha berya şer hemû reviyan e. Li Şamê jî Kurd jiyan dikin, zû ve koçberî wir bûne. Taxa Ekrad heye. Di dema Selahadîn Eyûbî de, Kurd li wê derê cih bûne.

Nûfûsê Rojavayê Kurdistanê jî, hejmartin zehmet e. Lê 3 milyonan kêmtir nîne. Hinek heval derdixin 4 milyonan jî. Dibe ku nêzikî 4 milyonan be. Ger şoreşa me bi ser bikeve, dibe ku bi ser 5 milyonan jî bikeve.

Rûberê Îranê 1681 hezar km$^2$ ye. Tirkiye 781$^2$ hezar km ye, Iraq 434 hezar km$^2$ ye, Suriye 185 hezar km$^2$ ye. Bakûr texrîben 220-250 hezar km$^2$ ye. Li Rojhilatê Kurdistanê beşeke girîng ya dîroknas û nivîskarana qebûl dikin ku ûstanên Ûrmiyê, Kurdistan, îlam, Kirmanşan, beşek jî Hamedan Kurdistana Rojhilat e. Ger tenê li gorî van ûstanan mirov hesap bike, rûbarê Rojhilatê Kurdistan 114 hezar km$^2$ ye. Herî mezin jî Ûrmiyê ye. Ger wan şahristanên ji Hamadan ve girêdayî

jî bixê ser, dike 120 hezar km$^2$. Ango herî kêm ew qes e. Ger ûstanê Loristan, Çarmehal û Bextiyarî, Gokiliya û Bûyerehmed jî bikevin ser texrîben rûbarê Rojhilatê Kurdistanê 170 hezar km$^2$ derbas dike. Bes pirsgirek hene. beşeke Lor xwe Kurd nabînin. An jî derdorên cuda wan weke Kurd nagrin dest. Lê Kurd, wan Kurd dibînin.

Başûrê Kurdistanê, beşeke wê bi awayekî fermî weke Kurdistan hatiye qebûl kirin. Niha wê derê dibêjin, hûkimeta herêmê. Ew cih jî ji parazgehên Dûhok, Hewlêr û Sûleymaniyê pêk tê. Ew sê parazgeh, ji 41 hezar km$^2$ pêk tên. Ew bi awayekî fermî hatiye qebûlkirin. Lê ya rast, berê sînorên Başûrê Kurdistanê heya nêzikî xeta Îlamê diçû. Ger wan jî hesap bikî, Başûrê Kurdistanê ji nêzîkî 87 hezar km$^2$ çargoşe ye. Lê gelek cihên wê niha Kurdan jî dev jê berdeya. Lê niha bi awayekî rasteqîn, cihên ku Kurd lê jiyan dikin; Şengal, Kerkûk, Mûsil û Xeneqîn bikeve ser, texrîben dibe 87 hezar km$^2$. Yanî nîvê Başûr, bi awayekî fermî nehatiye qebûl kirin.

Ew cihên Başûrê Kurdistanê ku bi awayekî fermî nehatine qebûl kirin re, Serokatî dibêje, “Qada Navîn-Orta Alan.” Hûkimeta navendî ya Iraqê jî dibêje, “herêmên madeya 140’î.” Ango ew herêmên ku pirsgirek li ser hene. Piraniya wê herêmê Kurd e. Di fermiyetê de ne di destê Kurdan de ne. Lê dema ku êrîşên DAİŞ’ê çêbûn, Kerkûk û hin derdorên Mûsilê ketin destê Kurdan. Bi giştî niha nêzikî 70 hezar km çargoşe (kare) li Başûrê Kurdistanê di destê Kurdan de ye.

Milê Rojava; Cizîrê, Kobanê û Efrîn bi giştî di navbera 22-25 hezar km$^2$ çargoşe ye. Niha em piçekî fireh dikin. Niha heval heya Çiyayê Evdilezîz, Eynîsa çûne. Ger ew hemû bikevin ser Kurdistanê dê em ê bigêhêjin 30 hezar km$^2$ jî. Ger Cerablûs, Ezaz û Bab jî bikeve ser, dê Rojavayê Kurdistanê berfirehtir bibe.

Ger em bi giştî komî ser hev û din bikin; hemû rûbarê Kurdistanê herî kêm 450 hezar km çargoşe ye. Berê piraniya dîroknas û kesên ku li ser Kurdistanê lêkolîn dikirin, digotin “Kurdistan, 550 hezar km ye.” Niha me hinek kêm kiriye. Hinek dîroknas jî dibêjin, “400-450 hezar km$^2$ ye.” Em ne dewlet in ku em wisa tam bipîvin, her wiha pîvandina erdnigariyê jî hinekî bi pirsgirek e. Ji ber vê em texrîben diaxifin. Ger Loristan ji ser Kurdistanê ve bê hesapkirin, dê Kurdistan zêdetir mezin bê xûyakirin.

Nêzikbûna me ya erdnigariyê çi ye? Heya niha elimandina civakê heye, civak li ser esasê netewe dewletê nêzikî erdnigariyê dibe. Ew netewe dewleta ku li Ewropa hate pêşxistin, penc esasên wê hebûn; yek, divê erdnigariyeke te hebe. Dudu, divê zimanekî hevgirtî hebe.

Sisê, divê yek dîrok hebe. Çar, divê çandeke hevpar hebe. Penc, divê bazareke netewî hebe. Ji bo ku tu bibê dewleteke xurt, divê ew tiştan bên pîroz kirin.

Bala we kişandibe, di netewe dewletan de erdnigarî jî tên pîrozkirin û li ser wê gelek şer tên kirin. Her dewleta ku çêdibe, dixwaze erdnigariya xwe mezin bike û erdnigariya dewletên din biçûk bike. Dixwaze her tiştî bike nava çanda xwe û çandên din biçûk bixe. Her tiştî de wisa nêzik dibe. Dema ku yek ziman be, yek çand be, yek erdnigarî be, yek bazar be, yek dewlet û yek al be; netewe dewlet dûrûst dibe. Dibêjin ger wisa be dewlet xurt e, wisa nebe dê dewlet lewaz be. Ji ber ku bingeheke mezin ya dewletê jî weke erdnigarî tê dîtin, erdnigariyê pîroz dikin.

Rêber Apo, di paraznameyan de li ser erdnigariyê sekiniye. Dibêje, "em erdnigariyê weke rehendeke netewa demokratîk digirin dest, lê ne weke nêzikbûna netewe dewletê. Erdnigarî ji bo jiyanê pêwîst dike, lê ne pîroz e. ya esas civak e." Mesela qewmên weke Cûiyan mînak didan; erdnigariyeke pir kêm di destê wan de maye, lê jiyan, pergal û vîna xwe diparêzin. Di dîrokê de jî erdnigarî ew qesa mîsoger nehatiye dest girtin. Mirov dikare extiyaran bipirse, kesên ku beriya sed salî jiyan kirine dizanin. Carna pirsgirek çêbûne, tevahi eşîr çûye cihekî din û li gel eşîreke din jiyan kirine. Wisa nêzikbûneke weke bibêjin ku "ew der ya min e" û bi awayekî mîsoger dest bidin ser cihekî tûnebûye. Pergala netewe dewletê ew qesa mîsogerî çêkirine. Di mejiyê me de jî cîhanek çêkirine û dibêjin, "ger ew pîrozî tune be, nabe." Divê em vê zîhniyetê bişkênin.

Ez mînakekê bidim; di sedsala 17'emîn de dema ku hevpeymana Qasr-i Şîrîn çêdibe, di navbera dewleta Osmaniyan û Safewiyan de hevkirin çêdibe. Da ku sînorên xwe  diyar bikin. Em niha vê peymanê rexne dikin, lê wê demê madeyeke vê peymanê li ser mafên civakê ye. Dibêjin, "hinek eşîrên weke Caf, Surçî û Biradost hene; ew eşîr havînê diçin cihên hûnik, zivistanê jî diçin cihên germ. Ji ber vê sînorên hatine diyarkirin, qut dikin. Divê çûn û hatina van eşîran neye astengkirin." Lê dema ku netewe dewlet dûrûst bûn, dev ji eşîra berde, xûçk û bira ji hev û din qut kirin. Mesela di navbera Rojava û Bakûr de, xeta sînor ji navbera gund û malan re derbas kirine. Li milê Başûr û Rojhilat ji her wiha ye. Ew îcata vê sedsalê ye.

Tişte ku ez dixwazim bibêjim, divê em mahne bidin gotina Serokatî ku dibêje, "ew qesa pîrozkirina erdnigariyê dibe sedema kûştina nirxên mirovahiyê." Naye wê mahneyê ku, em ji bo welatê xwe têkoşîn

nekin û em erdnigariya xwe bênirx bikin. Lê bi awayekî çort û mîsoger nêzikbûn, şaştiyan derdixe holê.

Ya din jî erdnigarî û miletekî bi hev ve gire didin. Li cîhanê, kêm erdnigarî hene ku yek milet li ser wê bijî. Ger em bi nêzikbûna netewe dewletê nêzik bibin, divê li ser erdnigariya Kurdistanê yek milet jiyan bike. Tirk di bin navê Tirkiyê de Tirkbûnê pêş dixin. Îran, her çiqasa hinek Îranîzmê jî dike, ya esas Farsîzmê pêş dixe. Iraqê, her çiqasa nasnameya Kurd qebûl kiribe jî, ji bin ve Ereb bûnê pêş dixe. Suriye her wiha. Ew qarekterê netewe dewletê yê. Dibêjin xeynî miletekî, tu kesekî din nikare li ser vê erdnigariyê jiyan bike. Divê em bi vî aqlî tevnegerin.

Di salên 91-92 û 93'yan de Serokatî got, "em hûkûmeta Botan-Behdînan îlan dikin." Wê demê di nava Ermenên dostên me de jî nerehetî çêbû û gotin, "Apo dixwaze, di nava axên me de welatekî çêke." Lewra gelek Ermen, hê jî piraniya Serhadê weke Ermenîstan digirin dest. Lê dostanî wisa nabe. Serokatî wê demê gazî wan kir û got, "bên em pêk ve kar bikin û vê dewletê ava bikin, lê navê dewletê bibe çi ne pirsgirek e. Hûn dixwazin em bikin Ermenîstan." Wê demê paradigmaya me ya nû tûnebû, lê dîsa Serokatî ew qesa mîsoger nedikir. Ji bo ku em pêk ve bijîn, Serokatî amade bû ku navê Kurdistanê jî biguherîne.

Niha em bibêjin, em navê Kurdistanê biguherînin, dibe ku gelek heval aqlê xwe winda bikin. Lê beriya vê 1000 salî navê Kurdistanê tune, navên cuda li vê erdnigariyê dikin. Heya sedsal beriya vê, navê Tirkiye, Iraq û Suriye jî tune bû. Ger em van tiştan baş lêkolîn bikin, pêwîst nake ku em hinek tiştan wisa pîroz û mîsoger bikin. Pêwîstiya jiyan û civakê çi be, divê mirov li gorî wê tevbigere. Dibe ku sibê Heleb jî bikeve destê Kurdan. Cîhan tê guhertin, tevgera Kurd jî aktif e û pêşengiya guhertinên demokratîk dike. Niha li Kurdistanê jî gelên cuda jiyan dikin, pêşniyarên wan hebin, em dikarin hinek navan biguherînin. Lê ji ber ku tesîra netewe dewletê li ser me jî heye, em jî hinek tiştan qebûl nakin. Ew ne rast e.

Em qebûl nakin ku ji me re bibêjin Ereb, Tirk û Feris, lê divê em bizanibin ku navê Kurdistanê navekî neteweperestiyê ye. Kurd-ûstan; ûstan navekî Asyayî ye. Mahneya wê welat e. Tê mahneya welatê Kurdan. Dema ku Sultan Sencer hatiye Kurdistanê, navê wir weke welatê Kurdan diyar kiriye. Gelek kes jî dibêjin, "em jî li vî welatî jiyan dikin, lê em ne Kurd in. Çima dibêjin welatê Kurdan?" Dibe ku sibê pêşniyarên bi vî rengî jî hebin. Dema ku em van tiştan dibêjin, seriye hinek hevalan diêşe, lê wisa dibêtiyeke dûr nîne. Serokatî dê erênî nêzikî vê

pêşniyarê bibe. Ger em bi nêzikbûna netewe dewletê bifikirin, li hemberî pêşniyarên wisa em ê eciz bibin. Lê ger em bi nêzikbûna netewa demokratîk bifkirin, ew tiştan xwezayî ne. Divê em mantiqê xwe yê erdnigariyê careke din bigirin dest û sererast bikin.

Mesela em Kerkûkê bigirin dest. Ji sedî 55 Kurd in, ji sedî 25 Tirkmen in, ji sedî 20 Ereb in, ji sedî 4-5 jî Aşûrî, Keldanî û Ermen in. Di 2005'an de me pêşniyarek amade kir ku li Kerkûkê xwe rêveberiyeke pêk ve çêbibe. Li ser esasê fikrên Serokatî bû. Piraniya Tirkmen, Ereb, Aşûrî û Ermenan qebûl kirin. Kêfxweş bûn. Lê piraniya Kurdan qebûl nekirin û gotin, "Kerkûk welatê me ye, hûn dixwazin bidin wan." Hemû pêkhateyên wir dibêjin, "bila nasname û mafên me bên qebûlkirin, em amade ne ku Kerkûk bikeve bin serweriya Başûrê Kurdistanê." Lê Kurd dibêjin, "na, hûn mêvan in." Ger wisa be, ew jî qebûl nake. Ji me re dibêjin, "hûn dixwazin ku li Kurdistanê Ereb û Tirkmen jî weke me bin." Me jî got, "hûn jî dibêjin li Iraqê bila Kurd û Ereb weke hev bin." Niha li Iraqê hejmara Ereban zêde ye, ger em bi wê mantiqê nêzik bibin, divê Kurd û Ereb ne wekhev bin.

Dema Komara Kurdistanê li Mahabad çêbû, li gel Komara Azerbeycan hevalên hev bûn. Pirsgireka wan li ser Ûrmiyê hebû, her kesî Ûrmiye ji xwe re dixwest. Her wiha li gelek cihên Bakûr, Kurd û Tirkmen bi hev re jiyan dikin. Dîsa ger li Rojava, Heseke jî bi giştî bikeve destê me, li herêma Cizîrê ji sedî 30'î zêdetir dibe Ereb. Ger tu bibêjî, ew tenê welatê min e; ne rast e. Ger li hevkirin hebe, navê Kurdistanê jî dibe, lê li hevkirin nebe, dibe ku biguhere jî.

Bi kurtasî divê em mantiqa netewe dewletê bişkînin. Di bingeha pirsgirekên ku li îro cîhanê derdikevin de ew mantiq heye. Di navbera gelek dewletan de, li ser herêmeke biçûk şer heye. Ger em bixwazin çareser bikin, divê em ew mantiqa yek dewlet û yek neteweyê derbas bikin. Ew mantiqa me ya erdnigariyê ye. Mesela Îran, Iraq, Suriye û Tirkiye erdingariya Kurdistanê qebûl nakin. Iraqê hinek qebûl kiriye. Yên din qebûl nakin. Di mantiqa netewe dewletan de, dewlemendiyên erdnigariyê girîng in. Ji ber wê her dixwazin ew cihên dewlemend, her di bin serweriya wan de be. Ji ber ku Kurdistan dewlemend e, her kesî berê xwe daye Kurdistanê. Ger erdnigariya me ne dewlemend bûya, dev ji me berdidan.

Di mantiqê me de jî her dewleteke mezin hebû. Mesela ez zarok bûm, min bi serê xwe nexşeya Kurdistanê dûrûst dikir, heya Edeneyê diçû. Min nexşereyê hez dikir. Nexşereya min heya deryaya Spî, Deryaya Reş, Ava Kendavê û derya Xezer jî diçû. Li çar aliyên Kurdistanê

jî, nexşereya min heya deryayan diçû. Min di nava tevgera me de fêm kir ku ew mantiqa netewe dewletê ye. Wan em biçûk kirine, em jî xwe mezin dikin.

Ya duduyan jî, berê behsa tiştekî wisa dikirin; niha jî Tirk dibêjin, "ew Kantonên Rojava dixwazin xwe bigihînin behrê." Berê digotin, "ji ber ku Kurdistan ji behre qut kirine, nebûye dewlet. Heya ku lingekî me negêhêje behre, em nikarin bibin dewlet." Ji ber vê dema ku me nexşe çêdikir, me çar ling digihandin deryayan. Ew tesîr heye. Em li gorî mantiqê erdnigariya dewletan nêzik dibûn. Ger dewlet bigêhêje behre, dê bibe dewleteke xurt. Ji ber vê dijminên me her dixwazin me jî behre dûr bixin, lê em jî dixwazin xwe bigihînin behre. Herdu jî yek nêzikbûn in. Bingeha xwe, ji dewletbûn e digre. Divê ew jî bê çareser kirin, divê em vê mantiqê careke din ber çavan re derbas bikin. Divê ew mantiq nebe sedem ku em çavê xwe berdin ax û welatê xelkê. Divê di nava civaka me de nêrîneke wisa dernekeve.

Li ser vê mijarê axaftin û pirsên hevalan hebin, dikarin bikin.

…: Erdnigarî jî weke beşeke zanistê derbas dibe. Her çiqasa weke cihekî mirov li ser jiyan dike bê dest girtin jî; esasê wê li ser esasê taybetmendiyên heremekê ye. Ji aliyê aborî, fîzîkî û siyasî ve lêkolîn dike. Li gorî her erdnigariyekê jî çanda wî gelî diyar dibe. Mesela Kurd, weke gelên çiyayî tên naskirin. Cil û bergên me, xwarin û tevgerîna me li gorî vê şêwe digre. Mesela Ereb li cihên deştî jiyan dikin. Cil û bergên wan li gorî wê şêwe girtine. Bi erdnigariya xwe tê naskirin. Lê bi derketina netewe dewletê hinekî cuda bûye. Çawa ku her gundek toxibên erdên xwe diyar dike, dewletê jî erdnigarî di nave xwe de parve kirine. Li gundan çawa ku pezê hinekan dikeve nava erdên hinekên din pevçûn rû didin, îro cîhan jî di nava netewe dewletan de parve kirine, şerê cîhanê jî li ser wê dibe. Şerê cîhanê li ser parsêlkirina erdnigariyê ye.

Mesela nêzikî 200 netewî hene li cîhanê, ew yên fermî ne û cîhan di nava wan de parsel kirine. Lê yên ku li gorî mantiqê dewletê, nebûne xwedî taybetmendî, weke netew nayen dest girtin. Lê mirov weke ziman û netew bigre dest, bi sedan netew hene. Weke Kurd, ji ber ku heya niha me nikariye li ser erdnigariya xwe azad bijîn, bi me re refleksek pêş ketiye. Em jî dibêjin, "Kurd û Kurdistan." Em carna bi mantiqê netewe dewletê nêzik dibin, lê em ne di ferqa wê de ne. Divê mirov tevdîra vê bigre û nekeve heman şaştiyê.

Yekî dîn hebû, ji ber ku pir felsefe xwendibû, dîn bibû. Helbestek dixwend, di helbesta wî de wisa derbas dibû; "ez xwe bi xwe sînor

nakim, ji ber ku gelê min heye. Ez xwe bi gelê xwe sînor nakim, ji ber ku gelên me û cîhan heye. Ez xwe bi cîhanê sînor nakim, ji ber ku gerduna me heye û ez mirov im.” Di vê derê de jî bale dikşîne ser sînoran. Dibêje, divê mirov ji xwe re sînoran danîne.

…: Ji aliyê erdnigariyê ve hasasiyeta me derket holê. Min jî rûbarê Kurdistanê hesap kir û 440 hezar km derket. Heval jî da diyarkirin, ji aliyê nêzikbûna netewe dewletê ve hin tişt vekirin. Lê xeynî wê bi hezaran milet û netew di cîhanê de hene. Nêzikî heft hezar ziman hene, piraniya wan ber tûnebûnê ne. Yek jî ya din cudatir nîne. Têkiliya erdnigarî û netew heye, dîrokî ye. Ji ber ku mirov, li ser wê axê jiyan dikin û xwe pêş dixin; bi wê axê ve tên girêdan. Lê ez bawer dikim, qarektereke cuda ya gelê Kurd heye.

Mesela netewe dewleteke Kurdan nehatiye avakirin, e şansek e. Ji vî alî ve li Başûrê Kurdistanê hinek pêşketin çêbûne. Dibe ku hin hêzên weke Amerîqa bi zanebûn jî hin tişt kiribin. Ji aliyê navê Kurdistanê ve; Şerefxanê Bêdlîsî dibêje, “di dema Osmaniyan de navê Kurdistanê hatiye diyarkirin.” Lê ger navê vî welatî Mezopotamya be zêdetir xwezayî û rast dibe. Hem gelên din jî dikarin qebûl bikin, hem jî navekî xwezayî yê erdnigariyê ye. Ger paradigmaya Rêber Apo bê qebûlkirin, di navbera ziman û rengan de cudabûn çênabe. Lê divê gelê Kurd pêşêngiya vê bike, jixwe ji ber ku dewledbûyin çênebûye, ew şansek e.

…: Têkiliya erdnigarî, welat û welatparêziyê hinekî were vekirin dê baş bibe. Yek jî em li ser erdnigariyekê jiyan dikin, lê tevahî cîhanê miletê ku xwediyê erd heye? Mesela hinek dewlet diçin û hin cihan dagir dikin û dibêjin, “ya me ye.” Mesela Tirk hatine û Anatolya dagir kirine û dibêjin, “welatê me ye.” Ew çiqasa rewa ye?

…: Em dibêjin, netewa dewlet li ser esasê yek erdnigariyê û sînoran hatiye avakirin. Lê di pergala ku em dixwazin ava bikin de, dê em ê sînoran daynin, an na? Ger em sînoran daneynin, dê em ê çawa wê erdnigariyê biparêzin? Ger em bibêjin, “Kurdistan ya me ye.” Ew jî nabe nêzikbûna netewe dewletê? Erdnigariyeke azad nabe, ma teqez divê mirov bike ya xwe? Mesela em niha li Rojava şer dikin, pêwîst dike ku em cihên derveyî Kurdistanê jî bigirin, ger em bigirin dê rewşa gelên din dê çawa bibe li wê derê?

…: Peyva Mezepotamya û Kurdistanê mirov dikare wisa binirxîne. Mezepotamya, ne peyveke resen e. Ji ailiyê Yewnanan ve nav lê hatiye kirin û ji aliyê erdnigariyê ve jî hemû erdnigariya Kurdistanê nagre

nava xwe. Ji bo cihên navbera Firat û Dîjleyê tê gotin. Li ser navê Mezepotamya weke hevkirinek pêş ket, lê li gorî qeneta min nabe bersiv.

…: Heval dibêjin, bê sînor em ê çawa erdnigariya xwe biparêzin. Dema ku xweserî pêş ket, dibe ku van gelên din ku li Kurdistanê jiyan dikin, vî navî qebûl jî nakin. Dê vê dorê Kurd bibêjin, "yên ku herî zêde şer kirin em bûn." Diyare ku di mejiyê her gelekî de ew nêzikbûn heye. Li Kurdistanê her cure gel hene. Hêval dibêjin, "dê em ê jî sînoran daynin?" Jixwe di navbera Kurdistanê de ew qesa sînor danîne û parçe kirine. Di navbera mirovan de têl danîne. Divê em bi wê hişmendiyê tevnegerin. Divê em vê bi gelê xwe jî bidin qebûlkirin.

Lê niha guhertina navê Kurdistanê, em jî bi zehmetî qebûl dikin. Hûcreyên me dîlîzin. Em dibêjin, "me ew qesa berdel daye, di oxirê wê de." Lê mijareke nîqaşê ye, bi demê re dê diyar bibe.

…: Hevalan gotin, "em ê çawa bi hev re jiyan bikin?" Jixwe gel bi hev re jiyan dikin, bi hev re dibin cîran, bi hev re dizewicin. Tiştê ku pirsgirekan çêdike, mantiqa netewe dewletê ye. Mesela Kerkûkê bawer nakim ku di navbera Kurd û Ereban de pirsgirek hebe. Ji berê ve bi hev re jiyan kirine. Tu pirsgirekên wan jî çênebûne. Heval dibêjin, "em ê çawa sînoran biparêzin?" Em sînoran naparêzin, em gel diparêzin. Ger mantiq parastina gel be, gelekî din alîkariyê ji te bixwaze, tu dikarê wan jî biparêzê. Her wiha xwe parastin jî ne mantiqê netewe dewletê ye.

Yek jî divê her reng û çand jî xwe biparêze û bi vî rengî tevlî konfedaralîzma demokratîk bibe. Ger li ser yek ziman û çandî be, rast nabe. Divê mirov çand û zimanê xwe jî biçûk nebine, lê divê gelên din jî di heman astê de bibîne. Çima em nikarin, bi gelekî din re di heman erdnigariyê de jiyan bikin û çima bibe sedema şeran?

…: Serokatî digot, "ji bo ku di nava me de miletgirî pêş nekeve, ez gelek tevdîran digrim." Hemû parazname jî li ser vê esasê pêş dikevin. Ger gelên ku li wê derê jiyan dikin, wê navkirinê nepêjirînin, jixwe tu mahneya wê tune. Mesela li Bakûr, gelek cih Tirkiye bi nav kiriye, lê navên wan Kurdî tên karanîn. Her wiha her mirovekî/ê jî du navên wan hene. Kesên ku gel qetil kirine, navên wan bi tax û kolanên gel xistine. Lê gel qet wan qebûl nake û kar nayne. Li Kurdistanê jî em bi gelek gelan ve jiyan dikin, pirsgirek tune ye. Lê ger em bibêjin, "ya me ye" dê pirsgirek derkevin. Her tişt bi tahamûlî û zîhniyetê ve girêdayî ye.

…: Di zîhniyeta kapîtalîzmê de welat, milk e. Li ser wê bazara wê pêş dikeve. Em hem bazara kapîtalîzmê, hem jî milkirina wê red dikin. Lê li ser erdnigariya ku em lê jiyan dikin, dîrokek me heye, jiyankiri-

neke me heye. Em bi vê mantiqê erdnigariya xwe ve dibin yek û dibêjin ya me. Lê qesî ku em dibêjin ya me ye, gelên din ku li vê derê jiyan dikin jî dibêjin ya me ye. Hevpar e. Welatparêzî jî, xwedîderketina li ew erdnigariya ku tu li ser jiyan dikê ye, parastina û pêş xistina wê ye.

Di paradigmaya berê de me digot, her tişt ji bo welat e. Lê em niha dibêjin her tişt ji bo mirov û civakê ye. Mesela niha li Başûrê Kurdistanê, cihekî bi navê Kurdistanê heye, piraniya gel di asta birçî mayinê de ye. Lê hinekên lord jî kêfê xwe dikin û serê carê bi dewletekê re têkilî datînin, niha ew Kurdistan hebe, dike çi be? Dema ku wekhevî tune be, mahneya wê tune. Ger mirov cihekî weke milkê xwe bibîne û hemû berhemên wê bigre tekela xwe, wekhevî nabe. Li ser wê erdnigariyê kî jiyan dike, ya hemûyan e.

Berê me tiştên sembolîk pir derdixistin pêş; min bi xwe jî gotiye, “bila dewleteke me hebe, bila biçûk be, bila feodal be, bila faşist be. Bes bila Kurdistaneke me hebe.” Lê li gorî paradigmaya Serokatî em mezî dikin; ger di wê dewletê de zordestî hebe, wekhevî tune be, komkûjî hebin, ew gelên din bên tûnekirin, navê wê çi dibe bila bibe, ew welat kêrî tiştekî naye.

…: Tiştê ku em lê binêrin; divê em bibêjin, guhertin di navan de çêbûye, an di zîhniyetê de? Ya esas guhertina zîhniyet e. Lê em pir zêde girîngî nadin zîhniyetê, sedema vê çi ye?

…: Di netewe dewletê de sembol pir zêde derdikevin pêş. Mesela nav, al û remzên dîtir. Lê tu dinêrê ew sembol gelên li wî welatî jiyan dikin temsil nakin. Em qala jiyaneke azad û wekhev dikin, ew jî bi sembolan nabe, bi zîhniyetê dibe. Ger ew zîhniyeta demokratîk tune be; dê tuyê al, arteş û nav derxê pêş. Mesela li Başûr ji me re digotin, “kaka, tu Kurdê Tirkanê.” Hê Kurdbûna min qebûl nedikir, Kurdê xas jî xwe dîbîne. Her wiha gelên Asûrî û Ermenî qebûl nake. Wisa be navê wê derê Kurdistan be, dike çi bibe? Ew jî girêdayî zîhniyetê ye.

…: Di seriyê min de hin nakokî çêbûn. Heval dibêjin, mabesta me parastina gel e, ne parastina erdnigariyê ye; ger mirov nikaribe erdnigariyê biparêze, mirov nikare wî gelî jî biparêze. Girêdaek girîng di nav de heye. Ya din jî Kurdistan, erdnigariyeke dewlemend e. Rastiyeke Rojhilata Navîn heye, zû bi zû bela xwe jê venakin.

Dema ku em niha şerê xwe mezî dikin û nêzikbûna Serokatî ya gelan mezî dikin, cudabûn hene. Mesela hevalên me yên Rojavayî, dibêjin, “şoreş ya me ye.” Lê em dibêjin şoreşa gelan e. Aîdî xwe dibînin. Bi vê nêzikbûnê, dê em ê jî bibêjin, “şoreşa Bakûr ya me ye.”

Lewra em bi zîhniyeta netewe dewletê mezî dikin. Ger li Rojava mûdaxaleyî hin tiştan nehatiba kirin, dê bişemitiya dewletbûnê. Lewra zîhniyeta me neguheriye. Ji bo vê ez dipirsim, gelo em ê sînoran daynin, an na? Dê her êrîş jî hebin.

…: Weke bersiv, niha nêzikbûna kapîtalîzmê ya erdnigariyê heye. Erdnigariyê ji aliyekî weke obje û sûbje digre dest; ji aliyekî ve jî pîroz dike. Weke amûr digre dest û li hemberî civakê kar tîne. Ji bo me jî ax pîroz e û parastina wê jî girîng e. Lewra civak, li ser axeke jiyan dike. Jiyan ji hawa çênabe, li ser axê dibe. Hemû pêşeroj û planên jiyanê jî li ser vê axê çêdibin. Lê pergal hemû dewlemendiyên binerd û sererd, ji bo pergala xwe kar tîne. Mesela Barzanî li Başûr her dibêje, "Kurdistan û Kurdistan." Dibe hinek kesên ji civakê lê bawer jî bikin. Lê kesên rewşenbîr û kesên derdorê Barzanî qesî pûşekî jî vê bawer nakin, lê weke benîştekî bicûn, her dubare dikin. Baweriya wan bi Kurdbûnê tune, lê ji bo civakê  bixapînin û holdîngên xwe mezin bikin kar tînin. Ango erdnigariyê ji xwe re dikin amûreke karanînê.

…: Li Rojava ji bo şoreşê, di serî de Barzanî û hêzên girêdayî wî tevlî şoreşê nedibûn. Digotin, "ji bo ku navê Kurdistanê tê de tune, em tevlê nabin." Qaşo em rexne dikirin. Di destpêka şoreşê de, derdorên weke Aşûrî, Sûryanî û Ereb tevlî me bûn; lê wan jî demokrasi pir zêde fêm nekiribû. Mesela Asûriyan digot, "em ê asayîşa xwe daynin." Lê hevalan mezî kir ku her partiyek û kêmnetewek ji bo xwe asayîşeke dixwaze. Di dawiyê de hevalan got, "bila di her bajarekî de navendeke we hebe." Ez dibêjim, ew jî şaş fêmkirinek e.

Mesela Ereb jî hebûn, di serî de cihê wan El Nûsra hebû, me dixwast em ji wir derxin, lê wan Ereban xwe nêzikî me nedikirin. Bi demê re nêzikbûnên me dîtin û fêm kirin, bi wî awayî me El Nusra ji wan deran derxist. Niha hêza ku herî zêde li gel YPG şer dike jî ew in. Ez dibêjim, ger ew nêzikbûna me bi rastî jî bê fêm kirin, hemû gel dikarin bipêjirînin.

…: Dema ku em dibêjin Kurdistan, divê em yekalî nefikirin. Di Kurdistanê de miletên din jî hene û hinekên wan ji me jî kevntir in. Ji ber ku em yekalî difikirin, nakokiyên me bi van gelan re derdikevin û em nikarin wan li derdora xwe kom bikin. Mesela hinekan ji me re digotin, "ji bo ku hûn dibêjin Kurdistan, em nikarin di nav de cih bigirin." Bi yekalî mezîkirinê nabe. Mesela me ji bo çi navê ERNK û ARGK guhert? Divê guhertin û veguhertin çêbe. Ji bo vê guhertina paradîgmayê ket dewrê. Em di gotinê de vê qebûl dikin, lê di pratîka me de tiştekî din derdikeve. Lewra di zîhniyeta me de nehatiye rûniştin.

Ji bo vê em bi gelên din ve, di pratîkê de dikevin qirika hev. Em dibêjin, bila li gorî me bin.

Di meseleya sînoran de, dibe ku erdnigariyeke ku te li ser pergala xwe ava kiriye û gelê xwe diparêzê hebe. Lê weke dewletan sînorên teqez em nikarin daynin û wisa bi pasaportan mirovan derbas bikin. Wê demê jixwe wekhevî çêdibe, çûn û hatin çêdibe. An na em bibêjin, "bila xeteke me hebe û bila ne kes wê xetê derbas bike, ne jî em wê xetê derbas bikin." Wisa nabe. Pratîkê de tiştên wisa derdikevin. Em, pir zû dibin deshilatdar. Ew şêwaza me dihêle ku mirov ji dûrî me bikevin. Dewlemendiya Kurdistanê tenê ji bo Kurd nene, hemû mirovên ku li Kurdistanê jiyan dikin, dikarin jê sûd werbigirin.

…: Dijmin Kurdistan kiriye çar parçe. Gel parçe kirine. Ji milê mejî û çand ve gel parçe kirine, ne tenê weke erdnigarî. Gel ji pîrozbûnên wê dûr xistine. Ji bo mirov bide naskirin, mirov dikare bibêje, "şoreşa Rojava û şoreşa Bakûr" lê naye wê mahneyê ku ya hinekan e. Serokatî dibêje, "em dixwazin pergala xwe bi awayekî aştiyane ava bikin û em naxwazin şer bikin." Ger rewşeke aştiyane hebe, jixwe pêwîstî bi sînoran tune.

Mesela li Rojava, hemû gel bi hev re jiyan dikin. Bi hev re bi rê ve dibin. Lê divê di nava gel de mirov vê ferasetê pêş bixe û îqna bike. Her kes xwe bi xwe rê ve bibe û xwe bi xwe biparêze. Hemû reng di van rêveberiyan de hene. Alên wan jî wisa bi renk kirine. Li Rojava hinek derdorên dewletê, dixwastin di nava gelan de nakokiyan derbixin, lê piştî ku dewlet ji Rojava hate derxistin, tiştekî wisa derneket. Lewra hemû cîranên hev in û li ser erdekî jiyan dikin. Nêzikbûneke wekhev pêwîst dike, lê divê li gorî qarekterên gelan wekheviyak hebe. Ew şoreş, ji bo hemû gelan e û hemû gel Serokatî ji xwe re rêbêr dibînin. Ne tenê ji bo Kurdan e. Divê her kes bi ol, ziman û jiyana xwe tevlî vê pergalê bibe. Wê demê wekhevî çêdibe.

Pêşdarazîbûnek jî çêbûye, dema ku mirov dibêje PKK û Kurdistan, hema Kurd tên bîra her kesî. Lê Serokatî paradigma û têkoşîneke hemû gelan bigre nava xwe pêş dixe. Dibe ku weke kadro em vê dizanin, lê gel wisa nêzik nabe. Dibêjin, "ya Kurdan e." Divê ew nêrîn jî bişke.

…: Divê nêzikbûnên dewletê, li hemberî gelan mirov baş tehlîl bike. Da ku mirov jî nekeve heman şaştiyê. Divê ferq û cûdabûna me û wan derkeve. Mesela di maqezagona Tirkiye de, dibêje her kesî ku li tirkiye dijî " Tirk"e. Lê em dibêjin, bila ew madde biguhere û an bibe "gelên Tirkiyeyê" an jî bibe "gelên Anatolyayê." Lê dema ku mijar dibe Kurdistan, armanc û encamkirina me ji hev nagre. Ji ber ku em

netewe dewletê pêk tînin, em encam nagrin. Encam hevpar jiyan kirin e. Mirov wan kesên li wir jiyan dikin, hemûyan weke Kurdistanî dikare bi nav bike. Ger wan gelan ew yek qebûl kirin û tevlî rêveberiya hevpar bûn, her wiha di bajar û gundên xwe de xwe rê ve birin, bi tu astengiyan ve rû bi rû nehatin, pirsgirek dernakeve. Divê mirov hem wan gelan fêm bike, hem jî bide fêmkirin.

Mesela kêmasiya me li Rojava çi bû? Me di serî de ew nêzikbûn bi xwe fêm nekiribû û me nêzikbûna netewe dewletê fêm nekiribû, da ku em bi wan jî bidin fêm kirin. pirsgirekên derketin jî ji ber vê bûn.

Ji bo sînoran, ger fereseta parastina rewa pêş bikeve; pêwîstî bi sînorên mîsoger namîne. Divê ew yek bê fêmkirin. Ger wisa bibe, mirov dikare pratîkeke rast jî bimeşîne. Lê divê mirov di serî de bi xwe fêm bike.

…: Hevalan gotin, hin tiştan mirov dikare di dema pêş de biguhere. Mesela navê Kurdistanê; ger bê guhertin dê qeyrana dil bê derbaskirin. Divê di serî de zîhniyeta wê bê rûnişkandin ku mirov mahne bidê. Di nava civakê de, Kurdistan pîroz tê dîtin, nêzikbûnêke wisa pêş ketiye.

Di meseleya  sînoran de; azadî jî bê sînor nîne. Dema ku mirov dibêje, bêsînor; anarşîzm tê bîra mirov. Mesela ji bo hêzên parastinê, em dibêjin; Navenda Parastina Gel, an jî Hêzên Parastina Gel. Tenê ne ya Kurdan e, ya gelan e. Dema ku li cihekî Kurdistanê li ser Sûryaniyan û kêmareke (ulusal azinlik-kêmnetewe) din êrîş çêdibe, dîsa em diparêzin. Hemû hêzên me yên parastinê ji bo vê ne û gelên cuda jî di nav de cih digirin. Lê bê sînor jî nabe. Dibe ku sînorên me weke yên dewletê nabin. Lê ji bo ku em bikaribin biparêzin, me hemû derdorên Rojava hendek kolane. Li hemberî êrîşên derve, ji bo parastinê ye. Lê ger li hemû Rojhilata Navîn û cîhanê nêzikbûneke demokratîk pêş bikeve, pêwîstî bi sînoran namîne. Sînorên cîhanê bi cetvelan çêkirine, sûnî ne, ne rasteqîn in. Lê vê gavê mirov nikare bibêje, em ê hemû sînoran rakin; ger zîhniyeteke demokratîk serwer bibe, jixwe ew sînor ji holê radibin.

…: Ji aliyê sînor ve gelek nakokî derketin. Cihê ku gel bi hev re jiyan dikin, parastin pêwîst dike. Dagirkerî û êrîş pêwîst nakin. Lê parastin her dem pêwîst e. Di netewa demokratîk de, ji aliyê zîhniyetê ve bê sînorî heye. Bes em jê dernakevin. Mesela mirov ji aliyê fikir ve, pir kêm mejiyê xwe kar tîne, lê dikare bê sînor jî bişûxilîne. Hê jî em bi zîhniyeta netewe dewletê, şîrove dikin. Lê divê em bizanibin ku fikra netewa demokratîk bê sînor e. Li her cihê cîhanê jî paradigmaya ne-

tewa demokratîk dikare pêş bikeve. Divê sînorên wisa mîsoger nebin, lê ger êrîşek jî hebe, divê ew erdnigarî bê parastin.

…: Mesele ne navkirin e, mantiqê navkirinê ye. Mesele Kurdistan û Efgenîstan e. Niha li ser çi esasî ew nav danîne, li ser çi esasî sînor kişandine? Mantiq girîng e. Li ser esasê hegemonbûyinê û kar kirine be, wisa sînor hatibin danîn û gtemenûk hatibin danîn, ew berjewendiyên gelan naparêze. Armanca wê parastina deshilatdariyê ye. Ew mantiq şaş e. Navkirin, tenê ne aîdî netewe dewletê ye jî. Navê gelek welatan jî beriya netewe dewletê hatiye danîn, lê dîsa bi zîhniyeta deshilatdariyê hatiye danîn. Ji bo vê welatek aîdî derdorekê hatiye dîtin.

Mesela berê cihên ku Kurd jiyan dikin, Sûmeran weke Hûrî pênase kiriye. An jî gotine, qebîleye Rojê, qebîleya şeran. Navkirinên cur bi cur hene, ya girîng mantiqa bi nav kirinê ye.

Di meseleya sînor û welat de, divê mirov welat bê wate jî nebine; lê divê mirov ax û erdnigariyê wisa pir zêde dernexe pêş û pîroz jî nebine. Divê pêşiya wekhevî û azadiyê jî neye dîtin. Mesela di kevana zerîn de, genim tiştekî girîng yê jiyanê ye; ji ber vê pîroz hatiye dîtin. Komînalîte û civakbûn pêş xistiye. Weke parçeyeke xwezaya xwe dîtine. Wê demê darek jî pîroz tê dîtin. Hemû tiştên di nava xwezayê de weke xwe dibînin, ji bo vê bi xwezayê ve di nava aştiyekê de jiyan kirin heye. Ger li hemberî van nirxan êrîşek hebe, parastin rewa ye. Ger di nava civakeke de, hemû mirov bi hev re jiyan bikin û erdnigariyeke hevpar hebe, lê derdorek bibêje, “ew der tenê ya min e.” An jî xwe li ser yên din bike deshilatdar, pirsgirek dest pê dikin. Pergala koledar û hiyerarşik jî wisa pêş ket. An na hemû mirov û civak ji yek cihî hatine û heman tişt jiyankirine, divê mirov ji hev û din qut negre.

Mesela îro, bi deh hezar salin Kurd li ser vê erdnigariyê jiyan dikin û ew erdnigarî pîroz dîtine. Ew pîrozbûn, heya îro hatine û divê em jî vê biparêzin. Lê ne bi awayekî nîjadperest, li ser esasê azadî, wekhevî û demokrasiye ye. Welatparêzî, di vê xalê de dikeve dewrê. Welat warekî pîroz e, divê mirov bi konevaniyeke pîroziyê nêzik bibe. Sînor danîn, ne li ser esasê netewe dewletê ye. Sînorên esasî, di mejiyê me de hatine danîn. Teyisîna vê cihên din jî dibe. Em dibêjin, “gelo sînorên Kurdistanê bên rakirin, dê em ê çi bikin?” Mesela gelên ji derve bên Kurdistanê, em ê biçûk bibînin, em ê wan sînordar bikin? Na. Ger em wisa nêzikî wan bibin, dê ew jî bibe şaşitî. Sînor rakirin jî dê li ser esasê dostaniyê  gelan be. Dê li ser esasa jiyana komînal û wekheviyê be. An na ne li ser esasê welat bêwate kirinê ye. Dê em di navbera konfedaralîzma demokratîk ya Kurdistanê, konfedaralîzma demokratîk ya

Rojhilata Navîn û konfedaralîzma demokratîk ya cîhanê de hevsengiyekî (dengeyekê) çêkin.

Marks jî digot, “welatê peroleterya tune. Hemû cîhan ya proleterya ye.” Em jî dibêjin, “welatê gelan tune.” Divê em li ser esasê konfederalîzma mirovahiyê nêzik bibin.

**H. Helmet:** Hinek hevalan got, ger em di nava milet de behsa van tiştan bikin, dê qeyrana dil derbas bikin. Di salên 2000’î de guhertina stratejîk hebû, me behs kir. Di wan deman de kongreya 7’emîn ya PKK’ê hate çêkirin. Mijareke esasî jî guhertina navê PKK’ê bû. Wê demê hinek heval tûşî kriz bûn. Di encamê de em gihêştin wê biryarê ku em nav neguherînin. Pişt re di 2002’yan de, di kongreya 8’emîn de navê PKK’ê hate guhertin û KADEK hate avakirin. Çawa çêbûye, em nakevin nav. Lê ez dixwazim behsa pîsokolojiya me ya kongreya heftemîn bikim. Hem ji bo gel, hem jî ji bo kadro wisa bû.

Ji bo Kurdistanê jî, kesekî ku pêşniyareke guhertina nav kiriye tune. Em bi xwe jî niha tiştekî wisa di nava gel de nadin nîqaşkirin. Me weke mînak da û em ji aliyê mantiq ve digirin dest. Ji bo kantonên Rojava jî, me negotiye bila teqez navê wir Kurdistan be. Hinek dibêjin, ew Rojavayê ku ye? Ne Rojavayê Erebîstanê ye, ne wisa? Rojavayê Kurdistanê ye. Hinek Ereb û Tirkên şoven jî hene, qebûl nakin. Rûxmî ku navê Kurdistanê li ser tune, qebûl nakin ku ew der weke Rojava jî bê naskirin.

Divê em van bizanin. Da ku em zîhniyeta xwe amade bikin. Em ji bo vê di perwerdeyan de nîqaş dikin, da ku ji her alî ve em xwe ji paradigmaya Serokatî re amade bikin. Nêrîna me ya ji bo dewlet, welat, erdnigarî, mirov, jin ûhwd çi ye? Em weke berê nafikirin. Naye wê mahneyê ku her tiştê me yê berê xirab bû. Hinek tiştên me baş bûn, em wan fireh dikin; hinek tiştên kêm jî hebûn, em timam dikin. Hinek tişt jî hebûn, me weke baş digirt dest, lê em têgihêştin ku ne baş e, em diguherînin.

Em niha jî nêrîna xwe ya erdnigariyê digirin dest. Divê taybetmendiyeke mirovê şoreşger jî welatparêzî be, divê gelparêz be. Welatparêzî, ne mahneya dewletperestiyê de ye. Mesela ger sobayek me hebe û em li ser wê sobayê komînal bifikirin, ew soba têra deh salan dike, lê ger heval komînal nefikirin, hê ku sê mehên zivistanê derbas nebûne ew soba xerap dibe. Mesela fanosek li malê me hebû, dapîra min 30-40 salî parastibû û dabû dayika min, wê jî 30-40 salî parastibû û niha jî weke remzeke li malê maye. Lê dema ku tiştekî wisa bi dest me dikeve, 3 mehan ber xwe nade.

Ger ji bo Kurdistanê jî em nebêjin, milkê hevbeşe e, dibe ku em neparêzin. Ger em bibêjin, yê me hemûyan e, gelo divê em qet neparêzin? Ji bo ku em biparêzin, divê tenê ye me be? Tiştekî psikolojik e. Mesela mirov cihên ku lê dayik bûne hez dikin. Dibe ku ew cih çolek be jî, lê dema ku wê derê dibîne hestiyar dibe. Girêdan axê heye. Lê ger ez bibêjim, ez li vê derê dayik bûme, tenê ya min e, nabe. Ereb jî li wê derê mezin bûye. Nêzikbûna miletperestî ew e. Dibêjin, ew cîhaz tenê yê min be, ez ê biparêzim; ger yê hemû dibistanê be karê min pê nîne. Welatparêziya ku me berê fêm dikir, wisa bû.

Jixwe em jî tu kesî re nabêjin, ji welatê me derkevin; lê hêdî  hêdî em weke xwe lê tînin. Jixwe Tirk jî ji me re nabêjin, welatê me derkevin, lê hêdî hêdî me hemûyan dike Tirk. Suriye, Îran û Iraqê jî, ne gotiye bila Kurd hemû ji welat derkevin. Lê dixwaze weke xwe lê bîne. Dema ku em dibêjin, hevkarî û bi hev re jiyankirin; naye wê mahneyê ku welat û ax ji bo me bê mahne ye û em dev jê berdin. Niha hinek herêmên Kurdistanê hene, xelkên din lê tune ne, an jî pir kêm jiyan dikin. Li wê derê her kesî qebûl kiriye ku ew der Kurdistan e; lê hinek cihan naxwazin qebûl bikin. Niha kesên herî şoven yên Iraq jî, nikarin bibêjin “Hewlêr, Dûhok û Sûleymaniye ne ya Kurdan e.” Tirk jî vê qebûl dikin. Lê Kerkûkê qebûl nakin. Niha em rabin û li ser esasê gelo ew cih Kurdistan e, an na nîqaş bikin, rast nabe. Em dixwazin vê bibêjin. Li parçeyên din jî pirsgirekên bi vî rengî hene.

Di vê mijarê de Serokatî pir berfireh difikire. Ger em dixwazin pergala netewa demokratîk pêş bixin, divê em rehet nêzik bibin. Wisa bibe, dibe ku gelek kes û derdor ew projeya me qebûl bikin û em bi hev re jiyan bikin. Niha  li Rojava, asayîşa Sûryaniyan jî heye, lê di  nava kordînasyonekê de kar dikin. Weke hevalan gotin, ew pergal, anarşîzm jî nayne. Pergaleke ku her kesî tîne gel hev û din.

Bila pirsên wisa li gel me çêbibin, bila em biêşin jî; lê ji bo ku em tiştên kêm û şaş biguherin jî ew yek pêwîst dike. Lewra tabû dişken û guhertinên rast çêdibin. Divê em bi awayekî rast nêzikî vê bibin.

Di mijara  sînoran de, di konfedaralîzma demokratîk de diyar e, zelal e. Li gorî saziyên navnetewî di cîhanê de nêzikî 7 hezarî etnîsîte hene. Weke civak, ger baweriya me xwedê hebe, xwedê ew çêkirine. Ger baweriya me bi xwezayê hebe, xwezayê çêkirine. Kesî ji me pirs nekiriye, hûn dixwazin Kurd bin, Ereb bin, an qewmekî cuda bin. Bê nasname û vîna me çêbûye, wisa be divê mirov rêz nîşan bide.

Berê nasnameya dewletê û netewê ne yek bû. Mesela Osmanî nedihat mahneya Tirkbûnê; gelek miletan di nava wê împaratoriyê de

jiyan dikir. Lê pergala kapîtalîst ew xirab kir, nasnameya netewê, bi dewletê ve girê da. Dewleta te hebe, tu heyî; ger dewleta te tune be, tu tûneyî. Ji bo ku em hebin, divê dewleteke me hebe. Ew hem bûye ûtopyayek, hem jî bûye tirsek. Em hem jê ditirsin, hem jî xeyal dikin.

Niha Serokatî dixwaze, vê careke din cuda bike. Dixwaze bide fêmkirin ku ew ne tiştekî xwezayî ye, ew modernîteya kapîtalîst çêkiriye. Da ku bikaribe gelan bixe bin serweriya xwe û berjewendiyên xwe pêş bixe, ew model pêş xistiye. Nasnameya netewê, bi dewletê ve girêda. Niha 7 hezar netew hene, lê di sedsala 20'emîn de ji hezarî wan hatiye helandin, tune bûye. Digotin, li Kanada hinek etnîsîte mane, bi têliyên peçiyan tên hejmartin. Ew qesa hejmarên wan kêm bûne. Gelek komên bi vî rengî hêdî hêdî tune dibin. Serokatî dibêje, "ew mozaîk in, dewlemendiya cîhanê ye." Lê niha ew pergal, wan tune dike.

Niha li giştî cîhanê, 192 dewletên fermî di Yekîtiya Netewan (YN) de hatine qebûlkirin. Serokatî vê rexne dike, dibêje ew ne Yekîtiya Netewan e, ew Yekîtiya Dewletan e. Em niha netewek in, niha li wê derê temsîliyeta me heye? Na. Serokatî dibêje, "konfedaralîzma demokratîk, temsîla netewan e. Divê li cihê Dewletên Yekbûyî, Netewên Yekbûyî, li wê derê be." Wisa be, divê nunerên 7 hezar netew li wê derê hebin. Divê nasnameya wan bê nasîn. Ger etnîsîteyeke cuda be, mafê wan heye ku weke neteweke bên dest girtin.

Cihên weke Rojhilata Navîn û Ewropa jî gelên cuda hene, dikarin li wê derê jî rêxistinbûna xwe ya konfederal çêbikin. Serokatî dibêje, "em dikarin bi hemû pêkhateyên Rojhilata Navîn ve, konfederalîzma xwe çêbikin." Ger em hinekî li ser bifikirin, pir ne zehmet e. Lewra milet berê ve fêrî jiyana hevpar bûne. Di navbera wan de pir nakokî çênebûne, lê ew sedsala dawî de me fêrî hev û din xwarinê dikin. Serokatî ji bo, komkûjiya Ermeniyan got, "bersûc û gumanbarên esasî yên komkûjiyê, ne Osmanî û Tirk in. Yên ku ew siyaset ava kirine, gumanbar in. Divê lêkolîn li ser van bê pêş xistin. Gelên herêmê bûn amûrê vê konevaniyê." Kurd û Aşûriyan jî şerê hev û din kirin. Simkoyê Şikakî, serokê Aşûriyan kûşt. Lê di destpêkê de Birîtanya û Fransa berpirsên vê ne. Yên din bûne amûr. Niha tu biçê kîjan dadgehê, yê ku plan çêkiriye, ji kesê ku bûye amûr zêdetir gumanbar e. Ji ber vê ji bo ku em bikaribin pênaseyeke rast ya erdnigariyê bikin , divê em vê nêzikbûnê derbas bikin.

Mijara sînor jî; niha cihên weke Rojava êrîş hene, teqez divê tu xendekan bikolê û wan gelan biparêzê. Ger pergala cîhanê hemû bizivire konfederalîzmê, mirov dikare tevahî sînoran ji holê rake û çûn û

hatin pir hêsan bibe. Lê îro mirov nikare wisa nêzik bibe. Ger îro tu ji DAİŞ xurtir nebî û gel neparêzî; dê her tişt ji holê rabe. Mantiq çi ye û pêwîstiyên pratîkî çi ne? Divê em van tevlîhev nekin. Tiştên ku em îro bikaribin bikin hene, tiştên ku em sibê û pêşerojê de bikin hene. Hin tişt stratejîk, hinek textîk, hinek jî pratîkî ne; ger ew hemû rast bin, mirov dikare bigêhêje encamê. Ger strateji û fikra te rast be, lê textîk û pratîka te ne rast be; tu nikarê tenê bi strateji encam bigrê. Dijberî vê ger pratîk û textîkê me bi serkeftî be, lê fikir û stratejiya me xirab be; di encamê de em ê biçin cihekî xirab. Bi vê nêzikbûnê, heval van mijaran ji nava hev û din derbixin dê baş bibe.

Ji bo girtina cihên dîtir; em bi awayekî dagirker êrîşî tu cihan nakin. Lê ji bo alîkarî û parastina wan gelan em dikarin alîkar bin û bi hev re bikin. Mesela Serokatî projeya HDP'ê ji bo Enqereyê jî pêş dixe. Ger derfet hebin, bi siyaseta demokratîk; ger derfet tunebin, bi şer jî mirov vê yekê pêş dixe.

Sovyet çima xirab bû? Sedemeke girîng jî, piştî demekê piştgiriya têkoşîna gelan nekir. Nebû alîkarê gelên ku têkoşîna azadiyê dimeşînin, berjewendiyên xwe yên dewletî dan pêş. Ger bûbûya alîkarê gelan, dibe ku temenê wê dirêjtir bûbûya. Ger em sibê li Kurdistanê pergaleke konfederal ava bikin, lê hemû derdorên me şovenîst bin; em nikarin bibêjin, "me alaqadar nake." Divê tu bi rêbazên şoreşgerane bibê alîkarê wan gelan, da ku li van welatan demokrasi pêş bikeve. Niha çima ji Ewropa û Amerîqa ciwan tên û tevlî têkoşîna me dibin? Lewra weke rizgarî dibînin. Ger sibê pêwîstiya wan çêbibe, divê em jî alîkarî bidin.

Nêzikbûna me, ji bo Rojava û Suriye jî wisa ye. Ne li ser esasê dagirkirinê ye. Xelkên wan deran tên gel hevalan û dixwwazin pêk ve cihên xwe rizgar bikin. Ger mirov bi awayekî erenî nêzikî wan gelan bibe, dê sibe pêk ve konfedaralîzma Suriye çêbikin. Ger mirov bibêje, karê min û alaqaya min bi te tune, rast nabe.

Ji bo mijara Mezepotamya; hevalan behs kir, rast e, peyveke Yewnanî ye. Beriya 2 hezar 300 sal hatiye gotin. Dema ku Îskender û Yewnan hatine herêmê, ew nav li Kurdistanê kirin. Tê mahneya welatê di navbera du çeman de. Beşeke Mezepotamya, Kurdistan e. Ango hinek cihên Kurdistanê dikeve navbera herdu çeman (Dîjle û Ferat), lê beşeke girîng jî nakeve navberê herdu çeman. Ji bo vê Kurdistan hemû ne Mezepotamya ye. Lê hinek lêkolînerên erdnigariyê û dîroknas, Kurdistanê qet naxin nava Mezepotamyayê. Dibêjin, "Mezepotamya, tenê

ji navbera Baxda û Baisra re tê gotin.” Dibêjin, “Mezepotamya ya kevn ew der e.”

Lê Serokatî weke “Mezepotamyaya Jorîn, Navîn û Jêrîn” behs dike. Mezepotamya ya Jorîn, Kurdistan e. Mezepotamyaya Navîn, beşek Kurdistan e, beşek jî dikeve Iraq ê. Mezepotamyaya Jêrîn jî, hemû Erebîstan e. Berê jî li wê derê hinek Kurdan jiyan kiriye, lê niha tune. Navekî kevn e, mirov dikare kar bîne, lê ne Kurdî ye.

***-Demografyaya Kurdistanê***

Em derbasî mijara demografyayê dibin. Demografya, têgeheke Yewnanî ye. Demos tê mahneya gel, girafîk di mahneya zevî û erdnigariyê de ye. Dema ku herdu têgeh tên gel hevûdin, dibe demografya û tê mahneya li gorî erdnigariyê bi cihbûna gel. Ew jî zanistek e, 200 salên dawî de zêdetir pêş ketiye. Li ser kîjan erdnigariyê kîjan milet jiyan dike; baweriya wan çi ye, ûslûp û zimanê wan çi ye? Wê lêkolîn dike.

Em jî dixwazin di vê beşe de li ser demografyaya Kurdistanê biaxifin. Gelên ku li Kurdistanê jiyan dikin kî ne? Bawerî û çanda wan çi ye? Em ê li ser vê mijarê bisekinin. Lewra dîrok, erdnigarî û demografya hemû girêdayî hev û din in.

Ew tabloyê ku îro li Kurdistanê heye, ne ezelî ye, ne jî ebedî ye. Divê di serî de em di ferqa wê de bin. Ji roja destpêkê ve ne wisa bûye û ne şert e ku her wisa jî berdewam bike. Mirov dikare bibêje, ew tablo van 200 salên dawî de hatiye avakirin. Beriya wê demografyaya Kurdistanê, ne weke ya îro bûye. Beriya hezar salî cudatir e.

Beriya hezar salî li Anatolyayê Tirk pir kêm bûn, beriya hezar û 500 salî qet tûnebûn. Lê niha miletekî esasî ku li wê herêmê ye. Beriya hezar û 300 salî, tenê heya Başûrê Bexdayê Ereb hebûn. texrîben 200 km başûrê Bexdayê, bajarekî Ereban heye. Weke mîrtiyeke girêdayî Sasaniyan e, lê Ereb in. Ew der sînorê Ereban bûn. Ji wê jortir, di serdema Abasiyan de û di dema ku Îslamiyet pêş ket de, Ereb hatine. Di serdema Ebû Cafer Mansûr de, Bexdayê çêdikin û dikin paytext. Êdî zêdetir Ereb dikevin wan herêman. Lê ev 200 salên dawî piraniya Bexda û Mûsilê jî bûye Ereb. Wisa be demografî hatiye guhertin. Niha Ereb gihêştine, herêmên Sêrt û Mêrdînê. Beriya 300-400 salî li herêma Serhadê gelek Ermen hebûne, lê niha pir kêm in. Berê hinek cihan hejmara wan û ya Kurdan yek bûye.

Ew jî nîşanî me dide ku demografya diguhere; carna bi zor û zextan hatiye guhertin, carna jî bi siyaseta xwezayî hatiye guhertin. An jî bi bûyerên xwezayê hatine guhertin. Mînak gelek eşîr hene, berê li herêmekê dimane, lê niha li gelek herêman bi cih bûne. Şikak wisa ne, Barazî hene, Şêx Bizinî hene; li gelek herêmên Kurdistanê belav bûne. Ev hinek bi sedema siyaseta Osmaniyan wisa bûye, hinek jî bi sedema xele û nexweşiyan wisa bûye. Hindek caran nexweşiyek peyda bûye, dema ku ew nexweşî pêş dikeve, ew eşîr belav kirine. Carna baran nabare û neçar dimînin ku koç bikin.

Berê pir baran û berf dibariye, lê niha kêm bûye; dibêjin, heya salên 70'î li Xinêre havînê jî berf xilas nedibû, lê niha ne wisa ye. Dema ku wisa bûyerên xwezayî rûdane, tevahî eşîret kom dibûye û koçî herêmeke din dikiriye. Ew li ser demografyayê tesîr dike û diguherîne. Siyaseta giştî jî pir tesîr kiriye. Ango dixwazim bibêjim, bila heval bizanibin ku demografya bi gelek sedeman diguhere û demografyaya îro, ne ya 200 sal berê ye. Çima wisa dibêjim, lewra netewe dewlet dixwaze me qaneh bike, da ku em bibêjin, ew tabloyê demografik ji ezel heya ebed wisa ye. Ne wisa ye. Ne ji destpêkê ve wisa ye, ne jî her wisa dimîne. Dê bê guhertin. Divê weke mantiq, di destpêkê de mirov van diyar bike.

Ew erdnigariya ku me weke Kurdistan diyar kir, bi piranî Kurd li ser jiyan dikin. Hinek herêm hene, miletên din pir kêm in, hinek herêman jî zêde ne. Lê erdnigariya Kurdistanê, piranî Kurd lê jiyan dikin. Ji bo vê em bi Kurd destpê bikin. Nufûsê Kurdan çiqas e? Ew gelek caran tê nîqaşkirin. Ew bîst salin, em dibêjin, "em 40 milyon in." Gelo me berê pir nepixandibû, an weke Xoca Nasredîn em niha şerm dikin ku gotinên xwe yên beriya bîst salan biguherînin. Ji Xoca Nasredîn dipirsin û dibêjin, "temenê te çend sal e?" Dibêje, "çil sal e." Piştî deh salan dîsa dipirsin, dîsa dibêje, "çil sal e." Dibêjin, "ma deh sal berê jî çil bû, çawa dibe?" Xoca Nasredîn dibêje, "şerme ku ez axaftina xwe biguherînim." Ya me jî texrîben wisa ye. Di salên 90'î de jî me digot, "40 milyon e, niha jî em dibêjîn 40 milyon e."

Em bi mantiqê nijadperestî nabêjin, weke netew û qewmekê em digirin dest. Texrîben niha Kurd 50 milyon hene. Dibêtiyeke mezin, wê demê 30-35 milyon Kurd hebû, niha jî texrîben 50 milyon heye. Niha em Bakûr 25 milyon, Rojhilat 15 milyon, Başûr 7 milyon û nîv û Rojava jî 3 milyon û nîv hesap bikin; dibe 51 milyon. Herî kêm di navbera 45-50 milyonî de heye. Ger tevgera me bi ser bikeve û em pergala xwe ava bikin, dibe ku em bibin 60 milyon jî. Ji bo wê divê em her weke

Xoca Nasredîn nebêjin 40 milyon. Ne ku em miletên din jî bikin Kurd, lê weke heqîqeteke li ser vê erdnigariyê 50 milyon Kurd heye. Lê tu mafên wan nayen qebûlkirin, divê em vê bidin qebûlkirin.

Taybetmendiyên Kurdan çi ne? Ji milê ziman ve nêrînên cuda hene. Niha di nava tevgera me de hinek kêmasiyên me hene, divê em derbas bikin. Niha li vê derê hevalên Dimilkî, Kurmancî û Soranî diaxifin hene. Li gorî etîmolojî û zimanzanan, hinek derdor zimanê Kurdî weke 5 zaravayan digirin dest. Dibêjin Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Jêrîn, Kirmanckî, Goranî û Lorî ne. Hinek zimanzan jî dibêjin, sê zaravayên Kurdî hene; Kurmancî, Goranî û Lorî digirin dest. Kurmanciya Jêrîn û Jorîn weke yek zaravayî hesap dikin. Goranî jî; weke Hewremî û Dimilkî digirin dest. Lor û kelhûrî, Lek ûhwd jî dixin nava Lorî. Lê bi piranî dîroknas û zimanzanên Kurd jî dibêjin çar zarave ne; Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Jêrîn, Kirmanckî û Goranî. Piranî ew tê esas girtin. Em jî heya niha zêdetir vê esas digirin. Lê pir ne durî hev in. Tesnîfkirin hinek diguhere, lê nêzikbûn yek e.

Tiştê ku ez dixwazim, em di vê derê de têbigêhêjin, divê em zimanê xwe bizanibin û weke xwe nêzikî bibin. Ne weke nêzikbûna hinekên ku dixwazin hin tiştan bi me bidin daqûrtandin…

Li gorî zimanzanên ku çar zaravayan esas digirin; Kurmanciya Jorîn, çend herêmên wê hene. Botan, Mêrdîn, Serhad, Tolhildan (Güney-Bati), Colemerg-Behdînan, Herêma Şikakî-Celalî heye. Li gorî van herêman devokên cûda tên karanîn, lê ew bi serê xwe ne zarava ne, devok in. Mînak hin hevokên Botanê cûda ne, yên Mêrdînê cûda ne.

Li Başûrê Kurdistanê, Kûrmanciya Jorîn, li herêma Dûhokê jî tê axaftin. Dûhok, Akre, Amediye bi hevok û zaravaya Kurmanciya Jorîn diaxifin. Dibêjin devoka Behdînî. Zaxo jî, bi Kurmanciya Jorîn diaxife, lê ne Behdînî ye, Botanî ye. Axaftina Zaxo weke Sîlopî û Cîzra Botan e. Bala hevalan kişandibe, carna di navbera du gundan de jî cudabûn derdikevin, lê bi gelemperî nêzikî hev in. Herêma Şêxan û Şengalê, bi Kurmanciya jorîn diaxifin, lê bi devoka Mêrdînî diaxifin. Hevalên ku miletê me ye Êzîdî guhdar kiribin dizanin. Axaftina wan dişibe herêma Mêrdîn û Elihê. Li Başûrê Kurdistanê, ew bajarên ku min behskirin, bi Kurmanciya Jorîn diaxifin.

Li Rojavayê Kurdistan, hemû Kurdên wir bi Kurmanciya Jorîn diaxifin. Lê ew jî hemû ne wek hev in. Herêma Derîk û derdora wê, bi devoka Botanê diaxifin. Herêma Qamişlo û Serekaniyê, bi devoka Mêrdînê diaxifin. Herêma Kobanê, weke Riha diaxifin. Herêma Efrînê

û derdorên wê, weke Herêma Tolhildan diaxifin. Ango li Rojavayê Kurdistanê, çar devok hene. Bes yek zarava ye.

Li Bakûrê Kurdistan, bi piranî Kurmanciya jorîn diaxifin. Herêma Dîlok, Semsûr û Gurgumê hinekî nêzikî hev û din diaxifin. Heval carna henekan dikin û dibêjin, “ew Kurmancî neaxifin.” Ew nêzikbûn ne rast e, lewra her herêmekê taybetmendiyên wê hene. Niha jî bernameyên wan çêdibin, ez guhdarî dikim. Hinek extiyarên wê herêmê derketibûn, kêmek zehmetî dikişandin, lê Kurdiyeke xweş diaxifîn. Bes yên ciwan, an bûne Tirk, an jî pir Tirkî ketiye nav axaftina wan.

Ji Riha, heya Bakûrê Amedê, axaftina wan nêzikî hev in. Ji Başûrê Amedê, heya Mêrdîn û Elihê nêzikî hev in. Jorî Amedê, heya Çewlîk û wan deran, axaftina wan nêzikî hev e. Zêdetir “z” dikeve nav axaftina wan. Milê Wan û Serhadê axaftina wan nêzikî hev e. Başûrê Wan û Colemergê weke hev diaxifin. Li Bakûrê Kurdistanê, 6-7 devokên cûda yên zaravaya Kurmanciya Jorîn hene.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî; ji Ûrmiye û jortir, li derdorê Ûrimeye, Xoy, Mako û Salmasê wan deran zaravaya Kurmanciya Jorîn tê şixûlandin. Ji Ûrmiyê jêrtir, zaravaya Kurmanciya Jêrîn tê axaftin. Milê Ûrmiye, devoka wan nêzikî herêma Wan û Colemergê ye. Lê milê Mako, weke herêma Serhadê ye.

Mirov dikare ji bo zaravaya Kurmancî Jorîn vê bibêje. Di nava Kurmanciya Jorîn de, metî û nêrî heye. Di axaftinê de xîtaba jin û mer cuda ye. Mînak tu dibêjê “hevala Rojîn, hevalê Cîhat.” Ew taybetmendiyeke Kurmanciya jorîn e. Beşeke mezin ya Kurdistanê, bi texrîben nîvî zêdetir bi Kurmanciya Jorîn diaxife. Li Îranê, Kurdên herêma Xorasanê jî bi Kurmanciya jorîn diaxifin. Xorasan, li rojhilatê Îran e.

Em ê derbasî Kurmanciya Jêrîn bibin. Çima dibêjin, Kurmanciya jorîn û Jêrîn? Ger li ser nexşereyê jî heval lê binêrin; cihên ku dikevin aliyê Bakûr, an jî cihên ku dikevin aliyê jor yên Kurdistanê, bi Kurmanciya Jorîn diaxifin. Ji aliyê erdnigariyê ve hemû cihên ku dikevin milê Bakûrê welat, Kurmanciya jorîn diaxifin. Em li gorî nexşeya siyasî nabêjin Bakûr, li gorî erdnigariyê Bakûr digirin dest. An na li gorî nexşeya siyasî Bakûrê Kurdistanê, parçeyê Bakûr re tê gotin. Ger mirov bi erdnigariyê temaşe bike, Efrîn, Dîlok, Semsûr, Gurgum, Meletî û wan deran dibin Rojavayê Kurdistanê. Jixwe berê me digot, “Herêma Gûney-bati.” Ji aliyê erdnigariyê ve ji ber ku piraniya Bakûr, an jî jorê Kurdistanê bi vê zaravayê diaxifin, gotine Kurmanciya Jorîn.

Aliyê rojhilat û başûr jî, dibin Kurmanciya Jêrîn. Hinek zimanzan jî, vê herêmê re dibêjin, Kurmanciya Navîn, lê bi piranî dibêjin Kur-

manciya Jêrîn. Li Rojhilatê Kurdistanê, du herêmên berfireh yên Kurmanciya Jêrîn diaxifin hene; yek herêma Mûkriyan e. Ji Mahabad, Bokan destpê dike, heya Şino, Piranşar û Serdeşt diçe.

Niha hevalên me ji bo wê devokê dibêjin Soranî, lê ew ne Soran in, Mûkriyanî ne. Lê em wisa fêr bûne. Çima wisa bûye?. Li Başûrê Kurdistanê, xeynî cihê Behdînan yên din Kurmanciya Jêrîn (Soranî) diaxifin. Dema ku ji Rojhilat û Bakûr yek dîtin û fêmkirine ku Kurmanciya Jorîn neaxife, gotine ew Soran e. Lê li Rojhilat ne wisa ye, dibêjin ew Mûkriyanî ne. Yekî Şikakî, ji bo yekî Kurmanciya Jêrîn diaxife dibêje, Mûkriyanî, nabêjin Soranî. Dijberî wê, li Başûr dema ku yên Soranî diaxifin, yekî bi Kurmanciya Jorîn diaxife dibînin, dibêjin "tu Behdînî yê?" Li Rojhilat jî, yekî Kurmanciya Jêrîn diaxife, dema ku yekî Kurmanciya Jorîn diaxife dibîne dibêje, "tu Şikakê?" Wisa fêm dike ku hemû Kurmanciya Jorîn Şikakî ne.

Bi kurtasî li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê, yên bi Kurmanciya Jêrîn diaxifin re, an dibêjin Mûkrî, an jî dibêjin Soran. Yên bi Kurmanciya Jorîn diaxifin re jî, an dibêjin Behdînî, an jî dibêjin Şikakî. Ew beriya 40-50 sal berê wisa bûye, hê jî bandora wê heye. Sedemek ew e.

Sedemeke siyasî jî heye. Di salên 1920'an de li Başûrê Kurdistanê tevgera Kurd pir zêde derket pêş. Bi taybetî piştî salên 1950'î, tevgerên Kurd li Kurdistanê, herî zêde li Başûr hebûn. Başûr jî, piştî salên 1974'an herî zêde şerê Barzanî û Talabanî çêbû. Bi şerê Soran û Behdînî, şerê hev û din kirin. Êdî dema ku ji parçeyên din jî hatin Başûr, fêrî Soran û Behdînî bûn. Tevgera me jî di destpêkê de di nava Kurmancan de pêş ket, hinek jî Dimilkî dizanî. Dema ku hat Başûr, li nêzikî herêmên Soranan, di çiyan de bi cih bû. Dema ku hevalên me jî yên ku Kurmanciya Jêrîn diaxifin dîtin, wan jî gotin Soran in. Êdî bandora siyasî, ji bandora civakî û çandî derbas kir.

Divê ew bê rastkirin. Dibe ku heval nakin pirsgirek, lê ji milê wejeyî û zimanî ve ne rast e. Niha tu biçe herêma Mahabad û Sinê û bibêjê, "tu Soranî." Dê bibêje "na." Bes hevalên me wisa fêr bûne. Hineke herêm nakin pirsgirek, lê hinek herêm dikin pirsgirek. Yek jî ziman parçe dike. Dema tu dibêjê, Kurmanc û Soran tu parçe dikî. Lê tu bibêjê Kurmanciya Jorîn û Jêrîn cuda dibe. Dibe ku niyeta te ya parçekirinê tune be, lê parçe dibe. Ji bo wê dijmin dibêje, hûn ne yek in. Min xwest ez hinekî vê îzah bikim. Divê bê sererastkirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê, herêmên ku Kurmanciya Jêrîn diaxifin, yek herêma Mûkriyan e. Yek jî herêma Erdelan e. Navenda wê Sîne ye, heya milê Saqiz, Merîvan û Bane wan diçe. Bakûr û rojavayê Sînê re

dibêjin herêma Erdelanî. Dema ku mirov berv bi sînorê Başûr ve tê, ji Rojavayê Kirmenşan devokekî din heye, hinek dibêjin Cafî, hinek jî dibêjin Germiyanî. Ji ber ku piraniya eşîra Caf li wê derê jiyan dike, dibêjin Cafî. Bi piranî Cafî û Germiyanî bi vê devokê diaxifin. Li milê Ciwanro, hinek derdor bi vê devokê diaxifin. Ciwanro jî dikeve milê başûrê rojhilatê Sûleymaniyê. Ew bi Cafî, ango Germiyanî diaxifin.

Li Başûrê Kurdistanê jî herêma Germiyan bi vê devokê diaxifin. Herêma Germiyan, berê ji Kelar, Kerkûk, Kifrî, Xûrmatu, Çemçemal û Xeneqînê pêk dihat. Celewle û Sadiye jî dikevin nava vê herêmê. Niha hinek kes Kerkûkê cuda dikin, lê heman devokê diaxife. Bes hemû bi Kurmanciya Jêrîn neaxifin. Kêlar, Kifrîn, Xûrmatu, û Çemçemal bi Kurmanciya Jêrîn diaxifin. Bi devokê Cafî, an jî Germiyanî diaxifin. Xeneqîn wan cuda diaxifin. Li Başûrê Kurdistan, derveyî herêma Germiyan, herêma Sûleymaniyê heye. Axaftina Sûleymaniyê re hinek dibêjin, devoka Sûleymaniyê, hinek jî dibêjin Babanî. Li derdora Sûleymaniyê, heya Helepçe, Pencewîn, Karadax, Dûkan û Qaladizê bi devoka Babanî diaxifin. Ji Ranya û vir ve, Çoman, Rewanduz, Soran, Şaqlawa, Hewlêr jî dikeve nava herêma Soran. Bi Kurmanciya Jêrîn diaxifin, lê bi devoka Soranî ye.

Penc devokên Kurmanciya Jêrîn hene. Ew jî li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ye. Jixwe li Bakûr û Rojavayê Kurdistanê Kurmanciya Jêrîn tune ye.

Ji bo Kirmanckî; zimanzanên Kurd, Hewremî û Dimilkî weke Kirmanckî digirin dest. Li mintiqaya Hewreman, ji wan re dibêjin zimanê Maço. Dimilî, li Bakûrê Kurdistanê hene. Li herêma Dersîm, beşeke Çewlîgê û herêma Xerpetê ne. Zaravaya vê herêmê tê axaftin re hinek dibêjin Kirmanckî, hinek jî dibêjin Dimilî. Li Bakûrê Kurdistanê û Tirkiye ew zarava hatiye biçûkirin. Dibêjin Zaza, em jî fêrbûne wisa dibêjin. Gotina “Zaza” ji bo biçûk xistinê ye. Di zaravayê Dimilî de “Z” pir tê şixûlandin. Hevalên ku li Başûr jiyan kirine dizanin, dema ku ew siyaseta herêmî li Başûr pêş dixistin, çawa ku henekên xwe bi Behdînî dikirin? Digotin, “van her Veve dibêjin.” Di dema şerê YNK û PDK’ê de ew henek dihat kirin. Li herêmên Kurmanciya Jorîn jî bi rengekî din henek dikirin. Li Bakûr jî nêzikbûneke bi vî rengî heye. Hem Kurmanc, hem jî Tirk wisa nêzik bûne. Niha weke xwezayî qebûl dikin ku Zaza ne, weke nasnameyeke lê hatiye. Em vê peyvê nedin şixûlandin baş e. Ji aliyê wêje û zimanzaniyê ve ne rast e.

Hewremanî, yên ku kar tînin bi vê zaravayê re dibêjin Maço. Hewreman bi vê devokê diaxifin. Devokeke nêzikî Dimilî ye. Li

Başûrê Kurdistan Şêxanî hene, Zegne, Kakaî hene, Şebek hene. Zaravayê wan eslî Maço ye. Şebek li herêma Mûsilê hene, texrîben nêzikî 200 hezarî hene. Niha hinek kêm bûne, hinek jî Ereban tesîr li ser wan kiriye. Zaravayê wan weke Hewremanî ye. Kakaî, di navbera Mûsil û Hewlêrê de jiyan dikin, 6-7 gundên wan hene. Li Kerkûkê jiyan dikin, li milê Tavûk jiyan dikin. Niha navendeke hevalên me jî nêzikî wan, bi cih bûye. Lê hêdî bi hêdî zimanê wan dizivire Kurmanciya Jêrîn. Lê beşeke girîng jî devoka xwe ji bîr nekirine. Di nava xwe de diaxifin. Li Germiyan jî hinek Kakaî û Zegne hene. Kakaî, li Helepçê jî hene. Li Helepçe gundekî bi navê Hawar heye, ew der navendeke pîroz ya Kakaiyan e.

Beşeke zêde ya Hewremiyan jî li Rojhilatê Kurdistanê ne. Beşa kêmtir li Başûrê Kurdistanê ye. Yek xete, lê parçe kirine. Li mintiqaya Pawo, Newsûd û wan deran jiyan dikin. Li mintiqaya Xûrmal, Bîhara, Tevala û Komala Gund hene. Bi vî rengî hem li Rojhilat, hem jî li Başûr zaravayê Hewremî heye. Li Bakûr jî zaravayê Dimilkî heye. Herdu pêk ve Kirmanckî ne. Li mintiqaya Haymana, nêzikî Enqereyê jî hewramî hene. Ew jî ji eşîreta Şêx Bizinî ne. Şêx Bizinî, li herêma Kerkûk jiyan dikin, lê niha piraniya wan bi Kurmanciya Jêrîn diaxifin. Lê yên ku çûne Enqereyê zimanê xwe parastine. Texrîben beriya 250-300 salî çûne wir. Hinek li milê Riha mane û yên din jî çûne Haymanayê. Yên Riha jî bûne Kurmanc. Hinek nivîskar, Hewremî weke Goranî hesap dikin. Lê bi piranî Hewremî û Dimilkî di nava zaravaya Kirmanckî de hesap dikin.

Goranî jî, çend devokên wê hene. Lorî devokeke Goranî ye. Kelhorî, Lekî, Mamesenî jî devokên goranî ne. Bi piranî li Rojhilatê Kurdistanê ne. Li herêma Kirmanşan, heya Îlam beşeke zêde Kelhûrî ne. Milê Lorîstan ve hinek Kelhorî hene. Li herêma Loristan, Lor hene. Başûrê wê Mamesenî hene. Ew hersê ûstanên derdora Loristan bi zaravaya Goranî diaxifin. Li Başûrê Kurdistanê jî, Xeneqîn, Mendelî, Bedre, Cesan, ew Kurdên ku berê ve çûne Bexde (Kurdên Feîlî) bi zaravayê Goranî, devoka Kelhorî diaxifin. Zaravayê Goranî, zaravayekî nazik e. Hevalên bi Kurmanciya Jorîn diaxifin, ji bo Kurmanciya Jêrîn dibêjin nazik e. Lê hevalên Goran zêdetir nazik in. Ji bo vê, dema ku di Kurmanciya Jêrîn de yek stranan dibêje, pê re dibêjin Goran e. Lewra pir nazik e. Axaftina wan bi awaz e.

Di Hewremî de nêrtî û mêtî heye. Lê di Kurmanciya Jêrîn de nêr û mê tune. Ew jî dibe sedem ku hinek bibêjin, zimanê Kurdî du ziman in. Lewra dibêjin meseleya nêrtî û mêtiyê, meseleya ziman e, ne meseleya

zaravayan e. Hinek jî dibêjin, ne bi wî rengî ye. Ger çêkirina hevokan nêzikî hev bin û ji aliyê çandî ve nêzikî hev bin, dibe zimanek. Dibêjin, ger kokê gelek peyvan bê girtin; di Kurmanciya Jorîn û Jêrîn de, di Goranî de gelek peyv weke hev in. Ji sedî 50-60 wekhevîbûn heye, hinek jî cudabûn heye. Ji ber erdnigariyê, di devok û zaravayan de guhertin çêdibe. Ger mirov bi awayekî fonetik guhdarî bike, mirov hev û din fêm dike. Weke hevok û peyv, piraniya zaravayên Kurdî weke hev in.

Weke kevn bûn, li gorî zimanzaniyê; zaravayê herî kevn yê Kurdî, zaravaya Kirmanckî û devoka Hewremî ye. Çawa tê zanîn? Yek gelek peyvên kevn hene, di wê derê de hatiye parastin. Ya duduyan, dema ku behsa malbatên ziman tê kirin, dibêjin zimanê Kurdî beşek ji zimanê Aryenî ye. An jî dibêjin Hînt-Ewropî. Serokatî peyva Hînt-Ewropî rexne dike. Peyva Aryenî û Arî rastir e. Ew jî niha bûye çend beş. Latîn heye, Îranî heye, Hîndî heye. Ew 5-6 malbat in. Kurd ji malbata Îranî tê hesap kirin. Jixwe Îranî jî, ji Arî hatiye. Di nava wê de Belûcî heye, Farsî heye, Eşkenî heye, Azerî heye, Kurdî heye, Peştûnî û Ordînî heye. Azerî îro weke ziman bûye Tirkî, lê berê ne Tirk bûn. Em û ew dotmam û pismamên hev in. Di bin wê de jî êdî zarava çêdibin.

Di nava ew malbatên Îranî de beriya 2000 salî, zimanê ku herî zêde pê dihate axaftin Pehlewiya Kevn e. Ew Pehlewiya Kevn ku Zend Awesta jî pê hatiye nivîsandin, herî zêde nêzikî Kirmanckî (Dimilkî-Hewremanî) ye. Faris dibêjin, “pehlewîtî ya me ye.” Zimanzan dibêjin, “Pehlewîtî zimanekî giştî ye, lê îro zaravayên ku herî zêde nêzikî Pehlewîtî, Kirmanckî ye.”

Jixwe dem, siyaset û civak li ser ziman tesîr dike. Bi demê re li gorî lêkolînan, êdî Kurmanciya Jorîn jî beriya hezar salî hêdî bi hêdî formûl bûye. Piştî wê bi çend sed salan Kurmanciya Jêrîn jî pêş ketiye. Jixwe wêjeya wê jî, di destpêkê de Hewremî ye, pişt re Kurmanciya Jorîn e, pişt re Kurmanciya Jêrîne. Bi vî rengî pêş ketine.

…: Weke giştî di zimanê Kurdî de meza û nêrza heye, lê hevalan gotin, “di Kurmanciya Jêrîn de mêtî û nêrtî tune.” Sedema vê çi ye?

**H. Helmet:** Zimanê Kurdî bi giştî ne wisa ye; mesela di Goranî û Kurmanciya Jêrîn de mêtî û nertî tune. Ango di hinekan de heye, di hinekan de tune. Sedema wê nizanim. Di giştî zimanên cîhanê de; hinekan de heye, hinekan de tune ye. Agahiyeke teqez tune, lê weke şîrove dikarim vê yekê bibêjim; dibêjin, di nava xwezayê de ner û mê heye, ji bo wê çêbûye. Hinek jî dibêjin, ji ber ku ner û mê zimanê serdestan e, wisa çêbûye. Lê qaneat û agahiyeke teqez tune. Yên Kurdî de

jî di du zaravayan de (Kurmanciya Jorîn û Kirmanckî) nertî û mêtî heye, di du zaravayan de (Kurmanciya jêrîn û Goranî) tune. Ji bo wê hinek dibêjin, ew ne zarava ne, du zimanên cuda ne. Lê em wisa nagrin dest.

…: Ji bo vê mijarê, dibêjin zimanê ku mêtî û nertî tê de hebe, dewlemend e. Di zimanên kevnar de bi piranî nêrzatî û mêzatî heye. Niha dema ku em hemû berhemên wêjeyî yên Kurdî mezî dikin jî, bi zaravayê Kurmanciya Jorîn û Kirmanckî ne. Lê Kurmanciya Jêrîn û Goranî di van 400-500 salên dawî de pêş ketine. Ji bo vê nêrzatî û mêzatî tê de tune. Ez dibêjim, dibe ku sedemek ew be. Ya duyemîn jî, erdnigariya ku Kurmanciya Jêrîn lê tê axaftin zêdetir deşt e. An jî çiya û bilindiya wê kêmtir e. Dibe ku bandora vê jî hebe û şêwegirtina ziman de rista vê jî hebe.

…: Gundêkî ku Dimilî diaxifin, li Efrînê jî heye, dibêjin ji Bakûr hatine. Jixwe wî gundî re jî dibêjin, “Gundê Dimilî.” Beriya vê bi hezaran salan hatine Efrînê. Dibêjin, şer kirine û koçî Kobanê bûne, pişt re hatine Efrînê. Dibêjin, “em Dimilî ne.” Lê zimanê Dimilkî neaxifin.

…: Me cara yekemîn Kurmanciya Jorîn û Jêrîn bihîst. Di nava gel de jî qet nehatiye bihîstin. Xweş hate pênasekirin. Serokatî jî, behsa Erebên Bedewî, Tirkmen û Kurmancan dike. Weke derdorên ku bajariyê nas nakin û li hemberî şaristaniye ber xwe didin, pênase dike. Ji hev derxistina van, em ê çawa bikin? Ya duyemîn, di navbera rewşenbîrên Kurd de, tam hevkirinek li ser rêzimanê Kurdî tune.

li Amedê konferansek çêbû, encamek jê derneket. Vê dawiyê jî encameke xirabtir derket. Alfebeya Latînî, weke alfabeya Kemalîst bi nav kirin; kêsên weke Şêrko Bêkes jî, weke hinekan diyar kirin. Di mejiyê mirov de nakokiyan çêdike. Di tu zimanan de sadebûn û xwerûbûn tune. Lê gelek tişt hene, divê bên lêkolînkirin. Hê jî di van mijaran de me nikariye xwe zelal bikin.

…: Em dibêjin, bêvan peyv bi falan zimanî ye. Em vê yekê ji ku dizanin, pîvana vê çi ye? Em carna bi xwesteka xwe, hin peyvên biyanî kar tînin, mirov dikare wan bike malê zimanê xwe. Her wiha guhertinên ku di ziman de çêdibin, kîjan rast in?

…: Ji bo Kurmanciya Jêrîn dibêjin, Soranî. Têkiliya wê bi mîrtiya Soran re heye, an na?

…: Li gel me tiştek heye, dixwazim parve bikim. Gotina Soranî li gel me naye karanîn. Ji bo kesên bi zimanê Soranî diaxifin, dibêjin “Kake.” Nizanim ji ku tê. Yek jî dibêjin, beriya 200 salî li milê Celali-

yan, Makû wan deran gelek Kurd koçber bûne û çûne milê Xorasanê. Hinek Kurd li wî milî hene, ji wan re dibêjin Qoçanî, sedema vê çi ye?

…: Van peyvên weke Qoçanî, Kake ûhwd zêdetir pênaseyên derdorê ne. An peyveke ku di wî zimanî de pir derbas dibe, an jî bi tîpeke ku di wî zimanî de derbas dibe wî zimanî pênase dikin.

…: Di ziman de, hin tişt heya dawiyê mayinde namînin. hevalan behsa Ehmedê Xanî kirin, niha em nivîsên wî bixwînin, dibe ku em yek jî jê fêm nekin. berê digotin, Bohtan, lê niha dibêjin Botan. Cih, dibe cî. Hêdî hêdî tîpa H winda dibe. Kurdî jî weke zimanên din, bi demê re tê guhertin. Di nava van zaravayan de jî ya ku nûjen û pêşketî ye, Kurmanciya Jêrîn e. Hevalan jî pirs kir û gotin, dê em ê çawa peyveke bikin malê gelekî. Ger gel kar tîne û kêrî wan tê, mirov dikare bipêjirîne. Lê em carna hin tiştên ku di zimanên din de resen in, li gorî xwe diguherînin. Mesela televizyon, kesê ku çêkiriye nav lê kiriye, pêwîst nake ku em biguherînin. Mesela heval ji kumanda re dibêjin, “dûrkeş.” Wisa nabe. Hin tişt jî di Kurdî de hene û di zimanên din de tune, mînak teşî heye. Îngîlîz nikarin li gorî xwe navekî lê bikin.

Em jî hinek peyvan li gorî xwe bi nav dikin û dibêjin bi Kurdî ye. Divê mirov reseniya hinek tiştan winda neke û peyvên mirov girtine jî mahneyeke xwe hebe. An na her zimanek ji derdora xwe bandor dibe. Carna ew dihêle ku ziman jî xirab bibe. Zimanzanên me jî nayen gel hev û pîvanekek hevpar nadin rûnişkandin. Li ser zaraveyên Kurdî naye sekinandin. Di navbera wan de jî nakokî hene. Divê xwe berpirsyar bibînin, da ku lêkolîneke berfireh bikin û xebateke hevkar derkeve.

…: Li ser navê netewbûnê, nêzikatiyeke me ya şaş heye. Hem zarava, hem jî devokên Kurdî yên kêmar, divê neyên ji bîrkirin. Divê xebatên taybet bên pêş xistin. Lewra ew jî dewlemendiyên zimanê Kurdî ne.

…: Li ser dewlemendiya zimanê Kurdî, ez dixwazim hin tiştan bibêjim. Her hevokeke ku em bigirin dest, çîrok û bûyereke wê heye. Mînak, peyva Lek heye. Di dema Selçûkiyan de êrîş tên ser herêma Kirmanşanê, heya wê demê xwe bi xwe bi rê ve dibe. Lê li hemberî êrîşan Lor û Kurmancên wê derê yekîtiya xwe çêdikin û xwe weke Lek bi nav dikin. Ew nav ji kurtkirina Lor û Kurmanc hatiye. Bi vî rengî ew ziviriye zimanekî û heya niha jî Lek, weke zimanekî di navbera Lor û Kurmancan de li Kirmanşanê jiyan dike.

Dîsa di dema ku Safewî êrîşî Kêla Dimdimê dike, di navbera eşîrên Kurd yên wê herêmê de yekîtiyek çêdibe. Navê Biradost, wê demê derdikeve holê. An na ne navê eşîrekê ye. Niha wisa bûye. Wê

demê Emîrxan dibêje, “ji ber ku em hemû Kurd in, em birayên hev in; ji ber ku dijminê me jî yek e, em dostên hev in.” Bi vî rengî navê Biradostan pêş dikeve. Niha hem li herêma Xinêre-Xakûrkê hene, hem jî li Rojhilat hene.

Peyva Kurmanc jî, serboriyeke xwe ya bi vî rengî heye. Yek dibêjin ji ber ku di armanca xwe de pir kor bûne, ji wan re gotine, “Kor armanc û bûye Kurmanc.” Yek jî dibêjin, di dema Medan û êrîşên Kyros de, yekîtiya Kurtî û Mad- Mag’an çêbûye. Ji wan re gotine, Kurdmang û bi demê re bûye Kurmanc. Peyva dijwar, jin, Zagros ûhwd jî wisa ne.

…: Niha ger ji 31 hezar nebatên cîhanê, 16 hezar di welatê me de hebin, divê ew dewlemendî li ser ziman û çanda me jî bike. Her wiha ez nizanim, li welatekî din û di heman erdnigariyê de gelekî ku bi du, an jî zêdetir zimanan diaxife heye. Ew jî dewlemendiya zimanê me ye. Li ser navê yekîtiya ziman, hinek dewlemendî tepisandin çiqasa rast e?

**H. Helmet:** Di mijara Kurmanc de, bi giştî agahî û lêkolînên me kêm in. Yek jî em herêma xwe jî nas nakin, divê bi giştî lêkolîn bên kirin. Serokatî mînaka Ereb, Tirk, Faris û Kurdan dide. Dibêje, “piştî serdema Îslamê, di nava gelan de cudabûnek çêdibe. Yên ku têkilî deshilatdariyê dibin, navekî lê dikin, yên derveyî deshilatdariyê dimînin jî bi awayekî din tên bi navkirin.” li Tirkiye, yên ku deshilat re dibêjin, Tirk; lê yên din re dibêjin Tirkmen. Li Kurdistanê, yên nêzikî deshilatdariyê ne Kurd in, yên din Kurmanc in.

Di Êzîdiyan de axaftinek heye, dibêjin, “em Kurmanc in, bes ne Kurd in. Kurd, ew kesên ku çûne gel Îslamê ne.” Heya îro jî Êzîdî vî tiştî dibêjin. Ango ziman yek e, lê qarekterê civakî cuda ye. Di nave Ereban de jî, xelkên gundî û eşîr re zêdetir dibêjin Bedewî. Em bînin ser Kurmanciya Jorîn û Jêrîn; li Hewlêrê jî, ji xelkên ku çûne gund re dibêjin, Kurmanc; lê yên ku çûne bajêr re dibêjin Kurd. Li Sûleymaniyê jî, peyva Kurd û Goran tê karanîn. Yên ku koçer mane, ji xwe re dibêjin em Kurd in. Cafî pir dibêjin. Lê yên ku çûne nava bajêr rûniştine re dibêjin Goran in. Ango dev ji Kurdbûna xwe berdane.

Ango li her herêmeke ew qarekter bi rengekî heye, Serokatî giştî dike.Babanî dibêjin, “heya beriya 200 sal jî, em Kurmanc bûne.” Belgeyên wan jî hene. Kurmanciya Jêrîn û Jorîn jî, li gorî wêjeyê, ew sed sale hatiye pêş xistin. Li gorî hin pîvanan tasnîf kirin e. An na hemû Kurmanc in. Ew yek zêdetir, lêkolînê pêwîst dike. Lewra em zêdetir dûrî rastiya xwe dikevin. Me kokê xwe bîr kiriye, em dibin biyaniya hin rastiyên xwe.

Ji bo pirsa Soran, rast e, ji ber ku ew herêm di destê Mîrê Soran de bûye, gotine Herêma Soran. Tesîra wê heye. Zimanê wan jî Kurmanciya Jêrîn e, lê pê re dibêjin devoka Soranî.

Ji bo nivîsandinê, divê em nêzikbûneke rast pêş bixin. Bi nêzikbûna netewe dewletê ziman çêkirine. Netewa demokratîk bi biryaran zimanan çênake. Dibe ku ew bibe malê civakê jî, lê xwezaya ziman û civakê ne ew e.  li vê derê em li ser hevalan tu zextan nakin, lê heval bi demê re devoka xwe û zimanê herêma xwe bîr dikin. Ne ku tevahî tê bîrkirin, lê ji ber pêwîstiyan diguhere. Lewra mirov dixwaze hev û din fêm bike.

Bi giştî jî ziman ji hev û din bandor dibin, bi demê re ji hev û din tiştan digirin. Ew xwezayî ye, lê divê mûhendisiya civakî tê de tune be. Ger xwezayî be û li gorî pêwîstiyan be tiştek nabe. Carna jî hin hevok tên bîrkirin, ew jî xwezayî çêdibe. Bi vî awayî di ziman de guhertin çêdibe. Di netewa demokratîk de, tiştê ku tê xwestin ew e; dijminê me, em ew qesa ji hev û din dûrxistine, ji ber vê em hev û din fêm nakin. Beriya 100-200 salî ne wisa bûye. Hatin û çûyin jî pir zêde ye. Lê bi sînor û hev qetandinê nehiliştiye ku çûn û hatin çêbe. Ew tesîra xwe li ser ziman jî dike. Kalikê min, Tirkiya Osmaniyan jî fêm dikir. Lewra dikarîn biçin û bên.

Nifşên piştî 1920'an çêbûne, li gorî netewe dewletê şêwe girtine. Zimanê wan jî teng maye û ji hev û din dûr ketine. Lê niha em careke din tên gel hev û din. Her cihên Kurdistanê em bi hev re têkilî datînin. Lê di bin navê yekbûyinê de, em bi biryar zimanekî çênakin.

3-4 caran konferans jî çêbû. Li Başûr hinek kes hebûn; Şêrko Bêkes, ji me hez dike, lê aqlekî nijadperest heye. Jixwe miriye. Li gorî wî, divê her kes bi Kurmanciya Jêrîn û devoka Sûleymaniyê  biaxife. Li gorî wan, wêjeya esasî ya Sûleymaniyê ye, wan pêşêngî kiriye û divê her kes jî bi vî zimanî biaxife. Yên vê naxwazin jî, qaşo naxwazin netewiyet çêbe. Hin rewşenbîrên wisa difikirin hebûn. Ew şaş e. Hinek rewşenbîrên  Bakûrî jî hebûn. Digotin, "Kurmanciya Jorîn zêdetir e, divê her kes bi vê zaravayê biaxife û binivisîne." Jixwe şerê hev kirin, weke tevger me mûdaxale kir. Ji ber vê, divê em jî wisa nefikirin. Divê em nebêjin, ew zêde ye, ew pêşketî ye û nizanim çi. Ziman wisa naye pênasekirin.

Ji bo tîpan jî wisa ye. Rast e, weke dîrok mirov lê mezî bike; Kurdan heya 2 hezar û 700 salî bi Aramî (Pehlewî) nivîsandiye. Ew tîpên ku heval behs dikin jî, Aramî ye. Baba Tahîrî Ûryanî, Marîfetname, Mishefa Reş, Meleyê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şerefxanê Bîdlîsî…

hemûyan bi wê nivîsandiye. Di heman zaravayan de bi van tîpan nivîsandine. Ew hezar sal e, wêjeya Kurdî hatiye nivîsandin; her bi vî rengî hatiye nivîsandin. Ger mirov dîrok û ûmir hesap bike, ew esas e.

Piştî salên 1931'an Latînî pêş ket. Di sala 1928'an de li Tirkiye qanûna alfeya latînî derket. Di sala 1931'an de jî Celadet Bedîrxan, Tewfîq wehbî, Cemal Nebez wan, komek nivîskar hem ji bo Kurmanciya Jorîn, hem jî ji bo Kurmanciya Jêrîn tîpên Latînî çêkirin. Ew heftî sale, bi tîpên Latînî Kurdî tê nivîsandin. Di 31'an de dest bi perwerdeya wê kirine. Tevahî Bakûr û Rojava, tîpên Latînî piştî salên 40-50'î belav bûye. Li Başûr kêm belav bûye, li Rojhilat qet nehatiye karanîn. Li Rojava komek kesên weke Cîgerxwîn, Osman Sebrî,Nurî dêrsîmî, Nuredîn Zaza ew berdewam kirin. Bi tîpên Latînî wêjeya Kurdî pêş xistin. Li Bakûr jixwe Kurdî tune bû. Bi tîpên Latînî fêrî Tirkî bûn, bi riya Celadet û Kamûran Bedîrxan wan hinek fêrî Kurdî bûn. Tevgera me jî bi wê dest pê kir. Lewra tevgera me li Bakûr dest pê kir, li Rojava berdewam kir.

Niha hem tevgera me, hem xelkê meye Bakûr, hem jî xelkê me yê Rojava bi Latînî dinivisînin, wêjeyeke wê jî çêbûye. Mirov nikare vê înkar bike û bi mantiqeke teşîrkirinê nêzik bibe. Rast e, di sedsala 20'emîn de digotin, "li hemberî paşverûtiya Xîlafetê, divê em bibin Rojavayî." Mistefa Kemal, ji bo bibe Rojavayî, tîpên Latînî pêş xistin, şepqe anî, cil û berg guhertin. Hinek rewşenbîrên me jî ketin bin wê tesîrê. Lê niha bûye beşeke rastiya civaka me. Ger mirov bi peyvên weke "tu Kemalîstî, tu paşverûyî" hev û din teşîr bike, rast nabe. Jixwe wisa şer kiribûn. Weke tevger me nêzikbûneke wisa pêş xist; me got, "ziman bi biryaran çênabe, nivîsandin jî bi ew nêzikbûna we çênabe."

Par di însiyatîfa kongreya netewî de konferansek çêbû, wê konferansê hinek rehetî çêkir. Biryar jî hate girtin ku li dibistan û dezgehan de zaravayên Kurdî zindî bên girtin. Yek jî ji bo nivîsandinê, divê hemû nivîskarên Kurd fêr bibin, bi herdu alfeyan (alfeya Latînî û alfebeya Aramî) jî binivisînin. Lewra ger em ya Aramî nizanibin, em dîrokekê winda dikin. Ger em bi Latînî jî nizanin, em beşeke civaka me fêm nakin. Ew tiştên ku me pêşniyar kirine, heya niha me bi xwe pêk neanî ye. Vê dawiyê hevalên me, di qomîteya ziman de biryar dane ku tîpên Aramî jî fêrî hevalan bikin. Heval dikarin hev û din fêr bikin, derfetên wê hene. Ne şerm e, dewlemendiyek e.

Ger wisa bibe, kîjan heval biçe kudera Kurdistanê jî dikare hinek tiştan bixwîne û fêm bike. Dev ji şoreşgeriyê berde, ew pêwîstiyeke civaka me ye. Ger lêgerîn û hewldanên hevalan hebin, divê xwe fêr

bikin. Ne tiştekî giran û zehmet e. Ez dubare dibêjim, ger heval bixwazin, di 15 rojan de dikarin herdu alfeyan jî fêr bibin.

Peyv çawa pêş dikevin? An ji ber pêwîstiyan çêdibin, an xwezayî pêş dikevin, an jî bi çavlêkerinê (teklît) dibe. Hinek peyvên zimanên cuda didin karanîn, da ku bibêjin pêşketî ne. Mesela cihê ku bibêjin siyaset, dibêjin polîtîka. Ev berê jî heye, niha pêş neketiye. Gelek pêyvên ketine nava zimanê me jî hene, mesela peyvên bi lojî xilas dibin, ne Kurdî ne. Beşek civakê kar tîne. Hinek peyv hene, mirov dikare bi awayekî resen kar bîne, lê hinek peyvên Kurdî hene, pêwîst nake em yên biyanî kar bînin. Ger pêwîstî hebe mirov dikare kar bîne, lê li ser esasê çavlêkirin û ferzkirinê be, rast nabe. Em xwe ji çavlêkirinê dûr bikin baş e, yên ferz dikin em qebûl nekin baş e, yên pêwîstî ne em bigirin baş e.

Li ser çavlêkirinê (texlît) behsa meseleyekê bikim. Ava Dîjleyê ji nava Bexdayê re derbas dibe. Li wir hinek ciwan hene, zankoya Bexda dixwînin û xwendina xwe xilas dikin. Li ser Dîjleyê bot heye, mirov bi pereyan dikare lê siwar bibe. Wan jî xwendina xwe xilas kirine û kêfxweş in, dibêjin em biçin di nava Dîjleyê de hinekî bigerin. Pere didin xwediyê botê û digerin. Dema ku li ser avê digerin, gelek peyvên lojî ji zilamê xwediyê botê dipirsin. Dibêjin, “hosta tu dizanê jeolojî çi ye?” Ew jî dibêje, “dev ji van tiştan berdin, ez bota xwe diajom.” Hinek dem ser re derbas dibe, vê dorê dibêjin, “hoste tu dizanê biyolojî çi ye?” Zilam dibêje, “ez nizanim.” Ciwan pê re dibêjin, “tu çawa nizanî, nîviyê temenê te vala çûye.” Cardin dibêjin, “tu dizanê meneolojî çi ye?” Zilam dibêje, “nizanim.” Êdî zilam ew qesî tengav dikin, ew jî ecele dike û bota xwe diqûlibîne û ew ciwan noqî avê dibin. Zilam ji ciwanan dipirse û dibêje, “hûn melelojî dizanin?” Ciwan dibêjin, “em nizanin.” Zilam dibêje, “wisa be,temenê we hemû beleş çû.” Divê em jî pir bi pêy van peyvan nekevin.

Hevalekî got, çima mintiqaya me dibêjin, “Kake.” Li mintiqayê Ûrmiyê û Salmasê heya beriya 300-400 salî bi piranî Yarsanî û Kakaî bûne. Dibe ku tesîra wê hebe. Di serdema Şah Îsmaîlê Safawî de, piranî bûne Elewî. Pişt re dema ku Şah Îsmaîl bûye Şîa, ji wan Elewiyan hinek birine aliyê Xorasanê. Di serdema Şah Abas de hinekên din birine û hinek anîne. Milê Serhedê û Dersîmê jî hinek Kurdên Elewî, birine milê Xorasanê. Hinek bi xwe zivirîne. Vê tesîr kiriye. Dibêjin, “em ji Xorosanê hatine.” Dibe ku Kakeî jî ji wir tê. Beşeke Azeriyan jî, wê demê Yaresanî bûne. Lê bi piranî bûne Şîa. Kurd, hinek bûne Elewî, hinek jî bûne Sûnî. Dijî Safewiyan sekinîne û bûne Sûnî.

Em hinekî behsa baweriyên Kurdan jî bikin. Baweriya Kurdan hemûyan ne wek hev e. Olên cuda hene. Herî zêde îro Kurd Misilman in. Heya 300-400 sal berê ne wisa bûye. Di serdema Osmanî û Safewiyan de jî hemû Kurd nebûbûn Misilman. Piraniya wan Yarsanî, Elewî û Êzîdî bûn. Lê van 300 salên dawî, gelek kes ji wan bawerî bûne Misilman û Misilman zêde bûne. Niha ji sedî 70, Kurd Misilmanên Sûnî ne.

Li Bakûrê Kurdistanê, beşeke zêde Misilman in. Piraniya wan jî Şafî ne. Herêma Riha, Semsûr, Dîlok hinek Kurdên hanîfî jî hene. Li Rojavayê Kurdistanê, piranî Misilman in. Li herêma Kobanê û Efrînê hinek Hanîfî hene, yên din zêdetir Şafî ne. Li Başûrê Kurdistan; Behdînan, Hewlêr, Sûleymaniyê û Kerkûk piranî Misilmanên Şafî ne. Li Kerkuk hejmareke kêm Hanîfî hene. Bala xwe bidinê, li herêmên ku Kurd û Tirk bi hev re jiyan dikin, zêdetir Hanîfî ne. Cihê têkiliyên Kurd û Tirkan tune, bi piranî Şafî ne. Li Rojhilatê Kurdistan; Ûrmiye, Xoy û Salmas Misilmanên şafî ne. Heya milê Erdelan wan deran hemû Şafî ne.

Ger em ji aliyê erdnigariyê ve bigirin dest, ji aliyê Bakûr ve, heya navarasta Kurdistanê; piraniya wan Misilmanên Şafî ne, kêmek jî Hanîfî hene. Lê ji aliyê Başûr ve ji Xeneqîn û jêr ve, ji milê Rojhilat ve ji Kirmanşan û jêr ve herêmên Îlam û Xuremabad bi piranî Misilmanên Şîa ne. Şîayên donzdeh îmamî ne.

Dervayî wê Kurdên Yarsanî hene. Ger derfet hebin, heval li ser lêkolîn bikin dê baş bibe. Yarsanî olekî Kurdan e. Piştî mîladê di salên hezarî de, dema ku Zerdeştî hatiye qedexe kirin, Kurd ketine nava lêgerînan. Heya serdemeke Îslamê jî Zerdeştî nehatiye qedexekirin. Lê di serdema Îmam Gazalî de dema ku tê xedexe kirin, Kurd neçar dimînin ku an bibin Misilman, an jî tiştekî din ji bo xwe bibînin. Ji bo wê di navbera Zerdeştî û Îslamiyetê de hevkirinek çêkirine. Dema ku pir tengav bûne, gotine em rêoleke (mezhep) Îslamê ne, dema ku serbest bûne, gotine ola me serbixwe ye. Ji milê Rojhilatê Kurdistanê, heya Serhadê û Başûrê Kurdistanê weke kevaneke piranî bûne Yarsanî. Piştî salên hezar û 100'î ye.

Milê navarast û Bakûrê Kurdistanê, milê Şêxan, Şengal, Dûhok, Cizîrê, Elih, Mêrdînê jî beşeke zêde bûne Êzîdî. Êzîdîtî, navkirineke di navbera ola kevn ya Zerdeştiyê û Mislimaniya Sûnî de ye. Yarsanî jî, navkirineke ola kevn ya Zerdeştî û Elewîtiyê ye. Elîbûn e. Ne ew Elewîtiya nû ye. Berê alîgirên Elî hebûn. Alîgirên Elî û Zerdeştiyê hevkirinek çêkiriye û Yarsanî çêbûye. Dema ku tengav bûne, gotine em

Elîvan, alîgirê Elî ne. Dema ku serbest bûne jî gotine, em Zerdeştî ne. Êzîdiyan jî, dema ku tengav bûne, gotine em Misilman in; dema ku rehet bûne jî gotine, em ê li ser esasê olê kevn yê Kurdan, Kurdbûna xwe biparêzin. Piştî hezar û 100'î Êzîdîtî û Yarsanî bi vî rengî derketine.

Êzîdî dibêjin, em Êzdanê kevn nû dikin. Lewra berê baweriya Kurdan Êzdatiyê hebûye, ango Mîtraîzm. Bala we jî kişandibe, cewherê Êzîdîtî, Elewîtî, Yarsanî, Ehlîhak, Kakaî, Elî îlahî yek e. Ji aliyê şêwe ve hin guhertin hene, lê cewher yek e.

Pêşengê Yarsanan Sansahak bûye. Pêşêngê Êzîdiyan jî Şêx Adî bûye. Sansahak kesekî, hem ji aliyê fikrî ve, hem jî ji aliyê rêxistinî ve zîrek bûye. Xwe tevger kiriye û însiyatîf jî daye şopdarên xwe ku, li gorî zûrifên cih xwe tevger bikin. Ji ber vê hinek cihan, bi navê Elewiyan xwe tevger kirine, hinek cihan bi navê Elî Îlahî, hinek cihan bi navê Ehlî Hak, hinek cihan jî bi navê Kakeî xwe tevger kirine. Ew her çar bawerî, bi eslê xwe Yarsanî ye. Beriya 500-600 salî berê jî li Kurdistanê van baweriyan zêde bûne, lê niha kêm bûne. Ji bo vê pêwîstî bi lêkolînê heye. Gelek hevalên me hê nû têkiliya Elewîtî û Yarsaniyê dibînin. Heqîqeteke me heye, em ji hev û din dûr ketine. Divê em careke din nêz bibin.

Li mintiqaya Kirmanşan, Ehlîheq hene, Elîlahî hene. Carna di televizyonê de derdikevin, zext li ser wan hene, pir kêm mane. Li herêma Azerbeycan, hinek Yarsanî hene. Li Başûrê Kurdistanê Kakaî, li herêmên Sûleymaniye, Kerkûk, Germiyan hene. Li Bakûrê Kurdistanê jî Elewî hene. Li gorî dîrokê, ez Elewîtî û Yarsaniyê cuda nagrim dest. Elewîtî, şaxeke Yarsanî ye. Beşeke kêm Elewî jî li Efrînê hene. Li Bakûrê Kurdistanê jî, li Gurgum, Dersîm, Qoçgiriyê çend milyonek Elewî hene. Ji van Elewiyan hinek Kurmanc in, hinek jî Dimilî ne.

Êzîdî jî li Başûrê Kurdistanê hene, navenda Êzîdiyan li Başûrê Kurdistanê ye. Navenda wan pîroz, Şêxan e. Navenda berxwedanê jî Şengal e. Her dem di çîrok û qewlên Êzîdiyan de Şêxan û Şêngal derve dibin. Lewra du cihên girîng in. Li Rojavayê Kurdistanê, hem li herêma Cizîrê hene, hem jî milê Efrîn û Helebê hene. Li Bakûrê Kurdistanê, herêma Mêrdîn û Elihê wan deran hebûn, lê niha pir kêm bûne, piranî çûne Ewropa. Li Ermenîstanê hene. Beriya 100 salî, di demê şerê Osmanî û Rûsya de, Êzîdî koçberî Ermenîstanê hatine kirin. Ji bo ku li hemberî hev û din bidin şixûlandin, koçberî wê derê kirine. Pişt re di nav sînorên Rûsya de mane. Niha Kurdên ku li Ermenîstan û Rûsya

jiyan dikin, piraniya wan Êzîdî ne. Weke baweriya Kurdan mirov dikare van tiştan diyar bike.

Hevalan Şebek pirs kirin. Li herêma Mûsilê hene. Weke zarava Hewremî ne. Weke bawerî jî di navbera Sûnîtî û Elewîtiyê de ne. Baweriyeke wan ya taybet heye. Niha li ser lêkolîn jî tê kirin. Ne tam Elewî û Yarsanî ne, ne Sûnî ne. Lêkolîn berdewam dikin. Ez pir bi kîte jî nizanim, rewşa wan çi ye.

Zerdeştî weke bawerî nemane. Van demên dawî hinek kom dibêjin, em dixwazin Zerdeştiyê nû bikin, çiqasa bikarin nizanim.

…: Hin Kurdên Cûhî (Yahûdî) û Fileh (Xiristiyan-Xeçperest) jî hene, ew çawa çêbûne?

**H. Helmet:** Cûhî; di dema kevn de du dewletên wan hebûne, yek bi navî Samira, Hoşei padişahê wê bûye, ya din bi navî Yehuda, Sedeqya padişahê wê bûye. Samira li Salî 722 b.z di aliyê padşahî asur Şelemen Nasir ve hat dagîr kirin. Padişahî Yehuda jî Salî 587 di aliyê padşahî Babîl Nebuxed Nesir ve hat têk birin. Herdu padişahî Weke xenîmet, Yahûdiyan bi xwe re tînin; hinekan li Babîlê dihêlin, hinekan jî li Kurdistan û Îranê belav dikin. Yahûdiyên herî kevn ku hatine û li Kurdistanê belav bûne yên wê demê ne. Hinekên wan, fêrî zimanê Kurdî jî bûne. Hinek Kurd jî, tesîr bûne û bûne Yahûdî. Ereb dibêjin, "kesê ku 40 rojî li gel miletekî jiyan bike, weke wan lê tê." Ev 2600 salin em pêk ve jiyan dikin, Kurd jî hinek bûne Yahûdî; Yahûdî jî hinek bûne Kurd. Rewşeke bi vî rengî heye.

Beriya 67 salî dema dewleta Cûhiyan Îsraîl çêbû, ew dem rêberên Cûhi bangawazî kirin ku hemû Cûhiyên li cîhanê hene, da ku biçin Îsraîlê. Wê demê, Îran, Iraq û Tirkiye hevalbendên Brîtanya bûn. Tirkiye, di nava peymana NATO de cih digirt. Xeynî wê peymana Bexde hebû. Îran, Iraq, Tirkiye, Pakîstan, Brîtanya hemû di nava vê peymanê de bûn. Van dewletan biryar dan ku Cûhiyên xwe bişînin Îsraîlê, da ku serhêjmara Îsraîl zêde bibe. Da ku Îsraîl li hemberî Ereban, bikaribe li ser lingan bisekine. Wê demê hemû Cûhiyên Kurdistanê hebûn jî, van dewletan hemû şandin. Wan Kurdî jî dizanîn. Niha jî hinek mane, bi Kurdî diaxifin. Bes zimanê wan yê kevn jî heye. Bes niha nemane.

Piştî mîladê salên 70'î Xiristiyanî jî dikeve Kurdistanê. Di destpêkê de xelkên Riha û Hewlêrê hinek dibin Xiristiyan. Miletên weke Ermenî, Sûryanî û Keldanî ku li Kurdistanê jiyan dikin, zêdetir Xiristiyaniyê esas digirin. Hinek Kurd jî dibin Xiristiyan, lê kêm in. Lê van salên dawî hinek misyoner li Ewropa hatine peywirdar kirin, hatine û dixwazin dêra Xiristiyanî ya Kurd çêbikin. Dibêjin "olê Xiristiya-

niyê, olekî pêşketî ye; olê Misilmaniyê olekî paşketî ye, bên û bibin Xiristiyan.” Ew Xiristiyanên nû ne, Protestan in. Hinek Xiristiyan li Kurdistanê hene, hevalên me wisa dizanin ku Kurd in. Lê ne Kurd in, tenê bi Kurdî diaxifin. Niha li Sûleymaniyê wan deran Xiristiyan hene, her bi Kurdî diaxifin, bes Keldanî ne. Xiristiyanên Kerkuk û Hewlêrê Kurdî baş nizanin, yên Botan û Dûhokê baş dizanin.

Li Kurdistanê hejmarek miletên cuda jî hene. Yek ji wan Faris in. Bi piranî sînorên Rojhilatê Kurdistanê em di nav hev de jiyan dikin. Bajarên din yên Rojhilatê Kurdistanê jî jiyan dikin. Bi piranî Misilmanên Şîa ne. Azerî, bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê, li Azerbeycana Xerbî li gel Kurdan jiyan dikin. Heya sînorê Sînê hene. Li milê Bakûrê Kurdistanê jî li milê Îdîr û Erdexanê hene. Ji van re dibêjin Caferî, ew jî Şîa ne.

Wekî din Ereb hene, li Rojavayê Kurdistanê her cihî hene. Hinek berê ve hatine, hinek jî bi siyaseta Kemera Ereban ya Suriye hatine. Ji bo ku Kurdan ji hev û din qut bikin, Ereb xistine navbera wan. Lê hinek jî Erebên kevn in. Li Bakûrê Kurdistanê; li herêmên Riha, Mêrdîn, Elih û Sêrtê hene. Li mintiqaya Îskenderûn û Antaqya jî hene. Li Başûrê Kurdistan; li Mûsil, Kerkûk, derdora Mexmûr, Xaneqîn, Xurmatu, Tavuq hene. Bi piranî herêmên sînor in. Li Rojhilatê Kurdistan; li herêmên Îlam û Xuzistan wan deran hene.

Milê Bakûrê Kurdistanê Erebên Sûnî hene, li milê Antakya wan deran Erebên Elewî hene. Li milê Rojavayê Kurdistanê jî Erebên sûnî hene: Li Başûrê Kurdistanê li herêma Mûsil hemû sûnî ne, li Til Efer Şîa ne. Erebên Kerkukê yên kevn sûnî ne, yên nû Şîa ne. Li Rojhilatê Kurdistanê jî Ereb Şîa ne.

Tirk, li Bakûrê Kurdistanê hene. Hinekên wan kevn in. Hinekên wan jî di vê sedsalê de hatine bi cih kirin. Di çarçoveya “Plana Şerq Islahat” de, hatine bi cih kirin. Piraniya bajarên Bakûrê Kurdistanê hene. Miletê Tirk bi piranî Misilmanên Hanefî ne. Tirkên Bektaşî hene. Tirkmenên Şîa û Elewî jî hene. Li Bakûrê Kurdistanê hem Tirkemên Şîa hene, hem Tirkmenên Elewî hene. Li Rojavayê Kurdistanê li milê Efrînê Tirkmen hene, bawer dikim Elewî ne. Li Başûrê Kurdistanê, Tirkmenên Til Efer piranî Şîa ne. Li nava Mûsilê Sûnî ne. Li Kerkûkê, Şîa zêdetir in. Li milê Xurmatu, Tirkmenên Şîa hene. Hejmara Tirkmenan li Başûrê Kurdistanê pir in. Li Başûrê Kurdistanê û Iraqê nêzikî milyonekî Tirkmen hene.

Li Kurdistanê Ermenî hene. Ermenî miletekî kevn in, nijadê wan Arî ne. Ola wan jî Xiristiyanî ye. Kokê hinek Ermeniyan û Kurdan

vedigerînin Urartuyan. Urartuyan weke bav û kalikên Ermenî û Kurdan pêk ve hesap dikin. Jixwe Kurd û Ermen yek nijad in. Lê olê wan cuda ye, pir zu ola xwe guhertin e. Ji ber ku bi zanatê ve mijûl dibin, Xiristiyanî pir zu hembêz kirine. Li Bakûrê Kurdistanê hene, berê pir bûne, lê niha kêm in. Li Başûrê Kurdistanê, nîspeteke kêm hene. Li Dûhokê û Kerkûkê hene, hinek jî koçber bûne û çûne Bexda. Lê bawer dikim, niha li Bexda kes nemaye. Li Başûrê Kurdistanê, di parlementoyê de nunerek dane wan.

Li Kurdistanê Asurî hene. Li Bakûrê Kurdistanê, li Mêrdîn, Botan, Colemerg hene. Li Colemergê berê pir zêde bûne, lê bi sedema şer û koçberiyê pir kêm mane. Li Başûrê Kurdistanê, herêma Behdînan, di gundan de hinek hene. Li Mûsil hene, li Kerkuk hene. Li Rojavayê Kurdistanê herêma Cizîrê hene. Asûrî weke qewm, Samî ne. Semîtik in. Ola wan jî Xiristiyanî ye. Ji ber ku em baş nas nakin, em carna Asurî, Sûryanî û Keldanî hemûyan dikin yek. Lê ne yek in.

Li Kurdistanê Sûryanî hene. Li Rojavayê Kurdistanê mintiqaya Cizîrê hene. Li Bakûrê Kurdistanê hene. Li Başûrê Kurdistanê jî li Mûsil û Kerkûkê hene. Ew jî ji miletê Zenopya ne, heval dewleta Zenopya dizanin. Navenda wan Palmîra ye, vê dawiyê ket destê DAİŞ. Beriya 2 hezar salan dewleta wan heye. Beşeke Şamê jî di destê wan de bûye. Ew jî Semîtîk in, zimanê wan hinekî jî Asûriyan cudatir e. Baweriya wan jî Xiristiyanî ye.

Keldanî hene. Li Başûrê Kurdistanê li Hewlêr, Kerkûk, Sûleymaniyê, Diyana, Şeqlawa û hin herêmên Behdînan hene. Ew jî ji Babîliyan mane. Ew jî Semîtîk in. Weke bawerî jî Xiristiyan in.

Li Kurdistanê Mihelmî hene; ew jî komeke kevn in. Li Rojava û Bakûr hene. Herêma Mêrdîn û Cizîrê hene. Bi eslê xwe Akad in. Ew bermahiyê Akadan, yên Arabîstanê bûne Ereb; yên Kurdistanê hinek bûne Kurd û hinekan jî taybetmendiyên xwe parastine û weke Mihelmî tên nas kirin. Têkiliyên wan yên civakî bi Kurdan re zêde ne.

Dervayî van li Kurdistanê Çeçenî hene. Di sedsala 20’emîn de dema ku şer çêbûye, li mintiqaya Gurcistan wan deran, Çeçen koçber kirine û hinek li Rojavayê Kurdistanê bi cih kirine, hinek jî li Bakûrê Kurdistanê, milê Erzeromê bi cih kirine.

…: Li herêma Geliya Zîlan jî Qirgiz û Efgan hene. Piştî serhildan û komkûjiya Geliya Zîlan, li wê derê bi cih kirine. Her wiha li Serhadê Terekeme hene. Zimanê Kurdî jî fêm dikin. Di nava wan de hinek Çerkez jî hebin. Ji bişavtina Kurdan anîbûn wê derê. Li milê Ozalpê jî sê gundên Lazan hene. Ew jî ji bo koricitiyê di salên 85-90’î de anîbûn.

Li navçeya Berkevirê ya Agiriyê jî, hem Şîa hene, hem jî Tereme-ke hene. Ew terekeme Hanîfî ne û ji aliyê Gurcîstanê anîne. 3-4 gund in. Ew Qirgizên li milê Geliya Zîlan jî Çaçanîstanê anîne. Me xwest em bi wan re têkilî daynin, lê pir dijberî me bûn. Berê baweriya wan çi ye, nizanim; lê niha sûnitiyeke pir mîsoger jiyan dikin.

…: Li milê Merîvan, Sînê wan deran qereçî hebûn. Jiyana wan pir xweser û girtîbû. Ji aliyê çandî ve pir xurt in, lê mirov nasnameya wan tam nizane. Pir têkilî dewletê jî nedibûn, gelo ew bi zanebûn e? Heval dikarin hin agahiyan bidin.

…: Dibêjin, ji milê Pakîstanê bajarê bi navê Qaraçî heye, qaraçî ji wê derê hatine.

…: Bajarê herî pir rengî yê Kurdistanê yek jî Mêrdîn e. Her cure bawerî û gel hene. Di navbera gelan de kelijandin heye. Çend malbatên Çeçen jî hene. Dêr û bawergehên wan cuda ne, lê jiyan pêk ve ye. Vê dawiyê tevlî xebatên me yên înşayê jî dibin. Mitirp, li milê Nisebînê hene; xwe weke Kurd bi nav dikin. Lê fikir, xîtabet û ûslûbê wan mezî dikê, xweserbûnek jî heye.

…: Van demên dawî, li Kurdistanê Selefî pêş ketine. Rista Selefi-yan çi ye?

**H. Helmet:** Ez bi xwe li ser van mijaran her lêkolîn dikim, heva-lan re nîqaş dikim, da ku Kurdistanê baştir nas bikim. Axaftin û aga-hiyên hevalan jî hinek tiştan timam dike. Bi giştî jî wisa ye, her hevalek nunertiya civakeke dike. Divê ji vî alî ve hewldaneke mirov hebe.

Li ser Çeçen, Terekeme û Qirgizan; min hinek tişt xwendine, lê min bi wan re jiyan nekiriye. Hevalên ku dizanin, dikarin agahiyên berfirehtir jî bidin.

Ji bo Qaraçiyan hin gotin hene. Dibêjin bajarê Qaraçî hatine; ba-jarê Qaraçî, navendeke tîcaretê ya Pakîstanê ye. Hinek dibêjin, "ji wir hatine." Lê ew nêrîn kêm dimîne. Ger bibêjin Afganî ne, dibe ku rastir be. Lewra Afganiyan demekê Kurdistan, di bin serweriya xwe de hişti-ne, dibe ku di wê demê de hatibin. Hinek dibêjin, Rûm in. Rûmiyan, demeke dirêj li Kurdistanê hûkim kirin, piştî Sasaniyan lewaz bûn. Ew Rûmên ku li Kurdistanê mane û nebûne Misilman, tevlî siyasete nebûne. Jixwe niha jî bi awayekî biçûk û cûda li Qereçiyan mezî dikin.

Jiyana wan jî hinekî bi tevger e. Ne weke koçerên Kurd in. Yên Kurdistanê hinekî fêrî Kurdî bûne, yên di nava Ereban de fêrî Erebî bûne, yên Tirkiye fêrî Tirkî bûne. Li tu cihên cîhanê, ji Qaraçiyan re sînor nehatiye danîn. Hinek dibêjin, pergal wan weke sîxûr dide


şixûlandin, ji bo wê ji wan re sînoran danenîne. Hinek dewlet, ji ber vê wan digirin jî. Lewra dibêjin, nasnameya wan tune. Bi rastî jî nasnameya wan tune, ne aîdî dewletekê ne. Nêzikatiyeke ku dibêje, hemû zilamên îstîxbaratê ne, şaş e. Mirovên belangaz in, dibe ku dewletan jî hinekên wan îstîfade kiribe, lê giştî ne wisa ne. Jiyana wan pir xirab e, derfetên wan pir kêm in. Li bajaran konên xwe vedidin û jiyan dikin. Li her cihî jî hene. Lê konên wan weke konên Kurdan (reşmal) ne saxlam in. Yên Kurdan, hem germahiyê nahêle hûndir, hem sermaye diparêze, hem jî baranê derbas nakin. Ji ber vê ji mûyên bizine çêkirine. Berê van tiştan baş hesap dikirine.

Li Kurdistanê, weke kom Hembelî û Malîkî tüne ne. Dibe ku tek tek rêola xwe guhertibin. Mesela herêma me, hinekan xwe guhertiye û bûne Hanîfî. Mesela ez yekî nas dikim, beriya sî salî keça wî û kurekî hev û din hez dikirin. Wî zilamî sond xwaribû ku keça xwe nede wî ciwanî. Keça wî jî sond xwaribû, ger nedin wî ciwanî dê xwe bikûje. Pişt re nîqaş kirin û hev kirin. Wî zilamî çû rêola xwe guhert û bû Hanîfî. Lewra di Hanifiyan de dayik dikare keça xwe bide. Zilam jî got, karê min pê nîne, dayika wê dikare bide. Lê ger Şafî bûya, nedikarî wisa bibêje. Ji bo ku sonda xwe nexwe, rêola xwe guhert.

Li gorî Hembelî, Malîkî, Şafîtî Hanîfîtî zêdetir nerm in. Şafitiyê de jî hin tiştan de hişkî heye, lê di sûnetan de nerm e. Hanîfî hinekî din jî nermtir e. Hembelî û Melîkî, li cihên weke Sûdî, Misir û Cezayirê zêdetir in. Li Kurdistanê piranî Şafî ne, hinek jî Hanîfî ne. Li Tirkiye jî Hanîfî pir in. Şîroveyek jî heye; dibêjin li gorî Şafîtiyê, kesê ku bibe Xelîfe divê teqez Ereb be. Lê li gorî Hanîfî her kesekî Misilman dikare bibe Xelîfe. Dibêjin, Tirkan ji bo wê zêdetir Hanîfîtî hilbijartin e. Lewra nêzikbûna deshilatdar ya Îslamê di wan de heye. Ger nebûna Hanîfî, ne dikarîn bibin Xelîfe. Di serdema Abasiyan de Xelîfe her Ereb bûye. Lê di serdema Osmaniyan de Xelîfe bûye Tirk. Hanîfî pêşiye li vê yekê vedikin. Lê Kurdan qet guh nedanê; Kurd bibin Xelîfe û nebin, pir ne girîng e. Ji ber vê Kurd zêdetir bûne Şafî, Kurdên ku nêzikî Tirkan e zêdetir bûne Hanîfî. Bala we jî kişandibe, cihên ku Tirk, Tirkmen û Kurd bi hev re jiyan dikin, Kurd zêdetir Hanîfî ne. Sedema bûyina Hanîfî ya Tirkan, dibêtiyeke mezin ew e. Lê dibe ku di destpêkê de Hanîfîtî nas kiribin, ji ber wê ew girtibin. Ew şîroveyek e.

Ji bo meselaya Selefiyan; Selef, têgeheke Erebî ye. Tê mahneya yên pêş. Weke bav û bapîr; yên ku beriya me jiyan kirine. Yên paşî re jî dibêjin Xelef. Dibêjin, “em li gorî Selefên xwe diçin.” Selefi jî dibêjin, “em li gorî pêşengên Îslamê diçin. Ji bo me rêol-mezhep ne

girîng e. Rêol hemû xûlikariya deshilatdarî û xirabiye ye. Em li gorî Muhamed û hevalên wî diçin.” Rêgeza wan ew e, ji bo vê navê xwe kirine Selefî. Lê keleka wê pir girîngiyê didin deshilatdariyê. Dibêjin, “cihê hûn lê ne, divê hûn pir rexneyan li deshilat nekin.” Mesela li Başûr, dibêjin, “divê tu mala Barzanî û deshilatdariya wan rexne nekê, divê tu îtîatî wî bikî; lewra Îslamiyetê qebûl dikin.” Li Sûîdiyê jiyan dikin, dibêjin, “divê tu Melîk rexne nekê.” Bi vî rengî deshilat jî ji wan îstîfade dikin. Hin tiştên wan baş in; edet û çanda ku reolan pêş xistine nakin. Dibêjin, “di destpêka Îslamiyetê de ew tişt tûnebûn.”



## DI SERDEMA CIVAKA XWEZAYÎ Û SERDEMA KOLEDARIYÊ DE KURDISTAN

Mijara me ya din, ji aliyê kronolojiye ve dîroka Kurdistanê ye. Em ê di serî de dema civaka xwezayî bigirin dest. Em di serî de dikarin bale bikşînin ser hin tiştan. Me got, em dîroka Kurdistanê li ser esasê sê deman esas digirin. Dema civaka xwezayî, dema civaka hiyerarşik-tebaqî, dema demokratîk ku em niha ji bo wê têkoşîn dikin.


***-Di Serdema Civaka Xwezayî Ya Ewil De Kurdistan***

Di dema civaka xwezayî de, mirovahî çawa jiyan dike? Tiştê ku divê em li ser kûr bibin; civaka xwezayî, dema ku mirov mirovbûna xwe qezenç dike ye. Ew girîng e. Dibêjin, “mirov çawa bû mirov?” Bersiva vê pirse, di vê demê de ye. Ji bo ku em wê fêm bikin, divê em bizanibin ku mirov çawa û li ku pêş ket. Ji ber ku we dersa Diroka mirovahî dîtiye, Pêwîst nake ku em bi kûranî bikevin nava civaka xwezayî û şaristaniyê, lê divê hin tiştên girîng em li ser bisekinin û hin encaman derbixin.

Civakbûn û mirovbûn, di dema civaka xwezayî de çêbû. Bingeha wê jî li erdnigariya Kurdistanê pêş dikeve. Ew ji bo me girîng e.

Li gorî tehlîlên zanist û arkeolojiye, em nikarin bibêjin mirov li Kurdistanê çêbûye. Lewra li gorî belgeyên ku îro hatine dîtin, hestiyên mirov yên herî kevn, li nêzikî ekvator Esopya hatine dîtin. Hestiyên du mirovan in, yek jin û yek jî mer e. Navê wan kirine, “Lusi û Ramidu.” Li gorî lêkolînên arkeolojiye, temenê wan hestiyan heya 4 milyon û 4 milyon 500 hezar salan diçe. Ew qesa sal berê, li wan deran jiyan kirine. Hestiyên din kevn ku hatine dîtin, li milê Tanzanya, Endonezya, Çîn, Elmanya, Îspanya hatine dîtin. Temenê wan, yên hinekan 2 milyon sal in, yên hinekan milyonek e. Hinek jî hene 800 hezar sal in.

Li gorî lêkolînan, jiyaneke van mirovan teqez û civakî tune ye. Ji bo vê tê gotin, di wan serdeman de mirov hê jî fêrî jiyana civakî nebûne. Weke ajalên dîtir, jiyaneke xwezayî jiyan dike. Lewra berhemeke jiyanî tune, encamek naye girtin. Dîrokanas dibêjin, temenê mirov nêzî 7 milyon e. Heya niha hestiyekî ew qesa kevn nehatiye dîtin, bes şibandina hestiyên mirov yên beriya milyonek sal û hestiyên ajalekî bi renge qirdik ku dişibe yê mirovan dikin. Dibêjin, dibêtiyeke mezin, ew guhertin di van deman de çêbûbe. Ango nêzikî




5-6 milyon sal ew guhertin çêbûye. Dema ku digêhêje 4 milyon sal beriya vê, şêweyê wan weke ya mirovan dibe. Ji ber vê dibêjin, di nava vê demê guhertin çêbûye, lê ew şîrove ye. Belgeyên ku hestiyên mirovan ku aîdî 4 milyon sal in, hatine dîtin.

Van mirovên ku beriya 4 milyon sal jiyan kirine, li Kurdistanê nehatine dîtin. Me berê jî behs kir, li vê herêmê rûtubet û nem heye; lê bi piranî ew hestiyên mirovên kevn, li herêmên germ hatine dîtin. Ji bo wê arkelog dibêjin, li wan herêman mirovbûna ewil çêbûye. Serokatî, wê heremê weke Efrîqa bi nav dike. Ev pêşketin di Dola Rîf de derbazî cihê din bûne.

Lê pişt re hin tişt bûne sedem ku, ew mirov ji Efrîqa belav bibin. Ev *Dola Rîf*, ji bo belavbûna mirov bûye korîdorek, neqebek. Gelek arkeolog, piştgiriya vê nêrînê dikin. Lewra li gorî hestiyên din derketine, dema ku dem û cihên belavbûnê mezî dikin, xeta belavbûnê jî diyar dibe. Wisa riyeke ji bo belavbûnê heye. Riya herî guncav, riya Efrîqaya Rojhilat û Rojhilata Navîn e. Ew rê ji Kurdistanê re jî derbas dibe. Ew girîngiya Kurdistanê nîşan dide.


Piranî arkeolog, li gorî lêkolînên kirine dibêjin, "mirov beriya 300-200 hezar sal, fêrî jiyana civakî bûye." Ango şoreşa civakbûnê çêbûye. Di dema civaka xwezayî de du şoreşên mezin hene. Yek şoreşa civakbûnê ye, yek jî şoreşa çandinî ye. Di vê demê de êdî mirov derbasî civakbûnê dibe; di navbera 300-200 hezar salî de ye. Bingeha wê li ku hatiye avêtin? Di encamên lêkolînên hemû cîhanê hatine kirin de, diyar dibe ku ew herêma Kevana Zerîn (Verimli Hilal) e. Hem hestiyên mirov dibînin, hem jî berhemên civakbûna mirov dibînin. Ji bo vê tê gotin ku mirov li vê herêmê fêrî jiyana civakî bûye. Vê em nabêjin, arkeolog dibêjin, lê ji bo me jî bûye bingeheke baş.

Serokatî dibêje, "dîrok di roja me de, em jî di destpêka dîrokê de veşartî ne." Ger van tiştan derbikevin, hem dîrok hinekî eşkere dibe, hem jî em derdikevin holê. Bi taybetî piştî salên 1950'î lêkolînên arkeologî zêde bûn. Gelek belge jî li van herêman derdikevin. Lewra fêm kirine ku jiyana civakî û berhemên wê li vê herêmê pêş ketine. Belgeya herî kevn, li Lûbnanê dîtine. Texrîben dîroka wê belge, beriya 100 hezar salî ye. Belgeyên hestiyên mirov û berhemên jiyana civakî ya mirov e.

Belgeya herî kevn ya mirov beriya 4 milyon sal e, lê texmîn tê kirin ku 2 milyon beriya wê jî mirov hebin. Ew belge jî dibêje, "100 hezar sal berê jiyana civakî li vê herêmê pêş ketiye, dibe ku 100 hezar sal beriya wê jî bingeha civakbûnê li vê derê pêş ketibe." Bes hê jî nedîtine. Ji bo vê dibêjin, beriya 200-250 hezar sal berê jiyana civakî pêş ketiye. Yên ku ew jiyan pêş xistine jî mirovê Hizirvan (Homo Sapîens) e.

Em nikarin bibêjin, yekem belge li Kurdistanê hatiye dîtin. Yekem belge li Lûbnanê hatiye dîtin. Lûbnan jî dikeve ser riya-xeta Dola Rîf; Rîf-Misir-Fîlîstîn-Lûbnan. Ji bo wê dibêjin, yên ku ji Rîf hatine, li Lûbnanê bi cih bûne. Jiyana civakî jî li vir pêş ketiye. Pişt re ew derbasî Kurdistanê dibe; derbasî Toros, Zagros dibe. Li Çiyayê Bradost belgeyên din jî dîtine. Li herêma Xakûrkê, Xinêre wan deran e.


HITTITE EMPIRE
(HATTI)
LAKE VAN
ARARAT
(URARTU)
CASPIAN
SEA
HURRIANS
ANATOLIA
LAKE URMIA
Haran
MITANNI
SUBARTU
Nineveh
PADDAN-ARAM
Ebla
Ashur
CYPRUS
Ugarit
SYRIA
(ARAM)
MESOPOTAMIA
AKKAD
Mari
Tigris River
THE GREAT SEA
(MEDITERRANEAN SEA)
Damascus
Euphrates River
CANAAN
Babylon
Jerusalem
ELAM
GOSHEN
NEGEV
Ur
Memphis
SINAI
ARABIA
EGYPT
LOWER SEA
(PERSIAN GULF)
Nile River
KEVANA ZERÎN
RED SEA


ŞIKEFTA ŞANÎDAR

Li milê Xakûrkê Şikefta Şanîdar heye. Li vê derê şûn û warê civakbûnê ya herî girîng ku heya niha li cîhanê hatiye dîtin heye. Ji bo çi girîng e? Lewra li vê derê jiyankirina du deman hatiye dîtin. Yek hestiyê 6 mirovan û berhemên wan in; beriya 60 hezar salî jiyan kirine. Yek jî hestiyên 3 mirovên ku beriya 50 hezar salî jiyan kirine. Ew hatine dîtin û li ser lêkolîn hatine kirin. Berhemên wan, kevirên ku dane şûxûlandin, ajalên ku girtine, hestiyên wan, goştê ku parastine, tiştên weke genim û ce ku kom kirine di vê şikeftê de hatine dîtin. Li gorî lêkolînan, ew tiştên hatine dîtin aîdî 60 hezar sal berê ne.

Niha ew cih, kirine cihekî serdana turîstan. Berê kes pê re eleqedar nedibû, lê niha cih pê re çêkirine, xelk serdana wir dikin. Navberekê xwestibûn, lêkolîn li vê derê bên berfireh kirin, lê rejîma Bais destûr nedabû. Ger niha lêkolîneke berfireh bê kirin, dibe ku tiştên cudatir jî bên dîtin. Beriya 60 salî lêkolîn hatine kirin, lê piştî wê lêkolîn nehatine kirin. Lêkolînvan dibêjin, “ew şikefta yekaneye ku di du serdeman de jiyan lê çêbûye.” Ew jî îspat dike ku bingeheke jiyana dema xwezayî heye. Ew jî li Kurdistanê ye.

Cihekî dîtir heye. Jê re dibêjin, “Şikefta Hezarmêrd.” Li çiyayên nêzikî Sûleymaniyê ye. Pir mezin e. Şikefta Şanîdar, yek şikeft e; texrîben 25 metro fireh, 50 metro kûr e. Lê Şikefta Hezarmêrd, sê çar şikeft in. Şikefteke wê pir mezin û dirêj e, yên din biçûk in. Ji bo ew şikefta dirêj, berê gotin hezar mêr di vir de bi cih dibe, ji bo wê navê wê jî kirine Hezarmêrd. Ew şikeft jî berhemên jiyana mirov û xwedîkirin û kêdîkirinên mirov nîşan dide, hestiyên wisa li vê derê hatine dîtin. Dîroka wê heya 40-50 hezar sal diçe. Arkeolog dibêjin, “ji 40-50 hezar sal beriya vê, jiyanê li van çiyan (Çiyayên Zagrosê) berdewam dikiriye.”

Şikefteke din heye, li mintiqaya Çemê Rêzane ku dikeve navbera Kerkûk û Dukan. Li wê derê qampeke me ya leşkeri hebû, hevalên kevn dizanin. li wê derê Şikefteke mezin heye, jê re dibêjin, “Şikefta Zerzî.” Ew jî jiyan û berhemên mirov û ajalên beriya 25 hezar sal berê nîşan dide.

Şikefteke din jî di navbera Til Efer û Şengalê de heye. Pê re dibêjin, “Herêma Yarimtepe.” Ew jî şikefteke biçûk e û dîroka wê vedigere 25-30 hezar sal berê.

Şikefteke din li milê başûrê Efrînê ye. Pê re dibêjin, “Şikefta duderî.” Ew şikeft jî heya 35-40 hezar sal berê diçe. Hinek berhemên jiyana wê serdemê li wir dîtine.

Li gorî ku hatiye keşîfkirin, li Kurdistanê penc cihên serdema destpêkê hene. Gelek şikeftên Kurdistanê jî hene, hê lêkolîn nehatine kirin. Dibe ku yên dîrokî di nav de zêdetir hebin.

Ew demên ku em behs dikin, Serdema Qeşê ye (Buzul Çaği). Berê me carna nîqaş dikir, hinek kesan wisa fêm dikirin ku cîhan hemû bûye qeşe; na, ne wisa ye. Niha çawa li bakûrê Rûsya hinek cih hene, berf qet nahele; ew der jî wisa bûye. Dibêjin, di serdema Qeşayê de li hemû cîhanê qeşa bûye û berf neheliyabûye, lê li herêma ekvator berf tûnebûye. Dibêjin beriya hezar û 300 sal berê, li Cezîreya Ereb şînahî zêde bûye. Çima? Lewra ger li Kurdistanê berf be, li başûrê Iraqê jî baran dibare. Lê niha li vir bûye baran, ew der jî ziha bûye. Ango heya 100 hezar sal berê, li Kurdistanê berf pir bûye, nîvê wê zêdetir neheliyabûye. Jiber ku zivistanan şikeft germ in, havînê jî hûnik in. Ango mirov dikare di şikeftan de jiyan bike. Kurdistanê jî şikeftên wê zêde ne, lê hemû şikeftên Kurdistanê de lêkolîn çênebûye.

Rûxmî ku lêkolîn kêm jî çêbûne, niha berhemên herî zêde ku aîdî wê demê ne, li Kurdistanê derdikevin. Ew jî xelkên dîtir tên dibînin û dibêjin wisa ye. Wisa be weke Serokatî dibêje, “şoreşa civakbûnê li vê erdnigariyê çêbûye.” Ew ji bo me girîng e. Ew bûye sedem ku civakbûn, di nava xelkên Kurdistanê de xurt be. Ew dema şoreşa civakî ye.

### *-Di Serdema Neolîtîkê de Rista Kurdistanê*

Dema duyem, dema şoreşa çandînî ye. Lêkolîner dibêjin, dema ku qeşe xilas dibe û mirov ji şikeftan derdikevin, diçin binarên çiya û deştan. Li wan deran cihên xwe çêdikin. Ango ji dema Paleolotîk (serdema kevir ya kevn), derbasî serdema neolîtîkê (serdema kevir ya nû) bûne.

Lêkolîner li hemû cîhanê digerin, cihê herî kevn yê cihbûnê careke din li Kurdistanê ye. Mesela Xirab Reşk (Göbekli Tepe), mînaka ewil e. Xirab Reşk, 15 km li rojhilatê Riha ye. Arkeolog dibêjin, ew cihekî olî yê wê serdemê bûye, ango cihekî weke Hac’a îro bûye. 20 mabed-tapinaq dîtine. Heya niha 4 heb derxistine û lêkolîn dikin. Niha jî dibin çavderiyê de ye, pir zêde dernaxin derve. Her mabetek 12 stunên (paya) wê hene, 2 metro zêdetir bilind in. Bi kevirên mezin hatine çêkirin. Li ser erdeki 8 hezar metro çargoşe, ew cih çêkirine. Temenê wê vedigere, 12 hezar sal beriya mîladê. Ango temenê wê 14 hezar sal e. Hê lêkolîn dikin, ew çiye û çi nîne? Ji vî cihî wêdatir, li Dûnê cihekî ku temenê wê 10 hezar sale nedîtine. Ew cihê olî jî li Kurdistanê ye.


XIRAB REŞK -1


XIRAB REŞK - 2

Wekî din Newalî Çolî heye. li ser Rûbarê Firat e. Li gorî lêkolînan, li wê derê jî 5 xanî hene, li nêzikî çêm çêkirine. temenê wî jî vedigere 10 hezar sal beriya mîladê. Wate Temenê wê texrîben 12 hezar sal e. Hinek xanî çarkoşe ne, hinek gilover in. Li gorî lêkolînan, mirovan 12 hezar berê li vê derê civakbûn û çandînî pêş xistiye.


Li Erganiya Amedê jî, Şikeftên Hîlar-Kota Ber Çêm (Çayönü) hene. Li wê derê jî texrîben jiyana aîdî 10 hezar beriya mîladê ye, dîtine. Hestiyên mirovan yên wê demê dîtine. Ya girîngtir, li wê derê çerm û qamûşên wê demê dane şûxilandin dîtine. Niha ji bo Xirab Reşk dibêjin, destpêka ol û tapinaxan li vê derê çêbûye. Ji bo Hîlarê jî dibêjin, destpêka fêrbûna cil û karanîna qûmaş li vir çêbûye. Ew jî mînakek e.




Wekî din, li Başûrê Kurdistanê milê Çemçemal “Gundê Çermo” heye. Firehbûna wî jî 13 hezar metre çargoşe ye. Herêmek e, li wê derê 25-30’î xanî dîtine. Temenê wan vedigere beriya 9 hezar sal. Cihê herî kevn ku ambarên ce û genim bi awayekî pergal dîtine ew der e. Niha di cîhanê de ji bo mijara çandînî, vê derê mînak digirin. Temenê wê ji cihên din yên Kurdistanê ne nûtir e, lê çandînî pêşketîtir hatiye dîtin. Ew destar û harîn li wê derê dîtine.

Ew belge hemû nîşan didin ku civakbûn, gundinî, çandînî, hemû li vê erdnigariyê çêbûne. Gelek gundên din dîtine, li milê Mûsil, Şengal

hene. Temenê wan 6-7 hezar sal e. Li gorî lêkolînên ku hatine kirin, li Kurdistanê 30-40 cihên ku temenê wan ji 5-6 hezar sal zêdetir e hene. Şoreşa çandînî û gundbûnê li van deran çêbûye. Serokatî jî di paraznameyên xwe de van cihan û taybetmendiyên wan berfireh vedike.




Niha li Rojhilat jî hinek cih dîtine, temenê wan vedigere 8-9 hezar sal berê, li Hîndîstanê cihên ku hatine dîtin heya 6-7 hezar sal berê diçe. Li Ewropa, Anatolya, Misirê cihên hatine dîtin dîroka wan heya 4-5 hezar sal berê diçe. Bes cihekî 12 hezar sal temenê wî hebe, xeynî Kurdistanê cihekî din nedîtine. Ew çi îspat dike? Wisa be, şoreşa civakbûnê û çandiniyê li vê derê çêbûye û li cîhanê belav bûye. Ew girîng e. Ji bo wê Serokatî dibêje, "di serdema xwezayî de şoreşa civakbûnê û şoreşa çandiniyê pêş ketiye; ew du gavên girîng yên mirovahiyê ne. Herdu gav jî li ser erdnigariya ku em îro pê re dibêjin, Kurdistanê ne."

Ew jî ji bo me nirxekî mezin e, divê em lê xwedî derkevin. Divê em biçûk nebinin û rê jî nedin ku tu kes biçûk bike. Lewra başî û xirabiya dîrokê li ser mejiyê mirov tesîrê dike. Dema ku tu zarokekî re bibêjê, "bavê te û dayika te leheng bû" dema ku ew zarok mezin dibe her xwe leheng dibîne. Tu pê re bibêjê, "bavê te û dayika te virt û vala bûne" ew zarok hîç dibe. Ew tesîrê li ser mejî û pîsokolojiya mirov

dike. Dewletên derve û gelek rewşenbîrên me jî gotine, “em hîç in” û wisa em bûne hîç. Lê Serokatî dîrokeke radixe ber çavan. Gelek dîroknas û lêkolîner jî vê îspat dikin. Pêwîst nake ku em wan lêkolîneran re bibêjin bên Kurdistanê, jixwe ew bi xwe li pêy dikevin. Girîng dibînin.

Divê em jî girîng bibînin, qiymet bidinê û giraniyê bidinê. Nirxê civakê ew e, divê em lê xwedî derbikevin. Gelek kesên ku di nava civaka me de hene, van nirxan dibînin û bi pereyan difroşin. Hinek jî didizin û dibin difroşin. Ew kesên ku van tiştên dîrokî kom dikin, dibe ku qet nexwezin kes behsa wan jî bike. ji bo vê divê em seranser nêzik nebin.

Weke cih û warên dîrokî ku li Kurdistanê hatine dîtin, me çend mînak dan. Ew mînak ji bo dîrok û erdnigariya Kurdistanê girîng in. Serokatî jî di paraznameyan de bi berfirehî behs dike. Ew belgeyên dîrokî ji bo me tên çi mahneyê, em çawa nêzik wan bibin û giringiya wan çi ye? Em weke berê dîrokê nagrin dest. Dudu, dema ku em behsa van serdeman dikin, alaqaya wê bi Kurd û Kurdistanê heye. Lewra wê demê de navê Kurd û Kurdistanê tune, lê erdnîgariyeke ku ji bo jiyana civakî bûye bingeh heye. Li ser vê esasî jî em hem lêkolîn dikin, hem dinirxînin.

Berhemên ku di wê demê de hatine pêşxistin, yekem şoreşa civakî ye, jiyana civakî ye. Jiyana civakî çi ye? Rêber Apo dibêje, “tenê bi kombûna mirovan, civak çênabe.” Hinek taybetmendî û xûsisiyet hene, dema ku ew tên gel hev civakbûn çêdibe. Divê em van taybetmendiyan bizanibin. Dema ku ew taybetmendî cihekî hebin, reng û cewherê wê kûr dibe. Em niha jî pir zêde li ser jiyana civakî nîqaş dikin, Serokatî dibêje, “jiyana komînal.”

Taybetmendiya yekem ya jiyana civakî; têkiliyên mirov bi mirovan ve xwezayî ye, bê amûr e. Ango hinek tişt nakevin navberê. Mînak em niha weke gelekî dixwazin bi gelên din re pêk ve jiyan bikin, xwezayî ye. Lê di têkiliyên dewletê de, her tişt bi riya saziyan pêş dikevin. Di jiyana civakî de, peyvendiyên mirov û mirov raste rast in. Pêk ve têkilî datînin. Ew xaleke girîng e. Bingeha vê jiyanê li Kurdistanê hatiye avêtin. Hemû lêkolîner vê dibêjin. Li ser vê esasê formen civakî çêbûne. Rêber Apo dibêje, “dîroka civaka xwezayî, forma civakî ye.”

Bala xwe bidinê, di dema civaka xwezayî de rengekî form heye; ew jî forma civakê ye. Îro du reng hene; yek forma deshilatdarî û pergala dewletê ye, yek jî civak e. Civak jî ji malbat, eşîr û gelan pêk tê. 250-300 hezar sal berê, heya beriya zayinê 3 hezar salan di jiyana mi-

rov de yek form hebûye, ew jî forma civakî bûye. Bingeha vê formê li Kurdistanê hatiye avêtin. Serokatî ji ev forma yekemîn re dibêje, “Klan.” Klan hem civakê tevger dike, hem jî bi rê ve dibe. Peyvendiyên mirovan diyar dike û li gorî wê jiyanê rê ve dibe. Weke îro dewlet rê ve nabe û formê civakê jî ne cuda ye. Klan hem peyvendiyên mirov û mirovan çêdike, hem jî jiyanê rê ve dibe.

Di van klanan de mirovan weke 25-30 kesî bi hev re jiyan kirine. Di nava van de jin, mer, kal, zarok hebûne; bi hev re jiyan dikirine. Têkiliyên jin û mêr, ne weke ya îro bûne. Pêk ve jiyan kirine, zarok jî zêdetir aîdî jinê dihatiye dîtin, lewra ya ku zarokan tîne dinê ew e. Ji ber vê ew serdem, di dîrokê de weke dema dayikê tê pênasekirin. Hinek nêzikatiyên şaş hene, weke ku jin di wê serdemê de deshilat bûye digirin dest. Lê ne wisa ye. Jiyan bi dayikê tê nasîn, zarok bi dayikê tê naskirin. Rista komkirina civakê ya dayikê heye.

Rêber Apo jî dibêje, “her lêkolîna ku nêzikî rastiya dayikê nebe, encamên rast nade.” Bala xwe bidinê, taybetmendiya resen ya jinê-dayikê çi ye? Her dema xwe dide zarokan, her dixwaze pirsgirek bên çareserkirin. Bi xwe zehmetiyan dikşîne, da ku civak zehmetiyan nekşîne. Niha dibe ku di pergala baviksalarî de ew taybetmendî hinekî kêm bibin, lê her jî tên jiyankirin. Ji ber van sedeman, wê demê weke serdema dayikê pênase dikin. Ew yek jî herî zêde li Kurdistanê jiyan kiriye. Dema ku îro jî em behs dikin, em dibêjin hê jî rista dayikê heye, di civakê de xwedî cihekî taybet e. Bingeha xwe ji vê demê digre.

Ger li cihekî kok kurtir be, berhemên wê jî ew qesa zêde dibin. Mesela hinek dar hene, koka (rîçik) wê çiqasa kûr be, berhemên wê jî ew qesa zêde û mayinde dibin. Lê hinek dar hene, kokê wê ne kûr e, bejna wê çiqasa dirêj be jî bi bayekî re, ew dar dirûxe. Li Kurdistanê jî rîçikê jiyana civakî kûr e. Rîçikê jiyana ku di pêşengtiya dayikê de pêş ketiye, li Kurdistanê kûr e. Ji bo vê, tesîra xwe li ser îro jî dike. Her çiqasa pergala zilam pêş ketibe û gelek pergalên cuda yên deshilatdariyê hatibin Kurdistanê jî careke dîtir di nava civakê de hinek cewher hatine parastin.

Em carna dibêjin, li Kurdistanê ne tenê jin, hemû mirov hestiyar in, naxwazin malê xelkê bixwin. Em dibêjin Kurd destê xwe dirêjî malê xelkê nake. Dibe ku li gorî jinê kêmtir be, lê di zilamê Kurd de jî ew tişt heye. Bingeha xwe ji vê serdemê digre.

Di destpêkê de ew forma civakî çêdibe, klan pêş dikevin. Dayik pêşengtiya klanê dikin. Têkiliyên mirovan raste rast in û li ser esasê xizmetî hev û din kirinê ne. Civakbûn bi vî rengî pêş dikeve. Mirov

dibînin ku bi tenê nikarin xwe biparêzin, ji bo ku bikaribe xwe biparêze tên gel hev û din, ew yek. Dudu, dibînin ku bi tenê nikarin jiyana xwe bi giştî araste bikin, tên gel hev û din û jiyana xwe bi hev re araste dikin. Ew bingehên civakbûnê ne. Ji ber ku taybetmendiyan herî girîng ya jiyanê civakbûn e, dema ku yek pêdiviyên civakbûnê pêk nîne, civak wî/ê qebûl nake. Yek bixwaze tena serê xwe jiyan bike, her tiştî ji bo xwe bixwaze; ew civak wî/ê kesî/ê qebûl nake.

Em jî dibêjin, weke civaka PKK'ê em li ser esasê xizmet çêbûne. Ger hevalekî/a me, bi zanebûn ezezîtiyê bike, dê heval qebûl nekin. Ger heval qebûl bikin, wê demê civakbûna me namîne. Lê di hinek rêxistinên din de tê qebûlkirin, her kes ji bo xwe jiyan dike.

Di dema paleolotîkê de, bi vî rengî civak hêdî hêdî jiyana civakî pêş dixe. Ew li Kurdistanê dibe. Ew milê forma civakî ye. Lê tiştekî din ku di wê demê de çêdibe jî baweriya (zîhniyeta) mirov e. Rêber Apo vê zîhniyetê weke "anîmîzm" pênase dike. Mirov wisa difikirin ku hemû derdora wî/ê zindî ye, xwe jî beşeke ji wê zindîbûnê dibîne. Anîmîzm ew e, zindîbûna derdorê û xwezayê ye. Xwe jî beşeke ew xwezaya zindî dibîne. Ango di wê demê de baweriya anîmîzmê li Kurdistanê pêş dikeve. Ji bo wê heya îro tesîra anîmîzmê li Kurdistanê heye. Ne weke wê demê ye, lê heye. Ew du mijarên girîng in; forma civakbûnê û zihniyet-bawerî. Lewra yên ku pişt re diguherin jî forma civakê û zîhniyet e.

Civaka xwezayî, arkeolog îro weke sê beşan bi nav dikin; dema kevrê kevn (paleolotîk), dema kevrê navîn (mezeolotîk), dema kevrê nû (neolotîk). Ew sê merhele di dema yek civakê de tên jiyankirin. Ji bo çi wisa tê binavkirin? Lewra di dema kevn de (beriya BZ 20000-15000'î), mirov fêrî hin tiştên destpêkê dibe; fêrî agir pêxistinê dibe, fêrî şûxilandina kevir dibe. Ji bo vê dibêjin, dema kevirê kevn. Mirov di vê serdemê de hê nû fêrî şûxilandina hin tiştan dibûne û amûrê ku di destpêkê de daye şûxilandin jî kevir bûye, ji ber vê wisa gotine.

Di dema mezelotîkê (dema helîna berfê) de, mirov hinek şêwe didin kevir û wisa didin şûxilandin. Ji bo vê navê wê weke dema kevirê navîn lê dikin. Dibêjin ew demeke navîn û derbasbûnê ye. Ew dem ji BZ 20-15 hezaran destpê dike, heya BZ 12 hazar salan berdewam dike. Li vir hinek ziman pêş dikeve; di destpêkê de zimanê Semîtîk, pişt re jî zimanê Aryenî pêş dikeve. Di van deman de, êdî mirov derdikevin derveyî şikeftan û êdî hejmarê mirovan jî zêde dibe. Li vir klan mezintir dibin. Dibêjin cara yekem hejmara van klanan digêhêje 150-200 kesî

û dadikevin keleka çeman. Mesela hin cihên kevn dîtine, heya 250 kesan lê jiyan dikiriye.

Dema ku ew klan mezin  dibin, ji wan re dibêjin “tîre.” Ew peyv li Kurmanciya Jêrîn de zêdetir tê şixûlandin, li cihên dîtir yên Kurdistanê peyva teyfe-qebîle- tê şixûlandin. Lê Kurdiya wê ne bi wî rengî ye. Îro jî li Kurdistanê tîre hene. Îro klan nemaye, cihê we malbatê (binemal) dagirtiye. Niha malbatên ji 5-6 kesan pêk tên. Lê heya 30-40 sal berê jî gelek bira û malbatên wan di nava hewşekî de jiyan dikirin û wan re jî digotin malbata falan kesî. Bajêr jî wisa bû, gundan jî wisa bû. Lê niha ne weke berê ye. Klan jî weke wan malbatên 30-40 sal berê ye, ji 5-6 malbatên biçûk pêk tên. Li bi demê re an hejmara wan zêde dibe, an jî çend klan tên gel hev û din û tîre çêdibin. Hem zarokên wan çêbûne mezin bûne, hem jî bi hevgirtina klanên cuda zêde bûne. Îro ew yek weke tîre tê bi navkirin.

Serokatî ji bo vê demê dibêje, “rast e, di vê demê de hejmara mirovan zede bû, lê neçar nebûn ku deshilatdariyê pêş bixin.” Hejmara klanê zêde dibe û dizivire tîreyê, lê dîsa jiyaneke civakî berdewam dike. Careke dîtir, bingeha jiyana civakî nehatiye windakirin.

Êdî di dema neolotîkê de gund zêde dibin, çandînî û zîrat zêde dibe. Beriya 14 hezar sal, li Kurdistanê gund çêbûne, cihên zîratê pêş ketine, hejmara civakê jî zêde bûye. Ew girîng e. Gelek berhemên mirov û kêdîkirina heywanan, piranî li Kurdistanê çêbûye. Dema ku ew guhertin û pêşketin çêdibin, hejmara mirovan jî zêde dibe. Lewra derfetên jiyanê zêdetir dibin, derfetên xwe parastinê zêdetir dibin.

Wê demê gaveke din tê avêtin. Ji aliyê forma civakî ve xêl-eşîret çêdibin. Klan, tîre (qebîle), xêl (eşîr). Ew formen civakbûnê ku di serdema civaka xwezayî de çêbûne. Pêwîstî bi dewletan nedîtine. BZ 8-9 hezar sal berê xêl pêş ketiye. Ew jî rêxistineke civakî ye. Di xêl de berê rista jinê zêdetir pêş bûye. Lê hêdî hêdî rista zilam jî zêde dibe. Serokatî jî di hinek cihan de dibêje, “bingeha şamantiyê û hwd, hêdî hêdî li vê derê de pêş dikeve.” Pergala jiyana xêl jî, weke ya klan û tîre ye; bes bingeha rista zilam û danehevan jî ava kiriye. Lê neziviriye rewşeke çîn û tebaqayan. Dema ku xwestine tiştna bikin, pêk ve kirine. Bi nîqaş û biryarên hevpar karê xwe meşandine.

Li gorî lêkolînên hene, di vê demê de hê baviksalarî pêş neketiye. Hê jî jiyan û malbat pêk ve ne. Ew jî li Kurdistanê çêbûne. Bala we jî kişandibe, heya van deman derveyî Kurdistanê li cihekî ditir, civakbûn pêş neketiye. Belgeyeke vê nîşan dide tune ye. Texrîben, di BZ 8 hezar salan de xêl pêş dikevin, heya wê demê cihekî din yê dinê, civakbûn

tune ye. Wisa be, bingeha klanbûn, tîrebûn û xêlbûnê li Kurdistanê baş hatiye avêtin û pişt re belav bûye.

Em îro jî dibêjin, bingeha eşîr-xêlan li Kurdistanê ew qesa kûr e. Me berê weke xirabî dîdît. Li gorî paradigmaya kevn, bi aqliyeta sosyalîzma pêkhatî, me malbat, tîre, xêl li pêşiya netewiyetê asteng dîdîtin. Em niha wisa nagrin dest, dijberî wê em dibêjin forma civakbûnê ye. Niha jî kêmasiyên wê hene, hatiye xirab kirin, ne weke berê ye. Di klan, tîre û xêlên berê de hev re jiyankirin esas bûye, xweza zindî bûye, jin û zarok û kal nehatine tepisandin, rista her kesî heye. Lê di eşîrên îro de zilam û xanedan serdest in. Divê ew bê sererastkirin. Lê têkiliyên civakî ku di nava malbat û mirovan de pêş dikevin, îro jî ne xirab in. Ew pêwistiyên jiyana civakî ne.

Hin çandên ne baş ketine nava eşîrê; doza xwînê, nêzikbûna jinê û hwd bi pêşketina deshilatdariyê re çêbûne. Mirov dikare vê rexne bike û sererast bike. Lê mirov nikare hemûyê red bike. Redkirin, bingeha xwe ji pergala deshilatdarî û şaristaniyê digre. Dema ku ew pergal pêş ket, xwest formen civakî yên weke klan, tîre û xêlan-eşîran rake. Lewra tîre û xêlan-eşîran li hemberî çand, zihniyet û çanda deshilatdariyê sekinîn.

Bi taybetî ew 200 salên dawî, ew form zêdetir li hemberî pergala deshilatdarî sekinîn û pergala modernîst jî xwest van ji holê rake. Vê li ser me jî bandor kiriye, ji ber vê divê em nêzikbûna xwe sererast bikin. Divê em weke berê nêzikî tîre (qabîle) û xêlan (eşîr) nebin. An na em dîrokê rast nagrin dest.

Baweriya yekem jî anîmîzm bû, di serdema neolotîkê de jî totem pêş dikeve. Li gorî anîmîzmê em hemû zindî ne, bes li gorî totem hinek zindî zêdetir bi nirx in. Li Kurdistanê ji ber ku serme bûye, nirxê roj-tav û agir zêdetir bûye. Cihekî weke Hîndîstanê, ji ber ku çêlekê xizmetî jiyana wan kiriye pîroz e. Li her cihekî tiştek derketiye pêş. Îro jî wisa ye; cihê ku mirov lê jiyan dike, tiştê ku jiyana me hêsan dike bi qiymet e. Ger tiştek fayda nade jiyana me em diavêjin. Wê demê jî wisa bûye. Bi vî rengî baweriya totem pêş dikeve.

Li Kurdistanê baweriya totem, di Mîtraîzmê de jî tê dîtin. Mîtra nunertiya roj dike, hinek dibêjin “remza roj.” Bawerî bi roj, tav û agir heye. Ne tenê Kurd jî, hemû civakên Aryen û Zagrosî Mîtra pîroz kirine û li ser wê bawerî hatine avakirin. Tesîra wê heya îro jî heye. Bala we jî kişandibe, hevalên me yên Yarsan û Elewî zêdetir van mijaran dizanin. Lewra hinek taybetmendiyên Mîtraîzm û Êzdaniya kevn, der-

basî van olan bûye. Li gorî wê girêdana xwezayê, eziyet nedayina ajalan di van olan de heye. Ji totemîzmê dest pê kiriye, heya îro hatiye.

Diyare ku di Mîtraîzmê de malbatî (malbata biçûk) jî pêş dikeve. di peyamên Mîtra de dibêje, divê xeynî jineke û merekî, têkiliyên cuda çênebin. Beriya wê sînorekî têkiliyê tune. Weke îro weke namus ûhwd nehatiye dest girtin. Lewra êdî hejmara mirovan zêde dibe, jiyan dewlemend dibe, berhem zêde dibin. Bi vî rengî hêdî hêdî bingehê van tiştan jî tê avêtin. Lê weke baweriyê ye. Ne qalib û dogma ye. Belgeyên ku gihêştine îro van tiştan pir bi kîte nakin (detaylandırmamak), lê li gorî tesîra wan ku heya îro hatiye jî mirov van tiştan dibîne û dikare şîrove bike. BZ 4-5 hezar sal bingeha van baweriyan li Kurdistanê pêş ketiye.

Hêdî hêdî civaka Kurdistanê, dixwaze gaveke din biavêje, formeke din pêş bixe. Heya wê demê formê civakê klan, tîre û xêl e. Forma baweriyê anîmîzm û totemizm û mîtraîzm e.

Di navbera BZ 6 hezar sal û BZ 3 hezar salan de jî neolotîk û berhemên wê li gelek cihên cîhanê belav dibe. Li Îran, Hîndîstan, Çîn, Anatolya, Misir, Ewropa jî êdî bingehê jiyana gund û çandiniyê ya neolîtîkê tê dîtin. Li başûrê Mezepotamya jî êdî neolotîk tê dîtin. li Tîkrîtê, hin cihên dîrokî ku aîdî serdema neolotîkê ne hatine dîtin, dîroka wan heya BZ 5-6 hezar sal diçe. bajarê Samere heye, nêzikî Bexda ye. Texrîben dîroka wê heya BZ 3 hezar 500 sal diçe. Ew diyar dike, êdî neolotîk hem berv bi başûr ve, hem berv bi rojhilat ve, hem jî berv bi rojava ve belav bûye. Ew di hezaran salan de pêk tê.

### *-Di Serdema Hiyerarşî û Koledariyê De Hozên Kurd*

Li Kurdistanê jî berhem û hejmara mirov zêde dibe, ew pêwîstî û lêgerînên nû derdixe holê. Ji bo wê heya wê demê çawa forma xwe fireh kiribin, di BZ 4-3 hezaran de jî lêgerîna formeke nû heye. Hem milê civakbûnê ve, hem jî ji milê baweriyê ve dixwazin gav biavêjin. Lê li cihên dîtir jî lêgerîn çêdibin.

Başûrê Mezepotamya jî çandên Ûbeyd û Til Xelef tên dîtin. Til Xelef di nava herêma Rojavayê Kurdistanê de ye, bi Erebî pê re dibêjin “Cozan.” Nêzikî Amûdê û Serekaniyê ye. Dîroka wê heya BZ 4 hezar 900’î ye. Texrîben nêzikî 7 hezar beriya niha ye. Çima dibêjin çanda Til Xelef? Lewra heya vê demê mirovan amûrên xwe hemû ji kevir û heriyê çêkirine. Lê di dema Til Xelef de mis (tunc) kar anîne. Ji bo vê dibêjin, “serdema mis (tunc).” Bi mis amûr tên çêkirin. Her wiha tiştên

ku bi heriye çêkirine jî pêş dixin, pir zirav û xweşik çêdikin. Êdî bûne hostayên wê. Ji ber vê weke demeke nû tê bi nav kirin. Mirov ji milê hostatî û danehevan ve gaveke di avêtine û pêşketinek çêbûye.

Lê rûxmî ku ew guhertin çêbûne; ji milê civakî û baweriyê ve guhertinek çênebûye. Til Xelef, weke çandekî gundînî û çandiniyê tê bi nav kirin, lê guhertinên deshilatdariyê çênebûne.

Ûbeyd heye; li başûrê Iraqê ye. Ew jî di demên Til xelef de ye. Niha başûrê Iraqê dibêjin "Çanda Ûbeyd." Di wê demê de jî tebax û hwd çêkirine, mis kar anîne. Lê pergala jiyana wan êdî berv bi guhertinekê ve diçe. Ew jî texrîben BZ 5 hezar û 4 hezar 500 sal e. Nêzikî dema Til Xelef e. Arkeolog dibêjin, "diyar e, çanda Til Ûbeyd bûye bingeha avabûna pergala deshilatdariyê." Ji bo avabûna bajaran bûye bingeh. Til Xelef jî mezin e, Til Ûbeyd jî mezin e; bes Til Xelef nebûye bingeha bajarvaniyê. Lewra tê gotin, "hinek şûnwarên li Til Ûbeyd hatine dîtin, bingeha bajarvaniyê diyar dike." Tam nebûye bajar, lê bingeha wê diyar dike. Êdî nîşaneyên guhertina jiyanê jî dide.

Di serdema xwezayî de jiyan di şikeft û gundan de bû. Pergala jiyanê, forma civakî bû; Klan, tîre û xêl bûn. Bawerî anîmîzm û totemizm bû. Lê di serdema hiyerarşiye de jiyan di bajaran de ye, bingeha wê jî li Til Ûbeyd tê dîtin. Ji bo wê tê gotin ku "bajarbûn, li ser çanda Til Ûbeyd pêş ketiye." Niha jî eşîreke mezin ya Ereban heye, navê wan Ûbeyd e. Li Iraq, Sûîdî û Misirê hene. Hinek dibêjin, ji wê demê mane.

### *1-Hûrî*

Di navbera BZ 4 hezarî û 6 hezarî de êdî hejmara mirovan zêde dibe. Hem li Mezepotamyaya Jorîn, hem jî Mezepotamyaya Jêrîn nûfus zêde dibe. Wê demê ji xelkê Mezepotamyaya Jorîn re dibêjin "Hurî." Hinek belgeyên ku li ser tabletên hatiye nivîsandin wisa derbas dibin. Di dema şikeftan de, li ser dîwaran hin şêwe çêdikirine û hin tişt destnîşan dikirine. Lê di dema Sûmeran de, li ser tabletên nivîsa bizmarî hatiye nivîsandin. Hin tabletên biçûk ku jiyana wê demê destnîşan dike, nivîsandine û veşartine. Hinekên wan hatine dîtin, heya niha zêdetirî 100 hezarî ji wan kerpîçan hatine dîtin, lêkolînên pir mezin li ser wan hatine kirin. Beşa herî zêde li Bajarê Uruk, Erîdu, Asur, Sus hatine dîtin. Niha hinekên wan hatine tehlîl kirin, lê hinek jî hê nehatine tehlîlkirin. Yên ku hatine tehlîlkirin, êdî derdixin derve.

Di wan tabletan de dibêjin, "qewmê wan herêman re Hurî tê gotin." Weke xelkên Bakûr, an jî cihên bilind e. Ango hinekên din wisa bi

nav kirine. Bi Erebî ji wan re dibêjin "Huriyîn." Hinek nivîskar û lêkolînvan dibêjin, "ew Huriyên ku di Qûranê de behsa wan tên kirin, ew qewm e." Huriyên bihûştê ne. Lewra gotine, "xelkên wê herêmê xweşik in, bi taybetî jinên wan rindik in; dema hûn çûn bihûştê dê wan bidin we." Ew şîroveyek e. Jixwe dibêjin, "navê bihûştê jî ji Kurdistanê hatiye."

Dîtine ku çiya, daristan, av ûhwd pir e; ango li gorî çolên Erebîstanê bihûşt e. Ew nav di wan belgeyan de hene, lê her kesekî/ê li gorî xwe şîroveyek kiriye.

Derbasbûna forma hiyerarşik, bi piranî li Mezepotamyaya jêrîn çêbûye. Li welatê Aryanan (Mezepotamyaya Jorîn) gav avêtin hêdî çêdibin. Heya ji klanê derbasî tîre dibin, ji tîre derbasî xêl dibin, li Kurdistanê pêşketin hene; lê li Başûrê Mezepotamya ji ber ku berhem zû kom dibin, hejmar zêdetir dibin, gavên nû li vê derê tên avêtin. Lewra li Mezepotamyaya Jêrîn, erd zêde ne, cihên çandiniyê berfireh in, Firat û Dîjle jî li ser van erdan e. Ew yek derfeta zêdetir çandînî û berheman dide. Ji gavên dîtir jî, ew yek bingeheke ava dike.

Hinek jî dibêjin, "ji ber ku li Kurdistanê derfetên bajarbûnê tûnebûn, li wê derê bajar çênebûn." Ew nerîneke ku cihê xwe nagre ye. Lewra niha li Hewlêrê milyonek kes jiyan dike. Herî zêde 100 hezar kesî li van bajarên weke Ûrûk û yên din jiyan kiriye. 100 hezar kesî dikarî li cihên weke Hewlêr û Kerkûkê, Kirmanşan û Amedê jiyan bike. Wisa be sedemek din jî heye. Dibe ku di nava çiyan de ew qesa derfetên kombûnê tûnebin, lê biçekî biçe jêrê derfetên wê hene. Sedema esasî ku li Mezepotamyaya Jêrîn bajarbûn pêş ketiye, meseleya zîhniyet û tesîra civaka xwezayî ye.

Bala xwe bidinê, di serdema kapîtalîzmê de tîcaret herî zêde li Venedîk'ê pêş ket. Lê bingeha avabûna pergalê li Venedîk'ê pêş nakeve. Derbasî Holanda û Brîtanya dibe. Lewra li wê derê tesîra ol û Papa kêmtir e. Lewra ol ji aliyê zihniyet ve rê nade ku sermeyadarî bê sînor tevbigere. Aqil û zîhniyeta civaka Aryen jî rê nade ku li erdnigariya wan bajarbûn pêş bikeve.


Bingeha bajarbûnê, li El Ûbeyd pêş ket. Dema ku lêkolîner li ser cihekî lêkolîn dikin, di destpêkê de dibêjin ew gund e, an bajar e? Lewra hin remz û taybetmendiyên gund hene, hinek jî yên bajaran hene. Mesela di gund de piranî xaniyên ku çêbûne, bê derî û bê hewş in. Heya van demên dawî jî li gundên Kurdistanê hewş û derî tune. An jî pir lewaz in. Vê dawiyê hinek gund, ji bajêr jî xirabtir dikin. Lê li bajêr

dema ku xaniyan çêdikin, deriyên wê teqez dikin, hewşên wê bi dîwarên mezin lê dikin.

Çima cudabûnek wisa heye? Lewra li gund tenê ji bo serma ûhwd dîwaran çêdikin, wekî din tiştan ji hev û din venaşêrin. Jiyana wan bi piranî pêk ve ye. Lê li bajaran her kes tiştê xwe vedişêrin. Ditirsin ku tiştên wan ji aliyê cîranên wan ve bên dizîn. Ew mijareke psikolojik e; tenê ne mijareke mîmarsazî û bînasaziyê ye. Rêber Apo jî vê wisa dinirxîne. Ango di navbera şêwaza xanî çêkirina gund û bajaran de ferq heye.

Ya duduyan, di gund de parastineke cîdî tune; lê hemû bajarên ku çêbûne bi suran hatine dorpêçkirin. Piraniya bajarên kevn ku heya roja me mane, surên wan hene. Mal xwe ji mala din diparêze, bajar jî xwe ji bajarê din diparêze. Ew taybetmendiyek e, bingeha wê jî ji milkbûnê tê. Ezezîtî ye. Di civaka xwezayî de komînalbûyin heye, di civaka bajarvaniyê de jî ferdbûn, ezezî heye.

Taybetmendiyeke din jî, li bajaran dûkan hene. Cihên kirîn û firotinê hene. Lê di gundan de kirîn û firotin tune, eyb e. Heya 40-50 salî berê jî, li gelek gundên Kurdistanê kirîn û firotin tûnebû. Tiştê wan zêde be, didin mirovên xwe yên dîtir, yên din jî didin wan. Hev û din îdare dikin, pir kêm kes tiştên xwe difroşin. Li bajaran dûkan, suk û bazara kirîn û firotinê heye. Ji ber wê dibêjin, hin taybetmendiyên bajarbûnê li El Ûbeyd hene. Lê dema ku bajarên Ur, Uruk, Erîdu dibînin, bi her alî ve taybetmendiyên bajarbûnê li van deran hene. Wan tam sazîbûna xwe pêş xistiye.




Di tîcarêtê de çi pêş dikeve? Qezenc (kar) pêş dikeve. Mantiqa berhemên zêdetir û karê zêdetir pêş dikeve. Bingeha vê mantiqê jî di bajaran de pêş dikeve. Li keleka wê karwansaray (hotel-xan) pêş dikevin. Ger tu li gundekî jiyan bikî, tu mêvanekî re nikarê bibêje biçe û cihekî dîtir jiyan bike. Wan dibin malên xwe û hemû pêwîstiyên wan pêk tînin. Lê bajaran ne wisa ye. Dema ku yek biçe bajar, divê cihek hebe ku biçe û îstîrahat bike.

Bala xwe bidinê, heya 20-30 salên berê gelek bajarên me hotel tûnebûn. Bajarên me jî taybetmendiyên gundan jiyan dikirin. Dema ku yek diçû bajêr, diçû mala xizmên xwe. Lê van demên dawî ew jî lewaz bûye.

Di salên 2008-2009'an de, hinek endamên kongreya netewî hatin Başûrê Kurdistanê, em jî pê re eleqadar bûn û me xwest em wan berin û li malên hevalan bi cih bikin, lê wan çûbûn hotolê. Pere dabûn û hotel heciz kiribûn. Me got çima wisa kirine? Gotin, "heval em li malan nikarin bêhna xwe bidin, me ji bo wê hotel girtiye." Me rexne kirin, ew taybetmendiyeke bajarvaniyê ye. Ger tu nunerê gel bê, divê di nava gel de bimînê û bêhna xwe jî li wê derê bide. Şevekê li hotelê man û pişt re rexneyên me ber çavan girtin û çûn malên welatparêzan. Ew malbat jî pir pê re alaqadar bûbûn û pir kêfxweş bûbûn. Bi kurtasî hotel, taybetmendiyeke zîhniyeta bajarbûnê ye.

Tiştekî din ku gund û bajaran ji hev û din cuda dike jî tapinax e. Di gundan de tapinaxên giştî û navendî tûnebûne. Lê di bajaran de ew pêşketiye. Ew jî zîgurat e, bi Erebî dibêjin, “zeqûret.” Li derdora zîguratê bawerî û xwedayên nû û civakeke nû çêkirine.

Di civaka Aryen de, bingeha taybetmendiyên bajarbûnê kêm bûne. Niha jî hinek xelkên me li Kurdistanê hene, di nava gund û bajarên xwe de kar nakin, dibêjin “eybe ku em wan karan bikin.” Lê diçin Ewropa û karên herî hêsan dikin. Lewra çavê wan derve ye, ji civaka xwe biyanî bûne. Ew psîkolojiyek e. Civaka me îro jî rê nade ku hin taybetmendiyên bajarvaniyê di nav de çêbibin. Hinek kes hene, nikarin di nava civaka xwe de her tiştî bikin, lê dema ku derdikevin derve wan tiştan dikin.

Di wê demê de jî pêwîstî biguhertinê heye, lê civaka Kurdistanê rê nade guhertineke bi vî rengî, guhertin hebe jî hêdî diçe. Lewra taybetmendiya civaka xwezayî û demokratîk hêdî ye, ne lezgîn e. Eger îro em biryareke demokratîk bidin, divê em nîqaş bikin û ya herî baş bibînin; lê ger em biryareke navendî bidin, em dikarin hema biryar bidin, rehet e. Hevalên me gelek caran dibêjin, “me berê hema biryar didan.” Rast e, lê berê em partiyeke Stalînîs-Lenînîst bûn. Me nîqaş jî dikir, lê hinekan qebûl nekiriba jî me navendê biryar dida û her kes jî mecbûr bû ku pêk bîne. Lê niha wisa nabe. Tu ji bo mijareke herî biçûk, bi seatan nîqaş dikê. Ev yek jî leza gohirtin kêm dike.

Civaka wê demê jî rê nade ku pêşketineke weke bajarbûnê çêbe, lê ji bo ku tiştekî pêş bixe jî dem pêwîst dike. Ew dibe sedem ku li Mezepotamyaya Jêrîn bajarbûn, dewlet û pergaleke nû pêş bikeve. Lê li Mezepotamyaya Jorîn. Hin tişt tên jiyankirin û lêgerînek heye, lê hê tiştên nû tam bi formûl nebûne. Êdî dinê dibe du form. Forma civakbûnê ku li Kurdistanê jiyan dike û forma dewletbûnê ku li Mezepotamyaya Jêrîn jiyan dike. Li Mezepotamyaya Jêrîn jî formê civakbûnê tune nabe, bes lewaz dibe. Lê li Bakûrê Mezepotamya û erdnigariya Aryenan forma civakbûnê hê jî xurt e.

Ji bo vê, wê serdemê re (BZ 4000-3000) dibêjin, serdema ji civaka xwezayî derbasbûna civaka deshilatdariyê. Demeke derbasbûnê ye. Li Mezepotamyaya Jêrîn, li bajarên Ur û Erîdu pêş dikeve. Şerê ku Serokatî behs dike û di navbera Enkî û Înana de, di navbera Marduk û Tîamat de derbas dibe ew e. Ew xwedanên van bajaran in. Her yek nunertiya civakeke dike. Tîamat û Înana nunertiya civaka xwezayî û jinê dikin, Marduk û Enkî nunertiya pergala deshilatdar ya zilam dikin. Di encamê de ew ser dikevin.

Dema ku li Mezepotamyaya Jêrîn pergala deshilatdariyê bi ser dikeve, bajar weke pergal û deshilatdarî (ne weke cih û war) araste dibe êdî xanedanî pêş dikeve. Xanedaniya Ur û Sûmeran di BZ 3000 hezaran de pêş dikevin. Heta serdema Akadan (BZ 2731) wisa berdewam dike. Lê Akad êdî împaratoriyeke mezin ava dikin. Beriya serdema Akadan, dewletên bajaran hene. Pişt re li Atîna û Yewnanîstanê jî dewletên bajaran (site dewleti) pêş dikevin, ne wisa? Mesela li başûrê Iraqê gelek bajarên xwedî dewlet hene; Erîdu, Uruk, Ur, Lageş, Sabar, Akad, Nîpur, Babil… Nêzikî 12 bajarên dewletî hene.

Her bajarekî dewletekê wê hebûye. Lê di dema Akadan de Sargonê Akad, van bajaran hemûyan dixe bin serweriya xwe û Împaratoriya Akadan ava dike. Hemû împaratoriya wî, ji başûrê Iraqê pêk tê, ango li gorî îro dewleteke biçûk e. Ji Bexda heya Basra ye. Lê li gorî wê demê împaratoriyek e. Lewra beriya wî her bajarek dewletek e. Sargon van bajaran komî ser hev dike û dixe destê xwe. Ew weke gava yekem ya împaratoriyê tê nas kirin.

Piştî ku kombûn çêdike û hemû bajaran dixe bin serweriya xwe, êdî ji bo ku bê Kurdistanê dikeve nava hewldanan. Çima? Da ku civakeke zengîn e; bingeha bajarbûn, dewletbûna wî jî li wir hatiye û keleka wî ye. Lê Sargon nikare Kurdistanê bigre. Li gorî ku belgeyên hatine dîtin, neviyê wî Naramsîn (BZ 2290-2259) heye. Ew jî êrîşî ser Kurdistanê dike û beşeke Kurdistanê digre. Cihê ku digre li gorî îro Başûrê Kurdistan û beşek jî milê Rojhilatê Kurdistan e; milê Kirmanşan û Loristan e.

### *2-Lolo*

Di wê serdemê de, li gorî belgeyên Akadan Loloyiyan li wê herêmê jiyan dikirine. Hinek jî dibêjin "Lolobî." Ew dibin pêşiyên Loriyan. Ji Rojhilat, heya herêma Karadax ya Başûr hene. Li wê sîlsîleyê şerê hev kirine, dema ku Naramsîn bi ser ketiye, li wê derê nexşê xwe çêkiriye. Niha li Karadax, li milê Şaho nexşê wî yê serkeftinê heye. Dema ku serkeftî bûye, navê xwe kiriye padîşahê her çar aliyê dinê. Lewra Kurdistan û çiyayên Kurdistanê jî girtine.

Hinek dibêjin, "çîroka Gilgameş, çîroka wan e." Hinek dibêjin, "beriya wan e. Lê nunertiya wan dike." Hinek jî dibêjin, "çîroka Gilgamiş ya paşayê Sûmerî ku BZ 2600'î de jiyan kiriye." Li gorî tabletan, heya wê demê êrîşeke cîdî li ser Kurdistanê nebûye. Bes efsaneyeke bi vî rengî heye. Li gorî çîrokê, ew çîroka Gilgameş, 300 sal li beriya Akadan çêbûye. Lê belgeyeke vê ronî dike tune ye. Ji ber vê hinek

dibêjin, “dibe ku ew çîrok di van pêvajoyan de li ser van şeran hatibe çêkirin.” Bi kurtasî di van deman de, li ser Kurdistanê êrîşek û berxwedanek heye, piştî demekê berxwedana Loloyî li Kurdistanê dişke.

Di çîroka Gilgameş de; Humbaba nunertiya Kurdên berxwedêr dike, Enkîdu nunertiya Kurdên xayin dike, Gilgameş jî nunertiya qralê van dewletên ku êrîşî Kurdistanê dikin dike. Şîrovekirina wê girîng e. Ger mirov bigêhêje şîroveyeke rast, xiyanetên din jî ronî dibin. Sedema vê xiyanetê çi ye? Rêber Apo baş pênase dike, divê em baş li ser kûr bibin.

Sedem çi ye? Wê demê di civaka Kurdistanê de lêgerînên guhertinê hene, bes civaka Kurdistanê hê biryar nedaye ku xwe çawa biguherîne. Lê li keleka wê guhertin çêbûne. Pişt re êrîşî Kurdistanê jî dikin. Piraniya civaka Kurdistanê wê demê dijberî van guhertinên ku li Mezepotamyaya Jêrîn tên jiyan kirin in. Lê hinek jî hene aşiqî wê dibin. Wê demê ji ber ku lêgerîn hene di civaka Kurdistanê de, bi neçarî derve jî dinêrin. Dema ku derve tiştekî nû çêdibe û xwe weke modelekî nîşan dide, bala hinekan dikşîne. Li vê derê çi derdikeve pêş? Divê ew civak an xwe biguherîne û pêşêngtiyê di destê xwe de bihêle; an jî bibe dûvik, paşve bimîne. Wê demê jî, ji ew hêza ku dixwaze êrîş bike bandor dibe. Bi rewşeke wisa re rû bi rû maye.

Kesên weke Enkîdu jî çavên xwe berdane derve, baweriya wan bi guhertineke hûndirîn tune. Rêber Apo dibêje, “di dema Medan de Astiyeges, ji Harpagos re gotiye, ‘te çima ji bo xwe nekir?’” Ger bi xwe bike, divê an guhertineke ku civak dixwaze bike; an jî divê wê civakê bike kole. Lê di wê civakê de bingeha kolebûnê tune, rê nade ku pergaleke wisa li ser bê ferzkirin. Wê demê ew kes destê xwe dide derve.

Weke ku di tevgera me de jî hatiye jiyankirin e; piştî salên 99’an em bi qeyranekê re rû bi rû man. Serokatî got, “pêwîst dike em biguherin.” Serokatî got, “di nava me de hinek dogmatik mezî dikin, hinekan jî çavê xwe berdane derve.” Yên dogmatik dibêjin, “ger em biguherin, dibe ku em xirab bibin.” Yên din jî dibêjin, “divê em mînakên derve ji bo xwe esas bigirin.” Bi xwe jî nikare, wê tevgerê weke derve bike, ji bo wê jî destê xwe dide derve û bi qûvetên derve dixwaze mûdaxaleyî tevgerê bike. Xiyanet wisa tê jiyankirin. Ji civaka xwe qut bûye, lê dixwaze li ser civakê jî jiyan bike.

Ew di Enkîdu de jî heye, di Harpagos de jî heye, di Osman û Botan de jî hebû. Ger Rêber Apo nebûya, halê PKK’ê jî weke Humbaba bûya. Ferq tune. Rêber Apo got, “pêwîst e em biguherin, divê em bi hêza xwe

biguherin û bi pîvanên civaka xwe biguherin. Ne li gorî hêzeke derve biguherin.” Bi vî rengî careke din xwe kir hêz, nebû dûvik. Ji bo vê Serokatî dibêje, “berxwedan çiqasa kûr be, îxanet jî ew qesa kûr e.”

Em carna bi awayekî din dinirxînin; weke ku civaka me her xiyanet kiribe û tiştekî din nekiribe, ew ne rast e. Rast e, em teng bûne; lê me her berxwedan kiriye. Yên ku îxanet kirine bi têliyan tên hejmartin. Ya din jî divê em vê heqîqate bizanibin; li cihê ku pîvanên civakê hene, xiyanet çêdibe. Li cihê ku pîvanên civakê tûnebin, xiyanet bê mahne ye. Mînak niha di nava tevgera me de, ger pîvan tûnebin, kî çi bike jî, kes deng nake. Dê her tişt xwezayî bê dîtin. Ji bo vê ger li cihekî pîvanên exleqî û civakî hebin û xwe teng bike dê xiyanet jî pêş bikeve; lê ger xwe fireh bike, dikare rêk li pêşiya xiyanetê bigre.

### *3-Gutî*

Li ser vê esasê di salên BZ 2210’î û şûn ve hêdî hêdî nakokiyên civaka Kurdistanê û hêzên deshilatdar çêdibe. Pirsgirek û pevçûn zêde dibin. Wê demê forma nû li Kurdistanê pêş dikeve. Forma nû çi ye? Piştî ku Akad li hinek cihên Kurdistanê serwer dibin komên din derdikevin. Di nava wan de Gutî hene. Gutî di hinek belgeyên Asurî, Akad û Babilan de tên bi nav kirin. Weke Gotî, Gutî, Kurtî tên bi nav kirin. Hinek kes dibêjin, “dibe ku navê Kurd ji van hatibe.”

Niha li başûrê Bexdayê bajarek heye, navê wî Kut e. Hinek dibêjin, ew bajar Gutiyan çêkirine. Ew jî li çiyayên Zagros jiyan dikin. Piştî ku Loloyî dişken û lewaz dibin, rista Gutiyan derdikeve pêş. Em carna wisa fêm dikin ku dema yek ket tune dibe. Ne wisa ye. Loloyî lewaz bûne. Di dîrokê nêz da jî berî ya 100 salî, rista Şikakan li Kurdistanê pir zêde bû, lê niha kêmtir e. Lê tune nebûne, jiyan dikin.

Dema ku Loloyî lewaz bûne, Gutî derketine pêş. Li gorî belgeyan, di navbera salên BZ 2210’an heya BZ 2116’an li Kurdistanê risteke wan mezin hebûye. Nêzikî 100 salî rista xwe lîstine. Ew jî li çiyayê Zagros, li milê Loristan wan jiyan dikin; li gorî îro berê xwe didin Başûrê Kurdistanê û Iraqê. Di BZ 2156’an de desthelatdariya Akadan tune dikin. Êrîşî Akadan dikin û paytexta wan digirin. Demekê jî li wir hûkim dikin. Paytexta wan başûrê Bexda ye, nêzikî Babil e. Gutiyan li hin bajarên wê demê, hin keleh çêkirine. keleha Kerkûkê wan çêkirine, wê demê pê re gotine “Arbixa.”




Gutî jî pişt re bi destê malbata Ur hatine têk birin. Careke din berê xwe didin çiyan û li çiyan xwe diparêzin. Bala xwe bidinê, di dîrokê de dibêjin, “dema ku Kurd teng dibe, her berê xwe dide çiyan. Dema ku fireh dibe jî xwe dide deştê.” Serokatî jî di paraznameyan de dibêje, “Gutî beşeke qewmê Hurî ne.” Hin belge jî vê piştrast dikin.

Ew dema ku deshilatdarî, ango pergala bajêr berê xwe dide Kurdistanê; dema ku di navbera pergala dewletê û civakê de pevçûn dest pê dikin, bi xwe re guhertinên nû tîne. Jixwe me berê jî diyar kiribû ku di nava civakê de jî lêgerîn hene. Dagirkeriya wê demê, ne bi vî rengî ye. Bi riya teknîk ûhwd nikare her tişî bixe mejiyê mirovan. Tesîra wê heye, lê ne ew qesa kûr e. Van pevçûn, li Kurdistanê lez didin guhertinê. Mesela Lolî û Gotî berhemên wan guhertinan in. Hin qewmên din yên bi vî rengî jî hene.

Dema ku Akadî berê xwe didin Kurdistanê, li Kurdistanê formê civakî yê klan, xêzan (malbat), tîre (qebîle), xêl (eşîr) heye. Heya vê demê jî di forma civakî de guhertin tune. Piştî xêl, forma hoz (konfederasyona eşîran) tê. Niha ew peyv li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê pir tê karanîn. Dema ku gelek xêl-eşîr tên gel hev hoz çêdibin. An jî weke konfederasyona eşîran tê bi nav kirin. Qewmên weke Gutî û Lolî êdî hoz in. Ne xêlek in. Piştî vê demê li Kurdistanê hoz derdikevin pêş.

Di dema hozan de êdî rista jinê kêm dibe. Weke jinên bajêr û pergala deshilatdariyê nîne, lê rista jinê kêm dibe. Di hozan de êdî rista zilam derdikeve pêş. Lewra şer jî pir in; serleşker û serokeşîr, bi piranî dibin zilam. Êdî navê zilam derdikeve pêş. Jin êdî kêmtir aktif dibe. Di

dema ku li Mezepotamyaya Jêrîn bajarbûn û dewletbûn pêş dikeve, li Kurdistanê jî êdî formê civakî diguhere. Êdî hevsengî berv bi xirabûnê ve diçe. Ew jî di nava hoz de çêdibe. Bandora çîn û cinsan zêdetir dibe. Em dikarin bibêjin eşîrên îro jî bi piranî bandorên wan deman in. Tam ne weke Xanadaniyên Ur û Akad in; hê li wir têkiliyên civakî hene.

Bala xwe bidinê, îro jî di gelek eşîrên Kurdistanê de, serokeşîrên bi vî rengî hene. Li hemberî xelk û eşîrên dîtir hinekî din tûnd e, lê di navbera eşîra xwe de hinek nerm bûn heye. Têkiliyên wî yên civakî hê qut nebûne. Ew guhertineke ku di wê demê de, di civaka Kurdistanê de bingeha wê tê avêtin e, bi demê re jî zêdetir dibe.

Ji milê baweriyan ve, di wê demê de li Mezepotamyaya Jêrîn Kahînên Sûmerî çêbûne. Li Mezepotamyaya Jorîn Mîtraîzm hebû; di wê demê de di Mîtraîzmê de jî kastbûn çêdibe. Bala we kişandibe îro jî pergala kast, di Elewîtî, Yarsanî û olên weke Budîzmê de heye. Bingeha xwe heya wê rojê diçe. Hinek dibêjin, ew kastbûn li hemberî ola Semîtîk berxwedanek e. Ew kastbûn çawa çêdibe? Di destpêkê de Mîtraîzm weke olekî civakê ye, lê di vê demê de hinek xirabûn bi renge kastbûnê xwe didin der. Kast, civakê li gorî baweriyê tebaqe bi tebaqe cuda dike.

Mesela niha di Îslamiyetê de ew tune; yekî ji rêzê dikare bibe mele, yek dikare bibe şêx û îmam. Di cewhera Îslamê de ew heye. Bes di nava Êzîdiyan de tiştekî wisa tune; ger tu ji malbata şêx bê, tu her şêxê; ger tu ji malbata feqîr bê, tu her feqîrê. Di Yarsanî û Bûdîzmê de jî ew heye. Bingeha xwe ji Mîtraîzmê digre. Hemû yek ol e, lê tebaqeyên wê hene. Berê her kesî dikariye xwe bi xwe îbadeta xwe bike û pêwîstiyên baweriya xwe bîne cih. Lê di dema kastbûnê de, neçar mane ku di pêşêngtiya qawal û şêxan de îbadet bikin. Niha jî li ser baweriya me bandorên vê hene. di Îslamê de tiştekî wisa tune, lê me derbasî Îslamê jî kiriye. Em dibêjin, “bila falan şêx cihê min dua bike.” Tu kesekî/ê din dikê navbera xwe û Xweda. Lê dibêjin, li hemberî olên Semîtîk, weke rêbazeke xwe parastinê ew yek pêş xistine.

Êdî piştî BZ 2000’î formê civaka Kurdistanê dibe hoz. Baweriya wê jî, ew Mîtraîzma ku bûye kast e. Bi cîranên xwe yên bûne dewlet re jî di nava pevçûnan de ne. Carna ew êrîşî Kurdistanê dikin, carna jî ew hoz berê xwe didin Mezepotamyaya Jêrîn. Bi vî rengî pevçûn berdewan dikin. Beriya BZ 2000’î jî hinek hoz hene, lê piştî BZ 2000’î hoz zêde dibin. Lêgerînên guhertina civakî jî zêde dibin.

Piştî wê tiştê ku herî zêde tê behskirin, pêşketina tevgera Zerdeştî ye. Çawa di nava Semîtîkan de dibêjin, tevgera Îbrahîmî pêş ketiye; di

nava Aryanan de jî tevgera Zerdeştî pêş dikeve. Zerdeşt ne weke kesekî ye, weke tevgerekê ye. Zerdeşt bi xwe ne navek e, pêşengek e. Di nava Semîtîkan de dibêjin pêximber (peyamber, resûl), di Aryenan de jî dibêjin Zerdeşt. Di zimanê kevn yê Kurdan de, Zerdeştî tê mahneya kesê ku xêr û bereket tîne.

Kesên ku li ser Zerdeştî lêkolîn kirine dibêjin, "ji BZ 1748'î heya BZ 700'î gelek Zerdeşt derketine. Armanca wan, hem reforma zîhnî bikin, hem jî reforma civakî bikin. Heya ku gihêştiye Zerdeştê herî dawî, wisa berdewam kiriye. Zerdeştê herî dawî jî Sîmyar e. Li gorî Med û Kurdan, di BZ 700'î de derketiye; li gorî Farisan jî di BZ 625'an de derketiye. Çima wisa dibêjin? Lewra Faris dixwazin bixin malê xwe. Dibêjin fikre pergala Îranê li ser zîhniyeta Zerdeştî çêbûye. Li gorî Med û Aşûriyan jî, ew tiştên ku Fars dibêjin şaş e. Dibêjin xwestine weke xwe lê bînin.

Ya girîng, bi navê Zerdeştiyê di navbera BZ 1748'î û BZ 700'î de, di civaka Kurd de guhertina baweriyê çêbûye û xwestiya reformê bike. Ji aliyê din ve jî şer, pevçûn û berxwedaneke ku li hemberî deshilatdariyê çêbûye heye. Du mijarên esasî ne.

### *4-Kasît*

Pevçûna ku di navbera hozên civaka Kurd û deshilatdaran de çêbûye, em hinekî vekin. Me behsa Lolî û Gutiyan kir; dema ku tesîra Gutiyan kêm dibe, li gorî belgeyên Babilan (Babilan, ji BZ 2000'î heya BZ 531'an sê serdemên mezin jiyan kirine.) Weke berdewamiya van qewman hozên Kasît derdikevin. Di hinek belgeyan de weke "Kaşî û kasî" jî tên bi nav kirin. Ew ji li herêma Loristan û çiyayên Zagrosê pêş ketine. Li belgeyên li ser wan hatine nivîsandin, BZ 1680'î de jiyan dikin. Heya mintiqaya Kerkûkê û deştên Kurdistanê çûne û li hemberî Babîlan şer kirine. Wê demê de Babil, gelek xurt bûne; pêvajoya Hamûrabî ye. Lê Kasîtan jî li hemberî wan ber xwe dane.

Di BZ 1596'an de Babîlan têk dibin. Li gorî belgeyên Babilî û Aşûrî, texrîben 500 sal li ser Babîlan hûkim dikin. Hinek caran raste rast hûkim dikin, hinek caran jî bi riya nunerên xwe hûkim dikin. Pişt re jî di Serdema dûyemîn û seyemîn ya Babîlan de û dema ku Aşûrî xurt dibin, Kasît lewaz dibin û berê xwe didin çiyan.

### *5-Mîtanî*

Di vê demê de hozeke din ya Kurd jî Mîtanî ne. Mîtanî li Bakûrê Mezepotamya jiyan dikin. Navenda wan nêzikî Serekaniya îro ye. Hi-

nek dibêjin “Waşokanî, Xweşkanî.” Dibêjin navê Serekaniya îro jî ji wir hatiye. Ew jî di navbera salên BZ 1600’î û BZ 1250’î de texrîben 400 salî li wan herêman jiyan dikin û risteke wan ya girîng jî heye. Ji aliyekî ve li hemberî Aşûriyan, ji aliyekî ve jî li hemberî Misir şer dikin. Di dîrokê de cara ewil hoza ku hesin daye şûxilandin, ew in. Hinek amûr û pêwistiyên xwe bi hesin çêkirine. Di belgeyên Misirî de jî hatine bi nav kirin.


Navbereke têkiliyên Mîtanî û Misiriyan xurt bûne. Nefertîtî ji prensesên Misirê ye, lê ji malbata Mîtaniyan e. Dostaniya xwe bi zewaceke wisa xurt kirine. Ji milê rojava ve jî, li hemberî Hîtîtan şer kirine. Hîtîtan jî hinek weke berdewama Hûriyan bi nav dikin. Hem dostaniyên wan hene, hem jî cih bi cih di navbera wan de pevçûn hene.

Gutî, Mîtanî û Kasît hinek berfireh tevgerîne û tesîra wan jî li herêmeke berfireh bûye. Lê piştî ku tesîra wan kêm bûye, êdî li Kurdistanê hozên ku çêdibin, piranî herêmî ne. Mesela Gutî, Iraqê jî digirin. Beşeke zêde ya Kurdistanê di bin serweriya wan de ye. Kasît jî wisa ne. Mîtanî jî carna heya Iraqê tên.

Lê piştî wan diyare lewazbûn heye. Lewra piştî BZ 1110’an Aşûrî împaratoriyeke pir xurt pêş dixin. Ji ber ku di navbera Aşûrî û van hozên Kurd de jî piranî şer û pevçûn hene, bûye sedem ku weke berê pir berfireh nikarin tevbigerin. Bi komên herêmî xwe berdewam kirine û parastine.

### *6-Subartu*

Hozekî din yê Kurd ku di wê serdemê de heye Subartu ye. li herêma Gola Wanê jiyan dikin. Di hendek belgeda ji wan re tê gotin Zubartî (subarî). Di BZ 1150’î de derketine. Zêberiyên îro dibêjin, “ew kalikên me ne.” Di hinek belgeyên Aşûriyan de behsa wan dikin. Herêma ku li jiyan dikin Başûr û Rojhilatê Gola wanê ye. Bi Aşûriyan re di nava dostanî, têkilî û pevçûnan de ne. Carna dostaniyê dikin, carna şer dikin. Demekê jî baca xwe dane Aşûriyan.




SUBARTU Û HIN HOZÊN DIN

### *7-Naîrî*

Di wê serdemê de (BZ 1150) komeke din heye. Wan re jî dibêjin Naîrî. Li gorî belgeyan dibêjin, tê mahneya Nehrî. Dibêjin gundê Nehrî jî, ji wir hatiye. Tê mahneya welatê avê, welatê çeman. Wan jî li keleka Subariyan, berv bi Rojhilat ve jiyan kirine, heya Gola Urmiyê diçe sînorên wan. Wan jî texrîben nêzikî 150-200 salî jiyan kirine. Heya salên BZ 1000'î di belgeyan de navê wan derbas dibe.

Di mezîkirina vê demê de, pirsgirekek me jî heye. Lewra xeynî Urartuyan, van hozan belge nenivîsandine. Ango belgeyên wan nehatine dîtin. Bi piranî ji belgeyên dewletên weke Babîl, Akad Aşûriyan, em ji van hozan agahdar dibin û li ser şîrove dikin. Di belgeyeke qralê Aşûriyan de gotiye, "min falan demê, li falan cihî jiyan kiriye; li wir falan hoz hene, dijî min disekinin, ez şerê wan dikim, wan bac daye min, reviyane ûhwd." Carna baş behs dikin, carna ne baş behs dikin.




### *8-Mardo*

Piştî salên BZ 1000’î behsa Mardo dikin. Wan li herêma Mêrdînê ya îro jiyan kirine. Dibêjin, wê demê mahneya peyva Merdo, kesê/a merd û zîrek e. Hinek dibêjin, Mêrdîna îro ji wê derê tê. Hozeke din ku weke Musko-Muşko tê bi nav kirin heye. Ew jî li derdora Muşa îro jiyan dikin. Dibêjin navê Mûşê jî li wir tê. Ew jî texrîben BZ 1000’î de li wê herêmê jiyan dikin.

### *9-Urartu*

Hozeke din ku tê behs kirin jî Urartu ne. Belgeyên wan jî hene. Li gorî belgeyên Urartu û Aşûriyan, ji BZ 870’î heya BZ 615’an hem jiyan kirine, hem jî li herêmeke berfireh hûkim kirine. Li bakûr, rojhilat û başûrê Gola Wanê berfireh bûne. Ango cihên ku berê destê Naîrî, Subartu û beşeke din jortir jî Urartuyan girtine. Nivîsên wan hene, paşayên wan di van nivîsan de weke Sardurî tên bi nav kirin. Çawa ku berê Aşûriyan gotine Nemrût û Misiriyan gotine Fîravun; Urartuyan jî paşnava Sardurî kar anîne.




Urartuyî di tîcaretê de xurt bûne. Peyvendiyên wan li gel Aşûriyan hene; dem bi dem hevpeyman bûne, dem bi dem jî şer kirine. Nivîsandin pêş xistine. Bi zimanê Semîtîk ya gelên Mezepotamyaya Jêrîn nivînsandine. Nivîs wê demê li ser tabletan dinivîsandine, pişt re li ser çerman nivîsandine. Di heman demê de nivîsa Aramî jî pêş ketiye. Aramî, di destpêkê de Suryanî û Aşûriyan dane şûxilandin, pişt re Urartuyan, Med û Persan jî dane şûxilandin. Ew komên yekemîn in ku li ser tablet û çerman nivîsê dinivisînin in.

Urartu di sala BZ 615'an de bi destê Medan ji holê tên rakirin. Hinek dibêjin bi Medan re ketine îtîfaqê, lê hinek dibêjin, na Medan ew kirine bin serweriya xwe. Lê di dîrokê de behsa şerekî mezin ku di navbera van herdu hozan de derketiye naye kirin. Diyare, an bi şer, an bi Peyman û dilxeşî Urartu bûne beşeke Medan.

### *10-Manna*

Hozeke din, hoza Maana (Maneî) ye. Texrîben di BZ 775'an de derdikevin. Li herêma başûrê Gola Urmiyê jiyan kirine, navenda wan nêzikî bajarê Saqiz yê îro bûye. Belge li ser wan hene ku cara yekem hinek reformên civakî çêkirine. Cihê rêvebirineke teqez û mîsoger, rêvebirineke nerm pêş xistine. Ji yekîtiya hozan pêk tê, gelek serokên hozan tên gel hev û koalisyon çêdikin. Nêzikî 70-80'î salî li wê herêmê xwe bi rê ve dibin.

Yên ku îro lêkolîn dikin dibêjin, "Manna bûne bingeha avabûna Medan." Jixwe pişt re Mane jî dibin beşeke Medan. Heya BZ 700'î rista wan heye, pişt re rista Medan derdikeve pêş.

Ji milê civakî û têkoşîna jiyanî ve; piranî li ser çandinî û gundvaniyê ye. Hinek hozên weke Urartu û Mîtanî hinek pîşe û sanat pêş dixin. Bi dewletên wê demê hene re têkiliyên wan; carna hevkirin û Peyman hene, carna jî pevçûn û şer hene. Piranî bi xwedîkirina sewalan jiyana xwe didomînin

Di van deman de baweriya hozên Kurd, Mîtraîzm e. Lê weke me got, hinek berovajîbûn jî di Mîtraîzmê de çêbûye. Lê bi rêka tevgerên Zerdeştî hinek başbûn û sererastkirin jî çêdibe. Heya ku tê dema Sîmyar wisa berdewam dike. Hinek dibêjin Sîmyar di BZ 700'î de, hinek jî dibêjin di BZ 625'an de dayik bûye. Diyare hin hewldanên wî hene, dixwaze hin tiştan bike. Ji ber vê nikare li herêma xwe bi cih bibe, piştre derbasî Balix dibe.




Fars dibêjin, "ew cih li rojhilatê Îranê û di sînorê Efganîstanê de ye." Hinek jî dibêjin, "na gundê Balix, li herêma Hewreman e." Niha jî li Rojhilatê Kurdistanê gundên bi navê Belix hene. Hinek jî dibêjin, "ji ber ku Zerdeşt bi xwe di wê serdemê de hatiye wir, li ser herêma Hewreman bandora Mîtraîzmê pir e." Li nêzikî Qendîlê, bajarê Serdeşt heye. Sîmyar demeke li wir maye, piştre derbasî Hewreman bûye. Lê Faris dibêjin, "derbasî Îran û Efganîstanê bûye, fikre xwe li wir timam kiriye û ziviriye Kurdistanê."

Fikre wî çibûye? xwestiye di Mîtraîzmê de reforman çêbike. Bi xwe Mag bûye, di serdema Mîtraîzmê de pêşengên olî re dibêjin "Mag." Çawa ku di ola xiristiyaniyê de Martîn Luther xwestiye reforman bike, di Mîtraîzmê de jî Sîmyar wisa kiriye. Di kîjan mijaran de xwestiye reforman bike? Yek, gotiye "divê êdî mirov raste rast bi xwedayê xwe ve bikevin têkiliyê." Ango divê tu kes nekeve navberê. Bala we jî kişandibe, tiştên ku Martîn Luther xwestiye bike, Sîmyar di salên BZ 700'î de xwestiye bike. Ji bo wê dibêjin, "Zerdeşt, feylezof bûye."

Mijareke din; di zîhniyeta mirovan de, di navbera mirov û xwezayê de, di navbera mirov û mirovan de bêdengetî çêbûye. Sîmyar dixwaze careke din wê zîhniyetê sererast bike. Sîmyar çi derdixe pêş? Divê mirov xwezayê biparêze, çandiniyê bike. di Zend Awesta de dibêje, "ez kesê/a ku çêlekê bide, ez jê hez nakim." Nabêje ez ciza dikim, dibêje ez jê hez nakim. Dixwaze mirov û xwezayê, mirov û mirov careke din nêzikî hev û din bike. Ya din, başî û xirabiyê derdixe pêş. Dibêje, "Ahûra Mazda nunertiya başiyê, Ehrîman jî nunertiya xirabiyê dike."

Di fikrên wî de dualîzm heye, ji ber vê jî dibêjin "Zerdeştî ne olek e, felsefe ye." Di olên semîtîk de, xweda heye û tiştekî xirab heye. Lê Zerdeşt herduyan jî weke xwedavend digre û di nava pevçûnan de dinirxîne. Mijareke din; bawerî û îbadeta Mîtraîzmê re jî digotine "hore." Niha jî li hin cihên Rojhilat û Başurê Kurdistanê hore tê gotin, Lê niha tiştên civakî jî ketine nav. Dema ku di Mîtraîzmê de qast çêbûne, gotine "tenê mafê Mag heye ku hore bike." Zerdeşt gotiye her kes dikare bike. Ew jî reformek e.

Ji milê jiyanê ve, di nava civakê de zilam zêdetir derketiye pêş. Dikare bi gelek jinan re bizewice. Lê Zerdeştî dibêjin divê tenê jinek û mêrek bi hev re bizewicin. Lê pir zarok çêkirinê jî derdixin pêş. Niha tesîra vê li ser Kurdan heye. Hinek dibêjin, wê demê ji ber ku jiyan pêş dikeve, pêwîstî bi zarokan çêdibe, ji ber vê dibêje. Lê hinek jî dibêjin, ji ber ku nifşên wan berdewam bikin, wisa kirine. Dibe ku bandora herduyan jî hebe.

Tiştê herî girîng ku Zerdeşt pêş dixe jî, dixwaze êdî zîhniyeta mirov bi giştî sererast bike. Dibêje, "baş bifikire, baş biaxife û baş bike." Ger mirov baş bifikirin; zilm nakin, malê xelkê naxin… Ango tiştên ku dibin sedema xirabûna civakê nakin. Li ser van esasan hin reforman pêş dixe. Mirov fêm dike ku wê demê hem ji bo civaka Kurdistanê, hem jî ji bo dinê pêngavek avêtiye. Çawa ku em îro dibêjin, fikrên Se-

rokatî ji bo mirovahiyê pengavek e; wê demê jî jiyana mirovahiyê berv bi tûnebûnê ve diçûye, alozî hebûne, li wir tevgera Zerdeştî di şexsê Sîmyar de dixwazin pêşiya xirabiyan bigirin. Li Kurdistanê derdikeve û li Kurdistanê dest bi van pengavan dike.

Divê em bizanibin ku her demê li dinê awayê jiyanê çi ye û li Kurdistanê çawa ye. Niha gelek derdorên nijadperest, ji me re dibêjin hûn di dîrokê de tune ne. Lê dema ku mirov ji van dîrokan mezî dike, mirov belgeyên dîrokî binêre, Xelkên din bi çi rengî jiyan dikin, civaka Kurd jî bi vî rengî jiyan dike. Ger ji wan baştir nebe, ji wan xirabtir jiyan nake. Ango civaka Kurd her heye. Lê wê demê navê Kurd û Kurdistanê tune; jixwe wê demê navê Tirk û Ereban jî tune. Navê kom, eşîr û hozên ku hene bi navên cuda tên pênasekirin.

Dema ku em behsa civaknasiyê dikin, divê van tiştan bên zanîn.Berxwedaneke bi çi rengî pêş ketiye, baweriyeke çawa heye, kîjan pêşketin û paşketin jiyan kirine? Fêmkirina van girîng e. Me hewl da em hinekî van vekin. Heya BZ 700'î em dikarin bi vî rengî binirxînin. Lê dema ku Zerdeştî pêş ket, Med jî pêş dikevin. Ew qonaxa nû ye. Heval dikarin di derheqê van mijarên ku me vegotina wan kiriye, nêrîn û pirsên xwe bînin ziman.

…: Dibêjin, ew şûn û warê Xirab Reşkê (Göbekli Tepe) tapinax bûye. Ew cih di dîrokê de weke cihekî olî hatiye karanîn, an weke gundekî hatiye karanîn?

…: Heya dema Zerdeştiyê, di klan û qebîleyan de nûfûs pir zêde tune bûye. Sedema vê yekê, şert û mercên xwezayî ne, an sînordarkirin û denetîmek hebûye? Lewra Zerdeşt jî çêkirina pir zarokan pêşniyar dike.

Ya din jî li ser arkeolojiye, ez dixwazim agahiyeke bidim. Di Tirkan de tenê jinek heye ku ew nivîsên bizmarî dixwîne. Ew jî Muazez Hîlmiye Çiğ e. Demekê hevdîtinên me çêbûn, min pirsek lê kir. Min got, "mamoste, ew berhemên dîrokî ku di Kurdistanê de derdikevin, aîdî Kurdan e. Hûn çima nav lê nakin?" Keniya û got, "em çiqasa serbixwe bin jî, em ew qesa girêdayî dewletê ne. Her dewletek ew tiştên derketî dike malê xwe. Gelek tişt hene, em nikarin şîrove bikin; lewra ew diçe herêmeke din, dibe aîdî gelekî din. Em tenê dikarin şîroveya tiştên ku aîdî Tirkane, an jî li ser axa wan in bikin." Gelek mînak jî dan, hemû dinê wisa ye. Got, "ger destûr bidin ku em bi awayekî rast van lêkolînan şîrove bikin, dê her kes bigêhêje nirx û asta xwe. Lê li ser gelek tiştan qedexe heye. Li Çatalhoyûk, Xirab Reş gelek tişt hene, em nikarin li ser biaxifin."

…: Heval jî got, “3 Zerdeşt hene.” Dibêjin, yê yekemîn di BZ 3000’î de ye. Yê duyemîn jî Hoşeng e, ji BZ 2000’î heya BZ 1700’î tesîra wî heye. Yê seyemîn jî Mahabad e, ji BZ 1600’î heya BZ 700’î tesîr kiriye. Li ser van Zerdeştan, tiştekî wisa diyar heye, ew rast in?

…: Sê pirsên min hene; yek ferqa di navbera tîre û xêl de çi ye? Dudu, îzdîwaca mahrem Zerdeşt qedexe kiriye, an beriya wê jî qedexe bûye? Ya seyemîn, başî û xirabî berê jî di nava civakê de hebûye, Zerdeşt çi pêwîstî dîtiye ku vê bi nav bike û weke Ahûra Mazda û Ehrîman pênase bike?

…: Dîroknas Elî Şerîatî, Êzîdî û Zerdeştiyê jî weke pirtûka Muqadas dibîne. Lewra du beş in, di zerdeştiyê de zêdetir felsefîk nêzikbûn heye, ya din de olî nêzikbûn zêdetir e. Niha divê mirov Zerdeştî û Êzîdîtiyê cuda bigre dest, an yek bigre dest?

…: Mirov çawa pêş ketine û bi kîjan xetê re xwe gihandine Mezepotamyayê, heval diyar kir. Dema derbasî jiyana xwecihî bûne, li cihên keleka avê hilbijartine. li keleka Firatê bi cih bûne, bala hevalan kişandibe Xirab Reşk jî li keleka Firatê ye. Lê weke cihekî îbadetê hatiye karanîn. Weke şûn û war jî hatiye karanîn.

…: Em niha bi çavê feylezofekî li Zerdeşt mezî dikin, an weke pêximberekî? Yek jî ji destpêkê heya niha, Zerdeştî çiqasa hatiye guhertin. di pirtûka wî de çi guhertin çêbûne?

…: Heval got, li dora agir kom bûne û hore gotine, lê min siyaçemene bihîstîbû; kîjan rast e? Pê ve girêdayî, hore, Siyaçemenî û dengbêjî tê gotin; gelo ew heman tişt in, an jî naveroka wan yek e? An tiştên cuda ne?

**H. Helmet**: Tam ne diyare ku Xirab Reşk an gund û bajare, an jî cihê olî ye. Hê lêkolîn berdewam dikin, dibe ku nexwezin eşkere jî bikin. Rêber Apo di paraznameyan de jî behs dike, ger hemû rastiyên wir derbikevin, dibe ku hin şirove jî biguherin. Divê em jî qalibî nêzik nebin. Em li ser esasê pênaseya “dîrok zindî ye” şîrove dikin, dikare bê guhertin jî.

Em belge û daneyên cuda jî digerin. Ger tiştên nû bikevin destên me, em ê li gorî wê şîrove bikin. Hinek nêrîn hene, dibêjin di BZ 12000’î de ew tapinax çêbûye. Ew dema gund û cih bûnê ye. Her wiha dibêjin tapinax di dema gundan de tune ne. Ger di dema bajaran de çêbûbe, wê demê karê vê tapinaxê çi ye? Mirov dikare vê pirse bike. Lê ji ber ku hemû lêkolînên wê xilas nebûne, mirov dikare li gorî wê şîrove bike.

Yek jî dibêjin, ew ne weke tapinaxeke ji reze ye, weke hac'ê ye. Weke cihekî pîroz ku dem bi dem diçûn û serdana wir dikin e, bi pênaseya îro em dikarin weke hac'ê binirxînin. Dibêtiyek wisa heye. Piştre ew çand li Kûdûs tê dîtin û piştre jî dizivire Meke. Ger wisa be, xwezayî ye. Dibe ku di wan deman de li wan derdoran hin avahî çêbûbûn û cihekî wisa pîroz ku dem bi dem biçin û serdana wir bikin çêkirine. Lê ger cihê jiyan û tapinaxan be, ew şîroveyên cuda pêwîst dikin. Ji bo vê em niha nikarin tiştekî bibêjin. Lê niha tiştê ku diyare, di hûndirê wê de nêzikî 20 tapinaxan hene. Cihekî îbadetê ye. Hê cihê jiyanê tê de nehatiye dîtin.

Veşartina tiştên dîrokî jî heye. Niha di wan bajar û cihên dîrokî de nêzikî 120 hezaran tablet hatine dîtin, lê gelekên wan nehatine şîrovekirin. Em niha hin tiştan bi Aramî dinivisînin, piştî 20 salan yek bixwaze van bixwîne, ger Aramî nizanibe nikare bixwîne. Nivîsa wê demê jî, nivîsa mixî ye; pir kêm mirov dikarin bixwînin. Ew jî çiqasa bi wîjdan dikin, em nizanin. Jixwe piranî wan belge birine Ewropa; van salên dawî dewletên herêmê dixwaze hinek bixin bin qontrola xwe. Berê hemû Ewropayiyan dibirin. Qaşo ji bo me diparêzin.

Ji bo vê Serokatî dibêje, "dîrok di roja me de hatiye veşartin." Ger em jî fêr bibin, bikaribin bixwînin, belgeyên ku ketine destê me bikaribin biparêzin; em dikarin bi xwe jî risteke bilîzin.

Hevalan got, çima heya dema Zerdeşt zarok zêde nebûne? Tam nikarim tiştekî bibêjim. Bes îhtîmalek heye; em jî weke cureyeke ajalan in, her ajalekî jî demên wê yên zarokatiyê û demên wê yên têkiliya cinsî hene. Lê Serokatî dibêje, "têkiliyên cinsî yên mirov rojane bûne." Bes ajal ne wisa ne. Di nava salê de demekê wê heye ku têkiliya cinsî çêdikin. Dibe ku mirovê xwezayî jî wisa be, ango di têkiliyan de sînorek hebe. Hinek kes bale dikşînin ser vê mijarê. Lê ew mirovê ku niha heye, ne xwezayî ye. Ji bo wê ew rewşa me hatiye guhertin. Ne salê carekê, her dem hişê mirovan li ser wê ye. Di dema Zerdeştiyê de ew çiqasa pêş ketiye nizanim, lê dibe ku tesîra van tiştan hebe.

Ger Zerdeşt jî bi vî rengî fikirî be û ji bo vê pir çêkirina zarokan pêşniyar kiribe xirab e; lê ger parastina nifşan esas girtibe baş e. Ango dualî ye. Mirov dikare wisa şîrove bike.

Di hinek belgeyan de tê gotin ku 3 Zerdeşt derketine. Lê hinek jî dibêjin, gelek derketine. Çawa ku di Îslamiyetê de dibêjin 120 hezar Nebî derketine, ji bo Zerdeştiyê jî wisa dibêjin. Lewra tevgereke reformê ye. Lê li ser Sîmyar belge jî hene. Hem belgeyên Medan û Persan hene, hem yên Yewnanan hene. Li ser dîrok û çûn û hatina wî di

navbera belgeyan de hinek ferq heye, lê nêzikbûn û tevgera wî yek e. Lê wan Zerdeştên din ku behs dikin, li ser wan kêm belge hene. Ew qaneat jî heye ku Sîmyar weke berdewamkerê tevgerekê reformê ye.

Cudabûna tîre û xêl; ji milê formê civakî ve cudabûna wan tune. Xêl kombûna çend tîreyan e. Çawa ku xêzan tên gel hev û binemal çêdibe, ew jî wisa ye. Çend binemal jî tîreyekê pêk tînin. Lê pêwêndiyên xizimtiyê di xêzan de zêdetir e, binemal de kêm dibe, di tîre de jî kêmtir dibe. Lê ew kombûyin berê ne tenê li ser esasê xwînê bûne. Li ser pêwêndiyên jiyanî bûne. Dema ku pêwîstî zêde bûne û erdnigarî berfireh bûne jî, çend tîre hatine gel hev û xêl çêkirine. Di xêl de jî xizimtî kêmtir e. Di xêl de, pêwîndiya îdarî zêdetir e. Di serdema xêlan de êdî rêveberî pêş dikeve.

Di hoz de jî îdarebûyin zêdetir derdikeve pêş. Di nava wî hozî de hinek hev û din jî nas nakin. Herêmek mezin hemû dibêjin, em Cafî ne. Di nava wan de gelek tîre hene, lê gelekên wan hev û din qet jî nedîtine. Hinek li Sûleymaniyê ne, hinek li Helepçe ne, hinek li Ciwanro û Kelar in. Ger bimrin, hev û din jî nabînin, bes dibêjin em Cafî ne. Weke Kurd em dikarin xwe jî bigirin dest. Serokatî dibêje, "netewe pêwendiyeke civakî ye, beriya her tiştî di zîhn de şêwe digre." Ger yek weke zihniyet xwe Kurd nebine, tu wî re bibêje Kurd e jî kêrî tiştekî naye. Ew aidiyet pêş dixe, li hemberî wê civakê berpirsyariyên xwe tîne cih û pêwîstiya xwe bi wê civakê heye.

Em carna behsa Kurdan dikin û em dibêjin, "em hemû yek xwîn in." Ne wisa ye. Ji bo ku pêwêndiya çandî û îdarî ûhwd çêdibe, êdî wisa tê fêm kirin. Mirov dikare ji bo tîre û xêl jî wisa bibêje. Her yek formê civakî yê serdemekê ye. Tîre di dema paleolotîk, mezeolotîk û destpêka neolîkîkê de pêş dikeve. Xêl di dawiya neolîtîkê de pêş dikeve. Hoz di dema dawiya neolotîkê û derbasbûna hiyerarşiye de pêş dikeve. Li Kurdistanê dewletên mîsoger çênebûne, lê hoz pêşketine.

Qedexekirina îzdîvaça mahremi ya Zerdeşt nizanim, min nebihîstiye. Qesî ku dizanim, beriya belavbûna Xiristiyaniyê, li Kurdistanê qedexe bûye. Di civaka Semîtîk de heya serdema Îsa hebûye, Îsa ew red kiriye. Sedemeke kûştina Îsa jî ew e. Ji bo vê paşayên Fîlîstînê yên wê demê, pêşengên olî yên Cûhiyan kûştine. Piştî Îsa jî vê yekê demekê berdewam kiriye. Lê di dema Îslamê de di nava qewmên Semîtîk de bi giştî hatiye qedexe kirin.

Di nava qewmê Aryanan de dibêjin beriya Îsa hatiye qedexe kirin. Lê Zerdeşt qedexe kiriye, an beriya wî jî qedexe bûye, ez nizanim. Lê di serdema Sasaniyan de, careke din nû bûye. Gelek paşayên Sasaniyan

xûçkên xwe re îzdîvaç kirine. Di dema Îslamê de jî careke din hatiye qedexe kirin.

Çima Zerdeşt her tişt weke xirabî û başî pênase kiriye? Ez tam sedema vê nizanim. Lê her bîrmend û kesên ku dixwazin karekî bikin, bi taybetî kêsên bi vî rengî, dixwazin tiştên ku bikin form bidinê. Ew serdem jî êdî serdema xwedayan e, pîrozkirinê ye. Zerdeşt jî di şexsê xwedayan de xirabî û başî pênase kiriye. Beriya wî jî xirabî û başî heye, lê Zerdeşt pêwîst dîtiye ku wisa pênase bike, da ku bikaribe zêdetir tesîr bike. Agahiyek  taybet min li ser vê mijarê nexwendiye, an jî ne bihîstiye, lê ez dikarim wisa şîrove bikim.

Hevalan got, em Zerdeşt weke pêximber digirin dest, an weke feylezof? Li gorî nêrîna me hemû pêşengên civakê yek in. Serokatî dibêje, "serdemek ya pêximberan e, yek ya feylezofan e, yek ya zanyaran e." Zerdeşt jî weke pêşengekî wê demê ye. Bi qarekterê civaka Aryenî pêşêngî kiriye, ne bi qarektera civaka Semîtîk. Di civaka Semîtîk de û di pêximberiya wan de, tek xwedabûn zêde li pêş bûye. Di civaka Aryan de, ew kêmtir bûye; hinek remzên jiyanî pîroz hatine dîtin. Taybetmendiya Zerdeşt ew e.

Ji bo cudabûna Êzîdîtî û Zerdeştiyê; mijareke berfireh e. Niha gelek xelkên me yên Êzîdî xwe Zerdeştî nabînin. Dibêjin, "em Ezdanî ne." Bes Zerdeştî jî Ezdanî ne. Beriya Zerdeştiyê, ji Mîtraîzmê re Ezdanî hatiye gotin; lê di dema Zerdeştî de, êdî Ezdan xwe bi Zerdeştiyê îfade dikin. Ji BZ 700'î heya PZ 1100'î, 1800 salî Ezdanî xwe bi riya Zerdeştiyê îfade dike. Ger îro kesek Ezdanî be û bibêje ez ne Zerdeştî me, çawa çêdibe? Dibe ku tam ne Zerdeştî û Mîtraîzm be jî.

Jixwe Êzîdîtiya îro tam ne Zerdeştî ye. Lê Ezdaniyê ji bo xwe esas digre. Ew bawerî jî bi riya Zerdeştiyê gihêştiye îro. Yên ku dibêjin, "em ne Zerdeştî ne" ji bo çi dibêjin?  PZ 1100'î de di serdema Îmam Gazalî de, Zerdeştî hate qedexekirin. Yên ku bigotana em Zerdeştî ne, dihatin kûştin. Ji bo wê divê tu Zerdeştiyê înkar bikî. Ji bo wê pêşêngên olî yên Yarsanî û Êzîdî, gotin em ne Zerdeştî ne. Gotin, em Êzdanî ne, hin tiştên Îslamiyetê jî girtin. Bi vî rengî dem ket navberê û êdî bê zanebûn, xwe ji Zerdeştiyê dûr xistin. Bes yên ku dizanin, vê meseleye înkar nakin.

Qewl û pirtûka Êzîdiyan heye, ger Îslam baweriyek be, Êzîdîtî jî baweriyek e. Em weke Êzîdîtî û Yarsaniyê nêzikî Îslamiyetê nabin. Lê ew jî ol in. Em çawa nêzikî Îslamiyetê dibin, divê em wisa nêzikî van olan jî bibin. Ger rexneyên me jî li ser Êzîdîtî û Yarsaniyê hebin, divê em bikin. Em nikarin bibêjin, Êzîdîtî û Yarsanî olên kevn in, wê demê

baş in. Lewra hinek hevalên me wisa dikin. Em nikarin bibêjin, hemû tiştên Elewîtî, Yarsanî û Êzîdîtiyê baş in; yên Îslamiyeta Sûnî jî xirab in. Hinek jî vê dawiyê fêr bûne, dibêjin Xiristiyanî jî baş e. Ew ji bo ol û civakê ne nêzikatiyeke rast e. Em ne olekî red dikin, em ne jî bi giştî dipêjirînin.

Serokatî dibêje, "nêzikatiya me ya ol, çandî ye." Nêzikbûna çandî çawa ye? Tu li hemberî wî olî rêz nîşan dide; lê dinerê, dinirxînê, tiştê pêwîst jî rexne dikê. Tiştê ku tu rêz nîşan bide û biparêzê jî hene. Ji bo hemû olan wisa ye. Em olekî yê din mezintir nabînin. Her olek, li gorî dem û civakeke xwestiye bibe bersiva hinek tiştan. Ji bo vê divê em nêzikbûna xwe careke din berçavan re derbas bikin.

Ferqa di navbera Hore û Siyaçemane; dibe heman tişt bin. Di belgeyên kevn yên Mîtraîzmê de dibêjin, qewlê wan re gotine hore. Ew hore, dibe ku îro siyaçemane be. Siyaçemane tenê ne tiştên olî ne; gelek tiştên xoşewîstî, hezkirin ûhwd digre nava xwe. Ango navê wî hore bûye. Ji ber vê hinek dibêjin, hore cafî ji wir maye, bes hore cafî jî olî nene, tiştên civakî ne. Siyaçemane jî rengek e, ji aliyê civakî ve tê karanîn. Hinek dibêjin ji dema Yarsanî ye, qewlên olî tabîr dike. Lê siyaçemane de tiştên olî tune, keç ser xortan dibêjin, xort li ser keçan dibêjin. li îranê, stranên olî re dibêjin Mûnacat. Dibêjin, ji stranên wan yên kevn û olî re dibêjin hore.

### *-Konfedrasyona Medan Û Zerdeştî*

### *1-Serdema Yekemîn Ya Medan*

Rewşa ku em niha behs dikin, ji rewşên berê ne qut e. Demeke ku di hûndirê serdema civaka hiyearşîk û qonaxa deshilatdariyê de ye. Bz 700'î de rewşek tê jiyankirin, ji aliyekî ve deshilatên ku li Mezepotamyaya Jêrîn hene lewaz û belav dibin. Di wê serdemê de Babîl hebûn, ji salên BZ 900'î şûnve lewaz dibin, BZ 700'î şûnve pir lewaz dibin. Li Başûrê Îranê û li başûrê Zagrosan Îlam hebûn, Îlam jî lewaz dibin. Hinek kes Îlam weke qewmeke Zagrosî, hinek jî weke qewmekî Sûmeran pênase dikin. Hê li ser lêkolîn berdewam dikin. Ew jî tengav bûn.

Di wê demê de deshilatdariya herî xurt Aşûrî bûn. Aşûrî BZ 900'î şûn ve dema xwe herî xurt jiyan dike. Deshilatdariyeke giraniyê dide ser tîcaretê ye. Di wê serdemê de paytexta wan Nînova ye. Demekê paytexta wan Aşûr bûye, li Iraqê niha bajarê Aşûr re dibêjin Şergat. Texrîben 100 km dikeve başûrê Mûsilê, di navbera Mûsil û Bexda de ye.

Serdema duyemîn ya Aşûriyan de paytexta wan Nemrûd bûye. Nemrûd dikeve navbera Mexmûr û Mûsilê. Li Rojhilatê avê Dîjlê ye. Vê dawiyê DAİŞ'ê ew der girtin. Li wê derê gelek tiştên dîrokî hebûn, piraniya wan teqandin û tûnekirin.

Serdema Aşûriyan ya seyemîn, BZ 912'an şûn ve ye. Wê demê paytexta xwe li Nînova çêdikin. Ew cihê ku niha lê Bajarê Mûsil heye. Ew serdem dema wan ya herî xurt e.

Weke erdnigarî, Aşûr dewleta herî nêzikî Kurdistanê ye. Zêdetir jî li ser Kurdistanê karîgerî û tesîra wan heye. Bi civaka Kurdistanê ve zêdetir di nava dan û stendin û pevçûnan de ne.  Aşûr heya ku hatine rûxandin; heya Anatolya, Şam û Îranê hûkmê wan hebû. Pergala wê demê jî împaratorî bûye. Wê demê hêzên împarator heya ku bikariban bikin bin serweriya xwe, diçûn, li wan deran bac dîstîne. Li gorî hejmar û rewşa wan ya aborî, her eşîrek û hozek baca xwe dide Aşûriyan.

Civaka Kurdistanê jî bi piranî di bin hûkmê Aşûriyan de ye. Lê naye wê mahneyê ku civak tune ye. Her cihekî hebûna xwe û jiyana xwe berdewam dikin, lê her herêmek li gorî rewşa xwe bi Aşûriyan re di nava têkiliyan de ne. Wê serdemê li milê Bakûrê Kurdistanê Urartu hene, li milê Rojhilatê Kurdistanê Manna hene, dîsa li milê Rojhilatê Kurdistanê Alîbî hene.

Di salên BZ 700'î de Manna'yan weke konfederasyoneke hozan, pêk ve pergaleke îdarî pêş dixistin. Ew niha weke bingeha Medan tê tehlîl kirin. Ji aliyekî ve jî weke bingeh fikrên Zerdeşt tên diyar kirin. Li derveyî Kurdistanê deshilatdarî hinek cihan aloziyan jiyan dike, Aşûrî jî teqezî û mîsogeriyeke tûnd jiyan dikin. Li Kurdistanê pêşketinên aborî, jiyanî û fikrî hene. Ew jî bingeha guhertinan çêdike. Tevgera zerdeştî a sîmyar di alî fikrî û civakiye ve zeminê guhertin çê kiribu, Ji milê îdarî ve bi riya Urartu, Mana û Alîbî hin guhertin çêdibin. Ew hemû bingeheke ava dikin. Tiştê diyar ji aliyekî ve zext û tûndiyên deshilatdaran hene, ji aliyekî ve jî lêgerînên guhertina civakî li Kurdistanê hene. Di encama van derfetan de Med tê avakirin.

Belgeyên Aşûrî, Urartu û Yewnanan de li ser Medan tê sekinandin. Berê belge kêm bûn, niha zêde bûne. Ew derfet dide me ku em li ser Medan baş lêkolîn bikin. Lê hinek belgeyên cuda jî, agahiyên cuda derdixin holê. Dema mirov van belgeyan bixwîne, li ser lêkolîn bike, da ku kîjan nêzikî rastiyê ye. Ji ber vê em tiştên şaş ve jî rû bi rû dimînin. Weke nav li hinek cihan Med, hinek cihan Mad hatiye nivîsandin, hinek cihan Medya, hinek cihan jî Amad hatiye nivîsandin.




KONFEDERASYONA MEDAN

Li gorî belgeyên Yewnan û Aşûriyan destpêka Medan vedigere BZ 715'an. Berê digotin BZ 700'î de derketine, lê niha belgeyan derxistiye holê ku BZ 715'an de derketine. Çawa hatiye avakirin? Di wê derê de jî nêrînên cuda hene. Bere digotin, "Diyako" ava kiriye. Li gorî belgeyên Yewnanî û Aşûrî, Diyako di salên BZ 700'î de li mintiqaya Ekbatan (Hemadan) bingeha Medan avêtiye. Hinek hoz kom bûne û yekîtiya xwe çêkirine, Diyako jî mirovekî baş bûye, ji xwe re kirine rêveber. Di destpêkê de weke federasyoneke xêl, ango weke hozeke çêbûye.

Li gorî hinek belgeyên ku nû derketine jî dibêjin, Diyako bi xwe ji Manna ye. Di dîroka Manna de kesekî ku li hemberî Aşûriyan disekine bi navî Diyako heye. Bi ser nakeve, pişt re Aşûrî wî mişextî dikin û dibin Aşûr. Demeke di nava arteşa Aşûr de rista xwe dilîze û vedigere û vê rêveberiyê pêş dixe. Dibêjin Diyakoyê Manna û Diyakoyê Med yek e. Hinek jî dibêjin, Diyakoyê Medan cûda ye; her li herêma Ekbatan weke serokekî xêlekê bûye, pişt re nexwestiye serok eşîriyê bike. Lê ji ber ku kesekî zîrek bûye, wan xêlan hemûyan ew ji xwe re weke rêber dîtine. Bi vî rengî bingeha Medan li wê herêmê tê avêtin. Çîrokeke bi vî rengî heye, her çiqas cûdabûn hebin jî, cewher yek e.

Tiştê ku diyar, di wê demê de valatiya fikrî û valatiya îdarî heye, li hemberî deshilatdariya Aşûriyan nerehetî û bertek hene. Ew bingehekê çêdikin. Hinek xêl û hoz jî hene ku dixwazin bi awayekî xweser jiyan bikin, kesekî bi navê Diyako ku ji rewşa wê demê û fikra Zerdeştî bandor bûye jî dixwaze pêşêngiya wê civakê bike. Bi vî rengî bingeha Medan tê avêtin.

Heya niha weke destpêka Medan di dîrokê de BZ 700 dihat esas girtin, lê piştî ku hinek belgeyên din derketin BZ 715 jî esas tê girtin.

Diyare ku bi Aşûriyan ve nakokiyên wan zêde dibin û naxwazin bac bidin. Aşûrî jî împaratoriyek e, her sal baca xwe ji hemû herêman distîne, êrîşî ser kesên baca xwe nadin dikin. Li ser vê esasê çend caran şer û pevçûn çêdibin, di encamê de Diyako li hemberî Aşûriyan li ber xwe dide heya dimire. Piştî Diyako Berxwedaniya civakî berdewam dike. li gorî Yewnanan Firewertîs, li gorî Farsiyan jî Fereîdun pêşengiya civakê digre dest û li hemberî Aşûriyan têkoşîn dimeşîne.

Ew jî texrîben di salên BZ 655'î de çend salan têkoşîn dimeşîne û di salî 633 B.Z bi destê Aşûriyan tê kûştin. Dibêjin li herêma Zagrosan tê kûştin. Hinek dibêjin niha jî gora wî li milê Şehîdan heye. Hinek jî dibêjin, cinazeyê wî birine mintiqaya Çemê Rezan û di şikeftekê de veşartine. Dibêjin, wan şikeftek ji bo Fereîdun çêkirine. wate ew jî bi destê Aşûriyan têk diçe.

Piştî wê Med dikeve bin serweriya Aşûr û Îskîtan. Îskît jî qewmekî ku ji Asya Navîn û derdora Behra Hazarê hatîne Welatê Med û Zagrosan bi cih bûne û dema ku şerê Med û Aşûran çêdibe, alîkariya Aşûran dikin. Ji ber vê dema ku Aşûr bi ser dikevin, Îskît li herêma Medan wesayetiya Aşûriyan dikin. Aşûr di vê demê de pergala Medan belav nake, lê Îskîtan li wê derê dihêle, da ku bikaribe qontrol bike. Di vê demêda Kiyakser (hoxuştire) dibe rêbera Medan.

Di vê demê de Kiyakser derdikeve pêş. Hinek dibêjin Kiyakser kûrê Fereîdun bûye, dema ku Fereîdun hatiye kûştin ew biçûk bûye, Pişt re mezin bûye û hêdî hêdî hêza xwe jî komî ser hev kiriye. Bi vî rengî bihêz dibe û deshilatdariya Îskîtan têk biriye. Li gorî belgeyên Yewnanî, di sala 615'an B.Z hemû fermandarên Îskît kom kirine û kûştine. Bi vî rengî li hemberî Aşûriyan careke din rabûye.

Diyare Kiyakser, ji jiyankirinên Diyako û Fereîdun wane derxistine û danehev kom kirine. Li ser vê esasê bi derdora xwe re ketiye nava têkiliyan. Yekem car li gel Parsan têkilî danîne. Hinek dibêjin Pars jî bi eslê xwe Med in. Lewra li gorî zimanê kevn yê Îranî Pars, tê mahneya yên kelekê. Tê mahneya Medên kelekê. Ango ne di navendê de ne. Lê divê pişt re weke qewmekê derketine. Hinek jî dibêjin, jixwe Pars qewmekî cûdane. Dibêjin Med û Pars herdu jî Aryen in, lê qewmên cûda ne. Ya mûhîm Med û Manna tevlî hev dibin û bi Parsan re jî têkiliyek koalisyonê datînin.

Pişt re jî hozên Alîbî ve jî dan û stendina çêdikin. Alîbî jî hozeke herêma Rojhilatê Kurdistanê, herêma Kirmanşan wan deran in. Di BZ 615'an de Urartuyan jî tevlî xwe dikin. Weke me berê jî got, hinek dibêjin bi Urartuyan re îtîfaq kirine, lê hinek jî dibêjin ew têk birine û

kirine bin serweriya xwe. Bi vî rengî ji Bakûrê Gola Wanê û Rojhilatê wê, heya herêma Ûrmiye û Mahabad; ji wê derê heya herêma Ekbatan û berv bi Rojhilatê wê ve serweriya Medan berfireh dibe.

Di salên BZ 614'an de jî îtîfaqa Medan bi Babîlan re çêdibe. Wê demê Babil jî hê nû radibe ser piyan. Ew hemû di serdema Kiyakser de dibin. Kiyakser Med'ê radike, Babilê jî paşayekî bi navê Nebûbelaser radike ser piyan. Nebûbelaser, dibe bavê NebuXeznaser. Xelkê me Kurd dibêje, Bextûneser. Texrîben Nebûbelaser di BZ 624'an de tê ser Babilan. Ew jî hinekî Babilan komî ser hev dike û piştî 10 salan bi Medan ve li hemberî Aşûriyan îtîfaqê çêdikin.

Pişt re di navbera Med û Babîlan de zewac çêdibe. (Namî Tîs) Keça Kiyakser, didin kûrê Nebûbelaser, ango didin Xeznaser. Dibêjin ew baxçeyê asmeyan jî ji bo ku dilê keça Kiyakser xweş bikin çêkirine. Lewra cihê Medan çiya û daristan e, cihê Babilan jî deşt e. Babil hemû derfetên xwe kar tînin û ew baxçeyê daliqandî pê re çêdikin. Bi vî rengî îtîfaqa Babîlan jî çêdibe.

Jixwe Babil û Aşûr di salên BZ 615'an de ketine nava şerekî giran. Wê demê îtîfaqa Med û Babilan çêdibe. Med jî vê ji xwe re weke fersend dibîne. Di BZ 614'an de Med Kerkûkê ji Aşûran digirin. Herî dawî di BZ 612'an de Babil ji başûr ve êrîşî Aşûriyan dikin, Med jî ji milê Bakur ve êrîşî Aşûriyan dikin. Aşûr ji milê başûr ve li ber xwe dide, lê ji milê bakur ve ber xwe nade û dişke. Padşay Aşûriyan Sarak ku kurê Aşûrpanîpal bu xwe dawêje nav Agirî koşkî Nînova.

Heya niha weke ku di meha adarê de Med bi ser ketibin, em digirin dest. Lê li gorî belgeyên niha hene, dibêjin di tebaxê de bi ser ketiye. Lê îşareta wan ew bûye, dema ku bi ser ketine agir pêxistine û xeber dane derdora xwe. Dema ku çiyayên derdorê dibînin ku li Mûsilê agir pê dikeve, fêm dikin ku serkeftin çêbûye. Ew çiya jî agir pê dixin û xeberê didin derdorên xwe. Bi vî rengî çend rojan li her cihî agir pêxistine û agahî dane her cihî. Wê demê wisa agahî bi hev re dişandine.

Di encamê de koalisyona Med û Babîlan bi ser ketiye û Aşûr têk birine. Wê demê navenda Aşûriyan Nînova ye. Lê dema ku dişkên xwe dikşînin, Riha ye. Navenda wan ya duyemîn Riha bûye. Weke ku Serokatî jî dibêje, "bajarên koloniyên wan hebûne." Riha jî ji wan yek e. Piştî ku Aşûriyan xwe kişandine Rihayê, vê dorê jî Med û Babilan êrîşî wir kirine û piştî çend salan di BZ 605'an de Riha jî girtine. Bi vî rengî Aşûr bi giştî têk birine û Aşûr nemane. Livir Aşûr Balîte ku mamî Sarak bu, serokayetî Aşûriyan dikir.

Ji ber vê yekê weke encama wê serkeftinê newroz tê pîroz kirin. Li gorî ku tê gotin, îro jî li Rojhilata Navîn nêzikî 300 milyon mirov Newrozê pîroz dikin. Hinek caran miletê Kurd eciz dibe, dibêjin "dixwazin Newroza me bidizin." Ger bixwazin berovajî bikin, mirov dikare rexne bike. Lê sedema esasî ne ew e. Ger ji ser re 2600 sal derbas bûbe û hemû gel vê pîroz dikin, mahneyek girîng diyar dike. Wê demê ji Efganîstan û Pakîstan, heya Anatolya serweriya Aşûriyan hebûye. Hemû gelên li vê derê, li hemberî zilma Aşûriyan xwedî bertek bûne. Ji ber ku Aşûrî têk çûne, van gelan kêfxweş bûne. Di wê demê de bûne alîkarê van hêzên li hemberî Aşûriyan şer dikin jî.

Îro em mînak bidin. Ji ber ku Sadam Huseyîn li hemberî her kesî zilm kiriye, dema ku ew têk çûye, her kes kêfxweş bûye. Ger îro Kurd, Faris û gelên dîtir vê rojê weke cejn dibînin, ne tiştekî xirab e. Lewra rûxandina deshilatdarî û avakirina rojeke nû ye. Mahneya xwe jî ew e. Êdî di adarê de be, di tebaxê de be ne girîng e. Em nikarin bibêjin bila teqez di tebaxê de bê pîroz kirin. Êdî rojeke ku ji bo gelan pîroz e.

Tiştê ji bo me bibe sedema kêfxweşiyê çi ye? Ger em weke Kurd, Medan pêşengên xwe dibînin, ew kar di pêşengiya me de çêbûye. Wisa be, hinek gelên di jî bibêjin cejna me ye, ji bo me nabe sedema eciziyê. Ger sibê li Rojhilata Navîn konfedaralîzma demokratîk pêş bikeve û gelên din jî wê pîroz bikin, ma em ê bibêjin ya me ye, hûn pîroz nekin? Ew nêzikbûn ne baş e. Lê hinek deshilatdar hene, diçin dîrok û navê wê diguherînin. Ew naye qebûl kirin. Mirov dikare van rexne bike, lê divê mirov newrozê ji mahneya wê nexe.

Îro Îranî jî, li gorî xwe digre dest. Di Şehnameya Fîrdewsî de, ew newroz û efsaneya Kawa hatiye guhertin. Ya rast di dîrokê de bûyereke bi navê Kawa tune ye. Kesekî wisa hesinkar û zilimkarekî bi navê Dehaq tune. Lê efsaneyeke bi vî rengî heye. Efsane îfadeya bûyerekê dike. Em niha behsa dîrokê dikin jî, em di çarçoveya hin belgeyan de behs dikin. Lê ger bi awayekî çîrokî bê vegotin, zûtir dikeve mejî. Efsane tabîra bûyereke girîng dike. Lê Farisan çi lê kiriye? Li gorî wan Kawa Fars e, Dehak jî paşayê Med, Astiyeges e. Kawa jî Kyros e. Niha dixwazin vê bixin mejiyê milet.

Weke çîrok ez dixwazim heval bizanibin. Ger ez şaş nebim, di sala 1981-2'yan de li bajarê Sûleymaniyê taxeke heye, pê re dibêjin Tûymelîk. Li wir hinek rewşenbîr û mirovên hûnermend peykerek ji bo Kawa çêkirin. Çend rojan ma û gel pê kêfxweş bû. Hûkimeta Baas pê eciz bû, peyker şikenand û bir. Ew di dilê xelkê de bû êşek. Dema ku di 1991'an de Sadam ket, xelkê careke din ew peyker li wê derê çêkirin.

Wisa çakûçek û seriye Dehaq di destê Kawa de ye. Dema ku di sala 99'an de em çûn Sûleymaniyê, me dît ku peyker hatiye guhertin. Di destekî wî de çakûç heye, di destê din de jî gul heye. Me got ew çi ye? Gotin, "niha belav bûye, dibêjin Kawa Fars e, Dehaq jî Kurd e. wisa seriye Kurdekî di destê Farisekî de be, nabe. Ji bo wê hatiye guhertin."

Hûkimeta Sûleymaniyê wisa kiribû. Piştî çend mehan, bi navê firehkirina rê ew peyker rakirin û birin. Ew 15 sal ser re derbas bûn, rê fireh nebûye û peyker jî nemaye. Çima wisa kirin? Min pişt re fêm kir; Yekîtiya ku wê demê li Sûleymaniyê hakîm bû û hin rewşenbîrên Sûleymaniyê, qaneh bûbûn ku Kawa Faris e û Dehaq jî Kurd e. Lewra Firdewsî jî wê demê hatibû werger kirin û li Sûleymaniyê belav bûbû. Lewra ya me nehatiye nivîsandin, wan nivîsandiye. Dibêjin, "ya ku hatiye nivîsandin dibe dîrok, ya din nabe dîrok."

Lê piçekî aqlê mirov hebe û mirov bikaribe binirxîne, mirov fêm dike ku ne wisa ye. Lewra gelek çîrokên Kurdan, di Şahnameyê de kirine yên Farisan. Faris, Urartu, Babil hemû behsa zilimkariya Aşûran dikin. Dema ku Aşûr ketiye, zilm kêm bûye. Di dîroka Faris de jî, bi xwe dibêjin, "Astiyeg kesekî zexel û bêhal bûye." Wisa be kesekî zexel û bêhal çawa dikare dîktatoriyê bike? Bi xwe jî dibêjin, "di BZ 550'an de dema ku deshilatdarî dikeve destê Farisan jî, heya BZ 521'an Faris û Med her pêk ve ne. Wekî din Astiyag nehatiye kuştin." Ger tiştekî wisa çênebûbe, ew çawa dibe efsaneyeke mezin. Ew girîng e. Divê mirov li ser lêkolîn bike û xelkê ronî bike. lewra gelek tiştên me berovajî dikin.

Weke min got, bûyereke bi navê Kawa tune. Lê Kawa nunertiya Kiyakser dike, Dehaq jî nunertiya paşayê Aşûriyan dike. Ji bo vê her kes vê guhertinê weke cejn dibîne û pîroz dike. Bi vî rengî demeke nû ya Medan dest pê dike.

…: Dîroka gelê me di pirtûkan de nehatiye nivîsîn. Divê em binivisînin. Divê her tiştê ku di nava pirtûka de jî hatiye nivisîn em weke rast nenirxînin. Divê em bi çavekî rexnegir lê binêrin. Ne tenê ji bo me, ji bo hemû gelan wisa ye. Lewra gelek tiştên ku hatine nivîsandin, bi plan in. Da ku pêşerojê jî li gorî xwe araste bikin. hinek çavkanî hene, divê mirov li ser baş dahûrandin bike û encaman derxe.

Tevrat, divê mirov baş bixwîne û tiştekî wê jî qebûl neke. Tevratê di derheqê gelê Rojhilata Navîn de çi gotibe, divê mirov dijberê wê fêm bike. Dervayî pesin dayina Cûhiyan û Persan tiştek tê de tune. Dervayî vê Sefernameyên ku hatine nivîsandin hene. Mesela Heredot, ji bo xwe di derheqê Medan de hin tişt nivîsandine. Gelek tişt jî pişt re lê hatine zêdekirin. Dîroka Heredot jî pir nêzikî tiştên ku di Tevratê tên

gotin in, Heredot bi xwe jî ne mirovekî bi însaf bûye. Behsa rastiyên dîrokî nake.

Etîmolojî (zimanzanî) hin derfetan ji bo lêkolînê dide mirov. Ger mirov wan encaman û yên ku van kesan nivîsandine ber hev bike, cudatî û dûrîtî jî tê dîtin.

Çîroka Kawa jî; yekem car Fîrdewsî nivîsandiye. Divê mirov vî kesî nas bike. Vî zilamî bingeha nijadperestiya Farisan, li Îranê bi awayekî fermî nivîsandiye. Jixwe weke nav jî ji bo şah, Şahnameyê dinivisîna û diyarî qral dike. Wê demê deve wî tijî zer dikin. Manifestoya nijadperestiya Farsan nivîsandiye. Di vê Şahnameyê de, xeynî Farsan ji hemû gelên din yên herêmê re heqeret dike.

Wisa behsa çîroka Kawa dike; dibêje Kawayê Hesinkar 3-4 zarokên wî hebûn, Kral Dehaq her roj mejiyê du zarokan dixwast da ku birîna xwe bide. Her roj du ciwan dikuştin û mejiyê wan dibirin Dehaq re. Lê dema ku tenê zarokekî Kawa ma, çareseriyek dît. Êdî her roj cihê ciwanekî pezek jêkirin û mejiyê wî pezî û wî ciwanî tevlî hev kirin û birin Dehaq re. Ew ciwanên hatine rizgarkirin jî, li çiyan veşartin. Dibêje, ji wan ciwanên ku li çiyan hatine veşartin û zêde bûne, qewmê Kurd çêbûye. Vê nasnameyê dide Kurdan. Bi vî rengî ew ciwan xwe komî ser hev û din dikin, êrîşî Dehaq dikin. Deshilatdariyê ji destê Dehaq derdixin û didin Ferîdun.

Li gorî vegotina wan Astiyeg, Ejdehaq e. Kawa jî weke kesê ku xizmet dike ku Kyros bê ser deshilatdariyê ye. Gelo ew kes Harpagos nene. Di encamê de bûye sedema binketina Medan. Di destpêkê de Kurdekî dixapînin û ji bo têk birina Kurdan kar tînin. Dibe ku ew Kawayê di wê derê de Harpagos be jî. Li gorî Şahnameya Fîrdewsî ew Kawa qet ne xwediyê berhemeke baş e. Lê divê di demên pêş de lêkolîn li ser zêde bibin û em bigêhêjin encamên cûda. Jixwe hinek nivîskar dibêjin, heya niha dîroka me li ser esasê binxistina gelan û bi destê Cûhiyan çêbûye, divê ji nû ve bê nivîsandin.

**H. Helmet:** Divê heval bi xwe jî hinek li ser lêkolîn bike. Di destpêkê de tiştên rast gotin, lê netîceya ku gihêştiye ne rast e. Jixwe armanca Şahnameyê ew e ku me bere encamên şaş. Serokatî dibêje, “Jenosîda çandî dixwazin pêş bixin.” Armanca Şahnameyê jî ew e. Ez bi xwe Fîrdewsî baş nas nakim. Qesî ku dizanim, jina wî jî Kurd e. Weke ku tê zanîn, civaka Kurd bi çîrokên devkî dewlemend e. Dibêjin jina wî jî pir dewlemend bûye ji aliyê çîrokan ve. Pere dane Fîrdewsî û gotina ji me re çîrokan çêke. Fîrdewsî jî ew çîrok bi piranî ji jina xwe girtine û bi rengekî wergerandiye dîroka fermî ya Farisan.

Ger em ê tiştekî rast bikin, divê em vê rast bikin; ne ku em rastiyên xwe jî bixin bin gumanê. Ez nabêjim, her tiştê me jî rast e. Lê hin tişt zelal in. Weke min got, di dîrokê de tiştekî weke Kawa tune. Ger efsaneyek wisa hebe, li ser bûyereke heyî teşbîh hatiye kirin. Di serdema kevn de jî ew ûslûp heye. Di Kurdan de jî ew ûslûp pêşketî ye, herî kêm ji yan Farisan pêşketîtir e. Ji ber vê yekê divê em gelek rastiyên xwe nexin bin gumanan.

Ger wisa bibe, pêwîst dike em hemû peykerên Kawa bişkênin. Divê em hemû stran û serboriyên xwe yên Kawayî ji holê rakin. Mesela em hevalê Mazlum Doxan re dibêjin, “Kawayê Hemdem.” Em li ser stranan dibêjin. Ger wisa be, divê em van hemûyan ji holê rakin. Jixwe navê wî jî ne Kawa ye, lê tu teşbîh dikê. Divê mirov mahne bide vê şêweyê. Jixwe ji vê wêdatir, ew dixwazin gelek tiştan berovajî bikin. Divê em li hemberî vê şiyar bin.

### *2-Serdema Firehbûna Medan*

Em ê mijara Medan berdewam bikin. Di encamê de Aşûriyan têk dibin û ji BZ 612’an heya BZ 550’î Med serweriya xwe berdewam dikin. Deshilatdariya wan ji sînorên Bakûrê Kurdistanê, heya Rojhilatê Îranê diçe. Bi renge Satrat pergala xwe li hemû herêman araste kirine.

Arteşa xwe teqûz kirine. Dibêjin di serdema Medan de arteşê şêwe girtiye, arteşbûna bi pergal pêş ketiye. Sûwar, piyade, tîrvan û yên din cûda kirine. Diyare ku pergala xwe ya îdarî heya astekê berfireh kirine.

Di salên BZ 590’î de şerê Med û Lîdya çêdibe. Li gorî dîrokê dibêjin 4-5 salan şerê wan berdewam dike û nikarin hev û din têk bibin. Tu kes mat nabe. Ew şer di serdema Kiyakser de çêdibe. Pişt re roj tê girtin û dibêjin, “ji ber vî şerî xweda ji me eciz bûye.” Bi vê sedemê ji hev dikin. Kralên Hîtît, Babîl û Misir dibin navbenker. Wê deme (Arnîs) keça Kralê Lîdya, didin kûrê Kiyakser, ango Astiyeg.

Di BZ 585’an de Kiyakser dimre û Astiyeg dibe Kralê Medan. 35 salan Astiyeg hûkimraniya Medan dike. Li gorî belgeyên heyî dibêjin BZ 550’î de deshilatdarî ji destê Astiyeges tê girtin û Kyrosê Axemenîşî (Akamendî) dibe qral. Lê Astiyeg naye kûştin, tenê ji hûkimdariyê tê girtin.

### *3-Serdema ketina Medan û deshilatiya Pars*

Heya salên BZ 524’an Med û Pars bi hev re hûkim dikin, bes qral Kyros e. Kyros jî dibe, neviyê Astiyeg. Ango keça Astiyeg, dayika

Kyros e. Bavê Kyros jî fermandarê herêma Parsan, nava wî Tîmûçîn e. Ango dayika Kyros Med e, bavê wî Pars e.

Ew guhertin di dîroka Heredotê de bi berfirehî tê vekirin, Serokatî jî di paraznameyan de cih dide. Diyare ku Kyros û Harpagos pêk ve, Astiyeg ji hûkimraniyê dixin. Harpagos berpirsyarekî leşkeri yê Medan bûye, bi Kyros ve hev kirine û Astiyeg dane aliyekî. Bûyer ew e. Ji bo çi ew hatiye kirin? Ew cihê şîroveyê ye. Berê di hinek belgeyan de dihat gotin, "Astiyeg nedikariye hûkim bike, pir zêde bi jiyana şexsî re mijûl dibûye. Bi neçîr, ger û jinê re mijûl dibûye; bi îdareya welat re meşqûl nebûye. Ji bo vê jî Harpagos û Kyros dest dane ser hûkimdariyê." Ew nêrîneke kevn e, niha jî hinek wisa difikirin.

Hinek belgeyên nû hene, dibêjin, "piştî ku Med û Lîdya hev kirin û keça qralê Lîdya dan Astiyeg, bi destê ew prensesa Lîdyayî deshilatdarê Lîdya, di nava koşkên Medan de pir pêş ve çû. Ji ber vê jî Pars û kesên weke Harpagos roj bi roj eciz dibûn. Lewra Med diket bin hejmuna Lîdya. Ji ber vê jî Harpagos û Kyros xwestine pêşiya vê yekê bigirin." Nivîskarekî din yê Yewnanî hebûye; dibêje, "di navbera Harpagos û Astiyeg de nakokî çêbûne. Astiyeg serê kûrê Harpagos jê kiriye û kiriye xwarin, ji Harpagos daye xwarin. Ji ber vê jî Harpagos eciz bûye û ketiye nava hewldaneke wisa."

Agahiyên bi vî rengî hene, mirov dikare şîrove bike. Bi nêrîna min, tesîra Lîdya û Medan heye; lewra berê gelek hûkimranan bi zewacan xwestine li ser hin împaratoriyên cuda tesîr bikin. Ya duyemîn, Med li ser esasê konfederasyoneke civakî çêbûye. Da ku ji bo deshilatdariya koletiyê ya Aşûriyan bibe alternatîf. Jixwe di destpêkê de karekterekî bi vî rengî heye.

Dema ku Med û Babîl, biryar didin ku Nînova bigirin; di nava xwe de Peyman çêdikin, divê erdên Nînova ji Babîlan re bimînin, hemû mal û hebûnên madî yên li Nînova jî ji Medan re bimînin. Di nava van tiştan de mirov û koleyên li wê derê jî hene. Lê dema ku Med Nînove digre, mirov û koleyên wê derê nabe û tevahî bajêr ji Babîlan re dihêle. Lê dema ku biryar didin ku Rihayê bigirin; vê dorê Riha divê ji Medan re bimîne û hemû mal û hebûnên madî jî divê Babil bigirin. Dema ku Rihayê digirin, erd ji Medan re dimîne, lê Babîl hemû mal û mirovên wê derê dibin. Ango Med mirovan weke kole nabin, lê Babil dibin; ew karekterek e.

Di çanda Medan de kolekirin pir pêş neketiye. Jixwe weke konfederasyona çandeke civakî pêş ketiye. Li hemberî pergaleke koletiye derketiye. Lê pişt re sînorên wê pir berfireh dibin; ji Behra Spî, heya

Behra Hazar û Xelîç diçe. An divê modeleke nû bibîne, an jî divê weke Aşûr û Babîl bibe. Ji bo vê Serokatî ji me re digot, "divê em formûleke bibînin, an na em nikarin bi vî rengî berdewam bikin." Diyare keseyeta Astiyeg, ji bo van herdu jibêrkan jî têrê nake.

Ez mînakeke din bidim. Di hinek belgeyan de dibêje, çend caran di navbera Astiyeg û Harpagos de pirsgirek derketine. Dema ku arteşê çêdikin jî, Astiyeg herêman bacê nagre. Lê Harpagos dibêje, "bi vî rengî nabe, divê em bac bigirin da ku em bikarin arteşê çêkin." Lê Astiyeg an qet bac nagre, an jî pir kêm bac digre. Wisa bi riya arteşê talankirina herêman tune. Lê dibêtiya ku ew pergal birûxe û xirab bibe heye. Kesayeta Astiyeg jî nikare alternatîfeke nû ava bike.

Ji bo vê lêgerînên Harpagos û Kyros jî hene. Harpagos ji ber ku bi xwe Med e, derfetên deshilatdariyeke bi vî rengî di nava çanda Medan da nabîne, lê di nava Parsan de heye. Têkiliyên wan yên tîcarî û hwd bi derve ve zêdetir pêş ketine. Ji aliyê din ve têkiliyên Pars û Cûhiyan pêş in. Jixwe di dîrokê de dibêjin yên ku alîkariya Parsan kirin û bûn sebeb ku Pars deshilatdariyê bigirin Cûhî ne. Ew Cûhiyên ku di serdema Aşûrî û Babîlan de, li Kurdistanê û Îranê bi cih kirine, aqil didin Parsan. Bi vî rengî koalisyona Harpagos û Kyros, Astiyeg didin aliyekî. Ew şîrove dibe ku zêdetir nêzikî rastiyê be.

Yek, diyare xwestine pêşiya Lîdya bigirin. Dudu, xwestine pêşiya rûxandina Konfedrasyona Medan bigirin û xwe îdare bikin. Ji ber vê yekê Astiyeg jî nekûştine, dane aliyekî û hinek pergala xwe çêkirine. Pêşiya Lîdya jî girtine. Lê di dema Kyros de jî pergaleke pir tîr û mîsoger çênabe, di dema Darîus de pergaleke mîsoger û hişk çêdibe.

BZ 521'an B.Z de Darîus, bi alîkariya Cûhiyan dibe deshilatdar. Karê yekem ku dike, kûştina Magên Zerdûştî ye. Li gorî hin belgeyan wê demê, 70 hezar mirovên olî yên Zerdeştî kûştine. Lewra dibêjin, "olê Zerdeştî, li pêşiya pêşketina pergala me asteng e." Lewra olê Zerdeştî nerm û mirovî ye. Rê nade pergaleke pir hişk û zilimkar. Ji ber vê yekê hejmareke zêde kesên olî dikûjin.

Ya duyemîn jî di ola Zerdeştiyê de li gorî xwe reforman dikin. Cara ewil di vê demê de Zerdeştî dibe olê deshilatdariyê. Pirtûka Zerdeşt, Zend e. Pişt re dibe Zend Awesta. Şîroveyên deshilatdariyê piştî vê demê pêş dikevin. Em niha dibêjin Awesta, gelek hevalên me jî paşnavê xwe dikin Awesta. Lê Awesta şîrove ye. Bi vî rengî êdî Zerdeştiyê dikin olê Desthelata Pars. Ew sapma û berovajîkirina yekemîn ku di ola Zerdeştî de tê çêkirin e. Di serî de di baweriyê de xarbûn çêdikin, pişt re jî di pergalê de.




Jixwe ew deshilatdariya Îranê ku 200 sal berdewam dike û pir hişk e, bingeha xwe ji wê demê digre. Bi vî rengî êdî Medan jî ji deshilatdariyê dûr dixin.

Piştî Medan, ger mirov weke kronoloji bigre dest; ji BZ 550'î heya BZ 330'î ew serdem bi destê Parsan û di bin serweriya wan de derbas dibe. BZ 330'î heya BZ 250'î jî li Kurdistanê deshilatdariya Yewnan heye. Îskenderê Makedonî, di destpêkê de tê û piştî wî jî deshilatdariya Selofkos û Yewnanên din heye. Ew jî weke berdewama Îskender in. Ji BZ 250'î heya PZ 226'an li Kurdistanê serdema Part Aşkaniyan heye. Ew jî qewmekî Aryanî ye. Niha Faris dibêjin, "Fars in." Lê ne Fars in, qewmekî cuda yê Aryenî ye. Ew jî texrîben zêdetirî 470'î salî li Îranê û beşek zêde yê Kurdistanê serweriya xwe çêdikin.

Di serdema Part de, Bakûrê Kurdistanê her di destê Partan de nene. Ji milekî ve Ermen pêş dikevin. Texrîben BZ 250'î heya PZ 50'î Ermenî li milê Serhad û wan deran serwer in. Milê Riha, Dîlok û wan herêm jî dem bi dem dikevin destê Rûman. Rûmên Rojhilatî ne, car caran li van deran hûkim dikin. Dem bi dem bi Partan re dikevin pevçûnan. Lê bi piranî weke hûkmê siyasî dikeve destê Partan.

Piştî vê demê ji PZ 226'an heya PZ 641 an, li Kurdistanê deshilatdariya Sasaniyan pêş dikeve. Sasanî jî li Îranê tê ava kirin, ew jî qewmekî Aryenî ne. Hinek dibêjin nêzikî Kurdan e, lê îro weke Fars tên naskirin. Lê ne Fars in jî. Qewmekî cuda yê Aryenî ne. Ew jî deshilatdariyeke navendî ava dikin û 400 sal zêdetir li van herêman serwer dibin. Kurdistan jî dibe beşek erdnigariya di bin serweriya wan de. Di vê serdemê de careke din, herêmên Dîlok, Gurgum, Efrîn û Meletî di destê Bîzansan de ne. Ji aliyekî ve Sasanî, ji aliyê din ve Bîzans hene.

Piştî 641'an Îslam dikeve Kurdistanê. Heya wê serdemê ew hêzên ku me hejmartin li ser Kurdistanê deshilatdar in.

Di van serdeman de em dikarin hinekî rewşa civaka Kurd binirxînin. Di dema Darîus de, hişkbûn çêdibe û Kurd hinekî din dikşe. Berv bi jiyana xwe ya xwezayî ve diçe û ji deshilatdarî û rêveberiyê dûr dikeve. Lê ji milê baweriyê ve pir guhertin çênabe. Di baweriya Zerdeştî de, bi bandora deshilatdariyê hinek guhertin çêdibin, lê ji ber ku civaka Kurd ji deshilatdariyê dûr dikeve, kêmtir guhertin çêdibin.

Di serdema Yewnaniyan de, dixwazin baweriya xelkê jî biguherînin. Ew mijareke girîng ku divê mirov li ser bisekine ye. Îskender û Yewnanî dixwazin, ji çand, dîrok û pirtûkên Rojhilat sûd werbigirin û baweriyeke nû pêş bixin. Wê demê ji vê çandê re dibêjin, çanda Helenîzmê. Dixwazin vê çandê pêş bixin. Li gorî ku tê gotin, wê demê gelek belge û daneyên Zerdeştiyê bi xwe re birine. Tesîr li ser erdnigariya Kurdistanê kirine. Heya demekê jî tesîra bawerî û fikra Yewnanî tesîr li ser van herêman kiribû. Di vê demê de li vê herêmê baweriyek pêş dikeve, bawerî û felsefe pêk ve ye. Heya serdema Manî tesîra wan heye. Hemû kesan ew negirtiye û baweriya gel neguheriye, lê tesîr çêkiriye.

Piştî ku Partên Aşkanî dibin deshilatdar, pergaleke pir hişk nameşînin. Piçek nerm e. Ne weke Pars û Sasaniyan e. Hûkmeke wan ya berfirehî heye, lê hişkbûneke navendî pêş naxin. Ew hem ji bo civaka Kurd, hem jî ji bo civakên din ku li vê herêmê hene, derfetên jiyaneke rehet didin. Wê demê Kurd bi baweriya xwe, jiyaneke asayî didomîne. Ew formen civakî yên weke xêl û hozan berdewam dikin. Di baweriyê de jî guhertineke pir zêde çênabe, jiyaneke civakî jî didome.

Di vê serdemê de, ji ber ku nêzikî zayinê jî dibin, bingehê qewimiyetê pêş dikeve. Di vê demê de bingeha qewmê Ermen û Ereb pêş dikeve. Formê qewmbûnê (gel-mîlet), bi hatina gel hev ya çend hozên nêzikî hev pêk tê. Ew dibe formeke berfirehtir. Qewmbûn û gelbûn piştî zayinê êdî pêş dikeve. Dibêjin li Kurdistanê jî bingeha qewmbûnê, di vê serdemê de pêş ketiye. Beriya wê tiştekî bi navê qewm û gelan tune.

Ji aliyê din ve, di serdema zayinê de, ji milê Hîndîstanê ve fikrê Budîzmê pêşketiye û heya Efganîstan û Pakîstan û Îranê tê. Ji aliyekî ve tesîra bawerî û felsefeya Yewnanî heye. Ji aliyekî ve li herêma Şamê Îsa derketiye û fikre Xiristiyaniyê hêdî hêdî pêş dikeve. Tesîra van hemûyan li ser Kurdistanê heye. Di Zerdeştiyê de jî, hem di serdema Persan de hin reform çêbûne, hem jî di serdema Partan de hin guhertin çêbûne. Ji ber vê sedemê jî diyare ku li Kurdistanê, êdî Zerdeştî tam nabe bersiv. Ji ber vê jî lêgerîn hene.

Di salên PZ 70'î de li Rihayê, beşek zêde ya gel dibe Xiristiyan. Li Hewlêr jî wisa. Li milê Rojhilatê Kurdistanê beşeke gel ji Budîzmê tesîr dibe. Ew fikir êdî di sedsala yekemîn ya mîladê de pêş dikevin, di sedsala duyemîn de zêdetir dibe. Lê Zerdeştî jî li ser piraniya gel tesîra xwe berdewam dike.

Di sedsala seyemîn ya mîladê de, êdî deshilatdariya Partan nabe bersiva îdarekirina civakê, her wiha baweriya Zerdeştî jî êdî nabe bersiv. Ji ber vê yekê lêgerîn zêde dibin û derketinên nû çêdibin.

Di vê demê de derketina rêveberiyê Sasanî bi pêşengtiyê Erdeşêr Pabegan, çêdibe. Di PZ 226'an de êdî Partan didin aliyekî û dibêjin, “êdî hûn nikarin bibin bersiv, em ê cihê we bigirin.” Ji milê baweriyê ve, di vê serdemê de Zerdeştî, Ginostanîkî, Budîzm, Xiristiyantî hene. Ew hemû li ser gel tesîr dikin. Her wiha di vê serdemê de Manî derdikeve. Li gorî belgeyên hene, Manî kesayeteke ku ji Babîlan derdikeve ye. Tesîra van bawriyên ku di wê serdemê de hene, li ser Manî hene û dixwaze li ser vê esasê bewerî û fikrekî nû pêş bixe.

Manî PZ 210'an de dayik bûye, piştî 245'an di nava dewleta Sasaniyan de cihê xwe digre. Serdema qral Şapûr e. Gelek fikrên xwe ji Şapûr dide qebûlkirin û di nava civaka Sasaniyan de fikrên xwe belav dike. Piştî Şapûr, di serdema Wehrana yekem kûrê Şapûr de; hem qralê wê demê, hem jî rahîbên Zerdeştî yên wê demê, fêm dikin ku ger di nava civakê de fikra Manî belav bibe, ew nikarin pergala xwe bi cih bikin. Ji bo vê di bin navê bêbawerî ye de, di Pz 276'an de Manî dikûjin.

Di vê derê de careke dîtir reform di Zerdeştiyê da dikin û ola Zerdeştî zêdetir nêzikî deshilatdariyê dikin. Bi vî rengî Sasanî li gorî xwe hem îdarê nû dikin, hem jî di ol de reforman çêdikin. Bi vê şêwazê li pêşiya Xiristiyanî, Manîtî û Ginostîkî digirin. Careke dîtir Zerdeştî li gorî xwe nû dikin û dixwazin bibin bersiv. Mirov nikare bibêje tesîra vê li ser civaka Kurd qet çênebûye, lê ji ber ku civaka Kurd pir zêde ne di nava deshilatdariya Sasaniyan de bûne, mirov dikare bibêje tesîra wê kêm bûye. Di vê serdemê de jî civaka Kurd, bi formen xwe yên civakî jiyan kiriye. Li ser vê esasê kariye forma xwezayî ya civaka xwe biparêze.

Heya salên 500'î rewşa Kurdistanê bi vî rengî bûye. Heya wê demê Sasanî pergala îdarî bi rê ve dibin. Piştî salên 500'î aloziya baweriyê li herêmê pir zêde dibe. Di van deman de Mazdek derdikeve. Tê gotin ku bi rengekî xwestiye fikrên Manî berdewam bike. Yek, xwestiyê di pergala îdarî û aborî de reforman bike; dudu, xwestiye di

civakê de reforman bike. Komînalbûyin di fikrên Mazdek de pir li pêş e.

Gelek projeyên li ser vê esasê dane Kûbat. Kûbat wê demê paşayê Sasanî bûye. Projeyên wî yên îdarî û aborî bûye sebeb ku Kûbat ji tengaviyan rizgar bibe. Lêwra têkiliyên wî û Qûbat baş bûne. Lê ew proje bûne sedem ku hinek komînalbûyin jî pêş bikeve. Ew jî bûye sedem ku serdestên Sasanî û oldarên Zerdeştî nerehet bibin. Gotine, “ger bi vî rengî biçe, dê rewşa me xirab bibe.” Ji bo vê li dijî Mazdek sekinîne, heya ku navbera wî û Kûbat xirab bikin.

Ji aliyê jinê ve, nêzikbûnên baş yên Mazdek hebûne. Mesela Xûrem hebûye; hinek dibêjin hevjina Mazdek e, hinek jî dibêjin heval bûne. Piştî ku Mazdek diçe jî, Xûrem vî fikrî belav dike. Ji ber vê yekê di serdema Îslamê de, baweriya Mazdekî weke Xûremdîn hatiye naskirin. Di fikra Mazdek de dibêje, “divê êdî jin û zilam nebin milkên hev û din.” Ew dibe sedem ku yên Mazdek hez nekin bibêjin, “Mazdek bê exleqî belav dike.” Çawa ku ji bo Manî hincetên wisa afirandin, bi vî rengî nêzikî Mazdek jî dibin. Pişt re meclîseke olî kom dikin, da ku nîqaş bikin. Hem gazî Mazdek û hevalên wî dikin, hem jî gazî hin Xiristiyanan dikin; lê di dema nîqaşan de Mazdek û hevalên wî hemiya dikûjin. Tê gotin ku ew bûyer di salên 528’an de pêk hatiye.i vî rengî pêşiya Mazdek girtine. Ew jî hewldan û lêgerîneke nû bû ku li Kurdistanê pêş diket, lê pêşiya wê hate girtin. Jixwe pişt re kûrê Kûbat, Xûsrev (Anawşîrvan) dibe hûktemenanê Sasaniyan. Deshilatdariyeke otoriter li Îranê bi cih dike. Dema ku pêşiya Mazdek tê girtin jî, lêgerînên pêşengekî nû li herêmê û cîhanê her hene. Wê demê li Kurdistan û Îranê stêrknasî li pêş e; hinek dibêjin dê ew pêşêng, ango pêximber li Şam pêş bikeve; hinek dibêjin li Erebîstanê pêş dikeve. Bi vî rengî êdî hêvî çêdibe ku ji derve yek were û bibe rizgarkerê wan. Ew ji Di sedsala heftemîn de derdikeve ku ew jî Mihemed e.Di van serdeman de em dikarin hinekî behsa têkiliya gelê Kurd û gelên din bikin. Di navbera Kurd û Farsan de têkiliyeke nijadî heye. Rêber Apo jî di paraznameyan de behs dike, Kurd û Fars qewmên Aryenî ne. Ermenî jî qewmbûna xwe vê demê pêş dixe û ew jî Aryenî ne. Lê dema ku Xiristiyanî tê Kurdistanê, Ermenî dibin Xiristiyan. Dibêjin “Xiristiyanî baweriya bindestan e.” Ji ber ku gelên weke Ermenî û Sûryanî jî li Kurdistanê bi zanatê re mijûl dibûne, baweriya Xiristiyaniyê qebûl kirine.i wê serdemê de ola serwer Zerdeştî bû, Kurd û Farsan ew ol ji bo xwe esasdigirtin. Gelên weke Sûryanî, Aşûrî, Akad û Kildanî Semîtîk bûn. Her çiqasa ji aliyê qewmî ve nêzikî hev bin jî, dema ku

olekî nû ku dibe bersiva pirsgirekên wan derdikeve, hinek vî olî dipêjirînin. Ermenî weke qewmekî bi karê dest û sanatê re mijûldar in. Ji ber ku ji aliyê deshilatdariyê ve dûrî hevnijadên xwe yên weke Fars, Part û Kurdan in, ji aliyê baweriye ve Xiristiyanî ji bo xwe esas girtine. Min xwest bale bikşînim ser vê mijarê jî.



**ZERDEŞT**

BZ 500-400'î de têkiliya Rojhilat û Rojava jî zêdetir bû. Di serdema Sokrat de jî, Yewnanî dihatin herêmê û felsefe û tiştên din fêr dibûn. Lê piştî sokrat, Platon û Arîsto wan navenda fikir û jiyanê hinekî hate guhertin. Hem rêveberiya îdarî û fikrî li Ewropa pêş ket, hem jî bi êrîşên Îskender xwestin hûkmê siyasî pêş bixin. Berê ve têkiliyên Rojhilat û Rojava hene û tiştên ku li Rojhilat pêş dikevin bi piranî veguhestina wan li Rojava jî çêdibe. Di vê serdemê de jî bi taybetî dema ku Xiristiyanî li Rojhilat çêdibe û li Rojava dibe ola fermî ya hêzeke weke Împaratoriya Roma têkilî zêdetir dibe.

Di serdema Manî de jî, hem li Rojhilat û hem jî li Rojava dêr (klîse) hene. Lê dema ku Manî tê kûştin û Zerdeştî di nava gelên Kurdîstanî û Îranî de careke din dibe deshilatdar, pişta 100 salî Xiristiyanî li Rojava dibe olekî deshilatdar. Bandora ola Manî li Rojhilat tê tepisandin û pêşî lê tê girtin, lê tesîra wî li Rojava berdewam dike. Jixwe Yewnanî ji hemû ol û fikrên Rojhilatî sûd werdigirin.

Em dixwazin li ser rojimêra (takvîm) Kurdî jî hin tiştan bibêjin. Ew nirxekî civaka Kurdistanê ye, girîng e ku em lê xwedî derkevin. Di nava gel û rewşenbîrên me de nîqaşên cûda hebin jî, mijara bingeha rojimêrê girîng e. Di Sûmer û Babîlan de teqwîm pêş ketiye.

Teqwîma herî kevn ya Babilan e, texrîben temenê wî 4000 hezar salî zêdetir e. Lê derveyî Babîlan, li cihanê teqwîma herî kevn ya Kur-

dan e. Niha jî li hinek cihan di nava civaka me de û ji aliyê hinek rewşenbîrên me ve tê şûxilandin. Em li ser bisekinin dê baş bibe. Lewra yekem nirxeke civaka me ye, yek jî ew teqwîm pir nêzikî xwezayê ye. Her wiha teqwîmeke rast e.

Niha teqwîma mîladî ya Xiristiyaniyê tê karanîn û ji navenda Brîtanya û Holanda esas tê girtin. Lê ger em ew teqwîma xwe xwedî derbikevin, dê bibe alternatîfeke baş. Em teqwîma mîladî weke ku ji destpêkê ve heye û qet naye guhertin  digirin dest. Lê ji ber ku îro mesîhî li ser cîhanê hûkimran in, teqwîma xwe dane pêjirandin.

Berê li gorî teqwîma mîladî, 1'ê avrêlê sersala wan bû. Li gorî hesabê wan Mesîh di 25'ê adarê de dayik bûye, piştî hefteyekî jê re mîlad kirine û bûye sersal. Dema ku Protestan ser ketin û hin gav avêtin, teqwîm jî guhertin. Gotin, "katolîk rast nabêjin. Mesîh di 25'ê adarê de dayik nebûye, di 25'ê Kanûnê de dayik bûye. Ji bo vê sersal 1'ê çile ye." Niha tenê Katolîk 1'ê avrêlê weke sersal dibînin û niha jî vê rojê weke sersalê pîroz dikin. Berê di nava Xiristiyanan de du dêr hebûn, digotin, "Kasolîkî û Ersodoskî." Kasolîkî re digotin dêrên Rojava. Li gorî wan sersal 1'ê avrêlê bû.

Dema ku Protestanî hatin, dijî wan sekinîn û ew roja 1'ê avrêlê kirin roja henekan. Da ku êdî ji mejiyê gel derbixin. Li gorî Ersodoskan ku ola Romên Rojhilat û Ermeniyane jî, Mesîh di 6'ê çile de dayik bûye. Sersala wan jî 13'ê çile ye. Bala we kişandibe, beşeke gelê me yê Bakûr hê jî dibêje, "di navbera teqwîma me û ya wan de 13 roj hene." Lewra di serdema Romayiyan de, ketine bin serweriya wan û hê jî tesîr li ser gelê me maye. Ew teqwîm ne ya Kurdî ye, niha jî Ermenî wisa pîroz dikin.  Lê ji ber ku têkiliyên Kurd, Ermenî û Bîzansiyan pir çêbûye, gelek xelkên me fêm dikin ku ew sersala Kurdî ye. Tenê di nava Xiristiyanan de sê sersal hene. Lê niha ya ku herî zêde di nava dinê de belav bûye, li gorî Prostestantiyê ye û 1'ê çile ye. Tam nava zivistanê ye. Niha ew bûye malê dinê jî. Lê divê em bizanibin ku ew bi vî rengî çêbûye.

Meseleya nexşê û seatê çawa be, ew jî wisa ye. Dibe ku em îro nikaribin biguherînin, lê pêwîst e bê guhertin. Ew bi xwe li ser vê teqwîmê hev nakin.

Teqwîmeke din ku li Rojhilata Navîn hatiye şûxilandin, ya Îslamî ye. Yekê re dibêjin sala Hicrî. Ew li gorî hîcreta Mihemed hesap kirine. Dema ku Mihemed ji Meke çûye Medînê ye. Li gorî mîladê Mihemed di sala 622'an de hîcret kiriye, ew kirine destpêka salan. Beriya Mihemed jî Ereban salên xwe li gorî heyvê hesap kirine. Aryenan li gorî

tavê salên xwe hesap kirine. Ereban li gorî heyvê hesabî sal kirine. Teqîp kirine û ferq kirine ku hevy, di 355 rojan de li dinê dizivire û tê cihê xwe. Ew kirine salek. Ji bo vê dibêjin sala heyvê 355 roj in. Mehên xwe jî li gorî wê hesap kirine û kirine 12 mehan. Heyv hinek caran 29 rojan, hinek caran jî di 30'î rojî de zivirandina xwe timam dike.

Ew jî kirine meh. Li ser behre temaşe dikin, dema ku heyv derdikeve dibêjin meha xwe timam kir, lê dema ku timam neke dibêjin hê meh berdewam dike. Ji ber vê wan kesên ku rojiyê digirin, hinek car 29 rojan, hinek car jî 30'î rojî digirin. Jiber ku sala hicrî qemerî 10 roj ji sala tavê kêmtire, Her sal jî 10 roj ferq dike. Sersala hicrî her sal 10 rojan tê pêş, Ji bo vê li gorî teqwîma Erebî, carna destpêka salê di havînê de ye, carna jî diçe zivistanê., ger îsal havînê be; piştî neh salan diçe biharê. 18 salî şûn ve diçe zivistanê, piştî 36 salan careke din tê havînê. Ger temenê yekî/ê têrê bike, îsal rojî havînê girtibe, piştî 36 salan dikare careke din havînê rojiyê bigre.

Li gorî xwe Ereban teqwîmek çêkirine, mirov rêz nîşan dide. Lê gorî nêrîna min, eger em li ser heyvê jiyan bikin û li gorî heyvê sal û mehan hesap bikin rast e; lê em li ser dinê jiyan bikin û li gorî heyvê hesap bikin, ne rast e. Divê em li ser dinê hesap bikin. Şaştiya wan di wê derê de ye. An na şopandina heyvê û hesapkirina wê rast e. Em gerîla ne, divê em jî tav, heyv û rojan baş hesap bikin û bizanibin. Lewra em dikarin li gorî vê çalakiyên xwe jî araste bikin.

Sersala Hîcrî ya hetawî heye; wê jî Îrana Îslamî hesap dike. Ew jî li gorî hîcreta Mihemed e, lê destpêka salê kirine bihar, newroz. Ew jî dibe teqwîma hîcreta hetewî. Li gorî dinê û zivirandina rojê hesap dikin. Li gorî tavê, sal 365 roj û 6 seat in. Berê gotine, 360 roj e; lê dema ku stêrknasî tam pêş dikeve, tê fêm kirin ku 365 roj û 6 seat e. Îran niha salê wisa hesap dikin.  Ji bo wê dîqat bikin, niha li Îranê sal 1394 e. Niha rojbûna hevalên me yên Rojhilatî li gorî vê teqwîmê ye. Mesela hevalekî/ê 25 salî, di 1369'an de hatiye dinê. Başe ku ne li gorî teqwîma mîladî ye, lewra divê em van tabûyan bişkênin. Lewra bandorên oryantalîzmê û kapîtalîzmê li ser me hene.

Ji ber vê yekê her sal 10 roj jî ferq dike. Niha salên hîcreta Ereban 1436 in. Li gorî salên hîcretî yên Îranê 42 sal ferq kiriye. Salên Ereban 42 salî ketine pêş. Lewra temenê salên wan kêmtir e. Weke me got, teqwîma Îranê jî li gorî hîcretê ye, lê ew jî weke xwe lêkirine. Çawa ku Şîatî weke xwe lêkirine, ew jî weke xwe lêkirine. Dibêjin Muhamed

falan salê hîcret kiriye û timam e, êdî li gorî xwe sersalê û hwd hesap dikin. Ango damgaya xwe lê dane.

Teqwîma Kurdî çi ye? Ji bo vê çend nêrînên cuda hene. Beşeke mezin gel û rewşenbîrên Kurd, destpêka avabûna Medan weke destpêka salên Kurdî hesap dikin. Ango BZ 700'î weke destpêk digirin dest. Teqwîma wan jî heye, li gorî dinê û tavê sal û roj hesap kirine. Hinek derdorên din jî dibêjin, Med di BZ 715'an de derketine, divê em wê salê weke destpêk bigirin dest. Hinek jî derketina Medan li ser têkbirina Aşûran hesap dikin. Ango dibêjin divê ji BZ 612'an de dest pê bike.

Li gorî min BZ 700 rastir e. Ger belge hebin, mirov dikare yên din jî esas bigre. Lê ger em Medan esas digirin, avabûna Medan ji bo me esas e. Ya duyemîn jî, gelek caran Aşûrî me rexne dikin. Dibêjin, "Kurd gelek tiştên xwe li ser me ava dikin." Em xwe li ser Aşûriyan ava nakin û em ne li dijî Aşûriyan jî nenin. Lê dewletekê deshilatdarî û zilimkar hebûye, me li dijî wê şer kiriye. Di encamê de Aşûrî jî hatine rizgarkirin. Mînak Sadam hate rûxandin, Ereb jî rizgar bûn. Ji ber vê yekê ger em teqwîma xwe li ser têkçûna Aşûriyan hesap bikin, xwe li ser xelkên bi navakirin e. Ji bo vê, bi nêrîna min ew nêzikbûn teng e. 5 sal dereng, an jî zû ferq nake; lê divê em destpêka avabûna Medan esas bigirin. Divê weke tevger nêzikbûneke me hebe.

Li gorî vê em biçin, niha salên Kurdî 2715 ye (li gorî mîladê salên 2015'an). Gelek cihan weke serketina qral û şeran weke destpêka salên xwe hesap kirine. Ya girîng ku tiştekî jê re bikî bingeh. Ji bo me jî ew baştir e. Ango ew 2700 sale Kurd teqwîm hesap dikin.

Rojekê hevalên me yên enternasyonel hatibûn, ez çûm gel wan. Em hinek li ser dîroka Kurd û Kurdistanê axifîn, min hinek behsa teqwîma Kurdî jî kir. Van hevalan ji Arjantînê hatibûn, gotin em hinek tiştan ji bo xwe digirin. Lewra dibînin ku li gorî teqwîmên dîtir, xwezayîtir û xweştir e. Ji bo wê bala wan dikşine.

Yek jî ger miletekî beriya 2715 salan tevgerên roj û heyvê hesap kiribin û teqwîm pêş xistibe, ne gelekî bê aqil e. Niha jî bala xwe bidinê, hinek extiyar hene bêyî ku seatê bidin şûxilandin kêngê dema nimêje ye, kêngê dema hilatin û daketina rojê ye dizanin. Hemû karên xwe bi van tiştan dikin. Ew hafiza û mejiyê civakê ye. Weke me got, derveyî Babîlan kesekî dîtir ku teqwîm weke Kurdan hesap kiribe Tûne. Lê em lê xwedî dernakevin. Ger em bi kîte bikevin navê, hesabê Kurdî baştir derdikeve.

Mesela em dibêjin Kurd gelekî ku nêzikî xwezayê ye. Kurd salên xwe bi biharê didin destpêkirin, niha Farsan jî wisa kiriye. Di erdnigariyên çarfasil jiyan dikin de, despêka jiyanê bihar e. Zivistan ne destpêka jiyanê ye, dema îstîrahatê ye. Ji bo sewal, xweza û civakî jî ew yek wisa ye. Lê li gorî Xiristiyanan, di nava îstîrahatê de sal destpê dike, li gorî Ereban jixwe ne diyare kengê destpê dike. Lê li gorî Kurdan, tu bi bihar û xwezayê re destpê dikê.

Em 21’ê adarê weke sersala Kurdan dibînin û em pîroz dikin. Lê em jî ji Tirk û oryantalîstan bandor bûne; me meha martê ya wan kiriye adar, sersala Kurdan 1’ê adarê ne 21’ê adarê, wate 21’ê Mart ê ye. Em navên Kurdî, li gorî teqwîma mîladî lê dikin, ev xelet e. Lê li gorî teqwîma Kurdî meha yekemîn avdar e. Di vê mehê de befir dihele, av zêde dibe. Lê ilme ziman xwe hinek sivik dike; ji ber vê avdar bûye adar. Meha adarê 31 roj in. Di salên Kurdî de 6 mehên yekemîn 31 roj in; 5 mehên din ku pişt re tên 30 roj in; meha donzdehemîn jî sê salan 29 ye, saleke jî dibe 30’î.

Di Kurmanciya jorîn de meha yekemîn adar e, di Kurmanciya jêrîn de dibêjin xakelêva. Bi giştî civaka Kurd de meha newrozê jî tê gotin. Hinek newrozê bi serkeftinê ve gire didin û dibêjin roja nû. Lê weke me got, li gorî hinek belgeyên ku çêbûne, dibêjin serkeftina Medan di tebaxê de çêbûye. Lê ne pirsgirekeke mezin e. Xakelêva jî, ji ber ku berê berf pir bûye û di vê mehê de diheliye û xak (ax) derdiketiye, gotine lêvê xakê derdikeve û pê re gotine xakêleva. Meha adarê li gorî teqwîma mîladî ji 21’ê meha seyemîn dest pê dike, heya 20’ê meha çaremin berdewam dike. Bala xwe bidinê navê meh, li gorî dem e û destpêka salê jî li gorî xweza ye.

Meha duyemîn yê Kurdî ku meha duyemîn ya biharê ye gulan e. hem di Kurmanciya jorîn, hem jî di Kurmanciya Jêrîn de gulan e. Lê li Rojhilat benamer jî tê şûxilandin. Nîsan, Civaka Êzîdî dişûxilînin, lê ne Kurdî ye koka wî Babîlî ye. Lê niha ketiye nav lîteretûra Kurdî. Di vê mehê de êdî gul derdikevin, ji ber vê dibêjin gulan. Benamer jî, ji vê derê tê; dema ku di biharê de berxik çêdibin, ji ber ku hê sar e, di meha yekemîn de wan dernaxin, di meha duyemîn de derdixin. Ji bo vê dibêjin dema mer (pez) e. Li gorî teqwîma mîladî ji 21’ê çaran destpê dike, heya 21’ê pencan berdewam dike.

Meha seyemîn ya biharê cozerdan e. Ango meha ku ce zer dibe ye. Genim hinekî din dereng zer dibe, di vê mehê de ce zer dibe. 22’yê pencan destpê dike, heya 21 şeşan.

Meha çaremin, ango meha yekemîn ya havînê, pûşber e. Ji 22'yê meha şeşan heya 22'yê meha heftan e.

Meha pençemin, meha duyemîn ya havînê tirmeh e. Bi Kurmanciya Jêrîn dibêjin xermanan. Li Rojhilat jî ji bo vê mehê dibêjin gelavêj. Bes gelavêj ji bo çi tê gotin? Ji bo stêrka gelavêj tê gotin, lê gelavêj di meha din de derdikeve, ji ber vê şaş tê gotin. Ji ber ku ew meh pir germ e, jêra gotine tirmeh. Ji ber ku xerman kom dikin jî, gotine xermane. Dema bênderan e. Ew mehe jî li 23'yê heftan, heya 22'yê heyştan berdewam dike.

Meha şeşemîn, meha seyemîn ya havînê gelavêj e. Bi Kurmancî dibêjin tebax. Ji 23 heyştan dest pê dike, heya 22 yê nehan berdewam dike. Van şeş mehan hemû 31 roj in. Gelavêj ji ber stêrka gelavêj e, tebax jî ji ber ew nexweşiya ku di bin lingên sewalan de derdikeve tê gotin. Bi vî rengî mehên havînê jî xilas dibin.

Mehên payîzê, ya yekemîn rezber e. Êdî rez ber digirin. 23'ê nehan destpê dike, heya 22 dehan berdewam dike.

Meha duyemîn ya peyîzê gelarêzan e. Bi Kurmancî dibe cotmeh. Vê mehê re dibêjin xezalwer jî, ew zêdetir li Rojhilat tê karanîn. Gelarêzan û xezalwer di mahneya weşîna çûloyên daran de ye. Cotmeh jî di mahneya, dema cotkirinê de ye. Ew ji 23'ê dehan destpê dike, heya 21'ê yanzdan berdewam dike.

Meha seyemîn ya peyîzê jî sermawez, mijdar e. Ango serma werz e, di vê mehê de werza (mewsim) sermeyê dest pê dike. Mijdar jî bi wateya dema tem û mij dest pê dike. Ji 22'yê yanzdan destpê dike, heta 21'ê yekê donzdehan berdewam dike.

Meha zivistanê ya yekemîn berfanber e. Berf, ango befir dibare. Ji 22'yê donzdehan destpê dike, heya 20'ê yekan berdewam dike.

Meha duyemîn ya zivistanê rêbendan e. Bi Kurmanciya Jorîn jî rêbendan e, lê li hinek cihan sebatê didin şûxilandin. Hinek dibêjin, ji şubatê hatiye, hinek jî dibêjin sibatê Erebî hatiye. Mahneya bêdengiyê ye. Ji ber barîna berfê rê tên girtin û ji bona wî dibêjin rêbendan. Ew ji 21'ê yekemîn dest pê dike, heya 19'ê duduyan berdewam dike.

Meha seyemîn ya zivistanê reşemî, reşemeh ye. Ew meheke ku xwezaya mirov tê guhertin. Xwîn dikeve tevgerê, bi taybetî di jinan de diyar dibe. Renge mêr û jinê reş dibe. Hem xwîn pir zêde dikeve tevgerê, hem jî ji ber ku mirov vê mehê xwe zêdetir dide ber tavê mirov reş dibe. Di vê mehê de ruyê mirov hinekî diguhere. Ew 20'ê duduyan

destpê dike, heya 20'ê siseyan berdewam dike. Pişt re derbasî sala nû dibe.

Bi giştî meh; adar, gulan, cozerdan, pûşber, tirmeh, tebax, rêzber, cotmeh, sermawez, berfanber, rebendan, reşemî. Bala we jî kişandibe, salên Kurdî bi xwezayê destpê dikin, mehên Kurdî bi xwezayê hatiye bi nav kirin. Ew girîng in. Civaka Kurd, her tiştê xwe bi xwezayê îfade kiriye.

Mijara çile heye. Li Kurmanciya Jorîn çile weke mehekê tê şûxilandin, lê ne meh e; 40 rojî tê. Di nav Kurdan de çileya zivistanê heye, çileya havînê heye. Çileya zivisatanê ew 40 rojên herî sar in; çileya havînê jî ew 40 rojên herî germ in.

Çawa hesap kirine? Çileya zivistanê 5 roj ji berfanber girtine, meha rebendan hemû ye, 5 roj jî ji reşemiyê ne. Ji ber vê dema ku mirov dikeve reşemiyê, dibêjin tu kete reşemiyê, êdî çile derbas bû. Çileya havînê jî mehên pûşber, tirmeh û tebax-gelavêj e. Gelavêj ew meha ku êdî germahî dişkê ye. Tirmeh meha herî germ e, 5 roj jî ji pûşber heye.

Weke nirxeke civaka Kurd ku em lê xwedî derkevin, vê mijarê girîng dibînim. Ne ku weke Brîtanya û Fransa em xeta Girinic biguherînin, lê em behsa rastiya xwe dikin. Niha yên ku ew burc ûhwd hesap dikin, li gorî stêrk û tiştên wisa diçin, li gorî mîlad ûhwd naçin. Wisa be civaka me ji zû ve van rêbaz ceribandine.

…: 3 sal berê li Sîne, mintiqayek heye li wir kelehek heye. Li wê derê mûmyayek derxistibûn û digotin Diyako ye. Li ser sînga wî hinek wêneyên masiyan hebûn, li keleka wî jî hin tiştên weke zeran hebûn. Îranê bir û veşart. Lê ger mirov lêkolîn bike, dikare gelek tiştên dîrokî jî ronî bike. Beriya ku mûdaxale bê kirin, dîmenên wî jî hatibûn kişandin.

**H. Helmet:** Me behsa forma civakî ya Kurdan kiribû; di dema neolîtîkê de formek hebû. Di serî de klan bû, pişt re bû tîre. Ew formen civakî pêş ketibûn. Di dema tabaqa û çînan de jî xîzanî, tîre xêlî û hoztî zêdetir pêş dikeve. Piştî dema çînatiyê jî gel-qewm pêş dikeve. Ew jî formeke din ya cuda ku li hemû dinê û Kurdistanê pêş dikeve ye. Niha jî dema ku em li civaka Kurdistanê mezî dikin, em forman hemû li Kurdistanê hene.

Forma pergala deshilatdariyê, di dema civaka xwezayî de tune. Lê dema ku derbasî dema çînatî dibe pergala koletiyê pêş dikeve. Ew derveyî Kurdistanê pêş dikeve, li Kurdistanê pêş nakeve. Başe ke li Kurdistanê pêş jî neketiye. Di dema Medan de jî derfetên vê hene, lê dîsa

pêşketinek wisa çênabe. Di dîrokê de tu kesî behsa pergalek wisa nekiriye ji bo Kurdan. Lê berê ji ber ku em nebûne xwediyê pergaleke wisa me rexne dixwarin. Me jî digot, çima me wisa nekiriye, lê niha em dibêjin başe ku me pergaleke wisa pêş nexistiye.

Lê dema ku li Mezepotamyaya Jêrîn ew pergala koletiyê pêş dikeve, teyisîna xwe li ser Kurdistanê jî dike, ango pergala hozbûnê hinekî xwar dibe. Pergaleke ku weke berê bi giştî civakî ye, lê koletî jî bi giştî pêş nexistine. Ew form di dema Medya de digêhêje lûtkeya xwe û divê gaveke nû biavêje, lê ji ber ku gav neavêt, dîsa vegeriya li ser xêl û xoz. Weke berê jiyan kir. Li vir em dikarin rexnedayina xwe bidin. Ger Medya derketinek bû û hêviya derketineke nû dida; dikarî pergaleke nû û derveyî koledariyê ava bike. Dikarî pêşiyê li pergala kedxwarî û deshilatdariya dewletê bigre, lê nebû bersiv.

Em dikarin vê derê de rexnedayina xwe bidin. Lê ji ber ku Medya, weke Aşûr û Persan nebûye împaratoriyeke koledar, divê em rexneyan li xwe nekin. Divê em bibêjin başe ku pêşengên me ew nekirine. Ger bikirana dê em jî fêrî kedxwarî û dagirkeriyê bûbana.

### *-Piştî Medan Bindestbûna Kurdistanê*

Piştî Medya, li Kurdistanê serweriya hêzên weke Îskender, Pers, Yewnanî, Aşkanî û hêzên din heye. Kurd jî bi riya formen xwe yên civakî û kevn jiyan dike. Lê hinek formen civakî yên Kurd jî ji deshilatdariyê tesîr dibin. Bi vî rengî li Kurdistanê çînîbûn çêdibe. Berê şêweya civakî ya li Kurdistanê formen xwezayî yên Kurd bûn, lê di vê demê de bi piranî vê yekê biparêze jî hinek ji deshilatdariyê bi bandorbûn jî heye. Hin çînên serdest yên Kurd, da ku bikaribin jiyan bikin têkiliyên xwe bi derve ve çêdikin. Li vê derê êdî bingeha çîna serdest pêş dikeve. Da ku deshilat bihêlin ku ew weke bijîn; hinek bac didin, an jî bi rengekî têkiliyên xwe bi derve re çêdikin. Niha jî Barzanî jî bo ku bikaribe hûkmê xwe berdewam bike, hin tavîzan dide derve û têkiliyên xwe bi derve re çêdike.

Li vê derê bingehê hevkariya dagirker û serdestan çêdibe. Êdî piştî Medya, bingeheke wisa pêş dikeve û heya îro bi rengekî berdewam dike. Tu nikarê bibêjê hemû civak wisa bûye, lê tebaqayeke wisa heye.

Hinek derdoran ew têkilî dane şûxilandin, da ku civaka wan bi komkûjî û zextan ve pir zêde rû bi rû nemîne. Aliyekî wisa jî heye. Lê hinekan jî ew têkilî dane şûxilandin, da ku li ser civakê xwe serwer

bikin. Herdu nêzikbûn jî di civakê de derketine pêş. Ew bi forma ku li Kurdistanê tê guhertin ve girêdayî ye.

Ji aliyê baweriyê ve, di dema civaka xwezayî de baweriya civaka Kurdistanê anîmîzm û mîtraîzm bû. Di dema deshilatdarî pêş ket jî di mîtraîzmê de kast çêdibin. Di dema Medya de bi riya Zerdeştiyê gavek tê avêtin û baweriya Zerdeştiyê pêş dikeve. Ew ji bo baweriya Mîtraîzmê jî reformek bû. Hinek tesîr li ser civaka Kurdistanê û Îranê kirin. Lê dema ku Pers bûn deshilat, hinek berovajîbûn û rê derketin çêbûn. Zerdeştî ji xeta wê hate derxistin.

Di dema Sasaniyan de ew berovajîbûn û rê derketin zêdetir bû. Du caran rastî mûdaxaleyên wisa tê. Zerdeştî du caran hate aşle kirin û li gorî deshilatdariyê hate formkirin. Ew li ser çand û nêzikbûna civakî jî bandor dike. Lê ji ber ku Kurd ji deshilatdariyê dûr bûne, kêmtir li ser bandor kiriye.

Tiştê ku li vê derê mirov bala xwe bide ew e; ji Medya heya dema Îslam, her çiqasî dem bi dem hin guhertinên biçûk çêbûne û bandora baweriyên din çêbûye jî; texrîben hezar û 300 sal, li Kurdistanê baweriya Zerdeştî esas bûye. Dema ku van hêzên din jî li Kurdistanê serwer bûne, ji ber ku baweriya wan jî piranî yek bûye, li ser baweriya civakê pir zêde zext çênekirine. Di dema serweriya Yewnanan de xwestine baweriya civakê biguherînin, ew jî pir zêde bi ser nexistine. Bi kurtasî forma baweriya Kurdan, bi piranî weke Zerdeştî bi awayekî xwezayî berdewam kiriye, lê ji ber mûdaxaleyên hêzên deshilatdar li ser Zerdeştiyê, ew jî weke berê nemaye. Hin guhertin di baweriya Zerdeştî de çêdibin.

Ji milê jiyanî ve, ji ber ku piştî Medya hin êrîşên Darîus li ser civaka Medya cebûn, civaka Kurd kêmtir dikeve nava deshilatdariyê. Zêdetir bi jiyana xwezayî xwe îdare dikin. Ew jî dibe sedem ku vegerin jiyana xwe ya xwezayî. Li gund û çiyan, zêdetir bi sewal xwedîkirin û zîratê debara xwe dikin. Wê demê Kurdan berê xwe nedane bajaran. Di serdema Gutiyan de hinek berê xwe dana bajaran û hinek bajar jî çêkirine, lê piştî Medya Kurdan zêdetir li gund û çiyayên xwe jiyan kirine. Naye wê mahneyê ku kes li bajaran nemaye, lê piranî di gund û çiyayan de ne.

Îro, bi taybetî 30-40 salên dawî ji ber pergala sermayedarî gel berê xwe dide bajaran. Lê heya 30-40 salî berê jî piraniya civaka Kurd li gund û çiyan jiyan dikir. Nihe ji sedî penc jî li gundan jiyan nakin. Bi taybetî li Başûrê Kurdistanê hemû di bajaran de jiyan dikin. Jixwe demekê enfal çêkirin û hemû gund vala kirin, piştî salên 90'î jî pergala

sermayedar hemû kişandin bajaran. Gundên mayî jî çend mal hene. Ger em taybetmendiyên xwe biparêzin, dibe ku piştî 15-20 salên din gelek mirov berê xwe careke din bidin çiyan. Lewra gelên ku taybetmendiyên wan yên civakî kûr bin, nikarin tahamûlî qeyrana ku di nava bajaran de tê jiyankirin bikin.

Di wan deman de jî rewşeke wisa hatiye jiyankirin û Kurdan careke din berê xwe daye gundên xwe û jiyana xwe ya xwezayî berdewam kiriye. Ew tenê Kurdistanê ne wisa ye, piranî civakên din jî di vê astê de rewşeke bi vî rengî jiyan kirine.

Di vê serdemê de me behsa lêgerînên heyî kir. Hewldanên Manî, Mazdek, Îsa û Yewnanan hene. Tesîra van jî heye. Her yekî xwestiye li gorî demê derketinekê çêbike û nûbûnekê pêş bixe. Li gorî derfetên wan her yekî tesîra xwe jî kiriye, lê li ser civaka Kurdistanê pir zêde tesîra wan çênebûye. Buda BZ 500'î de li Hîndîstanê derdikeve û li gelek herêman belav dibe, lê li ser Kurdistan û Îranê zêde bandor nake. Îsa Mesîh, li Fîlîstîn û Lûbnanê bi tesîr dibe, hinek li Kurdistanê jî bandor dike, lê li ser civaka Kurd pir zêde tesîr nake. Ger li Kurdistanê tesîra wî hebe jî, li ser civakên din ku ne Kurd in tesîr dike, li ser Kurdan zêde tesîr nake. Fikre Manî demeke kin tesîr dike, lê nabe mayinde. Fikre Yewnanî jî her wiha. Di sedsala 6'emîn de Mazdek hinek tesîr dike, lê ew jî mayinde û demdirêj nabe.

Ji ber vê di sedsala 6'emîn û 7'emîn de di civaka Kurdistanê de lêgerînên baweriya nû  zêdetir dibe. Di heman demê de aloziya deshilatdariyê zêdetir dibe. Ew dibe sedem ku civakên li herêmê jiyan dikin bikevin nava lêgerînekê û tiştekî nû ava bikin.

# DI SERDEMA ÎSLAMÊ DE KURDISTAN

Me pêwîstî dît ku em hinekî li ser Îslamê berfireh bisekinin. Diyare di mijara îslamê de kêmasiyên me hene. Divê em her yek hewl bidin ku nêzikatiya Serokatî ya baweriyan fêr bibin û li gorî wê nêzik bibin. Lewra ol û bawerî nêzikatiyeke girîng ya mirovan e. Her miletek jî zêdetir ji baweriyeke ve girêdayî ye. Civaka me jî wisa ye; yên ku Îslamê red dikin jî di bin tesîra Îslamê de ne, yên qebûl dikin jî di bin tesîra Îslamê de ne. Em hemû baweriyan nas bikin baş e, lê zêdetir jî naskirina Îslamê ji bo me girîng e.

Ji ber vê yekê projeyeke esasî ya ku Serokatî dixwaze bi ser bixe jî, îslama demokratîk e. Lewra Serokatî heqîqeta wê dizane. Lê nêzikatiya me çawa ye? Me berê bi nêrîna sosyalîzma pêkhatî lê mezî dikir, lê di wê demê de jî Serokatî gotiye, *"divê nêzikbûna me ya ol weke ya sosyalîzma pêkhatî nabe."* Ji roja destpêkê ve heya niha, Serokatî bi nêzikatiyeke ku red dike nîşan nedaye.

Wan sosyalîstên berê digotin, "Marks gotiye, 'ol afyona miletan e.'" Lê nêzikatiya PKK'ê ne wisa bûye. Ji ber vê yekê, wan sosyalîstên berê digotin, "PKK olperest e, ne sosyalist e." Li ser vê mijarê û mijara netewê em rexne dikirin. PKK'ê jî digot, "redkirina ol ne karê sosyalîzmê ye." Bi kurtasî di nava paradigmaya kevn de jî Serokatî weke sosyalîzma pêkhatî nêzik nebûye. Lê em pir caran li gorî Serokatî û rastiya PKK'ê naçin. Em li gorî hest û fêmkirina xwe diçin. Hinek heval weke oldarekî/ê nêzik dibin, hinek heval jî pir bi bertek nêzikî ol dibin.

Nêzikbûna me ji bo ol dê çawa be? Me hinek behsa pêşketina ol kir. Em behsa psîkolojî û moralê mirov dikin. Di civaka xwezayî de jî mirov ne bê ol bûne. Lê olê mirovên civaka xwezayî ne wek ya îro bûye. Bawer û îmana wan jî hebûye, lê bi demê re hatiye guhertin. Îro jî em ne bê Bawerin. Ma kes dikare bibêje Serokatî bê bawer e, an jî heval bê bawer in? Ez bi xwe qebûl nakim. Lewra em bê bawer bin, em nikarin karekî bikin. Lê ne şert e ku baweriya me ya Îslama Sûnî û Şîa be, ne şerte ku îmana me weke ya Zerdeştî û Xiristiyaniyê be.

Bawerya me baweriyeke nû ye. Li gorî dem, pêvajo û rastiya civaka îro ye. Ji bo vê hinek dibêjin, "PKK weke olekî ye." Bi vê nêrînê ger mirov mezî bike nerast e. ji ber ku Serokatî dibêje, "dema olan nemaye, dem dema tevgerên nûjen e." PKK li gorî pêwîstiyên civaka îro, tevgereke fikrî, bawerî û civakî ye. Hevalan pirs kirin û gotin, "em çawa nêzikî Zerdeştiyê dibin?" Zerdeştî li gorî wê demê tevgereke

bawerî û pêwistiyên civakê bûye. PKK jî li gorî îro, tevgereke siyasî, bawerî û civakî ye. Ne tenê ji bo Kurdistanê, dixwaze ji hemû pêwîstiyên mirovên dinê re bibe bersiv.

Wisa be bingeha me ya bawerî, siyasî û civakî heye. Ew baweriya me cih dide her renge baweriyan. Serokatî dibêje, " di fikrên min de Sokrates, Marks, Îsa, Mihemed, Promethus… heye. Ji her yekî/ê tiştek tê de heye."

Di civaka îro de, çend nêzikbûnên li hemberî ol hene; divê em van nêzikbûnan bizanibin û xwe biparêzin. Ya yekem, ya rêl sosyalîzmê ye ku ol red dike. Divê em nekevin nava nêzikatiyeke wisa. Hevala/ê ku bikeve nava vê nêzikatiyê, rastiya PKK'ê nas nake. Tenê ji bo Îslamiyetê nabêjim, ji bo hemû olan dibêjim.

Dudu, nêzikbûna qlasîk ya civakî heye. Ji dayik û bavê xwe hatine dinê ku Îslamê Sûnî ne, hinek Îslamê Şîa ne, hinek Êzîdî ne, hinek jî Xiristiyan in. Li gorî wê bûyinê nêzikbûn û qalibên wan hene. Niha gelek kesên Sûnî, ji Şîa hez nakin. Xiristiyan û Misilman, ji hev û din hez nakin, Cûhî û Misilman hev û din hez nakin. Ew yek ûtopyayeke ku hatiye çêkirin e, bi damgaya ol û rêoliyê wisa lê hatiye. Divê em wisa nêzik nebin. Hevala/ê ku wisa nêzik bibe, divê bizanibe ku di fikrên Rêber Apo de kûr nebûye. Dibe ku hevalên me her yek ji olekî cuda hatibe, lê divê weke PKK'ê nêzik bibin, divê weke civakê nêzik nebin. Ew jî nêzikatiyeke şaş ku em dixwazin biguherînin. Divê em hem nêzikatiya xwe, hem jî ya gel biguherînin.

Mesela em diçûn Şengalê, hinek xelkên me yên Misilman hebûn, nan û ava xelkê me yê Êzîdî nedixwarin. Xelkê me yê Êzîdî jî eciz dibûn. Careke em bi hinek hevalan ve çûn Şengalê, min dît ku hevalek xwarin naxwe. Dema ku me rexne kir, destpêkê got, "ez birçî nebûme." Pişt re îtîraf kir. Ji civaka Îslamî tesîr bûye. Ew kes xizmetî me dikin, nirx didin, lê ew heval dibêje, "ez naxwazim bixwim." Nêzikatiyeke wisa nabe. Hinek Êzîdiyên me jî hene, naxwazin li gel Misilmanan biaxifin. Divê ew jî wisa nekin.

Nêzikatiyeke din heye ku ew sed salên dawî pêş ketiye. Pê re dibêjin ola siyasî, Serokatî vê têgehê rexne dike û dibêje, "ne ola siyasî ye, ola deshilatdariyê ye." Ango ol dikin amûrê deshilatdariya xwe. Divê em ne bi xwe ol bikin amûreke deshilatdariyê, ne jî rê bidin ku tu kesî din bike. Di civaka Rojhilata Navîn de, Îslam û Cûhîtî wisa tê karanîn, lê li Ewropa Xiristiyanî bi vî rengî tê şixûlandin. Divê em vê qebûl nekin. Vê jî bi du rengên cuda dikin. Hinek dixwazin bi şêwazeke nerm bikin, hinek jî bi şêwazeke hişk vê yekê dikin.

Mesela yên weke AKP û Îhvanî Mûslîmîn, dixwazin bi şêwazeke nerm kar bînin. Hinek jî bi awayekî hişk dixwazin vê yekê bikin. Heval carna vê nêzikbûnê re dibêjin "îslama radîkal-mîsoger" lê ne wisa ye. Îslama radîkal, em in. Radîkalbûyin tê mahneyeke pozîtîf. Ew şêwaza olên tûnd, an jî şîdetê ne. Nêzikbûn yek e, dixwazin ol ji bo deshilatdariya xwe kar bînin. Lê hinek bi riyeke nerm dixwazin vê yekê bikin, hinek bi riya tûndî û zextan dixwaze vê yekê bike.

Em van herdu nêzikatiyan jî nakin û em nahêlin ku civak jî bibe amûrê vê yekê. Lewra ew nêzikbûn baweriyan xirab dikin û civakê diperçiqînin. Li ser navê ol tûndiyê dikin, civakê jî bê vîn dikin. Lê yên ku ol didin şûxilandin kezenç dikin.

Nêzikatiya sermayedariyê re jî dibêjin laîktî. Ew nêzikbûn jî dibêje, "em ol û deshilatdariyê ji hev û din cuda dikin." Lê di heman demê de ol û civakê jî ji hev û din cuda dikin. Dibêjin, "ol tenê karê kes e." Ew jî ne rast e. Ger ol û dewlet ji hev û din bên cudakirin, baş e. Lê ol û civak, ol û exleq ji hev û din cudakirin ne rast e. Lewra kapîtalîzmê bi vî rengî, bi riya protestantiyê ol û civak ji hev û din cuda kir. Bi vî rengî di nava civakê de belavebûn çêbû. Berê bi riya ol, di nava civakê de kombûyinek hebû. Dema ku ew têkilî nema, kapîtalîzmê xwe li ser civakê hakîm kir. Ji ber vê yekê dibêjin, vê nêzikatiyê bingeha bê exleqî û xirabiyên civakî yên îro çêkiriye.

Em van her çar nêzikbûnan jî rast nabînin. Serokatî di paraznameyan de dibêje, "ya me nêzikatiya çandî ye." Nêzikatiya çandî, ol weke beşeke çanda civakê digre  dest. Tevgera şoreşgerî ku dixwaze ji civakeke re pêşengiyê bike, çawa nêzikî civakê dibe? Çanda civakê dinirxîne, tiştên ku guncav dibîne pêş dixe, yên ku guncav nebine jî hewl dide ku biguherîne. Bes bi hûrmet nêzikî wê dibe. Di heman demê de em naxwazin ol bikin amûrê deshilatdariyê û em nabêjin ol, civakê eleqedar jî nake.

Ol rengekî baweriyê ye, Serokatî dibêje, "bê metafizik jî nabe." Mirov bê bawerî nabe, bes ne şerte ku em li gorî baweriyên berê nêzik bibin. Ger em bikaribin van nêzikatiyan esas bigirin û her olekî jî baş nas bikin, baş e. Lewra ger mirov ol baş nas neke jî, mirov ne dikare baş bigre dest, ne jî dikare rexne bike. Ger em dibêjin nêzakatiya me ew e, li keleka wê divê em hinekî nas jî bikin. Ne ku em bibêjin kê çi kir û çi bawer kir. Civaka me bi piranî Misilman e, ji ber vê divê em Îslamê baş nas bikin, da ku em bikaribin wan re nîqaş bikin û em wan bigihînin asta ku em dixwazin. Ji bo hemû olan wisa ye.

Divê em di vê mijarê de jî şiyar bin; divê em ne bêjin falan ol baş e û bêvan ol xirab e. Oryantalîstan çi kir? Nêrîneke weke ku Xiristiyanî baş e û Îslamiyet xirab e, pêş xist. Niha gelek rewşenbîrên ku xwe pêşketî dibînin, wisa nêzik dibin. Divê em nekevin nava nîqaşeke wisa. Nêzikbûneke wisa ne li gorî tevgera me ye.

### *-Şert û Mercên Derketina Îslamiyetê*

Ji salên 624'an heya 628'an gelek şer di navbera Sasanî û Bîzansan de çêdibin. Jixwe di vê demê de deshilatdariya qralê Sasaniyan Xesrew eberwiz( Zal) dest diçe û tê kûştin. Piştî wî 4-5 salan gelek qral li Îranê tên guhertin. Di nava çar salan de 10 paşayên Îranê tên guhertin. Tê wê mahneyê ku alozî heye. Wê demê êrîşên Bîzansan jî zêde ne, heya nava Sasaniyan tên û demekê paytexteke Sasaniyan jî digirin. Careke din Sasanî wan diqewirînin û heya cihê wan diçin. Ew çûn û hatin li ser civakê jî bandor dike. Bi kurtasî aloziya hûndirîn û derveyî heye. Ew hemû di sedsala şeşemîn û heftemîn de pêş dikevin.

Li Erebîstanê jî, di vê demê de hin pêşketin hene. Erebîstan jî weke Kurdan forma qewmî jiyan dike. Pergala civaka Erebîstan, pergala civaka qebîleyan e. Deshilatdariya Sasanî, li wir jî hûkim dikir. Civaka Erebîstan jî weke Kurdistanê bû. Lê ji ber ku Erebîstan dûr bû, deshilatdariya Sasanî weke ku Kurdistanê hebû, lê Erebîstanê tune bû.

Di dîrokê de tê gotin, Erebîstan ketibû bin tesîrî  sê çar deshilatan. Beşek di bin tesîrî Habeşan de bû. Habeşî dixwaze, herêmên Yemen, Meke wan deran bigre, çend caran êrîş dike, lê nikare bigre. Jixwe ew herêm di bin serweriya Sasaniyan de ne, lê tam nikare hûkmê xwe çêke.

Kîbtî li Misirê hene, hinek tesîra wan jî li ser Ereban heye. Ji aliyê din ve Bîzans, li Anatolya û Şamê hûkim dike, lê hûkmê wan li ser Meke û Erebîstan wan deran zêde tune. Ew yek ji bo Ereban fersendekî çêdike. Lewra di navbera sê çar deshilatdaran de ne, lê hûkmê hemûyan jî li ser tune. Jiyana wan jî jiyana qebîletiyê ye. Hinek qebîleyên wan, ji deshilatdariyê tesîr bûne, lê bi piranî jiyaneke xwezayî jiyan dikin.

Di rewşeke wiha ku li cîhanê ji aliyê siyasî û baweriye ve lêgerîn hene de, li civaka Ereb de lêgerîn zêdetir in. Çawa ku dema Rêber Apo derdikeve dibêje, "rewşa civaka Kurdistanê ji bo derketinek nû guncavtir bû. Divê an derketinek nû çêbikira, an jî tune bûbûya." Li rewşa Erebîstanê ya wê demê jî wisa ye. Di nav Bîzansan de êdî fikre

xwedayî pêş ketibû, di nava Sasaniyan de jî Zerdeştî hebû, li Habeşê jî hebû, di nava Kîtbiyan de jî hebû. Lê di nava Ereban de, baweriya totemi hê dihat jiyankirin. Ew li gorî demê nedibû bersiv.

Ji aliyê formê civakî ve; forma civakî jiyan dikirin, lê ji koletiyê jî tesîr bûne. Bi giştî aloziyeke jiyan dikin. Dixwazin derbasî formeke nû bibin, lê bi kîjan rengî ye, ne diyar e. Ew bingeh di nava Ereban de zêdetir e û derfet ji bo derketineke nû, guncav in. Mesela me got, di van deman de bingehê gelbûnê di nava Kurdan de pêş dike. Di nava Ereban de jî bingehê qewmbûnê hêdî hêdî pêş diket û vê jî li ser Ereban tesîr dikir. Di heman demê de, di nava Ereban de wêje jî pir pêş dikeve. Beriya Îslamê wêjeya ku di nava Ereban de pêş ketiye, niha jî kes nikare bigêhêje wê astê. Hem nivîs pêş ketiye, hem jî xîtabet pêş ketiye.

Çawa em dibêjin, Kurd di çîrokan de zîrek in; ew jî di helbest û xîtabetê de zîrek bûne. Her sal diçin Meke, Meke wê demê jî cihekî pîroz e. Li wê derê mîhrîcanên wêjeyî jî dikin; pirtûkan dixwînin û helbestan dinivisînin. Ez ji bo çi bale dikşînim ser vê. Em dibêjin, Ereb pir xirab bûne û Îslamê her tişt ji bo wan aniye. Ne bi wî rengî ye. Li ser wê bingeha heyî, Îslam pêş ket. Li herêmê çiqasa bandora koletiyê hebe jî, ne weke Kibtî, Habeşî û Sasaniyan e. Hinek kesên ku ji koletiyê bandor bûne hene, lê weke pergaleke koletî çênebûye.

Ji milê aborî ve têkiliya wan bi çar şaristaniyan ve heye. Ew ji bo wan fersendan derdixe. Ji milê wêjeyê ve îmkanên wan hene. Ji milê civakî û jinê ve jî hin erenîbûn hene. Dema em behs dikin, dibêjin beriya Îslamê jin bi awayekî zindî dixistin çalan. Ew çande ne gelemperî bûye. Ger wisa bûya, Ereb çawa zêde dibûn. Rastî ewe ku hendek dewlemendên Ereb nedihiliştine ku keçên wan biçin gel xelkê. Lê ew nisbetekî kêm bûye, hemû Ereb ne wisa bûne.

Mînak Xetîce ne jin e? di wê demê de hem salên wê ji Muhamed zêdetir in, hem jî tacîrek e. Ger li ser jinê zexteke wisa mîsoger hebe, Xetîce çawa bi vî rengî ye? Di şerê Kureyşan ku li hemberî Muhamed dimeşînin de, rista Hindê ji hemû zilaman zêdetir e. Hind, dibe hevjîna Ebû Sûfyan. Ya ku Hamza dikûje, Hind e. Eger hemî jin bên kuştin çewa kesên wekî Xetîce û Hind derdikevin.

Ew taybetmendiyên hin birdoziyan e. Îslam jî dema ku hatiye, dibêje “beriya min cehalet hebû. Hemû tişt xirab bûn û min rast kirin.” Lê her tişt ne wisa ye. Ew naye wê mahneyê ku Îslamiyetê tiştek nekiriye, lê pêwîst dike ku beriya xwe tune nehesibîne. Hevalên me jî tesîr bûne û dibêjin, “Îslamê pir xizmetî Ereban kir, lê ji bo Kurdan ne baş bû.” Ew nirxandin şaş e. Ne her tişt daye Ereb, ne jî her tişt ji Kurd

stendiye. Ger em wisa binirxînin, em ne dikarin Îslamê fêm bikin; ne jî dikarin bi Îslamê re jiyan bikin û têkoşîn bikin.

Bi kurtasî rewşeke bi vî rengî hebû. Aliyên baş yên Ereban jî hebûn, kêmasî û şaştiyên wan jî hebûn. Şaştî û kêmasiyên wan çi bûn? Ger gav neavêta, dibe ku pergaleke çort û zilimkar li Erebîstanê pêş biketa. Çawa ku di dema Medyayê de Kurdan gav neavêt, parçebûn çêbû û ket bin serweriya hin hêzên din. Dibe ku di wê demê de, di nava Ereban de parçebûn jî zêdetir bûbûya. Ew aliyê wan yê lewaz bû. Lê ji aliyê din ve wêjeya wan û aboriya wan pêş dikeve. Li ser vê esasê lêgerînên wan jî hebûn.

Bala xwe bidinê, di serdema Mihemed de gelek pêximber hene. Êdî li Erebîstan jî pêximberî belav dibe û bendewariya pêximberekî heye. Lewra stêrknas, dibêjin "di van deman de pêximberek tê." Di destpêkê de dibêjin, dê were Şamê, lê pişt re dibêjin, dê bê Erebîstanê. Mînak Mûseylemayê Derewzîn heye. Navê hemûyan naye bîra min, lê di wê serdemê de gelek kes dibêjin, "em pêximber in." Lê yê ku bû pêximber Mihemed bû.

Yên din çima nikarîn? Lewra strateji û pêwîstiyên Pêximberiyê nikarîn pêk bînin. Mûseylema jî ne ku Derewkar bû an navî wî Derewkar bû, lê jiber ku bin ket. Ji bo wê navê wî kirin Mûseylemayê Direwzîn (Derewkar). Lewra dibêje, "ez pêximber im." Lê ser nakeve. An Mihemed divê bibe pêximber, an jî ew. Ger ew bi ser biketa, dibe ku Mihemed bibûya direwzîn. Bi vî rengî hewldan çêbûn, gelek kesan xwest bibin pêximber û pêşêngên Ereban, lê nikarîn. Tenê Mihemed ew rol lîst.

Dema ku Mihemed pêş ket, rewşeke objektif heye. Li dinê û Erebîstanê rewşek heye. Ji aliyê sûbjektîf ve jî lêgerîn heye, yek ji wan jî Mihemed e. Divê em rast nêzik bibin, Mihemed mirovekî zîrek bû. Ne mirovekî ji rêzê bû. Mirovekî ku hem ji aliyê kesayet ve, hem jî ji milê pratîk û polîtîkayê ve zîrek bû. Diyare ku ji zarokiya wî ve, rewş ji bo wî guncav bûye.

Mihemed, ji malbata Haşîmî ye. Malbata Haşîmî jî, ew malbata ku salên dirêj xizmetî Kabê dikin e. ango malbateke olî ye. Li Meke, du malbat esas in; yek malbata Haşîmî ye ku xizmetî Kabê dikin e. ew malbat di xizmetî hemû kesên ku tên serdana Kabê dikin, de ne. Lewra Meke cihekî pîroz e. Ji ber vê damgayeke wan ya pîroz heye. malbata Ebû Sûfyan wan jî, malbata îdarê ne. Jixwe dibin pismamên hev û din. Berê bapîrê wan Qûsa hebûye. Wî hem xizmetî Kabê dikiriye, hem jî Meke îdare kiriye. Lê pişt re zarokên wî kar di nav xwe de beş kirine;

malbata Haşîmî êdî xizmetî Kabê dikin, yên din jî îdare dikin. Muhamed ji malbateke wisa derketiye.

Di civakê de ew tişt jî heye, mirovên ku bê dayik û bav mezin dibin; an pir baş dibin, an jî pir xirab dibin. Heqîqeteke wisa heye. Lewra dayik û bav, mirov pir qontrol dikin. Bi taybetî dema ku zarokê kur digêhêje 10-15 saliyê, bavik dixwaze êdî ew zarok weke wî bibe. Ger bavik nebe, dibe ku kur rehetir tevbigere û dibe ku weke bavê xwe nebe. Êdî baş be û xirab be, ew tiştekî cuda ye. Ger dayik jî tune be, ew dibêtî zêdetir dibe. Lewra dayik jî têgihiştina zarok re pir eleqadar dibe. Hê ku Mihemed ji dayik nebûye, bavê wî diçe. Hê temenê wî nebûye, 6 sal dayika wî diçe û hê temenê wî nebûye 10 sal jî bapîrê wî dimire.

Bi vî awayî  bêxwedî mezin dibe. Ji bo vê yekê dibe ku Mihemed bibe kesekî pir xirab, an jî dibe ku bibe kesekî pir baş. Di van şert û mercan de dibêtiya şikestinê jî heye, dibêtiya xwe bawerbûneke mezin jî heye. Diyare ku Mihemed, ew tişt ji bo avakirina xwe kirine bingeh. Divê em bi awayekî qalibî û dogmatik mezî nekin. Mesela em niha bûne gerîla, hin xeyalên me hene. Em ne weke kesên di nava civakê de ne, lê ew kesên ku dibin pêşeng, zêdetir xwediyê xeyal û lêgerînan e.

Serokatî dibêje, "ez di 6-7 saliya xwe de li ser bûyerên civakî fikirîm." Mihemed jî di salên xwe yên biçûk de, li ser gelek tiştan fikirî ye. Dê çawa bê bav û dayik, xwe mezin bike û bigêhêjîne. Mirov bi neçarî van tiştan difikire. Diyare ku baş jî fikirî ye. Ger em van bizanibin, em dikarin mahne bidinê.

Di dema Mihemed de, qarekterekî Ereb heye ku kesên dewlemend çend salan zarokên xwe dişînin gund, da ku yekî li gund wan mezî bike. Wan re dibêjin dayen. Mihemed jî wisa xwedî dikin. Her wiha çandeke wan heye, zarokên 5-6 salî re mamosteyan digirin û wan fêrî xwendinê dikin. Lewra weke îro hemû zarok nikarin biçin dibistan ûhwd. Di nava Kurdan de jî ew heye. Dema ku Îslamiyet hat jî, meleyan ew rist dîlîstin. Yên dewlemend mele tanîn malên xwe û yên feqîr jî diçûn gel mele, da ku fêrî xwendin û nivîsandinê bibin.

Mihemed jî di biçûkiyê de dayika wî û bavê wî miriye. Li gel kalkê xwe maye, kalkê wî jî xwedî derfet bûye. Dibêjin Mihemed neçûye ber xwendinê, ji bona wê xwendina wî tunebûye. Dibe di 10 salî û 15 saliya xwe de, derfeta wî nebube xwe fêr bike; lê mirov bawer nake ku kesekî ew qesa zîrek nikare xwe fêrî xwendin bike. Yek jî Mihemed, hem bi karwanên Ebû Talîp, hem jî bi karwanên Xetîce li gelek cihan geriyaye. Hatiye Şam, Yemen ûhwd. Ma mirovekî wisa

hewl nade ku fêrî çend tîpan bibe? Guman nîne ku xwe fêrî xwendinê kiriye.

Ji bo çi Xetîce wî dike berpirsê karwanê xwe? Diyare ku baqil e. Serokatî dibêje, "divê mirov bizanibe di kîjan demê de kîjan gavê biavêje." Ew jî wisa dike. Ger Mihemed kesekî xwedî helbest be û her sal biçe mîhrîcanê de helbestan bixwîne û pişt re bibêje, "ez pêximber im" kesek bawer nake. Lê ger kesekî ne xwendî be, qûran pê re were û hema di wê kêliyê de fêrî xwendinê bibe, dê bê bawer kirin. Ez vê ji bo çi dibêjim? Lewra helbestvanên Meke, demeke dirêj gotine, "Mihemed tenê helbestvanek e û tiştekî din nîne. Wekî me ye." Lê Mihemed jî dibêje, "ez xwendin nizanim, ez bi fermana xwedê bûme xwendevan û tiştên ku ez dibêjim jî weke wahî ji min re hatine."

Pir bi hişyarî û bi plan kar kiriye. ger ne baqil be, di bîst saliya xwe de nedibû berpirsyarê yekîneyên parastina Meke. Lewra wê demê ji bo parastina Meke, yekîneyên parastina cewherî ava dikin û Mihemed jî dikin berpirsyarê wê. Kesê ku baqil û hişyar nebe wisa nakin. Lewra Meke navendeke mezin ya tîcaretê ye, berpirsyariya wir nadin her kesî. Dibêjin, pê re digotine Mihemedûl Emîn. Ne kesekî baqil be, pê re wisa dibêjin? Guman nîne ku nabêjin.

Dîsa di 35 saliya xwe de, dema ku di nava eşîran de pirsgirek derdikevin, navbenkariyê dike. Rê û rêbazên li hevanînê pêş dixe. Ger kesayeta wî ne mûsaît be, nikare van tiştan bike. Rewşa sûbjektîf hebûye, derfetên objektif jî ji bo xwe ava kiriye. Xwe tam ava kiriye û pişt re gav avêtî ye. Wisa bê sebir û bê dem gav neavêtiye. Bala we jî kişandibe, Serokatî gelek caran di van mijaran de me rexne dike. Di dîrokê de jî gelek tevgerên şoreşgerî û baş hene, lê ji ber ku dem, textîk û stratejiya xwe baş hesap nakin bi bin dikevin. Mihemed ew tişt baş hesap kirine.

Mesela zewaca wî û Xetîce; li gorî qanûnên eşîrî dema ku zilamek zewicî, divê jina wî ji wî biçûktir be. Ew êdî dibe mijareke psikolojik. Kêm kes hene ku bi jineke ji xwe mezintir re zewîcî bin û jin neanîbin ser wê. Hinek kes hene, dema ku birayê wan dimire jina birayê xwe digirin, an di pirsgirekeke civakî derdikeve tiştekî wisa dibe. Xeynî vê rewşê, ger xortek zewac bike divê teqez jina wî, ji wî biçûktir be. Yek jî divê ji her alî ve asta wê jinê, ji ya zilam kêmtir be. Piştî ku deshilatdarî pêş dikeve, ew psîkolojî jî pêş dikeve. Di civaka Ereb de jî ev heye.

Lê Mihemed jinekê re dizewice ku 15 salan ji wî mezintir e. Yek pîr e, yek ciwan e. Wisa be ew zewac, ne zewaceke li gorî şertên civa-

ka wê demê ye. Xetîce dîtiye ku Mihemed kesekî zîrek û ciwan e û li gorî karê wê baş e, xwestiye pê re bizewice. Xetîce jî siyasî nêzikî wî bûye, ew jî siyasî nêzikî Xetîce bûye. Ger Xetîce nebûya, Mihemed nedikarî her sal biçe Şam, Iraq, Yemen û Bahren. Lê bi riya karwanên Xetîce diçe wan deran.

Dema ku diçe Şamê, Cûhî û Xiristiyanan nas dike. Lewra navenda wan li wir e. Li wê derê civaka Fîravun jî nas dike. Dema ku diçe Iraqê, Babîl û Sûmeran nas dike. Dema ku diçe Yemenê, Habeşiyan nas dike. Salê du caran sefer dike; havînê diçe milê Şam û Iraqê, zivistanê jî diçe milê Yemen û Bahrenê. Bi riya wan karwanan, hem debara xwe dike, hem jî tiştan fêr dibe. Her wiha ger pereyên Xetîce nebûna, Mihemed her sal nedikarî 40-50 rojî biçe şikeftê û lêhûrbûn bikira. Ger pereyên mirov tune bin û debara mirov nebe, mirov bi neçarî diçe kar, ji bo lêhûrbûnê derfet tune. Ger îmkan û derfetên Xetîce tûnebin. Mihemed nikare ji bo armanca xwe lêhûrbûn û kar bike.

Ji wê jî zêdetir, Xetîce jineke zîrek bûye. Pismamekî Xetîce bi navê Wereqe heye, elimekî wê serdemê bûye. Dema ku Mihemed diçe şikeftê, pê re wahî tê û vedigere; di destpêkê de Xetîceyê re dibêje. Xetîce jî ji Weraqe re dibêje. Wereqe dibêje, “tamam, Mihemed bûye pêximber.” Ger bi riya Xetîce nebûya, nedikarî ji Wereqe jî îstîfade bike. Dibêjin ji Wereqe jî pir zêde îstîfade kiriye. Bes Wereqe mirovekî kal bûye, jixwe piştî demeke ku Mihemed bûye pêximber wefat kiriye.

Tiştê ku ez dixwazim bibêjim; Mihemed xwe ava kiriye, şert û mercên wê demê jî baş xwendine û gavek avêtiye. Gotiye, “ew pêximber, îman û baweriya ku dinê li bendêye, li gel min e. Vaye ez derketim.” Li ser vî esasî gav diavêje û dibe pêximber. Di nava milet de tê gotin; kesekî ne xwendiye, dibe pêximber û wahiyan dinivisîne. Kesekî ne helbestvan e, ji helbestvanan baştir xîtab dike. Bi vî rengî tesîr dike. Bala xwe bidin xîtap û ûslûbê qûranê, îro jî dema ku yek bi dengekî xweş dixwîne, mirov tesîr dibe.

### *-Derketin û Belavbûna Îslamiyetê*

Weke me li jor gotiye, bingeha objektif û sûbjektîf ya Îslamiyetê wisa çêbû. Bi vî rengî Mihemed gavek avêt. Dîqat bikin, dema ku li welatê Ereban Mihemed got, “*peyam ji min re hatiye*” û bû pêximber, direk neçû ku li cîhanê belav bike. Sê salan bi awayekî veşartî tevdigere û derdora xwe ya nêzik rêxistin dike. Divê em li ser vê bifikirin. Piştî sê salan karê xwe eşkere kir, lê tenê Meke belav kir. Heya 8 salan ji Meke derneket, piştî 8-9 salan çû milên din.

Heya ku Omer nebû Misilman, nimêjek eşkere nekir, bangek eşkere nekir. di 7 saliyên pêximberiya xweda ew yek kir. Lewra Omer di nava hêzên leşkeri yên Kûreyşan de fermandar bû. Gotineke bi nav û deng ya Mihemed heye, dibêje, "li Meke du Omer hene, heya ku yek ji wan naye li gel me, em sernakevin." Yek ji wan Omeran, Ebû Cehl e. Ango bavê nezanînê, bavê cehaletê ye. Ji bo ku naye Îslamê, Mihemed navê wî dike, Ebû Cehl. Lê berê dibêje, ger bê li gel me cih bigire em ser dikevin. Yê din jî Omerê Xetap bu. Lê Omerê Xetap dibe îslam. Jixwe yekî zîrek û qûre ye. Dema ku tê, ji Mihemed wan re dibêje, "eybe ku hûn bi dizî nimêj dikin. Ka biçin ser banê, bang bikin; kî dixwaze bila bê nimêj bike. Kî dixwaze bê û pêşiya me bigre jî; bila bê, ez dizanim çi ji wan dikim." Wê demê bi awayekî eşkere bang dikin û nimêj dikin. Tiştê ku ez qest dikim, ew textîka ku hatiye meşandin, divê mirov bizanibe.

Piştî 11-12 salan hinek şandeyan dişînin Medîne û ji xwe re li wê derê cih çê dikin. Dema ku li ser pêximberiya Mihemed re 14 sal derbas dibe, diçin Medînê û li wir bi cih dibin. Lewra li Meke tengav dibin. Texrîben li Medîne jî 8 salan dimînin û piştî wê bi ser dikevin. Gelek şeran dikin, heya ku bi ser dikevin. Careke din Meke digirin û deshilatdariya xwe belav dikin. Van çîrokan kêm zêde hevalan bistîne, lê di demên pêş de me xwend, divê em bi rehetî bixwînin. Divê ne bi redkirinê, ne jî bi qaliban bigirin dest. Divê bi rengekî ku mirov bikaribe bixwîne û hinek şîroveyan bike, bixwîne.

Dîqat bikin, di sala 6'emîn ya hîcretê de peymana Hudeybî heye. Wê demê Misilman dixwazin biçin hacê û nimêj bikin, lê Kûreyşî qebûl nakin. Li hev dikin û dibêjin, "pêwîst e hûn îsal nayen hacê, lê hûn dikarin saleke din bên." Mihemed vê qebûl dike, lê divê Peyman bê çêkirin. Dema ku Peyman dinivisînin Elî nûner Mihemede dibêje, "bîsmîllahîrahmanîrahîm." Yê Kureyşî jî dibêje, "em qebûl nakin vê peyvê, ger em vê yekê qebûl bikin, em çima şerê we dikin." Mihemed dibêje, "rast dibêje, biguherîne." Vê carê jî Elî dibêje, "bîsmîlahî elahûme." Ango dibêje bi navê xwedayê ku heye. Êdî kîjan xweda û xwedayê kê be ew nediyar e.

Dîsa dema ku navî serokê herdu alî dinivîsin, Elî dinivîse, "Mihemed resûlê xwedê" Kûreyş vê jî qebûl nakin. Careke dîtir Mihemed dibêje, "rast dibêjin,  biguherîne." Vê dorê jî dibêjin, "Mihemed kurê Evdilah" Qesta min, Mihemed di şer de jî, di aştiyê de jî dizane çawa siyaset bike. Niha jî di van mijaran de Serokatî me rexne dike, ne wisa?

Mesela Mihemed dema ku diçe Medîne, hewl dide ku peymana Medîne çêke. Di destpêkê de Misilman lewaz in, ji ber vê pêwîstî bi peymanan dibîne. Lê dema ku hinekî xurt dibe, hûkmê xwe serwer dike. Niha em gelek caran peymana Medîne tînin ziman. Ger Misilman di her demê de peymana Medînê esas bigirin, pir baş e. Ji ber ku di peymanê de ol nehatiye ferz kirin, Dibêje, “hûn bi ola xwe ne, em bi ola xwe ne.” Dibêjin, “peymaneke siyasî û civakî ye. Em şera(OL) nakin hakem.” Lê niha gelek tevgerên Îslamî, dixwazin maqezagonên dewletê bi şera bê nivîsandin. Ew ne li gorî peymana Medîne ye. Heqîqet ew e; peymana Medîne, di demeke ku Îslam lewaz e de hatiye nivîsandin. Dema ku Îslam xurt dibe jî, êdî peymana Medîne derbas nabe. Êdî hûkim dikin.

Ez dixwazim çi bibêjim; kîjan demê çi pêwîst kiriye, Mihemed li gorî wê tevgeriya ye. Bala xwe bidin Qûranê; Qûran du beş e. Ji beşekê re dibêjin, “sûreyên Meke” ji beşa din re jî dibêjin, “Sûreyên Medîne.” Ew 14 salên ku li Meke bûne, bi fikra me ya îro mirov dikare bibêje Îslama gel bûye. Lewra hemû bangawazî, ji heq, sadaka û xêran pêk tên. Ew 8-9 salên dawî ku li Medîne derbas bûye û pê re dibêjin, “sûreyê Medîne” jî, sûreyên îdare û hûkim e. Weke qanûn e. Ji bo vê hinek dibêjin, “li Medîne Îslam, êdî dibe olê deshilatdariyê.” Heya Medîne, Îslam olekî gel e. Lê ji ber ku deshilatekî nû ye, moreke pir xirab li ser wê dernakeve. Piştî ku berfireh dibin, ew zêdetir xwe dide der.

Mihemed li gorî mîladî, di 571’ an de ji dayk bûye, di 610’an de bûye pêximber, di 632’yan de wefat kiriye. Ew 22 salan, Mihemed karî ku Îslamê li beşeke xakên Erebîstanê bi ser bixe. Her wiha bingeheke ku qewma Ereb li ser bikaribe gaveke biavêje çêkiriye. Da ku qewîmiyet pêş bikeve û gavên nû yên îdarî biavêjin, ji totemîzmê derbasî olekî nû bibin. Ew guhertin kirin û ji milê pergala jiyanê ve jî hinek guhertin di nava civaka Ereban de pêş xist. Ew koledariya ku hinekî ketibû nava Ereban, hinek sînordar kir. Lê tam ranekir.

Di meseleya jinan de, li gorî wê demê hinek guhertin çêkirin. Got, “pêwîst e, jin êdî bi awayekî zindî nekevin bin çalan. Bi emre xwedê her kes dikare çar jinan bîne.” Berê di nava Ereban de, her zilamekî dikarî qesî ku dixwaze jinan bîne. Jinê jî dikarî dev ji zilamekî berde. Lê Mihemed ew sînordar kirin. Got, “jin nikare li gorî xwesteka xwe zilam berde û zilam jî nikare qesî ku dixwaze jinan bîne. Divê sînorek hebe.” Bi vî rengî hin guhertin di nava civaka Ereban de çêkirin.

Van guhertin jî, ji milê siyasî, birdozîk û îdarî ve bûn sedem ku zêdetir di nava Ereban de yekîtî çêbe. Ew bû bingeha gav avêtina Ereban û xurtbûna Ereban.

Divê mirov Îslamê, weke her tiştên Ereban baş kir, nenirxîne. Îslam birdoziyek bû, lê ji ber ku di nava Ereban de pêş ket, hinek damgaya Ereban lê ketiye. Ferqeke wisa heye. Niha birdoziya PKK'ê jî di nava Kurdan de pêşketiye. Em dibêjin "dema ku PKK hate nirxandin, divê li gorî birdoziya wê bê nirxandin." Lê heqîqetek jî heye ku tesîra taybetmendiyên Kurdan jî li ser PKK'ê hene. Ango divê em nebêjin, "Îslamê xizmetî Ereban kir, lê dijî Kurdiniyê û gelekî din bû." Ger îro em bixwazin Îslamê binirxînin, divê em ji milê birdoziyê ve binirxînin. Ji milê jiyanî û çandî ve hinek tişt bi xwe re anîne, ew mijareke cuda ye, em ê cuda li ser bisekinin. Divê mirov weke bingeh, vê mijarê tevlî hev neke.

Ji ber ku berê Ereban ji Xwedayên cuda bawer dikirin û bi Îslamê bû yek Xweda, di nava Ereban de yekbûnek çêkir. Ji bo yekbûna miletekî, ew baş bû. Berê Ereb li gorî toteme diçûn, lê Îslamê xweda, kir xwedayê ezmanan. Ew baş e, an xirab e? Mijara nîqaşê ye. Em dibêjin, anîmîzm bû totem; ger Îslamê neguhertibûya, dibe ku totem jî bûbûya tiştekî din.

Weke me got, ji milê jiyan, çand, jin û tîcaretê ve Îslamê hinek tişt guhertin. Dema ku mirov li gorî îro dinirxîne, hinek tiştên wan guhertinan baş in, hinek xirab in. Tiştê ku ne baş e, ji bo Ereban jî ne baş e, ji bo Kurdan jî ne baş e, ji bo xelkên din jî ne baş e.

Piştî wê demê, di pêşengtiya Mihemed de Îslam li hemberî koledariyê bangawaziya azadiyê dike. Wê demê jiyana qralên Sasanî, Habeşî û Kibtiyan lûks bû. Bi piranî wisa bûn, ferq û cudahiyeke mezin di navbera deshilat, dewlemend û hêjaran de hebû. Dema ku Îslamê bangawaziya azadî û wekheviyê kir, vê li ser civakê tesîr kir. Yek jî weke gotinên xwedayî bangawazî kir. Jixwe berê jî di nav civakên Kurdistanê û Îranê de gotina, "dê pêximberekî nû bê" hatibû belav kirin.

Yekî weke Salmanê Farîsî, beriya ku Mihemed derkeve, diçe Şamê û li pêximber digere. Lewra Salmanê Farisî, kesekî zîrek û stêrknas bûye. Gotiye, "dibe ku li Şamê ew pêximber hebe" û bi vî rengî diçe Şamê. Lê dema ku wir nabîne, diçe gel Mihemed. Dibêje, "min dema ku hinek şopand, min got ew kesê ku ez lê digerim ew e."

Di demên ku Mihemed xwe amade dike de, li Îran û Kurdistanê jî lêgerîna kesekî ku wan rizgar bike heye. Cabanî Kurdî heye, ew jî yekî weke Salmanê Farisî ye, ji eşîreta Cabanî ye. Eşîreta Cabanî jî, li min-

tiqaya Babîl jiyan kirine. Heya ku 200-300 salî piştî Îslamê tên Kurdistanê jî, li wê mintiqayê jiyan dikin. Niha pirtûkeke ku bi Erebî hatiye weşandin li ser wan heye, dibêje "eşîreta kurdî ku hatiye ji bîrkirin." Cabaniyê Kurdî jî dibêje, "ew pêximberê ku em lê digerin ew e." Caban bi xwe jî wisa weke Salmanê Farisî ne bi nav û deng e. Lê kurekî wî heye, navê wî Meymûn e; niha gelek hadîsên Mihemed hene ku Meymûn kom kiriye û rêxistiye. Gelekên wan şîrove kirine û belav kirine.

Qasta min ew e; lêgerînek heye. Niha çawa ku gelek Îspanyolî û Arjantînî tên gel me û dixwazin me fêm bikin, wê demê jî wisa ye. Li her derê êdî hinek hêvî çêbûye di nava Ereban de, lê xelkên din ku xwedî lêgerînin jî diçin wir. Ne xeyalek e, heqîqetek e. Hinek dibêjin, "Îslam çawa belav bû?" Bi vî rengî belav dibe.

Ji aliyê din ve Mihemed bi rastî jî zîrek e. Dema ku di 628'an de sûlhê Hûbeydê dike. Di heman salê de paşayê Faris jî tê kûştin. Lê Mihemed beriya kûştina wî sulha Hûbeydê dike. Wê demê ji ber ku şerê Îslamê û Kûreyşan tune, Mihemed weke fersend dibîne û gelek şandeyan ava dike. Wan şandeyên ku 4-5 kesan pêk tên, hinekan dişîne Yemen, hinekan dişîne Ûman, hinekan dişîne Îranê, hinekan dişîne Roma, hinekan dişîne Misirê. Her şandeyekê nameyekê dide wan ku bibin û bidin qralên wan dewletan.

Ew şande cihê ku çûne dibêjin, "ji me re pêximberekî nû hatiye, hûn jî bên û jê bawer bikin." Bi vî rengî dixwazin xwe belav bikin. Kralên van dewletan jî pir bertek nîşan nadin û pir bala xwe jî nadinê. Ne red dikin, ne jî qebûl dikin. Kralê Kîbtiyan hinek erenî nêzik dibe. Ew kesê ku cariye ji bo Mihemed şandî ye. Ew cariye yek jê Marya ye. Kralê Kibtî dibêje, "tu û ola xwe xêr hatine, ola me heye û em bi ola te jî kêfxweş bûn. Înşalah bi ser bikevê."

Lê Sasanî, seriyên wan şandeyên Îslamê jê dikin. Wê demê Meke jî di bin serweriya Sasaniyan de ye. Lê pir ne hakîm e. Sasanî dibêjin, *"heya niha hûn xûlamên me bûn, niha ew kî ye ku dibêje, ez bûme pêximber û bila qralê Sasanî jî bê ser ola min."* Dema ku Mihemed xeber digre ku Sasaniyan serê şandeyên wî jê kiriye, dibêje "bila ew bizanibin ku xwedayê min heyfê hiltîne." Piştî demeke kurt, paşayê Sasanî tê kûştin. Gelek kes dibêjin, "xwedayê Mihemed ew kûştî ye, dibêjin ew mûcîzeyeke".

Bêguman Mihemed dizane wê demê di navbera Rom û Sasaniyan de şer heye û Romiyan paytexta Sasaniyan girtine. Mihemed vê dibîne

û texmîn dike ku rewşa qraltiya Sasaniyan bi wî rengî dewam nake. Wate hestên wî xurtin, lê ew li ser esabeyên Mihemed tesîr dike.

Mesela em ji xwe re dibêjin, em tevgereke îlmî ne. Beriya ku êrîş li ser Şengalê çêbibin, Serokatî got, “li wê derê tevdîran bigirin, dê êrîş çêbibin.” Lê dema ku êrîş çêbûn, gelek kesan gotin, “Serokatî pêximber e, an na çawa dizane?” Serokatî wê rewşê ji me baştir dibîne û hestên wî xurtir in, li gorî wê jî tevdîrên xwe digre. Niha ger wisa bê nirxandin, wê demê jî ger nêrînên Mihemed weke mûcîze bên dîtin xwezayî ye.

Di 2007’an de, di çarşema sor de em çûn Şengalê. Wê demê di nava Ereban de pirsgirekên Sûnîtî û Şîatiyê zêde bûn. Serokatî got, “li gel PDK û hûkimeta Iraqê hevdîtin çêbikin û ji bo Êzîdiyan hin tevdîran bigirin. Ji me re got, “divê hûn baldar bin.” Dema ku em çûn Şengalê, me ji bo parastina cewherî hin nîqaş meşandin û me nîşeya ku Serokatî şandiye jî ji bo welatparêz û dostên xwe yên wê derê xwend. Di meha tebaxê de teqînên mezin li wê derê çêbûn. Piştî wê me wan welatparêz û dostan dîtin, gotin, “bi rastî jî Serokatî pêximber e, an na ji ku re zanî li herêma me pirsgirêk çêdibin?” Di dema Mihemed de, ew şîrove û nirxandin zêdetir tesîr dikin.

Di wê demê de, Mihemed xwest ku bi riya wan şandeyan hin cihan fetîh bike û di nava gel de pêximberiya xwe bide qebûl kirin. Piştî ku li Meke bi ser ket rewşa wî zêdetir baş bû û xelkê zêdetir berê xwe da wî. Bala xwe bidinê, ew di 22 salên ku Mihemed bûye pêximber de, di nava Sasaniyan de 10 melîk hatine guhertin, Mihemed jî di wan deman de bi ser diket. Ji ber vê yekê xelkên weke Kurd û Faris ku di bin serweriya Sasaniyan de jiyan dikin, hinekî ne rehet dibin û berê xwe hinekî didin derve.

Ne rehetiya Romiyan kêmtir bû, lê ne rehetiya wan jî hebû. Ew jî ji bo Mihemed û Îslamê fersend bû. Wê demê ji ber ku Kurd û Fars hêvî dikin ku dê ji zilma Sasaniyan rizgar bibin, kêfxweş dibin. Bingeheke bi vî rengî çêbû, Îslamê jî hêdî hêdî xwe ava kir û gav berv bi Iraq, Şam û Kurdistanê ve avêt.

### *-Serdema Xelîfetiyê Û Hatina Îslamê Ya Kurdistanê*

Di sala 632’yan de Mihemed koça dawî dike. Piştî ku Mihemed koça dawî dike, serdema xelîfetê dest pê dike. Li gorî Îslamê, ji bo ku yek bibe berpirsyar û pêşeng, divê hevalên wî, wî pêşniyar bikin. di çanda tevgera me de jî xwe pêşniyar kirin tune, di Îslamê de jî wisa ye.

Mihemed jî piştî xwe kes nekiriye berpirsyar, gotiye, “esabe kê baş dibînin, bila ew berpirsyar be piştî min.”

Dema ku Mihemed wefat dike, esabe dibêjin, “beriya ku em Mihemed bikin gorê, divê em pêşengekî xwe hilbijêrin, da ku li ser termê Mihemed yek pêşengiya nimêje bike.” Ger kesekî diyar nekin, dibe ku pirsgirekek derkeve. Ew mijara nîqaşê ye. Hinek dibêjin, “dema ku Mihemed miriye, hê ku cenazeye wî veneşartine, li ser deshilatdariyê şer kirine.” Hinek tenê ji aliyê neyînî ve mezî dikin, lê divê ne wisa be. Divê em ji aliyê din jî bibînin. Niha Misilmanekî ji rêzê nemirî ye, emîrê wan mirî ye. Ger yekî din mirî bûya, dê emîr li ser wan nimêj bida kirin. Lê ger emîr mirî be, divê yekî diyar bikin. Ango tiştê ku kirine, ne şaş e.

Wê demê ji cemeata Medîne ku pêşwaziya Mihemed kiriye re dibêjin, “cemeata ensar.” Ji cemeata Meke re jî dibêjin, “cemeata Muhacir.” Cemeata Medîne dibêje, “me alîkariya Mihemed kiriye, ger em nebûna Mihemed bi ser nediket.” Yekî ji nav xwe diyar dikin û dikin Xelîfe. Da ku ew pêşiya cemeatê nimêj bike û bê cihê Mihemed. Wê demê Ebûbekîr wan pê dihesin û bi wan re nîqaş dikin, “dibêjin hûn şaş dikin, ji bo ku kesê were cihê Mihemed bê hilbijartin, divê hemû esabeyên esasî kom bibin. Yên esas, kesên ku ji destpêkê ve li gel Mihemed in. Lê ji wan kes tune.” di encamê de Ebûbekîr wan qaneh dike ku wisa nabe.

Careke din nîqaş dikin û du nêrîn derdikevin. Nêrînek dibêje, divê Ebûbekîr bê cihê Mihemed. Lewra yê ku ji ciwantiyê ve hevaltiya Mihemed kiriye û di dema Îslamê de jî kesê ku ewilî bawerî bi Îslamê anî yek jê Ebûbekîr e. Kesê ku pê re hîcret kiriye jî ew e. Temenê Ebûbekîr jî nêzikî yê Mihemed e. Dema ku Mihemed wefat dike, li gorî teqwîma heyvî 63 salî ye, li gorî teqwîma rojê jî 61 sal e. Ebûbekîr jî wê demê nêzikî 61 saliya xwe ye. Dibêjin, mirovekî kamil û têgihêştî ye. Di encama van sedeman de komek esabe dixwaze ku Ebûbekîr bibe Xelîfe.

Komeke din jî dixwaze ku Elî bibe xelîfe. Wan pişt re navê xwe kirin cemeata Ehlîbeyt (alîgirên Elî). Lewra dibêjin Mihemed ji malbata Haşîmî ye, wan re jî dibêjin Ehlîbeyt. Ew malbata ku xizmetî kabeyê dike ye. Divê kesê ku bê cihê Mihemed jî, divê ji vê malbatê derkeve, da ku careke dîtir xizmetî kabê bike û ji malbata pîroz be. Ji bo vê jî dibêjin, kesê herî guncav Elî ye. Elî ji malbata Mihemed e, li gel Mihemed mezin bûye û weke kûrê wî ye. Hem jî zavayê wî ye. Ji ber ku

10 saliya xwe de bûye Misilman, dibêjin Elî qirêj nebûye; baweriya totemi negirtî ye.

Bi taybetî îro Şîa dibêjin, “Mihemed gotiye, ‘kesê ku bibe mewlayê min Elî ye.’” Di nava axaftinên xwe de van tiştan gotine. Alîgirên Ebûbekîr jî dibêjin, “çend caran Mihemed bi xwe ne amade bûye, ji ber vê ji Ebûbekîr re gotiye, ‘biçe û cihê min nimêja cemeatê bide kirin.’” Wan jî ji ber vê dibêjin, “Mihemed dixwastiye Ebûbekîr bê cihê wî.”

Di encamê de piraniya esabeyên ku li wê derê amade ne, Ebûbekîr gûncav dibînin û wî dikin xelîfe. Lewra weke kesekî mezin û kamil dibînin. Wê demê temenê Elî 32 sal bûne. Lê Elî nekiriye pirsgirek. Li gel vê yekê Elî û alîgirên wî hêvî dikin ku Elî bibe xelîfe.

Temenê Xelîfetiya Ebûbekîr pir dirêj neajo, du salan berdewam dike. Lewra Ebûbekîr di 634’an de wefat dike. Piştî ku Mihemed dimre, gelek kes ji Îslamê dûr dikevin. Dibêjin, “Mihemed mir û Îslam çû.” Li hemberî vê Ebûbekîr jî dibêje, “dibe ku Mihemed mirî be, lê Xweda zindî ye. Jixwe Mihemed negotiye ‘pesna min bidin,’ gotiye ‘pesna Xweda bidin.’” Bi vî rengî xwestiye piştî Mihemed, Misilmanan hinekî kontrol bike.

Ji ber ku Ebûbekîr zû wefat kiriye, nikariye pir zêde ji nava Ereban derkeve. Di nava Ereban de deshilatdariya Îslamê ku heye îdare kiriye û xwestiye hinekî fireh bike.

Piştî Ebûbekîr, ji bo xelîfetiyê careke din nîqaş tê kirin. Jixwe di nava Xelîfeyan de, tenê Ebûbekîr bi xwe wefat dike, yên din tên kûştin. Vê carê jî li ser Omer û Elî nîqaş çêdibe. Piraniya esabeyan û bi taybetî jî malbata Kûreyşan zêdetir alîgir in ku Omer bibe xelîfe. Ji bo çi? Lewra di wan deman de êdî xeteriyan li ser xwe dibînin û dixwazin hinekî fireh jî bibin. Ji bo wê kesekî ku bikaribe fetih bike, ji wan re pêwîst dike. Rast e, Elî kesekî zîrek û şerker e. Lê ciwan e, piraniya fermandarên Îslamê, xwe ji Elî mezintir dibînin.

Mesela niha di nava me de jî, hinek ciwanên zîrek û rêk û pek in. Ger tu wan bikî fermandar, hinek hevalên me yên kevn qebûl nakin. Çiqasa ciwanekî baş be jî, dibe ku hinek fermandarên me yên kevn bertek nîşan bidin. Wê demê jî gelek fermandarên Îslamê, raqîbên Elî bûne, dê çawa wî qebûl bikin. Li gel Omer jî mişqûleyên wan hene. Ji ber vê yekê dîsa piraniya esabe û fermandaran dibêjin, “yê herî guncav Omer e.” Jixwe Elî hê 34 salî ye. Elî bi neçarî dîsa qebûl dike û Omer dibe xelîfe.

Omer ji salên 634’an heya 644’an 10 salan xelîfetî dike. Ew ji bo Elî baş e; lewra Elî êdî mezin dibe û hinek fermandarên kevn jî êdî dimirin. Ciwan jî bi piranî alîgirên Elî ne. Kesekî Îranî Omer birîndar dike û piştî birîndariya çend rojan dimire. Beriya ku bimire komek esabe kom dike û nêrîna wan digre. Da ku beriya ku bimre xelîfeyê nû hilbijêre. Ango Omer, weke Mihemed û Ebûbekîr nake. Dema ku esabeyan kom dike, Elî ne amade ye. Piraniya esabeyan dibêjin, “bila xelîfeyê nû Osman be.” Omer jî vê qebûl dike. Bi vî rengî Osman dibe xelîfe. Bi vî rengî dema Elî tê dibîne ku Omer miriye û Osman bûye xelîfe.

Ji ber vê yekê alîgirên Elî, ji Omer pir eciz in. Bi taybetî Şîa û Elewiyên îro dibêjin, “Omer bi xwe mafê Elî xwar, piştî xwe jî yekî din kir xelîfe.” Tê gotin Ji ber ku hem Omer, hem jî Osman ji Kûreyşan e, Omer, Osman dike xelîfe. Tesîra wê heye. Ew yek dibe pirsgirek û vedigere şer. Heya wê demê di mijara xelîfetiyê de nîqaş hebûn, lê piştî Osman vedigere şer.

Osman jî 12 salan xelîfetiyê dike. Ji 644’an heya 656’an xelîfetiya wî berdewam dike. Osman jî bi dest Xerîcan tê kûştin. Her tim ew nêrîn heye ku zilm li Elî hatiye kirin. Ew misilmanên ciwan, her dixwazin Elî bibe xelîfe. Di encamê de hinekên wan, Osman dikûjin. Da ku Elî bibe xelîfe.

Piştî mirina Osman, di 656’an de Elî dibe xelîfe. Jixwe temenê Elî jî bûye 56-57, êdî ew jî bûye zilamekî kamil. Rakîbên wî jî bi piranî mirî ne. Vê carê weke raqîp Mawiyeyê kûrê Ebû Sûfyan derdikeve. Ew jî di temenê Elî de ye, lê weke pêşengî ne weke Elî ye. Meseleya Osman dike hincet û li hemberî Elî derdikeve. Lewra bi Osman ve dibin pismamên hev û din. Dibêje, “Osman bi destê alîgirên Elî hatiye kûştin. Divê Elî hesap bipirse.” Lê Elî hesap naxwaze. Lewra yên ku Osman kûştine, jixwe ji bo Elî kûştine.

Pişt re Eyşe û Mûaviye, bi hev re li ser Elî zextê dikin. Da ku Elî hesap bipirse. Eyşe jî hem jina Mihemed, hem jî keça Ebûbekîr e. Dema ku Elî ji yên ku Osman kûştine hesap dipirse, êdî navê wan jî dikin Xerîcî. Berê ji wan re gotine, alîgirên Elî; lê dema ku Elî ji wan hesap dixwaze, dibin Xerîcî. Serokatî dibêje, “Xerîcî nunertiya xeta çep dikin, Elî nunertiya xeta navîn dike, Osman û Mûaviye jî nunertiya xeta rast ya Îslamê dikin.” Dema ku Xerîcî dibînin ku Elî bi Mûaviye re dikeve hevkirinê, li hemberî Elî jî disekinin. Êdî di Îslamê de navê wan dikin Xerîcî, ango kesên ji ol derketî. Rewşeke bi vî rengî çêdibe, jixwe piştî demekê kin Elî jî tê kûştin.

Demekê Elî şerê Mûaviye dike, di encamê de hevkirin çêdibe. Di wî şerî de, dibêjin Elî ji bo şervanên xwe gotiye, "an rimê wan, an jî serê wan bila paçê sor bê girêdan." Ji ber wê, êdî kesên ku dibêjin em alîgirên Elî ne, di her şerî de paçekî sor ji serê xwe ve girêdidin. Di dema Şah Îsmaîlê Safewî de jî wisa dikin. Kizilbaşî jî ji wê derê tê. Yên ku paçê sor, ji serê xwe ve gire didin, dibêjin "em arteşa Elî ne." Piştî ku Elî û Mûaviye demekê şer dikin, Elî dibêje, "divê êdî em şer nekin û hev bikin. Da ku di nava Îslamê de yekîtî çêbe."

Niha gelek kes dibêjin, hevkirina Elî bi Mûaviye ve xeletiyeke mezin e. Lewra hevkirineke deshilatdariyê ye. Dema ku Elî bimre, dê Mûaviye bibe xelîfe. Dema Mûaviye bimre jî, dê xelîfetiyê bidin kûrê Elî, ango Hesen. Bi vî rengî li ser deshilatdariyê hev dikin. Ji bo vê Serokatî dibêje, "Elî nunertiya xeta navîn dike." Lê Xerîcî li dijî van tiştan e. Xerîcî dibêjin, "divê her malbata Elî xelîfetiyê bike û divê xelîfetiyê radestî Kûreyşan nekin." Lê rûxmî vê jî Elî li gel Mûaviye hev dike.

Jixwe Elî 5 salan hûkim dike, di 661'an de Elî tê kûştin. Piştî ku Elî tê kûştin jî Mûaviye dibe xelîfe. Lê dema ku Mûaviye dimre, deshilatdariyê nadin Hesenê kûrê Elî. Hesen wê demê li Medîne ye, xwe weke xelîfe îlan dike. Lê Hesen tê jehrî kirin û tê kûştin. Hinek dibêjin, malbata Mûaviye kiriye, bi taybetî dibêjin jina Muaviye, Hesen kûştiye. Jixwe piştî kûştina Hesen, kûrê Mûaviye Yezîd xwe weke xelîfe îlan dike.

Yezîd li Şamê ye û li wê derê xwe weke xelîfe îlan dike. Jixwe Muaviye jî di dema xwe de, li Şamê hûkmî Îslamê dikir. Husênê kûrê Elî, wê demê li hemberî Yezîd derdikeve. Dibêjin, Hesen pasif bûye û Yezîd xelîfetiya wî qebûl nekiriye. Lê deng nekiriye. Jixwe dema ku Hesen tê kûştin, hema Yezîd xelîfetiya xwe îlan dike. Lê Husên jî xelîfetiya Yezîd qebûl nake. Mafê xwe dixwaze. Wê demê xelkê Iraq, Kûfe alîgirê Elî û malbata wî ne. Jixwe Elî di dema xwe de li Kûfe hûkmî Îslamê dike.

Xelkê Kûfe bangawazî dikin û dibêjin, "bila Husên bê gel me. Ger Husên bê gel me, em ê alîkariya wî bikin û xelîfetiyê em ê ji Yezîd bigirin." Hûsen jî, ji Medîne berê xwe dide Kûfe. Divê xelkê Kûfa biçûya pêşwaziya Hûsên, lê ji ber ku fermandarê Kûfe bi awayekî veşartî li gel Yezîd têkilî datîne, li Kerbelayê derdora Husên digirin û wî dikûjin. Ji malbata Husên, tenê kûrekî wî û xûçkeke wî ji wê komkûjiyê xilas dibin. Xeynî wan li gel Husên 72 hevalbendên wî tên kûştin. Dibêjin, hemû jî mirovên zîrek bûne. Ew bûyer, êdî weke

“Komkûjiya Kerbela” tê nas kirin. Serê Husên jî jê dikin û dibin ji Yezîd re.

Jixwe piştî wê Yezîd dibe xelîfe û êdî malbata wî xelîfetiyê berdewam dike. Bi vî rengî di Îslamê de, xelîfetî dibe malbatî. Êdî malbata Emevî xelîfetiyê û deshilatdariya Îslamê di destê xwe de digirin. Malbata Emevî ji 661’an heya 750’î hûkmî Îslamê dike.

Piştî malbata Emevî, malbata Abasiyan tên. Ew jî ji 750’î heya 1258’an hûkmî Îslamê dikin. Texrîben nêzikî 500 salî dibin xelîfeyên Îslamê.

Em bên ser hatina islam jibo Kurdistanê, Piştî salên 636’an Îslam, berê xwe dide Kurdistanê. Wê demê Omer xelîfe ye. Du hêzan tevger dikin, hêzeke dişînin Şamê da ku li hemberî Romiyan şer bike, hêzekê jî dişînin Iraqê. Da ku li hemberî Sasaniyan şer bike û herêma Sasaniyan bigre. Ew hêza ku li hemberî Romiyan şer bike, diçe Filîstîn, Lûbnan û Suriye digre. Heya 641’an derbasî herêma Mêrdîn û Cîzrê dibin û wir re derbasî Kurdistanê dibin. Ew hêze heya 642-3’yan piraniya Bakûrê Kurdistanê dixin destê xwe. Xelîdî kûrê Velîd (Xelîd Bîn Velîd) fermandariya vê hêzê dike. Ew hêza din ku ji jêr ve tê Iraqê jî, Seidê kûrê Ebû Vaqas fermandariya wê dike. Fermandarekî kevn yê Îslamê ye.


Di 636’an de li bajarê Qadsiye yê Iraqê di navbera hêza Ereb ku fermandariya wê Seid dike û arteşa Sasaniyan de şerekî mezin rû dide. Misilman vî şerî weke şerê xwe yê herî mezin bi nav dikin. Wî şerî re dibêjin, şerê Qadsiye Seîd. Di wî şerî de arteşa Îslamê bi ser dikeve. Bi giştî Sasanî naşkên, lê ew şer dibe sedem ku arteşa Îslamê bikeve herêma Sasaniyan.

Dema di sala 1980’î de Sadam li dijî Îranê şer kir, navê şerê xwe kir, “Qadsiye Sadam.” Got, “di Qatsiya yekem de Seid bi ser ket, ew jî Qadsiya duyem e ku Sadam ser dikeve ye.” Heya salên 642’yan di navbera arteşa Îslamê û Sasaniyan de 4-5 cihan şer çêdibe. Di hemû şeran de arteşa Sasaniyan, li hemberî arteşa Îslamê bin dikeve. Ew dibe sedem ku Sasanî bişkên û paş ve vebikşin û Kurdistan jî bi giştî bikeve bin serweriya Îslamê. Piştî çend salan qralê Sasaniyan jî tê kûştin û êdî deshilatdariya Sasaniyan namîne.

Arteşa Îslamê li hemberî Romiyan jî li derdorê Şamê şer dikin û bi ser dikevin. Lê deshilatdariya Romiyan bi giştî naşke. Heya cihên weke Riha, Dîlok û herêmên Gurgumê car caran di bin serweriya Romiyan de dimînin, carna jî dikevin bin hûkmê Îslamê. Li Bakûrê Kurdistanê, bi giştî her cih nakeve bin serweriya Îslamê.

Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ku Îslam, bi vî rengî hate Kurdistanê. Lê hinek nêrîn hene, divê em wan jî şîrove bikin. Di nava civaka me de, kesên ku ji Îslamê eciz in dibêjin, “Îslam bi şûr hat Kurdistanê û xwe ferz kir.” Kesên ku siyaseta Îslamgeriyê dikin jî dibêjin, “Îslam hat, hemû kesî qebûl kir û kêfxweş bûn.” Piraniya hizbên Îslam wisa dibêjin, yên çep jî dijberî wê dibêjin. Di herdu nêrînan de jî nepixandin heye. Îslam bi tenê şûr nehat, dema ku Îslam hat jî hemû kes bi kêfxweşî nebûn Misilman.

Îslam berî ku bi şûr were, me behsa Salmanê Farisî û Cabanî Kurdî kir. Beriya ku Îslam bê Kurdistanê, ew bi xwe bibûn Misilman. Ya duyemîn, her çiqas di wê demê de Sasanî qeyran jiyan bikin jî, xwediyê deshilatdariyeke mezin bûn. Rom deshilatekî mezin bûn. Ger Rom û Sasaniyan şerekî cîdî li hemberî Îslamê bikirana, Îslamê nedikarî bi ser bikeve.




## <u>BELAVBÛNA ÎSLAMIYET</u>

Di şerê Qadsiyê de Rûstem fermandarê Sasaniyan e, ji 200 hezarî zêdetir arteşa wî heye. Lê arteşa Îslamê 30 hezar kes e. Ger wê arteşê li hemberî Îslamê bi moral şer bikirana, 30 hezar kesî dikarî bi ser bikeve? Bêguman Nedikarî, ev diyar dike ku pirsgirekên moralî hene.

Weke şerê Sadam û koalisyona Amerîqa ku di salên 90’î de pêk hat bûye. Sadam di salên 90’î de digot, “bi milyonek û 100 hezar kesî,

arteşa min heye.” Çû û Kûveyt girt. Texrîben 400-500 hezar leşkerên xwe birin sînorên Kûveytê. Dema ku êrîşa koalisyonê çêbû, di destpêkê de êrîşên hawayî çêbûn. Wê demê nîvê arteşa Iraqê çû û li mala xwe rûniştin. Li holê arteş nema. Yên mayî jî beşekê xwe radestî arteşa Amerîqa kirin. Mirov dikare bibêje ji sedî 10’ê wê arteşê şer nekirin. Jixwe dema ku êrîşên bejahî jî destpêkirin, hemûyan berdan û çun mala xwe. Arteşa koalîsyonê nîvê Iraqê jî girt.

Sedem çi bû? Ne hejmara Arteşa Iraqê kêm bû, ne jî çekên wan kêm bûn. Lê wan kesên ku navê wan arteş bû, baweriya wan bi Sadam û şerê wî nebû. Ji bo wê nikarîn bi ser bikevin.

Serdema şerê Sasanî û Rom û Îslamê de jî ew heye. Hem qeyrana civakî heye, hem di navbera civak û deshilatdaran de cudabûnên mezin hene. Şerên heyî milet eciz kirine. Ji aliyê din ve jî navê Îslamê belav bûye, olekî nû ye û xwe belav dibe. Fermandarên Îslamê jî, di dema şer de Gelek rêbazên ku didin şixûlandin û li ser arteşê tesîr dikin hene. Hin rêbaz dane şûxilandin û arteşa wan kişandine gel xwe. Jiyana xwe mînak nîşan didin û dibêjin, “ma fermandar û leşkerên we cuda ne; yên me ne wisa ne.” Ew rêbazên wisa dane şûxilandin. Tenê şer nekirine. Ew bûye sedem ku Sasanî qet ber xwe nedin û Romî jî kêm ber xwe bidin.

Ew kesên din Kurd û xelkên din ku di nava van arteşan de cih digirin jî zêde şer nakin. Ew hemû dibin sedem ku arteşa Îslamê bi ser bikeve. Ango arteşên Sasaniyan û Romiyan, bi îman, bawerî û moral şer nakin. Lê arteşa Îslamî bi îman şer kir û bi ser ket. Dervey wî jî tekîtîkê xurt diden şuxlandin dema ku êriş diken.

Ji aliyê din ve ger em behsa civaka Kurdistanê bikin, ne tam tevlî arteşa Romiyan dibe, ne jî tam tevlî arteşa Sasaniyan dibe. Di astekê de kêfxweş dibin ku Îslam bê û van deshilatdariyan xirab bike. Bes derdorek jî heye ku şer kiriye. di dîroka Îslamiyetê de jî tê behs kirin. Hin herêmên Kurdistanê yên weke Şehrezor û Mêrdînê, xelkê şer kiriye. Ji bo çi şer kiriye? Ji dîrokê îstîfade kirin girîng e.

Mesela dema ku Amerîqa ket Iraqê, heya salên 2005’an rehet bûn, lê dema ku xwest hemû Iraqê weke xwe bike, êdî li Iraqê hemberî Amerîqa bertek çêbûn û teqîn derketin. Digotin. “bila Amerîqa ji Iraqê derkeve.”

Îslam jî dema ku destpêkê fetih dike, perspektîfeke wan heye. Fetih ji bo Îslamê, belavbûneke pîroz e. Vê jî bi riya xeza dikin. Ger tu ser bikevê, te fetih kiriye. Ger dema ku te cihek fetih kir û milet li dijberî te nesekinî, divê tu şerê wan nekê. Ew perspektîfa Îslamê ya destpêkê

ye. Tu bangawaziya wan dikê û dibêjê, “ew ola me ye, yê ku dixwaze bila were ser ola me. Yên naxwazin jî dive serweriya me qebûl bike û baca xwe ya olî(Ciziye) bide.”

Diyare ku dema hatine Kurdistanê jî ew kirine. Dema ku ser ketine, gel kêfxweş bûye û hinek derdor bûne Misilman jî. Niha di dîrokê de dibêjin çîna serdest, çîna serdest jî hemû nebûne Misilman. Lê yên ku bi lêgerîna xwe bûne Misilman jî hene. Niha hinekên me hene, çûne Ewropa xwendine û hatine, li Diyana dêra Xiristiyanan vekirine, kesî bi zorê wan nedaye vekirin. Wê demê jî numûneyên wisa hene. Lêgerîn hene. Hinek çînên serdest jî, dîtine ku Îslam serdest e, da ku sultaya xwe berdewam bikin bûne Misilman.

Bi piranî jî Kurd nebûne Misilman û gotine, “em ê ola xwe jî biparêzin û em ê bacê jî bidin Îslamê.” Belgeyên bi vî rengî hene. Ji ser hatina Îslamê re 300-350 sal derbas bûye, lê piraniya civaka Kurd hê Zerdeştiyê bawer dikin. Bes neçar mane ku baca xwe bidin. Niha li Şengalê jî, DAİŞ dibêje, “an divê hûn bibin Misilman, an jî baca xwe bidin.” Ew jî wisa dikin.

Piraniya Kurdan, nebûne Misilman û bac dane Îslamê; hinek bûne Misilman û hinekan jî şer kiriye; ne bûne Misilman, ne jî bac dane. Yên ku li mintiqaya Şehrezor, Hewreman û Mêrdînê bi komkûjiyê ve rû bi rû hatine ew in. Gotine em hûkmê we qebûl dikin, lê em dev ji ola xwe bernadin, ciziye jî nadin. Mesela em 15 salin ku li Qendîlê hûkim dikin, lê piraniya xelkê Qendîlê nebûne PKK’î. Ger em zextan bikin, dibe ku hinek bi zorê bibin PKK’î, lê dibe ku hinek jî şerê me bikin.

Misilmanan jî destpêkê Îslamiyet nespartine civakê. Lê dema ku hinekan bac nedaye, şerê wan çêbûye. Li gorî Îslamê, yekî ku şerê Îslamê kir, hem qetla wî helal e, hem jî malê wî helal e. Ew ê ku şer kiriye tê kûştin. Jin û malên wî jî birine, dest dane ser. Di destpêka hatina Îslamê wisa bûye û êdî ji aliyê Rojhilat ve jî vebûna Îslamê çêbûye.

Weke netîce, dema ku Îslam hat; hin objektif zemîn hebûn. tenê bi şûr nehatin. Ji bo ku qûveta Sasanî û Romiyan bişkênin, şûr jî dan şûxilandin. Beşek jî bi propaganda û îmanê hat. Civaka Kurd jî bi piranî Îslam qebûl nekir, lê red nekir jî. Êdî piştî salên 642’yan ev formê Îslamiyetê, li Kurdistanê ya deshilatdaran e. Lê naye wê mahneyê ku derdorên Îslamê bûn Misilman, civak jî bûye Misilman.

Di serdema Omer de Îslam tê Kurdistanê, piştî wî Osman berdewam dike, pişt re jî Elî berdewam dike. Tesîra van nîqaşên di nava Îslamê li ser Kurdistanê jî çêdibin. Çawa ku behsa îtîfaqa Osmanî û

Kurdan dikin, Îslam jî dibîne ku ger zêde biçe ser Kurdan, pir zêde nikarin pêş ve biçin. Ji bo wê bi rehetî Kurdan kariye ola xwe ya kevn bidomînin.

Peymaneke nivîskî tune, lê nêzikbûna Îslamê ya Kurdan, weke Sultan Selîm e. Kurdan hinekî di halê xwe de dihêlin. Jixwe yên bûne Misilman, ji bo wan baş in; hinek jî baca xwe didin, yên mayî jî pir naxwazin biçin ser wan. Da ku bikaribin heya milê Îran û Efganîstanê biçin. Lewra ger her dem bi Kurdan re şer bikin, nikarin biçin wan aliyan. Ew yek kêrî Kurdan jî tê. Heya serdema Emewiyan wisa berdewam dike.

### *-Di Serdema Emevî û Abasiyan De Kurdistan*

Di serdema Emewiyan de bi giştî Îranê digirin. Nêzikatiya Emeviyan, Erebperest e. Dibêjin, "Îslam dibe du beş; Ereb û alîgirên Ereban." Beşa esasî Ereb in, beşa din jî yên derveyî Ereban in. Ew nerehetî çêdike. Di nava Kurdên ku bûne Misilman de û xelkên din de ecizî çêdike. Ji ber vê yekê di nava Îslamê de mûxalîf çêdibin.

Komên ku li hemberî Emeviyan derdikevin kî ne? Di nava Ereban de jixwe Xerîcî, ji destpêkê ve li hemberî Emeviyan bûne. Di vê serdemê de ji wan hinek tên Kurdistanê û li wir jiyan dikin. Lewra li Kurdistanê hûkmekî tûnd yê Îslamê tune û ji bo Xerîciyan derfet çêdibin. Komek din ku mûxalîf in, Abasî ne. Abas mamê Mihemed e. Dema ku bapîrê Mihemed wefat dike, Abas xizmetî Kabe dike. Ji bo vê malbata Abas dibêje, mafê me heye ku em bibin xelîfe û em riya bavê xwe berdewam bikin. Bi vî rengî malbata Abasî jî, li hemberî Emeviyan disekinin.

Hinek alîgirên Elî jî hene, ji wan re dibêjin Ehlîbeyt. Ew jî qebûl nakin ku malbata Emeviyan, bi vî rengî hûkmî Îslamê bike. Ew sê komên mûxalîf ku di nava Ereban de hene.

Li derveyî Ereban jî, misilmanên ku ne Ereb li dijî Emeviyan disekinin. Bi vî rengî hêdî hêdî li hemberî Emeviyan bertek zêde dibin û ji sala 747'an heya 750'î di navbera van de şer çêdibin û deshilatiya Emevî têk dibin. Bi vî rengî Abasî dibin hûkimdar.

Abasî, malbata Elî û yên din hemû bi hev re Emeviyan têk dibin. Lê dema ku Abasî hûkim digirin destê xwe, yên din hemûyan dûr dixin. Hem malbata Elî dûr dixin, hem jî yên weke Ebû Mûslîm Xorasanî ku alîkarî kirine dûr dixin. Xerîciyan jî di hûndirê xwe de dihelînin.

Serdema Abasiyan, ji bo cihana Îslamê serdemeke nû ye. Lewra Abasiyan Îslam pir berfireh kirin. Ji nêzikbûnên berê yên Îslamê, ji danehevên xwe û danehevên Kurd û Farisan wane derxistin û xwe fireh kirin. Abasî heya Hîndîstan û Ewropayê çûn.

Di vê serdemê de Kurd hinekî din rehet dikin, jixwe berê jî Kurd hinekî rehet bûn. Salên destpêkê heya ku hûkmê xwe tam didin rûniş-kandin, hinekî tûndiyê bi kar tînin. Lê piştî wê rehet tevdigerin. Abasî ji 750'î heya 1258'an xelîfetiyê di destê xwe de dihêlin. Çawa hûkim dikin, girîng e. Abasî di Îslamê de form û pergaleke nû ava dikin. Pergala deshilatdariyê di dema berê de împaratoriya koletiyê bû. Êdî di serdema Abasiyan de împaratoriya olî çêdibe. Li ser esasê ol, pergala xwe pêş dixin. Ew pergala olî li hemû cîhanê belav dikin.

Di bine wê de jî da ku dewletên herêmî xwe îdarî bikin, dewletên biçûk ava dikin. Niha di pergala cîhanê de yekîtiya dewlet-miletan heye û dewletên biçûk hene. Wê demê jî împaratoriya Abasiyan weke yekîtiya miletan ya îro bû û nunertiya hemû cîhanê dikir, dewletên herêmî jî weke netewe dewletên îro bûn. Bes ne bi navê neteweyan bûn, bi navê malbat û herêman bûn. Form û pergala deshilatdariyê bi vî rengî tê guhertin.

Di nava wê formê de rista Kurd, Faris, Ereb û miletên din çi bû? Ew girîng e, divê bê zanîn. Di ew forma deshilatdariyê de Kurd bi çi rengî cihê xwe digirin? Di dema Abasiyan de ku ji salên 750'î dest pê dike û heya 850'î berdewam dike re tê gotin, "dema deshilatdarê Ereb." Ereb di wê sedsalê de hem xelîfe ne, hem jî hûkim dikin. Piştî wê dema ku berfirehtir dibin û têkiliyên wan zêde dibin, dibînin ku bi serê xwe nikarin rê ve bibin û dixwazin ji danehevên miletên din jî îstîfade bikin.

Miletê ku herî zêde, ji alîkariya deshilatdariyê re vekirîne, Faris in. Piştî salên 850'î Faris gelek cihên deshilatdariyê digirin dest, vê re dibêjin dema Farisan. Ji salên 850'î heya 950'î ew dem weke dema deshilatdariya Farisan tê nas kirin. Di wê demê de di pergala deshilat-dariyê de hinek guhertin çêdibe. Wê demê pêşeng hem xelîfe ye, hem jî sultan e. Xelîfe pêşengiya ol û civakê dike, lê di heman demê de rêve-birina îdarî jî dike. Lê di serdema Farisan de ew yek hinekî tê guhertin. Dîsa xelîfe nadin aliyekî, lê dibêjin bila xelîf, ango Abasî rêberiya ol bikin, îdare û sultaniye jî ji me re bihêle. Hûkim bi piranî dikeve destê Farisan.

Ji 950'î heya 1056'an hûkim dikeve destê Kurdan. Kurdên Deylemî hene, Dimiliyên îro berdewama wan in. Li milê Xazar jiyan dikine. Di destpêkê de Elewîtî girtine, bi vî rengî ketine nava Îslamê. Di

salên 800'î de xwe di nava Îslamê bi cih kirine, di salên 900'î şûn ve jî hêdî hêdî fermandarî û deshilatdarî dikeve destê wan. Texrîben ji sed salî zêdetir, împaratorî di destê Kurdan de ye.

Tiştê ku em dîqat bikşînin, Kurdên Deylewî alîgirên Elî ne, Ehlîbeytî ne, ne Elewiyên îro ne. Ew ne Sûnî ne, lê xelîfe sûnî ye. Niha gelek kes dipirsin û dibêjin, "çawa pergal neguhertine?" Hinek dibêjin ji ber ku ji Îslama sûnî pir zêde zext û tûndî nedîtine, pergal neguhertine. Hinek jî dibêjin, nikarîne biguherînin. Pergal weke xelîfetî berdewam dike, deshilatdarî jî di destê Kurdan de ye.

Piştî sala 1056'an dema Selçûkî û Tirkan dest pê dike. Heya salên 1172'yan deshilatdariya wan berdewam dike. Êdî hûkmê esasî dikeve destê Selçûkî û Atabekan. Ew jî texrîben ji 120 salan zêdetir hûkim dikin. Pergal her xelîfetî ye, di destê Abasiyan de ye, lê deshilatdarî dikeve destê Selçûkiyan û Tirkan. Kurd û Faris di vê demê de hinekî pasîf dimînin.

Piştî sala 1172'yan bi riya malbata Eyûbiyan, rista Kurdan careke din derdikeve pêş. Hûkmê wan ji sala 1172'yan, heya 1250'î berdewam dike. Careke din Kurd, pêşengiya hûkmê Îslamê dikin. Di serdema wan de jî şerê Xeçperestan çêdibe. Bala we jî kişandibe, di serdema Abasiyan de, 100 salî Ereb çalak in, 100 salî Faris çalak in, 120 salan Tirk çalak in, 200 salî jî Kurd çalak in. Van tiştan bi awayekî dîrokî jî hene. Lê pir naye behs kirin.

Mesela yekî weke Selahadîn Eyûbî, gelek tişt kirine, pir vekirî ye; lê ger bikaribin, qet behsa wî jî nakin. Me berê jî got, ji ber ku dewleta Kurdan çênebûye, baş e. Di dema Îslamê de jî ger deshilatdarî ne baş be, hem ji bo Ereban ne baş e, hem jî ji bo Kurdan ne baş e. Lê ew serdem, serdema deshilatdariyê ye. Pergaleke dinê ye. Ereb dibêjin, di vê serdemê de nizanim me çi kir. Ereban çi kiribe, Kurdan û miletên din jî kirine. Wê demê çima em behs nakin? Êdî baş be û xirab be jî, rastiya wê serdemê ye. Em ê bi neçarî behsa wê bikin.

Niha belgeyên Îslamê hene, em dikarin lêkolîn bikin. Em binêrin, di serdema ku Ereban Îslam bi rê ve biriye xirabî zêde bûye, an di serdema ku Kurdan Îslam bi rê ve biriye de xirabî zêde bûye. Em angaşt dikin, di serdema Kurdan de kêmtir bûye. Mînak Kurdên Elewî hûkim dikin, piraniya fermandarên di bin fermana wan de jî Sûnî ne, lê vê nakin pirsgirek. Di dema deshilatdariya Tirkan de, Selahadîn Eyûbî nîvê axa Îslamê girtin û Xeçperest derxistin.

Di wê demê de, ji bo cihana Îslamê serkeftinên pir mezin bûn. 100 salî zêdetir Kûdûs ketibû destê Xeçperestan. Lê Selahadîn rizgar kir.

Divê van mijaran bên dîtin. Formekî giştî hebû, Kurdan jî di nav de cihê xwe girtin. Mesela di dema Sasaniyan de, Kurd di nava deshilatdariyê de cihê xwe nagrin, lê di vê demê de bi başî û xirabî heye.

Di serdema Abasiyan de, gelek dewletên herêmî çêdibin. Ji Hîndîstanê heya Cezayîr û Rojavayê welatên Ereban dewlet çêdibin. Li Kurdistanê jî dewletên herêmî çêdibin. Berê li Kurdistanê forma siyasî di çarçoveya hozan de bû, vê dorê di çarçoveya dewletan de dûrûst dibe.

Ji ew dewletên ku li Kurdistanê hatin avakirin, ya herî kevn dewleta Hazwanî ye. Ew dewlet, ji Hewlêrê heya Ûrmiyê direj bûye. Di sedsala 8 û 9'emîn de hûkim kiriye. Ew dibin bapîrên Rowadî û Şedadiyan, ew jî dibin bapîrên Eyûbiyan.

Eyşanî (912-960), Rowadî (954-1076), Şedadî (951-1075), Enazî(959-1117), Hasnewî (959-1015), Lorî (Lora Mezin, Lora Biçûk), Dostkî (931-990), Merwanî (990-1095), Şamaranî (1100-1200), Şiwankarî (1200-1300) û hê gelek dewletên din yên herêmî di serdema 850'î û 1256'an de tên avakirin. Weke pergal hem deshilatdariya giştî heye, hem jî deshilatdariya herêmî heye. Civaka Kurd, hem di nava deshilatdariya giştî, hem jî di nava deshilatdariya herêmî de cih digre. Bi vî awayî deshilatdariyên herêmî ji bo xwe dûrûst dike û jiyan dike.

Çawa ku deshilatdariya giştî û xelîfetî, li ser navê malbatekê ye; deshilatdariyên herêmî jî li ser navê malbatekê ne. Ne li ser navê miletekî ne. Lewra netewe dewletî pêş neketî ye. Mesela heval dibêjin, "Selahadîn li ser navê Kurdan tiştek nekirî ye." Bi vî rengî mehkûmkirina Selahadîn ne rast e. Lewra em behsa rista miletan dikin. An na tu dewletên ku li ser navê miletan hatine avakirin tune ne. Ne dewleta Ereban, ne jî ya Tirkan heye. Ew naye wê mahneyê ku di wê demê de dewleta Kurdan çênebûye, em hemû dîroka xwe tune dihesibînin. Dewletên miletan di salên 1900'î de çêbûne. Mirov dikare di nava pergala wê demê de rista xwe binirxîne; baş bû ye, an xirab bûye?

Divê nirxandin, hem ji bo me hem jî ji bo giştî wisa be. Tê gotin ku niha Ewropayî ji me eciz in, sebeba wî jî vedigerenin jiboy ku Selahadîn ew têk birine. Ger di nava Kurdan de yek derketiye û ew hêz şikandine, destê wî sax be, çünkü di wê demêda civaki xwe parastiye. Ev naye wê mahneyê ku Selahadîn li ser navê Îslamê, navê Kurdan xirab kiriye. Di serdema me de yek behsa netewe neke xayin e, wê demê jî dema ku yekî behsa Îslamê nekiribûya û ji bo Îslamê kar nekiriba xayin bû. Divê di nava wê serdemê de bê nirxandin.

Divê em vê nêzikatiyê sererast bikin. Lewra yên nijadperest, vê yekê pir nîqaş dikin. Weke ku di wê serdemê de her kesî ji bo xwe dewlet ava kiriye û Selahadîn jî çûye û xizmetî wan kiriye. Ne wisa ye. Wê demê malbatî ye, dema ku Selahadîn jî hûkmî Îslamê kiriye, qralê Yemenê kiriye malbata xwe. Bira û biraziyên xwe kirine qralên Yemen, Misir û Şamê. Malbata Eyûbî hûkim kiriye. Yên Selçûkî jî hatine û malbatên xwe bi cih kirine. Li her cihekî dewletên herêmî hatine avakirin, li Kurdistanê jî hatine avakirin.

Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, di pergala wê demê de Kurd bê rist nebûne. Êdî ew pergal baş be, xirab be mijareke din e. Niha gelek kes dibêjin, "Kurd di dîrokê de tune ne." Lê ger em vê dîrokê mezî bikin, rista Kurdan ji ya wan kêmtir nene. Wisa divê em jî dîroka xwe înkar nekin.

Yek bi yek şîrovekirina van dewletên herêmî yên ku Kurdistanê hebûne, em nikarin li vir bikin. Lê li ser wan pirtûk û belge hene, yên ku dixwazin, dikarin li ser lêkolîn bikin. Her yekî 50-60-100 salî hûkim kiriye. Lê van ne dewletên Kurdî ne, dewletên ku li Kurdistanê çêbûne.

Ji van dewletan ya ku herî zêde rist lîstiye Mervanî ne. Lewra di serdema deshilatiya Selçûkan de jiyan kirine. Dema ku sultan Tûxrûl Begê Selçûkî hatiye û bûye sultanê Selçûkiyan, pêwîstî bi Kurdan dîtiye. Di vê demê de pir koç jî hatiye Kurdistan û Îranê. Jixwe dema ku Îslam hatiye, Ereb ji xwe re anîne Kurdistanê. Piştî salên 640'î zêdetir têkiliyên Ereb û Kurdan çêbûne. Piştî salên 750'î jî têkiliyên Kurd û Tirkan çêbûne û hêdî hêdî zêdetir bûye.

Tirk heya salên 700'î li ser hesp in. Eşîret û xêlên wan, zêdetir bi awayekî koçber û bi xenîmetê jiyan dikin. Ew bi xwe jî înkar nakin. Gelek caran diçin û talana Çînê dikin. Dema ku Îslam pêş dikeve, li Çînê jî împaratoriyeke mezin pêş dikeve. Wê demê împaratoriya Çînê, ji bo ku xwe ji êrîşên Tirkan biparêze, sûrên Çînê mezin dike. Ew sûrên Çînê, niha di nava cihên herî ecîp yên cîhanê de ne. Ew jî ji bo pêşiya girtin li talana Tirkan çêbûye. Piştî wê demê Tirkan nikariye êdî li wan herêman talanê bikin, neçar mane ku berê xwe bidin Xazar û berv bi Rojhilatê Îranê ve hatine. Hinek li wê derê mane û zêdetir jî berê xwe dane nava Îran û Kurdistanê.

Dema ku Îslamê dibînin, fêm dikin ku Îslam olekî fetihkar e. Karekterê Tirkan jî Fetihkar e. Ji bo vê Tirk û Îslam zû digêhêjin hev. Bi vî rengî di nava dewletên Îslamê de cihê xwe digirin. Heya salên 900'î rista Tirkan di nava Îslamê de kêm e, zêdetir weke esker cih digirin. Piştî 900'î rista wan di cihên weke fermandariyê de zêde dibe. Di ser-

dema Selçûkiyan de deshilatdarî jî dikeve destê wan. Hem hejmara Tirkan zêde dibe, hem jî rista wan zêde dibe. Ji ber vê deshilatdariya Îslamê dikeve destê wan.

Piştî salên 1000'î eşîr û xêlên Tirk yên weke Selçûkî, Atabegî, Ak Koyunî, Kara Koyunî pir zêde bûne. Ji ber ku ji bo Îslamê jî şer dikin, li herêmê bi cih dibin. Ew barekî giran li ser civaka Kurdistan û Îranê çêdike. Bi taybetî li Îranê tengaviyê çêdike. Wê demê ne penaber bûne, hem ji bo xizmeta Îslamê hatine, hem jî ji bo jiyana xwe bidomînin hatine. Împaratoriya Îslamê destûr dide ku li wan deran bi cih bibin, lê dewletên heremê yên Kurd, tengav dibin.

Di serdema Mervaniyan de Tirk li gelek cihên Kurdistanê bi cih bûne, êdî dewletên van herêman tengav dibin. Gelek caran di navbera Tirk û deshilatên Kurdan de şer çêdibe û pêwîstî bi çareseriyeke heye. Di vê serdemê de êrîşên Bîzansan jî li ser Îslamê zêde dibin, di sala 1086'an de Kûdûsê digirin. Beriya wê jî milê Gurgum, Riha û Antakyayê girtine. Gelek cihên Kurdistanê ji destê Îslamê derxistine û heya nêzikî Amedê hatine. Wê demê paytexta Mervaniyan jî Ferqîn e. Êdî Mervanî tengav dibin. Ji aliyekî ve Rom êrîşî wan dikin, ji aliyekî ve ji Tirk li ser wan dibin bar. Ji bo vê îtîfaqa Mervanî û Selçûkiyan çêdibe.

Serokatî vê pir girîng dibîne. Piştî salên 1050'î di navbera Ehmedê Mervanî û Sultan Tûxrûl Beg de hevkirinek çêdibe. Da ku êdî alîkariya hev û din bikin. Carna hin pirsgirek derdikevin, lê careke din hev dikin. Piştî Tûxrûl Beg dimre, Alparslan dibe hûkimdarê Selçûkan. Ew jî têkiliyên xwe bi Mervaniyan ve berdewam dike, da ku Anatolyayê fetih bikin. Fetha Anatolyayê, ji bo Selçûkiyan dibe serkeftineke mezin. Lewra niha Sultaniya Îslamê ketiye destê wan û careke dîtir erdnigariya Îslamê fireh dikin. Lê bê Kurd nikare van serkeftinan bi dest bixe. Lewra divê ji erdnigariya Kurdan re derbas bibe.

Ji aliyê din ve ger cihekî veke, dikare wan qewmên Tirk lê cih bike. Ji bo Mervaniyan jî ew şansek e. Dibêjin, ger em Romiyan ji vê derê derbixin; em xwe ji ew dijminê Rojavayî xilas dikin, hem jî cihên ku tên fetih kirin Tirk tên bi cih kirin û li ser Kurdan nabin bar. Bi vî rengî hevkirinek çêdibe û di sala 1071'an de şerê Malazgîrtê çêdibe û Mervanî û Selçûkî bi serokayetiya Nasir dewlet kurê Ehmed û Alparslan, Romiyan têk dibin û beşeke zêde ya Tirkan derbasî Anatolyayê dibe.

Ew barê deshilatdarên Kurdan kêm dike. Di heman demê de Selçûkî dikevin navbera Mervanî û Romiyan. Bi vî rengî çeperek ji bo Kurdan jî dûrûst dibe. Vê hevkirinê Serokatî wisa dinirxîne, "ew hevki-

rin hem kêrî Tirkan hatiye, hem jî kêrî Kurdan hatiye; îro jî ger Tirk dixwazin pêş ve biçin, li ser esasê hevkirina Tirk û Kurdan dikarin vê yekê bikin. Ger şerê hev bikirana herduyan jî winda dikir, lê bi hevkirin û herduyan jî qezenc kir.” Bi vî rengî dostaniya Kurd û Tirkan çêdibe. Lê piştî 20 salan Selçûkî xurt dibin û Mervanî lewaz dibin. Bi vî rengî Mervanî têk diçin. Piştî wan jî Şahmaranî berdewam dikin.

Şahmaranî li mintiqaya Bakûrê Kurdistanê, li derdora Amedê ne. Dostkî jî li Bakûrê Kurdistanê, li herêma Cizîrê wan deran hûkim dikin. Lorî, li mintiqaya Lorî ya îro ne. Di sala 950’î de dewleta Lorî çêdibe, di sala 1150’î de dibe du dewlet; Lora Biçûk û Lora Mezin. Hasnewî, li mintiqaya Şehrezor û Kirmanşan e. Enazî, li mintiqaya Başûrê Kirmanşan hûkim dikin. Şedadî û  Rewadî li mintiqaya Hewlêr, berv bi aliyê Rojhilatê Kurdistanê û Azerbaycanê ve hûkim dikin. Di van serdeman de cihên ku ew dewlet hûkim dikin bi vî rengî ne. Formê pergala deshilatdarî û rêveberiyê li Kurdistanê, mirov dikare wisa behs bike.

Di wê serdemê de, piştî Selçûkiyan rista Selahadîn Eyûbî jî heye, jixwe me hinek behs kir. Li ser van mijaran pirs û nêrînên hevalan jî hebin, dikarin bînin ziman.

…: Di serdema Selahadîn de, li Îranê hinek bûyerên din jî qewimîn, ew çi bûn? Yek jî deshilatdariya Selahadîn, tenê li erdnigariya Îranê bû, an cihên dîtir jî hebû?

…: Di serdema Abasiyan û Îslamê de rista Ebû Mûslîm Horasanî çi bû?

…: Serokatî dibêje, “em tevgereke Îslamî ne, em tevgereke Selahadînî ne.” Divê em Selahadîn Eyûbî baş nas bikin. Cihên ku Selahadîn dibe deshilatdar, ne erdnigariya Kurdistanê ye; zedetir li Kûdûs, Lûbnan, Şam, Misir û Yemenê ye, heya Cezayîrê diçe. Bi xwe ji malbata Şedadiyan e. Selahadîn, li hemberî Xeçperestan, li ser navê Îslamê parsatina çanda Rojhilatî kiriye. Di navbera Rojava û Rojhilat de, her nakokiyên bi vî rengî hene.

Ji ber vê divê mirov bi awayekî oryantalîs, bi çavên Rojavayiyan bûyeran mezî neke. Selahadîn nirxekî Kurdistanî û Rojhilatî ye. Ji ber ku Selahadîn Rojavayiyan ji Rojhilat derdixe, dema ku fermandarekî Îngîlîz tê Şamê, lingê xwe li gora Selahadîn dixe û dibêje, “Selahadîn rabe, em dîsa hatin.” Ango hê jî bîr nekirine. Divê em jî bîr nekin. Lewra Selahadîn qesî ku deshilatdar e, nirxekî civakî û Rojhilatî ye. Ji vî alî ve divê em baş nas bikin.

Ya duyemîn heval got, Selçûkî di vê serdemê de hatine Îran, Kurdistan û Anatolyayê. Tiştê balkeş li hemberî Xeçperestan tu şerên Tirkan tune ne. Tenê şerê Kiliçarslanê duyemîn heye, yek jî li Meletiyê Germiyanoxlu hene. Bawer dikim ew jî Kurd in, lê di dîroka fermî de dibêjin Tirk in. Mesela Abasî, Tirkan dixin milê Romiyan, lê şerekî li hemberî xeçperestan kirine tune.

Di vê serdemê de ji ber ku li Kurdistanê jî deshilatdarî pir zêde tune, ji aliyê çandî û wêjeyî ve bingeha hin tiştan tê avêtin. Medrese vedibin, rewşenbîr û zane derdikevin. Bingeha xwe ji wê demê digirin.

…: Di dema xelîfetiya Omer de, dibêjin gelek pirtûk û tiştên dîrokî ji Kurdistanê birine. Di vê mijarê de tiştekî zelal heye? Dibêjin talankariyek jî hatiye kirin.

…: Di nava civaka Kurd de, li hemberî Selahadîn nêzikbûnek heye. Ji ber ku dibistanên pergalê di seriyê me de nêrînek ava kiriye û em bi çavê Rojavayiyan dîrokê mezî dikin, mirov ji hebûn û dîroka xwe poşman dibe. Jixwe armanca wan ew e. Dibêjin welatên cîhanê yên seyemîn û welatên paşve mayî ne. Ew nêzikbûn hemû birdozîk in. Em îro behsa Selahadîn dikin, lê dibe ku hê gelek kesên wisa ku me qet navê wan nebihîstî hebin.

Qesekî mirov dibîne, di nava kîjan miletî de pêş ketibe jî, tu caran di nava Kurdan de nijadperestî pêş neketiye, lê çanda xwe jî parastiye. Ji her gelekî ve dostanî daniye, îxanet jî lê hatiye kirin, lê Kurd wisa nêzik nebûne. Ew nêzikbûn, bûne sedem ku Kurd ber xwe jî bidin. Dema ku em herêmê mezî dikin, çiqasa gel hatine qetilkirin û helandin, mirov dibîne. Lê Kurdan ber xwe daye û niha gelê herî dewlemend û xwedî alternatîf e.

Ji ber ku dijminên me, çav berdane erdnigariya me û me tune dihesibînin, kesên navdar yên Kurdan jî bi awayekî berovajî pênase dikin. Jixwe dîroka fermî û deshilatdaran li gorî wê hatiye nivîsandin. Lê dîroka rast û berxwedana Kurdan niha her kes dibîne.

…: Dema ku Îslam tê Kurdistanê, di serdema Xelîd Bîn Velîd de gotinek tê gotin, “Baneyê esabekûj” mahneya vê gotinê çi ye û çawa dikeve dîrokê?

**H. Helmet**: Di serdema Selahadîn de, terîqatên cûda derdikevin. Ne tenê Kurdistanê, li derveyî Kurdistanê jî hin terîqat derdikevin. Piştî sedsala 9’emîn û 10’emîn jixwe di nava Îslamiyetê de lêgerîn çêdibin.

Selahadîn, di nava deshilatdariya wê demê de rol lîstiye. Deshilatdariya wî ya esasî li Şam, Misir û Cizîreya Erebî ye. Ne li Kurdistanê



**Ebû Muslum Horasanî**

ye. Jixwe jê re dibêjin, *"Sultan Selahadîn Eyûbî*." Di wê serdemê de sultan deshilatdarê herî mezin e. Heya Helep û Mûsilê jî hûkim dike.

Ji bo gotina, "Baneya esabekûj" ez vê bibêjim; di nava civakê de hin tiştên ku hatine jiyankirin û bûne çîrok hene. Bane jî herêmeke Kurdistanê ye, li gel Îslamê çîrokên wê hene. Heval dibêjin, "hinek esabeyên Îslamê hene, dixwazin biçin Banê, lê xelkê wan rê nade û wan dikûje." Lê ez çîrokeke bi taybetî li ser wê nizanim. Agahiyeke şênber hebe, heval dikarin bînin ziman.

Li ser Ebû Mûslimê Xorasanî pirs hebû. Li ser wî nêrînên cûda hene. Hinek dibêjin, "bi eslê xwe Kurd e." Berê Kurd li Xorasan hebûne. Hinek jî dibêjin, "ne Kurd e." Hinekên din jî dibêjin, "Kurd e, lê ji ber ku çûye Xorasanê û li wir bûye fermandar, navê Ebû Mûslîmê Xorasanî lê kirine." Navê wî esil ne Ebû Mûslîm e, navê rastî (Behzadan kurê Wendad Hurmezd) ye. Navekî kevn yê Kurdî û Îranî ye. Ji bo wê guman heye ku Kurd be, lê nêrînên cuda jî hene.

Ebû Mûslîm, di serdema Emeviyan de tê girtin. Jixwe me behsa tûndî û zextên Emeviyan yên wê demê kirin. Di girtîgehê de têkiliya Ebû Mûslîm û Abasiyan çêdibe. Ew têkilî dibe nasîn û dema ku derdikeve li herêma Xorasanê demekê fermandariyê dike û têkiliyên xwe û Abasiyan jî qut nake. Di encamê de di sala 747'an de liv û tevgerên Abasiyan, li hemberî Emeviyan zêde dibin, Ebû Mûslîm jî mintiqaya Xorasan tevger dike û risteke esasî ji bo tevgera Abasiyan dîlîze. Ew tişt dihêle ku tevgera Abasiyan xurt dibe û piştî çend salan deshilatdariya Emeviyan bikeve.

Piştî deshilatdariya Emeviyan tê xistin, Ebû Mûslîm careke din li herêma Xorasanê tê peywirdar kirin. Rojhilatê Îranê, bi piranî dikeve destê Ebû Mûslîm. Lê pişt re ji ber ku deshilatdariya wî zêde belav bûye, gotineke wisa belav dibe û dibêjin, "Ebû Mûslîm Xorasanî, dixwaze xwe bike xelîfe." Li gorî dîrokê tê gotin, Ebû Mûslîm Xora-

sanî secereya xwe nivîsandiye û weke ku malbata wî ji malbata Mihemed e nîşan daye.

Abasiyan jî ji ber vê guman kirine ku ew dixwaze bibe xelîfe. Bi vî awayî bangî wî kirine û li Bexdayê lêpirsîn kirine û kûştine. Ji ber vê yekê Kurd dibêjin, “Kurdan alîkariya Abasiyan kirin, lê dema ku hatin ser deshilatdariyê Ebû Mûslîm kûştin.” Texrîben kûştina wî jî di sala 775’an de ye.

Piştî Ebû Mûslîm, keçeke wî ya bi navê Fatma heye. Li Kurdistan û Îranê tevgerek rêxistin kiriye û xwestiye riya bavê xwe berdewam bike. Di vê tevgerê de ola Hûremiyê jî, ji nû ve zindîkirin hebûye. Niha li herêma Barzan li ser kevirekî cihê lingekî heye. Hinek dibêjin, “cihê lingê Fatmaya keça Mihemed e.” Lê Fatmaya keça Mihemed nehatiye Kurdistanê. Hinek jî dibêjin, “cihê lingê Fatmaya keça Ebû Mûslîm e. Jineke pîroz bûye, dema ku lingê xwe kevir xistiye, şopa lingê wê diyar bûye.”

…: Ji bo meseleya Baneya Esabekûj; dema ku Xelîd Bîn Velîd bi leşkerên xwe tê Kurdistanê, li gel wî kesekî bi navê Mihemed Îbnî Mihemed heye. Ew kes di dawiya temenê xwe de biranînên xwe dinivisîne. Navê pirtûkê jî, “fetihkirina Iraqê” ye. Behsa Sûleymaniyê û herêma Kurdistanê dike. Pişt re derbasî Asosê wan deran dike. Cara yekem Kurd, di Asosê de pêşiya wan digirin û şerekî mezin çêdibe, li wê derê gelek esabe dimrin. Li milê Serdeştê jî hin şer çêdibin.

Dema ku digêhêjin Bane, xelkê Banê dibihîzin ku bi awayekî tûnd gelek Ereb bi berv wan ve tên. Nameyekê dinivisînin ji bo Xelîd Bîn Velîd. Dibêjin, “em Îslamiyetê qebûl dikin, lê divê hûn jî dest ji deshilatdarî û çanda me nedin. Ji bo vê şeş kesên xwe zane bişîne ku me fêrî Îslamê bike.” Xelîd Bîn Velîd jî qebûl dike. Jixwe wê demê li derdora Mahabadê bûye, amadekariyên êrîşa Ûrmiyê û Mahabadê kiriye. Şeş kesan dişîne Bane, lê piştî hefteyekî xeber digre ku ew şeş kes hatine kûştin. Jixwe serê wan şeş kesan, ji bo Xelîd Bîn Velîd dişînin.

Wê demê arteşekê dişîne ser Banê, donzdeh serok eşîrên Banê jî qetil dikin. Êrîşî ser milet jî dikin, gelek kesan dikûjin, gelekan digirin û talanê çêdikin. Wan şeş kesan jî dibin li ser girekî û di bin dareke mezin de vedişêrin. Ji wê derê re jî dibêjin gora esabeyan. Ji ber vê yekê jî ji Banê re dibêjin, “Baneya Esabekûj.”

…: Li mintiqaya me, li Sîne jî tiştekî  wisa heye. Dema ku hinek esabe têngav dibin, dua dikin û dibêjin, “yarabî cihê ku me ji destê Kurdan ve berdê, me bike dar.” Li wê derê gelek darên mezin hene, 20-

30 heb jî gor hene. Niha jî dema ku gundî wan daran jê dikin, dibêjin xwîn jê diherike. Çîrokek wisa heye.

…: Niha Omer weke kesekî ku adalet aniye Kurdistanê tê naskirin. Lê gelek deshilatdarî hene, ji bo deshilatdariya xwe şer dikin, komkûjiyên mezin dikin. Da ku baweriya xwe belav bikin, talanan dikin û dest didin ser jinan. Agahiyên bi vî rengî hene, ew jî rastiyek e.

**H. Helmet**: Ji bo çi dibêjin, adaleta Omer. Hz Omer mirovekî leşkerî bûye. Di dema Ebûbekîr de, gelek kesan digot Mihemed çû, Îslamiyet jî çû. Ebûbekîr ew hemû tasfiye kirin. Dudu di serdema Ebûbekîr de, hinek bazirganên Kûreyşan dixwestin weke xwe bikin, lê Ebûbekîr tûnd nêzik dibe û wan kesên li gorî Îslamê naçin ciza dike. Dema ku Ebûbekîr wefat dike jî, Omer xwe komî ser hev dike û bi hêz dibe, êrîş dike û tûndî jî dike. Lewra armancake Îslamê fetih kirin e. Dibêjin, “ola herî dawî ya ezman e, divê bigêhêje her kesî.” Ango Omer li gorî peyamên Îslamê diçe, tiştekî ku bike tune. Ji ber vê yekê tiştên ku Omer kirine, xizmetî Îslamê kiriye. Yek jî cudabûn nekiriye navbera hejar û dewlemendan. Kê xirabî kiribe, hesap jê pirsî ye. Ji ber vê dibêjin, adeleta Omer. Di dema Omer de Kurdistan hatiye fetih kirin, ji ber vê Kurd bi zehmetiyan ve rû bi rû mane. Yên dijberî vê disekinin tên kûştin.

Gelek çîrokên ku di nava civakê tên gotin hene, lê hinekên wan dibe ku di dema Îmam Gazalî de bin jî. Lewra di destpêka Îslamê de li hemû cihan şer nebûye. Gelek mintiqayan ola xwe parastine, lê di sedsala 11’emîn de dema ku Îslamê xwe ferz kiriye, şer çêbûne.

Li gorî belgeyên hene, di serdema Xelîd Bîn Velîd de, li herêmên Mêrdîn û Şehrezorê hinek şer çêbûne. Di wan şeran de nêzikî 50-60 hezarî jin û zarok weke xenîmet birine. Jixwe zilam jî hatine kûştin. Cihên dîtir şer çênebûne; an bûne Misilman, an jî ola xwe parastine û bac dane.

Ji aliyê civakî ve, dema ku Îslam hate Kurdistanê bi xwe re formeke nû anî. Di serdema Îslamê de, li Kurdistanê forma ûmetgeriyê çêbû. Bi vî rengî formên civakî ku li Kurdistanê çêbûne wisa ne; xêzan, malbat, tîre, xêl, hoz, qewm, ûmet çêbûn. Beriya Îslamê hêdî hêdî bingeha qewmbûnê çêbûbû. Lê tam bi form nebûye. Piştî dema Îslamê, qewmbûn êdî cihê xwe digre.

Li gorî Îslamiyetê qewm, ew komên ku ziman û çanda wan nêzî hev in. Ûmet jî hemû komên ku li gel hev û din jiyan bikin û bi olekî bawer bikin in. Têkiliya civakî ku di navbera ûmetê de heye, ne xwîn, ziman û cand e; îman e.

Îslamê li ser du tiştan kar kiriye; yek pergala îdarî ya Îslamê çêdike, dudu civaka Îslamê çêdike. Ji kîjan qewmî dibe bila bibe, divê Îslamî be. Jixwe rêgezeke Îslamê ew e; ferq di navbera Ereb û qewmên derveyî Ereban de tune. Dema ku Emevî Erebperestiyê dikin, ji ber vê Misilman eciz dibin. Rêgezek sereke a Îslam dibêje; di navbera Ereb û qewmên din de ferq tune ye, tenê di îbadetkirinê de ferq heye. Kî zêde îbadet bike, ew ji aliyê Xweda ve zêdetir tê hezkirin. Ew rêgez çiqasa pêk tê, an pêk naye, ew meseleyeke dîtir e.

Niha jî rêgezên PKK'ê hene, lê pratîkên ku derdikevin hene. ger mirov bixwaze PKK'ê binirxîne, divê bi van rêgezan binirxîne. Pratîka kesan di nav de çawa bûye, mijareke cuda ye. Ji ber vê yekê li gorî rêgezên Îslamê, ferq di navbera eşîr û miletan de tune ye. Li gorî Qûranê, Xweda dibêje, "me hûn ji qewmên cuda çêkirin, di navbera we de ferq tune ye. Yê we herî baş, kesê/a ku baştir îbadet dike ye." Bi vî rengî di qûranê de gelek mînak hene ku milet û qewman nêzikî hev bike. Li ser vê esasê forma ûmetiyê pêş dixe.

Niha jî di nava civaka me de tesîra ûmetiyê heye, beriya 100 salî zêdetir bû. Di ew dema ku Îslam hatiye Kurdistanê, jixwe qewmbûn çêbûye, hêdî hêdî tesîra ûmetiyê jî li ser Kurdan çêdibe. Piştî Îslamê li Kurdistanê formên heyî di astekê de xwe parastine, di xêzan-malbatê de hinek guhertin çêdibe. Beriya Îslamê di nava Kurdan de sê-çar cureyên xêzan hebûn. Di dema Zerdeştiyê de tenê jinek û zilamekî dikarî ji hev re bizewicin. Lê di dema Sasaniyan de dikarin hev û din berdin jî, heya demekê bi hev re jiyan dikin û pişt re dev ji hev û din berdidin.

Niha di nava Şîa de jî ew yek heye. Ji vê yekê re dibêjin sîxa. Di dema Sasaniyan de du zilam, dikarin jinên xwe biguherînin. Xûçk dikare bi birayê xwe re bizewice. Di wê serdemê de di Zerdeştiyê de jî berovajîbûn çêbûne. Her wiha zilam qesî ku dikare jinan, mafên wî heye jinan bîne. Jin jî dikare dev ji zilam berde. Lê dema ku Îslam hat, pêşiya van tiştan hate girtin. Ew guhertin bi demê re çêdibin. Êdî malbatên Kurdî, weke îro em dibînin damgaya Îslamiyetê lê dikeve. Êdî baş û xirab e, mirov dikare şîrove bike. Lê ne bi awayekî ku berê Kurdistanê malbat pir baş bû û Îslamê xirab kiriye. Mesela zewaca xûçk û birayan baş bûye? An jî hev û din berdana jin û mêr, baş bûye?

Mesela di nava Sasaniyan de, dema zilamek biçûya gel jineke din, nîşaneyeke ku di wê malê de ye datanî û heya ku wî zilamî karê xwe xilas nedikiriye, zilamê wê jinê ne diçûye malê. Ew çandek bûye. Êdî mirov dikare van binirxîne. Ya mûhîm formê malbatê, di dema Îslamiyetê de hatiye guhertin. Îslamê gotiye, divê jin xizmetî zilam bike, zi-

lam dikare bi awayekî fermî çar jinan bîne û derveyî wê jî dikare cariyeyan bîne.

Di têkiliyên tîre û hozan de pir guhertin çênebûne. Hinek çînên serdest yên Kurdistanê, li gel deshiltdariya Îslamê zêdetir têkilî danîne û hevkariya deshilatdaran zêdetir bûye. Jixwe berê aliyê zilam derketibû pêş, ew berdewam dike. Aliyê jinê jî, di astekê de rista xwe diparêze. Pir neketî ye. Ger mirov bi eşîrên Ereb û yên din ve qiyas bike, di nava eşîrên gundî yên Kurdan de rista jinê pêştir e, di wê demê de jî hatiye parastin.

Di baweriyê de jî hin guhertin çêbûne. Di 642'yan de Îslam li Kurdistanê hakîm bûye. Ew dîrok girîng e. Heya 1100'î beşeke zêde ya Kurd, nebûye Misilman. Ji 400 salî zêdetir Kurd hê Zerdeştî ne, ola xwe ya kevn parastine. Hinek pirtûk vê nîşan didin. Ne ku hema Îslam hatiye û bûne Misilman. Her wiha hemûyan şerê Îslamê jî nekiriye. Ger hemû Kurdan şerê Îslamê bikirana, bi giştî 50-60 hezar Ereb nehatine Kurdistanê. Kurdan dikarî milê wan bigre û biavêje. Divê ew bê zanîn.

Di serdema Emeviyan de beşeke Kurd, ji Xerîciyan tesîr bûne. Serokatî dibêje, "çepên Îslamê ne." Jixwe gelek komên wan hatine Kurdistanê û li wir jiyan dikin. Vê li ser civaka Kurd tesîr kiriye. Hinek ji malbata Elî tesîr bûne. Lê ne Elewiyên îro ne. Weke sozdarî bune algirî Eli, ev jî bi rêka Eli nêviyê Hz Elî, kûrê Husên û Zeyneba xûçka Husên. Jixwe jina Husên, Faris e. Dema ku ew ji komkûjiya Kerbela rizgar dibin, wan dibin Şamê, pişt re dibin aliyê Mûsilê. Di wê derê de derbazî kurdistan dibin.

Li Şengalê merketê Zeyneba keça Elî heye. Pişt re tên Kerkûkê, li wir cihê wan yê îstîrata heye. di wir re diçin milê Xûrmatu û Hamedan. Li gelek cihên Kurdistanê digerin. Ji ber ku nikarin biçin Erebîstanê, li Kurdistanê digerin. Ji ber ku malbata Mihemed û Elî ne, li her cihê ku çûnê xelk tesîr kirine. Hinek bi riya wan jî bûne Misilman, lê Misilmanên alîgirên Elî ne, ne Misilmanên Emeviyan e.

Hinek Kurdên ku bi deshilatdariyê tesîr bûne, hene. Cihê ku Îslamê dest xwe xistine, hinek kesên ku kirine berpirsyarên herêmê hene. Ji ber vê ew jî bûne Misilman. Bi taybetî ji çîna serdest, derdoreke ku wisa tesîr bûye heye. Hinek kes jî bi xwe, di encamên lêgerînên xwe de bûne Misilman û Îslamê ew kirine nunerên xwe, da ku gel perwerde bikin. Ew jî rêbazek bûye, da ku civaka Kurd bikin Misilman.

Di encamê de, beşeke civaka Kurd, dikevin bin tesîra Misilmanên alîgirên Elî. Beşek jî bi riya lêgerînên xwe û bi riya deshilatdariyê dibin Misilmanên Sûnî. Ev rewş heya salên 1100'î dewam dike.

Piştî salên 900'î ku êdî Farisan hûkmî Îslamê dikirin, sînorên Îslamê berfireh bûn. Di wê serdemê de, di nava Îslamê de hem fetîh hebûn, hem jî lêgerîn pir bûn. Di Îslamiyetê de îlmê îlahiyetê dixwendin. Di heman demê de li ser felsefê dixwandin. Lê niha naxwînin. Çima? Lewra di van serdeman de, dîtin ku di nava Îslamê de gelek kes, li ser navê lêgerîna xweda xwe weke xweda nîşan didin. Mesela Halac-i Mansur û Sûhreverdî ji bo vê tên kûştin. Lewra lêgerîna wan ya heqîqetê heye, dibêjin "heqîqet di nava me de ye, cihekî din lê negerin."

Lê Îslamiyetê got, ew qedexe ye. Yek jî kesên ku li ser felsefe dixwendin, ji felsefeya Yewnanî tesîr dibûn û felsefe û ol tevlî hev dikirin. Îslamê ew yek jî qebûl nekir. Gotin, "wisa biçe, ola me ji destê me diçe." Lewra di encama van xwendinan de lêgerîn jî zêde dibin. Dîqat bikin, di van serdeman de, di nava Îslamê de û li Rojhilat zanist û fikir pêş dikeve. Pêşengiya dinê jî di destê Îslamê de ye.

Ji aliyê din ve mezhep-rêol pêş dikevin. Di Îslamê de rêolên weke Hanîfî, Şafî, Hembilî, Malîkî pêş dikevin. Çawa pêş dikevin, ew navên îmaman e. Her yek li gorî xwe, ol û qûranê şîrove dikin, her yek bi rêbazeke cuda dike. Ji bo nimêjê, ji bo îbadetê û di her tiştî de nirxandinên wan yên cuda hene. Dema ku yên Îslamê rê ve dibin, ew qesa cudabûn dibînin, fêm dikin ku an divê di Îslamê de reformek bê çêkirin, an jî divê pêşiya wan tiştan bê girtin.

Li gel vê yekê piştî salên 1000'î êrîşên Rojavayiyan, li ser Îslamê zêde dibin. Li Bakûrê Efrîqa hinek cih ji destê Îslamê derdikevin. Li Şam û Anatolyayê, gelek cih ji destê Îslamê derdikevin. Hem ji derve ve êrîş hene, hem jî di hûndir de parçebûn pir zêde bûye. Ew yek bû sedem ku di nava Îslamê de nîqaş çêbin û pêşiya van tiştan bê girtin. Wê demê Îmam Mihemed Xazalî (1055-1110), mûftiyê xelîfetiyê bûye. Li gel îmamên din yên Îslamê nîqaş dikin û dibêjin, "ger pêşiya van tiştan neye girtin, dê cîhana Îslamê xirab bibe."

Ew hemû cîhana Îslamê eleqadar dike, tenê Kurdan eleqedar nake. Lê tiştek jî heye, Kurdistanê û Îranê eleqedar dike. Ew çi ye? Ola Zerdeştiyê hê xwe parastiye. Mesela nîviyê Pakîstanê bûye Misilman, lê hê Kurdistan bi giştî ne bûye Misilman. Dibînin ku sedem, parastina baweriya wan Zerdeştî ye. Ji ber vê yekê, di wê demê de Îmam Xazalî û îmamên din du biryaran didin. Yek, dibêjin "êdî divê rêol çênebin. Tiştê rast, di qûranê de heye; di qûranê de tune be, di hedîsan de heye; di hedîsan de tune be, tevsîr heye." Ew biryareke ku pêşiya rêolan digirin e.

Biryarekê jî didin ku pêşiya xwedanasiyê bigirin. Waneyên îlahiyet û felsefeyê qedexe dikin. Yên ku li ser van nîqaş dikin jî kafir îlan dikin. Mesela îro jî Misilman çawa pêşiya mirovan digirin; dibêjin, “xweda heye, an tune ye?” Tu bibêje tune ye, jixwe tu kafirê. Ger tu bibêje heye jî, divê tu tiştekî din jî nîqaş nekê. Lê berê dihatine nîqaş kirin. Ew du biryarên ku hemû cîhana Îslamê alaqadar dikin in. Biryarek jî heye, cîhana Kurd û Îranî eleqedar dike, ew jî qedexe kirina Zerdeştî ye. Dibêjin, “*êdî em Zerdeştî weke olekî qebûl nakin.*” Heya wê demê Zerdeştî weke ol hatiye qebûl kirin.

Li gorî Îslamiyetê, ger olek bê qebûlkirin, civakên ku ji wî olî bawer dikin, dikarin bi bac dayinê ola xwe bidomînin. Mesela Xiristiyanî û Cûhîtî weke ol qebûl kirine, yên Xiristiyan û Cûhî dikarin li cihên Îslamiyet serwer e, baca xwe bide û olê xwe berdewam bike. Lê yên ku ji Zerdeştiyê bawer dikin, piştî vê biryarê êdî nikarin ola xwe berdewam bikin. Divê an bibe Misilman, an jî bimre. Berê riyên din hebûn, lê niha tenê du rê hene. An divê bibê Misilman, an jî divê bimrê. Ew ji bo Kurdan bû pirsgirek.

Bi giştî jî di cîhana Îslamê de pirsgirek derdikevin, lewra lêgerîn kêm dibin. Cîhana fikir teng kirin. Bi vî rengî di nava Kurdistan û Îranê de hinek lêgerînên nû pêş dikevin. Dê îslam bê qebûl kirin, an na? Divê bi çi rengî nêzikbûna vê biryarê bibe?

Li hemberî nêzikbûna Îmam Xazalî, li Kurdistanê çi dûrûst bû? Li ser Hasan Sabah wan jî pirs hebûn. Me got, ji salên 900’î heya 1100’î ji milê siyasî û fikrî ve alozî pêş dikevin. Piştî vê demê tevgera Îsmaîlî û Hasan Sabah pêş dikeve. Di nava sûniyan de çar mezhep pêş ketin.

Di nava Şîa de jî, birê alîgirên Elî hebûn. Elî (Eliyê mezin), Hesen, Husên, Elî, Mihemed Baqir, Cafer Sadiq; ew şeş îmamên esasî yên Şîatiyê ne. Heya serdema Îmam Cafer nêrîna wan yek e. Piştî wê nêrîn jî cuda dibin. Îmam Cafer rêziknameyeke navxweyî ji bo alîgirên Elî çêdike. Ango divê alîgirên Elî û Ehlîbeytî bi çi rengî tevbigerin. Berê weke helwest û nêzikbûnekê ye, hê ne bûye rêbazek. Ji ber vê yekê yên îmamên donzdehî re dibêjin, Caferî.

Îmam Cafer vê rêbazê diyar dike. Du kûrên wî hene, yek Îsmaîl e, yek Kazim e. Îsmaîl kurê mezin yê Cafer e, lê nêrînên wî û bavê wî hinekî ji hev û din cuda ne. Ji bo vê bi hev nakin. Îmam Cafer jî, Îsmaîl weke mîrasgirê xwe diyar nake, Kazim weke berdewamkarê xwe îlan dike. Kazim dibe cîgirê bavê xwe. Ew dibe sedem ku Şîa bibin du beş. Beşek dibe Caferî û Îmam Kazim dibe rêberê wan, ji wan re dibêjin donzdeh îmamî. Beşek jî dibin alîgirên Îmam Îsmaîl. Lê ji ber ku

Îsmaîl zû wefat dike û zarokên wî jî tune, îmamiya wan jî di heft îmamiyê de xilas dibe. Ji ber vê ji tevgera Îsmaîlî re dibêjin Şîa heft îmamî. Baweriya wan ew bi şeş îmamên sereke û Îsmaîl heye. Baweriya wan ji Kazim û îmamên pêy wî tên tune. Yên donzdeh Îmamî; ji Mûsa, Mihemed Cewat, Elî Hadî, Elî Riza, Hesen Eskerî, Mihemedê Mehdî weke îmam digirin dest. Mihemedê Mehdî jî ew kesê ku jê bawer dikin ku winda bûye û dê vegere ye. Ji ber vê kes nebûye cigîrê wî û bawer dikin ku dê vegere.

Di wê demê de tevgera Îsmaîlî, zêdetir di nava qewmên ku ne Ereb in de, bi taybetî li Îranê pêş dikevin. Niha li Suriye gelek kom hene ku ne Ereb in, bûne Elewî. Dûrzî Elewî ne, Fînîkên kevn bûne Elewî. Mesela niha Esad û malbata wî Elewî ne. Lê Elewiyên Erebîstanê û Kurdistanê ne wek hev in. Dûrzî û Esad ne wek hev in. Dûrzî û Elewiyên Bakûrê Kurdistanê ne wek hev in. Şîayê Îranê û Elewî ne wek hev in. Tiştê hevpar, her kesî navê Elî girtiye, lê her kes bi çanda xwe ye. Piştî salên 800'î bi vî rengî di nava Sûniyan de jî, di nava alîgirên Elî de jî reol-mezhep pêş dikevin.



SELAHETTÎN EYBÎ

Di nava Şîa de, ji xeynî rêolên Îsmaîlî û Caferî, du reolên din jî hene; Fatimî û Zeydî. Zeydiyan, li mintiqaya Yemenê wan deran tesîr kirine. Niha ew Hûysiyên ku li Yemenê şer dikin, Şîayên Zeydî ne. Helwesta Zeydiyan ew bû ku Şîa û Sûniyan bigihînin hev û din. Dixwazin sentezekê çêbikin. Lewra Sûnî û Şîa pir dijberî hev disekinîn, ew jî dixwazin bigihînin hev û din.

Fatimî dibêjin, em alîgirên Fatmaya keça Mihemed in. Ew zêdetir li milê Misir û Şamê pêş ketine. Demekê jî xelîfeta Fatmî li Misirê tê ava kirin. Ew xelîfet bi destê Selahadîn Eyûbî têk diçe.

Hasan Sabah wan jî, texrîben di salên 1040-1050'î de tevgera xwe pêş dixin. Di serdema ku saltanata Bûveynî û Selçûkiyan de ye. Ew jî dixwazin, olê kevn yê Îranî vegerînin, lê bi fikrê Îsmaîlî kar dikin. Zêdetirî 100 salî hûkimdariyê dikin; piştî Selçûkiyan, di serdema Sela-

hadîn Eyûbî de ew jî tên tûnekirin. Gelek çîrok û pirtûkên ku li ser wan hatine nivîsandin hene.

Ew serdem demeke wisa ye ku hem di hûndir de ew tevger hemû hene, hem jî êrîşên derve hene. Îslam jî ji bo ku pêşiya van tiştan bigre, nêzikbûneke nû pêş dixe. Di nava vê nêzikbûnê de, pêşî li Îsmaîlî, Fatimî û Hasan Sabah wan jî tê girtin.

Kurd jî, hem ji cîhana Sûnî ya Îslamê tesîr dibin, hem jî cîhana Şîa ya Îslamê tesîr bûbûn. Hinekan jî xwe diparast. Piştî salên 1100'î ku ew nêzikbûna tûnd ya Îslamê derket, hin helwest derketin holê. Bi du şêwazan tevdigerin. Şêwazekê Sansahak pêşengtiya wê dike. Bi Erebî ji wî re dibêjin "Sultan Sahak." Ew jî dibe kûrê Şêx Îsayê Nevî, ango ew jî vedigerin ser Fatmayê, Seyîd in û ji şêxên Berzencî ne. Bi eslê xwe Elewî ne, lê dixwazin olê kevn yê Kurdan zindî bikin.

Li gorî Serencamê ji sala 1133'yan heya 1233'yan li herêmê jiyan dikin. Sansahak ji ciwantiyê ve li gel bavê xwe xwendiye. Di destpêkê ve ola Elewîtiyê qebûl kiriye. Pişt re derbasî herêma Hewraman bûye, li wê derê Gundê Perdîwer heye, niha ew der cihê pîroz yê Yarsaniyê ye. Li wê derê di bin navê Yarsanî de banga nûkirina olê Kurdan dike. Jixwe di wê serdemê de deshilatdariya Îslamê jî berv bi lewaziyê ve diçe. Ji bo çi wan re dibêjin Yarsanî? San di zimanê hewremî de, tê mahneya pêşeng, ji bo rêber û serokan dibêjin. Niha jî li herêma Hewreman, kesên mezin re dibêjin San. Yên ku dibin hevalên san re jî dibêjin "Yarê san." Ango dibin hevalên ew kesê rêber. Çawa ku Îslamê de dibêjin esabe, ew jî bûne Yarsanî.

Bingeha xwe li Hewreman diavêjin, dixwazin çanda Kurdî biparêzin. Lewra divê êdî an bi giştî bibin Îslam, an jî bimrin. Jixwe malbat jî Elewî û Sûnî ne. Di navbera Elewîtî û çanda Kurdî de têkiliyekê çêdikin. Li gorî dîrokê, texrîben 40-50 salan li navçeya Hewreman, weke zankoyekê li wê derê telebe perwerde kirine û li gelek cihan belav kirine. Bi vî rengî tesîra Sansahak, li gelek cihên Kurdistanê çêbûye. Belgeyên wan bi xwe jî hene, Serencam heye, bi zimanê Hewremî-Goranî hatiye nivîsandin, lê niha bi zimanê Kurmanciya Jêrîn jî belav kirine. Di wê derê de xwe çawa rêxistin kirine û belav kirine, tê nivîsandin.

Nêzikbûneke wan heye, mirov dikare bibêje weke nêzikbûna me ya îro ye. Perspektîfa Sansahak, ji bo alîgirên xwe ew e; dibêje, "hûn çûn her derê li gorî rengên wê derê xwe tevger bikin, pêwîst nake ku hemû yek rengî bin." Mesela niha li her çar parçeyên Kurdistanê rêxistinên me hene û yên ku fikrên Rêber Apo qebûl dikin, dikarin di nav de

cihê xwe bigirin. Ew jî li gorî cih û derfetan xwe cuda dikarin rêxistin bikin. Li Bakûrê Kurdistanê bi navê Elewitiyê zêdetir derdikeve pêş.

Piştî salên 1200'î ji Bakûrê Kurdistanê, heya Serhad û Makû wan deran, gelek derdorên civaka Kurd dibin Elewî û Yarsanî. Li rojhilatê Kurdistanê bi navê Ehlî Heq û Elî Îlahî; li Başûrê Kurdistanê bi navê Kakaî belav dibin. Yên ku hinek lêkolîn dikin, dizanin ku kokê wan hemûyan yek e. Lê yên ku di bin tesîrên Îslamê de mane, bi çavên cuda seyrî van olan dikin û wisa nêzik dibin. Bi vî rengî hewldaneke civaka Kurd, ji bo parastina ol û çanda xwe pêş dikeve.

Li gorî wê demê hinek rêgez, remz û nêzikbûnên xwe çêkirine. Bi vî rengî Elewiyên Kurd dûrûst dibin. Li Suriye û wan deran jî, kesên ku bûne Elewî hene, lê bi çanda xwe bûne Elewî. Mesela dema ku mirov Elewiyên Bakur, Ehlî Heq, Elî Îlahî û Kakaiyan bişopîne, çanda jiyanî ya wan weke hev e. Lê Elewiyên Suriyê cuda ne. Ew jî dibêjin, "Elî li gel me pîroz e" lê hewl didin ku çanda xwe biparêzin.

Li Başûrê Kurdistan, Rojava û Bakûrê Kurdistanê tevgera Êzîdîtiyê pêş dikeve. Êzîdîtî di pêşengtiya Şêx Adî de pêş dikeve. Li gorî dîrokê, Şêx Adî jî Ereb e. Navê wî Ûdeyî kûrê Mîsafîr e. Weke sefîrên Îslamê, malbata wan li mintiqaya Colemerg û wan deran jiyan kirine. Mamoste û mûderisê gel bûne. Li wir têkiliya wan bi gel re baş bûye û fêrî Kurdî bûne. Bi vî rengî bi gel ve bûne yek. Lê malbata wan, ji Emeviyan e. Ew malbat diçe Lûbnanê, lê Şêx Adî careke din vedigere Kurdistanê; lewra diyare ku bi Îslama deshilatdariyê ve bi hev nakin.

Di wê serdemê de Abasî hûkimdarê Îslamê bûne, ew jî ji malbata Emeviyan e. Ji ber vê bi hev nakin. Şêx Adî tê herêma Şêxan, Şêxan li rojhilatê Mûsilê ye. Li wê derê careke dîtir li gel Kurdan têkiliya xwe pêş dixe û tevgereke wisa pêş dixe. Ji salên 1072'yan heya 1162'an jiyan dike. Ango di serdema Îmam Xazalî de ye. Dema ku ew helwesta Îmam Xazalî pêş dikeve, ew jî tevgera Êzîdîbûnê pêş dixe. Êzîdiyan hewl dane, di bin vî navî de çanda Kurd biparêzin.

Dema ku tengav bûne gotine, em Yezîdî ne; Ereb ji wan re dibêjin Yezîdî. Ango alîgirên Yezîdê kûrê Mûaviye ne, Ango alîgirên Yezîdê kûrê enesê ensarî ne. Dema ku rehet bûne jî gotine, em Êzîdî ne, ne Yezîdî ne. Ger tu di nava civaka Êzîdiyan de bibêjê, "Yêzîdî" eciz dibin. Bi vî rengî olê xwe pêş dixin. Piştî Şêx Adî, Şêx Hesen pêşengtiya Êzîdiyan dike. Heya dema Şêx Hesen xwe weke rêoleke nîşan didin, Şêx Hesen xwe weke ol îlan dike. Jixwe ji ber vê Bedredîn lolo deshilatdarê Îslamê li Mûsil diçe ser wan û nîvê wan qetil dike. Dibêjin, "hûn çawa xwe weke ol îlan dikin."

Gelek caran bi vî rengî bi fermanan ve rû bi rû mane. Şêx Adî pêşengê Êzîdiyan e, Tavûsê Melek pîroz dibînin, pirtûk û qewlê wan li "Mishefa Reş û Cilwe" hatiye nivîsandin. Ew pirtûk bi Kurmanciya Jorîn e. Nimêj û duayên wan jî bi Kurmanciya Jorîn tên gotin. Pirtûka pîroz ya Yarsanan "Serencam" jî bi zimanê Hewremî hatibû nivîsandin. Ji bo vê tê gotin ku Yarsanî bûye bingeha ol, helbest û wêjeya Kurdî. Êzîdî jî di heman demê de ji bo helbest û wêjeya Kurmanciya Jorîn bûye bingehek. Ew bingeh piştî salên 1100'î pêş dikeve.

Balê bikşînim ser tiştekî din; beriya San Sahak jî, ji bo Yarsaniyê hewldan hene. Hinek pêşeng hene ku bingeha vê fikrê danîne, lê Sansahak van komî ser hev kirine. Ango fikrê Yarsanî, texrîben 200 sal beriya Sansahak bingeha wê çêbûye. Lewra dibînin ku xetere li ser wan heye, ji ber vê bingehek wisa çêdikin. Lê Sansahak komî ser hev dike. Ya Êzîdiyan jî Şêx Adî ava dike, lê di dema Şêx Hesen de dibe pirtûk û belav dibe. Bi vî rengî li Kurdistanê du ol, bi rengê rêolê xwe nîşan didin. Da ku bikaribin xwe îfade bikin.

Di paraznameyan de Serokatî dibêje, "rêol di destpêkê de weke rêbaza xwe îfadekirinê derdikevin." Mirov li Kurdistanê jî vê dibîne. Çareseriya xwe bi vî rengî pêş dixe. Tiştê din ku mirov girîngî bidê, ew herdu ol hewl didin ku çanda Kurd biparêzin û wêjeya Kurdî pêş bixin. Ew jî girîng e.

Li keleka vê rista jinê heye. Bi taybetî di ola Yarsanî de, heft pêşeng hene; her dem di nava van heft kesan de yek jin e. Gelek jinên pêşengiya civakê kirine bi vî rengî di nava Yarsanan de derketine. Lîza Xanim heye, Xatû Dayrek heye, Dayê Tewrêzê Hewremî heye. Ango komeleyek jinên Kurd ku piştî salên 1100'î di nava Yarsanan de pêş ketine hene. Helbest û berhemên wan yên wêjeyî û risteke wan ya civakî heye. Di pirtûka Serencam û di nava civaka Serencam de jî behsa wan tê kirin. Ew hewldanên vê olê ne ku ji bo parastina çanda Kurd in.

Di vê demê de yên ku nebûne îslam, hinek dibin Îslam û hinek jî bi vî rengî xwe diparêzin. Di nava Kurdên ku berê ve bûne Misilman de jî, pêşiya rêolan tê girtin û tarîqat pêş dikeve. Terîqata Qadirî heye, Abdûlqadirê Geylanî (1077-1166)pêşengê wê ye. Abdûlqadîrê Geylanî û Şêx Adî hevalên hev in, li Bexdayê pêk ve dixwînin. Abdûlqadîr, rêz nîşanî Êzîdîtiyê daye. Ji bo wî niha Êzîdî sond bi serê Şêx Abdûlqadîr Geylanî dixwin.

Şêx Abdûlqadîr Geylanî, elimekî Îslamê yê wê demê bûye. Hinek dibêjin li mintiqaya Geylana Îranê dayik bûye; hinek jî dibêjin li Gey-

lan Xerb, ev herêm dikeve rojavayê Kirmaşan dayik bûye. Jixwe li Bexdayê mezin bûye û li wir wefat kiriye. Tarîqata Qadîrî pêş xistiye.

Tarîqat, dema ku elimên Îslamê dîtin ku êdî nikarin tefsîr bikin, dema ku pêşî li tefsîr û rêolan hate girtin elimên Îslamî ji xwe re riyeke din geriyan û navê wê jî kirin terîqet. Terîqat, tesfîra rêbaza îbadetê ye. Rêol-mezheb şîroveya ol e, lê terîqet tenê rêbazên îbadetê şîrove dike. Cudabûn di wê derê de ye. Deshilatên Îslamê ew yek nekirin pirsgirek, lewra nimêj çawa bibe û sûnet çi be, jiyana îdarî pir eleqedar nake. Ji bo vê terîqet nehatin qedexe kirin.

Piştî vê demê di nava Îslamê de gelek terîqet derdikevin. Terîqeta Nexşibendî, Terîqeta Refahî, Terîqeta Nurbexşî, Terîqeta Kadîrî û hê gelek terîqetên din derdikevin. Lê terîqeta ku zû belav dibe û li ser Kurdistanê tesîr dike, terîqeta Qedîrî ye. Di sedsala 12'emîn de li Bexdayê di pêşengtiya Şêx Abdûlqadîrê Geylanî pêş dikeve; di sedsa 13'emîn de jî bi riya Abdûlezîzî kûrê Şêx Abdûlqadîr Geylanî û Abûbekirî nêviyê Abdûlqadîr Geylanî tê Kurdistanê. Di destpêkê de li heremên Şêxan û Akre, li derdorên Êzîdiyan belav dikin, pişt re diçin li mintiqaya Şemzînanê û Colemergê belav dikin. Êdî terîqeta Qadîrî, weke terîqeteke Îslam û Sûnî, li Kurdistanê belav dibe. Ango piştî salên 1200'î li Kurdistanê belav dibe.

Bi kurtasî piştî salên 1200'î li Kurdistanê, ji aliyekî ve civaka Kurdistanê bûye Sûnî û terîqata Qadîrî pêş dikeve. Ji aliyê din ve êdî nikarin weke berê ola xwe biparêzin û bi riya Êzîdî û Yarsanan xwe îfade dikin. Di wan deman de cîhana Îslamê jî tengav dibin. Di 1230'î de Moxol, êrîşî Îslamê dikin; ew êrîş 20-30 salî berdewam dikin. Di destpêkê de li Îranê deshilatdariya Îslamê têk dibin û di salên 1250'î de jî li Kurdistanê Îslamê têk dibin û di 1258'an de bi giştî deshilatdariya Abasî bi tevahî têk dibin.

Ew dibe sedem ku di cîhana Îslamê de valatiyeke îdarî û siyasî dûrûst bibe. Hinek derfet jî çêdibin ku hin gelên weke Kurd ku di bin serweriya Îslamê de jiyan dikin, bi ola xwe bijîn. Ger ew rewşa nebûya, dibe ku Êzîdî û Yarsanan nedikarî bingeheke bi vî rengî dayne. Lê ji ber ku rewşeke bi vî rengî hate jiyan kirin, Êzîdî û Yarsanan xwe di nava civaka Kurdistanê de bi cih kirin.

Di vê demê de, bi riya kesên weke Baba Tahîrî Hemadanî, hem ji aliyê olî ve, hem jî ji aliyê wejeyê ve pêşketin çêdibin. Piştî salên 1100-1200'î hem bi riya ol, hem jî bi riya xebatên wejeyî, wêjeya Kurdî jî hinek pêş dikeve. Ew derfetên ku çêbûne, lêwaziya Îslamê ji bo wêjeya Kurdî hin bingeh ava kirine. Lewra aqilekî wisa hebû, digotin, "yên ku

binivisînin, divê bi Erebî binivisînin. Lewra zimanê Qûranê ye û zimanê pîroz e.” Bala xwe bidinê, heya salên 1100’î di nava Kurdan de gelek nivîskar derketine, lê zêdetir bi Erebî nivîsandine. Lê piştî salên 1100’î hêdî hêdî wêjeya Kurd pêş dikeve.

Di vê demê de navê Kurd û Kurdistanê jî, bi giştî dikeve nava jiyanê. Gotina Kurd, berê ne weke ya îro bû. Mehmed Emîn Zekî Beg, behs dike û dibêje, “hinek belgeyên Aşûriyan hene, ji bo civaka Kurd, an jî ji bo civaka heremê dibêjin, ‘Kardûx-Kardûk.’ Îhtîmal heye ku navê Kurdan ji wir hatibe.” Hinek jî belgeyên Akadî û Sûmerî esas digirin û dibêjin, “dibe ku navê Kurd, ji Gutî-Kurtî hatibe.” Hinek jî dibêjin, “Ermeniyan ji bo Kurdan gotine ‘Kurdoîn, Kurdoxîç.’ Dibe ku navê Kurd yê îro ji wê derê hatibe.” Hinek dibêjin, “di Şahnameyê de navê Xordo heye, tê mahneya lehengiyê, dibe ku ew bi demê re bûbe, Kurdo.”

Hinek belgeyên nû hene, yên serdema Ûr in. Aîdî beriya 2000 sal beriya mîladê ne. Li ser heriyê hatine nivîsîn. Kemîl sîn Kralî Akad, di salê 2200 b.z ferman bo Emîr Werdner derdike ji bo bibe berpirsê (Kirda) li nêzîkî Kirmanşan. Weke Ereban dane şûxilandin, niha jî Ereb nabêjin Kurd, dibêjin Kird. Hinek jî dibêjin, dibe ku navê Kurd, ji wê derê hatibe. Bi Yewnanî, Xsenefon wan Kardoxî dane şûxilandin. Dibêje, “li herêma Wan’ê qewmekî bi navê Kardox heye.” Gelek belgeyên bi vî rengî hene ku li ser navê Kurd hatine nivîsîn.

Belgeya herî nû, li ser Cabanê Kurdî derdikeve, ew jî hevalê Mihemed e. Ew jî ji eşîra Cabanên Kurdî ku li Başûrê Iraqê jiyan kirine. Di hinek belgeyan de derbas dibe ku Kurd in, dibe ku navê Kurd ji wan hatibe. Lê di dîrokê de peyva Kurd, weke ku îro tê karanîn di pirtûkekê de derbas dibe, Navê pirtûkê, “Kelayên Ekrad ”e. Ebû Hesen Elî El Medayînî(754-840)P.Z bi Erebî nivisiye. Tê mahneya Qilayê Kurd. Çend pirtûkên wî hene, yeke herî girîng jî Qilayê Kurd e. Di vê pirtûkê de behsa şerê Kurd û serdemên ku Îslam nû hatiye Kurdistanê dike. Lê ew pirtûk niha tune ye. Lê di çavkaniyên din de tê behs kirin. Ebû Hesen Yahya heye, telebeyê Ebû Hesen Elî ye. Di sedsala 9’emîn de jiyan kiriye, di pirtûkên xwe de behsa Ebû Hesen Elî û pirtûkên wî dike.

Taberî heye, dîroknivîsekî dema Îslamê ye, di sedsala 9’emîn de jiyan kiriye, wî jî gelek mînak ji pirtûka Ebû Hesen Elî girtine û behsa wî dike. Lê ew pirtûk niha tune ye, êdî bi xwe winda bûye, an hinekan winda kiriye, naye zanîn. Ebû Hesen Elî, di ew pirtûka xwe de bi zimanê îro behsa Kurdan dike. Êdî Kurdan bi nav dike. Çima ew girîng e? Dibe ku niha hinekî kêm bûbe, lê berê gelek dewletên dagiker qet

îtîraf nedikirin ku Kurd, di dîrokê de hene. Ango înkar dikirin. Ji ber vê ew belge ji bo me girîng in. Tebarî bi xwe jî kesê yekemîn ku Kurdan, weke gel bi nav dike ye. Ew jî girîng e. Lewra hinek jî dibêjin, "Kurd hene, lê ne gelek e."

Mesela hê jî Erdoxan dibêje, "birayên min ku bi eslê xwe Kurdin hene, lê ne gel û netew in." Lê Tebarî, Kurdan weke gel bi nav dike. Jixwe pîştî Tebarî wan, gelek pirtûk û belge hene ku li ser rista Kurdan ya di dîrokê de hatine nivîsandin. Gelek pirtûk hene ku di serdema Abasî, Emevî û Selçûqiyan de, behsa rista Kurdan dikin.

Navê Kurdistanê jî di vê serdemê de zelal bûye. Berê ji bo vê erdnigariyê Kurdistan nehatiye şixûlandin. Jixwe berê ve ji vê erdnigariyê re, di demên cuda de çi hatiye gotin, me behs kir. Di serdema Yewnaniyan de gotine, welatê Mezepotamya. Di serdema Îslamê de jî, di mahneya welatê di navbera du rûbaran de hin têgehên Erebî hatine şûxilandin.

Lê weke Kurdistanê, dîroknivîsekî Ermenî (Madtiyos 0rhatîsî) behsa hatine Romî û şerê Rihayê wan deran kiriye, li ser vî şerî pirtûkek nivîsandiye. Di wê pirtûkê de dibêje, "Rom tên welatê Kurdistanê Rihayê û li vir şer(1030-1031) çêdibe." Beşeke nivîskaran dibêjin, "ew îspata ku beriya 1000 salî, ji vê erdnigariyê re gotine Kurdistan. Lê weke fermî û îdareyeke siyasî navê Kurdistanê tune bûye. Çawa dibêjin Anatolya û Mezepotamya, wisa gotine welatê Kurdistanê. Êdî ew welatê Kurdistanê heya ku diçe, di wê pirtûkê de nehatiye diyar kirin; lê Riha weke beşeke Kurdistanê nivîsandiye.

Ji ber vê peyva Kurdistanê, beriya 1000 salî hebûye. Lê weke cihekî îdarî, di serdema Selçûkiyan de pêş ketiye. Di sala 1117'an de, Sultan Sencerê Selçûkî, dibe sultan. Wê demê herêmeke wan ya îdarî re dibêjin, "herêmên çiya." Ew herêm Şengal, Şahrezor, Dînewer, Kirmanşan, Hamedan e. Ji van penc herêman re dibêjin, "herêma Çiya." Ew der beşeke Kurdistanê ye. Lê di serdema Sultan Sancar de, navê vê herêmê dikin Kurdistan. Ew di belge û nexşereyên di wê serdemê de heye. Serokatî ji bo Tirkên ku îro navê Kurd û Kurdistanê qebûl nakin dibêje, "birayên we bi xwe ew nav lê kirine, hûn çima qebûl nakin?"

Divê em di vê derê de nekevin şaştiyekê; Sultan Sencer, Kurdistan îcat nekiriye, lê wî weke herêmeke îdarî nav lê kiriye. Îro jî Kurdistan heye, lê her parçeyekî ji aliyê fermî û îdarî ve an qet hebûna wê qebûl nakin, an jî çend bajaran ve sînordar dikin. Naye wê mahneyê ku Kurdistan tune ye, dema ku ew qebûl bikin çêdibe. Di dema Sultan Sencer de jî wisa ye. Lê divê mirov wan textîr bike ku herêmeke wisa îdarî

çêkirine ku îro dikeve belgeyên me. Bi vî rengî Kurdistan, dikeve nava nexşere û belgeyên fermî.

Li derveyî dema Sultan Sancar, di dîrokê de Hemedûlahî Mistefî Qezwînî heye. Ew jî nivîskar û dîroknivîsek e. Di sedsala 14'emîn de jiyan kiriye. Li ser erdnigarî û welatê Îran û Kurdistanê diaxife. Pirtûkeke wî bi navê "Nuzheti Qilub - Kêfxweşiya Dilan e," di sala 1338'an de belav kiriye. Behsa Kurdistanê dike. Di wê demê de dîbêje, "ew herêma ku dibêjin Kurdistan, ji 16 bajaran pêk tê." Navê wan bajaran jî nivîsandiye. Ew bajar jî dikevin nava sînorên ew herêma ku me li jor behsa wê kiriye. Ew bajar careke dîtir; Şengal, Şehrezor, Dînaver, Hamedan, Mahîdeşt, Kirmanşan, Xiftiyan, Kengaver, Çemçemala Rojhilat, Derbendî Zînkî, dizbil, Kerend û Xoşan,Derbend Tac Xatun, wistam, Hersin û Buhar ye. Ew jî weke belgeyeke sedsala 14'emîn ku behsa Kurdistanê dike ye. Jixwe piştî wê gelek pirtûk û belge hene.

Şerefxanê Bêdlîsî, yekem dîroknivîsê Kurd e. Li ser Kurd û Kurdistanê Şerefname nivîsandiye. Şerefname di sala 1596'an de hatiye nivîsandin. Şerefxan, yek ji mîrên malbata Bêdlîsiyan e. Li Bîdlîsê jiyan dike. Dema ku pirsgirek di navbera malbata Bêdlisiyan û Osmaniyan de derdikeve, koçî Îranê dibin. Demekê li Hamedan jiyan dike, li wê derê Şerefnameyê dinivisîne. Şerefname di destpêkê de bi Farsî hatiye nivîsîn, pişt re wergera wê di gelek zimanan de tê kirin. Pirtûkeke ku teqez divê bê xwendin e. Lewra Şerefxan, dîrok li ser esasê civakî girtiye dest. Rast e, dibe malê mîr, lê li ser esasê civakê dinivisîne. Dema ku mirov dixwîne, mirov fêm dike ku civaka Kurdistanê nas dike.

Gelek mîsyonerên Rojhilatnas, ji pirtûka Şerefxan sûd wergirtine. Weke Kurd, divê em jî girîngî bidin vê pirtûkê û jê waneyan derbixin.

Yekem nivîskarê Kurd ku tê naskirin Şerefxan e. Ya duyem jinek e, Mestûre Xana Erdalanî ye. Ne tenê di nava Kurdan de, mirov dikare bibêje ku jina yekem ku li Rojhilata Navîn û cîhanê li ser dîrokê nivîsandiye. Lewra di wê serdemê jinên ku li ser dîrokê nivîsîne, pir kêm in. Mestûre Xan, di sala 1805'an de ji dayik bûye, di sala 1847'an de wefat kiriye. Xelkê Sîne ye; li wê derê dayik bûye û li wir mezin bûye. Bixwe ji eşîreta (Caf) e û hevjîna (Xesrewxanî Nakam) ji malbata Xana Erdalan bûye.

Wê demê malbata Erdelan, hinek tengasiyan jiyan dike. Ji ber ku mîrê Erdelan jî di vê serdemê de dimre, koçî herêma Baban dikin û tên Sûleymaniyê. Dema ku Mestûre Xan, tê Sûleymaniyê li wir jiyan dike û pirtûkên xwe û nivîsên xwe li wir timam dike. Niha tûrbeya wê jî li

Sûleymaniyê ye. Pirtûkek li ser dîrok û malbata Erdelan nivîsandiye. Texrîben behsa dîroka 500-600 salî kiriye. Di heman demê de kesekê nivîskar û helbestvan bûye. Nêzikî 20 hezar beyîtên helbestan nivîsandine, pişt re kirine pirtûk. Beşeke nivîsên wê Kurdî ye, zêdetir jî bi Farisî ye. Ew nivîsên wê yên bi Farisî jî, li ser Kurd û Kurdistanê ne.

Di sedsalên berê de jî, hin dîroknivîs derketine, lê li ser dîroka giştî û îlîm nivîsandine. Tiştê ku Mestûrê Xan wan nivîsandiye, li ser Kurd û Kurdistanê ye. Weke mijarên dîrokî mirov dikare li van îstîfade bike.

Pirtûka Mihemed Emîn Zekî Beg heye. Di nava Kurdan de, weke nifşê duyem yê dîroknasên Kurd tê nas kirin. Pêşengê nifşê duyem e. Di navbera 1880'an û 1948'an de jiyan kiriye. Hinekî di nava pergala Osmaniyan de, li cihên weke Stenbolê jiyan kiriye. Piştî Osmanî belav bûne, hatiye Iraqê û li wir jiyan kiriye. Beşeke jiyana xwe de weke memûr jiyan kiriye û di dema Iraqê de jî wezîr bûye. Beşeke jiyana xwe jî daye nivîsên dîrokî. Gelek pirtûkên wî hene, pirtûka herî bi nav û deng, "Xûleseya Dîroka Kurd û Kurdistanê" ye. Hê gelek pirtûkên wî yên din ku behsa Kurd û Kurdistanê dikin hene. Hê gelek nivîskarên din jî hene, lê yên sereke ew in. Divê mirov li ser lêkolînên taybet bike.

Heya belavbûn û xirabûna Abasiyan, em dikarin van tiştan bibêjin. Gotinên hevalan jî hebin, dikarin lê zêde bikin.

...: Di derheqê Selahadîn Eyûbî û Îdrîsî Bêdlîsî de, bi piranî di nava me de weke xayin lê tê mezîkirin. Divê mirov çawa qaneh bibe ku li gorî ew şert û mercên wê demê, ew tiştan ne xiyanet in?

...: Bi hatina Îslamê ve li herêma Şehrezor wan deran hin şer çêbûne. Behsa hin komkûjiyên din jî dikin, ji Mûsilê heya Sêrtê şer û pevçûn çêbûne û dibêjin 5 hezar kes kûştine û seriyên wan li ser rê rêz kirine. Cihekî dîtir, seriyê hezaran mirovan jêkirine û heya Meletiyê rêz kirine. Wisa Kurd neçar mane ku Îslamê qebûl bikin. Ango dibêjin, jixwe yên hatine qetilkirin mirîne, yên din jî wisa radest bûne. Lê hevalan bi piranî weke ku Kurdan ji dil Îslamiyet qebûl kirine nirxandin. Em ê vê çawa bigirin dest?

...: Dema ku Îslamiyet êrîşî Îranê dike, di wê demê li Kurdistanê Cûhî jî zêde bûne, wê demê helwesta Cûhiyan çi bûye?

...: Ji pêvajoya salên 800'î û heya Îmam Xazalî re, mirov dikare bibêje di wê serdemê de gelek pêşketinên îlmî, felsefîk û zanyarî çêbûne? Tenê ne ji bo Îslamê, ji bo hemû cîhanê mirov dikare bibêje nîqaşên mezin çêbûne û pêşketinên mezin çêbûne?

…: Qesî ku tê bîra min, Serokatî xanedaniyan weke girêdaneke malbatî dinirxîne, lê di heman demê de weke derketineke qewmî dinirxîne. Mesela Osmanî tên mahneya Tirkan, Abasî tên mahneya Ereban, Eyûbî jî tê mahneya Kurd. Lê îro dema ku dibêjin Osmanî, Tirk tên bîra mirov; dema ku dibêjin Abasî, Ereb tên bîra mirov; lê dema ku dibêjin Eyûbî, Kurd nayen bîra tu kesî.

…: Dibêjin di dema Qanûnî de jî, herêmeke bi navê Kurdistanê heye. Agahiyeke wisa heye, an na?

…: Hevalan gotin, dema ku dibêjin Osmanî, Tirk tên bîra mirov; lê dema ku dibêjin Eyûbî çima Kurd nayen bîra mirov? Mesela cihê ku Osmaniyan hûkim kiriye, bi piranî Tirk li ser jiyan dikin. Lê cihê ku Eyûbiyan hûkim kiriye, cihên weke Misir û Şamê ne, Kurd lê jiyan nakin. Cihê ku herî zêde Abasî lê hûkim dike jî, cihê Ereban e. Ji ber Selahadîn, dibêjin Rojavayî pir zêde Kurdan hez nakin, lê dijberî vê dibêjin ji ber ku dijminekî zîrek bûye, rêz jî nîşanî Kurdan didin.

Li ser komkûjiyên Îslamê, li Kurdistanê kirine; di nava civakê de jî behsa hinek tiştan dikin. Dibêjin herêma Rihayê, arteşa Îslamê girtiye; lê milê Meletî wan deran di destê Romiyan de bûye, navberekê Meletî jî dikeve destê Îslamê, lê carake din Romî digirin. Ew komkûjî dema ku arteşa Îslamê cara dûyemîn hatiye çêkirine. Ew riya Mûş û Meletiyê, seriyê 50 hezar kesên ji gel tê rêzkirin. Min jî ji civakê wisa bîstiye.

…: Ebûbekîr Sadiq re dibêjin, mirovê herî dewlemend bûye. Mihemed dema ku dike wefat bike, dibêje, “piştî ez mirim, yê herî nêzikî min bila bibe xelîfe.” Yê herî nêzikî wî Elî bûye; lê ji ber ku temenê Elî biçûk bûye, Ebûbekîr dewlemend bûye û hevalê Mihemed bûye, ew kirine xelîfe.

Ji bo Omer, Ereb dibêjin, kesekî edil bûye. Lê kesê herî zalim bûye, serê mirovan jê dikiriye, ji ser daran ve dikiriye û wisa dimeşî ye. Diketiye ku, serê mirovan jê dikiriye. Îro DAİŞ jî wisa dike, dibêje “yên ku nekevin ola me, em ê serê wan jê bikin.” Mirov dikare dema Omer û DAİŞ’a îro bişibînin hev?

…: Ji bo meseleya Selahadîn Eyûbî, em weke deshilatdaran jî dinirxînin. Lê gelek deshilatdarên ku bi awayekî tûnd, ji ser gelan ve çûne hene. Ji ber ku Eyûbiyan tiştekî wisa nekirine, em bi giştî red nakin. Zêdetir li hemberî xeçperestan sekinî ye. Ya duyemîn, derfetên Kurdan nebûne ku li ser dîroka xwe lêkolîn bikin. Mesela hê niha jî, yekî Cûhî hatiye Tirkiye û weke Osmaniyên nû li ser Ehmed Davûtoxlu nivîs nivîsandine. Lê kê di Kurdistanê de li ser Selahadîn

Eyûbî kar kiriye? Kesî kar nekiriye. Tu tevgerên Kurd jî lêkolîn nekirine, da ku bikeve nava mejiyê Kurdan.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, weke Kurd me berv bi netewebûnê ve gav avêtiye. Hê niha jî di vê mijarê de pirsgirekên me hene. Lê kesî li ser kesên weke Selahadîn Eyûbî û Îdrîsî Bîdlîsî lêkolîn nekiriye.

Di dema hatina Îslamê ya Kurdistanê, hemû bi şûr nebûye. Divê mirov bi şîroveyan dîrokê fêm bike. Mesela tiştên ku li ser Kurdan hatine nivîsandin, bi piranî ne rast in. Tiştên ku li ser Îslamê jî hatine nivîsandin; yên ku Misilman bûne, pir xweş nivîsandine. Yên ne Misilman jî bi nakokî nivîsandine û tiştên weke komkûjiyan nepixandine. Niha jî yên ku bi awayekî cewherî Îslamê diparêzin, gelê Kurd e. Tu Ereb, weke civaka Kurd cewherî nêzikî Îslamê nabin. Mirov nikare bibêje, Îslam bi şûr hatiye Kurdistanê. Bi taybetî derdorên ku dixwazin di navbera gelan de nakokiyan çêbikin hene. Ma di navbera du cîranan de jî nakokî çênabin? Wê demê divê mirov bi awayekî rast nêzik bibe. Di her sedsalekê de yên weke DAİŞ û Sadam derdikevin. Lê pêvajoya biratiyê û bi hev re jiyankirinê bi hezaran salan hatiye jiyankirin.

…: Di nava civakê de ji bo Selahadîn Eyûbî û Îdrîsî Bîdlîsî, nêzikbûneke baş tune. Em jî wisa nêzik dibûn. Lewra di nava civakê de em wisa fêr bûn. Divê di nava civakê de jî sererastkirinek çêbibe û em ji dîroka xwe xwedî derkevin.

Li ser Êzîdiyan, heya dema Şêx Adî di nava Êzîdiyan de şêxantî tune bûye, Şêx Adî dixe nav. Pîrantî hebûye, ew jî ji Zerdeştiyê tê. Êzîdî nabêjin, “em tevlî Şêx Adî bûn.” Dibêjin, “Şêx Adî tevlî me bû.” Tiştê girîng, Êzîditiyê ziman û çanda Kurdî parastiye. Jixwe ne ew bûya, tenê bi ol nedikarîn ew qesa li ser piyan bisekinin. Heya Serhad û herêmên Bakûr û  Başûr belav dibe. Yê ku Êzîdîtiyê pêş ve dibe û belav dike jî Şêx Hesen e. Jixwe di 1221’ê de Fermandarê Mûsilê, wî darve dike.

Hevalan di Yarasaniyê de, behsa rista jinê kir. Di Êzîdîtiyê de jî heye, lê ji ber ku piştî demekê tesîra Îslamiyetê zêde dibe, rista jinan kêm dibe. Mesela jinên ku mîrantiyê dikin hene. Lê ji ber tesîra derdorê ew rist veşartî dimîne.

…: Li ser Selahadîn Eyûbî, dem û erdnigariya ku derdikeve girîng e. Felsefe û birdoziya ku esas digre jî girîng e. Ew hemû li ser tesîr dikin. Mesela zêdetir erdnigariya Ereban hûkim dike. Di wê demê de ûmetî heye, weke enternasyonalîzmê ye. Di wê demê de Xeçperest dixwazin Rojhilata Navîn bigirin, di wê demê de tiştê herî girîng parastina nirxên Rojhilata Navîn e. Da ku gel li hemberî xaçperestan rake ser

piyan û herêmê biparêze, ûmetî pêjirandiye. Ji ber vê forma Kurdiniyê derneketiye pêş.

Tiştên wisa hene, hin kesayet û birdozî derdikevin holê, mirov qet nikare qewm û netewa wî lêpirsîn bike. Mesela çend kes dizanin ku Marks ji kû ye. Pir zêde lêpirsîn naye kirin, lewra tiştên din tên bîra mirov. Her wiha Hegel û Engels jî wisa ne. Bi çi awayî damgaya xwe dîrokê dide, ew derdikeve pêş. Bêguman bandora civaka ku ji nav derdikeve li ser heye; ya Selahadîn jî wisa ye. Taybetmendiyên Kurdiniyê li ser hene, wê înkar jî nake. Xwe weke Kurd tîne ziman, xwe înkar nake.

Mesela di serdema Medan de, împaratoriyên pir hişk û tûnd hene. Lê reformên di Zerdeştiyê de çêdibin, nêzikbûneke hê nerm pêş dixe. Ew yek li ser Persan jî bandor dike. Demeke pir girîng e. Di Îslamiyetê de jî, dema ku Selahadîn derdikeve de, Îmam Xazalî pêşiya şîroveyê girtiye. Demeke hişk û tûnd e. Lê Selahadîn Eyûbî, di nava Îslamiyetê û Rojhilata Navîn de nêzikbûneke hê nerm pêş dixe. Mirov dikare bibêje di dema wî de gel hinekî azad dijî.

Lê divê em aliyê deshilatdariyê jî bizanibin. Em nikarin bibêjin, Selahadîn Eyûbî civaka exleqî û polîtîk pêş xistiye. Deshilatdarî parastiye, ne li ser esasê komînalbûnê ye. Lê împaratoriyeke koledar û tûnd jî ava nekiriye. Divê em li ser esasê nirxandina kevn ya çînî nêzik nebin. Me berê digot, "paşverû ye, an pêşverû ye?" Mirov wisa nikare pênase bike. Divê em tiştên erenî jî binirxînin, tiştên neyînî jî binirxînin. Mirov nikare bibêje îxanetkar e. Divê em weke reş û spî nêzik nebin û li gorî wê nenirxînin.

…: Her kes dizane ku Selahadîn Eyûbî Kurd e. Lê arteşa ku pê şer kiriye jî Kurd e. Ne ku hemû Kurd in, lê hêza ku di nava arteşa Îslamê ya wê demê de xwedî rist Kurd in. Heta dema ku li hemberî Xeçperestan şer kiriye, hin Ereb jî pêşiya wî bûne asteng. Niha li Şam, Lazqiye wan deran kelehên kevn hene. Derdora wan kelehan, Kurd cih bûne. Dibêjin, "em Eyûbî ne." Mesela li Şamê hê taxek heye, bi deh hezaran mirov bi giştî Kurdên Eyûbî ne. Min ew bi xwe dîtine.

Serokatî dibêje, "*ez Îbrahîmî me, ez Selahadînî me*." Li hemberî dagirkerên Rojavayî, nirxên Rojhilatî parastin e. Kesayeteke şoreşger e. Îbrahîm jî li hemberî Nemrûd rabûye û gelek rizgar kiriye. Ji ber vê Serokatî dibêje, "ez Îbrahîmî û Selahadînî me." Tê bîra min, Serokatî ji Apê Osman Sebrî re digot, "ez riya te dişopînim." Apê Osman Sebrî jî got, "na, tu Serokê me ye, ez riya te dişopînim." Selahadîn jî em wisa dinirxînin. Lê divê em kêmasiyên wî jî bibînin. Tenê kurekî Selahadîn

derbasî Kurdistanê bûye û li Heskêfê mîrtiyek ava kiriye. Xeynî vê Eyûbî ji Kurdistanê xwedî derneketine. Pergala ku di nava Îslamê de çêkiriye, wê adaletê fayda daye Kurdistanê jî.

Lê em nikarin bibêjin, di wê demê de avabûneke civakî ya Kurdan tune ye. Em bi hezaran sal dîroka Kurdistanê û forma civakî ya Kurdan digirin dest. Wê demê jî di nava Kurdan de, hezkirineke welat û Kurdiniyê heye. Li hemberî dagirkerên ku hatine Kurdistanê berxwedan jî çêbûye. Selahadîn jî kesekî ji vî gelî ye û bi alîkariya vî gelî derbasî Rojhilata Navîn bûye û li hemberî xeçperestan ser ketiye. Nabe ku mirov kesayeteke wisa re bibêje xayin. Gotineke teng e, lê kêmasiyên mezin jî hene. Li vê civakê xwedî derneketiye. Divê mirov tenê Îslamiyetê ve girê nede. Hatina Îslamê ya Kurdistanê, xençerek bû ket dilê Kurdan. Jixwe Îslamê civaka Kurd ji hev û din belav kiriye.

…: Dema ku mirov behsa Selahadîn bike, divê mirov vê yekê jî ber çavan bigre. Selahadîn tenê li ser navê malbatekê tevlî nava Îslamê bûye, lê qewmên din li ser navê netewekê tevlî Îslamê bûne. Dema birdozî derdikevin pêş, netewiyet hinekî paş ve dimînin. Mesela dema ku PKK'î bibe mijar, Kurdbûn weke xwîneke naherike, lê weke çandeke PKK'ê lê hatiye. Ango ji qewmên din jî kes dikarin di nava PKK'ê de cih bigirin. Selahadîn jî li ser esasê Kurdbûnê nekiriye, li ser esasê Îslamiyetê kiriye. Lê kesayeteke mûhîm ku di nava Rojhilata Navîn de ye.

Di şer û nêzikbûnên wî de, gelek pîvanên wî yên exleqî hene. Ew pîvan jî yên Rojhilata Navîn in. Divê mirov li ser birdoziya wî, wî bigre dest. Ez bawer nakim ku tiştek ji Kurdan re kiribe. Dibe ku ji ber Selahadîn, bertekên Ewropayiyan li hemberî Kurdan hebin. Lewra bi dîrokê Rojhilat mezî dikin. Niha jî em dikarin Selahadîn bikin, remzeke ku carake din di navbera me û Ereban de biratiyê ava bike û li ser esasê Rojhilata Navîn ya demokratîk ava kirinê.

Ji bo Îslamê jî, dema ku me li ser esasê Îslamê nêrîn tanî ziman, ji me re digotin, paşverû. Niha jî dema ku em dinirxînin, ji me re dibêjin oryantalîst. Rast e, aliyên baş yên Îslamê hene, lê olekî ku bi xwe re dewlet çêkirî ye. Gelek ol, dewletan digirin û di xizmetê xwe de bi kar tînin, lê Îslamiyetê bi xwe re dewlet çêkiriye. Bi taybetî hatina Îslam ya Kurdistanê, bi mantiqa fetih û sultayê hatiye. Ez kesên weke Omer, Xalid Bîn Velîd û kurên Muaviye jî, weke kesên xwedî birdozî nanirxînim. Ji sultayê digeriyan, Îslamiyet weke qalikekî pê re danîn.

Ger mirov çanda Mihemedî binirxîne, ew cuda ye. Yek jî bi riya Îslamê, gelek qewm gihêştin ezmanan. Ereb, bi Îslamê bûn Ereb. Tirk û

Faris her wiha. Yên ku cewherî nêzikî Îslamê bûn Kurd bûn. Di vê serdemê de dewletek ava nekirin û nebûna xwedî sulta, dibe ku ji bo Kurdan baştir be.

**H. Helmet:** Nîqaşa me vegeriya ser Selahadîn. Me gotibû, divê em weke berê nêzikî dîrokê nebin. Lê diyare hê fikrandinên weke berê hene. Divê em hinekî xwe ji wê psîkolojiyê rizgar bikin. Divê em careke din nêrîna xwe ya dîrokê ber çavan re derbas bikin.

Hevalê Elî Piling heye, hevalan pir behs dikirin, min jî dixwest bibînim. Min cara yekem di 96'an de dît. Dema ku min dît, min dît ku hevalekî bejn kurt e. Lê di xeyalê min de herî kêm du metre bejna wî hebû. Bila şaş naye fêmkirin, hevalekî rêk û pêk e. Ez behsa mezîkirina me dikim. Hin zîhniyet hatine çêkirin. Dema ku yek bibêje leheng, hema zilamek tê ber çavên me, jinek naye ber çavên me. Ma di dîrokê de jinên leheng tune ne?heye. Bi taybetî di ew 5 hezar salan de zîhniyeteke wisa hatiye çêkirin. Ger mirov behsa nazdarî ûhwd bike, hema jinek tê ber çavên me. Ma zilamên nazdar tune ne? Dibe ku hebe. Lê zîhniyetek wisa çêbûye. Divê em van qaliban biguherînin. Dibe ku di dema pêş de zilamên bi navê nazdar jî hebin, jinên bi navê leheng jî hebin.

Em li ser ziman pir neaxifîn, Kurdî jî di nav de li ser hemû zimanan damgaya zilamsalariyê heye. Tesîra zilamperestiyê li ser ziman jî heye, li ser zîhniyetê jî heye, li ser her tiştî heye. Lê divê em biguherînin. Heval dibêjin, "dema ku em dibêjin Selahadîn, ew tişt tên bîra mirov." Heya cihekî mirov maf didê, lê ji bo çi wisa ye? Divê mirov li ser vê jî hinekî bifikire. Me got, Îslamiyet ji bo Ereban çi be, ji bo Kurdan jî ew e. Ger ji bo Ereb û Farisan xirab be, ji bo Kurdan jî xirab e. Weke pergal ez wisa dinirxînim. Weke birdozî em dikarin nîqaş bikin. Weke birdozî hat, çi bir û çi anî, çiyê wê xirab e û çiyê wê baş e? Mirov dikare van binirxîne.

Ger Ereb, ew qesî paşve mabin û vî karî bikin, em çima dijî wê ne? Çima ya wan baş e, ya me xirab e? Tiştê ku hatiye çêkirin, ew e. Serokatî di mezîkirina Selahadîn û Îdrîsî Bîdlîsî de got, "divê mirov Bedirxaniyan rexne bike, ji bo me tabloyekî pir xirab çêkirin." Ji bo vê Celadet Bedîrxan wan jî rexne dike. Em jî ji wan tesîr bûne. Ew tablo di sedsala dawî de çêkirin. Gelek tişt tune hesibandin, tiştên tune jî weke ku heye nîşan dan. Yek Ereb, Tirk û Farisan em înkar kirin. Tiştên ku ew dispêrin me û nirxandinên li ser me dikin, em jî qebûl dikin. Em weke xwe, li xwe nanêrin.

Wisa be em ê Selahadîn û yên din jî wisa binirxînin. Gelekên me dibêjin, em di dîrokê de tune ne. Tiştê dixwazim bibêjim ew e. An na Selahadîn baş kiriye, xirab kiriye; ew mijareke cuda ye. Selahadîn, kesayeteke Rojhilata Navîn e û Kurd e. Nêrînên weke xayin, ne rast in. Rexneyên me jî li ser hene, kêmasiyên wî jî hene; lê divê em başiyên wî jî xwedî derkevin. Tu mirov bê kêmasî nenin. Dibe ku îro jî weke ku hevalan got, Selahadîn di navbera me û gelên din yên Rojhilata Navîn de bibe fîgurekî siyasî. Lê weke rêgez û prensîp jî divê em bigirin dest. Ne ku em tenê li ser siyasetê bikin.

Mesela Îskender, hatiye Rojhilata Navîn; başî kiriye? Lê Yewnan, 2 hezar û 300 sale li ser Îskender jiyan dikin. Ger em hinekî nêzikbûnên xwe ber çavan re derbas bikin, dê em ê netîceyekê jî derbixin.

Li ser mijara kûştin û qetlîamên Îslamê em axifîbûn. Lê divê em hinekî nepixandinan dîqat bikin. Bila heval biceribînin. Bila çend heval êvar biçin û gel gundekî re derbas bibin, sibê dê gundiyê bibêjin herî kêm 100 heval êvar derbas bûne. Gelek tiştên wisa me jiyan kirine. Heqîqeteke civakê ya bi vî rengî heye. Hinek jî bi zanebûn hatiye kirin. Ger li hemû Kurdistanê komkûjî bibûya, Kurd nediman; ger hemû Kurdistanê berxwedan bibûya jî, Ereban nedikarî bikevin Kurdistanê. Lê ne wisa ye. Lê hin bûyerên waqaî çêbûne. Hinek Kurdên me gotine, “em ne Îslamê nas dikin, ne jî hûkmê wê qebûl dikin.” Wan jî lêdane û kûştine. Heval niha dişibînin DAİŞ, li Mûsil û Raqayê bi milyonan mirov hene, hejmareke zêde ya Kurdan jî heye. DAİŞ’ê ew Kurd hemû kûştin? Na, lê yên ku hemberî wan derketin kûştin. Em li dijî birdoziya DAİŞ in, lê divê em hinek jî şênber binirxînin. Niha Mûsil ji saleke zêdetire, di destê DAİŞ’ê de ye, du milyon mirov li wir jiyan dikin. Ma hemû bûne DAİŞ’î? Na. Yên bûne DAİŞ’î jî hene, zêdetirê wan nebûye DAİŞ, lê hûkmê DAİŞ qebûl kirine û rûniştine. Hinekan jî şer kiriye û DAİŞ’ê kûştiye.

Yek şerê me bike, dê em ê jî lêxin. Dibe ku birdoziya me û DAİŞ’ê cuda be, lê yek şerê te bike, dê tu neçar bimînê ku lêxê. Divê em van heqîqetan bibînin. Niha li Rojava, hinek cihan li hemberî hevalan sekinîbûn, heval pir bi hêrs ser ve çûbûn. Rêxistinê mûdaxale kir, da ku tiştekî şaş çênebe. Em pir xeyalî nêzik dibin, tiştê ku em ji bo xwe maf dibînin, ji bo xelkên dîtir maf nabînin. An ji bo xwe tabloyekî spî çêdikin, ji bo xelkê tabloyekî reş çêdikin. Carna jî tersê wê em dikin. Ji aliyê birdozîk ve em li hemberî DAİŞ in, lê divê em pratîka DAİŞ’ê pir cuda nekin.

DAİŞ, nunertiya Osman dike, an na? Mirov nikare tam tiştekî bibêje. Lê tiştê em dibêjin divê pir cuda û nepixandin çênebe. Ma DAİŞ'ê serê her kesî jê kiriye? lê yê hinekan jê kiriye.

Hevalan gotin, hin nêrînên me weke oryantalîzm tên pênasekirin. Ger mirov wisa bi giştî reş bike, oryantalîzm e. Lewra ew 100 salin, oryantalîst û Rojavayî dixwazin Îslamê reş nîşan bidin. Şerê xeçperestiyê bi xwe nivîsandine û Îslam wisa nîşan dane. Lê qesî ku Îslamê kiriye, Ewropayiyan xirabî nekiriye? Ew qesa ji hev û din nekûştine? Bi xwe dibêjin, bi sedema şerî olî, di navera salên 1618-1648 ji sê paran pareke Ewropayî hatine kûştin. Di dîroka Îslamê de, tu caran sê paran pareke Misilmanan nehatine kûştin. Naye wê mahneyê ku Îslam baş e û Xiristiyanî xirab e. Lê em dijberî ew mantiqa ku dibêje, "Xiristiyanî azadîxwaz e û Îslam jî pir paşverû ye" derdikevin.

Wisa ne rast e. Em dikarin nêrînên cuda jî bixwînin, lê divê em aqlê xwe jî bi kar bînin û şîroveyên xwe jî bikaribin bikin. Lewra her kes li gorî zanebûn û aqlê xwe diaxife. Em nikarin bibêjin, fikra falan kesî/ê tam rast e û ya falan kesî/ê şaş e.

Hevalan gotin, "ji salên 800'î heya serdema Îmam Xazalî, pêvajoya pêşketinan e?" Rast e, hemû belgeyên hene, wê nîşan didin. Serdema herî mezin ya Îslamê ku pêşketinên îlmî, fikrî ûhwd çêdibin e. Lê pêşî tê girtin. Serokatî dibêje, "ger Îmam Xazalî wan pêşî negirta, dibe ku ronesans û reform li Rojhilata Navîn çêbûbûya."

Tesîra Îslamê, li ser Cûhiyan hate pirsîn. Îslamê û Yahûdiyan pir li hev nekirine. Li Erebîstanê jî, li Kurdistan û Îranê jî bi hev nekirine. Lê hev û din îdare kirine. Şerên pir dijwar, min nebihîstine. Cûhî olê xwe ji ser Îslamê re dibîne, Îslamê jî fêm kiriye ku Cûhiyan nikare bike Misilman. Ji ber vê bi riya bac û peymanan hev û din îdare kirine.

Em bi giştî pirsên hevalan dikarin bi vî rengî bi bersivînin. Hevalan fikrên xwe jî anîn ziman. Xwezayî ye, mirov di her mijarekê de dikare gelek şîrovayan bike. Lê hêviya min ew e, ne tenê di mijara Îslamiyetê de, di her mijarekê de em nêrîn û mezîkirina xwe ber çavan re derbas bikin. Ne ku hemû nêrîn û nirxandinên me şaş in. Lê em hewl didin ku nêrîneke alternatîf û nû pêş bixin. Divê em li gorî nêzikbûn û paraznameyên Serokatî dîrok û her mijareke bigirin dest.

Divê di nava civakê de jî em vê nêrînê pêş bixin. Lewra em hewl didin ku pergal û jiyaneke nû pêş bixin. Tenê zanîna me jî têrê nake.

***-Piştî Abasiyan Mîrtiyên Kurd***

Me heya belavbûna Abasiyan behsa Kurdistanê kir. Ji 1258'an heya 1500'î rewşa Kurdistanê çi bû, em ê wê bigirin dest. Di 1258'an de bi sedema êrîşên Moxolan, dewleta Abasiyan xira bû. Piştî salên 1230'î hêdî hêdî Moxol êrîşî Îran û Kurdistanê dikin, di destpêkê de Îran, Kurdistan û Anatolyayê dixin bin serweriya xwe. Pişt re bi giştî Abasiyan belav dikin. Moxol heya 1350'î li herêmê serwer dibin. Lê Moxolan dewletek, an jî pergaleke ku demdirêj berdewam dike, ava nekirin.

Ew jî bi qarekterê Moxolan ve girêdayî ye. Weke qewmekî Asyaya Navîn, ango weke qewmekî Ural-Altay; zêdetir li ser jiyana koçerî û hespî jiyana xwe berdewam dike. Qewmekî şerker e, jiyana cihbûnê hez nakin. Ew sedemeke ku Moxolan, dewleteke navendî ava nekirine. Her dem bi hêza xwe bawer bûne û her di nava tevgerê de bûne.

Di dîrokê de dibêjin, Moxol hêzeke talanker û rûxêner bûne. Tiştekî ku ava bikin û alternatîf çêbikin tune. Îslamê jî hin tişt rûxandin, lê cihê wê tiştekî nû çêkir. Hem ji milê siyasî û îdarî ve, hem jî ji milê zîhnî ve, xwedî projeyeke bû, cihê we tiştek ava kir. Lê Moxolan, cihê tiştê ku rûxandine, tiştekî nû ava nekirin. Ji ber vê yekê dema ku Moxol li Kurdistanê hûkim dikin, damgaya xwe li wê pêvajoyê didin, lê weke eser tiştekî ku cihê xwe bihêlin tune ye.

Ew mijareke ku ji bo dîrokê girîng e ku em li ser bifikirin. Her hêzek, her çiqas xurt û bi hêz be jî; ger ne avaker be, mayinde nabe, temenê wê pir dirêj nake. Di vê demê de civaka Kurdistanê, ji ber ku pergaleke otorîter her dem li ser wan ne hakîme, fersendekî dibînin. Moxol, êrîş dikin, hêza xwe bi kar tînin. Lê tên û diçin, pergaleke ku li ser civakê dane ava kirin tune ye. Weke Îslamê bi civakê re pir mijûl nabin.

Weke me berê jî got, piştî salên 1100'î bi giştî bingeha ola Yarsanî û Êzîdîtiyê tê avakirin. Di sala 1250'î de jî dewleta Abasiyan belav dibe. Ango piştî ku bingeha Yarsanî û Êzîdîtiyê tê avakirin, Abasî pir jiyan nakin. 100 salî dimînin, lê ji bo dîrokê 100 sal pir dirêj nene. Ew dibe sedem ku Yarsanî û Êzîdîtî, piştî salên 1250'î jiyaneke rehetir bibînin. Ji sala 1250'î heya 1500'î, ji bo baweriya Kurd fersendek çêdibe. Her çiqas di navbera 1100'î û 1250'î de tengasiyek hatibe jiyankirin jî, piştî wê heya 1500'î firehî bûneke jiyan dikin.

Ew dibe sedem ku civaka Kurd, bi taybetî ew beşa zêde ku hê nebûye Misilman, rehetir jiyana xwe berdewam bike. Ger rewşeke bi vî rengî çênebûya, dibe ku Yarsanî û Êzîdîtiyê derfeta jiyaneke bi vî rengî nedîtîbana.

Ji aliyê din ve, dema ku Yarsanî û Êzîdîtî firsendê jiyankirinê dibînin, civaka Kurd jî bi giştî dikare civakbûna xwe berdewam bike û weke xwe bimîne. Jixwe ji ber ku nîvê civakê zêdetir hê nebûbûn Misilman, di astekê de xwe parastibûn. Li keleka wê dewlet û mîrên Kurd hebûn. Di wê serdemê de hinekên wan xirab bûbûn; hinek jî lewaz bûbûn, lê xirab nebûbûn.

Mînak dewleta Lorî, piştî salên 1150'î bû du dewlet; Lora Biçûk û Lora Mezin. Ew fersendê ku çêbû, bû bingeh ku xwe berdewam bikin. Lora Mezin, ji 1150'î heya 1453'yan temenê xwe berdewam dike. Texrîben 300 sal temenê wê heye. Lora Biçûk, ji 1150'î heya sala 1600'î, ango heya serdema Şah Abasê Safewî temenê xwe berdewam dike. Şah Abasê Safewî, hûkimdarekî tûnd bû û hemû dewletên herêma Îran û Kurdistanê têk dibirin. Dewleta Lora Biçûk, di wê demê de nêzikî 450 salî berdewam dike. Hêza xwe ji ew rewşa ku tê jiyankirin girt.

Di vê demê de Şuvankara hene, ji 1200'î heya 1400'î hûkmê xwe berdewam dikin. Li Başûrê Rojhilatê Kurdistanê û beşeke Îranê, di bin serweriya xwe de dihêlin. Emaretê Erdelanî jî di 1220'î de, beriya ku Abasî xirab bibin, li Rojhilatê Kurdistanê xwe ava dikin. Beriya belavbûna Abasiyan bi xurtî ava dibe û heya sedsala 19'emîn berdewam dike. Lê di dawiyê de hinekî lewaz dibe. Piştî salên 1300'î gelek mîrtî li Kurdistanê dûrûst dibin. Di dema Abasiyan de jî hene, lê di serdema Moxol û Tataran de xurt dibin.

Piştî Moxolan, komeke din bi navê Tataran tên. Ew jî qewmên Asya Navîn in. Pêşengê wan Tîmûrleng e. Ew jî ji 1350'î heya 1450 li Kurdistanê hûkim dikin. Lê di 30-40 salên dawî de hûkmê wan lewaz dibe. Qarekterê Tatar û Moxolan nêzikî hev in. Nêzikî 200 salî li Kurdistanê hûkmê wan heye, lê pergaleke ava nekin.

Piştî Tatar û Moxolan, komên Karakoyunan tên. Ew jî ji salên 1410'an heya 1460'an ji milê Tebrîzê ve tên û li Rojhilatê Kurdistanê, beşeke Başûrê Kurdistanê û Bakûrê Kurdistanê hûkim dikin. Piştî wan komên Ak Koyunan tên. Ew jî di navbera 1460'an û 1508'î de li Kurdistanê hûkim dikin. Herêma Amedê navenda wan e. Ew jî du hozên mezin yên Tirkmenan in. Van hoz û qewmên Tirk hêdî hêdî tên herêmê û her yek 40-50'î salî li Kurdistan û Îranê hûkim dikin.


Di van deman de, hûkmekî navendî li Kurdistanê tune. Her wiha bi awayekî navendî hewldaneke guhertina baweriyê li Kurdistanê tune ye. Ew yek derfet didin ku xelkên wê herêmê hinekî rehet jiyan bikin. Di wê demê de deshilatdarên herêmî ku hene, xwe diparêzin; hinekên din

jî çêdibin. Yên berê hene, dewlet in; lê piştre weke mîrtî tên bi nav kirin. Lê qarekterê vê demê mîrtî (emîrlîk) ye. Beriya wê pergala dewletên herêmî hebû.

Mîrtiyên ku di wê demê de derdikevin pêş; Erdalanî, mîrtiya Bîdlîsê, mîrtiya Hakarî ye. Ew piştî salên 1300'î pêş dikevin. Di Şerefnameyê de behsa wan tê kirin. Dîroka wan tam ne diyar e, lê di van serdeman de ne. Şerefxan, di Şerefnameyê de behsa van jiyan û nêzikbûnên van mîrtiyan dike, zêdetirî 50 mîrtiyan dijmêre. Hinekan re dibêje, mîrên mezin û serbixwe; hinekan re dibêje mîrên nîv serbixwe; hinekan re jî dibêje, mîrên ku di bin siya mîrên din de kar dikin. Bes hemû mîr in.

Bi vî rengî li Kurdistanê jiyan dikin. Lê di wê serdemê de mîrên herî bi tesîr in; mîrtiya Bîdlîsê, hem ji aliyê olî ve, hem ji aliyê siyasî ve xurt e. Mîrtiya Hakarî heye. Mîrtiya Çemîşgezek, li mintiqaya Dersîmê ye; mîrtiyeke Elewiyan e. Mîrtiya Erdelan, li mintiqaya Sîne û heya beşeke Başûrê Kurdistanê diçe. Heya Sûleymaniyê û Kerkûkê diçe. Mîrtiyek berfireh e, lê dema ku şerê Osmanî û Safewiyan çêdibe, parçe dibe. Mîrtiya Dasnê heye, mîrtiyeke Êzîdiyan e. Li navçeya Şêxan, Şengal û derdorên Mûsilê jiyan dikin.

Dibe ku mirov hemûyan nikaribe veke, lê hejmareke zêde ya mîrtiyan di wê demê de li Kurdistanê jiyan dikin. Hemû jî hem dixwazin sînorên xwe fireh bikin, hem jî çanda xwe bidin jiyankirin. Mesela mîrtiya Çemîşgezek, heya Gurgum û bajarên din yên Bakûrê Kurdistanê Elewîtiyê belav dike û çanda Elewîtiyê dide jiyankirin. Mîrtiya Dasnê , heya herêma Mêrdînê diçin û carna herêma Soran jî dixin bin serweriya xwe. Di navbera mîrê Soran û mîrtiya Dasnê de car caran pirsgirek derdikevin. Dervayî mîrtiya Çemîşgezek û Dasnê, mîrtiyên din yên li Kurdistanê mîrtiyên sûnî ne.




Mîrtiyên ku li Rojhilatê Kurdistanê û herêma Lor hene jî, bi piranî xwedî ola Ehlî heq, an jî Yarsanî ne. Lewra li Rojhilatê Kurdistanê zêdetir bandora van olan heye.

Tiştê din ku derveyî rewşa îdarî mirov behs bike, di vê serdemê de ji milê jiyana civakî ve hinek vebûn çêdibin. Lewra tûndî û şer kêmtir in. Ji ber ku mîrtiyên Kurd hinek zêde dibin, ew ji bo jiyana Kurd jî derfetên zêdetir dide. Lê di pergala jiyanê de guhertineke pir cîdî çênebûye.

Di vê serdemê de, piştî salêh 1200'î tarîqata Qadîrî jî li Kurdistanê pêş dikeve. Ew terîqat li ser jiyana civaka Kurd, pir zêde tesîr dike. Li Kurdistanê terîqata Qadîrî, rêbazek ji bo pêşketina Sûnitiyê ye. Mîrên sûnî û hinek zaneyên ku terîqat ji bo xwe esas girtine, medreseyan pêş dixin. Di Îslama sûnî de, ew taybetmendî li pêş bûye. Lê kêmasiyeke olên Kurdî yên weke Yarsaniyê û Êzîdiyê, zêde girîngî nedane perwerdê. Weke sedem jî dibêjin, ew ol li ser esasê xwe parastinê ye, ne fetihkar e. Bangî xelkê nakin, da ku bên ser olên wan.

Dîroknas, vê yekê weke sedemeke kêm bûna van olan nîşan didin. Dixwazin ya kevn biparêzin. Bala xwe bidinê, îro jî Yarsan û Êzîdî kesên derveyî xwe qebûl nakin. Dibêjin, bila endamên me ola xwe neguherînin, kesî din pêwîst nake. Lê Îslam her kesî re dibêje, were.

Ger ew taybetmendiya Yarsanî û Êzîdîtiyê tune bûye, dibe ku ew ol pir berfireh jî bûbana. Bi riya tarîqata Qadîrî, Îslama Sûnî hêdî hêdî li Kurdistanê xwe pêş dixe, lê hê jî weke îro ne hakîm e.

### *-Di Serdema Safewî û Osmaniyan de Kurdistan*

Dervayî Îslama Sûnî, li Kurdistanê terîqata Safewî pêş dikeve. Safewîtî bi riya Şêx Sefyedîn pêş dikeve. Ew jî bi eslê xwe ji Koyê, ji Başûrê Kurdistanê ye. Hinek dibêjin, ew bi xwe telebeyê Sansahak bûye. Di serencamê de jî tê behs kirin ku di bin tesîra Yarsaniyê de bûye. Bi xwe şêxekî Sûnî ye, hinek nêzikî terîqa Qadîrî ye, lê hinek taybetmendiyên xwe hene û dixwaze bi wan taybetmendiyên xwe tevbigere. Çawa ku Sansahak Elewî bû, çû û Yarsanî ava kir; çawa ku Şêx Adî Sûnî bû, lê ji ber ku têkiliyên wî li gel Kurdan xurt bû, çû û Êzîdîtî ava kir; Şêx Sefeyûdîn jî kesekî bi vî rengî ye.

Di sala 1271'an de dayik dibe, heya 1350'î jiyan dike. Ew jî di serdema ku dewleta Abasiyan xirab bûye de, derdikeve holê. Li mintiqaya Koy, Hewlêr û Rojhilatê Kurdistanê mûrîdên wî dûrûst dibin. Berê çandeke şêxtiyê hebûye. Di pergala medreseyan de, dema ku ciwanek dixwaze bixwîne, weke îro li mal, gund, an jî bajarê xwe naxwîne. Yên ku dixwazin bixwînin, gund bi gund, herêm bi herêm digeriyan. Mesela ji Amedê diçûn Bêdlîsê, diçûn Ûrmiyê. Ew weke çandeke wê demê bû. Kesê ku weke şêx navê wî derketî ye, ji her cihî telebe diçûn gel wî.

Diyare ku Şêx Sefyedîn jî, kesekî ku li ser civakê tesîr kiriye û li gelek cihan xwedî telebe ye. Piştî salên 1300'î bangawaziyên wî  zêde dibin û li mintiqaya Tebrîz û Erdebîlê mûrîd û telebeyên wî zêde dibin. Dema ku mûrîdên wî li wê derê çêdibin, ji wî daxwaz dikin ku biçe wir. Dibêjin li vê derê bingeha kar zêdetir e. Şêx jî cihê xwe diguherîne. Di dîroka şêxtiyê de, gelek mînakên bi vî rengî hene. Dema ku şêx diçe wir, serdema deshilatiya Moxolon e. Di wê serdemê de, fikrên xwe li wê herêmê baş belav dike.

Tebrîz di wê demê de, ji bo ew qewmên ku ji Asyaya Navîn hatine bûye navendek. Cihekî avî ye û xwedî berhemên baş e. Ji bo vê ew herêm ji xwe re esas girtine. Heya salên 1000'î ew cih, beşeke erdnigariya Kurdistanê ye. Qewmên ku li vê derê jiyane û hûkim kirine, qewmên Aryanî ne, bi piranî jî Kurd in. Îro hinek Azeriyan jî weke Kurd bi nav dikin, lê hinek jî cuda pênase dikin. Di vê serdemê de Şêx Sefeyedîn, baweriya xwe li vê herêmê berfirehtir dike. Tesîra Yarsantiyê jî li wê derê zêde ye. Dibêjin, ji ber ku Şêx Sefeyedîn telebeyê

Sansahak bûye, li wê derê bi rehetî kar kiriye. Ji ber vê şêx Sefeyedîn, li heremê tê hezkirin.

Çawa ku Şêx Adî û şêx Abdûlqadîr hevalên hev û bûn û ji ber vê Êzîdî Qadîriyan hez dikin, an jî demekê bi hev re kar dikin; Yarsan jî wisa nêzikî Sefeyedîn dibin. Diyare ku şêx Sefayûdîn û Yarsanî, li wê herêmê pêk ve kar dikin û ji hev û din îstîfade dikin.

Piştî şêx Sefeyûdîn, kur û nêviyên wî Safewîtiyê berdewam dikin. Heya serdema Haydar wisa diçe. Haydar jî dibe nêviyê şêx Sefeyedîn û bavê Şah Îsmaîl e. Diyare di serdema wî de, Safewîtî êdî berv bi Şîatiyê ve diçe, guhertinek çêdibe. Di 1471'an de, ango 100 salî piştî Sefeyedîn, ew guhertin çêdibe. Her bi navê Safewîtiyê dimîne, lê bi tesîra Sûnîtî û Yarsaniyê vedigere Elewîtiyê. Pişt re jî dibe Şîagerî. Di destpêkê de dibêjin, "em Elewiyên Qizilbaş in." Hinek dibêjin, ji ber ku Yarsanî û Elewîtî yek in; dibe ku Safewîtî bi tesîra Yarsanî bibin Qizilbaş.

Jixwe Haydar, li hember Ak Koyunan şer dike û tê kûştin. Piştî wî kurê wî Şah Îsmaîl, xwe komî ser hev dike û piştî sala 1491'an hewl dide ji bo xwe dewletekê dûrûst bike. Bi vî rengî mûrîdên xwe û Safewiyan gur dike û di 1501'an de Tebrîzê digre. Navenda Ak Koyunan, jê digre û vê yekê dike bingeha dewleta Safewiyan. Lê li ser esasê Qizilbaşiyê dest pê dike. Arteşa wan jî di şer de seriyê xwe sor girê didin. Dibêjin, "em Elewî ne û alîgirên Elî ne." Di 10 salan de, gelek cihên Ak Koyunan dixe destê xwe û gelek kes li dora wî kom dibin.

Ji ber ku heya wê demê, li Rojhilatê Kurdistanê û li Azerbaycanê tesîra Yarsanî û Elewîtiyê pir zêde ye, hejmareke zêde mûrîdên Şah Îsmaîl çêdibin. Jixwe Yarsanî û Elewîtî weke yek tê dîtin. Di nava Tirk, Kurd û Farisên li wê heremê de bandora Yarsaniyê pir zêde ye. Di heman demê de Şah Îsmaîl, ji bertekên gel yên li hemberî Ak Koyunan îstîfade dike. Lewra Ak Koyunî, sûnî ne. Lê Kara Koyunî Elewî ne. Hinek dibêjin, tesîra ola Kara Koyuniyan jî heye ku Safew bûne Elewî. Piştî ku Ak Koyunî, dibin hûkimdarên herêmê li ser gel zextan dikin, da ku her kes bibe Sûnî. Ji ber vê ew kesên ku ne sûnî ne, eciz dibin û dema ku Şah Îsmaîl derdikeve jî hemû dora wî kom dibin.

Ji ber vê di 10-15 salan de, Şah Îsmaîl piraniya Kurdistan û Îranê dixe bin destê xwe. Di sala 1508'an de jî navenda Ak Koyunan, Amedê digirin û bi giştî Ak Koyunan têk dibin. Şah Îsmaîl heya Gurgum û Deryaya Spî jî diçe û beşeke Anatolyayê jî dixe destê xwe. Êdî dewleteke navendî û berfireh ava dike.

Ji aliyê din ve, di vê serdemê de çawa ku mîrtiyên Kurd çêbûne, li Anatolyayê jî mîrtiyên Tirkan çêbûne. Li gorî dîroka Osmaniyan, di sala 1299'an de mîrtiya Osmaniyan tê ava kirin. Ew mîrtî hêdî hêdî xwe pêş dixe û berfireh dike.

Di sala 1453'yan de Stenbolê digirin. Dema ku Stenbolê digirin, ew ji bo wan dibe serkeftineke mezin. Lewra Stenbol, wê demê navendeke girîng ya cîhanê ye. Her wiha beşeke zêde ya Anatolyayê jî dixin destê xwe. Piştî wê dixwazin hêdî hêdî xwe fireh bikin. Lewra êdî deshilatdariya Tataran nemaye. Deshilatdarê Ak Koyun û Kara Koyunan jî nedigiheşt cihên osmaniyan. Ew ji bo wan fersendek bû. Bi vî rengî berê xwe didin Rojhilatê Anatolyayê û dixwazin bên Kurdistanê.

Di demeke ku Safewî deshilatdariya Îran û Kurdistanê dixin destê xwe de, Osmanî jî nêzikî Kurdistanê dibin. Di wê demê de di nava mîr û civaka Kurdan de çi çêdibe? Dema ku Safewî dibin hakîm, piraniya gel kêfxweş dibe. Lewra deshilatdariya Ak Koyunan tûnd bû. Medreseyên Ak Koyunan jî cihên weke Amedê hene.

Şêx Îdrîsî Bîdlîsî, mamosteyekî mezin yê Sûnîtiyê yê wê demê ye. Demekê diçe Amedê û di medreseyên olî de li gel Ak Koyunan ders dide. Mamosteyekî ku telebeyan perwerde dike ye. Dema ku Şah Îsmaîl Kurdistanê dixe destê xwe, Şêx Îdrîsî Bîdlîsî demekê li gel xwe dihêle. Diyare ku dixwaze wî qezenc bike, lewra bixwesta dikarî bikûje. Lewra dizane ku kesekî zane ye û tesîra wî li ser civakê heye, dixwaze wî qezenc bike. Şah Îsmaîl dixwaze ku ew bibe Şîa. Şêx Îdrîsî Bîdlîsî jî nabe. Dibêje, "em hemû Misilman in, em Sûnî ne, hûn Şîa ne. Rê bidin em dersên xwe berdewam bikin." Şah Îsmaîl, rê nade ku medreseyên Sûnî berdewam bikin. Dibêje, "li cihên ku me girtine, divê her kesek bibe Şîa." Diyaloxên bi vî rengî di navbera wan de çêdibin.

Di wê serdemê de, beşeke Kurdistanê Yarsan û Elewî ne. Bi taybetî Rojhilatê Kurdistanê, li Kirmanşan, Hewreman, Erdelan û beşeke Ûrmiyê Yarsan in. Li Bakûrê Kurdistanê, herêma Serhadê, Dersîmê, heya Herêma Gurgumê beşeke zêde Elewî ne. Li mintiqaya Şêxan, Cîzre, Mêrdîn û beşeke Elih û Serhadê Êzîdî ne. Lê beşeke zêde yên mîrên Kurd, Sûnî ne. Di nava civakê de jî Sûnî hene, lê zêdetirî wan ne Sûnî ne.

Di dema Ak Koyunan de jî, mîrên Kurd û Ak Koyunan hinek derdor kirine Sûnî. Vê yekê li gel Şah Îsmaîl bertek çêkiriye. serokên xêlên Ak Koyunî, dayika wî jî birine, kirine sûnî û ji xwe mar kirine. Jixwe dema ku bi ser dikeve, dayika xwe tîne û dikûje. Dîsa kesên ku ji bo Ak Koyunan serî tewandinê, mirovên Safewiyan bin jî dikûje. Ji ber

vê yekê dibêje, “divê her kesek bibe Şîa.” Ji aliyekî din ve piranî mîrên Kurdan diçin Xoyê û bi Şah Îsmaîl re hevdîtin dikin. Mîr dibêjin, “em deshilatdariya te qebûl dikin, tu jî rê bide ku em weke xwe jiyan bikin.” Şah Îsmaîl jî dibêje, “divê an hûn bibin Şîa, an jî ez ê we bikûjim.” Hemû mîran dike binçavan. Ji ber ku ew jî nabin Şîa, demekê wan di bin çavan de digre. Ji bo her mîrtiyekê jî fermandarekî xwe dişîne, dê ew fermandar wekaleta wê mîrtiyê dikin. Wan mîran nakûje, li binçavan de digre.

Ew rêbaz ku Şah Îsmaîl dide şûxilandin bû sedem ku di encamê de zirar bibîne. Çima zirar dibîne? Yek, zaneyên weke Îdrîsî Bîdlîsî nikare qezenc bike. Du, Mîrên kurd bûn neyarê Şah Îsmaîl. Ji ber ku ew yek bertek çêdike. Dema ku Şah Îsmaîl tê, di destpêkê de di nava civakê de kêfxweşiyek heye. Lê pişt re bertek û nerehetî çêdibe. Di sala 1508’an de Kurdistan bi giştî dikeve destê Şah Îsmaîl, lê di sala 1511’an de ew mîr hatine girtin. Piştî vê demê bertek zêde dibe.

Di sala 1512’an de Sultan Selîm dibe hûkimranê Osmaniyan. Sultan Selîm Kesekî fetihkar e. Nêzikî 8-9 salan hûkim kiriye, lê ew dema kurt de Osmaniyan gelek cih fetih kirine. Dema Sultan Selîm dibe hûkimranê Osmaniyan, têkiliyên xwe bi Kurdan re pêş dixe. Du rêbazan dide şûxilandin; yek, girîngî dide medrese û meleyên olî; ya duyem jî têkiliya xwe bi mîr û zaneyên Kurd re pêş dixe. Bi taybetî bi Îdrîsî Bîdlîsî re têkiliyan pêş dixe.

Di wê demê de diyare ku Îdrîsî Bîdlîsî jî, ji Şah Îsmaîl bê hêvî bûye. Ji ber vê diçe gel Sultan Selîm. Bi Sultan Selîm re lihev dikin, da ku Sultan Selîm bê Kurdistanê û Kurdan ji zilma Şah Îsmaîl rizgar bike. Li gorî peymanê dê Kurd alîkariya wî bikin, dê ew jî alîkariya Kurdan bike. Bi şertê ku pişt re rê bidin ku medreseyên Kurdî û mîrên Kurd weke berê hebûna xwe berdewam bikin. Li ser vê esasê îtîfaq dikin.

Îdrîsî Bîdlîs, di sala 1513’an de vedigere Kurdistanê, da ku vê mijarê bi mîrên Kurdan re nîqaş bike. Hejmareke zêde mîrên Kurdan dibîne, hin çavkanî dibêjin 28, hinek jî dibêjin 34 mîran ew peyman qebûl kirine. Jixwe Îdrîsî Bîdlîsî weke nuner tê erkdar kirin ku van karan bi rê ve bibe. Li ser vê esasê Şêx Îdrîs belgeyekê peymanî îmza dike. Ew belge hê jî heye. Ji çend xalan pêk tê. Li gorî vê peymanê;

1-Sultan Selîm û mîrên Kurdan alîkariya hev dikin ku Şah Îsmaîl bixin û ji Kurdistanê derbixin.

2-Dema ku Şah Îsmaîl ji Kurdistanê derxistin, Sultan selîm deshilatdariya herêmî ya mîrên Kurdan qebûl dike û mûdaxaleyî wan nake.

3-Di her dema ku mîrên Kurdan ketin bin xeteriyê de divê Sultan Selîm alîkariya wan bike. Dema ku Sultan Selîm bi xeteriyan ve rû bi rû bimîne, divê mîrên Kurdan jî alîkariya wî bikin.

4-Ger di navbera mîrên Kurdan de pirsgirek çêbûn, divê Sultan mûdaxale neke. Ango divê bêalî bimîne. Ger ji wî hakemî bê xwestin, divê mûdahîl bibe…


Komek xalên bi vî rengî hene. Mîrên Kurd vê belgê îmza dikin û şêx Îdrîs vê belgê dibe gel Sultan Selîm û ew jî qebûl dike. Li ser vê esasê di sala 1514'an de Sultan Selîm hêza xwe kom dike û berê xwe dide Kurdistanê, da ku Kurdistanê bi dest bixe. Mîrên Kurd jî xwe amade dikin, da ku pê re bibin alîkar.

Tiştê ku di vê derê de diyare, ew îtîfaq veşartî bûye. An jî pir hostatî kirine, lewra Safewî pê nehesiyane. Îtîfaq çêbûye, arteşa Osmaniyan gihêştiye nîvê Kurdistanê, hê jî agahiya Safewiyan pê tune bûye. Ew tiştekî girîng e. Bi vî rengî, Sultan Selîm di şibatê de îtîfaqê qebûl dike û heya tebaxa 1514'an arteş digêhêje Çaldiranê. Di destpêkê de mintiqayên Edene, Gurgum û wan deran xwe komî ser hev dikin. Heya ku digêhêjin Çaldiranê, arteşa wî dibe 200 hezar kes. Beşeke zêde jî leşkerên mîrên Kurd in.

Di wê demê de Şah Îsmaîl xwe amade kiriye, li mintiqaya Sîne, berv bi Başûrê Îranê ve diçe. Dema ku xeber digre ku arteşa Osmaniyan ketiye Kurdistanê, vedigere. Heya ku vedigere û diçe ku pêşiya arteşa Osmaniyan bigre, arteşa Osmaniyan digêhêje Çaldiranê. Li wê derê digêhêjin hev. Diyare Şah Îsmaîl dereng xeber digre. Divê heya ku arteşa Osmaniyan bigêhêje Çaldiranê, li cihên din berxwedan çêbûbûye. Lê berxwedanek çênabe, hin nunerên Şah jî li Amedê ne, lê têk diçin.

Dema ku Osmanî û Safewî li Çaldiranê tên hemberî hev, dibêjin Şah Îsmaîl kariye 25 hezar leşker kom bike û biçe şer; Osmanî zêdetir bûne. Hem hejmara Osmaniyan zêde bûye, hem Safewî ne amade bûne, hem jî mîrên Kurdan li aliyê Osmaniyan bûne; ji ber van sedeman Osmanî ser ketine. Hêzên Safewiyan têk diçin û Osmanî heya Tebrîzê tên û wê derê jî digirin.

Lê Şah Îsmaîl naye kûştin û beşeke hêzên xwe derbas dike. Carake din oldar û pêşengên Şîa kom dike, hêzên xwe radike ser piyan û êrîşî Osmaniyan dike. Gelek cihan vedigerîne û Osmaniyan heya derdora Bêdlîsê derdixe. Bi vî rengî hinek hêza xwe jî diparêze. Lê di destpêkê de paytexta wî jî dest diçe.




Şerê Çaldiran ku di dîrokê de pir behsa wî tê kirin, dibe sedem ku Kurdistan bibe du beş. Mîrên Kurdan, dixwazin ku Kurdistanê ji destê Safewiyan derbixin û bi Osmaniyan ve bibin mûtefîq; lê ji ber ku Safewî bi giştî naşken, şer timam nabe û beşeke Kurdistanê careke dîtir di destê Safewiyan de dimîne. Gelek carên din di navbera Osmanî û Safewiyan de pevçûn û şer hene. Çûn û hatin çêdibin; car caran Safewî heya Amedê diçin, carna Osmanî heya Ûrmiyê diçin. Lê ew sînorê ku niha di navbera Rojhilatê Kurdistanê û Bakûr-Başûrê Kurdistanê de bi awayekî amelî dibe sînorê Safewî û Osmaniyan.

Ji ber vê tê gotin; şerê Çaldiran, Kurdistan kir du beş. Lê heya sala 1639'an ku peymana Qasr-i Şîrîn çêdibe, wisa berdewam dike. Di vê peymanê de jî bi awayekî fermî Osmanî û Safewî sînorên hev û din qebûl dikin. Di wê demê de Bexda û Başûrê Kurdistanê di destê Safewiyan de maye, lê di serdema Sultan Murat de, Osmanî van herêman jî digirin. Bi awayekî fermî yekem carê Kurdistan, parçe dibe û sînor dikevin navbera Kurdistanê. Bi emelî di şerê Çaldiran de çêdibe, lê bi awayekî fermî di peymana Qasr-i Şîrîn de Kurdistan parçe dibe.

Di vê serdemê de hevkirina Kurd û Tirkan, careke din dibe rojev. Ew girîng e. Ger mirov taybetmendiyên wê demê binêre, mirov di çarçoveya mîlîgeriyê de nanirxîne. Tiştê ku diyare, li herêmê du deshilat-

darên mezin ku dixwazin li ser Kurdistanê hûkim bikin hene. Yek bi tûndî tevdigere, yek jî bi nermî tevdigere. Şêx Îdrîs jî li ser vê esasê dixwaze bi wan deshilatdaran yekî re bikeve îtîfaqê. Da ku zext li ser milet kêmtir bibe, bikaribin deshlatdariya xwe biparêzin û olê xwe belav bikin. Osmanî zêdetir ji vê rewşê re vekirîne.

Em jî îro dikarin li gorî rewşa xwe binirxînin. Rêber Apo dibêje, "çi Tirk dibin, çi jî Ereb û Fars; yên ku mafê Kurdan nas dikin re em amade ne ku îtîfaq bikin." Ger em mahne nedin îtîfaqa Şêx Îdrîs, wê demê em mahne nedin helwesta Serokatî û îtîfaqên xwe jî. Ger tu bi vîn îtîfaq bikî, ne tiştekî xirab e. Tiştê ku diyar, Sultan Selîm û mîrên Kurd bi vîna xwe îtîfaq kirine. Xwestine bi Şah Îsmaîl re jî îtîfaq bikin. Lê Şah Îsmaîl bi îtîfaqeke wisa re ne amade bûye. Ji ber vê bi Sultan Selîm re îtîfaq kirine.

Bi van sedeman, pêwîst nake ku em Şêx Îdrîs re bibêjin xayin ûhwd. Di demên derbasbûyî de, tiştek nedima ku me ji bo Şêx Îdrîs nedigot. Lê hin tişt hene ku divê mirov Şêx Îdrîs û mîrên Kurdan rexne bike. Mesela di wê demê de mijarek heye; Sultan Selîm dibêje, "ez nikarim bi hemû kesan re bikevim têkiliyê. Di nava xwe de yekî bikin mîrê mîran, bila bi min re bikeve têkiliyan. Dema ku ez bixwazim li Kurdistanê tiştekî bikim, bila mûhatabekî min hebe." Lê mîrên Kurdan kesî diyar nakin.

Diyare ku tu kes yekî din ji ser xwe re nabînin, her kesî weke hev û din dibînin. Dibêjin, "bila Sultan bi xwe yekî diyar bike." Mirov dikare vê rexne bike, sedema vê çi ye? Ger mîrên Kurdan, yekî diyar bikin û yên din jî dora wî bicivin, ew dibe tevdîrek. Ger sibê têkiliyên Osmanî û Kurdan xirab bibin, dikarin bi hev re tevbigerin. Lê ger pêk ve nebin, deshilatdariya Osmanî dikare wan yek bi yek bifetisîne. Jixwe pişt re jî wisa dibe. Ew nêzikbûneke şaş e. Îdrîsî Bîdlîsî jî wisa nekiriye.

Dibêjin, Şêx Îdrîs pir zêde têkilî karên siyasî nedibûye, karên olî re mijûl dibûye. Berê qarekterekî bi vî rengî yê şêxan hebûye. Îdrîsî Bîdlîsî jî xwestiye tenê bi medrese û karên olî re mijûl bibe. Mîran jî bi hev nekiriye. Ew xaleke lewaz e. Bi têkiliyên nav xweyî re jî girêdayî ye. Ger hevkirinek bikirana kesî nedikarî tiştekî jî bibêje. Îro ve jî girêdayî ye. Serokatî dibêje, "wisa kirin ku êdî du Kurd nikarin bên gel hev û din."

Ew pêvajo bû bingeh ku li Kurdistanê hinek guhertinên din çêbibin. Piştî parçebûna Kurdistanê ku di sala 1514'an de çêbûye û heya 1800'î rewşa Kurdistanê çawa bûye, mirov dikare bigre dest. Kurdistan

bi awayekî amelî bûye du beş. Li beşa Rojhilatê Kurdistanê tesîra deshilatdariya Safewiyan hebû. Li beşa Rojava jî tesîra deshilatdariya Osmaniyan hebû.

Osmaniyan ji bo çi ew îtîfaq kiribûn? Da ku Kurdistanê bixin bin destê xwe û erdnigariya xwe fireh bikin. Ya duyemîn jî ger Kurdistan bigirtana, ji bo girtina Şam û cihên din yên Rojhilat rê vedibû. Jixwe piştî wê Şam û Misir girtin. Armanca Osmaniyan ew bû. Armanca Kurdan jî, diyare mîrên Kurd dixwest li herêma xwe rehet jiyan bikin û jiyana xwe ya xwezayî bidomînin.

Li Rojhilat, ji 1501'ê heya 1722'yan deshilatdariya Safewiyan hebû. Ew deshilat, deshilatekî navendî bû. Dixwest hemû civakê qontrol bike û fereset û ola Şîatiyê pêş bixe. Dixwest hemû civaka Îranê bike Şîa. Di wê demê de civaka Rojhilatê Kurdistanê, bi rewşeke zehmet ve rû bi rû mabû.

Mîrtiya Lora Biçûk hebû; di serdema Şah Abas de, ji ber ku Yarsanî û Şîatî nêzikî hev bûn, her çiqas alîkariya Safewiyan dikirin jî, Şah Abas bi giştî ew mîrtî qontrol kir. Êdî ne weke mîrtiyeke serbixwe bû. Şah Abas dixwest, guhertina mîr jî bi xwe bike. Ango weke waliyên xwe nêzikî wan dibû. Çend caran êrîşî ser wan dike û careke dîtir îtîfaq dikin. Bi kurtasî mîrtiyê bi giştî ranake, lê wan qontrol dike. Hêdî hêdî li ser wan kar dike ku Yarsaniyê jî bizivirîne Şîatiyê. Jixwe îro jî dema ku mirov diçe wê heremê, gelek kes hene ku di van 100 salên dawî de dev ji Yarsaniyê berdane û bûne Şîa. Gelek malbatên ku xwe bi vî rengî guhertine û bûne Şîa hene. Hê dilê wan Yarsanî ye, lê bi awayekî fermî xwe guhertine. Jixwe di serdema Kara Koyunah de Lora mezin têk dibin, di serdema Safewiyan de jî Lora Biçûk bi giştî qontrol dikin.

Ji aliyê din ve Şahên Safewî pir bi tûndî ji mîrtiya Erdelan re dan û stendin dikin. Ji ber ku neçar dimîne, mîrê Erdelan demekê ola xwe diguherîne. Mîrê Erdelan Sûnî ye, lê şah Abas wan neçar dike ku bibin Şîa. Lê ew demeke kurt berdewam dike, pişt re careke din dibin Sûnî. Ji bo vê Rêber Apo dibêje, "li hemberî Osmaniyan Elewîtî û Şîatî weke olekî berxwedanê ye, li hemberî Safewiyan jî li Rojhilatê Kurdistanê Sûnîtî weke berxwedanekê ye."

Di vê demê de Erdelanan jî qontrol dikin. Ew jî serdema Şah Abas e. Jixwe Şah Abas, ji 1588'an heya 1629'an texrîben 40 salan hûkim dike. Şahê herî zalim e. Di dîrokê de jî tê gotin ku Şah Abas, kesê ku herî zêde mûhendisiya civakê kiriye. Dibêjin, Mistefa Kemal û Riza Şah, ji Şah Abas fêrî mûhendisiyê bûne. Lewra di serdema wî de li gelek cihan, milet hatiye guhertin. Mesela navberekê Serhad xistiye bin

destê xwe, milet li wir biriye û li Xorasanê bi cih kiriye. Ji ber ku ew Elewî bûne, ew birine heremên şer û ji xwe re kiriye çeper. Ji milê Sîne wan deran, xelk biriye milê Xazar. Bi vî rengî cihê mirovan guhertiye. Li gorî aqlê xwe, tiştên ku dibin sedemê deshilatdariya wî pêk anîne.

Di heman demê de zext û zilm kiriye ku wan vegerîne ser ola xwe. Heya serdema Şah Abas, beşeke Başûrê Loristanê hê jî di destê Erdelanan de bûye. Mîrê Baban jî nû bi nû dûrûst dibûye. Piştî şerê Çaldiran mîrtiya Baban dûrûst bûye û di destpêkê de tenê li derdora qeladizê ye û biçûk e. Lê Erdelan mîrtiyeke berfireh û kevn e. Şah Abas dixwaze her tim qontrol bike.

Di heman demê de wisa nêzikî mîrtiya Biradost jî dibe. Emîrxanê Lepzerîn mîrekî ku di navbera xêl û hozên vê herêmê de yekîtî dûrûst dike ye. Li heremê Biradost; li aliyê Rojhilatê Kurdistanê û heya şemzînanê mîrtiya xwe mezin dike. Di wê demê de, li wê derê Elewî, Yarsan, Sûnî hene. Ne weke ya îro ye. Emîrxan hemû xêl û hozên vê heremê komî ser hev dike. Di heman demê de alîkariya Şah Abas jî dike. Lê piştî demekê ji bo ku deshilatdariya Emîrxan mezin dibe û gelek kes hûrmet nîşan didin. Hinek jî dibêjin, dixwaze bibe Şah. Ji ber vê jî Şah Abas tahamûl nake ku mîrekî wisa hebe.

Wê demê Şah Abas dixwaze hinek Tirkmenan bîne û li wan herêman bi cih bike. Xeber dişîne Emîrxan re û dibêje, “hinek xelkên bi vî rengî hene, divê bên herema te, cih amade bike.” Emîrxan jî dibêje, “cih û îmkana min tune ye.” Lewra Emîrxan dizane ku ger ew xelka bi vî rengî biçin gel wî, li ser wî dibin bar û pirsgirek. Dema ku Emîrxan, wan qebûl nake; Şah Abas dibêje, wisa be Emîrxan emrê min qebûl nake. Rûxmî ku Emîrxan, salên dirêj alîkariya wî kiriye; dîsa jî êrîşî ser wî dike.

Di sala 1605’an de êrîş dike, nêzikî saleke ablûqa û êrîş li ser Keleha Dimdimê berdewam dikin. Niha Keleha Dimdimê bûye çîrok, pirtûk jî li ser hatine nivîsandin. Di pirtûkan de hinek nêrînên cuda hene. Ereb Şemo bi Kurdiya Rûsî nivîsandiye. Lê bi çend zimanên cuda vegerandin heye, ji ber vê cudabûn jî hene. Lê tiştê diyar ew e; Şah Abas êrîşî ser Keleha Dimdimê dike, xelkê Keleha Dimdimê jin û mer pêk ve li hemberî deshilatdariya Îranî nêzikî salekê şer dikin. Deshilatdariya Îranê û hêzên Şah Abas bê teqat dimînin.

Di dawiyê de bi sedema xiyanetê ava ku diçe kelehê tê dîtin û qutkirin. Bi vî rengî jiyana kelehê xirab dike.  Ji bo avê bibînin, neçar dimînin ku kom bi kom derkevin derve, lê yên ku derdikevin tên kûştin. Di encamê de neçar dimînin ku berxwedaneke sîng bi sîng bi-

kin. Hinek dibêjin hemûyan bi hev re êrîş kiriye û hatine kûştin; hinek dibêjin leşkerên Îranê êrîş kirine, yên ku şer kirine hatine kûştin, yên ku şer nekirine an xwe kûştine, an jî xwe şewitandine. Bi vî rengî berxwedaneke giştî di nava kelehê de dûrûst bûye.

Ji bo dîroka mirovahiyê jî girîng e. Kêm cihan wisa li bajar, an jî cihekî hemû gel pêk ve berxwedan çêkiriye û di dawiyê de jî ji bo ku radest nabin xwe dikûjin. Hinek nêrîn hene ku hinek radest bûne, lê ew nêrîn jî naye piştrast kirin. Ew berxwedan jî di dema Şah Abas de çêbûye.

Weke netîce em dikarin bibêjin, deshilatdariya Şah Abas ya wê demê qontrolkirin û pelçiqandina civakê ye. Milê îdarî ve qontrolkirin û ji milê baweriyê ve weke xwe kirin e. Ew dibe sedem ku li Rojhilatê Kurdistanê, di ol û mezheban de hinek guhertin çêbibin. Di vê pêvajoyê de, beşeke zêde ya Rojhilatê Kurdistanê, neçar mane ku ji Yarsanî û Elewîtiyê vegerin Şîatiyê.

Şîabûna Azeriyan jî di vê serdemê de timam dibe, Azerbaycan êdî bi temamî dibin Şîa. Hejmareke kêm ya Yarsanî maye, lê bi piranî bûne Şîa. Li Kurdistanê ji Kirmanşan û jêrtir bi piranî dibin Şîa. Niha jî hinek tên guhertin. Li mintiqaya Erdelan, hinek guhertin heye; lê Sûnîtî derdikeve pêş. Wê jî hinek bi mayina deshilatdariya Erdalan ve girê didin. Yek jî dibêjin ji ber ku sînorên wan bi Baban û Osmaniyan ve he ne, pir guhertin çênebûye. Lewra hem Babanan li dijî Osmaniyan, ji Safewiyan piştgirî girtine; hem jî Erdelanan li dijî Safewiyan ji Osmaniyan piştgirî girtine. Ew rewş bûye piştgirî ku hem di ol de, hem jî di ziman de pir zêde guhertin çênebin.

Li hemberî hemû tûndiyan jî, nebûne Şîa û her Sûnî mane. Ji bo vê Serokatî dibêje, “Sûnîtî, li Îranê li dijî deshilatdariyê dibe nunera berxwedanê.” Beşeke Erdelan Yarsanî ye, lê jêrî Kirmanşanê Şîa zêdetir in.

Tiştekî balkeş, Azerbeycanî hemû bûne Şîa, lê Kurdên wê derê bûne Sûnî. Hinek dibêjin, ji ber sedema êrîşên Safewiyan yên li ser Biradost û Keleha Dimdimê bertek ava kiriye û bûne Sûnî. Hinek jî dibêjin, Osmanî bûne sedem. Ew mijareke lêkolînê ye. Mesela cihekî weke Ûrmiyê Azerî hemû dibin Şîa, lê Kurd çima dibin Sûnî? Guhertineke demografîk ya bi vî rengî li heremê çêdibe.

Mirov dikare bibêje 200 salî deshilatdariya Safewî, li herêmê li gorî xwe bişavtinek pêş xist. Bişavtin ne li ser esasê neteweyekê ye, li ser esasê ol e. Di sedsala 20’emîn de bişavtin û entegresyon, li ser

esasê nijadperestiyê û netewe pêş dikeve; lê di serdema Safewiyan de li ser esasê mezhepgeriyê pêş dikeve.

Piştî ku deshilatdariya Safewî têk diçe, nêzikî deh salan Efganî li Îranê hakîm dibin. Kurdistanê jî dixin bin destê xwe. Di navbera 1722'yan heya 1730'î Safewî lewaz dibin û Efganî li Îranê hûkim dikin. Ew pêvajo pir dirêj nake, Efganî jî dixwazin li gorî xwe Îranê bi pergal bikin, lê ji ber ku pir namînin pir bandora wan namîne.

Piştî salên 1730'î Nadirşahê Şahê Evşarî derdikeve. Ew lewaziya ku li Îranê heye, dinirxîne û di demeke kin de dibe paşayê Îranê. Heya sala 1747'an hemû Îranê dixe bin destê xwe û dixwaze deshilatdariyeke navendî dûrûst bike. Pergala herêmî û bacî careke din rêxistin dike û li gorî wê xwe ava dike. Ew mîrtiyên ku hene, dixwazin careke din serî rakin, wan dihencixîne. Piştî Nadîr Şah kur û neviyên wî lewaz dibin, nikarin weke wî îdare bikin.

Malbateke Kurd ya herêma Lek derdikeve ser textê dîrokê. Ji wan re dibêjin malbata Zend. Pêşengê wan jî Kerîm Xanê Zend e. Ew malbata, li herêma Kirmanşan û Xuremabad hozeke ku bi navê Zend tên naskirin in. Li herêma xwe, rêveberiya wan heye. Di serdema Kerîm Xan de li herêmê valatî heye. Diyare ku Kerîm Xan jî mirovekî zîrek û baqil e. Hêdî hêdî Kurdistan û Îranê dixe bin destê xwe. Ji sala 1752'yan heya sala 1759'an li hemû Îranê hûkim dike.

Tiştê ku diyare Kerîm Xan, xwe weke şah îlan nake. Di pergala Îranê de kî dibe hakîm, xwe Şah îlan dike. Şahnemeya Fîrdewsî jî bingeha xwe ji wir digre. Lê Kêrîm Xan, navê xwe dike Wekîlî Rîwaye. Dibêje, "ez wekîlê xelk im." Ew serdema Kerîm xan de, li Îranê deshilatdarî û pergaleke nerm pêş ketiye. Otorîteyeke navendî tûnebûye, Kerîm Xan bi şexsiyeta xwe dikariye hûkim bike. Lê piştî ku Kerîm Xan dimre, di navbera kur û birayê wî de pirsgirek derdikevin. 15 salan hûkmê wan berdewam dike, lê pir lewaz in.

Heya 1795'an hûkmê wan bi lewazî berdewam dike, lê keleka wan Mihemed Axayê Qacarî derdikeve. Dibêjin di serdema Kerîm Xan de, kesekî rêzdarbûye. Kerîm Xan jî bi hûrmet û rêz nêzîkî wî bûye, lê dema ku Kerîm Xan dimre di 1781'an de hêdî hêdî leşkeran ji bo xwe kom dike û xwe rêxistin dike. Dema ku dibîne kur û birayên Kerîm Xan lewaz in, xwe ava dike û beşeke Îranê dixe destê xwe, di sala 1795'an de giştî Îranê dixe destê xwe û pergala deshilatdariya Qacarî çêdike.

Ew deshilatdarî jî heya sala 1925'an berdewam dike. Deshilatdariya Qacarî bû pireyeke deshilatdariya Safewî. Qacariyan xwestine per-

gala Safewiyan careke din zindî bikin. Lewra di serdema Kerîm Xan wan de, sîstema îdarî hinek nerm bûye û gel bi rehetî jiyan dikin.

Piştî Safewiyan heya têkçûna Qacariyan, li Rojhilatê Kurdistanê hinek pêşketin çêdibin. Wêjeya Kurdî, bi zaraveya Hewremî û Kurmanciya Jêrîn pêş dikeve. Piştî salên 1750'î Xanekûbadî destana “Şîrîn û Ferhat” bi Kurdî dinivisîne. Mewlewî wan li herêma Hewreman pêş dikevin. Li mintiqaya Erdelanan wêje pêş dikeve. Herêma Erdelan carake din zindîbûnê jiyan dike. Rûxmî ku di sedsalên 16-17'emîn de di civak û wêjeya Kurdî de tevngavbûn heye, di sedsala 18'emîn de hinek vebûn çêdibin.

Di vê serdemê de formê deshilatdariyê bi giştî me behs kir. Di forma deshilatdariya giştî ya Safewî û Qaçariyan de cihê Kurdan tune. Lê ew dema ku valatî çêdibe de, weke Kerîm Xan risteke berfireh dibîne. Di formê deshilatdariya herêmî de, mîrtiyên Erdelan, Lor û Biradostî hene. Lê formê deshilatdariya heremî tê teng kirin. Di heman demê de jiyana civakî tê teng kirin. Ji milê baweriyan ve 400 salî zêdetir, bi awayekî pergal guhertina rêolan heye. Hem di serdema Safewiyan de, hem jî di serdema Qaçariyan de beşeke zêde ya civaka Kurd, ji milê zîhniyet û baweriyê ve gorankarî jiyan dike.

Ew formê ku îro li Rojhilatê Kurdistanê heye, wê demê hatiye avakirin. Di formê civaka Rojhilatê Kurdistanê de çi diguhere? Berê di nava civakê de yên pêşeng Key bûn, niha Keyxêya ku heye, ji wê derê tê. Dibêjin Keyxeda, Keybanû. Niha jî ew têgeh di nava Kurdan de tên şûxilandin. Ew ûslûp, ziman û çand di nava Kurdan de winda dibe, niha pir kêm maye. San di civaka Kurd de, weke berpirsyarê herêmî û berpirsyarê hoz tê karanîn, lê di ew çend sed salan de winda bûye. Ji milê olî ve pîrtî, magî û mûxtî êdî winda dibin. Di nava Elewiyan de pîrtî hinek tê karanîn, xeynî wê nemaye. Ew çand û zaravayên civaka Kurdistanê ne, lê bi tesîra terîqat û mezheban hêdî hêdî winda dibin.

Cihê wan êdî şêx, seîd, mele, hecî û hwd tê şixûlandin. Ji destpêka Îslamê ve, lê bi taybetî ew 400 salên dawî ew têgeh di nava civaka Kurdistanê de bi cih dibe. Kesên di nava civakê de, êdî dixwazin bibin hecî, şêx, mele û seîd. Mesela di nava Êzîdiyan de şêxtî pêş ketiye, berê tiştekî wisa tune bûye. Di nava Ereban de şêx, tê mahneya pêşengên eşîran, lê di nava Kurdan de bûye pêşengê olî. Dema ku Ereb hatine Kurdistanê, ji ber ku pîroz hatine dîtin, şêxan re gotine kesên pîroz in. Lê di nava Ereban de şêxtî ne meseleyeke olî ye. Em çawa dibêjin keka, seyda, mezinê min; ew jî di wê mahneyê de bi kar tînin.

Ew têgeh hem bi terîqeta Qadirî, hem jî bi çanda giştî ya Îslamê dikevin nava civaka Kurdistanê.

Li Rojhilatê Kurdistanê, peyva Xan jî zêde dibe. Xantî têgeheke Asyayî ye, Tirk jî pir didin şixûlandin. Gelek mîrên Kurd, êdî bi navê Xan tên naskirin. An jî dibin Beg. Begtî hinekî din weke xanêdanên biçûk tên karanîn. Ew jî ji Begiya Tirkmenî ketiye nava civaka Kurd. Bi vî rengî lîteratûr jî tê guhertin.

Ne tenê ji bo Rojhilatê Kurdistanê, li hemû Kurdistanê tesîra çanda Tirk, Ereb û Farisan zêde dibe. Ji ber ku Ereb yên ku Îslam anîbûn, ziman û çanda wan esas hate girtin. Zilamên Kurd, bi taybetî kesên mezin, cilên Ereban ji bo xwe esas girtin. Ew cilên abayî ne. Di nava jinan de, bi piranî yên ku li bajaran rûdinin, cilên Ereban ji bo xwe esas girtin, êdî cilên Kurdî kêmtir dibûn. Lê heya vê dawiyê jî jinên Kurd, cilên Kurdî zêdetir parastine. Zilamên Kurd zêdetir, cilên Erebî xwe kirin. Lê niha jinên Kurd jî, cilên Kurdî naparêzin; hem ji cilên Erebî, hem jî cilên Ewropaî bandor bûne. Bi vî rengî heya sedsala 19'emîn, hem demografî, hem jî di çanda Kurdî de guhertin çêdibin. Jixwe îro berçav e, tiştên Kurdînî kêmtir bûne.

Di dema ku li Rojhilatê Kurdistanê ew rewş dihat jiyankirin, li Rojavayê Kurdistan (cihên di bin serweriya Osmaniyan de) rewşeke dijber hebû. Ji ber îtîfaqa mîrên Kurd û Osmaniyan, rehetiyek di nava mîrên Kurd û civaka Kurdistanê de hebû. Lê naye wê mahneyê ku li Rojavayê Kurdistanê tu pirsgirek tune bûn. Mesela mîrtiya Bîdlîsê, mîrekî xurt bû. Di nava wan û Osmaniyan de hinek nakokî derketin û bû sedem ku li hemberî mîrtiya Bîdlîsê jî bisekinin. Bîdlîs cihekî olî ye, dibistanên olî pir zêde ne. Hem ji milê olî ve, hem jî ji milê îdarî ve mîrtiyeke xurt bû. Dixwestin ku di navbera Osmanî û Safewiyan de deshilatdariya wan xurtir be.

Wê demê nunerê Sultan Selîm jî li Amedê hatibû diyar kirin. Ew kesê ku nunertiya Sultan Selîm dikir, carna lingê xwe zêde dirêj dikir. Mîrtiya Bîdlîsê jî nêzikî wir bû û ji ber ku ji xwe bawer in, nerehetiya xwe tanîn ziman. Her wiha mîrtiya Bêdlîsê têkiliyên xwe li gel Safewiyan qut nakin. Lewra sînore û ditirsin, ger şer bibe dibe ku ew biçin. Ew dibe sedem ku di sala 1516'an de Osmanî li mîrtiya Bêdlîsê bidin. Ji ber vê Bîdlîsî dikevin nav tengasiyê. Jixwe malbata Şerefxanê Bêdlîsî ji ber vê yekê koçber dibin û diçin Îranê. Piştî 60-70'î salî vedigerin, lê mîrtiya wan êdî lewaz dibe. Dervayî mîrtiya Bîdlîs, mîrtiya Çemîşgezek ku Elewî ne, mîrtiya Dasnê ku Êzîdî ne; mîrên din hinek rehet jiyan dikin.

Li Îranê, deshilatdariya giştî împaratoriya olî û mezin bû. Ew împaratorî Şîa bû. Deshilatdariya heremî jî mîrtî bû, lê lewaz bûn. Li Osmaniyê forma deshilatdariya giştî împaratoriya Sûnî bû. Rojavayê Kurdistanê (Kurdistana Osmaniyan), formê deshilatiyê, an jî forma deshilatdariya herêmî jî; dewletên herêmî û mîrtî bûn. Osmaniyan li Kurdistanê, Erebîstanê û cihên dîtir mîrtî pêş xist. Di mîrtiyan de, deshilatdarên xweser hebûn. Em dikarin bibêjin otonom bûn.

Di nava împaratoriya giştî ya Osmaniyan de rista Kurd heye, lê kêm e. Mesela mirovên Kurd diçin û dibin fermandar; lê risteke wan ya pir diyarker tune ye. Di nava Safewî û Qaçaran de rista Kurdan qet tune bû. Lê li Rojavayê Kurdistanê, Kurd herêmên xwe rê ve dibin. Ji salên 1514'an heya salên 1850'î texrîben 350'î salî di nava Osmaniyan de deshilatdariyên herêmî û mîrtî hene. Ango di vê demê de formê deshilatdariyê li Kurdistanê heye. Mîrtiyên Botan, Hekarî, Mûtkî, Xîzan, Soran, Amedî, Baban, Bêdlîs, Çemîşgezek, Heskîf, Dasnê di serdema Osmaniyan de hene.

Ji van mîrtiyan, mîrtiya Bîdlîsî demekê bi Osmaniyan re pirsgirekan jiyan dike, pişt re weke mîrtiyeke olî berdewam dike. Îro jî tesîra xwe diparêze. Lê ji milê îdarî ve lewaz dibin.

Mîrtiya Çemîşgezek, mîrtiyek Elewî ye. Heya 50-60 salî Osmanî li ser wan zextan dike, da ku ola xwe biguherin. Lê naguherînin, pişt re hêdî hêdî li hev dikin. Mîrtiya xwe berdewam dikin, lê lewaz dibin. Mîrtiya Dasnê, mîrtiyeke Êzîdî ye. Dem bi dem bi Osmaniyan re dikevin têkiliyan. Dem bi dem Osmanî li ser wan fermanan derdixin. Niha Êzîdî behsa 72 fermanan dikin. Zêdetirî van fermanan di dema Osmaniyan de, ji bo van mîrtiyan derdikeve. Hêdî hêdî ew mîrtî tê guhertin. Jixwe herî dawî mîrtî tê rakirin. Di navbera salên 1514'an û 1850'î de beşeke zêde Kurdên Êzîdî dibin Misilmanên Sûnî.

Dervayî van her sê mîrtiyan, mîrtiyên din bi awayekî xweser berdewam dikin. Li vir divê girêdayî Elewiyan mirov hinek tiştan bibêje. Di van deman de Gurgum (Mereş), Qoçgirî, Dersîm û heya Erzurumê beşeke mezin Elewî ne. Deshilatdariya Osmaniyan vê qebûl nake, lewra ew ji bo Safewiyan dibin hêz. Dema ku Safewî êrîşî Osmaniyan dike, hinekên wan diçin gel Safewiyan. Jixwe beşeke wan, Safewî dibin milê Xorasanê. Hem ji milê Rojhilatê Kurdistanê, hem jî ji milê Rojavayê Kurdistanê ve gelek Kurdên Elewî dibin milê Xorosanê.

Hem ji ber ku li hemberî Osmaniyan ber xwe didin, hem jî ji ber ku têkiliyên wan bi Safewiyan re hene; Osmaniyan êrîşî Elewiyên van herêman dikin. Dixwazin wan qontrol bikin. Bi du rêbazan dixwazin

qontrol bikin; yek, bi tûndî û tepisandinê nêzik dibin. Dudu, rêbaza Bektaşîbûnê pêş dixe.

Hacî Bektaşî Velî, piştî sala 1520'an destpêkê li Şamê dergahên Bektaşî pêş dixe. Piştre bi riya Yenî Çeriyan, Elewîtiya Bektaşî tê pêş xistin. Hêdî hêdî beşeke Elewiyan dikin Bektaşî. Bektaşî, dibe mezhebê Elewiyan yê deshilatdariyê. Heya îro jî hene. Elewî bi eslê xwe Kurd in, Azerî û Tirkmen in. Di destpêkê de Tirkên Elewî tûnebûn. Lê pişt re ew jî pêş dikevin. Bi riya Bektaşiyê bûn Elewî. Beşeke Tirk, beşeke Kurd, beşeke Azerî bûn Elewiyên Bektaşî. Yên ku bûn Bektaşî bi Osmaniyan ve tên girêdan û dibin deshilatdar. Osmaniyan bi vî rengî li ser Elewiyan kar dikin.

Beşekê kêm dikin Sûnî, piranî jî dikin Bektaşî. Ji bo ku Elewiyan bike alîgirên xwe rêbazeke wisa da karanîn. Vê rêbazê hinekî encam jî girt. Di serdema Cumhuriyetê de Mistefa Kemal jî konevaniyeke wisa meşand, niha piraniya Elewiyan bûne mezhebê deshilatdariyê. Bi navên cûda bûn alîgirên deshilatdarî ye. Deshilatdariyeke Sûnî bû, lê Elewî wisa bûn alîgirên wî. Wê demê ne pir bûn, beşek bû. Lê tesîr dike, piştî 1550'î Elewî hêdî hêdî lewaz dibin.

Ji bo Dasnê jî çend rêbaz dan karanîn. Yek, ferman bûn. Li ser wan ferman derdixistin û çavên wan ditirsandin. Ji aliyê din ve stendina bacê bû. Yekî ku ne Êzîdî ye, bac jê nagrin; lê yên Êzîdî bac digirin. Ew li ser Êzîdiyan tesîr dike. Ji aliyekî ve jî li herêmên wan, di navbera Kurdê Êzîdî û Sûnî de nakokî pêş xistin. Mesela di navbera Kurdên Soran û Kurdên Dasnê de pir mişqûle çêkirine. Bi vî rengî Êzîdî, hêdî hêdî kêm kirin.

Ya din jî Osmaniyan rêbazek pêş dixistin; medreseyên olî li her cihî pêş xistin. Hem li Anatolyayê, hem jî li Kurdistanê ew medrese pêş xistin. Ji ber ku medrese li navçeyên Êzîdiyan jî pêş xistin, Êzîdî tesîr bûn, hêdî hêdî Êzîdî kêm bûn. Beşeke wan bû Sûnî û beşeke kêm jî bi awayekî lewaz man. Piştî salên 1514'an heya salên 1800'î zêdetirê Êzidiyan namînin. Ji sê beşan du beş, an tên pelçiqandin, an jî dibin Sûnî. Bi vî awayî ew herêma Kurdistanê jî di demografyayê de guhertin çêbûn.

Li herêmên din ji ber ku mîr sûnî bûn, bi Osmaniyan ve bi hev dikirin. Heya salên 1800'î wisa berdewam kir. Nêzikî 300 salî hev û din îdare dikin. Ji milê bawerî û civakî ve Kurdan ji çi sûd wergirtin? Ji milê olî û îdarî ve deshilatdariyên herêmî pêşketin. Bû sedem ku li Kurdistanê hinek bajar ava bibin, hin gund fireh bibin û jiyana civakî

ya Kurdan pêş bikeve. Di vê serdemê de piraniya mîrên Kurd, zîratê pêş dixin. Dîsa di nava mîrtiyên Kurdan de pîşesazî û zanat pêş dikeve.

Mesele di mîrtiya Botanê de; zanatê çek, şûr û xençeran pêş dikeve. Her wiha li mîrtiya Soran û Baban de jî ew zanat pêş dikevin. Hinek mîrên Kurd, pereyên xwe çêdikin. Li gorî wê demê ew pêşketin in. Di hinek mîrtiyên Kurdan de bazirganî pêş dikeve. Herî zêde jî di mîrtiya Baban de bazirganî pêş dikeve, lê di piraniya mîrtiyan de bingeheke wisa pêş dikeve. Bi vî rengî ji aliyê jiyanî ve di nava civaka Kurdistanê de hinek pêşketin dûrûst dibin.

Xeynî vê, jixwe di wê demê de mîrtî form digre. Di bin mîrtiyê de jî xêl û hozên Kurd hinekî din rehet jiyan dikin. Di formê Kurd de guhertineke çênebûye. Malbat, tîre, xêl û hoz e. Hestê qewmî hinekî heye, lê ne yek e û ne giştî ye. Ji aliyê din ve hestên ûmetî pêş dikeve. Li herêmên Osmaniyan hestên ûmetiya Sûnî pêş dikeve, li herêmên Safewiyan jî hestên ûmetiya Şîa pêş dikeve. Bi vî rengî civaka Kurd, hinekî dûrî hev jî dixin. Li ser forma civaka Kurdistanê jî bi tesîr dibe.

Ji bo qarekter û çanda Kurdî, li ser Rojhilatê Kurdistanê me hin tişt gotin; li Rojavayê Kurdistanê jî zêde ferq tune. Li hemberî ola Şîatiyê, hem Osmanî hem jî mîrên Kurd, girîngiyê didin medreseyan û medreseyên olî vedikin. Hemû mîrtiyên Kurd, li keleka xwe medreseyên olî vedikin û derfet didin zaneyên olî. Bi piranî jî perwerdeya olî, li ser esasê rêola sûnitiyê pêş dixin.

Mesela li herêma Kerkûk, Germiyan wan deran piraniya gel Yarsanî bûn; lê bi vî rengî hêdî bi hêdî Yarsantî kêm bû, berê xwe dan Sûnîtiyê. Hinek Elewî hebûn, neman. Mesela malbata Şêx Mehmudê Berzencî, bi eslê xwe Elewî bûn. Lê piştî salên 1500'î dibin Sûniyên Qadîrî. Niha rêberên tarîqata qadîrî ne. Her wiha Kakaî, Yarasanî pir kêm dimînin. Li Rojhilat dibin Şîa, li Rojava jî dibin Sûnî. Lewra hem tûndî zêde dibin, hem jî rêbazên weke perwerdeya fermî û îmtiyaz zêde dibin. Bi vî rengî li Rojavayê Kurdistanê, ji salên 1514'an heya 1800'î berv bi Sûnîtiyê ve diçin.

Elewî, Êzîdî, Yarsanî kêm dibin; Sûnî zêde dibin. Niha jî xeynî Rojhilatê Kurdistanê, hemû parçeyên Kurdistanê Sûnîtî weke rêola hakîm e. Lê li Rojhilat, mezhebê Şîa zêdetir e. Ew guhertineke bawerî û demografîk e.



**EHMEDE XANÎ**



**MELEYÊ CÎZÎRÎ**

Di heman demê de çawa ku li Rojhilatê Kurdistanê, li Rojavayê Kurdistanê jî guhertineke bi vî rengî çêdibe. Van têgehên weke hacî, şêx, mele, seîd l i Rojavayê Kurdistanê zêdetir cihê xwe girt. Mesela şêxtî pir pêş dikeve. Her çiqas dibêjin, seîdî qarekterê Elewîtî û Şîatiyê ne jî, li Osmanî jî pêş dikeve. Seîd kî ne, malbata Mihemed in. Lê bi giştî çend kes mane. Ji ber vê yekê gelek kes bawer nakin ku li Kurdistanê seîd hebin. Dibe ku hinek hebin, lewra Elî demekê li Kurdistanê û Îranê bûye. Mirov red bike, rast nabe. Lê ew qesa jî ne zêde ne. Ji ber ku seîd pîroz in, rehawet dibîne.

Gelek kesên ku bûne Misilman û xwestine bi vê rê ji xwe re hinek derfetan biafrînin, xwe kirine seîd. Dibe ku hinek rast bin, lê piranî ne rast in. Bi vî rengî li herdu parçeyên Kurdistanê jî formê civakî diguhere.

Di nava bingeha mîrtiyê de wêjeya Kurdî baş pêş dikeve. Piştî salên 1400'î Meleyê Ehmedê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî derdikevin. Di serdema xwe de, ew ronesansekê Kurdî pêş dixin. Ew dema ku li Kurdistanê ew wêjevanên Kurd derdikevin pêş, li cîhanê jî kesên bi vî rengî yek bi yek derketine holê. Piştî salên

1450’î û 1500’î hejmareke baş ya nivîskar û wejevanên Kurdî bi pêş dikevin.

Şerefxanê Bîdlîsî jî berhemeke vê demê ye, bi Farsî nivîsiye lê parçeyekî vê ronesansê ye. Mestûre Xan a Erdelanî berhemeke vê pêvajoyê ye. Di heman demê de, geşbûna berhemên Hewremiya nû di vê serdemê de ye. Geşbûna wêjeya Kurmanciya Jêrîn-Soranî bi riya Mevlana Xelîdî Neqişbendî, Şêx Marîf, Nalî, Kurdî, Salim pêş dikeve. Hemû berhemên wê pêvajoyê ne. Ji aliyê nivîs, wêje berhemên Kurdî ve; salên 1500’î heya salên 1800’î mirov dikare weke ronesansa Kurdî bi nav bike.



Lê li gel ew ronesansa Kurdî ku ji aliyê rewşenbîriyê ve çêdibe, pêşengiyeke siyasî çênabe. Ji ber vê yekê Ehmedê Xanî dibêje, “divê pêşengek çêbibe.” Ji milê rewşenbîrî û wêjeyê ve, gav avêtineke bi vî rengî çêdibe; lê milê siyasî ve ew gav naye avêtin. Teng dimînin.

Di wê serdemê de, di mîrtiya Loristan de rista jinan pêş e. Heya îro jî tesîrên wê mirov dibîne. Jin weke cengaver perwerde dikirin. Ango tenê karê malê nakin. Di mîrtiya Loristanê de Dewlet Xan heye; rista wê pir mezin bûye, di sala 1316-1317 da hevjîna wî dimre, Dewlet xan dibe Mîr. Lê hinek derdor û mîran qebûl nekirine ku ew bibe mîr. Ji ber vê mîrtî radestî Îzedîn Huseynî birayê xwe kiriye. Lê di nava civakê de pir rol lîstiye. Di serdema Kerîmxanê Zend de, rista jinê pir e. Hemû behsa şerê ku jinan kiriye dikin. Di nava şer û rêvebirina civakê de rista wan heye. Di nava mîrtiya Zend û Loristan de karîger bûne.

Niha jî weke çanda Lor, Zend û Lekan; mirov dibîne ku tena serê xwe jin çekan davêjin milên xwe û li wan çiyan digerin. Ango ne weke jineke belangez ku tenê karê malê dikin e. Ew tesîra beşeke Yarsaniyê ku heya roja me maye. Beşek çanda kevin ya Mîtraîzmê ye, beşek jî tesîra jiyana herêmî ku şervantî û koçertî li pêş e. Cihên ku koçertî pêş ketiye, belengazbûna jinê kêmtir e. Serokatî dibêje, “bajarbûn koletiyê zêde dike.” Li van herêmên ku koçer in jî, jin bi rehetî tevdigerin. Pir zêde pêwîstî bi zilaman nabînin. Lê bajaran jin, xwe pir mûhtacî zilam dibînin. Ji ber ku li van herêmên me behs kirin, jiyana koçerî û zîratê heye, ristek jinê ya bi vî rengî jî heye.

Di parçayê Kurdistanê ku dikeve bin serweriya Osmaniyan de, li herêma Soran jina ku herî zêde navê wê derketiye, Xanzadeya Mîra Soran e. Di sala 1555’an de hatiye dinê, di sala 1615’an de wefat kiri-ye. Nêzikî 60 salî jiyan kiriye. Ew jî demeke dirêj mîra Soran bûye. Di dema wê de li herêma Soran ji aliyê zîrat û bînasaziyan ve pêşketin çêbûne. Hinek qesr û keleh çêkirine. Niha jî li Başûrê Kurdistanê, heya



**FATMA REŞ**

mirov diçe Kerkukê gelek cihên li ser navê Xanzadeyê hatine çêkirin hene.

Her çiqasa ji aliyê neyînî ve, di mijara kontrolkirina jinê de rista Îslamê hebe jî; ji ber ku koka civaka xwezayî di nava gelê Kurd de heye, li hinek cihan rista jinan baştir şênber dibe. Di sesdasa 19'emîn de ew yek zêdetir xwe dide pêş. Li Bakûrê Kurdistanê Kara Fatma heye. Li împaratoriya Osmaniyan deng vedaye. Hem li Gurgumê, hem jî li Erzînganê; di şerê Kirimê de li hemberî Rûsya risteke wê heye. Fermandariya 500 leşkerî dike. Wê demê li hemû ragihandina cîhanê de deng vedide. Dibêjin, "Kara Fatma bûye efsane." Çawa ku îro YPJ li cîhanê olan dide, wê demê jî Kara Fatma risteke wisa dîlîze.

Heya sedsala 19'emîn Osmaniyan li hemberî Kurdan rehet jiyan kirin û hevkirinek hebû. Lê di sedsala 19'emîn de ew rehetî û hevkirin têk çû û rewşa Kurdan hate guhertin. Ji ber vê jî hinek serhildan û berxwedanên Kurdan çêdibin. Her wiha di sedsala 19'emîn de ji milê tarîqatan ve li Kurdistanê hinek nûbûn pêş dikevin. Mirov dikare hinekî din bi taybetî li ser Tarîqata Nexşibendî û Qadirî bisekine. Heya sedsala 19'emîn ger heval dikarin tiştekî lê zêde bikin, an jî pirs hebin heval dikarin bînin ziman.

…: Tiştê ez dixwazim bipirsim; li ser Keyekser e, gelo ew mîr e, an jî serweriya wî li kîjan herêman bûye?

…: Meselaya Adîlexan hinekî din bê vekirin dê baş bibe. Li kîjan herêmê mîrtî kiriye?

…: Di navbera 1500'î û 1800'î de, ji aliyê wêjeya Kurd ve weke ronesansekê ye. Mesela di Mem û Zînê de, Ehmedê Xanî dibêje, "ger rêveberiyeke siyasî derketiba, em jî nedibûn koleyê miletên din." Valatiya rêbertiyê, di wê demê de tehlîlkirin girîng e. Ehmedê Xanî tehlîl kiriye, lê çima xwe rêveberiyeke siyasî nekiriye, ma wî bi xwe nedikarî?

…: Hevalan behsa herêma Ûrmiye kirin, li wir bermahiyên Xiristiyaniyê jî hene. Li wir Xiristiyanî çawa pêş ketiye?

…: Di sedsala 17’emîn û 18’emîn de, hêzên biyanî jî mûdaxaleyî herêmê dikin. Jixwe dema pêşketina kapîtalîzmê ye. Îro çawa ku NATO û Amerîqa li herêmê risteke wisa dîlîzin, wê demê jî hêzên weke Almanya, Îtalya, Fransa dikevin herêmê û darbeyên giran tiştên şûnenasiya herêmê didin. Dest didin ser tiştên civakê.

Bi taybetî di serdema deshilatdariya Safewiyan de, mûdaxeleya Îngîltere ya herêmê heye. Mirov dikare bibêje, aliyekî deshilatdariya Safewiyan rast bi rast bi Îngîlîzan ve girêdayî ye. Çek û amûrên giran yên şer didin wan, wan dielimînin textîkên şer jî. Lewra Îngîlîzî xwediyê daneheveke mezin in. Bi taybetî di komkûjiyên ku kirine de, danehevek bi dest xistine. Wan danehevan tînin û dikin xizmetî qralên Rojhilata Navîn. Bi taybetî şerên ku qralên Safewiyan û Osmaniyan li hemberî gelên Zagrosî û Anatolyayê dane meşandin, bi van danehevan çêdibin.

Dema ku Nadîrşah têk diçe û Zendî tên ser hûkim Îngîlîzan diqewitînin. Navenda Zendan jî Şîraz e, cihekî ku pişta xwe bide çiyayan e. Çol xilas dibe û çiya li Şîrazê dest pê dikin. Yek jî nêzikî behrê ye. Ew cih bi zanebûn hatiye hilbijartin. Îngîlîz jî ji ber ku bi riya behrê tên Îranê, nikarin wir re têkevin herêmê. Lê bi riya tîcaretê dikevin herêmê. Ji Kerîmxanê Zend re dibêjin, “em bi hev re tîcaretê pêş bixin. Em tiştên xwe bînin li vir bifroşin, yên we jî berin.” Kerîmxan jî dibêje, “hûnê çi bidin me?” Îngîlîzî dibêjin, “em ê amûrên xwe yên xweşik bidin we, hûn jî amûrên xwe bidin me.” Kerîmxan sîniyeke wan digre û diavêje erdê, hema dişkê. Dibêje, “tiştên we hema dişkên, yên me mayinde ne. Armanca we ne tîcaret e, armanca we xapandina me ye.” Gelek mînakên wisa tên gotin.

Bi piraniya tevgerên serhildanê ku li Kurdistanê hatine çêkirin, bingeha xwe ji baweriyan digirin; lewra bê bawerî nikarin li hemberî împaratoriyên mezin yên weke Osmanî û Safewiyan ber xwe bidin. Erdalanî jî hêza xwe ji Yarsantiyê digirin. Yên ku bingeha wan jî ava dike, yekî bi navê Bava ye. Bav û baw kesên pêşeng yên Yarsaniyê ne. Ger Yarsanî tune be, ne gengaze ku hêzeke weke Erdalanî derkeve. Ne gengaze ku jinên wisa pêşeng derkevin.

**H. Helmet:** Ez bi xwe li ser Keyakser tiştekî nizanim. Adîle Xan, em ê di mijarên pêşî de li ser bisekinin. Hevalan got, “Ehmedê Xanî çima bi xwe nebûye rêber?” Şert nene ku hemû nivîskar bibin rêber. Ne şerte ku her kesê ku şîroveyên baş bike, bibe rêber. Em tevgereke şoreşger in, nêrînên me li ser rêbertiyê hene. Rêbertî ne tenê teorî ye, ne jî tenê pratîk e. Kesê ku bixwaze rêbertiyê bike, divê hem bikaribe tehlîl û fikir bike û bikaribe binirxîne. Lê divê di heman demê de bikaribe pratîk bike, pêwîstiyên demê pêk bîne.

Serokatî dibêje, "fikir û felsefe, li gorî wê bername û li gorî wan jî stara-tejî û textîk divê hebe. Li gorî wan hemûyan jî divê mirov bikaribe rêxistina xwe ava bike." Ger mirov van hemûyan neke, mirov nikare bibe rêber û bi ser bikeve. Diyare Ehmedê Xanî kesekî rewşenbîr e, kesekî welatparêz e. Lê van taybetmendiyên me hijmartine di xwe de nabîne. Ji bo wê angaşt pêwîst dike, sûbjektîf xwe amadekirinê pêwîst dike. Ger angaşteke wî bi vî rengî hebûya, hêvî ji yekî/a din nake.

Aliyekî din jî nivîskarên me yên wê demê, di bendewariya çîna serdest û mîran de ne. Pêşengên Kurd yên wê demê mîr in. Bendevarî û hêviyên wan jî mîr in. Mesela di wê serdemê de Machîevelî, li Îtalya tiştekî weke wê dinivisîne. Ew jî ji bo mîr dinivisîne. Ji aliyê ûslûp ve Ehmedê xanî jî, mînakeke Macîevelî ye. Lê kesî fikrên wî îstîfade nekiriye. Bi xwe jî bi wê re ne amade ye. Ew taybetmendî îro jî li Kurdistanê heye. Gelek mirov hê bawer dikin ku li ser navê Kurdan tiştek pêş bikeve; divê mîr, beg û şêx pêş bixin. Vaye 400 sal ji ser re derbas bûye, lê ew fikra hê jî heye.

Serokatî dibêje, "bifikirin, ji derveyî vê jiyanê jiyaneke din heye." Ew jî wê demê nefikiriye ku derveyî wan, rêbertiyeke din jî heye û ji bo rewşenbîriya îro bike mînakek. Serokatî dibêje, "rewşenbîrên me pir teorîk dimînin." Rexneyek wisa dike. Ji bo meselaya Ehmedê Xanî jî mirov dikare wisa bibêje.

Ermeniyên ku ola wan Xiristiyanî ye, li Azerbeycan û Bakûrê Kurdistanê xwedî bandor bûn. Heya serdema Qacariyan wisa bû. Dema Qacariyan de, ji ber ku dewleta Îranê lewaz bû, Azerbaycan û Ermenîstan di wê demê de ji Îranê veqetandin. Ew bû sedem ku tesîra Ermeniyan li ser Rojhilatê Kurdistanê kêm bibe. Lê li Bakûrê Kurdistanê, heya împaratoriya Osmaniyan xirab bû jî Kurd û Ermeniyan di nava hev û din de jiyan dikirin. Jixwe niha jî li Bakûrê Kurdistanê gelek şûnvar û dêrên wan hene. Lê li Rojhilatê Kurdistanê ji ber ku di salên 1820'an de Ermenî qut bûne, cihên wan jî nehatine parastin. Tesîra wan jî li Îran û Rojhilatê Kurdistanê kêm bûye.

# DI SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ DE KURDISTAN

## *-Di Sedsala 19'emîn De Tevger Û Serhildanên Kurd*

Em ê derbasî sedsala 19'emîn bibin. Weke tê zanîn piştî sedsala 15'emîn li cîhanê lêgerînên nû çêdibin. Li Rojhilata Navîn, Osmanî û Safewiyan xwestin ji ew guhertinên heyî re bibin bersiv. Jixwe piştî ku Îmam Xazalî pêşiya fikir û felsefê girt, di sedsalên 11, 12, 13 û 14'emîn de ji aliyê civakî ve hinek tengav bûn hate jiyankirin. Lê car din jî hin derfetên jiyankirinê hebûn. Rûxmî vê hem ji milê fikir ve, hem jî ji milê olî ve gaveke mezin nehat avêtin.

Li Ewropa jî, dema ku Xeçperestan ji Selahadîn Eyûbî darbe xwarin, êdî serdemeke nû dihat jiyankirin. Ji vê serdemê re dibêjin, dema tarîtiyê; ango tarîtî tê jiyankirin. Pergala olî ya dêran, ango vatîkan hûkmî Ewropa dikir. Dadgehên engîzasyonê li Ewropa pêş ketibûn; ol, siyaset sînordar kiribû. Her wiha ol, tîcaret û îlîm sînordar dikir. Li Rojava rewşeke wisa hebû. Li Rojhilat Îmam Xazalî wan heman tişt kirin, li Rojava jî dadgehên engîzasyon û vatîkan ew tişt kirin. Heya sedsala 15'emîn wisa berdewam kir.

Lê piştî vê demê li Rojhilata Navîn Osmanî û Safewiyan derketinên nû kirin û xwestin bibin bersiv. Ji milê deshilatdariya siyasî ve bûn bersiv jî. Bi mantiqa olî û mezhebî, ew valatiya siyasî dagirtin. Ji milê baweriyan ve rêol kirin alternatîfa giştî Îslamê. Beriya wê Îslam dihat esas girtin, lê di serdema Osmanî û Safewiyan de, bawerî zivirî mezhebiyê. Lê diyar bû ku ew herdu hêz, hem ji bo herêmê hem jî ji bo cîhanê bibin bersiv. Wisa valatiyek hate jiyankirin.

Li Rojava jî piştî sedsala 14'emîn lêgerîn zêde bûn. Di sedsala 15'emîn de di pêşengtiya Martîn Lûther wan de reform pêş ketin. Reformên olî çêbûn û tevgera protestantî pêş ket. Piştî salên 1500'î ew tevger hêdî hêdî li Ewropa belav bû. Di destpêkê de li Almanya pêş ket, li Holanda û Îngîltere berfireh bû. Ji ber ku ew qesa Protestantî pêş ket, di salên 1600'î de li Ewropa jî şerê mezhebî, ango şerê Protestantî û katolîkî pêş ket. Ew şer 30 salî berdewam dike û di vî şerî de sê beşan beşeke Ewropa tê kûştin. Hev û din kûştin.

Di encama vî şerî de ji milê papa ve, protestanî weke rêoleke Xiristiyaniyê hate qebûl kirin. Dema ku Protestanî hate qebûlkirin, ji milê dewletên weke Holanda û Îngîltere ve bû olê fermî. Vê mezhebê, hêdî hêdî rê li pêşiya pergaleke siyasî û fikreke nû vekir. Lewra Katolîkan îlîm pir sînordar kiribû. Mesela ji ber ku Bruno û Galîleo gotin dinê

gilover e, hatin dadgehkirin û hinek zanyar hatin kûştin. Ango îlîm sînordar dikirin. Protestantiyê hinekî pêşiya îlîm û tîcaretê vekir.

Di ola Îslam û Xiristiyantiyê de rêgezek heye; divê tîcaret di bin denetîma ol û siyasetê de be. Serokatî dibêje. “di serdema olî de, sermaye weke şûşeyekî devê wî girtî ye, lê di serdema sermayeyê de devê wî şûşeyî tê vekirin.” Ango sermeyadarî li gorî rêgezên ol, divê di bin kontrola siyasetê de be. Lê li gorî rêgezên sermeyedariyê, divê siyaset di bin kontrola sermeyedariyê de be. Niha jî di cîhana sermeyedar de, sermeya hûkmî siyasetê dike. Hûkmî ol dike, hûkmî îlîm û zanistê dike. Ango hûkmî her tiştî dike. Lê li gorî rêgezên kevn yên olî, divê sermeya, îlm û tîcaret di bin kontrola ol û siyasetê de bin.

Di vê xalê de Serokatî protestantiyê rexne dike û dibêje, “rast e, protestantiyê tiştên baş kirin; lê tiştên xirab jî çêkirin.” Dema ku Protestanî pêş ket, tîcaret û zanistê zêdetir ji bo xwe derfet dît. Piştî salên 1600’î tîcaret hem bi riya avê, hem jî bi riyên bejahî di navbera Asya, Efrîqa û Ewropa de berfireh bûn. Ew hêzên pêşengiya wê dikirin, xwestin bi riya tîcaretê hûkmê xwe jî li cîhanê bi cih bikin. Van hêzên Ewropaî, di nava xwe de jî pirsgirek jiyan dikirin. Ji aliyekî ve bi pirsgirekên xwe re mijûl dibûn, ji aliyekî ve jî hêdî hêdî gav diavêtin.

Mirov dikare bibêje, piştî salên 1600’î hêdî hêdî pêşengtî ji destê Rojhilat derdikeve. Heya wê serdemê pêşengtiya dinê bi zêdetir di destê Rojhilat de ye. Dem bi dem di navbera Rojhilat û Rojava de denge çêdibe. Lê piştî salên 1600’î Rojava pêşengtiyê dike û ew pêşengî roj bi roj zêde dibe. Ji bo ku bikaribin bibin hakîmê dinê; siyaset, tîcaret, îstîxbarat û mîsyoneriyê pêş dixin. Mîsyoneran dişînin herêmê; ew mîsyoner ji aliyekî ve tîcaret û siyasetê pêş dixin, ji aliyekî ve jî ol û îlma xwe belav dikin.

Ew yek li ser Çîn, Hîndîstan, Îran, Erebîstan û Kurdistanê dane meşandin. Bi vî rengî li ser van herêman kar dikin. Piştî salên 1800’î tesîra wan li ser Osmanî, Kurdistan û Îranê zêdetir dibe. Lewra sal derbas dibin û danehevên wan çêdibin.

Ji salên 1680’î heya 1750’î li Brîtanya şerê hundirîn heye. Di navbera qral û parlemento de pevçûn û nakokî hene. Di encamê de piştî salên 1760’î li Brîtanya tevgerên reformê pêş ketin. pergala melikî destûrî pêş dixin. Ew pergala îro pêş ketiye jî ew e. Berê qral bi hêz bû, lê di encama têkoşînê de; hêdî hêdî rista qral sembolîk dimîne û saziyên din dibin xwedî rist. Serokatî dibêje, “Brîtanya bi vê rêbazê pergala qraltiyê neguhert, lê cewhera wê guhert.” Bes vê bi rêbazên nerm dike.

Rêbazên Brîtanya ji Fransa zêdetir encam digirin. Li Fransa tevgerên ronesansî piştî salên 1700'î pêş ketin; ji aliyê siyaset û îlm ve gavên nû diavêjin. Li Almanya felsefe pêş dikeve. Şoreşa Fransa ku di sala 1789'an de çêbûye, pir bi nav û deng bû. Gel, rewşenbîr û şoreşgerên Fransa, qraliyeta Fransa têk birin û pergaleke nû ya komarî (cumhiriyet) ava kirin. Lê pergala cîhanê li dijî vê komarê bû.

Ew guhertinên ku li Ewropa çêbûn; yek bi guhertina cewhera pergala Brîtanya, dudu bi şoreşa Fransa û bandorên van yên li ser Ewropa pêş ketin. Her wiha tesîra giştî ya tîcaretê-aborî ku li Holanda û Brîtanya pêş ketiye bi bandor bû. Piştî salên 1800'î aboriya wan kete pêşiya aboriya Îspanya û Portekîzê. Li Fransa tevgereke civakî û mezin pêş ket. Di mijara felsefê de jî, li Almanya tevgereke mezin pêş ket. Tesîra van hemûyan li ser Ewropa hebû û tesîra wan li ser dinê jî hebû. Bi taybetî li ser Osmanî û Îranê jî hebû.

Ji ber ku danehevên wan yên berê jî hebûn, gavên wan ku li ser Osmanî û Îranê diavêjin şênbertir û zêdetir encamgir bûn. Di wê demê de Osmanî lewaz dibûn, li Îranê jî Qacarî bûbûn deshilat, lê ne pir xurt bûn. Di siyasetê de gelek lewaziyên wan hene. Xwe dixin nav gelek şeran, lê nikarin encam bigirin. Di siyaset û rêveberiyê de pir pêşketî nenin. Ji ber vê tesîra Brîtanya û Fransa li ser wan zêdetir dibe. Di wê demê de Brîtanya, Fransa û ji aliyekî jî Rûsya weke hêzeke mezin li ser Osmanî û Îranê dixwazin serwer bibin.


Ji ber ku nakokiyên Osmanî û Îranê, bi Rûsya ve hene; xwe nêzikî Brîtanya û Fransa dikin. Yek jî ew guhertinên ku li Ewropa çêbûne, tesîra xwe li ser civakên li Osmanî û Îranê jî dikin. Ji bo ku bibin bersiva wê jî têkiliyên xwe zêdetir bi Brîtanya û Fransa re çêdikin. Ji bo ku Brîtanya û Fransa jî bikaribin li cîhanê hakîm bibin, vê herêmê girîng dibînin. Hem ji aliyê tîcaretê ve li ser rekên girîng e, hem jî ji ber ku erdnigariyeke navendî ye, xwediyê girîngiyeke jeostratejîk e. Lê dibînin ku bi serê xwe nikarin hûkim bikin.

Fransa dixwaze bi serê xwe hûkim bike, lê projeya wê ya Misirê bi ser neket. Lewra di pîsokolojiya civakê de hê jî ew nakokiya Xiristiyanî û Îslamê heye, ne hêsane ku hêzeke Xiristiyan li vê erdnigariyê bibe hakîm. Ji bo vê pêwîstiya wan bi rêbazên din heye. Ji van rêbazan re jî dibêjin, "şêwaza dagirkeriya nû." Wê demê tiştê ku pêwîst dibînin, bi Osmanî û Îranê re îtîfaq pêş xistin e. Ji bo wan bi lewazî jiyankirina Osmanî û Îranê, ji guhertina pergalî girîngtir e. Ger pergaleke nû û bi hêz li van herêman çêbibe, dibe ku berjewendiyên wan bikevin xetereyê. Ji ber vê yekê rê didin ku Osmanî û Îran li ser piyan bimînin, lê

divê ew jî derfet bidin ku welatên Ewropayî siyaset û berjewendiyên xwe bimeşînin.

Ji ber vê yekê di salên 1807-8-9’an de di navbera Brîtanya, Fransa, Osmanî û Îranê de gelek îtîfaq û peyman çêbûne. Piştî vê jî hinek îtîfaq çêdibin. Li gorî van peymanan, Brîtanya û Fransa alîkariya Osmanî û Îranê dikin; an pere didin wan, an siyasetê fêrî wan dikin. Osmanî û Îran jî derfet didin ku ew hêz li welatên wan tîcaretê bikin, mîsyonerî bimeşînin û siyaseta xwe pêş bixin. Hem deshilatdariya Qacarî, hem jî deshilatdariya Osmanî vê yekê qebûl dike. Bi vî rengî heya salên 1843’yan bandora Brîtanya û Fransa, li herêmê zêde dibe.

Piştî wê di împaratoriya Osmanî de, tevgera destûrî pêş dikeve. Di heman demê de li Îranê tevgerên Qanûnî pêş  dikevin. Îran û Osmanî hin mektebên nû jî pêş dixin. Li cihên weke Lûbnan, Stenbol, Tehran û Bexdayê ew mekteb pêş dikevin. Heya wê demê pergala mekteban, medreseyên olî bûn. Lê ew pergala nû ya mekteban, pergala mektebên Rojava ye. Rewşeke bi vî rengî ji destpêka sedsala 19’emîn, heya nava-rasta vê sedsalê berdewam dike.




**<u>DI NAVBERA DU İMPARATORIYAN DE KURD</u>**

**<u>MÎRTIYÊN KURD-SEDSALA 19</u>**

***1-Serhildanên Mîrtiyên Kurd***

Di vê demê de civaka Kurdistanê jî, ji welatên Rojavayî tesîr dibin. Bi taybetî jî parçeyê Kurdistanê ku di bin hûkmê Osmaniyan de ye, zêdetir tesîr dibe. Lewra tesîra Rojava, li ser Osmaniyan zêdetir e. Wê demê tevgerên weke Mehmet Elî Paşayê Misirî pêş dikevin, ew jî tesîrê li ser Kurdistanê dike. Li Rojhilatê Kurdistanê, li herêma Erdelan hinek tevger pêş dikevin, lê zû kontrol dikin. Lê li Kurdistana ku di bin hûkmê Osmaniyan de ye, ji ber ku 200-300 salî rêveberiyên herêmî hene û mîrên Kurdan xwe bi xwe rê ve birine, ji van pêşketinan jî tesîr dibin.

Li herêmê hinekî wêje, tîcaret, aborî ûhwd pêş ketiye. Ew ji bo civaka Kurd, dibin derfet. Li ser vê esasê civaka Kurd dixwaze ew pergala deshilatdariya herêmî berfirehtir bike. Mîrên Kurd, piştî salên 1800'î rewşeke wisa jiyan dikin.

Dijberî wê Osmanî lewaz dibe, ji Rojhilatê Ewropa û Balkanan tê derxistin. Li Misir tê derxistin. Di nava Ereban de hin tevger derdikevin. Êdî Osmanî tengav dibe. Dema ku li van cihan tengav dibe, êdî berê xwe dide Kurdistanê. Da ku Kurdistanê hinekî kontrol bike û ew jî ji dest dernekeve.

Li aliyekî pêşketinên civaka Kurdistanê heye, ji aliyekî ve jî pêşketinên giştî ku hemû dinê, Osmanî û Kurd jê tesîr bûne heye. Li aliyekî din jî deshilatdariya Osmanî li derve û hundir tengav bûye, dixwaze hêza xwe û civakê kontrol bike. Ew dibin sedem ku ew îtîfaqên ku di navbera Osmanî û Kurdan hene, hêdî hêdî xirab bibin û pevçûn çêbibin. Serhildanên Kurd ku di sedsala 19'emîn de çêbûne, bi van sedeman çêbûn.

Ez weke destpêk dixwazim vê bibêjim. Hevalên me û hinek nivîskar, dema ku behsa van serhildanan dikin, dibêjin "îsyan." Berê me jî wisa digot. Lê em nedin şûxilandin dê baş bibe. Îsyan peyveke Erebî ye, ji asîbûnê tê. Tê mahneya ku kesê ji qanûnan asî bûye. Bi Kurdî dibêjin Yaxî, ew jî têgeheke ne xweş e, xirab e. Xelk ji bo neyarên xwe dibêjin. Çawa ku Tirkiye îro ji me re dibêje terorîst, weke ku em jî xwe re bibêjin terorîst. Wê demê jî Osmaniyan gotiye, asî-îsyan; em jî wan têgehan kar tînin, ne rast e.

Mesela li Iraqê, peşmergeyan şer dikirin; ji wan re digotin mîtemerit, muxerîb. Ango kesên yaxî. Di encamê de tegêha îsyan, ne Kurdî ye û mahneya wê jî ne rast e. Lewra Kurdan an serî hildane, an jî ber xwe dane. Carna xwestine jiyaneke firehtir û rehetir jiyan bikin serî hildane, carna jî dijmin hatiye ser, ber xwe dane. Ya rast ew e. Bi taybetî ew

têgehên şaş di nivîsên me yên Kurmancî û Tirkî de zêdetir derdikevin pêş.

Di wê demê de, kesên pêşeng mîr in. Yên ku di vê demê de bikaribin bikevin tevgerê, ew kesên ku xwedî hêz û pêşdîtin in. Hem rêberên civakê ne, hem jî hinekî din rewşa siyasî ya cîhanê dibînin. Jixwe civak jî çavê xwe berdide wan. Di vê serdemê de hin tevger dûrûst dibin. Li ser wan pirtûk û çavkanî jî pir in. Divê lêkolînên berfireh jî bên kirin.

*Serhildana Baban*

Ji wan serhildanan yek, ya Abdurahman Paşayê Baban e. Taybetmendiyeke Babanan heye, ji mîrên xwe re dibêjin paşa. Hinek dibêjin, ji bo xwe mezin nîşan bidin navê xwe kirine paşa. Hinek jî dibêjin, Osmaniyan navê paşatiyê ji wan kiriye. Di nava sultanê Osmanî û paşayên Îranê de, nakokiyeke wisa hebûye. Ji bo ku sultanên Osmanî nîşan bidin ku paşayên Îranî ji wan biçûktir in, ji bo mîrên bin destê xwe, dibêjin paşa. Paşayên Îranê jî, ji mîrên bin destên xwe re dibêjin sultan. Babanî jî di bin destê Osmaniyan de ne, lê cîranên Îraniyan e. Ji ber vê yekê dibêjin, Osmaniyan navê wan kirine paşa. Da ku hem wan bikşînin aliyê xwe, hem jî paşayê Îranê biçûk bikin.

Bingeha Mîrtiya Baban piştî şerê Çaldiran tê avêtin. Feqe Ehmedî DareŞimane ev mîrti ava kiriye. Tê gotin ku di dawiya sedsalên 16'an û destpêka sedsala 17'emîn de hinekî xwe fireh dikin. Di destpêkê li mintiqaya Qeladizê ne. Dema ku Erdelan lewaz dibin, ew xwe fireh dikin û pêş dikevin. Feqe Ehmed DareŞimane ev mîrti ava kiriye. Pişt re navenda mîrtiya xwe dibin Qele Çalan ku li mintiqaya Sûleymaniyê ye. Di sala 1784'en de bajarê Sûleymaniyê çêdikin û dikin paytexta xwe. Êdî hem dibe navendeke siyasî, hem jî dibe navendeke tîcarî.

Di sala 1789'an de jî Abdurahman Paşayê Baban, dibe mîrê Babanan. Di wê serdemê de heya nêzikî hêrêma Behdînan û Mûsilê û hinek heremên Bexdayê jî dixe bin deste xwe. Bexda naxe destê xwe, lê waliyê Bexda bi erêkirina wî tê hilbijartin. Hinek kes dibêjin, li ser Bexda bi tesîre, lê çima bi xwe nabe waliyê Bexda. Lewra walîtiya Bexda, di pozîsyoneke girîng de ye. Hinek jî dibêjin, ji ber ku mîrtiya Kurdan e; nikarin derveyî Kurdistanê bijîn.

Ji ber ku deshilatdariya wî xurt dibe, Osmanî nerehet dibin û pêşiya wî digirin. Di sala 1806'an de di navbera Baban û Osmaniyan de şer çêdibe. Osmanî hêza xwe ji Stenbol, Erebîstan û Bexdayê tînin. Cara yekem li mintiqaya Germiyan şer çêdibe. Di şer de Abdurahman Paşa

dişke û alîkariyê ji Îranê dixwaze. Dema ku Îran alîkariya wî dike, careke din herêmên xwe distîne. Demeke kurt qut dibe. Osmanî ji nakokiyên malbatî sud werdigirin. Di wê demê de Xelîd paşayê Babanî heye, li gel Abdurahman paşa nakokiyên wan hene. Îran jî dixwaze mîrtiya Baban bikşîne gel xwe û aliyekî digre gel xwe. Osmanî jî dixwazin nakokî û pevçûnên malbatî kûr bikin û aliyekî digirin gel xwe.

Bi vî rengî heya salên 1813'an gelek şer û pirsgirek di navbera wan de çêdibin. Lê di encamê de Abdurahman paşayê Baban hinek teng bibe jî, deshilatdariya xwe diparêze. Di sala 1813'an de Abdurahman Paşayê Baban dimre. Kurê wî Mahmûd Paşa dibe hakîm û zêde gavan navêje, ew sînorên heyî îdare dike. Heya sala 1847'an jî, Osmanî pergala mîrtiya Baban red dike.

Di sala 1847'an de, di navbera Îran û Osmaniyan de îtîfaqa Erzoromê çêdibe. Di encamê de Îran û Osmanî hev dikin ku pergala mîrtiyê li Kurdistanê rakin. Lewra heya wê demê hem li Îranê hinek mîrtiyên Kurd hene, li Osmanî jî zêde hene. Piştî wê alîkariya hev dikin ku pergala mîrtiyê rakin. Lewra dibêjin ger bimîne, dibe ku serê me bibe bela. Yekem mîrtiya ku biryar didin ku ji holê rakin jî, mîrtiya Baban e. Lewra dibêjin di navbera me de ye û li ser me xeterî ye. Di sala 1847'an de mîrtiya Baban û mîrtaya Erdelan radikin. Ew gava yekem ya serhildanê ye.

Mîrtiya Baban, di milê tîcaret, wêje, zîraet, sanat ûhwd de pêş ketiye. Top çêkirine, çekên biçûk çêkirine. Di wê demê de karwana tîcaretê ya Babanan, heya Tebrîz, Mûsil û Helebê diçe. Dervayî vê li herêma xwe zaravaya Hewremî pêş xistine. Heya çêkirina Sûleymaniyê xelkê zêde li vê mintiqayê zaravayê Hewremî didane şixûlandin. Kêmtir Kurmanciya jêrîn bûye. Zimanê fermî jî di mîrtiyên Kurdî de Farsî bûye. Wê demê li mîrtiya Erdelan û Babanan, zimanê fermî Farsî bûye. Pişt re Babanan Kurmanciya Jêrîn jî kirine zimanê fermî. Niha jî li Başûr, bi wî zimanî tê nivîsandin. Ji wêjeya zimanê Kurmanciya Jêrîn ku pêş ketiye, Babanan îstîfade kirine.

Bi vî rengî, hem bi nakokiyên navxweyî; hem ji ber ku di navbera du deshilatdariyan de ye; hem jî ji ber alîkariya Îngîlîzan ji Osmaniyan re, ew mîrtî nikare xwe fireh û mayinde bike. Herî dawî têk diçe.

*Serhildana Soran(Rewandûz)*

Piştî mîrtiya Baban lewaz dibe, mîrtiya Rewanduz (Mîrtiya Soran) derdikeve pêş. Berê ve mîrtiya Rewanduz heye, lê ji ber ku mîrtiya Baban wê demê xurt bûye, di bin serweriya Babanan de bûne. Texrîben di sedsala 14'emîn de hatiye avakirin. Heya 1800'î nêzikî 500 salî wisa berdewam kiriye. Di sala 1817'î de mîr Muhamedê Revandûzî, dibe mîr. Yên ku jê hez dikin, pê re dibêjin paşayê gewre(Mezin) jî. Yên jê hez nakin jî dibêjin Paşayê kor. Bi taybetî Êzîdî wisa dibêjin. Lewra ferman li ser Êzîdiyan der xistiye û gelek Êzîdî kûştine. Ji ber wê xelkê Êzîdî, ji mîr Muhamedê Revanduzî eciz in.

Mîr Muhamed, mîrtiya Revanduzê ku belav bûye, komî ser hev dike. Kesekî ku xwediyê rihekî fetih e. Hewldan nîşan dide ku deshilatdariya xwe berfireh bike. Destpêkê mîrtiya Revanduz çar parçebûne. Mîr Mumamed mamên xwe pismamên xwe civandine û mîrtî komî ser hev û din kiriye û mîrtiyeke navendî çêkiriye. Pişt re hinekî din xwe firehtir kiriye. Heya salên 1831'an nêzîkî 14-15 salan kar kiriye. Milê Bakûr ve xwe gihandiye herêma Cizîrê. Ji milê Baban ve jî heya Dûkan hatiye û sînorê Babanan teng kiriye. Hewlêr, Ranya, Qeladize, Koysancax, Şaqlava, Şêxan xistiye destê xwe û heya milê Zaxo wan çûye. Behdînan jî xistiye destê xwe.

Ji milê zanat ve, yekem mîrê Kurd e ku bi îmkanên xwe top çêkiriye. Mîrên Baban û Botanê, bi alîkariya Rûsan top çêkirine. Lê mîrê Soran bi hostayên Kurdî top dane çêkirin. Niha jî topên wan li Rewanduzê hene. Wê demê karxaneyeke topan ava dikin û 205 topên mezin çêdikin. Kesê ku van topan çêdike, hosta Recep e. Diyare wî jî di nava Osmaniyan û Rûsan de danahev çêkirine û dema ku ziviriye li Revanduzê ew kar kiriye. Ji milê zîratê ve hin pêşketin çêbûne. Îdareyeke navendî çêkirine.

Jixwe mîr Muhamed, di îdareyê de tûnd e û ji ber vê li gel Êzîdiyan pirsgireka wî derketine. Wê demê bac dixwazin, Êzîdî nadin. Dema ku bac nadin, mîr Muhamedê Revanduzî jî tund diçe ser. Diyare wê demê Îngîltere û Osmanî jî, ji bo nakokiyan kûr bikin hincetan digerin. Her vê bûyerê jî dikin hincet, da ku êrîşî mîr Muhamed bikin. Îngîlîz û Osmanî dibêjin, mîr Muhamed kesekî ku mafê xelkên derveyî xwe dixwe ye. Bi vî rengî hêz kom dikin û tên ser wî. Ango weke pergaleke emaret naye înkarkirin, lê dibêjin siyasetê xirab dimeşîne, divê bê kontrolkirin.

Wê demê Osmanî parastina Êzîdiyan dike hincet û êrîş dike. Îngîltere jî piştgiriya wan dike. Lê armanca wan ne parastina Êzîdiyan e,

kontrolkirina Mihemedê Revanduz e. Ji 1831'an heya 1835'an çend caran di navbera mîrtiya Revanduz û Osmaniyan de şer çêdibe. Mîr Muhamed herêmên xwe diparêze, lê teng dibe. Hêzên waliyê Bexda, hêzên waliyê Mûsil, hêzên Stenbolê hemû kom dibin û bi hev re êrîş dikin. Mihemed Reşîd paşa Sadrazam bi xwe tê û şer dimeşîne. Ew dem Hêzeka 110 hezar kes kom diken ji bo lêxistina Mîr Muhemed.

Di vê demê de Mîr Muhamed, têkiliyên xwe bi Îranê re jî xirab dike, diwaze hin herêmên Rojhilatê Kurdistanê ku dikevin bin serweriya Îranê jî bigre. Ji ber vê Îran jî li hemberî wî disekine. Di sala 1835'an de dema ku Osmanî tên ser Mîr, Îran ji bi hêzeke 20-30 hezarî tê û êrîşî wî dikin. Hêza wî jî nêzikî 30-40 hezarî ye û êdî ji du aliyan ve tengav dibe.

Çend nêrînên cuda hene; hinek dibêjin, fermandarên hêzên Mîr Muhamed dema ku dibîne ew qesa hêzeke zêde tê ser wan, nexwestine şer bikin û bi Osmaniyan ve hev kirine. Xwestine mîr qaneh bikin, da ku radest bibe. Ji ber vê jî dema ku mîr ferman dide ku şer bikin, şer nakin. Hinek jî dibêjin, wê demê mûftiyê emaretê heye, jê re dibêjin Mele Mihemedê Xeta. Melayekî bi nav û deng e û zaneyekî ku xwedî mekteb e. Dibêjin mele gotiye, "kî li hemberî xelîfe şer bike, telaqî wî dikeve û jina wî li wî heram dibe." Ji ber vê jî leşker şer nakin. Lê hinek vê nêrînê red dikin, dibêjin mele tiştekî wisa negotiye.

Di encamê de, leşker şer nakin. Dema ku şer nakin, mîr li gel fermandarên arteşa Osmaniyan dikeve têkiliyê.

Fermandarên Osmanî dibêjin, "ger tu siyaseta xwe biguherînê, radest bibê û daxwaziyê afokirinê ji sultan bikî, dê em ê te afo bikin." Dema ku mîr van qebûl dike û radest dibe, Resulê birayê wî dikin cihê wî û wî jî dibin gel sultan. Lê sînorên mîrtiyê bi derdorê Revanduzê ve sînordar dikin.

Mîr Muhamed dibin Stenbolê, demeke li gel Sultan dimîne û sultan wî afo dike. Pişt re careke din vedigere, da ku bibe mîr. Lê waliyê Bexda û waliyê Mûsilê, dibêjin biryara sultan şaş e û îtîraz dikin. Dibêjin, "ger Muhamed vê carê jî bibe mîr, dê kes nikare wî kontrol bike. Divê an nebe mîr, an jî divê biçe gel waliyê Bexda û soz bide ku ji fermana waliyê Bexda û Mûsilê dernekeve." Sultan vê qebûl dike, lê mîr qebûl nake, Mîr Muhamed dibêje, "min ferman ji sultan girtiye, ma waliyên Bexda û Mûsilê kî ne ku ez biçim gel wan?"

Sultan careke din ferman dişîne û leşkerên gel wî re jî dibêje, "ger vê carê jî mîr fermana min qebûl nekir, wî bikûjin." Diyare ku cara duyem jî fermana sultan qebûl nekiriye û leşkerên gel wî jî li mintiqaya

Sêwazê ew kûştine. Cenazeyê wî kirine torbeyekî û avêtine nava avê. Li gorî dîrok behs dike, di 1837'an de hatiye kûştin. Lê birayê wî mîr Resûl Revanduz, bi awayekî teng mîrtiyê berdewam dike. Çawa ku Baban teng bûn, ew jî wisa teng dibin. Piştî salên 1847'an mîrtiya Revanduz jî bi giştî tê rakirin.

*Mîritiya Botan*

Piştî mîrtiya Revanduz teng dibe û lewaz dibe, mîrtiya Botan hinekî serê xwe radike. Mîrtiya Botan, piştî salên 1300'î dibe mîrtî. Heya salên 1800'î dem bi dem teng dibe, dem bi dem fireh dibe. Di sala 1821'an de Bedîrxan Beg dibe mîr û di 1828'an de Bedîrxan Beg, pereyan bi navê xwe derdixe. Di wan deman de giraniye dide ser zîrat û çêkirina çek, top, şûr û xenceran. Di sala 1836'an de xwe hinekî fireh dike. Bi taybetî dema ku mîrê Revanduz dişke, mîrtiya Botan hinekî din sînorên xwe berfireh dike.

Her wiha di sala 1836'an de serê xwe radike, lewra dixwaze zêdetir xwe fireh bike. Lê zû tê kontrolkirin. Dibêjin piştî ku radest bû, li gel Osmaniyan, li hemberî tevgerên din şer kir. Di vê derê de li ser Bedîrxan Beg rexne jî hene. Lewra ji sala 1837'an heya 1841'an li hemberî  îbrahîm paşayê Misirî, piştgiriya Osmanî dike. Nevî û kurên Bedîrxan jî dibêjin, "wê demê ne amade bûne, da ku serî rakin. Ji ber vê jî neçar  mane ku hinek tiştan pêk bînin." Wê demê, weke pêvajoya xwe amadekirinê bi nav dikin. Bi vî rengî heya 1841'an mîrtî xwe hinek diparêze û di nava deshilatdariyê de jî hinek rol dîlîze.

Di sala 1842'yan de, di navbera mîrê Botan û mîrtiya Behdînan, Hakarî û Mûtkî de hevkirinek çêdibe. Ew sê çar mîrtî hev dikin ku pêk ve mîrtiyeke mezintir ava bikin. Rêber Apo vê yekê, weke yekbûna Kurd ku cara ewil pêk tê bi nav dike. Berê jî wan mîrên dîtir xwe fireh kirine, lê li ser esasê hêzên xwe û şexsiyeta xwe vê dikin. Lê mîrtiya Botan bi îtîfaq mezin dibe û gav diavêje. Di dîroka hemû mîletan de ew heye; an kesek derdikeve û xwe bi hêz dike, an jî bi îtîfaqê yekbûnê çêdikin. Yên Kurdan herdu jî bi temamî çênebûne. Ew kesên ku bi hêz bûne, hinek gav avêtine û şikestine. Îtîfaq jî di pêşengtiya Bedîrxan Beg de, di nava wan mîrtiyên ku me hejmartin de çêbûye, gavek avêtine.

Sînorên mîrtiya wan heya Sêrt, Elih, Başûrê Kurdistanê û heya Revanduzê pêş ketiye. Vê yekê dewleta Osmanî tirsandiye. Ji ber vê yekê çend caran şerê wî kirine û xwestine kontrol bikin, lê tam kontrol nebûye. Êdî ji xîleyan digerin. Osmanî hem Aşûriyan li hemberî

mîrtiyê radikin, hem jî nakokiyên di nava mîrtiyê de kûr dikin û didin şixûlandin. Li ser vê esasê di sala 1847'an de, hem ji aliyê Cizîrê ve, hem jî ji milê Hakarî ve, ji du milan ve êrîşê dibin ser mîrtiya Botanê.

Beriya vê êrîşê, Aşûriyên li herêma Hakarî dibêjin, "em bac nadin mîrtiya Botan, em didin xelîfe." Fermandarên herêmê jî bi zextan dixwazin bac bistînin û ew dibe sedema şer. Hinek Aşûrî jî tên kûştin. Ew bûyer, di dîrokê de hem ji bo mîrê Botan dibe rexne; hem jî dibe hinceteke ku Îngîltere û Fransa alîkariya Osmaniyan bikin. Dema ku Osmanî êrîşî ser Botanê dikin, dewletên Îngîltere û Fransa bi hostatiya xwe ya leşkerî û teknîka xwe alîkariya Osmaniyan dikin.

Ji aliyê din ve jî nakokiyên nava malbatê dane şûxilandin. Êzdînşêr heye, pismamê Bedîrxan Beg e. Dibêjin dema ku Bedîrxan Beg bûye mîr, bi alîkariya Osmaniyan bûye mîr. An na mafê Êzdînşêr bûye ku bibe mîr. Ew weke nakokiyeke maye, Osmaniyan jî ew dane şûxilandin û gotine, "ger tu alîkariya me bikî, em te dikin mîr." Li ser vê esasê êniya Cizîrê ku Êzdînşêr fermandarê wê ye, şer nake û radest dibe. Êniya din jî 5-6 mehan şer berdewam dike. Lê di encamê de Bedîrxan Beg, di keleha Hewrexan de tengav dibe û radest dibe.

Piştî ku radest bû, Bedîrxan digirin û wî mişextî dikin û dişînin Girava Girîtê. Êzdînşêr jî dikin mîr. Mîrtiya Êzdînşêr heya 1856'an berdewam dike. Piştî îtîfaqa Erzoromê ku biryara rakirina mîrtiyan digre, di destpêkê de mîrtiya Botan ranakin, lê pişt re hewl didin ku mîrtiya Botan jî rakin. Li hemberî vê Êzdînşêr jî hinekî ber xwe dide, lê di encamê de mîrtiya Botanê di sala 1856'an de bi giştî tê rakirin.

Bi rakirina mîrtiya Botan, pergala mîrtiyê li Kurdistanê namîne. Êdî deshilatdariya Osmanî bi riya sancak û waliyan hûkmî herêmê dike. Di sala 1869'an de Osmanî pergala deshilatdariya xwe bi giştî diguherînin û pergala wîlayet, sancak û qazayan çêdikin. Ew dibe sedem ku tevgerên Kurdî, piştî mîrtî ji holê tên rakirin, bi rengekî din serî hilbidin. Dema mîrtiyê xilas dibe. Êdî dema şêxtiyê dest pê dike.

Di encamê de serhildan û berxwedanên mîrên Kurdan bê netîce man. Hemû mîrên Kurdan hatin pelçiqandin û hatin tasfiyekirin. Piştî sala 1847'an di çarçoveya îtîfaqa Erzoromê de, Osmanî û Îraniyan bi hev kirin û bi alîkariya Îngîltere, Fransa û Rûsya mîrtiya Kurdan ji holê rakirin. Pişt re di çarcoveya têkiliyên Osmanî, Îngîltere û Fransa de, di serdema Abdûlmecîd de pergaleke nû pêş xistin.

Bêguman nirxandinan van serhildanan girîng e. Me hinekî behsa sedema van serhildanan kir. Li cîhanê ji aliyê tîcaret, aborî û têkiliyên siyasî ve pêşve diçû. Bi taybetî piştî sedsala 16'emîn û 17'emîn

pêşengtî ketibû destê Rojava û dewletên Rojavayî û li Rojhilat bi cih dibûn. Hem li cîhanê, hem jî li Rojhilata Navîn bandora vê li ser civakê hebû. Ji aliyê din ve rewşa siyasî ku li Kurdistanê dihat jiyankirin, ji aliyê zanist, wêje û aboriyê ve hin bingeh avakiribûn. Ew tişt bûn sedem ku civak bikeve nava lêgerînan.

Di heman demê de ew tengaviyên ku Osmanî jiyan dikir, bû sedem ku li ser civakê û herêmê pergaleke zêdetir navendî û tûnd ava bike. Ew hemû bûn sedem ku hewldana mîr û civaka Kurd çêbibe, da ku ji bo jiyaneke baştir û rehet bijîn. Li ser vê esasê serhildan çêbûn. Pêşengên civaka Kurd, wê demê mîrên Kurd bûn. Divê ji aliyê siyasî, aborî, leşkerî ûhwd ve xwe amade bikirana. Lê ji van aliyan ve xwe baş amade nekirine. Ya duyemîn ji ber ku heya wê demê ji aliyekî ve mîrên Kurdan hevpeymanên dewleta Osmanî bûn û xwe ji xelîfe ve girê didan, di dema serhildanan de jî nikarîn bi giştî li hemberî Osmaniyan bisekinin. Her çiqasa li hemberî pergala îdarî û zilma dewletê xwestibin hinek xweserî pêş bixin jî, bi giştî nikarin xwe dijî xelîfe nîşan bidin. Ew nêzikbûn, di mîrên Kurdan de tune ye. Tiştê ku diyar dibe armanc ne guhertina pergalê ye, belkî Dixwazin di çarçoveya pergala Îslam û xelîfetê de, ew pergala heyî hinekî din firehtir bikin û hinekî din deshilatdara wan zêde bibe. Di encamê de hemû mîrên Kurdan, adalet û saltana xelîfe qebûl dikin û radestî wê dibin. Ger rêberek, pergaleke bi giştî bide dijberî xwe û bixwaze biguherîne, di encamê de pê re hev nake.

Mijareke din civaka Kurd, bi taybetî derdorên çîna serdest yên Kurd jî bi girêdana Îslam û xelîfetê jiyan dikin. Dema ku pir zorî û zehmetî çêdibe, da ku hinekî din jiyana wan baştir bibe hin hewldanên wan çêdibin, lê ger ew bibe sedema pirsgirek, pevçûn û nakokiyên zêde, xwe ji bo tiştekî wisa amade nabînin. Her wiha amadene ku bi pergala deshilatdar ve bikevin nava hevkariyê (işbirlikçilik). Bi kurtasî jiyan û pergaleke alternatîf tune. Dixwazin di nava pergala heyî de deshilatdariya xwe fireh bikin.

Di wê demê de fereseta netewegerayî jî pêş dikeve û ji ûmetgerayiyê cudatir e. Ûmetgerî ferq nake navbera miletan, lê netewegerî dike. Hêdî bi hêdî bingeha netewe dewletê pêş dikeve. Ew yek di pergala ûmetgeriyê de naye qebûlkirin, lê di pergala kapîtalîst de, divê dewlet li ser esasê netewe çêbibe. Diyare ew fikra, li Kurdistanê hê pêş neketiye. Her çiqasa bandora milîgeriyê li ser Kurdan hebe jî, weke fikir hê bi formûl nebûye. Ji bo vê ne weke mîlîgerî alternatîfek derdikeve pêş, ne

jî bi awayekî cuda altarnatîfek derdikeve pêş. Da ku ji pergala ûmetgerî û saltanata Îslam qut bibin.

Ji ber vê tevgerên Kurd yên di vê demê de, di nava pergalê de xwedî hewldan in. Ne di lêgerîna pergaleke din de ne. Ger rewşeke wisa hebe û tu bixwazê bi çekan ser bikevê, tu encam nagrê. Jixwe ew kesê din baştir çeka xwe dide şixûlandin. Ew di şerê siyasî de jî wisa ye û di şerê leşkerî de jî wisa ye. Ger tu bixwazê ji yekî re şerekî bikî, divê çeka te û teknîka te cudatir be. Ger çeka te, teknîka te û textîka te cudatir nebe û tu weke wî/ê van tiştan bidê şixûlandin, ew pêşiya te ye. Lewra ew çek û ew textîk jixwe wan pêş xistine. Ew dem derfeta serkeftin ji bo wî zêdetire.

Li hemberî te pergaleke olî ku xwedî danehevên 1000 salî ne heye, dewlete weke Osmanî ku ji 400 salî zêdetir danehevên wê yên îdarekirinê hene; ger tu bixwazê li hemberî wan ser bikevê, divê tu bi teknîk û textîkên wan tevnegerê. Ji bo wê mîr û tevgerên Kurd, nikarin netîce bigirin.

Xeynî vê nizanîne ku bi civakê ve çawa bikevin têkiliyê. Mesela li Kurdistanê, gelên cuda hene, dê çawa bi van ve bidin û bistînin. Ji vî alî ve ne serkeftî bûne, hatine lîstikên deshilatan. Ne lîstika deshilatan be jî, ew refleksên olî, mezhebî û teng nehiliştiye ku yekîtiya civakî di nava civaka Kurd de dûrûst bikin. Civaka Kurd, civakeke pirengî ye. Lê ew fêm nekirine. Me mînakên wê dan, gelek aliyan ve kêmasiyên bi vî rengî derdikevin.

Ji aliyekî din ve, ji ber ku civaka Kurd pêşengtî ji dest daye tiştên cuda derdikevin holê. Dema ku pergala deshilatdariyê çêbû, civaka Kurd rista pêşengtiyê jî dest da. Ji ber vê jî zemîna tiştên weke xiyanetê derketin. Di vê serdemê de jî ew tê jiyankirin. Ji bo ku em bikaribin, bingeha xiyanetê bişkînin û têk bibin; divê bi giştî berxwedan ser bikeve. Heya ku bingeha xiyanetê bi giştî neçike; çiqasa berxwedan çê bibe, ew qesa jî xiyanet çêdibe. Lewra zemîna bi hêzên deshilatdar ve bikevin têkiliyê heye û ew jî dibe xiyanetê. Ew jî di nava serhildanên Kurdan de hatine jiyankirin.

Vê yekê em dikarin ji bo giştî Rojhilata Navîn jî bibêjin, ji ber ku rista pêşengtiyê bi dev Rojava ve berdaye, nikare pergaleke alternatîf ava bike. Hemû pergalên ku li Rojhilata Navîn ava dibin jî, dûvikên Rojava ne.

Di vê serdemê de, rewşa siyasî ya cîhanê baş nehatiye xwendin û têgihiştinek çênebûye. Li gorî wê têkilî û tîfaq çênekirine. Di mînaka mîr Muhemedê Revanduzî de ew tê dîtin. Îro dîqat bikin, carna hinek

kesên me bi awayekî ecemî tevdigerin. Mesela dibêjin, “em çima bi Îranê ve nekevin şer.” Bi ya wan be, divê em şûr bikin destê xwe û bi her kesî re şer bikin. Tu bi her kesî re şer bikî, îmkana serkeftina te jî kêm dibe. Mîr Muhamedê revanduzî jî, di serdemeke ku îmkanên serkeftinê hene de, berê xwe dide Îranê û wan jî dike dijmin. Dema ku Osmanî û Îran bi hev re tên ser jî, nikare ber xwe bide.

Rêber û pêşengên Kurdan, di wê demê de ew tiştan baş nenirxandine. Li gorî wê ji xwe re perspektîfek ava nekirine û di netîce de zirar dîtine. Bi kurtasî dema ku ew serhildan têk çûn û pergala mîrtiyê têk çû. Forma îdareyên herêmî, li Kurdistanê weke berê neman. Heya wê demê formên deshilatdariya giştî û heremî hebûn. Berê weke dewletên herêmî û xanadanî dihatin nas kirin, piştre bûn mîrtî. Lê formeke herêmî her hebû. Di dema Abasî, Safewî û Osmaniyan de jî li Kurdistanê formeke wisa hebû. Lê piştî salên 1847’an deshilatdariya herêmî hate tengkirin û bi giştî hate rakirin.

### *2-Li Kurdistanê Tevgera Şêx û Terîqetan*

Dema ku mîrtî rabûn, li herêmê valatiyek çêbû. Osmaniyan xwest, vê valatiyê bi pergala bajar û bajarokan dagre. Ji bo dewletê bi vî rengî ew valatî hate dagirtin. Lê ji bo civakê, ew valatî tam nehate dagirtin. Ne tenê Kurdistanê jî, ji civakên Îran û Erebîstanê jî wisa bû. Ew daxwaza netewiyetê li van deran jî pêş ket. Jixwe di wê demê de netewe dewlet jî hatine avakirin, teyisîna xwe li ser Rojhilata Navîn jî dike.

Di sedsala 18’emîn de li Ewropa hêdî hêdî netewe dewletên ku li ser esasê netewiyetê deshilatiyeke nû pêş dixin ava dibin. Di sedsala 19’emîn de zêdetir dibin û xwe tam belav dikin. Beriya wê li Ewropa jî împaratorî hebûn. Serokatî di paraznameyan de dibêje, “divê rexneyên me li gorî demê bin.” Dîqat bikin, heya sedsala 18’emîn li Ewropa jî hê modela netewe dewletê tam bi cih nebûye. Lê em dibêjin, çima di salên 1000’î de li Kurdistanê netewiyet pêş neket. Lê hê heya 1800’î ne li Rojhilata Navîn, li Ewropa bingeha netewegeriyê pêş nakeve.

Rêber Apo meseleya netewegeriyê, zêdetir piştî serdema Şêx Ûbeydûlahê Nehrî û di sedsala 20’emîn de zêde rexne dike. Ger li ser esasê netewegeriyê mirov dixwaze rexne bike, divê piştî vê serdemê bê rexnekirin. Di dawiya sedsala 19’emîn û destpêka sedsala 20’emîn de ye.

Dema ku fikrê netewiyetê li Ewropa cih dibe, tesîra xwe li hemû cîhanê bi cih dibe. Mesela dema ku di salên 1800'î de li Almanya tevgera netewiyetê pêş ket, di heman demê de felsefe û zanist jî pêş dikeve. Her wiha di pêşengtiya Bîsmarc de dewleteke bihêz ava dikin û dixwazin hema mûdaxaleyî derve jî bikin. Lewra cûhî li Almanya civakeke rêxistinkirîbûn, ev bu sebeb ku Cûhi rolê wan di hundir Almanya zêde bibe. Mesela gelek kesên weke Marks ku zane ne, di nava Cûhiyan de hene. Gelek Cûhiyên ku fikrên çepgir û rastgir pêş dixin hene. Jixwe Marksîzm jî li Ewropa pêş dikeve.

Di heman demê de Masonî pêş dikeve. Weke modernbûnê digirin dest. Weke tevgereke zanistxez tê naskirin. Masoniyet, di sedsala 15'emîn û 16'emîn de pêş dikeve. Destpêkê li Îtalya, Almanya û pişt re jî li her cihî pêş dikeve. Piştî salên 1800'î li Almanya tê nû kirin û dinê jî belav dibe. Di sedsala 19'emîn de gelek kesên Îslamî û derveyî Ewropa jî di nava masoniyetê de cihê xwe digirin. Cemaladîn Efganî jî kesekî pêşengê Îslamê ye, lê ew jî tevlî tevgerên masonî dibe. Pişt re dibînin ku tevgera masonî xizmetî tevgera Cûhitiyê dike, ji ber vê gelek jê dûr dikevin. Almanya jî dixwaze bi riya masoniyê li cîhanê xwe belav bike; yek jî ji ber ku xwediyê zanat û aboriyeke mezin e; dixwaze raqibiya Îngîltere û Fransa bike.

Wê demê piraniya dinê, di bin tesîra Îngîltere û Fransa de ye. Brîtanya, navê "împaratoriya ku tav lê naçe ava" li xwe kiribû. Ji Rojhilatê dinê, heya Rojavayê dinê gelek cih di bin hakîmiyeta Brîtanya de bûn. Almanya jî weke neteweke nû çêbûye û xwediyê ew qesa îmkan e, qebûl nedikir ku weke dewleteke lewaz jiyan bike. Ji bo vê hewldanên nû pêş dixist. Ji ber vê yekê bi taybetî piştî salên 1878'î têkiliyên Almanya, Osmanî û Îranê jî pêş ketin.

Heya wê demê Osmanî û Îraniyan, zêdetir bi Brîtanya û Fransa re têkilî datanîn. Êdî dîtin ku ew dixwazin, zêdetir îstîfade li wan bikin. Îhtîmal hebû ku Osmanî û Îranî jî hêdî hêdî bibin koloniyên Fransa û Brîtanya. Ew yek dîtin. Ji ber vê bi taybetî di serdema Abdulhamîd de, êdî têkilî bi Almanya re pêş xistin. Alman jî vê dikin firsend û têkiliyên xwe xurt dikin. Ji ber vê di navbera Brîtanya, Fransa û Almanya de nakokî derketin. Divê em di nirxandinên xwe yên dîrokî de vê mijarê jî ber çavan bigirin.

Di vê demê de, li Kurdistanê ji aliyekî ve di pêşengtiya mîran de serhildan çêbûn, ji aliyekî din ve jî li Kurdistanê tevgerên fikrên nû pêş diketin. Ew tevgerên fikrên nû li Kurdistan, Îran û Erebîstanê pêşketin çi bûn? Li Sûîdiyê Wahabiyet pêş ket; tevgereke ku careke din dixwaze

navenda ol vegerîna Sûîdiyê bû. Tevgereke Îslame ya tûnd bû û di pêşêngtiya Mihemed Abdûlwahap de hate pêş xistin. Qebûl nedikirin ku Ereb di bin serweriya Tirkan de bin. Di sedsala 18'an de ew tevger pêş ket.

Her wiha di vê demê de, tevgera Naqşibendî li herêmê pêş dikeve. Koka Naqşibendî, vedigere sedsala 14'emîn. Destpêkê di pêşengtiya Mihemed Bahadîn Naqşibendî Biharî de pêş dikeve. Di sala 1318'an de li mintiqaya Bihara dayik dibe û di salan 1389'an de wefat dike. Di ew serdema ku Abasî xirab bûn de tarîqat pêş ketin. Tarîqatek, Qadîrî bûn; li Kurdistan û Iraqê pêş ket. Pir zû jî tesîra xwe li Kurdistan, Iraq, Îran û Anatolyayê dike. Lê tarîqata Naqşibendî li Asyaya Navîn pêş ket. Ji ber vê zû negihêşt Kurdistanê, an jî tesîra wê li Kurdistanê kêm bû.

Ew tarîqat di sala 1811'an de bi riya Mevlana Xalîdê Naqşibendî (1776-1827) hat Kurdistanê. Ew bi xwe jî Kurd e, ji eşîra Caf e, li mintiqaya Karadax mezin bûye. Pişt re hêdî hêdî meletiya xwe pêş xistiye, pişt re çûye Delhî, ew tarîqat girtiye û ziviriye Kurdistanê. Hinek dibêjin, di sala 1779'an de, hinek jî dibêjin di sala 1776'an de ji dayik bûye. Çend sal cudahî di dîroka çêbûyina wî da heye. Di sala 1811'an de ji Efganîstanê vedigere Kurdistanê. Beriya wê li Sûleymaniyê bûye îmam û liser ol perwerde daye. Lê piştî wê diçe Hîndistanê û piştî du salan dîsa vedigere Sûleymaniyê û di mîrtiya Babanê de jiyan dike.

Li wir destpêkê tarîqata wî ji hêla gel ve pir tê qebûlkirin. Lewra di wê demê de tarîqata Qadirî li herêmê hakîm e û navenda wê jî li Sûleymaniyê ye. Şêx Marûfê Nodê, ku dibe bapîrê mezin yê Şêx Mehmûdê Berzencî. Wê demê weke pêşengê tarîqata qadirî, li herêmê tê naskirin û li Sûleymaniyê jiyan dike. Di serdema Babaniyan de mizgefteke mezin ji wan re çêkirine, jê re dibêjin Mizgefta Gewre. Niha jî heye. Dema ku Mevlana Xalîd, dizivire û tê Kurdistanê,bi sebeba ku pêşengtiya tarîqateke cuda dike, mîrên Baban,li Sûleymaniyê mizgeftekê jê re çêdikin, navê wê mizgeftê jî Mizgefta Xaneqa ye. Ew jî niha heye. Texrîben nêzikî 9 salan, carna li Sûleymaniyê, carna li Bexdayê fikrê Naqşîbendiyê belav dike. Ev Şêx Marûfê Nodê nerehet dike. Pişt re bi nakokiyên Qadîrî û Naqşibendiyan, Sûleymaniyê cih dihêle û diçe Bexdayê. Pişt re jî diçe Şamê, li Şamê di sala 1827'an de bi nexweşiyê dimre. Niha qebrê wî, li Şamê taxa Kurdan e.

Bi giştî fikrên Serokatî, ji bo tarîqatan hene. Lê bi hûrdekarî lêkolînên me kêm in. Ez hêvî dikim, weke ol, heval li ser rêol û tarîqatan jî baş lêkolîn bikin. Bi taybetî jî li ser Naqşibendiyê divê lêkolîn bên kirin. Lewra Naqşibendî, li Kurdistanê pir tê nîqaş kirin û

demekê di nava me de jî pir neyînî dihat nirxandin. Niha kêmek baştir e, lê hê jî di nirxandinên me de lewazî hene. Neqşibendî çawa û ji bo çi pêş ket, tesîra wê çi bû? Her wiha ji bo Kurdan çi aniye û çi daye windakirin? Em van mijaran baş lêkolîn bikin. Bi nerîna redkirinê ku heya niha hindek hevalên me wisa nêzik dibûn lê temaşekirin, şaş e.

Lewra beşeke civaka me, heya îro li ser vê tarîqatê dimeşin. Beşeke şêx û pêşengên vê tarîqatê jî, ji bo Kurdiniyê çûne. Ger nêzikbûn wisa bibe, bertek çêdibin. Mesela beriya 3-4 salan, di kowara Welatê Azad de, hevalekî me nivîsek nivîsandibû li ser Naqşibendiyê. Li Başûr û Rojhilat, dostên me Neqşibendî bi piranî eciz bûn. Em mehekê meşqûl bûn ku wan qaneh bikin. Lewra ew nivîs, pir teng û dogmatîk hatibû nivîsandin. Bi vî rengî nabe. Ya mûhîm mirov hinekî baş bixwîne û baş şîrove bike, dê baş bibe. Ew naye wê mahneyê ku em tarîqatgeriyê bikin.

Ew 200 sale, li Kurdistanê di navbera Naqşibendî û Qadiriyê de nakokî hene. Ger tu bi wî rengî biaxifê, hinekê ji te re bibêjin tu alîgirê falan tarîqatêyê. An jî dê bibêjin, tu ol red dikê. Em ne Qadirî ne, ne jî Naqşibendî ne, çima em bi wî rengî nêzik bibin? Hinek belge dibêjin, Abdûlqadirê Geylanî Kurd e, lê hinek dîroknivîs vê qebûl nakin. Mirov dikare bibêje, nêzikî Kurdistanê ye. Lê Naqşibendiya nû, bi riya Kurdan belav bûye. Piştî salên 1811'î Naqşibendiya nû, bi riya Mevlana Xalîd belav bûye. Niha Endonezya li ser tarîqata Naqşibendiyê diçe.

Li dinê, Endonazya weke mînaka Îslama nerm tê nîşandayin. Demekê dixwastin Tirkiye, weke Endonezya bi rê ve biçe. Endonezya bi riya Naqşibendiyê rêve diçe û Mevlana Xalîd jî weke pêximber dibînin. Li Efrîqa, ew miletên ku ne Ereb in, beşeke wan Naqşibendî girtine. Di nava Ereban de tesîra Naqşibendiyê kêm e. Li Iraqê hinek heye, lê li Sûîdî û wan deran Wahabî zêdetir bi tesîr e. Tesîra Naqşibendiyê li Kurdistan, Tirkiye û Îranê heye. Li navarasta Asya û Efrîqa tesîra wê heye. Ew jî Naqşibendiya nû ye. Di dîrokê de jê re dibêjin Neqşibendiya Nû ya Xelîdî.

Çiqasa qîmeta Îbnî Haldun û Celaledînî Rûmî heye, divê em Mevlana Xalid jî wisa binirxînin. Gelek Tirk behsa Mevlana Celaledînî Rûmî dikin, lê Mevlana Xalîd jî teşîr dikin. Kesê ku cara yekemîn ol, bi Kurdî nivîsandiye Mevlana Xalîd e, em çima înkar bikin. Bi Farsî û Erebî jî nivîsandiye, lê bi Kurdî jî ol û helbest nivîsandine. Em nabêjin kesekî sosyalîst û nizanim çawa bûye. Em li gorî wê demê dinirxînin. Kesekî pêşengê civakê bûye û eslê xwe jî red nekiriye. Hinek dibêjin, "temenê wî kêm bûye, an na dixwastiye ol û tarîqata Kurdan pêş bixe."

Lêkolînên bi vî rengî jî li ser wî tên kirin. Aliyekî objektîf yê van nirxandinan heye. Lewra di nivîs û helbestên wî de diyar e. Lê ew yek tam formûl nebûye. Jixwe 8-9 salan li Kurdistanê maye. Pişît wê 2-3 salan li Bexda maye, 2-3 salan jî li Şamê maye û wefat kiriye. Mirov li ser vê mijarê lêkolîn bike, dê baş bibe.

Ji aliyê civakî ve, ji ber ku di wê serdemê de olê deshilatî li Îranê Şîa ye, li Osmaniyan jî Sûnîtiye, tarîqata serwer jî Qadîrî ye, civak nerehet jiyan dike û ew terîqet zû belav dibe. Sedema zû belavbûna tarîqata Naqşibendî, hem taybetmendiyên Mevlana xalîd in, hem jî rewşa objektîf ya civakê ye. Diyare ku Mevlana Xalîd jî, van mijaran baş dinirxîne û li ser wê esasê tevdigere.

Rêgeza esasî ya Naqşibendiyan ku ji Qadiriyan cudatir e, ew e; di Qadirêda pêwîste tu ferz û sûnetan baş bînê cih. Dibêje, “îbadet ew e ku tu bi eşkere û bi Cimaet îbadet bikî.” Di Neqşibendida îbadet ew e ku tu bi Dil bikey.  Ji ber wê navê Naqşibendî lê hatiye kirin. Dibêje, “îbadet ew e ku tu li ser dil neqiş bikî.” Ji bo vê Neqşibendî, Qadirayan rexne dikin û dibêjin, “Qadirî bi rastî ne îmandar in, lê bi awayekî şeklî xwe îmandar nîşan didin.” Qadrî jî dibêjin, “baweriya Neqşibendiyan ne bi îmanê heye, ne jî Xwedê heye, kî dizane ku bi dil çi dikin.” Ji ber vê yekê Neqşibendiyên esil, nimêj nakin. Dibêjin, “em bi dil, îman dikin.” Dema ku dikevin nava civakê û cihekî dîtir nimêj dikin, lê ji bo xwe nakin.

Qadirî jî wan rexne dikin û dibêjin, “ne îmandar in.” Cudabûneke din zîkir e. Zîkra Qadirî eşkere ye. Ew ên ku porê xwe û rûyên xwe dirêj dikin, li xwe dixin Qadîrî ne. Nexşibendî wê qebûl nakin. Lê îro gelek şêxên Neqşibendî weke Qadiriyan dikin. Lewra civak li ser wan gef dike, da ku zikîr bikin. Lê di eslê xwe de zîkirê Qadirî bêdeng e. Ger bixwazin zîkir bikin, diçin cihekî û lêhûrbûn dikin. Di perspektîfa Neqşibendiyê de dibêje, “ger tu bixwazê zîkrê xweda bikî, tu dikarê di dema kar de jî zîkir bikî.” Ew jî mişqûleyeke di navbera wan de ye. Li ser vê esasê hev û din carna teşîr jî bikin.

Her wiha Qadîrî dibêjin, “tu biçê û di nava cemeatê de îbadêt bikî baştir e, xeyrî wê zêdetir e.” Lê Neqşibendî dibêjin, “ne şerte ku cemeat hebe, zîkîr û îbadet bi tenê jî dibe. Bes bila dilê te hebe.” Di nêzikbûna pergala perwerdê de jî cûdabûn hene. Di Qadiriyan de cihê mizgeftê û cihê şêx cûda ye. Mizgeft cihê nimêjê ye, cihê şêx jî cihê perwerde û weaz girtina ji şêx e. Neqşibendî vê jî rast nabînin û dibêjin, “divê cihê nimêjê û cihê şêx yek be.” Ji ber vê pergala wan ya mizgeftê re dibêjin, “xeneqe.” Niha li gelek cihên Kurdistanê hene, ew

Xeneqe li ser pergala Neqşibendî hatine çêkirin. Jiyanê civakî, perwerdê û îbadetê hemû li wê derê dibin. Lê di Qadiriyê de cuda dikin. Li ser vê jî hev û din rexne dikin.

Di nêzikbûna deshilatdariyê de, şêxên Qadirî dikarin hem şêx bin, hem jî rêveber bin. Me behsa Îslamê jî kir. Di Îslama Sûnî de, pêşeng hem dikare bibe sultan, hem jî dikare bibe xelîfe. Lê di Şîayan de ne wisa ye. Di Şîayan de pergala wîlayetê feqe heye. Di wîlayeta feqe de rêberê ol, nabe serokomar. Niha jî li Îranê wisa ye. Elî Hemaneyî, rêberê civak û ol e; nabe serokê îdarî û siyasî. Nejad, Rûhanî û yên din dibin serokomar, lê ew nabe. Ger yek bibe rêberê ol, divê êdî bi karên civak û ol re meşqûl bibe. Di Sûniyan de, dikare hem bibe xelîfe, hem jî dikare bibe sultan. Terîqatiya Qadîrî weke Sûnîtiyê ye. Kesek dikare hem rêberê tarîqatê be, hem jî berpirsyarê dinê be. Lê di Neqşîbendiyê de, yekî şêx be divê zêdetir xerikî ol be. Kesê ku xerikî dinê bibe jî, divê perspektîfa xwe ji wî bigre.

Lê niha ne bi vî rengî ye. Niha bi piranî di vê mijarê de Neqşibendî jî, weke Qadîriyan bûne. Di Nexşîbendiye de her kes dikare bibe şêx, ger bixwîne û pêwîstiyên wê bîne cih her kesek dikare bibe şêx. Qadîrî jî destpêkê wisa bûye, lê bi demê re şêxtiya Qadiriyê bûye xanedanî û mîranî. Lê şêxtiya Neqşibendî jî niha bûye malbatî. Di destpêkê de hem Qadirî, hem jî Neqşîbendî ne wisa bûn. Dîqat bikin, dema ku Mevlana xalîd wefat dike, birayê wî nabe cîgirê wî. Kom dibin û di nava çend kesên ku Mevlana xelîd diyar kirine de, yekî hildibêjêrin. Lê piştî 40-50 salî, êdî pergala şêxtiya Neqşibendî jî dibe malbatî.

Di serdema hatina Mevlana Xalîd de, ji ber ku hin tiştên nû hene; li Kurdistan, Anatolya û Îranê balkeş tê dîtin û çêker tê dîtin. Bi taybetî ji ber ku Mevlana Xalîd bi Kurdî hin tiştan dinivisîne, zêdetir bala civaka Kurdistanê dikşîne. Tiştekî din ku di Neqşibendiyê de balê dikşîne; jin jî dikarin bibin şêx. Lê di Qadiriyan de jin nikarin bibin şêx. Niha jî di nava Neqşibendiyan de şêxên jin hene. Mesela niha şêxê malbata Sûrçiyan jin e. Berê digotin, dayik û xûçk. Dayik miriye, lê xûçk ango Zerîfe maye û şêxê Sûrçiyan e. Li Rojhilat demekê şêxên jin hebûn. Mesela li milê Qendîl, Şêx Eyşe heye. Ew hinek reform û cudabûnên ku tarîqeta Neqşibendiyê pêş xistine û bi wan reforman bal kişandiye. Li gorî rewşa wê demê, bûye sedem ku zû jî belav bibe.

Di serdema Mevlana Xalîd de, Neqşibendi heya Kurdistan, Iraq, Îran û Şamê belav bûye. Piştî wî jî xelîfeyên wî berdewam kirine. Hêdî hêdî zêdetir cihê xwe girtine. Bi mîrên Kurdan ve jî li gel hev dimeşin. Lê dema ku mîrtiya Kurdan namîne, rista şêxan derdikeve pêş. Lewra


yên ku li ser civakê bi bandor in, tarîqat in. Mesela dibêjin, dema ku Mevlana Xalîd wefat dike, 20 hezarî zêdetir mûrîdên wî hene. 20 hezar mûrîd, arteşek e. 67 xelîfeyên wî hene, îmamên ku li ser rêbaza wî perwerdê dikin in. Her yek li herêmêkê civakê perwerde bike, ne kêm in. Piştî mirina Mevlana Xalîd, bîst salan ew tarîqat zêdetir cihê xwe digre û dibe tarîqateke ku li her herêmêkê bandora wê heye.

Ew dibe bingehek ku piştî mîrtiyan, şêx rista pêşengtiyê bilîzin. Bi taybetî şêxên Neqşibendî derdikevin pêş, yên Qadirî kêmtir in. Di dawiya sedsalên 19'emîn de, tevgerên Kurd êdî bi pêşengtiya şêxan de derdikevin pêş.

*Serhildana Şêx Ûbeydûlahê Nehrî*

Ew sedemên ku me hijmartin, bûn sedem ku piştî salên 1870'î tevgera Kurd di pêşengtiya şêxan de pêş ve biçe. Ji wan tevgeran yek jî tevgera Şêx Ûbeydûlahê Nehrî ye. Weke tevgera yekem ya netewî tê naskirin. Me berê got, li derdora mîrtiya Botanê kombûna, mîrtiyên Kurd; ji bo yekîtiya netewî gavek bû. Tevgerên ditîr jî her yekê, ji aliyekî ve xwedî mahneyekê bûn. Lê tevgera yekem ku li ser navê netewiyetê tevdigere, tevgera Şêx Ûbeydûlahê Nehrî ye.

Şêx Ûbeydûlah, bi xwe kûrê Seyîd Taha ye. Seyîd Taha, dema ku tevgera Nexşibendî nas dike, ew jî tevlî wê tarîqatê dibe. Piştî ku Seyîd Taha wefat dike, birayê wî dibe şêx. Piştî ku ew jî wefat dike, kûrê Seyîd Taha, Şêx Ûbeydûlahê Nehrî dibe şêx. Şêx Ûbeydûlah, diyareke ku zanayekî serdemê ye, tesîra wî li ser civakê zêde ye. Hinek dibêjin 12 hezar mûrîdên wî hebûne. Li gorî îro tesîra wî li ser parçeyê Bakûr, Başûr û Rojhilat hebûye. Ango hem li Kurdistana Osmaniyan, hem jî li Kurdistana Îraniyan tesîra wî hebûye.



**SÊX ÛBEYDÛLAHÊ NEHRÎ**

Dema ku di nava wan dewletan de hin guhertin çêbûne, Şêx Ûbeydûlah jî hewl daye ku tevgereke Kurd pêş bixe. Têkilî bi şêx, serokeşîr û rewşenbîrên wê serdemê re pêş dixe. Di sala 1880'an de, cara yekem di navbera pêşengên Kurd de civîneke berfireh pêş dixe. Hejmareke zêde mirovên oldar, rewşenbîr û mirovên xwedî statû tevlî vê civînê bûne. Di encamê de biryar didin ku bi navê "Yekîtiya Kurdan" rêxistineke Kurdî çêbikin. Ew rêxistina yekeme ku di dîroka Kurdan de çêbûye. Her wiha biryar didin ku pêk ve ji bo serxwebûna Kurdan kar bikin.

Di wê demê de têkiliya Şêx Ûbeydûlahê Nehrî li gel dewleta Osmaniyan heye, li gel dewleta Îranê jî heya astekê têkiliyên wî hene. Lê ji ber mezheba wî sûnî ye, nêzikî Osmaniyan e. Hinek dibêjin, xeber daye Osmaniyan, da ku li Rojhilatê Kurdistanê tevgerekê bike. Ji ber

vê di destpêkê de Osmanî bûne alîkar jî. Lê hinek jî dibêjin ne bi wî rengî ye. Dibêjin, Şêx Ûbeydûlah Nehrî gotiye; “li gorî planeke em di destpêkê de Kurdistana Rojhilat rizgar bikin, pişt re em Kurdistana di bin destê Osmaniyan de ye jî rizgar bikin.” Li ser vê esasê jî tevdigerin.

Şêx Ûbeydûlah, di destpêkê de li Rojhilatê Kurdistanê herêma Ûrmiyê û Mahabad dest bi tevgerê dike. Pişt re berê xwe dide Bakûrê Kurdistanê, da ku derdorên Şemzînanê jî bigre. Dema ku Osmanî dibînin ku, hedefa wî firehe û berê xwe dide Bakûr jî; li hemberî wî dikevin nava komployan.

Di heman serdemê de di navbera Osmanî û Rûsan de jî şer heye. Lê piştî ku şerê wan xilas dibe, di sala 1881’an de Osmanî û Îran, bi alîkariya Rûsya êrîş dibin ser Şêx Ûbeydûlah. Di encamê de tevgerê teng dikin, dipelçiqînin û Şêx Ûbeydûlahê Nehrî jî digirin. Di 1882’yan de dişînin hîcazê û wî mişextî dikin. Piştî salekê li wir wefat dike. Bi vî rengî, tevgera Kurdî ku şêx Ûbeydûlah çend salan pê re mijûl dibe jî têk diçe.

*Tevgera Şêxê Barzan*

Di wê serdemê de tevgereke din ku di pêşengtiya şêxan de pêş dikeve, tevgera şêxê Barzan e. Mirov vê mijarê jî divê baş lêkolîn bike. Divê bi çavê îro, em 100 sal beriya niha nenêrin. Şêxên Barzanî jî, Neqşibendî ne. Malbata Şêxê Barzanî jî, ji eşîreta Zebarî ne. Lê li herêma Barzan, gundekî biçûk jiyan dikin. Bapîrên wan, diçin gel Seyîd Taha yê Nehrî û li wir terîqatê digirin û dibin Xelîfeyên Terîqata Neqşibendî.

Di terîqatê de xelîfe, dikare perwerde bide, lê nikare îcazet bide. Weke me got, 67 xelîfeyên Mevlana xelîd hebûne. Ew xelîfe dikarin perwerde bidin; lê heya ku şêx nebêje, ew nikarin îcazet bidin. Yên ku perwerde kirine, dişînin gel şêx û şêx îcazet dide wan. Ji malbata Barzanî jî, Tacedîn Barzanî (hinek dibêjin navê wî Mihemed e, hinek jî dibêjin Abdûrahman e, lê laqaba wî Tacedîn e) derdikeve pêş. Di Îslamiyetê de, laqaba her kesî heye.

Mesela Şêx Osmanê mezin heye, ew jî ji xelîfeyên Mevlana xelîd bûye; laqaba wî Siracdîn e. Laqaba Mevlana Xalîd, di nava Ereban de Ziyadîn e; ango kesê ku dîn ronî dike. Laqabê Barzanî jî, Tacedîn bûye; ango kesekî ku ji bo dîn weke tac e. Ew jî perwerdeya olî dibîne û diçe gundê Barzan. Êdî li wir xeneqe û cihên perwerdê çêdike. Dema ku mûrîd zêde diçin gel wî û perwerde dibînin, êdî navê wî dikin şêxê

Barzan. Ango Barzan ne eşîret e, navê gundê wan e. Mesela em dibêjin Şêx Ûbeydûlahê Nehrî, Nehrî jî ne eşîr e. Di canda kevn de wisa bûye; dema ku şêx diçe cihekî rûdine, ji wî re dibêjin şêxê wê derê. Abdurahman Barzanî jî wisa dibe şêx Tacedîn Barzanî.

Piştî wî Evdilselam dibe şêx, piştî wî jî Mihemed dibe şêx. Ew şêxên herêma Barzan in. Dema Evdilselamê mezin, dibe şêx û xelîfeyê Şêx Ûbeydûlah e. Bapîrê wî xelîfeyê Seyîd Taha bûye; Ew jî xelîfeyê Şêx Ûbeydûlahê Nehrî bûye. Lê dibêjin, Şêx Evdilselam xwe weke şêx û xewz îlan kiriye. Di Îslamiyetê de xewz, ji şêx mezintir e. Weke lûtkeya şêxtiyê ye. Ji ber ku gelek mûrîdên Şêx Evdilselam Barzanî çêdibin û di nava mûrîdên xwe de tê hezkirin, hinek jê re dibêjin xewz.

Wê demê di navbera Şêx Ûbeydûlahê Nehrî û şêx Evdilselamê Barzanî de nakokî çêdibe. Lewra ger şêx Evdilselam bibe xewz, ji Şêx Ûbeydûlah Nehrî mezintir e. Şêx Ûbeydûlah Nehrî, wê demê bang Evdilselam Barzanî dike û dibêje, “tu li gorî ûsûl naçê.” Ew jî qebûl dike û xelîfetiya xwe berdewam dike. Jixwe di serdema ku tevgera Şêx ûbeydûlah têk diçe, Şêx Evdilselam Barzanî jî dimre. Hinek dibêjin, ji ber ku di navbera wan de nakokî hebûye, di dema serhildanê de pir alîkariya Şêx Ûbeydûlahê Nehrî jî nekiriye. Hinek jî dibêjin alîkarî kiriye.

Piştî ku Evdilselam Barzanî dimre, kurê wî Mihemed Barzanî dibe şêx. Mihemed Barzanî jî dibe bavê Mele Mistefa Barzanî. Ji sala 1882’yan, heya sala 1903’yan şêxtiya Mihemed Barzanî berdewam kiriye. Di dema wî de jî mûrîdên wan zêde dibin û ji ber ku Şêx Ûbeydûlah Nehrî jî miriye, bi serê xwe tevdigere. Êdî Barzanî, bi vî rengî statûya şêxtiyê digirin. Piştî ku şêx Mihemed wefat dike, kurê wî şêx Selam dibe şêx. Penc kurên şêx Mihemed hene; Selam, Ehmed, Mihemed Sidiq, Babo, Mistefa ye; yê herî biçûk Şêx Mûstafa ye. Dema ku bavê wî dimre, Mistefa hê di zikê dayika xwe de ye.

Şêx Selam, ji aliyê ol û rewşa dinê ve mirovekî hişyar bûye. Ji ber vê ji aliyekî ve dixwaze tarîqata xwe pêş bixe, ji aliyekî ve jî hinek reformên civakî dike. Tesîra wan reforman hê jî li herêma Barzan heye. Reforma yekemîn, dibêjin divê mûrîdên me alîkariya hev û din bikin. Lewra di wê serdemê de hûkmê eşîra Zêbar li herêmê zêde ye. Dema ku dibînin Barzanî bi bandor dibin, li ser wan tûndiyê dikin. Ango dibêjin, ew ji eşîra me ne, çawa dikarin bi vî rengî tevbigerin? Lê şêxê Barzan jî di serdema şêx Mihemed de hinekî li hemberî eşîra Zêbar derdikevin, yên piştî wî tên jî helwesta bavê xwe berdewam dikin.

Ew nakokiya Zebarî û Barzaniyan, heya niha jî berdewam dike. Berê rista axayan zêde bûye, rista şêxan kêm bûye; lê di wê serdemê de jî rista şêxan zêde dibe. Ew çanda hevgirtina mûrîdan, li wê herêmê hinekî belav dibe. Li herêmên din kêm e, lê ew herêmên sînor wisa lê tê ku her eşîrek şêxekî derdixe. Mesela eşîra Biradost, bi şêxê Lolan ve girêdayî ne; eşîreta Sûrçî, bi şêxê Bicêl ve girêdayî ne; eşîreta Zebarî, bi şêxê Barzanî ve girêdayî ne. Pişt re şêxê Barzan, êdî ji eşîretê derbas dike. Eşîreta Zêbar dixwest, wan di bin kontrola xwe de bigre, lê ji bin kontrola wan derketin.

Di dema şêx Selam de, Zebar nanê hinekên wan jî qut dike. Ji ber vê şêx Selam dibêje, "mûrîdên ku xwedî derfet in, divê alîkariya mûrîdên ku nanê wan hatiye qutkirin bikin." Dibêje, "malê mûrîdekî, malê hemû mûrîdan e. Şêx jî bê mal e, ez ji bo xwe mal naxwazim." Ew li ser civakê tesîr dike. Mûrîdan teşvîqî jiyaneke komînal dike û xwe jî di nava wan de jiyan dike. Ji milê siyasî ve jî reformeke dike; dibêje, "yên ku şêx qebûl dikin, divê êdî şêx guhdarî bikin, divê êdî axa guhdarî nekin." Wê demê beşeke mûrîdên Barzanî, Zebarî ne; hinek Gerdî ne, hinek Mûzûrî ne hinek Şêrwanî ne, hinek Dolemerî ne. Bi vî rengî çend salan bi wan re meşqûl dibin.

Di salên 1902-4'an de formeke nû çêdike, niha ji wê formê re dibêjin eşîreta Barzanî. Ne weke eşîrên berê ye, formekî nû ye. Forma şêx û mûrîdên wî ye. Mesela birayekî Zebarî dibe Barzanî, lê birayekî din ji ber ku ne mûrîdê wî ye, nabe Barzanî. Êdî perspektîf ew e; divê axaftina şêx, ji ser her axaftinê re bigirin. Yek jî ji bo ku forma xwe pêş bixin, remzeke ji bo xwe datînin. Divê êdî dolbend-şaşika sor girê bidin. Dibêjin, "em jî weke Elî nunertiya Îslama rast dikin, ji ber vê yekê em jî weke leşkerên Elî şaşikên sor girê bidin." Ew yek niha di nava Barzaniyan de bûye çand.

Ji milê xwezayê ve jî hinek gavan diavêjin. Di nava Barzaniyan de neçîrvanî qedexe ye, yên ku dibin mûrîdên wan divê neçîrvaniyê nekin û zirar nedin xwezayê. Niha jî li herêma Barzan, pir zêde neçîrvanî tune, bûye çand. Ew dibe sedem ku tesîra şêxê Barzan, li herêma Behdînan û beşeke Bakûr jî pêş bikeve.

Di wê serdemê de Osmanî, ji ew rewşa Barzanî eciz dibin. Ji ber vê yekê, demekê şêx Selam digirin. Dixwazin dev ji van tevgerînên xwe berde û li ser vê esasê wî ber didin. Lê dema ku dibînin, dev ji ew nêzikbûnên xwe bernade, di sala 1909'an de di navbera Osmanî û Barzaniyan de şer çêdibe. Ji bo çi şer çêdibe? Yek, Osmanî dixwazin wê herêmê kontrol bikin. Şêxê Barzan, ji xwe re weke xetere dibînin û

dixwazin pêşiya wî bigirin. Di serdema Îteat û Terakiyê de, Osmanî dixwazin li wan herêman bingeha sazîbûna polîs ûhwd çêbikin. Lê Barzanî li pêşiya vê asteng in.

Bi vî rengî şerê Barzanî û Osmaniyan çêdibe. Dema ku şer giran dibe, Barzanî nikarin xwe bigirin. Şêx Selam û mûrîdên wî demekê diçin Bakûr, demekê diçin Rojhilat; bi awayekî tevger xwe diparêzin. Ew rewş, heya sala 1914'an de berdewam dike. Dema ku vê salê de Osmanî dikevin şerê cîhanê yê yekemîn, Osmanî bangî gaza û seferberiyê dikin. Wê demê bangî Şêx Selam jî dikin û dibêjin, "tu şêxekî oliyê, niha şerê me bi kafiran re heye, were da ku em bi hev bikin." Ew jî qebûl dike. Dema ku diçe Mûsilê ku ji hev bikin, di rê de tê girtin û li Mûsilê îdam dikin. Dema ku tê îdamkirin, li ser milet zêde tesîr dike.

Piştî şêx Selam (şêx Selamê duyemîn e), birayê wî şêx Ehmed dibe şêxê Barzan. Ew jî ji sala 1914'an, heya sala 1969'an şêxtiyê dike. Şêx Ehmed Barzanî jî, ji ser riya birayê xwe yê mezin diçe. Ji ber vê di nava mûrîd û gel de tê hezkirin. Li gel mûrîdên Barzan, Şêx Ehmedê Barzanî weke xweda tê naskirin. Jê re digotin, "xwedanê Barzan." Şêx Ehmedê Barzanî jî, di sala 1931-2'yan de li hemberî hûkimeta Iraq û Brîtanya şer dike. Ji ber ku têk diçe, direve Tirkiye; Tirkiye jî wî radestî Iraq û Brîtanya dikin.

Iraq wî heya salên 1936'an mişextiyê Başûrê Iraqê dike. Dema ku di 1936'an de mûrîdên Barzanî careke din serî radikin, Şêx Ehmed Barzanî carake dîtir tînin Kurdistanê, lê azad nakin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî jî li gel wî ye. Heya sala 1943'yan herdu jî li Sûleymaniyê di bin kontrolê de tên girtin. Di 1943'yan de jî Mele Mistefa Barzanî careke dîtir li hemberî Iraqê şer dike. Êdî Şêx Ehmed Barzanî pêşengtiya olî dike, Mele Mistefa Barzanî jî pêşengtiya siyasî dike. Mistefa Barzanî, eşîrên Başûrê Kurdistanê kom dike û ji sala 1943'yan, heya sala 1945'an şer dike. Lê dema ku di 1945'an de netîce nagre, derbasî Rojhilatê Kurdistanê dibe.

Wê demê li Rojhilatê Kurdistanê jî amadekariyên Komara Mahabad tên kirin. Mistefa Barzanî jî tevlî wê dibe û heya ku Komara Mahabad bin dikeve jî li wir dimîne. Pişt re jî derbasî Rûsya dibe. Şêx Ehmed Barzanî jî careke dîtir tê Iraqê û heya sala 1958'an girtî dimîne. Dema ku pergala qraltiyê xirab dibe, Şêx Ehmed Barzanî azad dibe; Mistefa Barzanî jî ji Rûsya vedigere.

Heya vê serdemê di nava Barzaniyan de, rista şêxên Barzanan esas in. Lê piştî sala 1958'an Mele Mistefa Barzanî, hêdî hêdî weke serokekî Kurd tê naskirin. Lewra hem çûye Mahabadê, çûye Rûsya, se-

roktiya PDK dike. Di nava Kurdan de tesîra wî zêde dibe. Lê di nava malbata Barzaniyan de, her Şêx Ehmed esas e. Kesên bi wan re jiyan kirine, her dibêjin, “heya ku şêx Ehmed Barzanî wefat kiriye jî, Mistefa Barzanî li hemberî wî çok dataniye û ew guhdarî dikiriye. Dema ku gotinên Şêx Ehmed xilas bûne jî, paşve diçûye û li hemberî wî vedikşî ye.” Weke şêx û birayê xwe yê mezin, rêz nîşan dida ye. Lê şêxên Barzan, tenê di nava Barzanan de bi tesîr bûne; Mistefa Barzanî jî ketiye nava siyasetê û derve jî tesîra wî dibe.

Heya 1969’an şêxtiya Barzan, li ser siyaseta wan jî hûkim dike. Lê dema ku di 1969’an de şêx Ehmed wefat dike, kesekî ku cihê wî dagre dernakeve. Du kûrên wî hene, lê hinek pirsgirek jiyan dikin. Li gorî tarîqata Neqşibendiyê, Şêx Ehmed kes ji xwe re weke cîgir diyar nekiriye, divê mûrîd diyar bikin. Mûrîd jî bi piraniya Xûrşîd diyar dikin, ev xarza Şêx Ehmed r mala Mistefa Barzanî bûye. Xurşîd jî kesekî zîrek bûye û her weke şandeya Şêx Ehmed diçûye derdorê û pirsgirekên wî çareser dikirine. Ji ber vê piraniya mûrîdan ew hilbijartiye, lê kûrên Şêx Ehmed ew qebûl nekirine.

Şêx Osman kûrê Şêx Ehmede, bavê Ethem Barzanî ye. Wî qebûl nekiriye ku Xûrşîd bibe şêx û gotiye “mafê min e.” Kurê dîtir jî Mihemed Xalîd e, wî jî pir daxwaz nekiriye, lê risteke wî jî hebûye. Ji ber vê heya du salan pirsgireka şêxtiyê berdewam kiriye. Li gorî ûsûl divê Xûrşîd bibe şêx, lê li gorî malbatê divê Osman bibe. Dibêjin, Xurşîd gotiye, “ez ji bo şêxtiyê, şer nakim.” Lê Osman pir dayatma kiriye. Di sala 1971’an de pirsgirek di navbera mûrîdên wan de derketiye û hinek şerê wan çêbûye. Wê demê Mistefa Barzanî jî, hem weke xal û mam, hem jî weke serokê Kurdan, li gel PDK dibe navbenkar.

Di netîceyê de dibêjin, “bila ne Xûrşîd, ne jî Osman bibe şêx; bila Mihemed Xalîd bibe şêx.” Li ser vê hin nerîn çêbûne; hinek dibêjin sedema ku Xûrşîd û Osman nebûne şêx, Mele Mistefa Barzanî bûye. Lewra herdu jî di meseleya şêxtiyê de, xwe ji Mistefa Barzanî mezintir dibînin. Dibêjin, “pêwîst dike ku Mistefa Barzanî gotina me bike.” Ji ber vê Mistefa Barzanî bi awayekî eşkere negotiye, lê hez nekiriye ku herdu jî bibin şêx. Xeynî vê dîtiye ku piraniya mûrîdan ji Xûrşîd hez dikin, ew jî dibe sedem ku di nava Barzanan de rista Mistefa Barzanî kêm bibe. Jixwe dibêjin, nakokiyên wan hebûne. Lê Mihemed Xalid, dostê Mele Mistefa bûye. Keça xwe jî daye kurê Mistefa Barzanî, ango Mesud Barzanî. Ji ber vê Mele Mistefa hez kiriye ku Mihemed Xalid bibe şêx. Da ku di dema pêş de pêk ve bimeşin, di dema pêş de ji bo kurê wî jî dibe qûvet.

Ji ber vê, ew bi xwe dibêjin, “piştî Şêx Ehmed, şêxtiya Barzan têk çûye.” Lewra ketiye bin serweriya siyasetê û Mistefa Barzanî. Ji ber vê yekê, dema ku di 1975’an de tevgera Mistefa Barzanî têk diçe û derdikevin derveyî welat, piraniya mûrîdên Barzanî pê re naçin. Di wê serdemê de, dibêjin mûrîd û kesên ku nêzikî Barzaniyan e, 6 hezar malbat in. Ji wan hezar malbat, bi Mele Mistefa Barzanî û Mihemed Xalid re diçin. Yên din li Başûr dimînin. Dema ku li Başûr dimînin, hûkimeta Iraqê jî rê nade ku ew biçin herêma xwe. Li herêma Hewlêrê qampekê ji wan re çêdikin, ji wê qampê re dibêjin, “Kûştepe.” Hinekan li wê qampê bi cih dikin, hinekan li milê Diyana û Herîr bi cih dikin.

Bi vî rengî li 3-4 cihan wan bi cih dikin û heya 1983’yan li wê derê dimînin. Di 1983’yan de dema ku şerê PDK û Iraqê hinekî xurt bû û bi alîkariya PDK, Îranê herêma Hecî Temenan girt; Iraqê jî ew kesên di qampê de xistin çemberê û hemû zilamên wan birin û kûştin. Ji vê bûyerê re dibêjin, “Enfala Barzanî.” Li gorî civakê dibêjin, di vê enfalê de 8 hezar kes kûştine. Li gorî belgeyan jî 5 hezar kes hatine kûştin. Yên mayî jî dibin û mişextî dikin, heya niha jî mişextî ne. Kesên ku çûne, bi piranî mûxalîfên mala Mistefa Barzanî bûne. Mûrîdên Şêx Osman û mûrîdên Şêx Xûrşîd in. Her wiha kurên Mele Mistefa ku, mûxalîfê Mele Mistefa ne û li gel wî neçûn jî di nav de ne. Sê kurên mezin yên Mele Mistefa; Loqman, Sebîr û Ûbeydûlah ku bi bavê xwe ve nakokiyan jiyan dikin jî di nav de ne.

Hinek di salên 80’î de tên mişextî kirin, lê piranî di salên 83’yan de tên mişextî kirin. Bi vî rengî şêxtî û siyaseta mala Barzanî jî dikeve destê Mistefa Barzanî, Îdrîs Barzanî û Mesud Barzanî. Niha hinek neviyên Şêx Babo û şêx Selam mane; hinek li Sûleymaniyê, hinek jî li Ewropa jiyan dikin. Ew eciz in, rexneyên wan li ser mala Mistefa Barzanî hene. Dibêjin, “şêxtiya me, şêxtiyeke mezin û pîroz bû; van xirab kirin. Niha hemû xistine xizmetê xwe û ji bo xwe kar tînin.” Jixwe piranî hatine tasfiyekirin, yên mayî jî wisa dibêjin. Hinek mûrîdên Xûrşîd jî mane, lê ew qet tevlî siyasetê nabin. Dibêjin, “em ne bi Barzanî re ne, ne jî kesekî din re ne.” Sofîgerî dikin û dibêjin em Xûrşîdgeriya xwe diparêzin. Em bi vî rengî dikarin behsa malbata Barzanî bikin.


Bi vî rengî, hem ji aliyê şêxtî, hem jî ji aliyê siyasetê ve hinek agahiyên me di derheqê vê malbatê de hebe baş e. Lewra niha piraniya xelk û hevalên me tenê Mesud Barzanî dîtine û siyaseta wan ya îro dizanin. Ev zanîn tenê nabe bersiv. Em îro dibînin siyaseta wan ne siyaseteke baş e. Girêdana derve li pêş e, li gorî pêwîstiyên civakê tev-

negerîn heye. Ew di nava gel de, bertekan çêdike. Gelek kes jî bi van bertekan her tiştî reş dikin. Ew rast nene. Dîrokeke ew qesa kevn nene, mirov dikare bi awayekî rast binirxîne û aliyên wê yên baş û xirab bigre dest. Em tenê li ser esasê reşkirin û spîkirinê, nêzîkî şîrovekirina dîrokê nabin.

Hem ji aliyê olî, hem jî ji aliyê siyasetê ve, ew malbat jî ji 100 salî zêdetire di nava civaka Kurd de xwedî rist e. Ger em rast binirxînin, em dikarin bi şaştiyên wan re jî têkoşîneke baş bikin. Lê ger em bi nêzikbûneke dogmatîk nêzik bibin, em nikarin encam bigirin.

*Tevgera Şêx Seyîdê Berzencî*

Dervayî Barzaniyan, di salên 1900'î de rista şêxên Berzencî ku bi terîqeta Qadirî tevdigerin heye. Bavê şêx Mehmûd heye, şêx Seyîdê Berzencî ye. Di sala 1908'an de, dema ku Cemiyeta Îteat û Teraqiyê hekîm dibin, Seyî d Berzencî hinek li hemberî wan disekine. Pişt re di nava Cemiyeta Teavûnî Kurdistan de riste xwe dîlîzin. Li herêma Sûleymaniyê û di nava mûrîdên xwe yên li herêmên din hene de rista xwe dîlîzin. Lê Cemiyeta Îteat û Terakiyê, ji van pêşketinan eciz in û ji ber vê di 1909'an de Cemiyeta Teavûnî Kurdistan digirin.



**ŞÊX MEHMUD BERZENCÎ**

Dema ku vê cemiyetê digirin, malbata Berzencî jî digirin û dibin Mûsilê. Di nava wan de şêx Seyîd, Şêx Ehmed, şêx Mehmûd heye. Li Mûsilê bi komplo, Şêx Seyîd û şêx Ehmed dikûjin. Lê şêx Mehmûd derbasî Sûleymaniyê dibe û heya sala 1914'an di nava mûrîd û xelkê xwe de, xwe diparêze. Dema ku şerê cîhanê yê yekemîn çêdibe, Osmanî bi mecbûrî hakîmiyeta Sûleymaniyê didin Şêx Mehmûd. Lewra dibînin ku tesîra wî li ser civakê zêde ye û gel pê ve girêdayî ye. Heya dawiya şerê cîhanê, dibe hakîmê herêma Sûleymaniyê. Bi vî rengî hewldaneke malbata Berzencî ku dixwazin pêşengtiya tevgerên Kurd bikin jî çêdibe.

*Tevgera Mele Selîmê Bîdlîsî*

Mele Selîmê Bîdlîsî Li despeka sedsla 20’ ê da, di nava civakê de kesekî bi tesîr e. Li gel şêx Şehabedîn û komek kes, li herêma Bêdlîsê dixwazin tevgereke siyasî pêş bixin. Di sala 1913’an de Demekê herêma Bêdlîsê û derdorên wê dixin bin serweriya xwe. Dema ku Osmanî mûdaxale dikin, têk diçin û Mele Selîm xwe radestî konsolosiya Rûsya ya li Bêdlîsê dike. Dema ku di 1914’an de, di navbera Osmanî û Rûsya de şer çêdibe; Osmanî êrîşî konsolosiya Rûsya dikin û wê derê digirin. Mele Selîm û hevalên wî jî îdam dike. Ew tevger jî, bi vî rengî piştî salekê ji holê radibe.

*Tevgera Îbrahim Paşayê Wêranşarî*

Îbrahîm Paşayê Wêranşarî axayê Hozê Millî ye. Endamê tevgera alayên Hamîdiyê ye. Ew jî dixwaze li hemberî Cemiyeta Îteat û Terakiyê helwest nîşan bide û mintiqaya Qamişlo, Serekaniyê, Wêranşer û Mêrdînê bixe bin serweriya xwe. Ji bona wî Di salên 1908-9’an de, tevgereke wî çêdibe, hinek herêman dixe bin destên xwe. Lê bi alîkariya Fransa, Îteat Terakî êrîşî wî dikin û têk diçe. Wê demê Îbrahîm Paşa dixwaze, xwe bigîne Çiyayê Şengalê û tevgera xwe berdewam bike. Lê beriya ku bigêhêje Çiyayê Şengalê bi nexweşî wefat dike. Tevgera wî jî wisa ji holê radibe.

*Tevgera Eşîreta Şikak*

Di van deman de, li Rojhilatê Kurdistanê hin hewldanên eşîra Şikak hene. Caferê Şikak weke kesekî navdar û li ser civakê bi bandor e. Lê di sala 1905’an de, wî jî bi komplo digirin û li Tebrîzê darve dikin. Piştî wî, di salên 1913-14’an de birayê wî Sîmkoyê Şikak hinek hewldan çêdike. Heya xilasiya şerê cîhanê yê yekemîn jî tevgera wî berdewam dike.

Bi vî rengî ji dawiya salên 1800’î heya, xilasiya şerê cîhanê yê yekemîn, hin tevgerên Kurd ku di pêşengtiya şêx, mele û axayan de pêş dikevin hene. Lê tiştê ku diyare; şêx, axa û mele jî weke mîrên berê, pir zêde ne xwediyê alternatîf in. Şêwaza rêbertiya mîran, careke din bi rêberiya şêx, mele û axayan dubare dibe. Ji ber vê ew tevger zêde encam nagrin.

### *-Di Serdema Şerê Cîhanê Yê Yekemîn De Rewşa Kurdistanê*

### *1-Beriya Şer Rewşa Kurdistanê*

Di van deman de hinek bûyerên din jî hene. Tevgera Masonî, li Ewropa û Almanya pêş dikeve û berê xwe dide dewletên Osmanî û Îranê. Li van deran jî hêdî hêdî bingeha xwe ava dikin. Her wiha Îngîltere û Fransa, hin mektebên nû li Osmanî û Îranê pêş dixin. Piştî salên 1870-80 nifşekî nû çêdibe. Ew nifş ji wan kesên ku di nava van mekteban de cih digirine. Piranî jî kurên axa û bega ne, hinekên wan tevlî serhildanan jî bûne û têk çûne. Hinek jî yên dewlemend û bajaran de dixwînin in.

Di van deman de li Kurdistanê, derdoreke wisa çêdibe. Hinekên wan tevlî tevgerên nû yên Tirkiye û Îranê dibin. Li Tirkiye, piştî salên 1890'î hin tevgerên nû pêş ketin, weke şaxên Masoniyetê bûn. Di bin navê tevgerên pêşverû û Osmaniya nû de çêdibin. Ji van tevgeran ya herî mezin, tevgera Îtîat û Terakî ye, bingeha wê di sala 1892'yan de tê danîn. Heya sala 1908'an di nava civaka Osmanî de bi rengên cuda kar dike û xwe rêxistin dike, di vê salê de jî deshilatdariya Osmaniyan digre dest.

Dİ destpêkêda di sala 1908 de deshilatdariya Sultan Abdûlhamîd teng dikin, di sala 1909'an de bi temamî ji peyvirê digirin. Kurd jî, di nava vê tevgerê de cih digirin; heya salên 1908'an hejmareke ciwan, rewşenbîr û pêşengên Kurd, di nava vê tevgerê de cihê xwe digirin. Tevlêbûna ciwan û rewşenbîrên Kurd, li ser esasê ku ew tevger dixwaze nûbûn û pêşketinan çêbike ye. Li ser esasê netewiyetê ew tevger pêş neketibû, di destpêkê de rîçikekî bi vî rengî tune bû.

Li Îranê jî piştî salên 1890'î hinek tevgerên siyasî, çepgerî û rewşenbîrî pêş dikevin. Bi taybetî li herêma bakûrê Rojhilatê Kurdistan û herêma Azerbaycan û Tahran tevgerên bi vî rengî pêş diketin. Çend hincetên esasî yên rêxistinbûna wan hene. Yek, konevaniyên aborî yên deshilatdariya Qacarî şaş dibînin. Aboriya Îranê bi giştî ketiye bin serweriya Rûsya û Îngîltere. Xelkê Îranê xwedî berheme lê ji ber pêkanînên weke gtemenûkê, berhemên wan bê nirx dimînin û pere nakin. Ew di nava civakê de dibe pirsgirek.

Deshilatdariya Qacarî, deshilatdariyeke otorîter e; bi taybetî piştî ku Rûsya û Îngîltere li ser wan bandor dibin hesabê civakê nakin. Ew bûne sedem ku piştî salên 1890'î li Îranê, hem zaneyên olî, hem rewşenbîr, hem jî çînên cuda yên Îranê hin tevgeran pêş bixin. Heya sedsala 20'emîn jî ew tevger pêş dikevin. Ew du sedem bûn bingeh ku li Îranê, heya sala 1905'an tevgera Meşrûtiyetê pêş bikeve.

Armanca tevgera Meşrûtiyet ew e; divê êdî li Îranê destûrên fermî û maqezagon pêş bikevin, da ku her tişt bi destê padîşah pêk neye. Ji aliyê din ve divê hilbijartin çêbibe û çînên cuda yên Îranê, di nava parlemento û siyasetê de cihê xwe bigirin. Ji aliyê din ve jî rêveberiyên olî dixwazin, di nava rêveberiyê de hinekî cih bigirin. Her wiha tê xwestin ku ji aliyê îdarî û jiyanî ve hinekî firehî çêbibe. Jixwe di sala 1905'an de ew tevger pêş dikeve. Ji bo tevgerîna qral çarçoveyekê datînin, hinek qanûnan derdixin. Biryar dan ku parlemento bê hilbijartin û komîsyonên olî çêbibin û zaneyên olî di nava van komîsyonan de cihê xwe bigirin. Bi vî rengî ji sala 1905'an heya salên 1911'an komek qanûnên reformê li Îranê çêdibin.

Pergala deshilatdariya Qacarî lewaz dibe. Ew lewazbûn jî dibe sedem ku heya sala 1925'an deshilatdariya Qacarî heya ji holê rabe, nikaribe li ser piyên xwe bisekine. Mirov dikare bibêje, di van 20 salan de, deshilatdariya Qacarî lewaz e; nikare li ser piyan bisekine û bi piştgiriya Brîtanya, Fransa û Rûsyayê dimeşe. Ji aliyê din ve jî li Îranê, tevgerên civakî pêş dikevin û dixwazin pergaleke nû ava bikin.

Di nava vê de Kurd jî, heya asteke rista xwe dîlîzin. Li herêma Kirmanşan, Azerbaycan bi taybetî rista Kurdan, di avakirina destûra Îranê de heye. Li Osmanî jî, weke me got beşeke Kurdan di nava Îteat û Terakiyê de cih digirin û li Tirkiye pêş xistina tevgera meşrûtiyetê de rista wan jî heye. Di bin navê guhertin û reforman de sultan sînordar dikin. Îteat û Terakî got, "em pêşketin û reforman dixwazin," lê pişt re derket ku Îteat û terakî Tirkperestiyê dikin. Ew bû sedem ku Kurdên di nava Îteat û Terakiyê de cih digirin, jê qut bibin û bixwazin bi sêrê xwe tevbigerin.

Piştî salên 1890'î hejmareke rewşenbîr û nifşên nû yên Kurd çêdibin. Piştî vê salê hêdî hêdî hin gav tên avêtin. Di vê serdemê de tevgerên rewşenbîrî jî li Kurdistanê pêş dikevin. Di 22'yê nîsana 1898'an de, cara yekem rojnameya Kurdî "Kurdîstan" derdikeve. Di pêşengtiya Mîhtat Mîtat Bedîrxan de, li Kahîrê derdikeve. Ew jî di dîroka Kurd de gaveke girîng e. Lewra di wan serdeman de li cîhanê rojnamegerî pêş dikeve, di nava rewşenbîrên Kurd de jî hewldanên bi vî rengî çêdibin.

Di vê demê de her çiqas em dibêjin, netewperestî pêş neketiye jî; tiştê balkeş Rojnameya Kurdistanê, di nava xakên Osmaniyan de pêş nakeve, li Kahîre pêş dikeve. Di wan deman de li Kahîrê bandora Osmaniyan nemaye, tesîra Brîtanya wan heye. Em dikarin mûqayeseya wê ya îro jî bikin. Mesela dema ku tevgera PKK'ê pêş ket, rojnamegeriya Kurdî, li Ewropa pêş xist. Pişt re televîzyona Kurdî ku PKK'ê

peşengtiya wê kir, Med TV li Kurdistanê weşan nekir, li Ewropa weşan kir.

Ev yek nîşanî me dide, her çiqasa di wê demê de tevgerên siyasî bangawaziya azadiya gelan dikirin, di bin wê de înkarkirina gelan jî hebû. Ger bangawaziya azadiya gelan rast bûya, Kurd jî gelek e û mafê wan heye bi zimanê xwe rojnameyan derbixe. Lê çima mafekî bi vî rengî naye dayin? Mafdayinê jî bidin aliyekî, Osmaniyan zext li ser wan dikirin, da ku li Kahîrê jî ew rojname naye çapkirin. Jixwe li wê derê hate sekinandin, pişt re derbasî Îsvîçre û Brîtanya bû û bi vî rengî temenê xwe berdewam kir. Weke televîzyonên me yên îro ye, her tên girtin û cih diguherînin.

Mijareke din girîng ku mirov ji bo rojnameya Kurdî balê bikşîne ser jî ew e; dema ku Îngîlîz rojnameyan derbixin, dewlet van rojnameyan derdixe; dema ku rojnameyên Tirkî tên derxistin, Osmanî pêş dixin; dema ku li Bexda rojnameya Erebî pêş dikeve, walî derdixe. Li Îranê, rojnameya Farsî derdikeve, deshilat pêş dixin. Lê rojnameya Kurdî, bi destê deshilatan nehatiye derxistin. Gel û kesên ji civakê derdixin. Ew girîng e. Nirxeke civakê ye.

Niha jî dema ku em behsa Med Tv dikin, dewleteke me tune bû ku televizyonekî pêş bixe; tevgereke siyasî û civakî pêş dixe. Niha jî milyon dolar ji nava civakê tên komkirin, da ku ew televizyon bikaribe weşana xwe berdewam bike. Ji ber vê divê em girîngiya vê nirxê bizanibin. Rojnameya Kurdistanê 6-7 salan carna qut bibe jî berdewam dike. Sê merheleyên wê hene. Ji bo rojnamegeriya Kurdî dibe bingeh.

Di vê serdemê de li Kurdistanê, deshilatdariya Osmanî dixwaze pergaleke nû ya rêvebirinê pêş bixe. Dît ku bi rakirina pergala mîrtiyê û bi çêkirina pergala wîlayet û eyalet tam nikare bibe bersiv. Nikarin bi giştî Kurdistanê kontrol bikin. Ji ber vê yekê Sultan Abdulhamîd, Alayên-firqayên Hamîdiyê pêş xistin. Di sala 1891'an de biryar dide ku, hêzên herêmî ji eşîr û hozên Kurdan pêş bixe. Ew hêz çawa çêkirin? Her serok malbat, eşîr û hoz ji 500 kesî, heya hezar kesî dikare mirovên xwe kom bike. Dê dewlet wan çekdar bike û perwerdê bide wan.

Peywira wan ya yekemîn parastina herêmên xwe ye; ya duyemîn jî dema ku pêwîstiya dewletê pê hebe, divê alîkariya dewletê bikin. Çek digirin û li mala xwe rûdinin. Ne weke leşkerên nîzamî ku bi arteşê ve girêdayî ne. Yên ku di nava Alayên Hamîdiyê de cih digirin jî naçin leşkeriyê. Ew ji bo civaka Kurd, rêbazeke nerm e. Ger êrîş li herêma wan hebe, xwe diparêzin; car caran jî diçin alîkariya dewletê. Ew ji bo

Kurdan rehetî ye. Leşkeriya nîzamî, ji bo Kurdan zehmetir e. Ji ber vê yekê Sultan Abdulhamîd vê rêbazê pêş dixe û weke kesekî baş tê dîtin.

Abdûlhamîd hinek fermandaran jî peywirdar dike, da ku van alayan perwerde bike. Hinek kes vê yekê, weke bingeh û gava yekemîn ya korucutiyê, ango caştiya ku li Bakûr, Başur û Rojhilatê Kurdistanê tê karanîn dinirxînin. Hinek jî bi awayekî xwezayî dibînin.

Alayên Hamîdiyê, heya xilasbûna serdema Abdûlhamîd her berdewam dike. Ji bo komkûjiya Ermenan, Kurd jî tên tohmetkirin û rexne li ser Kurdan hene. Lewra gava yekem ya van Alayên Hamîdiyê, dema ku di sala 1895'an de di navbera Osmanî û Ermenan de pirsgirek derdikevin, van hêzan didin şixûlandin. Ji ber vê beşeke Ermen û çavdêr, dibêjin Kurd jî di komkûjiya Ermenan de şirîk bûne. Hinek jî dibêjin, ew hêzeke girêdayî Osmanî bûye û bi fermana sultan kar kiriye. Mirov nikare li ser Kurdan bike mal, karê dewletê ye. Ew komkûjiya yekem ku li ser Ermeniyan tê çêkirin e, di sala 1915'an de komkûjiya mezintir tê jiyankirin.

Ya mûhîm bi Alayên Hamîdiyê, li Kurdistanê hin hêzên Kurdî çêdibin û hinekên wan dibin bingeha serhildanên Kurdî jî. Mesela îbrahîm Paşayê Wêranşarî, li ser esasê Alayên Hamîdiyê tevdigere. Bi xwe fermandarekî, Alayên Hamîdiyê ye; dema ku li hemberî Îteat û Terakî serî radike, bi Alayên Hamîdiyê tevdigere. Pişt re hinek kesayetên weke Îhsan Nûrî Paşa û Xelîd Cîbranî jî ji Alayên Hamîdiyê îstîfade dikin. Lewra kesên di nava Alayên Hamîdiyê de cih digirin, kesên ku hatine perwerdekirin û çekên nû dikarin bikar bînin in. Ji vî alî ve ew yek, ji bo tevgerên Kurd yên sedsala 20'emîn jî hinekî dibin bingeh. Lê dewletê, da ku xizmetî wan bike ew alay pêş xistin.

Mijareke din girîng ku di vê serdemê de pêş dikeve, siyaseta Cûhiyan ya li herêmê ye. Bi riya Masoniyê, Almanya hinek kar dike. Pişt re derdikeve ku tevgera Masoniyê, tevgereke Yahudî, netewperest û aborî ye. Çawa ku Almanya dixwaze ji hinek taybetmendiyên wan îstîfade bike, Yahudî jî dixwazin ji sermayeya Alman îstîfade bikin. Ew di navbera wan de dibe hevgirtinek.

Pişt salên 1892'yan tevgera Masoniyetê, li Tirkiye di bin navê Îteat û Terakiyê pêş dikevin. Li Ewropa jî, roj bi roj pêş ve diçûn. Di sala 1897'an de, cara yekem tevgera Masoniyetê kongreya xwe çêdike. Ew yekem kongreya tevgera Cûhiyan ku li bajarê Bazil yê Siwîsrê çêdibe ye. Lê wê derê nîqaş dikin, da ku xwe li cîhanê baştir bi cih bikin. Herî dawî biryar digirin ku pergaleke civakî ji bo xwe ava bikin.

Heya wê demê Cûhîtî weke baweriyek û tevgereke aborî û tîcaretê li cîhanê belav bûye. Zext û perçiqandin jî li ser Cûhiyan heye, lê rêxistineke wan derveyî meseleya baweriyetê tune. Ew kongre biryar digre ku êdî rêxistineke civakî û siyasî ji bo xwe çêkin. Jê re dibêjin, kongreya Cûhiyan. Ew pergal, weke pergala me ye. Çawa ku em dibêjin, KCK pergaleke civakî û siyasî ye, ew jî bi wî rengî ye. Dibêjin her kesekî Yahûdî, li ku dibe bila bibe dikare bibe endamekî kongreyê. Her kom, partî û saziyeke Cûhiyan, dikare bibe endamê vê kongreyê. Ew kongre, li ser esasê xwe rêvebirinê xwe tevger dike û rêxistinbûna xwe pêş dixe.

Weke armanc jî, avakirina dewleteke Cûhiyan didin pêşiya xwe. Du nêrînên wan hene; yek, dixwazin li Efrîqa dewletekê çêbikin; dudu, dixwazin li Fîlîstîn û Haranê dewletekê çêbikin. Çend komên wan hene; hinek çepgir in, hinek rastgir in. Koma rastgir jî, du beş in; beşeke wan nêzikî Amerîka û Brîtanya ne, beşek jî zêdetir nêzikî Almanya ne. Koma herî xurt, koma ku di wê serdemê de bi Almanya ve tevdigerin in. Jixwe têkiliyên Almanya û Osmanî jî xurt bûne. Masoniyet, ji bo Osmanî û Almanya nêzikî hev û din bikin, pir hewldan nîşan didin. Ew dibe sedem ku ew Cûhiyên ku di nava pergala Almanya de cih girtine, bibin alîgirê Osmanî û di nava pergala Osmanî de jî bibin xwedî rist.

Bi vî rengî koma nêzikî Almanya, Osmanî û Îranê zêdetir pêş ve diçin. Ew kom pêşengtiya kongreyê jî dike û avakirina dewletê jî dixwazin ji ser vê komê re çêbikin. Di wê demê Hertzil heye, pêşengiya vê tevgerê dike. Demekê kar dike, da ku Sultan Abdulhamîd rêvebirên din qaneh bike; da ku di nava sînorên împaratoriya Osmaniyan de, dewleteke Yahûdiyan çêbibe. Lê Sultan Abdulhamîd qaneh nabe û êdî navbera wan û Sultan Abdûlhamîd xirab dibe.

Ji ber vê yekê, dibêjin tevgera Îteat û Terakiyê; tevgereke Masontî, Cûhîtî û Tirkperestiyê bû ku li hemberî Sultan Abdûlhamîd pêş ketibû. Lewra Sultan Abdûlhamîd, şertên Cûhiyan qebûl nekirin. Serokatî dibêje, “Yahûdiyan wê demê hewl dan, prototîpa Îsraîlê çêbikin. Lê Sultan Abdûlhamîd ji bo wê ne amade bû.” Ji ber vê yekê li hemberî Sultan Abdûlhamîd tevdigerîn û di sala 1908-9’an de înkîlapê çêdikin. Rêber Apo di paraznameyan de jî, rista Yahûdiyan di guhertina Rojhilata Navîn de pir vedike. Tiştê diyar, Yahûdî di pêşxistina modela netewe dewletê de risteke mezin dîlîzin.

Di van reforman de ristê ol, zanist û sermaye heye. Di reformên ku Martîn Lûther kirin de, xwest pêşiya sermaye veke, lê tam bi ser neket. Di tevgera Masoniyetê de, êdî netewe dewlet, li ser esasê pêşxistina

pergaleke aborî û endûstriyalîzmê û kar pêş dikeve. Di bin navê ger netewe dewlet pêş bikevin, dê milet jî azad bibin de, ew yek pêş xistin. Ango azadiya milet bi netewe dewletê ve girê dan. Wisa kirin ku dê milet fêm bikin ku sedema perçiqandina wan tûnebûna dewletê ye. Bi vî rengî milet, bi dewletê ve girêdan.

Ji bo vê Serokatî dibêje, "ger em dixazin moderníteya kapîtalîst fêm bikin, divê em netewe dewletê fêm bikin." Ya duyemîn, gotin ji bo ku îlîm azad bibe; divê dewleta te hebe. Divê dewleta te jî ne di bin deshilatdariya olan de be. Bi vî rengî zane û elim jî bi xwe ve girêdan. Ya seyemîn jî, ji bo ku tu bikaribê qezenc bikî; divê dewleteke te hebe ku bazareke te ya azad hebe. Bi vî rengî tu dikarê rehetî qezenc bikî. Di netîce de, dewlet weke sembola azadiyê nîşandan. Di vê demê de li Fransa tevgerên civakî hebûn, li Almanya felsefe pêş ve diçû, li Brîtanya aborî pêş ve diçû. Van hemûyan, di modela xwe de sentezek çêkirin. Ji bo vê Serokatî dibêje, "Hegel, dewlet êdî weke xweda bi nav kir." Ger tu dixwazê azad bibê û qezenc bikî, ji te re dewlet pêwîst dike.

Bi vî rengî modela netewe dewletê pêş xistin. Lê li Ewropa, ol pêşiya vê asteng bû. Li Rojhilata Navîn jî nakokiyek wisa hebû. Ji ber vê Sultan Abdulhamîd wan, ne razî ne ku netewe dewlet ava bibe. Vê weke xeterî dibînin. Lê ew pêvajoya ku piştî salên 1870'î li ser civakê tesîr dikin, di nava civaka Osmanî û Îraniyan de hêrsa mîlîgerayê pêş dixin. Bala xwe bidinê, Masoniyet û dewletê li vê herêmê çi pêş xist? Modeleke wisa pêş xist, ji bo ku vê modelê bide qebûlkirin jî, wisa nîşan didan ku bi azadiya gelan re ne.

Ji bo her miletekî jî xîtabên cûda hebûn. Ji bo Ereban digotin, "Ereb miletekî qedîm û bi tesîre. Berê hemû cîhan di bin destê Ereban de bû. Çawa dibe ku Ereb di bin serweriya Tirkan de bin." Ew yek pêş xistin û bi vî rengî tevgerên Erebî kontrol dikirin. Wekî din ji bo komên cûda yên Xiristayan (Sûryanî, Ermenî, Keldanî) bi xwe ve girê bidin digotin, "ew hevdînên me ne, ola me wek hev e. Em ê ji wan re dewletê çêbikin." Bi vî rengî ew bi xwe ve girê didan. Çima şerê Kurd û Aşûriyan çêbû? Ji bo vê bû. Lewra Brîtanya û Rûsya soz dabûn Aşûriyan û digotin, "em hemû Aşûriyên Kurdistanê, dibin herêma Wrmê - Selmas- Xoy-Maku- û li wê derê ji wan re dewletekê çêdikin." Gelek jî birin wir. Vê yekê êdî ji milê miletên din ve nerehetî û bertek çêdikirin.

Ji bo Ermeniyan; hem Brîtanya, hem jî Rûsya soz dabû ku ji wan re dewletekê çêbikin. Bi vî rengî Ermenî bi xwe ve girê dan û bûn sedem ku gelên herêmê ku jiyanek hevpar çêkirine, ji hev û din qut bibin

û bingeha wê hevpariyê têk biçe. Di encamê de pevçûn çêbûn. Ji bo Tirkan digotin, “Tirk miletê serdest yên Osmanî ne, divê dewleteke xurt ji bo xwe çêbike.” Bi taybetî Cûhiyên nêzikî Almanya ew yek pêş dixistin. Tirktiya spî jî wisa pêş ket. 20-30 salî li ser vê yekê kar hate kirin.

Ji bo Kurdan çi hate pêş xistin? Têkiliya Kurd û Tirkan zêde bû û têkiliyê Kurd û miletên din jî ne xirab bûn. Kurd, ne Xiristiyan in ku bibêjin, em hevdîn in û em lê xwedî derkevin. Ne weke Ereb in ku bibêjin, xwedî Îslam in û pêwîste hûn li hemberî Tirkan derkevin. Wê demê gotin, “Kurd Aryen in, em yek nijadî ne û Kurd ji Ewropa hatine.” Teoriya oryantalîzmê wisa li ser Kurdan pêş ket. Beşeke nivîskar û rewşenbîrên me yên sedsala 20’emîn jî ew qebûl kirin û pêş xistin. Gotin, “Kurd miletekî Ewropayî ye.” Niha jî gelek xelkê me bi vê teoriyê kêfxweş dibin.

Bi vê yekê xwestin, ew derdora rewşenbîrên Kurd û Kurdên ku dikevin nava siyasetê bi xwe ve girê bidin. Da ku bikaribin Kurdan bikin alîgirê xwe. Xwestin ku Kurd, bi miletê derdorên xwe ve nebe yek û ji wan dûr bikeve. Niha jî li Başûrê Kurdistanê, tesîra vê yekê heye. Gelek rewşenbîr hene dibêjin, “em Aryan in, em ji Ewropa hatine; em ne weke Ereban paşketî ne, em ne weke Tirkan xelkê Asyaya Navîn in û paşketîne. Jixwe Tirkan her şer kirine û li ser pişta hespan jiyan kirine. Lê em pêşketî ne.” Pêşketina wan jî çi ye, ne diyar e.

Ew 150 sal e, li ser vê kar tê kirin. Bi vî rengî Kurd xwe mezin dibînin û Kurd, ji miletên derdorê tê qut kirin. Ya din, bi vî rengî Kurd hinek ji erdnigarî, ax û nirxên xwe jî tê qutkirin. Heya 100 sal berê, gelê ku herî zêde bi axa xwe ve girêdayî ye Kurd in; lê van 100 salên dawî, texrîben Kurd weke Yahûdiyan dibin. Ax û nirxên xwe dûr dikeve. Ji aliyê din ve, li hemberî Kurdan jî bertek çêdibin. Tirk, Kurd, Fars bi rengekî din bertek nîşan didin. Bingeha ew jiyana hevpar lewaz dibe. Têkiliyên Kurd û wan miletên din kêm dibin. Ew milet jî êdî Kurdan weke miletên vê erdnigariyê nabînin, mêvan qebûl dikin. Tirkên ku bi xwe îtîraf dikin ku hezar sale hatine vê erdnigariyê, xwe weke xwediyê vê erdnigariyê dibînin; lê Kurdan mêvan dibînin. Ew zîhniyet pêş dikeve.

Li ser van miletên herêmê, tevgerên Mason û dewletên xwedî sermaye kar kirin; da ku bikaribin wan parçe bikin û li Rojhilata Navîn ji bo xwe bingeheke ava bikin. Heya salên 1870-80’î rista Brîtanya û Fransa zêde bû, pişt re rista Almanya zêde bû. Bi taybetî têkiliyên Almanya û Osmanî û Îranê zêde dibin. Bi taybetî têkiliyên aborî û leşkerî

pir zêde dibin. Hêzên Osmanî, bi pîsporên Almanya hatin perwerdekirin.

Êdî tîcareta Almanya kete nav herêmê. Biryar dan ku xeta trenê ya Berlîn û Baisrayê (Berlîn-Stenbol-Helep-Musul-Baisra) çêbikin. Da ku tîcaretê heya Hîndîstanê bixin bin serweriya xwe. Lewra tîcaretê di destê Brîtanya û Fransa de bû, xwestin ji destê wan derbixin. Niha çawa ku li ser xetê gaz yê Îran, Tirkiye û Ewropa nîqaş dikin. Rûs ji bo xwe weke xeteriyekê dibînin, Tirk ji bo xwe weke sermayeyeke dibînin, Ewropa weke deskeftî dibînin. Wê demê jî xetê Trenê risteke wisa dîlîze û projeyeke stratejîk û mezin e. Herî dawî îtîfaqa Osmanî û Almanya li ser vê çêdibe.

Ew pêşketin, roj bi roj li ser herêmê tesîr dikin. Di navbera Brîtanya, Almanya, Fransa û Rûsya de jî, roj bi roj nakokî û alozî pêş dikevin. Lewra Brîtanya û Fransa dîdîtin ku êdî hegemonyaya wan kêm dibe û rista Almanya zêde dibe. Bi vî rengî derbasî sedsala 20'emîn dibe û ew rewş tabloyekî nîşan dide ku êdî cîhan bi vî rengî nikare berdewam bike. Hêzê hegemon, dixwazin serweriya xwe berdewam bikin; lê nakokî hene. Ew dibe sedem ku pergal bê guhertin. Li Rojhilata Navîn jî her miletek bi rengekî di nava hewldanan de ne. Dixwazin di pergala nû de cih bigirin.

### *2-Şerê Cîhanê Yê Yekemîn*

Li ser esasê van guhertin û nakokiyan di navbera salên 1914'an û 1918'an de şerê cîhanê yê yekemîn derdikeve. Di navbera du êniyan de bû; êniya yekemîn Brîtanya, Fransa, Îtalya, Rûsya û pişt re Amerîqa û hin hêzên din jî tevlê dibin. Êniya duyem, di pêşengtiya Almanya de, Macerîstan, Osmanî û Îran jî bi rengekî cuda tevlê dibû. Wê demê ji wan re dibêjin, êniya hevpeyman û Sondxûr.

Çar salan şer kirin. Di vî şerî de zêdetirî 10 milyon mirovan tên kûştin. Zêdetirî 20 milyon mirov jî telef bûn; seket bûn û zirarên cuda dîtin. Gelek aboriya cîhanê di vî şerî de çû. Cara yekem di vî şerî de teyare û çekên nû hatin şûxilandin, kîmyasal tê şixûlandin. Ew çek jî hemû hatin tecrûbekirin, ceribandin. Welatê Kurdistanê jî bû beşeke şer.

Di dema şer de çend mijarên girîng hene; heya sala 1916'an şer bi tevazûm diçû, herdu aliyan hêzên xwe diparastin. Piştî wê salê Brîtanya û Fransa bi dizî peymana Sykes-Pîcot çêkirin. Dibêjin bingeha cîhana îro ya sedsala 20'emîn di vê peymanê de hatiye avakirin. Armanca vê

peymanê parçekirin û kontrolkirin bû (böl-yönet). Beriya şer digotin, "em dixwazin miletan azad bikin." Lê diyar dibe ku dixwazin li gorî siyaseta xwe parçe bikin. Li gorî Sykes-Pîcot parçe kirin; beşek ji bo Brîtanya û beşek jî ji bo Fransa tê veqetandin, hinek jî dabûn Îtalya, pişt re peyman hinek tê firehkirin û Rûsya jî tevlê dikin. Lê ji ber ku hê şer ser neketiye, nikarin plana xwe bi cih bikin.

Di sala 1917'an de, li Rûsya şoreşa Cotmehê çêdibe û komînîst xwe ji şer dikşînin. Lewra beriya şer jî helwesta Lenîn diyar e, dibêje "ew ne şerê azadiya gelan e, ew şerê êmperyalîzmê ye. Divê karker û cotkar û gel tevlî vî şerî nebin." Beriya şer, partiya herî mezin ya komînîzmê, partiya komînst ya Almanya bû. Lê dema ku şer çêdibe, alîkariya Almanya dike. Lenîn vê yekê rexne dike û dibêje, "ew dibe sedem ku partiya komînst ya Almanya tasfiye bibe." Jixwe di dawiyê de jî tasfiye bû.

Ji ber wê helwesta komînîstên Rûsya ser bi xwe ye, şer rast nabînin û tevlî şer nabin. Lenîn nabêje ku "ger ez bang li karker û cotkarên Rûs bikim, da ku tevlî şer nebin; ji aliyê netewî de ez ê zirarê bikim." Helwesteke wisa nîşan dide û di netîceyê de bi ser dikeve. Serokatî jî di van salan de li ser vê mijarê sekinî û got, "ew şerê cîhanê ye û divê em xwediyê helwesteke serbixwe bin. Em xeta seyem in." Lenîn jî di wê demê de helwestek wisa nîşan da û ser ket. Dema ku serket jî biryara xwe pêk anî. Hinek partî hene, di dema hilbijartinan de dûrûşmayan berz dikin; lê dema ku ser dikevin pêk naynin. Lê lenîn gotina xwe pêk anî û hêzên Rûsya kişandin.

Wê demê Brîtanya û Fransa tirsiyan û karekî din kirin, da ku bikaribin ser bikevin. Wê demê piraniya Cûhiyan li gel Almanya û Osmanî bûn, lê soza avakirina dewleta Cûhiyan nikaribûn ji wan bigirin. Di demeke wisa de Brîtanya û Fransa soza dewleta Cûhiyan, dan Yahûdiyan. Di cotmeha 1917'an de li Rûsya şoreş çêbû, piştî mehekê jî Peymana Belfor ç ê bu; wezîrê derve yê Brîtanya soz dide Cûhiyan û dibêje, "ger hûn alîkariya me bikin, em ê dewletekê ji we re çêbikin."

Ew dibe sedem ku Cûhî hemû îmkanên xwe yên madî û rêxistinî ji pişta Almanya bikşînin û bikin xizmeta Brîtanya û Fransa. Wê demê ji milê aboriyê ve, Almanya bi rûxandinê ve rû bi rû dimîne. Mesela îro hemû sermeyader, pereyên xwe ji Tirkiye bikşînin, Tirkiye dikeve. Wê demê jî bi vî rengî ye. Piraniya sermayeya Almanya di destê Cûhiyan de ye, zanyarên wan Cûhî ne. Lê Cûhî hemûyê dixin xizmeta Brîtanya û Fransa. Bi vî awayî di 1918'an de Brîtanya û Fransa bi ser dikevin.

Ji ber vê Hîtler dibêje, “sedema binketina me Cûhî ne” Dema ku şerê duyemîn yê cîhanê dest pê dike jî, Hîtler dibêje, “divê em di destpêkê de kûrmê hûndirê xwe de bikûjin. Lewra ew bûn sedem ku em bin bikevin, divê em xeletî jiyan nakin.” Ji ber vê li hemberî Cûhiyan komkûjiyan dike. Di encamê de şerê cîhanê yê yekemîn bi vî awayî xilas dibe.

…: Weke çîrokekê di nava me de belav bûye, dibêjin eslê Barzaniyan Yahudî ne. Tiştekî wisa heya, an na?

…: Di dema şerê cîhanê yê yekemîn de nîqaşa sînorên Mîsakî Mîlî jî çêdibin, heval bikaribe vê mijarê jî hinekî veke dê baş bibe.

…: Di hemû paraznameyan de Serokatî, cewherê civakê weke “civaka exleqî û polîtîk” dinirxîne. Dema ku mirov behsa mîr, şêx û terîqatan; bike ji vî alî ve mirov nikare cewaz bigre dest? Civaka Kurd jî di cewhera xwe de, exleqî û polîtîk e. Di çanda Zerdeştiyê de jî ew heye; lê tarîqat, bi taybetî jî tarîqata neqşibendî di seriyê min de pir nakokî çêdike, gelo civakê ji cewhera wê dûr naxe?

…: Şêxan û tarîqatan pêşengtiya civakê kirine, lê di nava civakê de di dogmatîzm pêş xistinê de, rista van çi bûye? Tesîrên wan tên zanîn, zêdetir ji bo pêşketina civakê asteng in. Bi erenî û neyînî mirov dikare rista wan çawa binirxîne?

…: Ji bo Naqşibendiyê, li milê Kirmanşan tesîra wan heye. Hê jî li wan deran hene. Lê ji milê îlîm ve pir dogma ne, pir paşketî ne. Li gelek tiştên xwe jî dûr ketine. Di malbatên şêxan de hin rewşenbîrî heye, li gelek cihan xwendine û di siyasetê de jî rista wan heye. Lê nehiliştine ku gelek derdor bixwînîn û bibin xwedî lêgerîn. Tesîreke wan ya neyînî, li herêma me heye. Lê tesîrên wan yên erenî jî hene; li gorî herêman diguhere. Bi taybetî di şexsê şêx Osman Neqşîbendî de risteke wan ya neyînî li herêma me heye.

…: Ji ber ku li Kurdistanê, rihekî yekgirtî çênebûye; di pêşengtiya mîr, şêx û tarîqatan de herêm bi herêm xwe rêxistin kirine. Serokatî dibêje, weke xwe parastinê jî divê mirov vê binirxîne. Di dema Osmaniyan de jî xweser jiyan dikin. Heya cihekî mîrtî û şêxtî baş e; lewra li hemberî êrîşan xwe parastine. Ew yek car caran vegeriyaye şerên mezin jî. Mesela zêdetirî 100 hezarî şervanên Bedîrxaniyan çêbûne. Hin hewldanên yekîtiyê jî çêbûne, lê ser neketine.

Nêrînên mîr, şêx û tarîqatan cih bi cih cuda dibin, ew dibe sedem ku yekîtiya di nava Kurdan de pêk naye. Di mînaka Îdrîsî Bîdlîsî de jî tê dîtin, hev û din qebûl nekirin heye. Weke Serokatî gotiye reform

jiyan nekirine, li gorî demê xwe nû nekirine. Di sedsalên 18'emîn û 19'emîn de li cîhanê û herêmê pêşketinên nû çêdibin, lê Kurdan xwe dubare kirine. Ji ber vê parçebûyin çêbûye, her çiqasa parçekirina hêzên hegemon jî hebe, sedema esasî avanekirina yekîtiya nav xweyî ye.

Piştî sedsala 19'emîn jî şêx û kesayeteke Kurd jî, bi tevgerên miletên din re tevgerîne. Mesela şêxên Bîdlîsî hene, her bi kovara Tirkiye re tevgerîne. Beriya şerê cîhanê yê yekemîn, ew şêx jî hin nirx û çandên xwe jiyan dikin; lê piştî wê ji ber ku reformek jiyan nekirine, bi serdest û hegemonan re tevgerîne. Niha jî bûne depoyên dengên partiyên deshilatdariyê. Mesela Tayip li Kurdistanê çawa deng digre, bi şêxekî ve têkiliyên xwe çêdike û hemû kesên di bandora wî de ne, dengên xwe didin wî. Van şêxan ji ber ku reformek jiyan nekirine, qarektereke paşverû girtine.

…: Van serhildanên Kurd ku çêbûne, bingeha xwe ji civakê girtine. Di nava civakê de bingeh û pêwîstiyeke wisa hebûye. Her çiqas em van rexne bikin û bibêjin, nebûne bersiva pêwîstiyên civakê û nebûne alternatîf û pêy menfeata xwe ketine jî, divê em vê yekê jî li ber çavan bigirin ku berxwedanek dane meşandin, çandek pêş xistine, rêbazek danîne û riya şoreşê li Kurdistanê vekirî hiştine. Her tim şoreş, li pêy şoreşê hatiye û îro gihêştiye şoreşa 29'emîn.

Li hemberî wan Osmanî, Safewî û Qacarî hebûne, hêzên hegemon yên derveyî hebûne; xwestine wê civakê tune bikin. Xwestine çand û zimana wê civakê tune bikin, lê ew rabûne û bûne pêşengên vê civakê. An na em nikarin bibêjin, ger ew pêşeng tune bûna, dê civakê bi xwe pêşketinek çêbikira. Mesela Bedîrxan û Şêx Ûbeydûlah tune bûya, dê civakê pêşketinek çawa bikira? Valatî û lewaztî di bingeha civakê de heye, destûr dide ku kesayetên wisa çêbin. Civak ne gihêştiye asteke wisa bilind ku kesayetên weke Rêber Apo di nava xwe de bixûliqîne.

Mesela li gel Tirk, Ereb û Belûcan em mûqayese bikin; çima di dîroka wan de serhildanên wisa ku pê şanaz bibin tune ne. Li hemberî dagirkeriya herêmî û derveyî çima serî ranekirine, dibe ku radest jî bûbûn. Gelek civak hene, heliyan e. Îro tenê navê Azeriyan heye, çand û zimana wan ne zelal e. Nikarîne pênaseyeke bi hêz û dûrûst li ser mîlîgeriya xwe bikin. Ger Kurd bi ser neketine û li Rojhilata Navîn nebûne xwedî otorîte, mirov dikare bi awayekî din şîrove bike. Mirov dikare rexne jî bike; di ew 200 salên dawî de çima rewş wisa bûye, çima civaka Kurd nikariye derketinekê bike?

Mirov zêdetir dikare li ser lêhûrbûn bike, lêkolîn bike û rexne bike. Lê mirov nikare bi giştî înkar bike. Ger ew tevger û serhildan tûnebûna, dibe ku îro PKK jî derneketiba. Ger îro ew qesa tevgerên Kurdan hene, angaşt û hestên me yên azadiyê hene, ger em dikarin bibêjin di vê cîhanê de em jî hene; li ser esasê vê mîrasê ye. Mîrasa Bedîrxan e, mîrasa Lepzerîn û şêx Ûbeydûlahê Nehrî ye. Mîrasa bi sedan kesên ku me navê wan ne bihîstî ye. Yek jî Bedîrxan tenê nebûye, li gel wî bi hezaran Bedîrxan hene; ew jî civaka Kurdî ye. Ango civak li gel bûye, civak ne cûda ye, lê ew pêşengên civakê bûne.

…: Li ser van serhildanan nirxandinên me yên berê, li gorî nêrîna paradîgmaya berê bû. Li gorî wê me digot, "di sedsala 20'emîn de modernîte û netewe dewletî pêş ketiye; kapîtalîzm ji feodalîzmê pêşketîtir e. Ew serhildan jî dema feodalîzmê temsîl dikin û rêberên wan li ser esasê feodaliyê derketine, ji ber vê paşverû ne." Ew nêrîna Marksîzmê bû. Li gorî nêrîna dîrokê ya rast û rast pêş ve diçe ye. Yê ku pişt re derketiye, ji yê berê pêşketîtir e. Lê niha em wisa mezî nakin; hem ji bo sedsala 19'emîn, hem jî ji bo serhildanê di sedsala 20'emîn de çêbûne em wisa nagrin dest.

Li ser esasê nirxên civaka exleqî û polîtîk pêş ketine, an li ser esasê pergal û deshilatdariya şaristaniyê derketine? Divê mirov li ser vî esasî binirxîne. Li hemberî deshilatdarî û şaristaniya dewletî, civak cewhera xwe çawa diparêze û nirxên xwe li ser esasê çi pêş dixe? Car caran li ser esasê ol pêş dixe, carna li ser esasê mezhep û tarîqatan pêş dixe, carna li ser esasê sosyalîzm û tevgerên jinê pêş dixe. Ew tevgerên parastina civakî ne, li hemberî pergalên ku nirxên civakî tune dikin, serî radikin. Serhildanên di sedsala 19'emîn de pêş dikevin jî li hemberî deshilatdariya Osmanî ne.

Osmanî di wê demê de lewaz dibe û bê hêz dikeve, ji bo ku deshilatdariya xwe bişîdîne tûndiyê pêş dixe. Li hemberî vê tûndî û şidandina deshilatdariyê, civak di pêşengtiya mîr, şêx û tarîqatan de serî radike. Hem hestên netewî û civakî hene di van serhildanan de, hem jî parastina ol heye. Beriya wê hinek xweser jiyan dikin û rehetir in. Ji ber vê zêde serhildan tune ne. Mesela di navbera salên 1500'î û 1800'î de li Kurdistanê ji milê jiyana civakî û wêjeyî ve ronesansek pêş dikeve. Ehmedê xanî, Meleyê Cizîrî wan hemû di wê demê de pêş dikevin. Lewra jiyan û pergaleke xweser heye. Lê dema ku ew tê şidandin, serhildan çêdibin. Mirov nikare bibêje, bi giştî civakeke exleqî û polîtîk çêbûye, dibe ku kêmasî hebin; lê di encamê de civak li hemberî deshi-

latdariyê serî radike. Parastina civaka xwe esas digirin. Mirov dikare zêdetir ji vî alî ve bigre dest.

Tiştên ku bên rexnekirin û weke kêmasî bên nirxandin hene. Lê mirov bibêje paşverû ye, li gel dewletê disekine, rast nabe. Çawa ku me got, Selahadîn Eyûbî li hemberî Ewropa, nirxên Rojhilata Navîn parastine; ew jî zêdetir vê yekê dikin. Rista wan yek e. Em nikarin bibêjin, li hemberî sedsala 20'emîn paşverû ne. Ger di sedsala 20'emîn de hinekî rihê netewiyet û civakî maye û li ser wê esasê PKK pêş dikeve, sedem ew serhildan in. Îro PKK hinek jî wan mîras digre. Îro em Barzaniyan rexne dikin, hevkariya dewletan dikin û pergala dewletî diparêzin, li hemberî nirxên civakî jî disekinin; lê di dema xwe de jiyana ekolojîk jî parastine. Kurdîtî zindî girtine. Ew aliyên wan baş in.

Yanî divê em aliyên baş û yên ne baş, ji nava hev derbixin. Em çi mîras digirin û li hemberî çi disekinin, divê em nêrîna xwe zelal bikin. Jixwe hemû dewletên Ewropayî û yên Rojhilata Navîn, serhildanên Kurdan paşverû dibînin, weke eşqiyatî û şakitî dinirxînin. Divê em jî bi wî rengî mezî nekin. Kêmasiyên ku em rexne bikin hebin jî, îro em li ser wî mîrasî jî dimeşin. Em van serhildanan li hemberî şaristaniyê, parçayekî civaka exleqî û polîtîk binirxînin çêtir e.

…: Ger em dîrokê temaşe bikin, li Rojhilata Navîn zêdetir tevgerên olî pêş ketine. Piranî tevger li ser esasê olî pêş dikevin, hinek pişt re diguherin. Qarektera tevgerên olî jî, dogmatîzm e. Lewra li ser baweriyeke dûrûst dibin û bawerî jî bersiva demekê didin. Di nirxandinên hevalan de jî derket, tamam em li gorî îro nenirxînin, lê ger tevgerek xwe berdewam bike divê li gorî demê jî xwe biguherîne. Pirsa min, gelo ew tevger bi awayekî xwezayî dogmatîk in, an weke sapma wisa dibe?

**H. Helmet**: Mîsakî Mîlî, em ê piştî çend mijarên din li ser bisekinin. Ji bo Mijara malbata Barzanî, me hinek tişt gotin. Bi ya min ne Cûhî ne. Lê heval qaneh bûne ku Cûhî ne, heval dizanin. Min behsa kokê wan kir, belge jî li ser hene. Lê ew 50 sale, piştî salên 1960'î Mele Mistefa Barzanî bûye serokê wan; di siyasetê de kar û xebat kiriye. Hewldanên wî jî hene, xeletiyên wî jî hene. Bi sedemên hewldanên wî hinek kes jê hez dikin, bi sedema xeletiyên wî jî hinek kes jê eciz in. Ji 30 salî zêdetire jî kûrên wî berdewam dikin. Li gorî bavê wan, xeletiyên kuran zêdetir e.

Piştî salên 1960'î têkiliyên wan jî bi dewleta Îsraîl re xurt bûye, ew dibe sedem ku kesên ji wan hez nekin, bibêjin ew Cûhî ne. Sedemek ew e. Ger firsend çêbibe, em ê li ser PDK hinekî din bisekinin. Şerê

wan û Talabanî-Îbrahîm Ehmed wan heye; hev û din teşîr kirin, tesîra wê jî heye. Barzaniyan digotin, “Talabanî zilamê Îranê ye.” Wan jî digotin, “Barzanî Cûhî ne.” Bi vî rengî 50 salî li ser hev û din axifîn, di vê navberê de du nifş mezin bûne. Ji ber vê yekê tesîr li ser civakê dike û dikeve nav nivîsê. Yek jî ji ber ku wan herêmên Barzaniyan Cûhî hebûne, ji ber vê dibêjin Barzanî Cûhî ne. Lê Cûhî çûne, li Suleymanî jî taxeka wan hebûn, çûn. Dema ku dewleta Îsraîlê çêbû, Tirkiye, Iraq û Îranê hemûyan biryar girtin û Cûhiyên xwe şandin Îsraîlê.

Heval dikarin lêkolîn bikin, ne şerte ku bawer bikin. Lê divê mirov bi çend gotinan jî, encameke wisa dernexe. Carna heval gotinên Serokatî li rûyê me didin, lê carna Serokatî axaftinên pir giran ji bo me jî dike. Barzanî şerê me dike, Serokatî jî dibêje “gotine ku ew Cûhî ne, diyare wisa ne.” Hevalên me jî dibêjin, “di dahûrandinan de Serokatî wisa gotiye, wisa be Cûhî ne.” Divê tiştên Serokatî dibêje jî, di kîjan demê de çi dibêje em bizanibin. An na em ê tiştên Serokatî jî şaş bigirin dest. Li ser tevgerên Kurd, gelek nirxandinên Serokatî hene; lê di hin cihên dîtir de tiştên cuda jî dibêje. Niha rewşa AKP heye, Barzanî hinek helwestan nîşan dide, heval daxûyanî didin û di wê demê de eciz dibin û hinek qiseyan dikin. Ew nabe tiştekî akademîk û tiştekî dîrokî. Ji bo wê heval van tiştan weke xwe bigirin, baştir e.

Meseleya mîr û tarîqat çiqasa civakî ne, çiqasa ne civakî ne de; Serokatî di paraznameyan de behs dike. Dema ku tarîqat û rêol çêbûnê de tevgerên civakî ne. Li Kurdistanê jî derketibin, li cihekî dîtir jî derketibin wisa ye. Ji bo wê min got, miletên dîtir yên xwe mezin dibînin, lê em yên xwe biçûk dibînin. Divê em vê mantiqê bizanibin. Serokatî jî dibêje, “dema ku terîqat û rêol çêbûne, wesîleyeke xwe îfadekirina civakê ne.” Divê ew weke tespîteke bê dîtin. Lê dema ku em şîrove bikin, em dikarin kêmasî û başiyên Îslamê nîqaş bikin.

Di destpêkê de olê Îslamê jî weke tevgereke civakî û siyasî derketiye. Divê tu wê bibîne. Dema dibe rêola Sûnî û Şîa; Sûnîtiyê xizmetî deshilatdariyê kiriye, Şîatiyê jî bi rengekî din pêş ketiye. Li hinek cihan tersî vê ye. Lê mirov weke rêol binirxîne, mirov dikare bibêje ew rêol ji bo falan tiştî wisa dibêje, rast e, an na? Mesela me behsa tarîqata Qadirî û Neqşibendî kir, mirov dikare binirxîne, kîjan nêrîn baştir e? Çima em Sûhrewerdî baş dibînin? Ger Sûhrewerdî bûbûya tarîqateke jiyanî, îro weke Qadîrî û Neqşibendî dibû. Em çima ji Halaci Mansûr xwedî derdikevin? Ew jî lêgerek e, lê bi rengê baweriyê ye. Yên ku nebûne malê civakê em xwedî lê derdikevin, yên xelkên dîtir em lê xwedî derdikevin, lê em yên xwe her red dikin.

Ew ne mantiqekî rast e. Em dîrokê li ser esasê deshilatdariyê nanirxînin; ew jî ji nava civakê derketine, divê em binirxînin. Civaka me de ew tişt hebe jî, tune be jî; li gorî felsefeya Serokatî em lê xwedî derdikevin. Lê xwedî lê derketin, naye wê mahneyê ku mirov weke wan bike. Ew du tiştên cûda ne. Ne ku em bibin Şîa, Sûnî, Qadîrî, an jî Neqşibendî; lê divê em lê xwedî derkevin. Niha Îranî li ser Şîageriyê jiyan dikin. Ger du kes hebûna û li Neqşibendiyê xwedî derketibana, dibe ku Kurdan li ser Neqşîbendiyê tiştek ava bikirana. Ger Şêx Ûbeydûlahê Nehrî wan, baş hesap bikirana dibe ku li ser esasê Neqşibendiyê dewleteke Kurd çêbikirana. Îmkanên wê jî hebûn.

Tu dikarê pratîk û fikra wî rexne jî bikî; lê înkarkirin û paşverû nirxandin ne rast e. Mirov wisa bigre dest, baştir e. şêxtî û tarîqat û rêol jî di destpêka xwe de tevgerên civakî ne. Hevalan gotin, civak perwerde nekirine. Mevlana Xalîd 20 hezar mirov perwerde kirin, Serokatî jî dibêje min li Suriye 30 hezar mirov perwerde kirin. Ne ku li gorî fereseta sosyalîzmê perwerde kirine, lê li gorî rewşa civakê ya wê demê Mevlana Xalîd ew qesa mirov perwerde kirine. Divê ew bê zanîn. Qadîrî jî di destpêkê de wisa ye; dibêje şêxtî bi mîrad nebe, lê niha bûye mîrad. Ew ji rê derketine. Barzanî jî heya demekê ne mîradger in, lê pişt re wisa nabe.

Em weke PKK dibêjin, em tevgereke sosyalîst û demokratîk in; lê Ferhat xwest ku weke mîradgerê Serokatî, bibe berpirsyarê tevgerê. Ger helwestê tevgerê û hevalan nebûya, dibe ku PKK îro bûbûya tevgereke mîradgirî. Şêxtî li Kurdistanê û cihên dîtir jî wisa bûye. Niha li hemû cîhanê, ji şêxên heyî ji sedî 99 bûne mîradgir û xanedan. Rêgeza wan, ne ew e; lê îxrafek çêbûye. Şêxatî di destpêkê de dibêje, pêwîste tu xizmetî civakê bikî, lê niha ne wisa ye. Niha kî şêx be, mala wî mezin e, milkê wî zêde ye. Ger 100 sal berê xelkê gotiye, şêxtî baş e û li pêy wan çûye, îro divê li pêy wan neçin.

Niha em jî tevgereke baweriyê ne, ji ber ku xelk bi me bawer dike li gel me ye. Dibêjin, “hevalên PKK’î weke meleyketan e.” Lê ger sibê hinek ji nava me derkevin û vê tevgerê kontrol bikin, dogmatîzm dibe, an na? Dibe ku 100 salî xwîna wî miletî jî bixwûn. Lewra xelkê bawer kiriye ku Serokatî û heval ji bo wan jiyan dikin, lê hinek tên û bi rêbazeke qûrnaz ji bo xwe jiyan dikin. Di Îslamiyetê de, di mezhep û tarîqatan de ew heye. Di hemûyan de heye. Lê naye wê mahneyê ku tu hemûyan wisa binirxînê. Divê heval wan aliyan bibînin. An na em nikarin xwe û civaka xwe baş binirxînin.

Em behsa nirxên civakî dikin; deshilat jî beşeke wê civakê ye, rewşenbîr jî beşeke wê civakê ye, ol jî beşeke wê civakê ye; divê mirov wan jî binirxîne. Lê divê mirov ji aliyê baş û şaş ve binirxîne. Bi giştî li ser meseleya şêxtî û tarîqatan, mirov dikare wisa binirxîne. Tarîqatên li Kurdistanê jî hebûne, di destpêkê de tevgerên civakî bûne. Qadîrî jî di destpêkê de wisa bûne, lê pişt re bûne tarîqata deshilatdariyê. Neqşibendî jî di destpêkê ve wisa bûne, pişt re hin guhertin çêbûne. Lê ji ber Neqşibendî di demên dawî de hatiye Kurdistanê, mirov dikare hinekî cuda binirxîne.

Weke agahî mirov dikare meseleyeke dîtir jî bibêje. Texrîben di salên 1843'yan de birayê Mewlana Xalîd, Mehmûd Sahîp dibe rêberê tarîqatê. Dema ku Mewlana Xalîd dimre Abdulahê Haratî, Abdûlahê Xezayî, Şêx Siracetîn, Şêx Abdûlahê Harananî bi rêzê dibin xelîfe. Osmanî dibînin ku Neqşibendiyê li ser civakê pir tesîr dike, dixwazin di nava Neqşibendiyê de mîradiyê pêş bixin. Têkilî bi Mehmûd Sahîb û şêx Siracedîn re datinin. Berê tarîqata Neqşibendî û deshilatdariya Osmaniyan pir hev nakin. Li ser vê belge jî hene; Osmanî li dijî wan disekinin û dibêjin, "ew zilamên Îngîlîzan e." Îngîlîz jî bi rengekî dîtir wan dinirxîne.

Lê ji ber ku Osmanî dibînin ku Neqşibendî pir berfireh dibin, bi wan re têkilî çêdike. Herî dawî di serdema Mehmûd Sahîb de, dibêjin em dixwazin Mehmûd Sahîb bibe rêberê tarîqatê. Piştgiriya wî dikin û ew dibe xelîfe. Dibêjin piştî wê Osmanî terîqata Neqşibendî serbest dike. Bi vî rengî hêdî hêdî hevkirinek di navbera Osmaniyan û beşeke zêde ya vê terîqatê de çêdibe. Lê beşek têkilî bi Osmaniyan re çênake; yek ji wan malbata Şêx Ûbeydûlahê Nehrî ne, her wiha malbata Barzaniyan jî wisa ne. Lê beşek têkiliyên xwe çêdikin.

Di wê demê de Şêx Abdûlahê Hanaranî xelîfe ye, lê Osmanî birayê Mewlana Xalîd derdixin pêş û dibêjin mafê te ye ku bibê xelîfe. Çawa ku Amerîqa ji Ferhat re dibêje mafê te ye ku tu bibê rêberê PKK'ê, Osmanî jî wisa dikin. Dema ku birayê Mevlana Xalîd dikin rêber, hinek ne rehet dibin û hem ji wî kesî dûr dikevin, hem jî ji Osmanî dûr dikevin. Heya niha jî ew du xet hene. Hinek Neqşibendî bi deshilat re ne, hinek jî dûrî deshilat in. Heya sedsala 20'emîn jî berdewam dike.

Seîdê Nûrsî, nunerekî ji Neqşibendiya nerm e. Demekê bi Osmanî re tevdigere, lê pişt re wî digirin, çend salan dikin zindanê. Demekê hevalên me pir rexne dikirin, niha em dixwazin jê xwedî derkevin. Kêmasiyên wî hene, lê tevgereke nerm ya Neqşibendiyê ye. Pişt re talebeyên wî derdikevin, Fetûlah Gûlen tam bûye ajanê dewletê, lê

koma Zehra jî ne bi dewletê re ne. Mirov nikare koma Zehra û Fetûlah Gûlen weke hev binirxîne, lê herdu jî telebeyên Nûrsî bûn. Ya Neqşibendî jî di esasê xwe de wisa bû; hinekên wan bi deshilatdariya Osmanî û Îranî re têkilî danîn û hinek jî li hember sekinîn.

Ger mirov hem dîroka van baş nizanibe û hem jî baş nenirxîne; her şûrê xwe bikşîne û bibêje hemû xayin in, nabe. Gelek kes di bin tesîra wan de ne, gelek kes xwe hem welatparêz, hem jî Qadîrî û Neqşîbendî dibînin. Ger tu hemûyan bikî xayin, civak jî te guhdarî nake. Divê em vê bibînin; hinek rêber û şêxên Qadirî û Nexşibendî bûne hevkarên dewletê, lê hinek jî li ser îman û Kurdiniyê hatine darvekirin. Ma niha mirov dikare Şêx Selam Barzanî û Mesut Barzanî bike yek? Ger mirov wek hev bibîne, neheqî ye. Ma mirov dikare Şêx Mehmûdê Berzencî û hin şêxên Qadirî ku bûne hevkarên dewletê weke hev bigre dest? Ew jî na. Lewra hinekên wan ji bo Kurdinî û îmanê hatine kûştin, lê yên din bûne hevkar û xizmetkarê dewletê. Ger mirov wek hev bigre dest, bi wîjdanî jî ne rast e.Ger em behsa civaka exleqî û polîtîk dikin, ji aliyê wîjdanî ve ew ne rast e. Hevalên me malbat û her tiştên xwe berdidin û tên li serê çiyan şer dikin; hinek kes jî bêyî ku nas bikin, li ser hevalên me nirxandinan dikin. Em ji van re dibêjin, bê wîjdanî dikin. Divê em jî bi wî rengî nêzik nebin.

### *3-Piştî Şer Rewşa Kurdistanê*

Heya şerê yekem yê cîhanê em axifîn û em li ser rewşa beriya şer sekinîn. Em hinekî jî pişta şer çi bûye, wê vêbibêjin.

Aliyên ku şer dikirin, angaşt dikirin ku li ser esasê gelan şer dikin. Lê di dema şer de derket holê ku şer ne li ser esasê azadiya gelan e, ji bo deskeftî û berjewendiyan e. Îtîfaqa Sykes-Pîcot jî vê yekê nîşan dide. Ew îtîfaq di destpêkê de veşartî bû, lê dema ku şoreşa cotmehê çêbû, Rûsya ew îtîfaq deşîfre kir.

Di encama şer de, serkeftina Brîtanya, Fransa û Îtalya çêbû û deskeftiyên wan bûn esas. Almanya, Osmanî, Macarîstan û dewletên din yên alîgir bin ketin. Ango dewletên ku li Kurdistanê deshilatdar in, di vî şerî de bin ketin. Ew yek raste rast li ser çarenûs û qedera Kurdistanê tesîr dike. Li gorî encamên şer, hêzên ku di şer de ser ketine xwedî mafin ku dewletên bin ketine, li gorî berjewendiyên xwe di nava xwe de parve bikin.

Em zêdetir li ser mijarên ku civaka Kurdistanê eleqeder dikin disekinin. Osmanî bi peymana Mondorosê radest bûn. Di dîroka

30.10.1918'an de ew peyman îmza kirin. Hê şer timam nebûbû. Şer bi giştî di dîroka 11.11. 1918'an de xilas dibe. 12 rojan beriya xilasiya şer Osmanî radest bûn. Li gorî peymana Mondoros, erdnigariya ku ketibû destê dewletên serkeftî; êdî ew erdnigarî dibûn milkê wan dewletên serkeftî. Mafê wan heye ku li ser van erdnigariyan tasarûf bikin. Mafê Osmaniyan êdî li ser van xakan namîne.

Heya dema peymana Mondorosê, erdnigariya ku di destê Osmaniyan de maye, êdî dibû sînorên Osmaniya nû. Li gorî nexşereyê, di wê demê de cihên ku di destê Osmaniyan de mane; li gorî Tirkiyeya îro, heya mintiqaya Erzoromê di destê Rûsya de bû. Lê Sovyetan biryar dabû ku ji şer vekşe, hinek hêzên xwe vekşandibûn û hinek jî mabûn. Ji aliyê din ve heya nêzikî Helep, Mûsil û Kerkûkê di destê Osmaniyan de mabû. Hewlêr û Sûleymaniyê jî di destê Osmaniyan de bû.

Li gorî peymana Mondorosê, ew erdnigarî divê di destê Osmaniyan de bimîne. Ango erdnigariya îro ya Tirkiye, li Suriye heya Helep û Hesekê, li Iraqê jî Kerkûk, Mûsil, Sûleymaniyê û Hewlêr di destê Osmaniyan de dima. Lê diyar bû li gorî peymana Sykes-Pîcot, li gorî weadên Belfor û li gorî hewldanên Brîtanya û Fransa projeyên cûda hebûn. Her çiqas bi Osmaniyan ve hevkiribûn ku ew erdnigarî ji bo Osmaniyan bimîne; di nava xwe de jî bi peymana Sykes-Pîcot hevkiribûn; da ku heya herêma Gurgum, Dîlokê ji Tirkiye veqetînin, wîlayeta Mûsil ji Tirkiye bistînin, ji aliyê din ve herêmên Bêdlîs, Çewlîk, Mûş Erzorom, Agirî, Îdîr wan deran ji bo Ermeniyan dewletekê çêbikin. Ew tişt di projeyên wan de hebûn.

Ji ber vê yekê piştî ku şer hate sekinandin jî, Brîtanya hêzên xwe nedan sekinandin û hêrêma Mûsil, Kerkûk û Hewlêrê xist bin destê xwe. Li aliyê din Fransa nesekinî û herêma Helep, Dîlok, Riha û Gurgumê xistibûn bin destê xwe. Ew tevgerên dawî yên Brîtanya û Fransa di zivistana 1918'an û bihara 1919'an de çêbûn. Ew yek bû sedema nerehetiya Osmanî. Lê ji ber ku wê demê Osmanî di şer de têk çûbû, lewaz bibû. Paytexta Osmaniyan Stenbol jî ketibû bin çavderiya Îngîltere, Fransa û hêzên hevpeyman. Ji ber vê yekê derveyî gilî û Gazindan tiştekî ku bikira nemabû.

Di vê demê de rewşa Kurdistanê û dewletên serdest yên Kurdistanê çi bûn? Beriya şerê cîhanê, ji aliyê rewşenbîrî û çekdarî ve pêş ketibû; di heman demê de hinek rêxistinên Kurdî jî pêş ketibûn. Di 1908'an de, li Kurdistana di bin destê Osmaniyan û li Stenbolê Rêxistina Tavûnî Kurdistan (Kûrdîstan Tavaûn Cemiyetî) ava bû. Ew rêxistin ji beşeke rewşenbîrên Kurd ku berê di nava Îteat û Terakî de kar diki-

rin, pêk dihat. Dixwestin li ser navê Kurdiniyê hinek gavan biavêjin; di salên 1908-9'an de hinek gav avêtin û di nava civaka Kurdî xwe tevger kirin.

Lê Îteat Terakî û deshilatdarên Osmanî ew rewş qebûl nekirin û ew Cemiyet girtin. Pişt re di sala 1911'an de Komalaya Hêvî çêbû. Momaleyeke ciwanan bû, li ser navê ciwan û telebeyan çêbû. Lewra êdî Îteat û Terakiyê destûr nedida ku derveyî wan tu kes siyasetê bikin. Lê rê didan ku li ser navê ciwan û telebeyan tiştên wisa pêş bikevin. Ji ber vê yekê Komalaya Hêvî jî li ser navê ciwanan çêbû, lê di esasê xwe de armanca wan karên siyasî bûn. Hinek dibêjin, di sala 1910'an de bi awayekî nepenî xwe rêxistin kiriye, lê di sala 1912'an de îcazet girtiye. Heya salên 1914'an bi awayekî fermî karê xwe didomînin.

Dema ku şerê yekemîn yê cîhanê dest pê dike, Osmanî seferberiyê îlan dike û divê her kes tevlî şer bibe. Hemû rêxistin û komaleyên heyî hatin girtin, da ku hemû tevlî şer bibin. Bi vî awayî Komalaya Hêvî jî li holê namîne. Cemiyeta Teavûnê Kurdistan û Komalaya Hêvî rojnameyan derdixin û bi riya rojnameyan hinek xebatên rewşenbîrî jî dikin.

Li milê Rojhilatê Kurdistan, li Sîne, Kirmanşan hinek rêxistin û komale dûrûst dibin. Li Sîne bi riya Mele Mihemedê Mirdoxî û hinek kesên din partiya siyasî dûrûst dibe. Li Kirmanşan partiyên çep dûrûst dibin; wê demê tesîrê tevgerên çep li Kirmanşan zêde ye. Li milê Xoy, Makû di pêşengtiya Abdûlrezaqê Bedrîxanî û Simkoyê Şikakî de rêxistina Cihandanî dûrûst dibe. Ew rêxistin jî li Rojhilatê Kurdistanê, di salên 1911, 1912 û 1913'an de dûrûst dibin û heya salên 1914 berdewam dikin.

Hinek kar û çalakiyên wan yên rewşenbîrî û siyasî hene; lê bi destpêkirina şer kar û çalakiyên van rêxistinan jî lewaz dibe û ji holê tê rakirin. Lêwre dinê dibe, dûneya şer. Ew rêxistin jî, ne rêxistinên ew qesa xurtin ku weke Lenîn, birdoziya xwe biparêzin û alternatîfeke nû pêş bixin. Ji aliyê rêxistinî û fikrî ve ne di wê astê de ne, ji ber vê kar û çalakiyên wan lewaz dibin.

Dema ku şer sekinî, siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ku hebûn, xwestin ji rewşa piştî şer sûd werbigirin. Ji wan kesan yê yekem ku mirov li ser bisekine, Şêx Mehmûd Barzancî bû. hê ku şer bi giştî nesekiniye, di payiza 1918'an de bi Brîtanya re dikeve têkiliye. Diyare dibîne ku şer êdî bi ser ketina Brîtanya û Fransa xilas dibe. Lewra di wê demê de Brîtanya Bexda xistibû bin serweriya xwe û berê xwe dabû Kerkûk û Mûsilê, da ku wan deran jî bigre. Jixwe weke me berê jî behs

kir, Osmaniyan hêrêma Sûleymaniyê radestî Şêx Mehmûd Berzencî kiribûn. Lewra êdî hêza wan ku li wan deran kontrol bikin nemabû.

Şêx Mehmûd bi Brîtanya re dikeve têkiliyê û dibêje, “em dixwazin hûkûmeta Kurdan çêbikin.” Di wan deman de Brîtanya û Fransa jî daxûyanî didin û dibêjin, “ey gelên bindest yên Osmaniyan, ger hûn alîkariya me bikin û Osmanî bin bikeve, hûn dikarin azad bibin.” Li aliyê din Wîlson heye, serokê Amerîqa bû. Di wê demê de belevoka bi navê “prensîbên Wîlson” belav dike. Ji 14 xalan pêk tê û girêdayî azadiya gelan e.

Şêx Mehmûd jî dibêje, “li ser esasê bangawaziyên we û daxûyaniyên Wîlson, em jî weke Kurd dixwazin hûkimeta xwe çêbikin, azad jiyan bikin û hûn jî me nas bikin û qebûl bikin.” Li ser vê esasê têkiliyê bi Brîtanya re çêdike. Di meha cotmeha 1918’an de Brîtanya bersiva wî dide û dibêje, “em deshilatî û hûkimeta we qebûl dikin, hûn dikarin ava bikin.” Li ser esasê van hevdîtinan, di 2 mijdar 1918’an de şêx Mehmûd Berzancî li Sûleymaniyê hûkimetekê îlan dike û Brîtanya jî nunerên xwe dişîne û qebûl dike.

Ew gaveke ku ji aliyê Kurdan ve tê avêtine, da ku dewleteke Kurdî bê avakirin. Dewleta Şêx Mehmûd bi navê “Kraliyeta Kurdistan” e. Şêx Mehmûd Berzencî jî weke melîkê Kurdistanê tê îlan kirin.

Di vê demê de li Kurdistanê, di payiza 1918’an de ew rewşenbîrên ku berê Cemiyeta Teavûna Kurdistanê ava kiribûn, careke din tên gel hevudin. Di nava wan de gelek serokeşîrên berê, kur û neviyên mîran û şexsiyetên olî jî hene. Hinek dibêjin di dema xilasbûna şer de, hinek jî dibêjin beriya şer hatine gel hev û din. Lê piranî weke ku di sala 1918’an de kom bûne tê qebûlkirin. Cemiyeta Tealî Kurdistan ava dikin. Abdûlqadirî Nehrî Şemzînî, ango kurê Şêx Ûbeydûlah Nehrî dibe serokê cemiyetê. Emîn Alî Bedîrxan, ango kurê Bedîrxan Beg dibe alîkarê wî. Gelek rewşenbîr û kesayetên ku tên naskirin di nav de cih digirin.

Ew Cemiyet, li piraniya bajarên Kurdistanê û Osmaniyan komaleyên xwe vedikin. Li Stenbol, Amed, Sûleymanî, Bexda, Mêrdîn, Bêdlîs û li gelek cihên din komalayan ava dikin û gel li derdora wan kom dibin. Daxwaza vê Cemiyetê ew e ku mafê Kurdan bê dayin.

Li aliyê din, di sala 1919’an de tevgera Simkoyê Şikakî nû dibe. Lewra di 1914’an de Rûsya, Aşûrî biribûn herêma Serdeşt wan deran û dixwestin ji wan re dewletekê çêbikin. Lê piştî ku di sala 1917’an de Rûsya şer vedikişe, ew Aşûrî li wan deran li holê dimînin. Di navbera Aşûriyên li wê herêmê û Kurdên ku di pêşengtiya Simkoyê Şikakî de

nakokî û pevçûn derdikevin. Di 1919'an de Simkoyê Şikak, wan herêman dixe bin destê xwe û rêberê Aşûriyan, Mar Şamûn jî dikûje. Di dîrokê de ew ji bo Simkoyê Şikakî dibe rexne û dibêjin, "pir bi tûndî nêzikî Aşûriyan bûye." Lê Sîmkoyê Şikakî jî dibêje, "ew bûne amûrên hêzên derveyî û xwestine welatê me bigirin, ger min ew nekûştana, dê wan em bikûştana." Serokatî jî rexne dike û dibêje, "yên ku ew siyaset dan meşandin, berpirsyarê wan kûştinan in." Rewşeke bi vî rengî çêbûye.

Di sala 1919'an de Îran jî di rewşeke belave de ye. Hûkimeta Îranê, bi giştî lewaz dibe; serweriya deshilatdariya navendî, li ser herêmê namîne. Di wê demê de Simkoyê Şikakî ji Ûrmiyê, heya Mahabad wan deran dixe bin deshilatdariya xwe û heya 1921'an hûkmî wan herêman dike.



**DÎMENEK JI SERHILDANA QOÇGIRÎ**

Di vê demê de li Qoçgirî, Meletî û Xerpetê (Elazix) tevgerek pêş dikeve. Hinek weke du tevgeran digirin dest û Hinek jî tevgera Meletiyê cuda digirin dest. Di sala 1919'an de li herêma Qoçgirî, gelek serokeşîr û serokhoz kom dibin û hêrêmê dixin bin destê xwe. Dibêjin, "em jî hûkimeta Kurdî dixwazin. Em dixwazin ku dewletên ku serkeftine rastiya me qebûl bikin."

Ji aliyê din ve li Meletî û Xerpetê tevgerek çêdibe. Di wê demê de waliyên Meletî û Xerpetê herdu jî ji malbata Bedîrxan in. Bangî xweserî û azadiyê dikin û dibêjin, "divê herêma me azad be û em xwe weke dewlet îlan dikin." Du hewldanên bi vî rengî çêdibin.

Di wê demê de, li aliyê Tirkiye jî hewldana Mistefa Kemal çêdibe. Di gulana 1919'an de hin derdorên Tirkiyê kom dibin û ji bo ku bikaribin arteşa Osmanî komî ser hev bikin û projeyên xwe ser bixin, Mistefa Kemal weke berpirsyar erkdar dikin. Da ku biçe Rojhilatê Anatolyayê û hêzên li wan deran kom bike û bikaribin di çarçoveyê îtîfaqê de tevbigerin. Lê Mistefa Kemal di dîroka 19.05.1919'an de bi riya deryayê derbasî Samsûnê dibe û li wir dijberî ku hatiye nîqaş kirin, xwe îlan dike. Dibêje, "ez dixwazim welat, ol û milet rizgar bikim. Lewra welat, ol û miletê me ketiye bin destê dagirkeran û di bin bêniriya kafiran de jiyan dikin. Bi vî rengî nabe."

Nunertiya ew berteka ku li Osmanî çêbûbû dikir. Lewra li gorî Peymana Mondorosê tevnedigerîn û hêdî hêdî Osmanî biçûk dikirin. Li aliyekî Fransa heya Gurgum û Dîlokê girtibû. Li aliyekî Yewnanan mûdaxale kiribûn û heya herêma Îzmîrê girtibû. Li aliyekî Rûsya tam hêzên xwe nekişandibûn û dixwestin beşeke Bakûrê Kurdistanê bikin dewleta Ermeniyan. Li aliyekî din Brîtanya Musul û Kerkûk girtibû. Ji bo Osmaniyan Stenbol, Enqere û beşeke anatolyayê dima. Êdî milên Behra Ege û Deryaya Spî ji destê Osmaniyan derdiket. Her wiha Kur-

distan jî di destê Osmaniyan de nedima. Ji bo wê Mistefa Kemal helwesteke bi vî rengî nîşan dide.

Di van deman de, di asta cîhanê de jî ji bo ku hêzên bi ser ketine bikaribin projeyên xwe pêk bînin, Kongreya Parîs ya Aştiyê pêk tînin. Ew kongre di sala 1919'an de çêdibe. Di vê kongreyê de li ser netîceyên şer û hemû welatêtn ku tevlî şer bûne nîqaş çêdibe, li ser ji nû ve xêzkirina nexşereya cîhanê nîqaş çêdibin. Di encamê de biryar digirin ku ji bo her herêmekê kongreyekê çêbikin. Ji bo dewleta Osmanî jî biryar didin ku di kongreya Sevr de nîqaş bikin. Biryara ku Kurdan eleqedar dike, ew e.

Di navbera salên 1919'an û 1920'an de, cara yekem di serdema nû de, di kongreya Parîsê de Kurd weke miletekî beşdarî kongreyeke cîhanî dibin. Ew girîng e. Piştî kongreya Parîsê, Kurd li ser navê Kurdîtiyê tevlî tu kongre û konferansên cîhanê nebûne. Li ser navê dewletên din û navên cuda tevlê dibin, lê ser navê Kurdan tevlî tu konferansan nabin. Par li Cenevê, li ser Suriye hate nîqaşkirin. Me israr kir ku şandeyên Kurdî serbixwe tevlê bibin, lê qebûl nekirin. Hêzên ENSK jî tevlê nebûn. Lê di kongreya Parîsê de, Kurd li ser navê xwe tevlê dibin û daxwaziyên xwe pêşkeşî kongreyê dikin.

Di wê demê Şerîf Paşayê Baban heye, ji malbata Baban e. Demekê bolyozê Osmanî yê li Sîwîsê bû. Piştî salên 1909'an di nava tevger û rêxistinên Kurdî de kar dike, di heman demê de weke nunerê Ewropa yê Cemiyeta Teavûnê Kurdistan û Cemiyeta Tealî Kurdistan kar dikir. Dema amadekariya kongreya Parîsê dibû, Cemiyeta Tealî Kurdistan ew erkdar kiribû; da ku weke nuner tevlî kongrê bibe. Di heman demê de Şerîf Paşayê Baban, li gel Şêx Mehmûd Berzencî, Simkoyê Şikakî û tevgerên din yên Kurd têkilî çêdike û piraniya tevgerên Kurd piştgiriya wî dikin. Weke nunerê Kurdan qebûl dikin, da ku tevlî kongrê bibe.

Şerîf Paşa tevlî kongreyê dibe û dibêje, "daxwaziya Kurdan ew e ku serbixwe jiyan bikin û îtîlaf bi dewleta Kurdan bê kirin." Vê projeyê didin kongreyê û pişt re Şerîf Paşa li gel nunerê Brîtanya, li gel serokwezîrê Fransa, li gel gelek nunerên welatan nîqaş dike û li gorî wê demê proje û nexşereyên Kurdistanê didin wan. Da ku di kongreya Parîs û Sevrê de biryar ji bo Kurdan bê girtin. Lewra Kurd jî ji yek wan miletên ku di bin deshilatdariya Osmanî de jiyan dikin in. Heya sala 1920'an ku peymana Sevrê çêdibe, ew nîqaş li gel aliyên têkîldar çêdibin. Di kongreya Parîsê de Şerîf Paşa û nunerên Kurd weke çavdêr beşdar dibin, weke endam beşdar nabin. Dibêjin dewlet dikarin weke endam tevlî kongreyê bibin.

Ew dem, ji sala 1919'an heya sala 1920'an demeke girîng e. kongreya Parîsê, ji bo Kurdistanê hin biryarên girîng digre û soz didin ku mafên azadiya Kurdan qebûl bikin.

Di sala 1919'an de tevgera Şêx Mehmûd Berzencî bi rûxandinê re rû bi rû dimîne. Bi ya min ew ne tesadûf e; dema ku Mûstafa Kemal diçe Samsûnê, di heman rojê de Brîtanya li Şêx Mehmûd dide. Di dîroka 19.05.1919'an de, piştî 6-7 mehan têkiliyên Şêx Mehmûd û Brîtanya xirab dibin. Brîtanya dixwaze Sûleymaniyê bixe bin serweriya xwe, lê Şêx Mehmûd Berzencî jî dibêje, "we soz dabû ku hûn hûkimeta me qebûl bikin" û dijberî wan derdikeve. Bi vî rengî di navbera wan de pirsgirek derdikevin, têkiliyên wan qut dibin û şer di navbera wan de çêdibe.

Di hazîrana 1919'an de li herêma Derbendî Baziyan, di navbera hêzên Şêx Mehmûd û hêzên Brîtanya de şer çêdibe û di encamê de Şêx Mehmûd têk diçe. Şêx Mehmûd bi xwe jî birîndar dibe û dikeve destê Brîtanya. Wî dibin Bexda û dadgeh dikin; di destpêkê de biryara îdamê li ser wî didin, lê pişt re dozgerên Brîtanya yên li Iraqê vê biryarê qebûl nakin û dixwazin Şêx Mehmûd sûrgûnî Hîndîstanê bikin. Bi vî awayî Şêx Mehmûd sûrgûnî Hîndîstanê dikin. Di demeke ku li Parîsê li ser Kurdistanê nîqaş çêdibin, Brîtanya li vê derê hûkimeta Kurdî ku di pêşengtiya Şêx Mehmûd de pêş dikeve, têk dibe.

Li aliyê din, li Bakûrê Kurdistanê tevgera Qoçgirî û tevgera Meletî û xerpetê heye. Mistefa Kemal bi wan re dikeve têkiliyê û di havîna 1919'an de li Sêwaz û Erzoromê kongre çêdike. Di vê kongrê de, ji Kurdan re dibêje "bi tenê berxwedan nabe, bên ku em bi hev re berxwedan bikin û welatê xwe pêk ve rizgar bikin." Di wê demê de hejmareke zêde ya serokeşîrên Qoçgirî, Meletî û Erzoromê qebûl dikin ku bi Mistefa Kemal re tevbigerin. Dibin endamê Meclîsa Gel ya Mezin (Büyük Milet Meclisi). Di wê demê de navê Tirk tê de tune ye.

Ji îlona 1919'an, heya bihara 1920'an amadekarî dikin. Di nîsana 1920'an de jî ew meclîs bi awayekî fermî, bi 223 kesan rûniştina xwe ya yekemîn dike. Di nava ew kesên ku hatine diyarkirin de serokeşîr, rewşenbîr, leşker hene. Ji wan 72 kes Kurd in. Ji wan re dibêjin, "Mebûsên Kurdistan." 6-7 kes ji wan, ew şexsiyetên ku ji tevgerên Qoçgirî, Meletî û Xerpetê tevlê bûne. Dibêjin, "êdî em tevlî tevgera Mistefa Kemal dibin." Ji ber vê tevgera Qoçgirî ku Haydar Beg û Alîşan pêşêngtiya wê dikin, lewaz dibe; jixwe tevgera Meletî û Xerpetê jî namîne. Ango weke daxwazî namînin, tevlî tevgera Mistefa Kemal dibin. Mistefa Kemal, dema ku meclîsa yekemîn ava dike, bi rengekî

Haydar Beg û Alîşan jî dixapîne û bi vî rengî tevgera Qoçgirî jî tasfiye dibe. Jixwe hinek tevlî tevgera Mistefa Kemal dibin, yên din jî tasfiye dibin.

Bi vî rengî ji aliyekî ve tevgera Şêx Mehmûd Berzencî tasfiye dikin, ji aliyekî ve tevgerên Qoçgirî, Meletî û Xerpetê tasfiye dikin. Ji aliyekî din ve jî li Rojhilatê Kurdistanê li ser Simkoyê Şikakî êrîş hene. Riza Xanê ku di wê demê de serleşkerekî Îranê bû, bi alîkariya Ziyadîn Tabatayî di sala 1921'an de înkilap dike. Riza Salê ku dibe serleşkerê Îranê, êrîşî Simkoyê Şikakî dike û wan mintiqayan ji destê Simkoyê Şikakî derdixe. Bi vî rengî li sê herêmên Kurdistanê ku tevgerên Kurdî hinek gav avêtine, di salên 1919-1920-1921'an de tên tasfiyekirin.

Di heman serdemê de, di payiza 1919'an û di destpêka 1920'an de Cemiyeta Tealî Kurdistan jî, bi sedemên nêzikbûnên malbatî û kesayetî parçe dibe. Ew tevger di navenda Osmanî de bû û gavên bi bandor diavêtin. Di navbera malbata Nehrî û Bedîrxaniyan de pirsgirek hene; malbata Bedîrxanî dibêjin, "em ji bo serxwebûnê jiyan dikin." Malbata Nehrî jî dibêje, "em dikarin bi awayekî otonomî bi Tirkan re jiyan bikin." Bi vî rengî nêrîn cuda dibe.

Pişt re di sala 1920'an de kongreya Sevrê tê darxistin, di 10'ê tebaxa 1920'an de xilas dibe. Di encamê de, di 423 xalan de biryar dane. Sê xal (xalên 62, 63, 64) bi taybetî li ser Kurdistanê ne. Di van xalan de gotine, "hêrêma ku dikeve rojhilatê çemê Firatê, sînorê Ermenîstan, sînorê Suriye û Iraqê; ji şeş mehan heya salekê dikare rêveberî û otonomiya xwe ava bike û xwe rê ve bere. Ger ew rêveberî, bikare salekê xwe îdare bike; hem Îngîltere, hem Fransa, hem Osmanî, hem jî Cemiyeta Miletan divê vê hûkimetê bi awayekî serbixwe qebûl bikin û dewleteke Kurdî jî çêbe."

Kurd vê yekê ji bo xwe weke deskeftiyeke dibînin; lewra bi awayekî fermî di qada cîhanê de otonomî û xwerêvebirina Kurdan hatiye qebûlkirin.

Dema ku ew biryar di tebaxa 1920'an de hate dayin, tevgera Kurdan bi tasfiyeyê ve rû bi rû mabû. Li Bakûr û Başûr rastî tasfiyeyê hatibûn, li Rojhilat jî bi zext û tûndiyê ve rû bi rû mabûn. Şerîf Paşayê Xandan, piştî wê biryarê tê Kurdistanê. Bîranînên wî hene û dibêje, "ez çûm Stenbolê û geriyam. Min dît ku Cemiyeta Tealî Kurdistan bûye du beş û kes hesabê tu kesî nake. Hinek çûne gel Mistefa Kemal, hinek çûne gel Osmaniyan, hinek jî dibêjin em serxwebûnê dixwazin, lê parçe bûne." Dibêje, "pişt re çûm Kurdistanê, li Bakûrê Kurdistanê piraniya serokeşîr û fermandarên leşkerî çûne gel Mistefa Kemal. Çûm wîla-

yeta Mûsilê (Başûrê Kurdistanê), şêx Mehmud Berzencî têk çûye û kesekî din ku tevbigere jî tune.” Dibêje, “ez salek û şeş mehan geriyam, min tiştek nedît û me nikarî em tiştekî bikin.” Di wê demê de rewşa Kurdistanê wisa ye. Jixwe di 1921’an de êrîş li ser Sîmkoyê Şikakî tên kirin û ew jî derbasî Başûrê Kurdistanê dibe.

Dijberî wê di salên 1920 û 1921’an de Mûstafa Kemal; têkiliyên xwe bi Rûsyayê re pêş dixe û hêza Rûsya dikşe û hêrêma Erzorom û Agiriyê careke dîtir dixe bin destê xwe. Heya sala 1921’an Îngîltere, Fransa û Yewnanan ji axên Tirkiye derdixe.

Di wê demê de hûkimeta Brîtanya û Fransa du dewletên din çêdikin: yek li Suriye û yek jî li Iraqê ye. Di van deman de xerîteya cîhanê ji nû ve dihat xêzkirin, di bihara 1920’an de bi navê Suriye dewletek çêkirin. Li gorî peymana Sykset-Pîcot, divê dewleta Suriye bikeve bin çavdarî û binêriya Brîtanya. Wê demê ji dewletên wisa re dibêjin, “manda-întîdap.” Her wiha divê wîlayeta Mûsilê jî bikeve bin binêriya Fransa. Lê pratîkî dijberî wê bû; Brîtanya hatibû Mûsilê û Fransa jî çûbû Suriye. Fransa, Suriye dagirkiribû; Iraq û Mûsil jî Brîtanya girtibû. Ew di navbera Fransa û Brîtanya de bû nakokî. Fransayê li Suriyeyê dewletek çêkir, lê Brîtanya digot, “mafê Fransa li ser wê dewletê tune. Divê ez vê derê îdare bikim.” Fransa jî digot, “divê ez jî Mûsilê îdare bikim.” Brîtanya rê nedida ku Fransa Mûsilê îdare bike, lewra petrol dîtibûn û li Mûsil û Kerkûkê dewlemendî hebû. Di bihara 1920’an de biryar dan ku dewleta Suriye çêbibe.

Di wê demê de Kurdan dixwestin Mûsil bikeve ser Kurdistanê, ew jî pirsgirekek bû. Ji aliyekî din ve Ereban dixwestin dewleteke bi navê Iraqê çêkin û Mûsilê jî tevlî vê dewletê bikin. Ji aliyekî din ve jî, tevgera pêşengtiya Mistefa Kemal de, dema ku di sala 1920’an de meclîsa xwe kom kirin, peymanek çêkirin. Digotin em ê şerê rizgariyê bikin, bi wê re nexşereyek jî çêkirin û sînorên xwe weke Mîsaki Mîlî diyar kirin.

Li gorî Mîsakî Mîlî, divê sînorên Osmanî ku di dema peymana Mondorosê de hebûn, ji wan re bimînin. Bi mahneyekê din, divê Fransa ji Dîlok, Gurgum, Riha, Antakya, Hesekê û Helebê derxin. Divê Brîtanya jî ji Mûsil, Kerkûk û Sûleymaniyê derxin. Divê ew cih hemû bikevin nava sînorên Osmanî û welatekî hevbeş çêkin. Li ser esasê sînorên Mîsakî Mîlî kar kirin. Ji ber vê yekê Mistefa Kemal digot, “divê em Mûsilê vegerînin, Mûsil ya me ye. Dema ku şer sekinî, ew cih yên me bûn û divê hûn derkevin.” Li ser van herêman pirsgirek hebû.




## LI GORÎ MÎSAKÎ MÎLÎ ROJHILATA NAVÎN

Ji ber vê yekê di navbera Fransa û Brîtanya de, di sala 1920’an de peymanek çêbû û piştre wan dewletên din jî ew qebûl kirin. Ji vê peymanê re dibêjin, “Peymana San Rîmo.” Di vê peymanê de ûsûlê mandatiyê nîqaş kirin. Ango li ew dewletên ku ketine bin serweriya Fransa, Îngîlterê û dewletên serketine, divê xwe bi çi rengî tevger bikin û divê hûkmê wan çibe. Ango heq û hûqûq diyar kirin. Ji aliyekî ve jî Fransa û Brîtanya bi hev kirin, li ser meseleya Suriye û Mûsilê. Li ser esasê vê peymanê Brîtanya qebûl kir ku Suriye, di bin serweriya Fransa de bimîne. Ango destê xwe ji Suriye kişand, bi şertê ku Fransa jî destê xwe ji Mûsil bikşîne. Fransa jî bi şertekî qebûl kir. Ew şert jî divê Brîtanya ji nefta ku Mûsilê derdikeve ji sedî 25’an bide Fransa.

Bi vî rengî li hev kirin. Êdî Fransa, Suriye li gorî xwe ava kir. Di destpêkê de pergaleke qraliyetê çêkiribûn. Di serdema Melîk Faysal de wisa bû. Faysal kurê Şerîf Elî Meke ye, ew Brîtanya anî û kir qralê Suriye. Lê dema ku Suriye ket bin serweriya Fransa, Fransa patika wî girt û ji Suriye derxist. Melîk Faysal êdî bê text ma.

Di wê demê de nîqaş hebûn ku li Iraqê dewletekê çêbikin. Di meha 10’an ya 1920’an de li Iraqê jî dewletek çêkirin. Di destpêkê de ew dewlet, ji wîlayetê Baisra û wîlayeta Bexda pêk dihat. Di dema Osmaniyan de, çend bajarên derdora Baisra kom bibûn û wîlayetê Baisra ava kiribûn; çend bajarên li derdora Bexdayê kom dibûn û wîlayeta Bexdayê pêk dianîn.

Ereban dixwest, wîlayetê Mûsilê jî bikeve ser Iraqê. Dihat wê mahneyê ku bajarên Mûsil, Kerkûk, Sûleymanî û Hewlêr jî bikevin nava dewleta Iraqê. Lê Brîtanya di destpêkê de ew yek qebûl nekir. Brîtanya, Fransa, Osmanî, Kurd û Ereban; her kesî Mûsil dixwest. Meseleya Fransa hatibû hal kirin; lê meseleya Kurd, Tirk û Ereban nehatibû hal kirin. Ji ber wê dema ku di destpêkê de Iraq çêbû, tenê ji Baisra û Bexdayê pêk hat. Wîlayeta Mûsilê, ango li gorî îro Başûrê Kurdistanê neket nava sînorên Iraqê.

Ew di peyîza 1920'an de çêbû, di tebaxa 1920'an de jî kongreya Sevr biryar dabû ku Kurdistanek bê avakirin. Heya sala 1921'an Kurdan nikarî dewletekê ji bo xwe çêbike. Di vê salê de Mistefa Kemal, piraniya Kurdan komî ser hev û din kirin. Mistefa Kemal, ji hinek mijaran îstîfa kir. Yek, heya beriya şerê cîhanê Mistefa Kemal, li Amed, Erzorom û bajarên Kurdistanê fermandariya arteşê dike. Têkiliyên wî li gel serokeşîr û gelê wir heye. Dibêjin têkiliyeke baş bûye, ji vê îstîfade dike.

Ya duyem, dema ku Mistefa Kemal dest bi tevgerê dike nabêje, " ez li dijî Îslamiyetê me, ez li dijî xelîfe me, ez li dijî Kurdan im." Got, "em Tirk, Kurd û miletên din yên ku li Osmanî jiyan dikin, em hemû birayên hev in. Ew hêzên dagirker, hêzên kafir in. Hatine welatê me dagir bikin û parçe bikin, xelîfeyê me jî bindest kirine. Em dikarin pêk ve li hemberî wan bisekinin. Dema ku em li hemberî wan bisekinin, em ol, xelîfe, welat û deshilatdariya xwe rizgar dikin." Ew xîtabet bala civaka Kurd û Tirk dikşîne. Piraniya civaka Kurd, vê yekê qebûl dikin. Yên ku di destpêkê de qebûl nedikirin jî, piştî peymana Sevrê qebûl kirin.

Çawa ku em îro dibêjin, "hêzên êmperyalîst dixwazin li gorî xwe, li Başûr dewleteke Kurd ava bikin" wê demê jî wisa ye. Çima? Lewra peymana Sevrê mafê çêkirina dewleta Kurd da. Lê ger peymana Sevrê pêk bihata, Kurd dibûn şeş parçe. Niha em çar parçe ne. Li gorî Sevrê sînorên Rojavayê Firatê nakevin nava sînorên Kurdistanê, an ji bo dewleta Tirk dimînin, an jî ji bo Fransa dimînin; ji aliyê Bakûr ve heya sînorê Ermenîstanê ye û di xaleke din de sînorê Ermenîstanê jî heya Çewlîk û Bêdlîsê tînin. Ango nîvê Bakûrê Kurdistanê dikeve nav sînorên Ermenîstanê. Her wiha Rojavayê Kurdistanê, ji bo Fransa-Suriye dimîne. Jixwe wîlayetê Mûsilê jî Brîtanya û Iraqê re dimîne. Beşek jî di destê Îranê de ye.

Wê demê Kurdistan dibe şeş parçe. Ji ber vê yekê, Cemiyeta Tealî Kurdistan dibêje, "piştî peymana Sevr, Kurdistan bi temamî parçe bû."

Lewra di wê demê de Mistefa Kemal, peymana Sevrê ji gel re dixwîne û dibêje, "vaye nîvê welatê we didin Ermeniyan, hûn vê qebûl dikin? Ger hûn bi Brîtanya û Fransa re tevbigerin, nîvê welatê we didin Ermeniyan, nîvê welatê we jî didin Ereban." Bi vî rengî baş kar dike. Ji ber vê yên ku heya wê serdemê tevgera Mistefa Kemal qebûl neke jî, tevlî wî dibin.

Dibêjin, "em pêk ve bikin û bila otonomiya her kesî hebe." Jixwe di şibata 1922'yan de rêgeza otonomî û mûhtariyetê, Mistefa Kemal qebûl dike. Di destpê de hinek xelkê Qoçgirî û Meletiyê li hember derdikevin, lê pişt re ew jî qebûl dikin. Bi vî rengî ew kesên ku derve mane jî, heya salên 1921 û 1922'yan tevgera Mistefa Kemal qebûl dikin. Di nava van tevgeran de biryara peymana Sevrê encam nagre. Weke ku ew çend salin, ji bo Suriye civînên Cenevê dar dixin, lê netîce nagre.

Di wê demê de Mistefa Kemal hêdî hêdî pêş ve çû; Fransa ji Gurgum, Dîlok, Rihayê derxist; Yewnan ji milê Ege derxistin, îtîfaq çêkir û Rûsan xwe ji aliyê Erzoromê kişand. Ango ew Tirkiya ku niha heye, hêdî hêdî kontrol kir. Ji aliyê din ve têkiliyên xwe bi Fransa re çêkirin.

Bala xwe bidinê. Dema ku di sala 1919'an de Mistefa Kelam serê xwe radike; Osmanî, Brîtanya û Fransa dadgeha Mistefa Kemal çêdikin. Serokê dadgehê jî Mistefa Paşayê Yamûlkî ye. Ew jî fermandarekî Kurd e, xelkê Sûleymaniyê ye û pişt re di tevgerên Kurdî de cih digre. Di wê demê de jî li Stenbolê hakîmê leşkerî ye. Mistefa Paşayê Kurd, biryara îdamê li ser Mistefa Paşayê Tirk dide. Divê Mistefa Kemal bê îdamkirin, lê piştî sê salan xwe îspat kir û ew dewletên ku di derheqê wî de biryara îdamê dabûn, pê re ketin îtîfaqê. Herî dawî di mijdara 1922'yan de Fransa û Brîtanya qebûl dikin ku pê re bikevin dan û standinê. Da ku meseleya Osmanî û Tirkiye hal bikin.

Ew mijareke ku mirov jê waneyan derbixe ye. Çawa ku li ser Mistefa Kemal biryar hebû ku bê îdam kirin û pê re ketin îtîfaqê. Berê ji Serokatî re digotin, "terorîst." Niha ji aliyê pratîkî ve Serokatî û PKK'ê qebûl dikin, lê hê nebûye fermî. Ew heqîqetek e. Ger tu di pratîkê de, bi taybetî di rewşên awarte de xwe îspat bikî, her kes neçare ku te qebûl bike.

Di encama hevkirina Mistefa Kemal û Fransa û Brîtanya de, biryar didin ku biryarên Sevrê nayen qebûlkirin û kongreyeke din bê çêkirin. Li ser vê esasê di navbera mijdara 1922'yan û tirmeha 1923'yan de civînên Lozanê çêdibin. Di van civînan de li ser esasê hevsengî û tevazûnên nû meseleyê çawa hal bikine, nîqaş dikin.

Di vê demê de, sînorên Suriye jî teng dikin; berê heya Gurgum û Rihayê diçûn, lê di encamê de weke niha dimînin. Antakya jî li gorî wê peymanê dikeve nav sînorên Suriye, lê pişt re Tirkiye careke din ew der girt.

Li Iraqê jî, di sala 1921'an de nîqaşeke cîdî çêdibe. Kongreya Kahîrê heye; ji bo naveroka nîqaşên wê girîng e, Serokatî jî bal dikşîne ser. Heya îro tesîra vê kongreyê li ser siyaseta Rojhilata Navîn heye. Di kongreya Kahîrê de, li ser dewleta Iraqê û meseleya Mûsilê nîqaş çêdibin. Dewleta Iraqê, tenê ji Baisra û Bexda pêk bê, an Mûsil jî bikeve nav sînorên Iraqê? Vê yekê nîqaş dikin. Mûsil bibe beşeke Iraqê, bikeve nav sînorê Iraqê, ji Tirkiyê re bê berdan, an bibe dewleteke serbixwe? Lewra Mistefa Kemal jî di salên 1921'an de dawaya Mûsilê dike û fermandarekî xwe bi navê Ozdemîr dişîne hêrêma Revanduzê. Ew fermandar bi eşîrên Kurd re têkilî datîne û nîqaş dike, da ku herêma Mûsilê vegerînin ser Tirkiye.

Ji ber vê yekê di vê kongreyê de, li ser qedera Mûsil û Iraqê nîqaş dike. Di vê derê de du nêrînên esasî derdikevin; yek, dixwazin Mûsilê bikin dewletekê serbixwe û bi Brîtanya ve girê bidin. Hinek kesên weke Noel, vê nêrînê diparêzin. Nunerê Brîtanya yê wê demê Çerçîl jî vê fikrê diparêze, ji bo berjewendiyên Brîtanya vê yekê rastir dibîne. Lê ji bo parastina berjewendiyên li Hîndîstanê yên Brîtanya, nêrînên cûda jî derdikevin holê. Bala xwe bidinê, li Rojhilata Navîn van dewletên hêgemonîk her navendên xwe yên leşkerî hildibêjêrin û konevaniyên xwe yên Rojhilata Navîn, ji ser wê navendê re dimeşînin. Mesela niha navenda Amerîqa ya li Rojhilata Navîn, Katar e.

Wê demê navenda Brîtanya jî Hîndîstan bû. Hîndîstan, Çîn, Îran, Pakîstan, Iraq, Efganîstan û heya Osmanî ji vê navendê kontrol dikirin. Wê demê nunerên Brîtanya yên Hîndîstan, Bexda û Kahîrê dibêjin, "bila Mûsil nebe dewleteke serbixwe, bi Iraqê ve bê girêdan baştir e." Dibêjin, "ger tenê Bexda û Baisra di nava sînorên Iraqê de bimîne, zêdetirî xelkên van hêrêman Şîa ne, zêdetirî Îranê jî Şîa ye; ger em dewleta Iraqê bi vî rengî çêbikin, dibe ku di demên pêş de ew dewlet bibe beşeke Îranê û bikeve bin çavdêriya Îranê." Vê yekê ji bo xwe xeterî dibînin, lewra Şîagerî pêş dikeve, Îran xurt dibe û Iraq jî ji destê Brîtanya derdikeve.

Yek jî dibêjin, "ger Mûsilê bikin dewleteke serbixwe, Kurd nikarin xwe îdare bikin. Di encamê de jî çawa ku herêmên Riha, Dîlok û Gurgumê ji destê Fransa derketin, dê Mûsil jî ji dest me derkeve. Dibe ku sibê Mistefa Kemal van herêman careke dîtir bixe bin destê xwe."

Lewra pêşengê herêmê Şêx Mehmûd bû, ew jî çûye; yên din jî nikarin xwe komî ser hev û din bikin. Ew nêrînek e. Nêrîna duyemîn jî; dixwazin Mûsilê jî tevlî xakên Iraqê bikin û Melîk Faysal bînin û bikin paşayê Iraqê.

Melîk Faysal ji Meke ye û ji malbata Mihemed e, sûnî ye. Dibêjin, "ji ber ku piraniya Iraqê Şîa ne, dibe ku Faysal qebûl nekin. Lê ji ber ku Kurd û Erebên Mûsilê Sûnî ne, li Iraqê di navbera Şîa û Sûniyan de hevsengî çêdibe." Dema niha jî em Iraqê mezî dikin, texrîben ji sedî 55 Şîa ne, ji sedî 45 jî Sûnî ne. Dervayî ol û rêolên din, rêjeyeke wisa çêdibe. Hê jî Şîa zêde ne, ger mirov herêma Mûsilê (Başûrê Kurdistanê) jê derbixa, ji sedî 80 dibin Şîa. Lewra Sûnî zêdetir li herêma Mûsilê hene. Dibêjin, "ger em hevsengiya Sûnî û Şîayan çêbikin, ji bo rêvebirina Kral Faysal jî baş e, ji bo îdarekirina me jî baş e."

Yek jî bi herêma Mûsilê dixwazin Faysal jî bikin bin kontrolê. Ger Faysal li hemberî Brîtanya derkeve û ji kontrola wan derbikeve, dikarin Kurdan li hemberî Faysal derbixin. Lewra Kurd ji miletekî cuda ne û nakokiyên wan çêdibin. Bi vî rengî dixwazin hem Kurd, hem jî Erebên Sûnî û Şîa kontrol bikin. Dibêjin, "bi hin mafan, em dikarin Kurdan jî bi xwe ve girê bidin û tesîrê li ser Kurdên parçeyên din jî bikin. Ji ber ku Kurdên Başûrê Kurdistanê, di bin serweriya wan de ne; em hinek maf bidin wan, em dikarin Kurdên parçeyên din jî bi xwe ve girêbidin û dema ku pêwîst kir em li hemberî wan dewletan bi kar bînin." Di encamê de kesên ku vê nêrînê diparêzin, yên din jî qaneh dikin û Mûsilê tevlî xaqa Iraqê dikin.

Di vê kongreyê de, biryar didin ku Mûsil bikeve ser Iraqê û Faysal jî bikin paşayê Iraqê. Heya wê demê 4-5 mehin ku qraliyeta Iraqê çêbûye, lê hê qralê wê tune. Di wan deman de ji, Mistefa Kemal fermandarên xwe şandine herêmê. Ji bona wê jî weke alternatîf û tevdîr, biryar didin ku Şêx Mehmûd vegerînin Başûrê Kurdistanê. Biryar didin ku Şêx Mehmûd Berzencî vegerînin, qaneh bikin da ku li hemberî Mistefa Kemal bi hev re tevbigerin. Diçin gel Şêx Mehmûd û pê re dibêjin, "Mistefa Kemal, dixwaze wîlayeta Mûsilê bixe ser Tirkiyê, em dixwazin te vegerînin û ger tu bi me re hereket bikî, em ê hûkimeta te ya Kurdî jî qebûl bikin." Diyare şêx Mehmûd jî qebûl dike.

Bi vî rengî di sala 1922'yan de Şêx Mehmûd vedigerînin. Di meha 11'emîn ya 1922'yan de, Şêx Mehmûd hûkimeteke nû çêdike. Hûkimeta Brîtanya îlana hûkimeta Şêx Mehmûd qebûl dike. lê piştî wê hevdîtinên Mistefa Kemal û Brîtanya çêdibin. Piştî mehekê jî Mistefa Kemal, Brîtanya û Fransa li hev dikin. Heya meha sibatê bi hev nakin,

di meha sibatê de weke prensîb li hev dikin. Lê tenê di meseleya Mûsilê de bi hev nakin, dibêjin “em ê komîsyonekê çêbikin, da ku vê mişqûleyê çareser bike.” Ango di kongreya Lozanê de, hemû pirsgirekên Tirkiye tên çareserkirin; ew biryarên avakirina Kurdistan û Ermenîstanê hemû tên bîrkirin. Lê tenê meseleya Mûsilê naye çareserkirin.

Xalên peymana Lozanê yên 40, 41 û 42’yan bi mafên çandî ve girêdayî ne. Mafê dewletê yên van qewmên din yên Tirkiye tune ye, lê divê hûkimeta Tirkiye mafên wan yên çandî biparêze. Divê Tirkiye destûr bide ku van gelan li herêmên xwe bi zimanê xwe bixwînin û jiyana xwe îdare bikin. Serokatî got, “em hin tiştên ku di peymana Lozanê de hatine diyarkirin, qebûl dikin. Divê ew maf bên pêkanîn.” Lewra li gorî peymana Lozanê, divê Tirkiye çand û zimanê van qewm û miletan biparêze. Divê rê bide ku bi zimanê xwe bixwînin û bi zimanê xwe tevlî karên fermî bibin. Divê rê bidin ku rojname û çapemeniya xwe derbixin. Divê destûr bidin ku her miletek li herêma xwe îdareya xwe bike. Lê Tirkiye ew pêk neanîn.

Di dawiya sibatê de peymana Lozanê xilas dibe, lê divê parlamentoyên Tirkiye, Brîtanya û Fransa jî qebûl bikin. Parlemontoya Tirkiye, vê peymanê qebûl nake. Dibêjin “parlementoya yekemîn ya Tirkiyê, bi îrade ye. Dema peymanê qebûl nakin, di adara 1923’yan de, ew meclîs tê fesihkirin. Meclîseke nû tê avakirin, ew meclîs di avrêla 1923’yan de tê îlankirin.” Dibêjin, “ew meclîsa nû ji kesên piraniya nêzikî Mistefa Kemal pêk tê, di nava wan de kesên mûhalîf tune.” Jixwe di wê demê de hilbijartin tune, tên tayinkirin. Ew parlemento jî bi awayekî fermî di 24’ê Tirmêha 1923’yan de peymana Lozanê qebûl dike.

Tiştê ku di vê demê de mirov balê bikşîne ser; dema ku di meha şibatê de di navbera Mistefa Kemal û Brîtanya de hevkirin çêdibe, di heman demê de arteşa Brîtanya êrîşî Şêx Mehmûd dike. Di 28’ê sibata 1923’yan de êrîşî ser Şêx Mehmûd dikin û cara yekemîn, bi teyareyan bajarên Kurdan dixin. Wê demê navenda hûkimeta şêx Mehmûd Sûleymaniyê ye, bi teyareyan Sûleymaniyê dixin. Hûkimeta Şêx Mehmûd jî bajaran ber didin û li çiyan xwe bi cih dikin û şer berdewam dikin.

Bi vî rengî bi peymana Lozanê Kurdistan parçe bû, lê tam ne weke îro ye. Parçayê Rojava tam zelal nebûye; pişt re dema ku Tirkiye û Fransa bi hev dikin, Tirkiye dev ji Rojavayê Kurdistanê jî ber dide. Di sala 1925’an de, piştî ku serhildana Şêx Seîd hate tepisandin, Mistefa Kemal bi peymana Enkereyê dev ji wîlayeta Mûsilê jî berda. Di 5’ê

hazîranê de, di navbera Tirkiye, Iraq û Brîtanya yê de îtîfaqa Enkere çêdibe û Tirkiye dev ji Mûsilê berdide. Serokatî di paraznameyan de dibêje, “Mistefa Kemal bi rewşeke wisa ve rû bi rû mabû ku an Mûsil ji dest diçû, an jî Tirkiye ji dest diçû.”

Di peymana Enkereyê de tiştê ku hatiye îmzakirin; dewleta Tirkiye dev ji wîlayeta Mûsilê ber dide û Mûsil dibe beşeke Iraqê. Lê bi şert; şertê yekemîn, divê ji sedî 10 petrolê Mûsilê bidin Tirkiye. Şertê duyemîn divê Iraq weke dewlet bi giştî bimîne, ger Iraq ne yek parçe be, an jî parçe bibe; divê Mûsilê vegerînin ser Tirkiyê. Îtîfaqa Iraqê, di sala 2007’an de di navbera Tirkiye, Iraq û Amerîka de careke din hate nûkirin. Beriya ku Erdoxan biçe û Bush bibîne û êrîşî ser me bike, di sala 2007’an de kordîneyeke sê alî (Tirkiye, Iraq û Amerîqa) çêkirin. Soz dan Tirkiye ku Iraq parçe nebe, ger parçe bibe mafê Tirkiye heye ku Mûsilê bigre.

Ew îtîfak hem di dîrokê de heye û Cemiyeta Miletan îmza kiriye, hem jî hatiye nû kirin. Bi vî rengî ger Iraq parçe bibe, mafê Tirkiye heye ku Mûsilê bigre. Vê yekê hinek weke karekî xirab dibînin. Lê ger bibe, ji bo me baş e. Di sala 1992’yan de, Serokatî got, “em dewleta Botan û Behdînanê çêdikin.” Turgut Ozal jî di wê demê de daxûyanî da û got, “em qebûl dikin, ger wisa be em wîlayetê Mûsilê digirin.” Di wê demê de, Sadam lewaz bibû, li Başûrê Kurdistanê jî serhildan çêdibûn. Wê demê Serokatî daxûyanî da û got, “em kêfxweş dibin, bila wîlayeta Mûsilê bigirin, em alîkariya wan bikin.” Piştî wê bêdeng bûn. Diyare pişt re fikirîne, ger wîlayeta Mûsilê bikeve ser Tirkiyê; du parçayên Kurdistanê dibin yek. Ew jî ji bo me baştir e.

Ger îro jî bikin, em kêfxweş dibin. lê hinek hene naxwazin. Di van demên dawî de jî Serokatî di nameyên xwe de digot, “divê hûn li ser meseleya Mîsakî Mîlî, baş kar bikin.” Ger em baş li ser kar bikin, em dikarin peymana Enkereyê nû bikin û bila Başûrê Kurdistanê jî bikeve ser Tirkiye. Ji bo me ne pirsgirek e. Li Suriye jî heya Helep, Hesekê û Raqayê dikeve ser Tirkiye. Mîsakî Mîlî ew e, ger pêk were sê parçeyên Kurdistanê, careke dîtir dibin yek. Karê me jî rehet dibe. Ya girîng, ew bi peymana Enqereyê ve girêdayî ye, divê em baş li ser kar bikin. Lê heya niha me baş li ser kar nekiriye.

Bi vî rengî di sala 1926’an de, bi giştî Kurdistan parçe bû. Rojhilatê Kurdistanê, weke xwe ma. Lê Rojavayê Kurdistanê (Kurdistana di bin serweriya Osmanî de), bû sê parçe. Beşek di destê Tirkiye de ma, beşek ket destê Suriye û Fransa, beşek jî ket destê Iraq û Brîtanya.

Ji van sînoran re jî dibêjin, sînorên Brûksel. Rêkevtina Brûksel heye, di payiza 1924'an de rêkevtina Brûksel çêbû, di sala 1926'an de jî pêk hat. Êdî ew xet hate diyarkirin. Niha ew xeta ku di navbera Bakûr-Başûr, Bakûr-Rojava û Rojava-Başûr de çêbûye re dibêjin, "xeta Brûksel."

Heval dikarin li ser encamên şerê cîhanê yê yekemîn, pirs û nêrînên xwe bînin ser ziman.

…: Li gorî rewşa berê hebûye, civaka Kurd parçe kirine û li dijî hev dane şûxilandin. Taybetî ûmeta Îslamê, beşek kiriye Sûnî, beşek kiriye Şîa. Niha jî ew nakokiya Sûnîtî û Şîatiyê li Kurdistanê heye. Em dibêjin, em wekhev nêzikî olan dibin. Lê rastiyek jî heye, ol li ser qewimiyetê re dibînin. Mesela li Rojhilatê Kurdistanê, bi taybetî li Kirmanşanê ew tişt pir diyar e. Gelo pêwîst nake ku mirov li hemberî van tiştan bibe xwedî helwestekê?

Lewra ew zehmetî heye, kêşe jî dûrûst dike. Jixwe li gorî ol nikarin bi xwe biryarekê jî bidin, ji îmaman mezî dikin; ew jî ne nêzikî me ne. Divê helwesta me li hemberî wan çawa be?

…: Dixwazim tiştekî bipirsim. Dema ku Kurdistan parçe bû û Rojavayê Kurdistanê ket destê Suriye û Fransa, Îskenderûn ne di nav sînorên Tirkiye de bû. Lê pişt re radestî Tirkiye kirin. Gelo ji ber ku piraniya wan Tirkî diaxifîn radestî Tirkiye kirin?

…: Gelek nirxandinên Serokatî, li ser Mistefa Kemal, hevkariya wê demê ya Kurd û Tirkan, mûxtariyet ûhwd hene. Bi rastî jî di wê demê de têkiliya Mistefa Kemal, li gel Kurdan stratejîk bûye, an tenê ji bo ku wan tevlî şer bike wisa tevgeriya ye?

…: Qesî ku dizanim, Çiyayê Agiriyê berê di nav xakên Îranê de bûye, lê pişt re di navbera Riza Xan û Mistefa Kemal de peymanek çêdibe û Çiyayê Agirî parve dikin, sedema vê çi ye?

…: Komara Tirkiye, li ser tûnebûna Kurdan ava bûye. Dema ku me dîrok digirt dest, me digot "jixwe ew hemû faşîst in, ji destpêkê ve wisa bûn." Me pir bi kûrahî li ser rewşa xwe û pêkhatinên wê demê lêkolîn nedikir, em bi pêşderaziyan tevdigerîn. Lê di paraznameyên dawî de Serokatî dibêje, "divê tehlîlkirina Mistefa Kemal, ji ya Tirkên Spî cuda bibe. Hin kes hene, weke ku xwediyê du kesayetan be.

Mesela Atatûrkek heye, diçe Bakûr û destên şêxên Kurdan maç dike û mûxtariyetê tîne ziman. Fetîh Okyar, hevalê wî yê zarokatiyê dibêje, "ez destê xwe nakim nava xwîna Kurdan." Profîlekî bi vî rengî heye. Bi vî awayî mebûsên Kurd, di parlementoya Tirkiyê de hene.

Dervayî vê jî profîlekî cuda heye; kûştina hin mebûsan heye, meseleya Mûsil-Kerkûkê heye, komkûjiya Dersîm-Amed-Agiriyê kiriye. Weke ku du Mistefa Kemal hebin. Lê yek e. Ji vî alî ve di fêmkirinê de lewaziya me heye. Pê ve girêdayî, gotina Serokatî ku wisa tîne ziman; "divê mirov Mistefa Kemal, ji Tirkên spî cuda bigre dest" tê çi wateyê?

…: Avabûna Tirkiye, li ser Kurdistanê tesîr dike. Di wê demê de di avakirina Tirkiye û rewşa wê demê ya Kurdistanê de rista Cûhiyan çi ye? Serokatî pir li ser vê disekine, lêpirsîn dike. Ew mijar jî hinekî bê vekirin, dê baş bibe.

**H. Helmet:** Em li ser meseleya ol sekinîn. Em careke din vegerin, baş nabe. Weke çareserî kûrbûn û nêzikbûneke birdozîk pêwîst dike. Bi giştî ji bo ol, rêol û terîqetan me çarçoveyek diyar kir; divê em bi vî rengî nêzik bibin. Ger em wisa nêzik bibin û têkoşîneke birdozîk, siyasî û çandî bikin û şiyariyê pêş bixin dê ew mesele jî hêdî hêdî hal bibin. Ger em wisa nekin, tiştên di dîrokê de hatine jiyankirin dê dubare bibin. Ez bi kurtî wisa dibêjim. Me berê bi berfirehî vekir.

Meseleya Îskenderûnê; ne ku Îskenderûn dan Tirkiye, Tirkiye bi xwe girt. Di salên 1937-38'an de şerê cîhanê gur bû; Almanya, Polanya girt; Îtalya, Lîbya girt. Di wê serdemê de hê şerê cîhanê yê duyemîn destpê nekiribû, her dewletekê dixwest sînorên xwe fireh bike. Tirkiye jî, hê meseleya Mîsakî Mîlî di dilê xwe de girtibû, di wan deman de rewşa Suriye û Fransa jî ne baş bû. Suriye serxwebûn dixwest, Tirkiye jî ji vê rewşê sûd wergirt û Îskenderûn girt. Mesele ne Tirkî axafîn û neaxifîn e. Rewşeke siyasî hebû û Tirkiye gaveke wisa avêt.

Di sala 1974'an de li cîhanê alozî hebû, şerê Wîetnam û her wekî din hebû; Tirkiye çû û Kibris girt. Ango Tirk, di demên wisa de bi hostatî û qûrnaztî tevdigerin. Ger di sala 92'yan de jî ger PKK'ê tune bûya, dibe ku Başûrê Kurdistanê bigirtana. Lê dît ku PKK ji bo wê amade ye, paş ve gav avêt.

Mistefa Kemal, mirov dikare weke du şexsiyetan binirxîne, an na? Serokatî dinirxîne; tiştê girîng ku ji bo Mistefa Kemal bigirin dest, yek em dixwazin li ser esasê mîlîgeriyê nêzik nebin. Ew girîng e. Ji Mistefa Kemal qut, em wisa nêzik dibin. Ger em biratiya gelan dixwazin, divê em tiştên ku ji bo biratiya gelan faydaya wan heye, girîngî bidinê. Stratejiya me ya berê ne wisa bû; me digot em dewleteke Kurdî ya serbixwe çêdikin, nirxandinên me jî di bin tesîrên mîlîgeriyên Kurd de bûn. Ji bo wê Mistefa Kemal baş kiribe jî dîsa li ber çavê me reş bû, jixwe şaştî kiribe jî her reş bû.

Ger em niha dixwazin li ser hevbeşbûnê û pêkve kar bikin; kî dibe bila bibe ger li ser esasê biratiya gelan gav avêtibin, divê em nirx bidinê. Ji bo Mistefa Kemal jî wisa ye. Ger tiştên xirab kiribin, divê em rexne bikin. Dixwaze bila ew kes Kurd be, dixwazê bila yekî din be. Ji ber wê Serokatî, Mistefa Kemal wisa dinirxîne. Gelo nêzikbûna Mistefa Kemal textîk e, an stratejîk e? Niha em nikarin biçin û niyeta Mistefa Kemal binêrin, lewra 70' salî zêdetire wefat kiriye. Lê ji 1919'an heya 1922'yan, di têkiliyên Mistefa Kemal de bi gelên din ve, bingeha hevbeşiyê esas girtiye. Di van sê salan de, bingeheke hevkarî, pêk ve jiyankirin û karkirinê û pêk ve şerkirinê esas girtiye.

Stratejîk nêzik bibe û textîkî nêzik bibe, nizanim. Lê gavên di wê demê de avêtine baş bûne. Ger em mîlîgeriyê esas bigirin, em ê bibêjin, "çima Kurd çûne gel Mistefa Kemal û dewletek ji bo xwe çênekirine?" Lê ger em hevbeşiyê esas bigirin, xwezayî ye û karekî baş bûye. Li hemberî pergala dagirker û parçeker, pêk ve têkoşîn kirine. Piştî salên 1922'yan ku bi Fransa û Brîtanya re dikeve têkiliyê, piraniya gavên wî êdî li ser esasê mîlîgeriyê ne. Pratîka wî ew e.

Hevalan gotin, "rista Cûhiyan çi ye?" Rista Cûhiyan di avakirina Tirkiye de, mirov dikare bibêje di vê derê de digêhêje lûtkeyê. Berê Cûhiyan, di xeta Almanya de rol dîlîstin û dixwestin dewleta Cûhiyan çêbikin. Pişt re nikarîn dewleta Cûhiyan çêbikin, ji ber vê Cûhiyên Îngîlterê dîtin ku hê bingeha dewleteke Cûhiyan tune ye. Ji bo vê jî xwestin ji bo Tirkan çêbikin. Divê ew model çêbikirana. Di wê demê de ew model, bi Îsraîl çênabe; lewra bingeha Îsraîlê lewaz e.

Ji ber vê yekê Serokatî dibêje, "Tirkiye, prototîpa Îsraîlê ye." Ji bo vê yekê, li ser esasê Tirkiyeke laîk, nijadî û Ewropî kar kirin. Ew yek Cûhî, Fransa û Brîtanya pêk ve kirin. Ji ber vê dema ku têkiliyên wan û Mistefa Kemal pêş dikeve, şertê wan yê yekemîn; dibêjin, "ger tu dixwazê ji me alîkarî bigrê, divê ol û dewlet ji hev û din cuda bibe." Mistefa Kemal, di sala 1922'yan de biryar dide û saltanatê radike. Di sala 1924'an de Xelîfetê radike. Dema ku destûra 1924'an ava dike, êdî ol derveyî destûrê dihêle.

Dervayî vê jî, dewletê li ser esasê yek-tek miletî çêdike. Bi vî rengî modelê Tirkiye çêdibe. Modelê yek milet û yek dewlet, li Tirkiye hate formûlekirin. Ew projeya Siyonîstan bû, di salên 1923'yan de li Tirkiye dest bi avakirina wê kirin û heya salên 1936-37'an pê re meşqûl bûn. Çawa ku li Fransa, Almanya û Îngîlterê dewlet hatin avakirin û piştî 70'î salî li welatên din yên Ewropa netewe dewlet pêş ket; dema ku dewleta Tirkiye jî li ser esasê milîgeriyê çêbû, mîlîgeriya Ereb û mi-

letên din jî gur bû û bingeh ji bo mîlîgeriya Îsraîl çêkir. Jixwe di şerê duyemîn yê cîhanê de ew jî çêkirin.

Serokatî dibêje, “niha ji bo ku bikaribin, vê dewletê bidin berdewamkirin û îdareya wê bimeşînin, dixwazin prototîpa dewleta Kurd jî çêbikin.” Li ser vê jî nîqaş heye. Bi kurtasî di formûlekirina dewleta Tirkiye de; têkiliya Fransa, Îngîltere û Cûhiyan bi vî rengî ye. Serokatî di paraznameyan de dibêje, “piştî ku Tirkiye, bi dewleta Fransa, Îngîltere û Cûhiyan ve ket nava têkiliyan; êdî roj bi roj Mistefa Kemal teng kirin.” Serokatî jî, niyeta Mistefa Kemal nizane. Dibe ku Mistefa Kemal siyasî tevgerîbe û di destpêkê de wisa nêzikî Kurdan bûbe; dibe ku di destpêkê de rast nêzik bibe û di dawiyê de bê çare jî mabe.

Berê me baş nedîdît, lê dema ku em niha hinekî din li ser dîroka avabûna dewleta Tirkiye kûr dibin, pratîkek wisa heye. Piştî 1923-24’an rista İsmet İnönü û Fevzi Çakmak derdikeve pêş. Ew kesên ku pêştir bi Mistefa Kemal re bûne; Fetîh Okyar, Kazim Karabekîr û yên din hêdî hêdî tên berteraf kirin. Mistefa Kemal tenê dimîne û weke ku Serokatî dibêje, “li Çankaya dikin remz.” Bi rastî jî vîna Mistefa Kemal tune bû û nikarî tiştekî bike? Dibe ku ew nêrîn ji bo wî jî giran bibe. Bes niha ne dema wê ye; ger em bixwazin bi Tirkiye re dostaniyê bikin, niha ne dema wê ye.

Divê mirov vê jî bizane. Mirov waqayê mezî bike, rast e derdora wî hatiye girtin, lê ger bixwaze ma nikare tiştekî bike? Lê nake. Ger pêşengtiya wî jî neke, pê re ye. Heval dibêjin, “em dikevin nakokiyê.” Serokatî li ser xebatên hevbeş kar dike. Ger em dixwazin pêk ve tiştekî bikin, em nikarin bibêjin, “we di falan cihî de xiraîb kir.” Dê ew jî ji me re bibêjin, “we jî falan cihî xirabî kir.” Lê ger mirov bibêje, “kêmasiyên me jî hebûn, yên we jî hebûn, demekê jî me pêk ve kar kir” mirov dikare bigêhêje hev. Dibe ku hin nirxandinên Serokatî, ji bo Mistefa Kemal siyasî jî bin, xwezayî ne. Hinek jî rastî ne.

Serokatî dibêje, “bên û destûra yekem û mûxtariyetê qebûl bikin. Ew Mistefa Kemal çêkiriye, ger hûn li Mûstafa Kemal xwedî derdikevin, van qebûl bikin.” Berê vedişartin û digotin, “Mistefa Kemal tiştekî wisa nekiriye.” Lê niha hêdî hêdî derdikevin. Em jî tevgereke siyasî ne, ne dogmatîk in. Me behsa PDK kir, em carna diçin û pêk ve rûdinin. Em rexneyên hev jî dikin. Em her şûr li hev bikêşin, nabe. Ne ku em dikevin nava nakokiyan, divê mirov bi wî rengî nêzik nebe.

Hin tişt hene, divê mirov rexne bike; divê hin tiştan mirov wate bidê. Lê em bibêjin “Mistefa Kemal, kesekî pir azadîxwaz bûye; xwestiye Tirk û Kurd û miletên din pêk ve, bi awayekî azad bijîn” ew ne rast

e, tiştekî nepixandî ye. Mistefa Kemal hinek gav avêtine, lê tiştekî wisa nekiriye. Ger bi rastî jî niyet û xwesteka wî ew bûya, dikarî hinek tiştan bike. Lê em nikarin her tiştê wî reş jî bikin. Bi vî rengî dewleteke yek-tek rengî li Tirkiye hate avakirin, Mistefa Kemal jî bû xwediyê wê dewletê. Bû Atatûrk (atayê-bavê Tirkan), berê ne Atatûrk bû.

### *-Piştî Peymana Lozanê Rewşa Kurdistanê*

### *1-Bakûrê Kurdistanê*

Piştî vê demê, em ê di destpêkê de li ser Bakûr û Tirkiye vegotin bikin. Heya peymana Lozan ku di 24'ê Tirmeha 1923'yan çêbûye, hê dewletek bi navê Tirkiye nehatibû çêkirin. Hê Osmanî û hûkimeta Enqereyê hebû. Navenda Osmanî li Stenbolê bû, li Enkereyê jî meclîsa miletê gel hebû. Di dîroka 29.10.1923'yan de, biyar dan ku dewleta ku ava kirine, bi nav bikin; Komara Tirkiye hate îlan kirin. Êdî her salê di 29'ê Cotmehê de li Tirkiye salvegera avabûna Komarê pîroz dikin.

Piştî ku komar hate avakirin, projeyên hebûn ketin rojevê. Heya wê demê meclîsa gel hebû, destûra 1921'an ku di çarçoveya Mîsakî Mîlî de hatiye derxistin heye. Li gorî wan divê destûreke nû bê avakirin û di qanûnên nû de, şêwaza vê komarê bê diyarkirin. Di bihara 1924'an de destûra nû ya komarê ava dikin. Ya berê ne destûra komarê bû, destûra meclîsa gel bû. Komar wê destûrê qebûl nake û destûra 1924'an çêdike. Ew destûra nû, weke destûra yekem ya komarê tê bi nav kirin.

Pergala dewletê; komar (cumhireyet) e, dewleteke laîk e; ol li derveyî dewletê tê hiştin û pergala xîlafetê tê hilweşandin. Ew hatin nîqaş kirin û di destûrê de bi cih bûn. Heya wê demê Xelîfeyê Osmanî bê rist mabû, lê her mabû. Bi vê yekê bi giştî hate rakirin. Li gorî destûrê, Tirkiye bû komar û zimanê Tirkî bû zimanê fermî û yek ziman e. Pergala Tirkiye, ûnîter e; parlementoyê Tirkiye, parlomentoyê hemû gelên Tirkiye ye û hemû hemwelatiyên Tirkiye, Tirk in. Bi vî rengî destûr hate bi cih kirin.

Ew ji bo Tirk, Kurd û civakên din yên Tirkiye jiyan dikin, rewşeke nû bû. Li gorî destûrên Tirkiye, rê dan ku partî çêbibin. Di wê demê de Fetîh Okyar û Kazim Karabekîr partî çêdikin; di demekê kurt de qedexe dikin û pergala yek partiyê ava dikin. Tenê CHP, partiya Mistefa Kemal hûkmî Tirkiye dike. Ew partî jî di havîna 1923'yan de, piştî peymana Lozanê tê vekirin. Beriya komarê ye, ji ber vê dibêjin "parti-

ya avaker ya komarê ye.” Ew ê ku dewlet ava kiriye CHP ye, xeynî wê hemû partî tên qedexekirin.

Mistefa Kemal di destpêkê de serokê hûkimetê bû, piştî ku komar ava bû, Mistefa Kemal bû serokê dewletê. Arteş di bin çavdariya serokê dewletê de bû, di wê serdemê de wisa bû. Di destpêkê de pergaleke wisa hebû. Niha Erdoxan jî dixwaze, pergala serokiyê ku tenê serokdewlet dikare hûkim bike ava bike. Bi vî awayî şêweya dewleta Tirkiye tê dayin.

Di wê demê de rewşa Kurd çi ye? Kurd, beriya ku peymana Lozanê bê îmzakirin, di dema nîqaşên wê çêdibûn û hate parlementoyê da ku bê îmzakirin, bertek nîşan dan. Di nava Kurdan de, nerehetî çêbû; beşeke Kurdan jî ket lêpirsînê. Tiştê ku 3 salan hûkimeta Tirkiye û Mistefa Kemal dibêje û soz dide, pêk naye. Ji ber vê jî hinek lêgerîn çêdibin.

Li gorî belgeyan, di havîna 1923’yan de Xelîd Cîbran, Yusuf Ziya û komelek kes ku berê di nava Alayên Hamîdiyê de fermandar bûn û di nava arteşa Tirkiye de xwedî rist bûne û hinek rewşenbîr, li Erzoromê kom dibin û rêxistina Azadî (Rêxistina Serxwebûnê) ava dikin.

Di dema ku peymana Lozanê tê îmzakirin, di Tirmeha 1923’yan de, ew jî li Erzoromê rêxistineke bi awayekî veşartî çêdikin. Biryar didin ku bi rewşenbîr, fermandar, serokeşîr û kesayetên Kurd re bikevin têkiliyê; da ku meseleya Kurd careke din zindî bikin. Dibêjin, “sozên ku Mistefa Kemal û Tirkiye dane, pêk nehatine; divê em bikevin tevgerê.” Nîqaşeke bi vî rengî çêdibe.



**XELÎD CÎBRAN**

Di sala 1923’yan, heya 1924’an ew rêxistin têkiliya xwe bi gelek fermandar, serokeşîrên ku di nava meclîsê de û li derve çalak in û gelek rewşenbîrên Kurd re têkilî datînin. Di havîna 1924’an de hin kombûyinan çêdikin û biryar didin ku heya bihara 1925’an xwe baş rêxistin bikin û di sala 1925’an de Tirkan ji Kurdistanê derbixin. Da ku Kurdistan azad bibe. Planlamaya wan ew e; divê di

destpêkê de hinek eşîran bi tevger bikin. Jixwe hin çekên ku ji dema Alayên Hamîdiyê mane hene, hin çek di dema şerê cîhanê de girtine, di dema alîkariya Mistefa Kemal kirine jî hinek çek girtine. Di encamê de ew tişt bûne sedem ku hejmareke zêde ya eşîrên Kurdan xwedî çek û îmkanên şerkirinê bin.

Ji aliyekî din ve beşeke efser-sûbay û fermandarên Kurd, di nava arteşa Tirk de ne, dixwazin wan jî bixin tevgerê. Di heman demê de rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd ku heya wê demê li gel Mistefa Kemal bûn, êdî serbixwe tevdigerin. Bi nêrîna wan ger hemû eşîrên Kurd amade bin û tevlî serhildanê bibin, dê heya bihara 1925'an raperîn bikin. Hem fermandarên Kurd, yên di nava arteşê de ne bi hêzên xwe; hem jî eşîrên Kurd bi eşîrên xwe dê tevlî serhildanê bibin. Jixwe beşeke mezin ya wan fermandaran, li Kurdistanê fermandar in. Bi vî rengî arteşa Tirk, li Kurdistanê felç dibe. Leşkerên ku tevlî serhildanê nebin jî, dikarin dîl bigirin. Wê demê dikarin Kurdistanê bixin bin destê xwe.

Bi vî rengî dikevin tevgerê. Di îlona 1924'an de, li Elkê (Beytûşebab) hejmareke fermandarên Kurd hene. Yek ji wan Îhsan Nûrî Paşa ye; yek ji wan Riza ye, ango birayê Yusuf Ziya ye. Li gel hin fermandarên din, li milê Hekarî fermandarên arteşa Tirk in. Kurd jî di nava arteşê de hene. Wê demê mişqûleya Aşûriyan tam çareser nebûye. Ew Aşûriyên biribûn milê Rojhilat, hinek vegeriyane herêma Hekarî. Mistefa Kemal û hûkimeta Tirkiye, biryar didin ku hêzeke awarte bişînin herêmê û meseleya Aşûriyan hal bike. Ger qebûl dikin, divê di çarçoveya ku Tirkiye diyar kiriye de, jiyan bikin. Ger qebûl nekin jî, dê ew arteş wan bipelçiqîne. Ji ber vê yekê di havîna 1924'an de, Tirkiye arteşeke zêde dişîne wê herêmê.

Yusuf Ziya jî, telgirafeke bi şîfre dişîne birayê xwe û Îhsan Nûrî paşa re. Di telgirafê de dibêje, "xwe baş amade bikin, ji bo serhildanê amadekariyên xwe bikin." Lê ew wisa fêm dikin ku telgiraf ji bo destpêkirina serhildanê hatiye. Li ser vê yekê li herêma Hekarî û Elkê xwe îlan dikin û li hemberî arteşa Tirk disekinin. Lê cihekî dîtir tevger tune. Cihê ew hene jî Tirkiye arteşeke awarte şandiye. Ji ber vê nikarin tiştekî bikin. Arteşa Tirk zû mûdahale dike û tevgera wan belav dibe. Ew jî direvin û tên Başûrê Kurdistanê.

Ew bala hûkimeta Tirk dikşîne. Çawa komek leşkerên Tirk, li gel fermandarên xwe li hemberî wan disekinin? Wisa be tiştek heye. Ew dibe sedem ku Mistefa Kemal û arteşa Tirk, fermandar û leşkerên Kurd bixin bin çavdêriyê û kî bikeve tevgerê wî bigirin. Bi vî rengî Yusuf Ziya (endamekî pêşeng yê tevgerê ye) û Xelîd Cîbran (serokê tevgerê

ye) digirin. Xeynî wê dema ku dibînin di nava eşîr û civaka Kurd de tevger heye, hinek serokeşîran jî digirin.

Xelîd Cîbran, li gel Şêx Seîd jî têkilî daniye û gotiye hûn karê xwe berdewam bikin. Jixwe xizmên hev in. Hinek dibêjin beriya ku bê girtin têkilî daniye, hinek jî dibêjin piştî ku hatiye girtin têkilî danî ye. Bi vî rengî Şêx Seîd jî barê tevgerê dide ser milê xwe û di nava eşîr û terîqetan de digere, da ku lêztir xwe kom bikin û dest bi serhildanê bikin. Lê heya wê demê, gelek fermandar hatine girtin û hinekên wan jî hatine îdam kirin. Yusuf Ziya û Xelîd Cîbran jî li Bêdlîsê tên kûştin. Gelek serokeşîr jî tên girtin; hinekên wan tên kûştin û hinekên wan tên berdan. Dibêjin, ji bo ku di navbera eşîran de nakokiyan çêbikin, hinek berdane. Ew dibe sedem ku di navbera eşîran de pisgirek çêbibin.

Her wiha ji bo fermandaran jî wisa dikin. Piştî ku Xelîd Cîbran wan tên girtin, Şêx Seîd dixwaze tevgerê bide destpêkirin, lê diyare hê jî amadekariyên wan xilas nebûne û li benda biharê ne. Di 8'ê şibatê de, Şêx Seîd gelek şêx û serokeşîr dîtine û soza piştgiriyê ji wan girtiye. Gera xwe timam kiriye û vegeriyaye Pîranê. Hinek leşker tên û hin kesên nêzikî Şêx Seîd digirin. Serokatî dibêje, "ew komployê, da ku Şêx Seîd têxin nava tevgerê pêk anîne."

Li hemberî vê bûyerê Şêx Seîd, bi xwe hinekî nerm nêz dibe. Lê Qasimê xizmê wî û birayê wî bi bertek nêzik dibin. Dibêjin, "ew kesên nêzikî Şêx girtin, ji bo şêx Seîd meseleyeke heqeretê ye. Çawa ew çend leşker, gotina şêx Seîd nakin?" Lewra şêx Seîd ji wan leşkeran re dibêje, "ger sûçên wan hebin, bi xatirê min efo bikin; ger hûn efo nekin jî bihêlin ku em ji gund derkevin, pişt re hûn dikarin lêpirsîn bikin." Lê di netîceyê de leşker qebûl nakin û wan mirovan digirin. Birayê şêx Seîd, Abdurehîm û xizmê wî Qasim, bi mirovên xwe êrîş dikin ser qereqolê û qeroqol digirin. Kesên ku hatine girtin jî azad dikin.



**ŞÊX SEÎD**

Ew dibe sedem ku di navbera Şêx seîd û Tirkiye de şer dûrûst bibe. Hi-

nek dibêjin, di 13'ê şibatê de ye, hinek jî dibêjin 15'ê şibatê 1925'an de ye.

Li gorî belgeyên ku hene, dibêjin her kesî li gorî biharê xwe amade dikiriye. Lê hê biharê re maye û ew bûyer çêdibe. Ji ber ku şêx Seîd jî ketiye nava şer, her kes neçar dimîne ku bikevin tevgerê. Lê beşeke fermandar û eşîran jî darbe xwarine. Hinek hatine girtin, hinek hatine kûştin, hinek reviyane, hinek ne amade ne. Bi vî rengî serhildan destpê dike.

Di wê demê de, Îhsan Nûrî Paşa û birayê Yusuf Ziya ku derbasî Başûr bûbûn, di peyîza 1924'an de bi Brîtanya re dikevin têkiliyê. Ji wan re dibêjin, "rewşa me bi vî rengî ye, Tirkiye me înkar dike, divê hûn alîkariya me bikin." Li gorî belgeyan, Brîtanya ew red nekirine, lê alîkarî jî nekirine. Mesela wê demê Îhsan Nûrî wan, ji wan çek xwestine da ku dîsa vegerin Bakûr, lê Îngîlterê alîkariya wan nekiriye. Piştî ku Şêx Seîd têk diçe, Îngîltere alîkariya wan dike, da ku derbasî Îranê bibin û ji wê derê re derbasî Agirî bibin. Alîkariya wan ew e.

Bi vî rengî têkiliya rêxistinê bi Brîtanya re çêdibe, lê Brîtanya rûxmî ku alîkariyê nake, li ser vê serhildanê siyaset dike. Lewra di wê demê de meseleya Mûsilê hal nebûbû û Brîtanya li ser vê serhildanê siyaset kir.

Bi vî rengî tevgera Şêx Seîd destpê dike û êrîşî Amedê dikin. Milê Elazixê, Genc û Pîranê digirin. Di 7'ê adarê de jî êrîşî Amedê dikin. Wê demê Amed cihekî girîng yê dewletê ye. Hinek dibêjin di nava Amedê de xwe baş rêxistin nekiribûne, hinek jî dibêjin hin eşîrên weke mala Cemîl Paşa soz dabûn ku tevlî serhildanê bibin, lê tevlê nabin. Ji ber vê di hûndirê bajêr de tevger çênabe, tenê ji derve êrîş çêdibin. Ew dibe sedem ku arteşa Tirkiye, di hûndirê Amedê de xwe biparêze, heya ku alîkarî jê re bê.

Li mintiqaya Wêranşerê û deşta Rihayê, divê eşîra Mîlî jî xeta trenê bigirin û rê nedin ku alîkarî ji bo leşkerên Tirk yên li Kurdistanê be. Lewra xeta esasî ew der e, ji wir re alîkarî tê. Dervayî vê Fransa, alîkariya Tirkiye dike; xeta trenê dide wan ku bişûxilînin, hin îmkanên din jî dide wan. Bi vî rengî arteşa Tirk, xwe digihîne Amedê û dorpêça hêzên Kurdî, di destpêka nîsanê de têk diçe. Dema ku nikarin Amedê bigirin, moralê wan têk diçe. Vê carê moralê leşkerên Tirk pêş dikeve û pêy serhildêrên Kurd dikevin.

Bi vî rengî hêdî hêdî cihên di destê serhildêrên Kurd de ne, digirin. Elazix, Pîran, Lîce wan deran digirin. Di avrêla 1925'an de li Varto, Şêx Seîdê Pîran jî dîl tê girtin. Çawa ku bi girtina Xelîd Cîbran û Yusuf

Ziya tevger darbeyekê dixwe, bi dîl girtina şêx Seîd jî tevger darbeyekê dixe. Wê demê hûkimeta Tirkiye, ne tenê kesên ku tevlî serhildanê bûne, gelek kesan ciza dikin. Mesela di wê demê de şêx Evdilqedîrê Nehrî, li Stenbolê ye û tevlî serhildanê jî nebûye. Tê girtin û dibin Amedê, dadgeha wan dikin û di meha gulanê de wan îdam dikin.

Şêx Seîd jî, li gel 48 kesan di meha gulanê de tê dadgeh kirin, di 28'ê hazîranê de tê îdam kirin. Heya meha havînê ya 1925'an gelek kesan îdam dikin, lê îdam heya 1927'an berdewam dikin.

Di sala 1927'an de, Hesen Xeyrî heye di dîroka Bakûr de. Hesen Xeyrî, yek ji wan kesên ku li gel Hayder beg û Alîşanê ku pêşengtiya tevgera Qoçgirî kirine, tevgerî ye. Mirovekî welatparêz e. Daxwaziya serxwebûna Kurdistan dike, lê dema ku dan û stendin çêdibin, qaneh dibe ku tevlî tevgera Mistefa Kemal bibe. Dema peymana Lozan çêdibe jî, li ser daxaziya Mistefa Kemal û Îsmet Înonî, bi cilên Kurdî diçe parlementoya Tirkiye û bi Kurdî diaxife. Axaftina wî jî dikin telgiraf û dişînin Lozanê. Dibêje, "em Kurd û Tirk birayên hev in, me pêk ve têkoşîn kir, em ê pêk ve dewleta xwe jî ava bikin. Em dewleta serbixwe naxwazin. Ew tiştên ku li Lozanê hatine kirin, yên me ne."

Li ser vî esasî Lozan bi giştî tê îmzakirin. Lewra di wê demê de Brîtanya û Fransa dibêjin, "Kurd jî li Tirkiye miletekin, dibe ku ji vê îtîfaqê razî nebin." Tirk jî dibêjin, "Kurd jî razî ne, belgeya me jî ev e." Di sala 1927'an de Hesen xeyrî jî îdam dikin. Sedema îdamkirina wî jî, dibêjin, "tu bi cilên Kurdî çûyê parlementoyê û bi Kurdî axifiyê. Ew li gorî destûra Tirkiye tiştekî qedexe ye, bi vê nêzikbûnê tu Tirkiye parçe dikê." Ew jî dibêje, "we ji min xwest, çawa tiştekî wisa dibe." Weke rexnedanekê dema ku wî îdam bikin, gotine "axaftinên te yên dawî çi ne?" Wî jî gotiye, "min parçe bi parçe bikin, her parçeyekî min li ser riyeke Kurdistanê dînin, da ku kes weke min neke."

Ya mûhîm, ji 1924'an heya 1927'an tevgereke kûştin û îdamê li ser siyasetmedar, rewşenbîr û pêşengên Kurd, tê meşandin. Armanc jî, tasfiyekirina ew tevgera heyî ye. Piştî ku Şêx Seîd tê kûştin jî ew tevger xilas nabe. Heya ku li Zîlanê komkûjiyê dikin, ew tevger berdewam dike. Ji bo wê Serokatî dibêje, "Brîtanya, li ser wê siyaset kiriye." Serî carê, cihekî dîtir serî radikin. Ne pêk ve ye, lê her roj cihekî teqînek çêdibe. Ji ber vê Tirk ditirsin, ger bi vî rengî biçe û Brîtanya û Fransa dest biavêjin tevgerên Kurdî, Tirkiye ji destê wan diçe. Ji bo wê di 1926'an de dev ji Mûsilê ber didin. Da ku bikaribin tevgerên Kurdî bipelçiqînin. Piştî girtina Mûsilê, Brîtanya û Fransa li hemberî tevgerên Kurdî çavên xwe digirin.

Li ser vê tevgerê hinek caran dibêjin, tevgereke olî û paşverû bûye. Ew nirxandineke şaş e. Dibe ku kêm û kurtî hebin, lê ne bi wî rengî ye. Ji bo çi wisa dibêjin? Du tohmetên Tirkan hene; yek dibêjin tevgereke paşverû ye û dixwazin ji nû ve xelîfetê vegerînin, dudu dibêjin tevgereke girêdayî Brîtanya ye.

Herdu jî ne rast in. Lewra belgeyên dîrokî hene. Têkiliya tevgerê li gel Brîtanya çêbûye, lê Brîtanya jî alîkarî nekiriye. Dijberî wê alîkariya Tirkiye kirine. Ger mirov merhebayê yekî bike, mirov nabe zilamê wî. Brîtanya û Fransa li ser siyaset kirine. Ya duyemîn jî ew tevger, di destpêkê de di pêşengtiya şêx û meleyan de destpê nekiriye. Yek jî tenê ji bo meseleya ol kar nekirine.

Di destpêkê de, tevger bi şiyara azadiya Kurdistanê pêş ketiye. Yên pêşengtî dikin jî rewşenbîrên Kurd û fermandarên Kurd yên di nava arteşa Tirkiye de ne. Lê bi eşîret û oldaran re jî dikevin têkiliyê. Di pratîkê de bar li ser milê Şêx Seîdê Pîran dimîne, an na Xelîd Cîbran û Yusuf Ziya tasfiye nebana, dê wan pêşengtî bikirana. Ji ber ku Şêx Seîd, şêx e, rû dirêj e; dibêjin tevgereke olî ye. Ne tevgereke olî ye, lê aliyê wê olî jî heye. Ji bo ol û vegerandina xelîfetê destpê nekiriye.

Ew tohmet in, ji bo şikandin û biçûk xistinê hatine kirin. Da ku Mistefa Kemal bikaribe ji Rûsya, Brîtanya û Fransa alîkarî bigre û serhildanê bitepisîne wisa gotine. Lewra wan dewletan digotin, divê dewleteke laîk çêbibe. Ger bibêjin, tevgera Kurd, tevgereke olî ye; piştgiriya Tirkiye dikin. Rûsya digot, "em dewleteke sosyalîstî ne û ol afyonê gelan e." Ji ber ku tevgera Kurdî, olî dibînin; dibin alîkarê Tirkiye.

Kêm û kurtiyên vê tevgerê hene. Di destpêkê de baş planlama dikin; lê di konevaniya pratîkî de, di veşartîbûnê de lewaz bûye. Ger tiştên ku di destpêkê de nîqaş kirine, baş pêk anîbana; bawerim bikarîbana bi ser bikevin. Lê ji ber ku di pratîkê de lewazî derket, siriyet nema û dema ku deşîfre bûn, ketin panîkê û rêberên wan hatin girtin; bi ser neketin.

Piştî wê jî bi rengên cûda berdewam kir. Di sala 1927'an de li Lûbnanê, ew kesên ku ji komkûjiyê reviyan û derketin derveyî sînorên Tirkiye, hinek çûn Suriye û hinek çûn Lûbnan. Li Lûbnanê di tebaxa 1927'an de tevgera Xoybûn çêdikin. Wê demê Celadet Bedîrxan dibe serokê tevgerê, komaleyek kes jî di rêveberî û nava tevgerê de cihê xwe digirin.

Ew tevger, têkiliya xwe bi tevgerên mîlî yên Ermen Taşnaq re pêş dixe. Têkiliyên xwe bi sovyetan ve pêş dixe, di heman demê de dixwa-



**ÎHSAN NÛRÎ PAŞA Û ALA AGIRIYÊ**

zin bi serhildanên li mintiqaya Zîlan û wan deran berdewam dikin re têkiliyên xwe pêş bixin. Heya wê serdemê Îhsan Nûrî, li Başûrê Kurdistanê bû; têkilî bi wî re datînin û wî dikin berpirsyarê leşkerî yê vê tevgerê. Jê dixwazin biçe Bakûr û ew tevgerên ku tevdigerin komî ser hev bike û tevgereke berfireh pêş bixe. Da ku alîkarî ji mîlîgeriya Ermeniyan û Sovyetan jî bigre. Bi vî rengî tevgereke nû dest pê dike.

Di sala 1928'an de Îhsan Nûrî digêhêje mintiqaya Agirî û dikeve nav lêgerînan. Hejmareke zêde ya eşîrên van hêrêman dibîne û dixwaze van serhildanan bi pergal bike. Heya sala 1929'an ew tevger pêş ve diçe. Hikumetek bi serokatiya Bira Hesko (Hesko Telî) çêdikin. Di vê salê de dewleta Tirkiye, hêzeke mezin dibe ser wan û netîce nagrin. Piştî wê Tirkiye dikeve nava planan, da ku bikaribe vê tevgerê têk bibe. Lewra dibîne ku çend carên din şer çêbibe û nikaribin ser bikevin, dê li cihên dîtir jî serhildan çêbibin.

Dixwazin tirs di dilê milet de çêbikin, lê her ku ew bin dikevin tirsa milet dişkê. Di sala 1930'î de bi Îranê re îtîfaq dikin. Di wê serdemê de hê tevgera Sîmko jî jiyan dike. Îtîfaq dikin, da ku bi hev re bibin alîkar û Îran ji bo tevgera Agirî bibe asteng û nebe alîkar. Lewra di wan deman de li milê Makû û Salmas jî tevgerîn heye. Ji aliyê din ve Tirki-

ye, bi Rûsya re dikeve têkiliyê û peyman dide ku Rûsya hevpeymanê wan be.

Di wê demê de, Rûsya dibînin ku Tirkiye zêdetir nêzikî Brîtanya û Fransa dibin. Di sala 1921'an de peymana Rûsya û Tirkiye heye, lê Tirkiye êdî zêdetir bi aliyê Fransa û Brîtanya ve diçe. Ji ber vê Rûsya nerehet dibe. Tirkiye di sala 1930'î de careke din bi Rûsya re têkilî çêdike, da ku nebe hevpeymanê Fransa û Brîtanya. Li ser vî esasî hin peymanên siyasî û aborî pêş dixin. Li hemberî wê jî dixwazin ku Sovyet alîkariya tevgera Agirî nekin.

Di wê demê de li navçeya Laçîn, bi navê "Kurdistana Sor" otonomiyek dabûn Kurdan. Ew cih di navbera Ermenîstan û Azerbaycanê de ye. Tirkiye dixwaze, wê otonomiyê jî rakin. Li ser peymana wan, hem Rûsya alîkarî nade Agirî, hem jî otonomiya Kurdan tê belav kirin. Kurdên wê herêmê, her yekî/ê ji aliyekî ve belav dikin. Piştî van peymanan, Tirkiye careke din êrîşî ser Agiriyê dike. Heya sala 1931'an bi rengekî serhildan berdewam dike, lê di vê salê de bi giştî têk diçe.

Piştê xwe hinekî bi derve ve girêdane, di hûndir de jî li her herêmêkê xwe amade nekirine. Li hemberî arteşa Tirkiye ku li her aliyekî re îtîfaq kiriye jî nikarin êdî ber xwe bidin. Ew tevger bi vî rengî belav dibe, serfermandarê serhildanê Îhsan Nûrî jî berê xwe dide Îranê û li wir penaber dibe. Di sala 1974'an de li wê derê wefat dike. Bi vî rengî serhildana Agirî xilas dibe. Piştî wê heya salên 1932'yan li wan herêman, dewleta Tirkiye serê her eşîrekê dihencixîne.

Piştî salên 1933-34'an dibêjin me ew herêmên Sûniyan tasfiye kirin. Piştî wê berê xwe didin ser, navçeyên Elewî. Ji ber vê yekê li Agirî mezelek çêkirine û dibêjin, "mûhayel Kurdistan, burada meftûndûr. (Kurdistana ku dihat xeyal kirin, di vê derê de hatiye bin ax kirin)"Dibêjin, "êdî li ser Kurdistanê nefikirin, xeyal nekin."

Heya serhildana Agirî, me vegotin kir. Girêdayî Bakûr, li ser serhildanên Kurdî yên herî girîng yek jî berxwedana Dersîmê ye. Em li ser serhildan û berxwedanan axifîbûn. Ya Dersîmê bi rastî jî berxwedan e. Mesela tevgera Şêx Seîd weke serhildanê tê naskirin. Lewra di cewhera xwe de amadekariyên serhildanê dikin, lê Dersîm berxwedan e.

Di sala 1935'an de dewleta Tirkiye biryara 2884'an digre. Li gorî vê biryarê, ji bo Dersîm, Xerpet û Qoçgiriyê hin tevgerên dewletê divê çêbibin. Biryareke awarte ye. Li gorî dewletê heya wê demê ew herêm nehatine kontrolkirin û nehatine sererastkirin, dixwazin kontrol bikin. Lewra ji sala 1924'an heya salên 1933'yan bi piranî herêmên Kurdistanê yên Sûnî re mijûl dibûn. Li gorî wan êdî ew herêm hatine kontrol-

kirin û ji çekan hatine paqijkirin. Lê herêmên Kurdistanê yên Elewiyan, hê dest nedanê, divê bê kontrol kirin. An na di demên pêş de dibe xeterî.

Ango tevgereke ku li vê herêmê serhildanê re amadekarî dike tune, civak jiyana xwe ya asayî didomîne. Lê diyare dewleta Tirk vê yekê qebûl nake. Dewleta Tirkiye çawa çêbû, ji aliyekî ve li hemberî serhildanên Kurd disekinî; ji aliyekî ve jî bi têkiliyên dewletên weke Rûsya, Brîtanya û Îngîltere dixwest dewleteke laîk û dûrî ol, dewleteke bi yek netewî yên weke Ewropa ava bike. Ji bo vê komek biryar û qanûnan jî derdixin.

Di sala 1925'an de bi navê "Plana Şark Islahat" qanûneke berfireh derdixin. Ango plana islahkirin û reformkirina Rojhilat e, Rojhilatê Tirkiye jî Kurdistan e. Bi ya wan erdnigariya Bakûrê Kurdistanê, pêwîstî bi islahkirinê heye. Li ser vê esasê wê projeyê derdixin. Gelek aliyên vê projeyê hene; ji aliyê sûrgûn, îskan, bişavtina çandî û tevdîrên leşkerî ve piralî ye. Armanc hem pelçiqandina serhildanên Kurdan e, hem jî entegre kirina civaka Kurd ya dewletê ye.

Ji bo timamkirina vê planê, qanûna bi navê "îcbarî Îskanî" derdixin. Bi giştî Tirkiye eleqadar dike. Li gorî vê qanûnê dewlet azad e, kîjan kesan ji ku rakin û berin ku rewa ye. Lewra pêwîstiya dewletê heye û her tişt di destê wan de ye, her karê mişextî û îskanê jî rewa dikin. Di wê demê de pirsgirekên Tirkiye bi Yewnenîstan, Bulgarîstan, Romanya, Gurcîstan û Rûsya re hebûn. Li gel van dewletan jî hinek hevkirin çêdibe û bi van dewletan ve jî guhertinên etnîkî dikin.

Mesela li Tirkiye xelkên Bulgar hebûn, van vedigerînin, li dewletên din jî her wiha. Lewra berê dewleta Osmanî heya Ewropa çûbû û li van deran Tirk bi cih bûbûn. Di vê serdemê de ji ber ku li ser esasê netewe dewletê dewlet pêş diketin, her dewletekê dixwast welatê xwe ji wan etnîkên din rizgar bike. Ji bo wê etnîkên xwe bi hev û din diguhertin. Di wê demê de Tirkiye ji bo çi qanûna Îcbarî û Îskan pêş xist? Da ku wan komên Tirk ku vedigerînin Tirkiye, cihê ku dixwazin bi cih bikin. Beşeke zêde jî li Kurdistanê bi cih dikirin. Beşeke eşîret û komên Kurd ku serhildan dikirin jî, ji Kurdistanê derdixistin û dibirin li bajar û herêmên Tirkiye bi cih dikirin. Ew siyaset û nêzikbûn parçeyekî plana Şark Islahat û Îskanî Îcbarî ye. Bi vî rengî hêdî hêdî demografyaya Kurdistanê diguhertin û civaka Kurdistanê kontrol dikirin.

Ji aliyê din ve ji bo ku bikaribin mînaka dewleteke Ewropa pêş bixin, gaveke din ku avêtine jî qanûna tîpên latînî ku di sala 1928'an de hatiye derxistin. Lewra heya wê demê li Tirkiye, bi tîpên Aramî-Erebî


dihat nivîsandin. Ji van tîp û nivîsan re digotin, zimanê Osmanî. Mektep û nivîsandinên karên fermî yên Tirkiye êdî bi tîpên latînî bû. Ew jî gaveke din bû, da ku giştî civaka Tirkiye ji Rojhilata Navîn bê qutkirin. Lewra Tirkiye dewleteke kevn ya ku bi dîrok û çanda Rojhilata Navîn û Îslamê ve hebû. Ji bo ku bikaribin xwe ji Îslam û Rojhilata Navîn qut bikin û xwe nêzikî Ewropa bikin, gaveke bi vî rengî avêtin.

Bala xwe bidinê, îro civaka Tirkiye civaka herî zêde ji dîroka xwe xerîb bûye. Lewra îmkanên xwendin û şopandina wê dîrokê tune. Dervayî lêgerînên şexsî kes nikare ji vê dîrokê agahdar bibe. Dewleta Tirkiye jî, ji vê dîrokê tiştên ku pêwîst dîtine wergerandine Tirkî. Tiştên pêwîst nabîne jî wernagerîne û naxwaze tu kes bixwîne û agahdar jî bibe. Ew jî dihêle ku ew civak bibe biyaniyê dîroka xwe. Di van salên dawî de, hem ji aliyê tevgera me ve, hem jî ji aliyê hin kesên ku dixwazin li ser dîroka xwe lêkolîn bikin ve hêdî hêdî hin tişt zêdetir derdikevin holê. Piştî salên 1928'an li Tirkiye pêngaveke bi vî rengî pêş ket, ew pêngav heya salên 2000'an jî berdewam dike û roj bi roj hatiye kûrkirin.

Piştî wê di sala 1935'an de Tirkiye gaveke din diavêje; yek ji bo hêrêma Dersîmê qanûneke nû derdixe. Lewra ew herêm hê tam entegreyê pergalê nebûne. Di heman demê de qanûna guhertina cil û bergan derdixin. Di vê qanûnê de jî cilên kevn yên Tirkiye tên redkirin û cilên Ewropaî hatin naskirin. Niha jî ew pergal berdewam dike. Li kêm welatan tiştên bi vî rengî hene. Ger tu biçê saziyên fermî, divê tu bi pantolon, êşlik xwe bikî û kiravetê girê bidê. Ger wisa nebe, tu ne fermiyê.

Vê yekê li ser civaka Tirkiye tesîr çêkiriye. Kurd jî wisa bûne, niha tevgera me dixwaze hinekî biguherîne jî, lê em pir zehmetî dikşînin.

Di salên 2005-6'an de, em li Başûr bûn û me hin xebatên dîplomasiyê dimeşandin. Min cilên Kurdî xwe dikirin. Hevalên me digotin, "heval tu cilên fermî li xwe bikî baştir dibe." Min jî got, "ma cilên me yên fermî ew in." Pişt re min fêm kir ku cilên fermî, ji bo hinek hevalên me ceket, kiravat û pantolon e. Niha li Başûr jî, beşeke partiyên Kurd, li vê yekê tesîr bûne. Heya beriya 10-15 salan cilên hemûyan Kurdî bûn. Lê niha piranî kiravat û pantolan li xwe dikin. Ew berhemên wan nêzikbûn û qanûnan in. Şaş e, lewra her kes bi çanda xwe fermî ye.



**SEYÎD RIZA**

Bala xwe bidinê, li dewletên Ereban û Efrîqa mezî bikin; piraniya serokên wan, cilên civaka xwe li xwe dikin. Kêm kes hene ku van cilên din xwe dikin, yên xwe dikin jî weke xerîb tên naskirin. Lê Tirkiye ne wisa ye. Tesîra vê siyasetê li ser civaka Kurd jî bûye.

Li gorî qanûna ku bi taybetî ji bo herêma Dersîmê derxistine, pêwîst bû eşîretên van hêrêman nêzikî 200 hezar çek radestî dewletê bikin. Weke me berê jî got, li Kurdistanê bi gelek sedeman piraniya civak û eşîran bibûn xwedî çek. Di wan deh salan de dewleta Tirkiye li herêma Sûniyan hem serhildan pelçiqandin, hem jî çek kom kirin. Lê li herêma Elewiyan hê ew kar nekiribû, texmîn dikirin ku hinek çek jî derbasî herêma Elewiyan bûne. Ji bo xwe xeterî dîdîtin. Ji bo vê yekê ji eşîran dixwastin ku çekên gel kom bikin û radestî dewletê bikin.

Ya duyemîn li vê herêmê rewşa awarte tê îlankirin û li gorî rewşa awarte tê rêvebirin. Waliyê herêma awarte tê diyarkirin. Êdî waliyê herêma awarte jî, dê tiştên pêwîst bike. Ew tişt, di nava civaka wê herêmê de hinek nerehetî çêdike. Yek, dibêjin “ew qesa çekên me tune ne. Da ku em radest bikin.” Dudu, dibêjin “heya niha me li dijî dewleta Tirkiye tiştek nekiriye, dewlet çima wisa nêzikî me dibe?” Ew dibe sedem ku hinek alozî di navbera dewletê û civaka li vê herêmê de çêbibe.

Di wê serdemê de 7-8 hozên mezin yên herêmê, di pêşengtiya Seyîd Riza û Elîşêr de komî ser hev dibin, da ku li hemberî dewletê helwesta xwe diyar bikin. Weke gava yekemîn, dixwazin bi waliyê

herêma awarte Abdulah Alparslan re bikevin têkiliyê, da ku ew mesele bê şer çareser bibe.

Li gorî ku di dîrokê de tê gotin, Seyîd Riza kurê xwe ji bo danûstendinan dişîne, lê di danûstendinê de encameke cîdî nagrin. Di vegerê de, kurê Seyîd Riza Îbrahîm jî tê kûştin. Bi komployê tê kûştin. Ew yek, rewşê aloztir û zehmetir dike.

Ji ser vê yekê, Seyîd Riza û hevalên wî diçin wê herêmê û şer dikin. Ya duduyan jî gumanên wan li ser deshilat zêdetir dibe. Lewra di destpêkê de ji deshilat dixwazin ku li hemberî vê bûyere bibe xwediyê helwest û kesên ku Îbrahîm kûştine bigirin. Lê deshilat wî karî nake û wan diparêze. Ew dibe sedem ku Seyîd Riza, Elîşêr û hevalên wan fêm bikin ku dewlet dixwaze bi temamî ew radest bibin.

Li ser vê esasê ew jî di bihara sala 1937'an de, dixwazin herêma xwe bixin bin kontrola xwe. Rê, pir ûhwd an dirûxînin, an jî kontrol dikin. Da ku arteşa dewletê nikare bê herêmê. Lewra arteşa dewletê xwe amade dike ku herêmê kontrol bike. Piştî wê dewlet plana xwe lezgîntir dike û di gulana 1937'an de êrîşeke mezin dibe ser Dersîm û derdora wê. Hejmareke zêde arteşa xwe dibe herêmê û dest bi lêdana eşîr û civaka Kurd li wê herêmê dikin.

Di encama wî şerî de, xêl û hozên Kurd berxwedaneke mezin dikin, herdu alî darbe dixûn. Lê diyare hozên Kurd, ji ber ku herêmê nas dikin û şervanên baş in, pêşiya leşkeran digirin.

Di wê demê de dewleta Tirkiye dixwaze, hem bi leşkerî, hem jî bi qûrnazî ser bikevin. Gava yekem, dest diavêjin Rêber. Rêber biraziyê Seyîd Riza ye. Li gorî ku dîrok behs dike, pirsgirekên wî li gel mamê wî hene. Dewleta Tirk jî, her wan nakokiyan dişopînin û dixwazin jê îstîfade bikin. Di destpêka berxwedan pêş dikeve de Rêber tevlî berxwedanê nabe. Lê dema ku şer gur dibe û berxwedan berdewam dike Rêber tevlî şer dibe û diçe gel Elîşêr. Dibêjin, Seyîd Riza bi guman nêzik bûye, lê ji ber ku hatiye berxwedan bike, dest nedanê. Gotine em nikarin pêşiya kesekî ku dixwaze berxwedan bike, bigirin.

Demekê Rêber, li gel Elîşêr dimîne. Kesê ku ji berxwedanê re pêşengtî dike û fermandarê şer jî Elîşêr e. Seyîd Riza weke pîr û serokeşîrekî, di nava civakê de bi bandor e û weke kesayeteke civakî tê naskirin. Lê kesê ku fermandariya leşkerî dike û rêxistinê îdare dike, Elîşêr e. Piştî ku demekê Rêber li gel Elîşêr dimîne; di havîna 1937'an de şevekê Rêber, serê Elîşêr û hevjîna wî Zerîfe qut dike û dibe waliyê herêma awarte ya Dersîmê re. Walî jî li wê demê li Xerpetê rûdine, Rêber seriyên wan dibe wir.



**ELÎŞÊR Û ZERÎFE**

Ew bûyer ji bo berxwedanê darbeyeke mezin e. Lewra Elîşêr fermandarê arteşê û pêşengê pratîkî yê berxwedanê bû. Ew yek di nava berxwedanê de tengavbûnekê jiyan dike. Rûxmî wê berxwedan naşkê, dijberî wê di nava berxwêdêran de kîn jî çêdike. Berxwedan heya îlona 1937'an didome.

Di meha îlonê de, careke dîtir dewleta Tirkiye dixwaze bi fêlbaziyê plana xwe ser bixe. Daxwaz dikin ku bi Seyîd Riza re danûstendin çêbikin û hevkirin çêbibe. Di wê demê de bi riya waliyê Erzînganê xwesteka xwe digîhînin Seyîd Riza. Ji ber ku heya wê demê waliyê Erzînganê tevlî şerê wan nebûye, diyare Seyîd Riza qaneh dibe. Qaneat dike ku ew hewldan bi niyeteke baş tên kirin. Ji ber vê Seyîd Riza diçe Erzînganê, da ku danûstendin bike. Dema ku diçe Erzînganê, Li cihê danûstendinê Seyîd Riza û hevalên tên girtin û bi awayekî dîl derbasî Xerpetê dikin.

Wan dibin gel waliyê herêma awarte û radestî wî dikin. Bi vî rengî Seyîd Riza û hevalên wî tên xapandin û tên girtin. Li Xerpetê Seyîd Riza û hevalên wî tên dadgehkirin û bi darvekirinê ve rû bi rû dimînin. Di dîroka 10.11.1937'an de li ser wan biryara îdamê tê dayin. Li gorî nêrînekê di 14.11.1937'an de, li gorî nêrîneke din jî di 17.11,1937'an



**BESA ŞAYE**

de tên darvekirin. Bi vî rengî berxwedan darbayeke din dûxe. Lê berdewam dike.

Di berxwedanê de, eşîrên Dersîmê ku tevlî berxwedanê dibin, bi jin û zilaman berxwedaneke mezin dikin. Hevjîna Elîşêr Zerîfe, hevjîna Seyîd Riza Besê risteke mezin dîlîzin. Mirov dikare bibêje berxwedaneke giştî ye, tenê zilaman berxwedan nekirine. Kesên ku karîbûne şer bikin, hemû tevlî berxwedanê bûne. Şehîdbûna Zerîfe û Besê jî bûyerên mînakî ne. Piştî berxwedanê komkûjiya Dersîmê jî, diyar dike ku dewlet çiqasa bi hirs diçe ser berxwedanê.

Tiştekî din ku mirov behs bike, dema ku berxwedan destpê dike; 6-7 eşîrên milê Rojavayê Dersîmê tevlî berxwedanê nabin. Dema ku Seyîd Riza û Elîşêr hewl didin ku di sala 1936’an de eşîrên Kurdan komî ser hev bikin, van eşîr tevlî berxwedanê nabin. Dibêjin, “ger em ber xwe nedin, li hemberî dewletê tiştekî nekin; dê dewlet jî li ser me tiştekî neke.” Lê xwe xapandineke. Dema ku dewlet tê ser Dersîmê, heya ku tevgera Seyîd Riza û Elîşêr tune dike, naçe ser wan eşîrên ber xwe nadin. Piştî ku tevgera berxwedanê tune dike, dewlet vê dorê berê xwe dide wan eşîran.

Wê demê ji wan eşîran hinek radibin, da ku ber xwe bidin. Lê dereng dimînin. Di sala 1938’an de dewlet herêma wan jî kontrol dike û vê derê jî komkûjiyan dike. Ew mijareke ku em jê waneyê bigirin e.

Li gorî ku di dîrokê de dibêjin, di dema serhildana Şêx Seîd de, ji eşîrên Dersîmê alîkarî xwestine, lê wan piştgiriya Şêx Seîd nekiriye. Lê ew bûyer carna tê mezinkirin. Lewra Dersîm û Amed pir dûrî hev in. Cihekî weke Mêrdînê ku nêzik e û Kurdên Sûnî ne, tevlî serhildana Şêx Seîd nebûne. Ne ku tenê Dersîm tevlî serhildanê nebûye û serhildana Şêx Seîd têk çûye. Divê em giştî bigirin dest. Lewra ger mirov van mijaran dîqat neke, dewlet dixwaze nakokiyên wisa derxe. Jixwe dibêjin, dema ku Seyîd Riza berxwedan kir jî, Kurdên Sûnî piştgirî nedanê. Dixwazin her cudabûnekê çêbikin.

Di dema berxwedana Dersîmê de jî, gelek eşîrên herêma Dersîmê tevlî berxwedanê nabin. Diyare ku di nava eşîrên Kurdan de, meseleya

netewiyet û hev û din timamkirinê lewaz e. Mesele, ne tenê meseleya ol e. Dibe ku bandora wê jî hebe, lê mesele ne tenê ew e. Eşîra Mîlî, Sûnî bûn; dîsa jî tevlî serhildana Şêx Seîd nebûn. Wisa be divê mirov giştî binirxîne. Tenê bi nakokiya Sûnîtî û Elewîtiyê divê mirov nenirxîne. Ya esas eşîrên Kurd, berjewendiyên eşîra xwe, didin pêşiya berjewendiyên netewî. Ger li gorî wan berxwedan baş be, tevlê dibin; ger li gorî wan berxwedan ne baş be, tevlê nabin. Zêdêtir jî rêber û pêşengên wan, van biryaran didin.

Hinek dibêjin, Mistefa Kemal nexwestiye li Dersîmê komkûjî pêk bê û Seyîd Riza bê darvekirin. Lê belgeyên bi vî rengî tune. Lê dema ku di destpêkê de dixwazin êrîşî Dersîmê bikin, serfermandarê arteşê êrîş nake û di nava wan de hinek mişqûle derdikevin. Hinek dibêjin, Mistefa Kemal bi xwe mûdahale dike, da ku êrîş çêbibe. Hinek jî dibêjin, yên ku mûdaxale kirine, Îsmet înonu û Fewzî Çakmak wan bûne. Celal Bayar wan nexwestine şer bikin. Mirov dikare van mijaran lêkolîn bike, lê di encamê de dewlet bi awayekî hovane êrîş dikin.

Di sala 1937-38'an de, li gelek herêm û gundên Dersîmê tên şewitandin. Gelek kes tên kûştin, di nava gundan de xelk bi zindî tên şewitandin. Bûyerên bi vî rengî hene. Hejmarên ku hatine kûştin, şewitandin û windakirin; hê bi temamî ne diyar e. Hinek dibêjin 50 hezar e, hinek zêdetir dibêjin. Lê tiştê diyar komkûjiyeke mezin li ser Dersîmê hatiye meşandin. Bi vî rengî tevgerên Kurdî yên li Tirkiye, bi riya çekan tên pelçiqandin û demeke nû li Tirkiye destpê dike.

Tevgera me, salên navbera 1925'an û 1940'î weke "dema komkûjiya Sûr ya Bakûrê Kurdistanê" bi nav dike. Ango 15 salan, dewleta Tirkiye bi riya tûndî, zilm û çekan civaka Kurdistanê qetil dike, heya ku bikaribe vîna civakê bişkîne. Piştî sala 1940'î dema qetlîama spî ye, ango weke ku Serokatî dibêje, "dema jenosîda çandî " ye. Lewra pêştir vîn hate şikenandin, pê re hin qanûn ji bo entegrasyon û bişavtinê derxistibûn. Heya sala 1940'î bingeha ku ew qanûn pêk bên tune bû, lê piştî wê hêdî hêdî pêk hatin.

Ji ber vê Rêber Apo dibêje, "piştî salên 1970'î civaka Kurd bi du çarenûsan ve rû bi rû ma. An divê biryar bide, da ku careke din rabe; an jî bi giştî tune bibe." Lewra kesekî/a ku di sala 1920'an de hatiye dinê, piştî 1940'î dibe ciwan û rastî jenosîdê tê û di salên 1970'î de jî îxtiyar bûye û berv bi mirinê ve diçe. Yên ku di salên 1940'î de hatine dinê jî, di sala 1970'î de êdî jin, an jî zilamekî têgihiştî ye. Ango du nifş mezin bûne, ger mûdahaleyê rewşe neyekirin, dibe ku ew civak bi temamî tune bibe.

Piştî salên 1940'î rewşa Kurdistanê bi vî rengî ye. Rewşa Tirkiye çawa ye? Di sala 1938'an de Mistefa Kemal dimre û Îsmet Înonu dibe serokomarê Tirkiye, ango dibe bavikê duyemîn yê Tirkiye. Heya salên 1950'an serokomariya wî berdewam dike. Di wê demê de, li cîhanê şerê cîhanê yê duyemîn çêdibe. Tirkiye di vê demê de, Antakya digre; ya duduyan di navbera Almanya û Brîtanya de rist dîlîze. Lewra şer careke dîtir, di navbera Fransa, Brîtanya û Almanya de çêdibe. Her çiqas Tirkiye xwe nêzikî Brîtanya dibîne jî, di şer de xwe bêalî nîşan dide. Gumanên wan hebûn ku nêzikî Almanya jî bibin.

Di sala 1943'yan de, ji ber ku rewşa şer di leha Brîtanya de pêş dikeve, Tirkiye biryar dide ku bibe alîgirê wan. Dema ku Almanya, li Rûsya û Fransa dişkê û berv bi lewaziyê ve diçe, diyar dibe ku ser nekave; Tirkiye xwe nêzikî Brîtanya dike û xwe weke hevpeymanê wan nîşan dide. Di sala 1945'an de şer xilas dibe. Piştî şer Amerîqa, bi Tirkiye re têkilî datîne û dixwaze Tirkiye hin gavan biavêje. Lewra pergala Tirkiye, pergaleke tekhizbî ye û nikare weke berê berdewam bike.

Ji ber vê di sala 1945'an de qanûneke derdixin, da ku pergala avakirina partiyan û pir partîbûnê pêş bikeve. Di sala 1946'an de hilbijartin çêdibe. Wê demê partiya Demokrat ku di pêşenktiya Celal Bayar û Ednan Menderes de çêbûye, di nava parlementoyê Tirkiye de bi nêzikî 60 kûrsî cihê xwe digre. Careke din di 1950'î de hilbijartin çêdibe û partiya demokrat dibe deshilat. Êdî dema CHP ku yek partî bû, xilas dibe. Lê tiştê diyar dibe, weke ku îro jî tê behskirin, dewleta veşartî û kûr her di destê partiya avaker û kesên avaker yên dewletê de ne. Tenê hûkimet dikeve destê partiya demokrat.

Wê demê Celal Bayar dibe serokomar û Ednan Menderes jî dibe serokwezîr. Heya sala 1958'an du car din hilbijartin çêdibe, lê dîsa demokrat partî ser dikeve û bi serê xwe hûkimetê çêdike. Çawa ku AKP sê carin dibe hûkimet, demokrat partî jî wisa dibe.

Di wê demê de li cîhanê guhertinên cîdî hebûn. Piştî şerê cîhanî yê duyemîn, li aliyekî komara mîlî ya Çînî çêbû, li aliyekî Hîndîstan ji destê Brîtanya rizgar bû, li aliyekî Koreya Demokrat pêş dikeve û şerê herdu Koreyan çêdibe. Her wiha li Misir deshilatdariya Brîtanya dirûxe û di pêşengtiya Ebdûl Nasir wan de komara Misirê tê avakirin. Di sala 1953'yan de tevgera demokratîk ya Mûsadiqî wan pêş dikeve û dixwazin pêşiya deshilatdariya Brîtanya û Amerîqa bigirin. Li aliyekî din li hemberî Fransa, şoreşa Wîetnamê çêbû û ji beşeke Wîetnamê Fransa hate derxistin.

Ango ji salên 1945'an heya 1960'î di bin navê sosyalîzm û azadiya gelan de gelek şoreş û tevger dûrûst dibin. Tesîra vê li ser Tirkiye, Îran, Suriye, Iraq û Kurdistanê jî dike. Li Iraq jî di sala 1958'an de, pergala qraltiyê û deshilatdariya Brîtanya hat xirabkirin û komara Iraqê hate avakirin. Vê komarê maf û nasnameya Kurdan qebûl kir. Ew rewşên nû bûn. Di sala 1959'an de tevgera Kûba ser ket û wê demê tesîr li ser cîhanê kir. Van rewşan bûn sedem ku ji aliyekî ve li Tirkiye tesîrên erenî çêbibin; ji aliyekî ve jî tirsa pergala leşkerî ya NATO çêbû, da ku pergala Tirkiye naye guhertin. Lewra Tirkiye di sala 1952'yan de bû endamê NATO.

Serokatî dibêje, "dema ku Gladîo hate avakirin, di nava Tirkiye de jî bi awayekî aktîf û bi riya Îstîxbarat û NATO xwe tevger kir." NATO dîdît ku, li aliyekî ve li Rojhilatê Asya gelek dewlet ji Amerîqa û Ewropa dûr dikevin, li Amerîqa serhildan heye, li welatên Ereban pergala Rojava teng dibe, Înglîtere ji Iraqê hate derxistin û Îran tê tengav kirin. Ger di wê demê de Tirkiye jî ji destê wan biçe, halê wan ne baş e. Ji bo vê yekê Serokatî dibêje, "guhertinên ku li Tirkiye çêbûne, bi perspektîfên NATO û Gladîo çêbûne."

Li ser vê esasê di 27'ê Gulanê 1960'an de Alparslan Tûrkeş û çend kesên din li Tirkiye înkilaba leşkerî çêkirin. Deshilata partiya demokrat têk birin û xwestin cardin li gorî xwe pergalê kontrol bikin. Lewra gelek guhertinên derveyî hene û tesîr li ser Tirkiye dike. Di hûndirê Tirkiye de jî hêdî hêdî tevgerên çep li Tirkiye pêş dikevin. Partiya Komînîst ya Tirkiye, tevgerên demokratîk, tevgerên Îslamî pêş ve diçin. Mesela di 1949'an de Saîdî Nûrsî ji zindanê derdikeve û heya salên 1960'î bi fikrên xwe gelek tevgerên fikrî û olî pêş dixe. Ji wan re dibêjin, "tevgera Nûrcî." Ew tirseke çêdike, dibêjin "ew tevger dixwaze, Tirkiye vegerîne serdema xelîfetê."

Ya duyemîn tevgera çep û sosyalîst pêş dikeve û dibêjin, "dibe ku ew jî me nêzikî pergala komînîst bike." Ji aliyekî din ve jî hin tevger û komaleyên biçûk yên Kurdî çêdibin. Di wê serdemê de kesên weke Musa Anter, Seîd Kirmizitoprak, Seîd Elçî û komek kesayetî hewl didin ku hin tevgerên rewşenbîrî yên Kurdî pêş bixin. Piştî bêdengiya 30 salî, tevgerên bi vî rengî çêdibin. Jixwe di 1959'an de ji van kesan 49 kes tên darizandin, ew dadgeh li Tirkiye weke "doza 49 kesan" tê naskirin.

Ew bûyer li Bakûrê Kurdistanê, piştî komkûjiyên Kurdan weke gava yekem ya rewşenbîriya Kurd e. Ne li ser navê Kurdiyetiyê jî dikin, xebatên rewşenbîrî dimeşînin, lê hinek bêhna Kurdîtiyê didin. Jixwe hevalên me yên ku bi Apê Musa re jiyan kiribûn behs dikirin. Serokatî berê digot, “me ji sifirê destpê kiriye.” Digotin, “Musa Anter ji hevalan re digotiye, ‘ji serokatî re bibêjin, heya ku me gihand sifirê jî me gelek zehmetî dîtin.’” Rewşa wê demê wisa ye. Jixwe dema ku darbeya leşkerî çêdibe, pêşiya hemû tevgerên Kurd, Îslamî, çep tê girtin. Lê bi navekî din tînin ziman.



**DOZA 49’AN**

Serokatî dibêje, “ew darbe planeke NATO û Gladîo bû ku li ser esasê xeta kesk pêş xistin.” Ango xwestin li ser esasê kontrolkirina tevgerên çep û Îslamê pergala xwe nû bikin. Piştî ku arteş her tiştî kontrol dike, hinek reforman jî pêş dixe. Hinek qanûn derxistin ku mafê xwe tevgerkirinê dide. Ew ji bo dîroknivîsan pirsyar in. Darbe çêbû, lê piştî darbe hinek derfet dan. Ew ji bo çi ye? Serokatî wisa dinirxîne, “van pêşiya tevgerên azadiyê girtin û xwestin bi kontrol tiştên din pêş bixin.”

Li ser vê esasê piştî 1965’an tevgera Îslamî di pêşengtiya Necmedîn Erbakan û Fetûlah Gulen tê pêş xistin. Necmedîn Erbakan, zêdetir aliyê siyasî temsîl dike; Fetûlah Gulen jî aliyê cemeatî temsîl dike û bi rengên cuda kar dike. Aboriya wê jî tê pêş xistin. Li Tirkiye êdî per-

gala medreseyan jî ji nû ve tê pêşxistin. Ew yek du cihan dibe; yek Tirkiye ye, yek jî Pakîstan û Hîndîstan e. Ew programa NATO bû, li hemberî Rûsya. Li Pakîstan û Efganîstan, di encamê wan medreseyan de tevgera çekdarî li dijî Rûsya hate pêşxistin. Li Tirkiye jî medreseyên ku hatin pêşxistin, bingeha tevgereke Îslama nerm ku bikaribe bi Amerîqa re kar bike hate avakirin. Niha jî gihêştiye çi astê em dibînin.

Ji aliyê din ve piştî salên 1961'an li Başûrê Kurdistanê serhildana Kurdî careke dîtir destpê kir. Piştî ku di sala 1958'an de hinek mafên Kurdan hatin qebûlkirin, di sala 1961'an de navbera Kurd û hûkimeta Iraqê têk çû. Dema ku navbera wan xirab bû, şer destpê kir. Tesîrên vî şerî li ser beşên din yên Kurdistanê jî hebû. PDK jî li parçeyên din hebû, li Bakûrê Kurdistanê jî hewldanên wê çêbûbûn. Li ser vê esasê di 1965'an de PDK Tirkiye çêdibe. Di pêşengtiya Faîk Bucak de çêdibe. Eşîra Bucak û Faîk Bucak di wê demê de welatparêz in.

Dewlet vê qebûl nake û hewl dide bi nakokiyên eşîrî mişqûleyan derbixe, li ser van esasan Faîk Bûcak jî tê kûştin. Dema ku ew tê kûştin jî, di nava Bûcakan de xeta welatparêziyê tê lewaz kirin û xeta hevkariya dewletê tê pêş xistin. Jixwe di dîroka tevgera me de jî, eşîra Bucakan li ser esasê ew xeta hevkar ya dewletê, li hemberî tevgera me jî disekinin.

Piştî Faîk Bucak tê kûştin, Seîd Elçî dibe serokê PDK Tirkiye; lê ew partî dibe du beş. Beşek rastgir in, beşek jî çepgir in. Beşa rastgir re Seîd Elçî pêşengtiyê dike, ji beşa çepgir re jî Seîd Kirmizitoprak (Doktar Şivan) pêşengtiyê dike. Kadro û pêşengên wan tên girtin. Heya sala 1970'î Seîd Kirmizitoprak di zindanê de dimîne û derdikeve. Di wê serdemê de hevdîtinên  di navbera PDK û hûkimeta Iraqê de hene. Iraq, otonomiya Kurdan qebûl dike. Di wê serdemê de Seîd Kirmizitoprak jî tê Başûrê Kurdistanê û demekê alîkariya PDK ya Başûr dike. Di sala 1971'an de jî dixwaze xwe tevger bike, da ku li Bakûr tevgereke çekdarî pêş bixe.

Wê demê Barzanî û PDK vê yekê qebûl nakin. Dibêjin, "niha ne dema wê ye ku tu karekî bi vî rengî bikî." Ew yek di navbera Barzanî û Doktor Şivan û hevalên wî de dibe pirsgirek. Di demeke wisa de Seîd Elçî jî ji zindanê derdikeve û tê Başûrê Kurdistanê. Seîd Elçî tê Zaxo û dixwaze biçe gel Doktor Şivan. Li gorî ku hevalên Seîd Elçî dibêjin, navberekê di nava Seîd Elçî û Doktor Şivan de pirsgirek hene, dixwaze wan çareser bike. Yek jî dibîze ku Doktor Şivan hin amadekariyan ji bo Bakûr dike, dixwaze biçe gel wî da ku pêk ve kar bikin. Li ser vê esasê ji PDK dixwaze ku wî bibin gel Doktor Şivan.

PDK jî dibêjin, rast e û xwestiye biçe gel Doktor Şivan. Lê piştî ku diçe gel PDK, êdî naye dîtin. Piştî wê çi li serê wî hatiye, hevalên wî jî nizanin. PDK dibêje, “me ew bir û radestî Doktor Şivan kir, lê piştî rojekê Doktor Şivan ew kûştiye.” Doktor Şivan û hevalên wî jî dibêjin, “ne rast e, PDK ji me re gotiye ku Seîd Elçî dixwaze bê gel we, lê neanîne gel me. Pişt re me fêm kiriye ku di rê de ew kûştine.” Ew çîrokeke û du rengên wê hene. Di encamê de PDK, Doktor Şivan digre û bi kûştina Seîd Elçî gumanbar dike. Wî demekê dixin zindanê û dadgeha wî çêdikin, di encamê de dadgehên PDK biryar didin ku Doktor Şivan jî bikûjin.

Dibêjin, “belgeyeke ku Doktor Şivan bi xwe nivîsandiye û îtîraf kiriye ku Seîd Elçî kûştiye di destê me de ye.” Biryara kûştina Doktor Şivan jî, bi wê belgeyê didin. Bi vî rengî Seîd Kirmizitoprak (Doktor Şivan) jî tê kûştin. Hevalên Doktor Şivan dibêjin, “ew belgeya îtîrafê ne rast e, ew xetên nivîsandinê û ew axaftin jî ne ya Doktor Şivan e. Ew planeke dezgehên parastina PDK û mîta Tirkiye ye û pêk ve kirine. Bi zanebûn Seîd Elçî azad kirine, anîne Başûr û kûştine, bi gumanbariya kûştina wî jî, Doktor Şivan kûştine. Bi vî rengî pêşiya şerê Bakûr jî girtine.” Hevalên Doktor Şivan û hinek hevalên Seîd Elçî dibêjin, “bi vî rengî hem Tirkiye ji PDK ya Tirkiye rizgar kirine, hem jî Barzanî û PDK ya Başûr xwe ji vê belayê rizgar kirine.”

Ger hûn dîqat bikin, dema ku Rêber Apo dixwaze ji Bakûrê Kurdistanê derkeve, vê mijarê dinirxîne û dibêje, “hinek heval dibêjin em biçin Başûrê Kurdistanê, lê niha em lewaz in. Ger em biçin Başûrê Kurdistanê, dibe ku qedera me jî weke ya herdu Seîdan bibe. Niha ne dema çûyina Başûrê Kurdistanê ye.” Bi vî rengî ew tevgera PDK ya Bakûr ku dixwest pêş bikeve jî, di salên 1971-72’an de tasfiye kirin. Di wê serdemê de li Tirkiye hin tevgerên çep pêş diketin. Pê ve girêdayî PSK (Partiya Sosyalîs a Kurdistanê) û hin komên girêdayî PDK jî pêş diketin, lê pişt re PKK derket û wan rista xwe nelîstin. Jixwe di dîroka PKK’ê de ew tiş bi berfirehî tên vekirin.

…: Ez dixwazim bale bikşînim ser tiştekî. Di navbera Osmanî û Komara Tirkiyê de, di nêzikbûna berxwedanî û serhildanên Kurd de cudabûnek heye. Dema Osmaniyan de dema ku serhildan çêdibûn û dihatin şikenandin, ew kesên ku pêşengtî dikirin dihatin mişextî kirin. Dişandin Hîcaz û Girava Gîrîtê. Lê bele piştî ku Komar hate avakirin, mirov dibîne ku bi giştî tên tasfiye kirin. Tên kûştin û tên îdam kirin.

Dîsa ji bo Seyîd Riza, gotinên balkeş hene. Mesela dibêjin beriya ku bê îdamkirin, Mistefa Kemal dixwaze biçe wê dere. Hinek salix

didin, dibêjin "lêborîna xwe bixwaze." Kesê ku walîtiya wê derê dike û mirovên wî, beriya ku Seyîd Riza lêborîna xwe bixwaze, yekser wê şevê radibin û wî îdam dikin. Hem jî li ber ronahiya sayereyan dadgeha wî çêdikin û wî îdam dikin. Weke daxwaziya dawî dibêje, "min pêşiya kurê min bikûjin, îdam bikin. Da ku mirîna wî nebînim." Lê dewleta Tirkiyê wê jî qebûl nake û kurê wî li ber çavên wî îdam dikin.

Gotineke wî ya bi nav deng jî heye, dibêje; "min derewên we nikarî, ew ji min re bû ders; min jî li hemberî we çok danenî, bila ew jî bi we re bibe dert."

…: Hevalan gelek mînak dan. Dema ku qanûnên guhertinê derdixin, yek jî wan înkilaba şapqa ye. Pir bala min dikşîne. Ji bo şapqayekî jî qanûneke derdixin. Berî wê fes dihat karanîn, lê bi awayekî qanûnî û fermî şapqa derdixin. Dîsa tiştên weke lêdan û guhdarkirina temburê qedexe dikin. Stranên gel qedexe dikin. Mûzîka qlasîk ya Ewropa fermî dikin. Kesên weke Mozart û Betofen teşvîq dikin. Ji bo ku bê fêmkirin ku xwediyê zîhniyeteke çawa ne, ew mînak girîng in.

Ji bo Seyîd Riza jî, dibêjin roja ku tê îdamkirin, betlane ye. Di wê rojê de karên fermî nabin. Lê tiştekî bêqanûnî jî dikin. Hem şev e, hem betlane ye, hem dadger tune. Lê dadgerekî tînin û bi awayekî lezgîn wî dar ve dikin.

Wezîrekî wê demê jî heye, dibêje; "kesê ku li vî welatî jiyan dikin, hemû Tirkên arî ne, yên ku ji xwe re bibêjin em ne Tirk in jî; tenê mafekî wan heye, ew jî xizmetkirina Tirkê arî ye. Ew gotin, wê pêvajoyê jî îfade dike. Çawa ku di dema Agirî gotin, "xeyalê Kurdistanê li vê derê meftûn e." Di wê demê de jî gotineke wisa wê pêvajoyê îfade dike.

…: Di mijara Şêx Seîd de, pir tê axaftin; dibêjin Îngîlterê xwestiye ji bo meseleya Mîsak-î Mîlî li hemberî Osmaniyan bide şûxûlandin. Lê tiştên ku Heval Helmet gotin de tiştekî wisa nebû. Jî vî milî ve heval hinek sererast bike baş e. Yek jî rista Qasim, di têkçûna serhildanê de çi ye?

…: Qesî ku min ji vegotinan fêm kir, di van deman de pir guhertin çêdibin. Armanc qutkirina Tirkiyê û Bakurê Kurdistan, ji Rojhilata Navîn e. Dema em îro jî mezî dikin, heman armanc berdewam dike. Di van tevgeran de îro jî heman xwestek heye, an na? Mesela Mistefa Kemal, şoreşa wêjeyê pêş dixe, di cil û bergan de guhertinan dike. Ew xaleke mûhîm e. Niha çiqasa hewldan heye ku bizivire wê demê, an jî kîjan demê esas digirin?

…: Ez gihêştim wê qanate ku, tiştê ku mirov ji dîrokê fêm dike, vî mantiqî di mirov de bi hêz dike; ji bo qarekterên pêşeng nebaşî naye qebûlkirin, ew tenê ne li Tirkiyê hemû welatên cîran jî heye. Wisa nêzikî Mistefa Kemal dibin. Ji bo wî siyekê çêdikin, ew sî jî di Îsmet Înönü de pêş dikeve. Lê Mistefa Kemal de kêmasî nabînin. Di vir de Kemalîzm çêdibe. Li Iraqê Baisî, li Îranê Pehlewî û Xumeynîzm pêş dikeve. Bi vê mantiqekê tevdigerin hemû, ew jî zext û serdestiya ser gel e. Ji holê rakirina bingeha şoreşa civakê ye. Ji bo gelan derfetên pir mezin jî çêdibin, lê bi navên cûda di ser gelan de diçin.

**H. Helmet:** Em hinek li ser mijara Şêx Seîd rawestiyan. Dema ku Şêx diçe herêma Pîranê û li wan deran digere; her wiha li cihên din yên Bakur digere da ku ji bo tevgerê piştgiriyê kom bike. Pişt re tê herêma Pîran. Li wir leşkerên qaraqola wê herêmê diçin û dixwazin çend kesan bigirin. Şêx Seîd jî mûdaxale dike û dibêje ne rast e û negrin tu kesî. Ew jî dibêjin ew kes sucdar in, divê em bigirin.

Li gorî rêgezên civakî dema ku kesek were mala te, divê hûrmeta wî kesî bikî. Bi taybetî kesekî navdar e û xwe avêtine bexta wî. Êdî ji bexta wî ye, divê qet nebe hevkirinekê çêbike. Lê leşker li gorî vê tevnagerin û naçin. Li hemberî vê birayê Şêx Seîd û Qasim diçin wan leşkeran dikûjin û tolê distînin. Wan kesan jî azad dikin. Dibêjin ew li hemberî Şêx Seîd bêrûmetî ye.

Serokatî jî dibêje, ew kar bi destê Qasim çêbûye. Lê wekî diyar dibe, Qasim weke sîxûrê dewletê kar dike . Dema ku Şêx Seîd tê girtin jî, Qasim pê re ye. Lê ew naye îdam kirin, hinek dibêjin dema hatiya darizandin gotiye, ji bo ku Şêx Seîd şer neke û radest bibe, ez bûme alîkar. Ya rast, li Varto Şêx Seîd naye girtin. Lê dema ku dibîne ku pire hatiye girtin, xwe radest dike. Hinek dibêjin, Şêx Seîd bi xwe çû û got jixwe ew kara xilas bû, êdî em bikevin danûstendinê. Lê li gorî axaftinên Qasim jî, dibêje min îqna kiriye.

Ji ber vê naye îdamkirin. Ji ber van herdû mijaran nêrîneke wisa heye ku Qasim her sîxurtî kiribe. Buyera yekemin, ji bo ku tevger bi ser nekeve zû hereket dike û bi komployê destpê dike. Ya duyemîn jî Şêx Seîd daye girtin. Bi ûslûbekî zanebûn ew kiriye. Lê sîxûrtiya wî objektif be, an jî subjektîf be mirov ji bo vê nikare tiştekî bibêje.

Girêdayî meseleya Îngîlîzan jî, mirov dikare wisa bibêje; peywendiya Îhsan Nûrî Paşa û hinek fermandarên din bi Brîtanya û yên din re heye. Ew di dîrokê de derbas dibe, jixwe dîrokeke pir dûr jî nene. Bes mirov nikare bibêje Brîtanya bi plan ew tevger pêş xistine. Jixwe van tevgeran bi komek mirov û bi awayekî veşartî destpê kirine. Pişt re

têkiliyên wan bi Brîtanya re çêdibin. Ew jî dixwazin ji Brîtanya îstîfade bikin, Brîtanya jî dixwaze ji wan îstîfade bike. Lê nêrîna ku dibêje, ew tevger Brîtanya pêş xistiye şaş e. Nêzikbûneke bi vî rengî ne rast e. Ew axaftinên dewleta Tirk in.

Ji aliyê bişavtina dewletan kiriye ve; tenê ne Tirkan, Îranê jî ew kar kiriye. Li hemberî vê divê em giranî bidin ser çanda civakê. Em nas bikin, bizanibin ku çi kirine û em ê li hemberî wê jî hewldanên xwe nişan bidin. Bes weke tevger hewldanên me ji vî alî ve kêm in. Hinek hevalên me û rêxistinên me dibe ku pêwîstî jî nebinin ku li ser van tiştan biaxifin. Divê em weke pêwîstiyeke bigirin dest. Lewra ew projeyeke bişavtin û qirqirina çandî ye. Niha tevgera me li dijberî van siyasetan derketiye, mesele tenê bi navê Kurdbûnê tevgerîn nene. Pêwîst e, exleq, çand û jiyan bên sererastkirin. Lewra ew hatine berovajîkirin.

…: Dibêjin li Efrînê pireyek heye. Dibêjin dema ku li Bakur serhildan destpê dike, ji wî alî ve alîkariya çekan dihatiye kirin. Lê ji ber ku Fransizan xeber hildane û pire girtine, nikarîne çekan bişînin, weke sedemeke têkçûyina serhildana Şêx Seîd jî vê dest nîşan dikin. Ya din jî dema serhildana Dersîmê têk diçe, dibêjin bi deh hezaran jinan dîl digirin û dibin. Di nava van de jina Seyîd Riza jî heye. Lê hemû xwe diavêjin çeman û xwe dikûjin.

Leşkerên ketine Dersîmê, dema ku dikevin gundan her derê dişewîtinin. Di nava maleke şewitî de zarokek xwe rizgar dike û derdikeve derve, lê dema ku dibîne leşker ber derî ye, dîsa xwe diavêje nava agir. Yanî bûyerên ku zext û îşkenceyan vedibêjin pir in. Gel di bin zexteke pir mezin de bûye.

**H. Helmet:** Hevalan hin tişt diyar kirin, ew di gelek belge û partûkan de jî derbas dibin. Cudabûna Osmanî û Komara Tirkiyê jî rast e. Serokatî jî dibêje, Osmanî baştir nêzik dibûn. Her wiha Komara Tirkiyê çi aniye sere kurdan, gelek mînakên zindî û jiyanî hene. Bi hejmartinê xilas nabin. Ew axaftinên Seyîd Riza yên sêdarê jî rast in. Weke hevalan got, ji bo paqij derxistina Mistefa Kemal jî hinek tiştan dibêjin. Gotineke afûkirinê jî heye, lê li gorî qarekterê Komara Tirkiye ku nû hatiya avakirin, ew dibêtî piçekî dûr e. Seyîd Riza yê ku ew qesa li hemberî wan şer kiriye, dê çawa bê afûkirin nizanim. Mantiq qebûl nake.

***2-Rojhilatê Kurdistanê***

Em ê li ser Rojhilat hinek biaxifin. Cîhan pir hatiye guhertin, lê Îran pir nehatiye guhertin. Îran pir aktif tevlî şerê cîhanê yê yekemîn nebû. Her wiha mûdaxaleyên hêzên weke Rûsya û Brîtanya, Îran xirab kiribû. Ji sala 1905'an heya 1911'an guhertina destûrî hebû. Ji sala 1911'an heya 1919'an jî bêîstîkrarî hebû. Piştî vê hinek hewldanên sererastkirinê çêdibin, lê ew jî tam cihê xwe nagrin.

Heta 1923'yan Riza Xan dibe serokwezîr. Êdî her kes serokwezîriyê jî nake. Yê ku dibe jî bi heyvek û dû heyvan nikare berdewam bike. Jixwe rewşa paşayan pir ne baş e. Pir hêvî lê naye kirin. Bi dewlet û civakê re pir alaqadarbûyin tune ye. Hûkûmetên lewaz in. Di nava van şert û mercan de Riza Xan, bi alîkariya Brîtanya hêdî hêdî di nava arteşê de pêş dikeve. Dibe serokê arteşê û wezîrê parastinê. Di 1923'yan de jî dibe serokwezîr.

Çîroka wî û ya Mistefa Kemal nêzikî hev in. Mistefa Kemal di 1919'an de destpê dike û di 1921'an de serkeftinê dest dixe, ew jî di wê demê de dibe wezîrê parastinê. Di sala 1923'yan de Mistefa Kemal komarê ava dike, ew jî di wê dîrokê de dibe serokwezîr. Texrîben Tirkiye û Îran paralel diçin. Serkêşiya yeke Mistefa Kemal dike, ya din Riza Xan e. Tabî pişt re dibe Riza Şah. Êdî pergala Qacarî radikin. Ji sala 1919'an destpê dike, lê di 1925'an de tê rakirin.

Di 1926'an de jî tacê paşatiyê dixin serê Riza xan û dibe şahê Îranê. Dibe Riza Şahê Pehlewî, navê Pehlewî jî pê ve dikin. Weke Mistefa Kemal tevdigeriya. Têkiliyên wî jî bi Brîtanya û dewletên Rojave re xurt in. Di navbera 1925'î û 1930'î de, hewl dide hûkimdariya xwe ya li Îranê zêde bike.

Di van serdeman de, ji ber ku heya demekê belavebûn hebû. Jixwe rêveberiyên herêmî yên Kurd li pêş in. Pergal ew qesa serwer nebû. Mesela mintiqaya Ûrmiyê, Mahabad wan deran Şikak hûkûmeteke xwe çêkiribû. Li mintiqaya Lorîstan, rêveberiya wê herêmê ku lewaz bibû, di vê demê de hinekî din xurt dibe. Emareta Loristan berfireh dibe. Herêma Lek, ne weke hûkûmet be jî, di destê wan de bû. Mintiqaya Ciwanro, xelên wir îdareya xwe bi xwe dikirin. Li herêma Hewreman, Merîwan wan deran, Cafer San wan êdî hûkim dikirin. Dîsa malbata Hamêreş wan, li herêma xwe hûkim dikirin. Bi vî rengî, li Rojhilatê Kurdistanê her herêmekê hûkmî xwe dikirin.

Li Îranê rewşeke belav hebû. Lê êdî Riza Şah xwest, li van deran hêdî hêdî kontrol bike. Bi sala 1921'an re dest bi serweriya van herêman kir. Di serî de li hemberî Îsmalê Şikak û herêma wî destpê kir.

Ew herêm kir bin serweriya xwe, Sîmko nikarî li berxwe bide, di serî de derbasî Bakur bû, pişt re hate Başur. Demekê li gel Şêx Mahmud ma.

Riza Şah dema ku di navbera 1919'en a 1921'an de bû wezîr û fermandarê arteşê li hemberî Mahmud Dizlî wan sekinî. Mahmud Dizlî jî tê gel Şêx Mahmud û li hemberî Brîtanya, gel wî şer dike.

Di vê navberê de hewldanên Riza Şah hene, lê piştî 1925'an dixwaze timam bike. Di vê demê de mintiqaya Loristan wan tam nehatine qontrol kirin, ji ber vê li van herêman şer pêş dixe. Piştî 1926-7'an êrîşî rêveberiya Lekê dike. Di van sê-çar salan de herêma Loristan û Leke şer berdewam dike. Riza şah, beşeke ji van eşîr û derdoran bi riya şer qontrol dike. Hinek jî qontrol nabin, bi fêlbazî têk dibe. Siyaseteke wî heye; Qûranê dişîne û dibêje bila ew Qûran bibe navbenkarê me û em li hev bikin. Ew jî dibêjin timam, lê dema ku tên wan digre. Yên ku tên girtin yek mîrê Lek e.

Mîrê Lorîstan, wê demê Riza Qolîxan e. Ew jî bi şer têk diçin û hinekên wan radest dibin, hinek jî diçin Başûr. Li herêma Lek, piştî ku mîrê wan tê girtin. Jina wî, Qedemxêr heye. Qedemxêr ji 1925'an heya 1928'an ber xwe dide û li hemberî Riza Xan disekine. Şer û berxwedaneke mezin dike. Di nava Loran de Cîhan Xan heye, ew jî li hemberî Riza Şah disekine. Lê piştî sala 1928'an diyare ku zorî û zehmetî bo wan tê. Lewra ji aliyekî ve Loristan dikeve bin serweriya Îran, ji aliyekî ve jî Hewreman wan deran dikevin bin serweriya Îran.

Di encamê de ew hemû şert û şûritên Riza xan qebûl dikin. Qedemxêr jî di destpêkê de qebûl nake, lê bi riya Qûran û navbenkeran qebûl dike. Dawiyê de dibin zindana Tahranê û li wir vefat dike. Bi vê siyasetê, Riza Şah herêma Loristan, herêma Lek, herêma Hewreman dixe bin qontrola xwe. Mahmutxanê Dizlî wan qontrol dike. Mahmut xanê Kanî Sanenî û HemeReşîdxanê Banenî qontrol dike.

Di 1930'î de careke din tevgera Sîmkoyê Şikakî heye. Di 1924'an de, di encama danûstandinan de Sîmko qebûl dike ku biçe rûne û kar neke. Demekê wisa jî dike. Paşê danûstendinên wan têk diçin, di 1926'an de careke din hereket dike, pişt re afûya wan derdikeve û diçe rûdine. Di sala 1930'î de Riza Şah guman dike ku dîsa tevgereke Sîmko heye. Walî û fermandarên herêmê bi komplo di bin navê dawetê de dibin û wî dikûjin. Bi vî rengî, pengava Riza Şah ya li ser eşîr û herêmên Kurdistanê, heya 1930'î berdewam dike.



**QEDEMXÊR**

Piştî vê li Rojhilatê Kurdistanê, bi piranî eşîr û tevgerên Kurd tên qontrolkirin. Bi giştî nêzikbûna Riza Şah ya li hemberî Rojhilatê Kurdistan, weke Mistefa Kemal e. Ji bo guhertina pergala Îranê qanûnan derdixe.

Ji aliyekî ve jî dixwaze deshilatdariya olî li Îranê lewaz bike. Lê ji ber ku li Îranê, deshilatdariya olî zêde ye, nikare weke Mistefa Kemal bi ser bikeve. Tesîra wan kêm dike, lê bi timamî weke Tirkiye nikare gavên mezin biavêje. Ew jî weke Mistefa Kemal, qanûnên cil û berg û şepqe derdixe. Ji salên 1930'î şûnve dixwaze hêdî hêdî Îraneke Ewropî dûrûst bike. Qanûnê herifguherînê nikarê pêk bîne. Ji ber hêza oldar û dînê Îran nikare vê bike. Lê gavên din ku li Tirikyê hatine avêtin, Riza Şah jî avêtine. Xwest wisa jî civaka Îran biguherîne.

Jixwe bi vê rewşê di salên 1936-7'an de êdî di nava Kurdan de hinek bertek derdikevin holê. Ew jî bi zor û zextê van bertekan diperçîqîne. Diçe ser wan. Hinek kes direvin û diçin Başûr, hinek tên darizandin û diavêjin zindanan. Bi vî awayî dixwaze qanûnên xwe bi cih bike. Di navbera salên 1930'î û 1940'î de li Rojhilatê Kurdistanê tevgerên Kurd zehmetî dikşînin. Jixwe tevgerên çekdarî namînin. Tevgerên siyasî û rewşenbîrî jî tên sînordar kirin. Ji ber ku li Başurê Kurdistanê hinek derfet derketine holê, piraniya wan rewşenbîr û siyasetmedaran tên û li Başur bi cih dibin.

Di navbera salên 1939'an û 1946'an de şerê cîhanê yê dûyemîn hebû. Di vê demê de Riza Şah dibe alîgirê Almanya. Ji ber vê Brîtanya û Rûsya mûdaxaleyî Îran dikin. Di sala 1941'an de Brîtanya ji milê korfez ve mûdaxale dike û heya Tahran digre. Rûsya jî ji milê Bakurê Îranê ve mûdaxale dike û heya nêzikî mintiqaya Mahabad dixe bin destê xwe.

Bi vî rengî Îranê qontrol dikin û Riza Şah jî di îlona 1941'an de li ser text digirin û kûrê wî dikin paşa. Navê wî Muhamed e, weke Muhamed Riza şah navê wî derdikeve. Ew kûr wê demê ciwan e, temenê

wî bîst û penc salin. Bavê wî ji paşatiyê dêxin û mişextî dikin. Êdî di hûkmê Îranê de, belavebûn çêdibe. Heya ku şer xilas dibe, hûkim di destê Brîtanya û Rûsya de ye.

Di vê demê de li Kurdistanê de valatî çêdibe. Ji 1941'an heya 1944'an li mintiqaya Bane û derdora wê di pêşengtiya Hamereşîd Xan de careke din tevger destpê dike. Li vê herêmê ji bo xwe hûkimetekê dûrist dike û radyoyekî herêmî çêdike. Di 1944'an de hûkimeta Îranê bi alîkariya Brîtanya vê hûkimetê xirab dike. Dîsa li mintiqaya ciwanro û Hewreman, di 44-45'an de herêm dikeve destê Kurdan. Lê bi alîkariya Brîtanya, hûkimeta Îran careke din van herêman dest xwe dixe.

Li mintiqaya Mûkriyan, di 42'yan de hindek rewşenbîrên ku hatibûn Başurê Kurdistan vedigerin û diçin Rojhilatê Kurdistanê. Lewra li wir hinek derfet çêbûne. Hinek siyasetmedar vedigerin. Yekî ji wan Hemereşît Xanê Banê bû. Diçe Rojhilat û ji bo xwe hûkimetê çêdike. Beşeke ji wan rewşenbîr û siyasetmedaran jî, xelkê Mahabad in û diçin li wir ligel rewşenbîrên wir rêxistinekê çêdikin. Navê vê rêxistinê Komaleya Jiyanewî Kurdistan e. Hinek jî dibêjin komaleya Jiyanewî Kurd, ango komaleya Vejîna Kurdistan. Weke rêxistineke siyasî di sala 1942'yan de çêdikin. Vê demê Mahabad, herêmeke navber (tampon) e. Di navbera deshilatdariya Brîtanya û Rûsya de ye. Bes tesîra Rûsya li ser zêdetir e. Hûkma Îranê jî li ser tune.

Ew komale derfet dîbîne û xebatên xwe pêş dixe. Li Mahabad, Mûkriyan û wan deran xebatên xwe yên giştî pêş dixe. Hata salê 1944'an xebatên xwe berfireh dikin û xebata ku heya wê demê di nava rewşenbîr û ciwanan de pêş diket, xwe berfireh dike û bi kesayet û serokên din yên eşîran re jî dikevin têkiliyê. Xelk jî bi vî awayî dibin endam. Kesekî ku di vê salê de dibe endam jî, Qazî Muhamed e. Kesekî rewşenbîr û oldar e. Kesekî ku li Mahabad tê naskirin e. Dema ku hinek kêsên weke Qazî Muhamed û hinek kêsên din yên weke wî dibin endamên komaleyê, komale gavên mezintir diavêje. Da ku bibe tevgereke civakî. Piştî wê pêwêndiyên wan gel Rûsya pêş dikevin.

Di wê demê de şerê cîhanê berv bi dawîbûnê ve diçe, li cîhanê jî daxwaziya azadiyê zêde bûye. Li ser navê çepê û mafên mirovan daxwaza azadiyê xurt dibe. Ew komele jî li gel Sovyetan danûstandin dikin û daxwaz dikin ku Sovyet alîkariya wan bike û ew hûkimeteke serbixwe çekin. Di heman demê de tevgera gelê Azerî jî, li mintiqaya Tebrîz wan deran pêş dikeve. Ew jî bi alîkariya Rûsya pêş dikevin û daxwaziya hûkimetê dikin. Rûsya qebûl dike û li Tebrîz hûkimeteke

Azerbaycan dûrûst dibe. Dibêjin em hûkimeta Azerî û Kurd destek dikin.

Di heman demê de ew komele gav diavêje û di 1945'an de, xwe dike partî û dibe Partî-Hizbê Demokratî Kurdistan (PDK). Biryar didin ku ew hizba, di demeke kurt de komareke ava bike. Di meha dehan, heya meha donzdehan kar dikin û di hefdehê meha donzdehan ya 1945'an alaya komara xwe bilind dikin. Ji bo vê niha (17-12-1945) kirine roja bilindkirina alê. Di 22'yê meha yeke ya 1946'an de êdî bi fermî komarê îlan dikin. Li Mahabatê Komara Kurdistanê tê avakirin.



**<u>QAZÎ MUHAMED Û ALA MAHABADÊ</u>**

Hinek kes navê vê komarê bi şaştî dibêjin. Dibêjin "Komara Mahabad," navê wê ne Mahabad e. Navê wê Komara (Cumhuriyet) Demokratîk ya Kurdistan e. Navenda wê li Mahabad e, ne ku navê wê Mahabad e. Qazî Muhamed îlanê komarê dike û dibe Serokomarê vê komarê. Pêştî ku Partiya Demokrat ya Kurdistan ava bibe, Qazî Muhamed dibe serokê partiyê. Pişt re jî dibe serokê Komara ku ji sênzdeh wezîran pêk tê.

Komarê Kurdistan, temenê wê texrîben yanzdeh meh in. Piştî ku Komar hate avakirin. Di avrêla 1946'an de dewleta Rûsya û Îran li hev dikin. Lewra şerê cîhanê xilas dibe. Hemû dewlet dixwazin li gorî berjewendiyên xwe encamê ji şer bigirin. Di têkiliyên wan de, mijarên

petrol, aborî ûhwd hene. Di encamê de di avrêla 1946'an de digêhêjin îtîfaqê. Li gorî vê îtîfaqê, Îran mafê karanîna petrola xwe dide Rûsya û Rûsya ji petrolê Îranê îstîfade dike. Di heman demê de îtîfaqên aborî û tîcarî di navbera Îran û Sovyetan de çêdibin. Li hemberî wê Sovyet jî biryar dide ku hêzên xwe ji Îranê bikşîne. Wê demê, li derdora Tebrîz û Ûrmiye hêzên sovyetan hene. Di meha hazîranê de, Sovyet hêzên xwe ji Îranê dikşîne û piştgiriya xwe ji bo komara Azerbeycan û Komara Kurdistanê jî dikşîne.

Dema ku piştgiriya xwe qut kir, ew dibe sedem ku hem komara Azerbaycan, hem jî komara Mahabad tengav bibe. Ji bo vê herdû komar di navbera xwe de hevpeymaneke çêdikin, da ku piştgiriyê hev re bikin. Di heman demê de bi hûkimeta Îranê re jî dikevin têkiliyê. Dibêjin êdî çareseriya me tune, em neçar in ku hûkimeta Îranê re hev bikin. Heya meha tirmehê jî çend caran jî di navbera hûkimeta Îran û van herdû komaran de çûn û hatin çêdibe.

Di encamê van dûnûstendinan de, Komara Kurdistan, daxwaz dike ku weke hûkimeteke otonom bê naskirin. Di serî de weke hûkimeteke serbixwe, xwe îlan dikin. Lê ji ber ku piştgiriya wan nemaye, êdî daxwaziya otonomiyê dikin. Îran vê jî qebûl nake. Ji ber vê êdî di havîna 1946'an de êrîş dibe ser hûkimeta Azerbeycan û hûkimeta Kurdistan. Ew dema ku hevdîtin di navbera hûkimeta Kurdistan û hûkimeta Îranê de çêdibe, ew beşê kes û serok eşîrên ku tevlî komarê bibûn hêdî hêdî jê vedikşin û beşek ji wan diçe gel dewletê û têkiliyan dûrûst dike. Lewra hêviya wan şikestiye. Êdî careke din têkiliyên xwe bi dewletê re datînin.

Dema ku dibinin şah careke din rabûye û têkiliyên xwe bi Rûsya û Brîtanya re rast kirine, beşeke hozên Kurd xwe ji komara Kurdîstan vedikşînin û ji bo komarê lewaziyek çêdibe. Di heman demê de, mintiqaya Bokan hinek şer rû didin. Destpêkê hêzên Kurd hinek ber xwe didin û nahêlin ku hêzên Îran pêş ve werin. Lê bi demê re hem ji bo vekişîna hinek eşîran, hem jî ji bo tûnebûna çek ûhwd nikarin ber xwe bidin. Hêdî bi hêdî hêzên Kurd dişken û heya nêzikî Mahabad paşve vedikşin. Hêzên Îran jî xwe nêzikî Mahabad dikin. Di meha donzdehan de êdî hêzên Îranê digêhêjin nêzikî Mahabad.

Beriya wê Tebrîzê digirin. Jixwe komara Azerbaycan têk diçe. Tene Mahabad maye ji bo girtinê. Hinek eşîr mane, Mistefa Barzanî wan hene. Ew jî ji bo Qazî Muhamed dibêjin, were paşve vebikşin û biçin çiya. Lê li gorî ku di dîrokê de derbas dibe, Qazî muhamed dibêje ez miletê xwe nahêlim. Yên ku dixwazin biçin bila biçin. Bi vî rengî êdî

ew hêzên ku mane jî Mahabad berdidin û bi vî rengî hêzên Îran dikevin Mahabadê.

Bala xwe bidinê; roja ku Serokatî re cizayê îdamê birîn, roja ku Şêx Seîd hatiye îdamkirin e. Komploya li ser Şêx Seîd çêbûye û serhildanê destpê kiriye, roja 13-15 şibatê, di heman demê de roja komploya navnetewî ku li ser Serokatî hatiye çêkirin e. Dewletên serdest, van tiştan ji xwe re weke dîrok digirin dest. Li Rojhilatê Kurdistanê jî, di hefdehê meha donzdehemîn de alaya Komara Kurdistanê rakiribûn. Wê demê serokê arteşa Îranê ku êrîşî Mahabad dike, Hûmeyon e. Hûmeyon 2-3 roj berê hefdehê mehê digêhêje ser Mahabad û Mahabadê jî êdî parastina wê nemaye. Dikare bikeve Mahabadê, lê nakeve Mahabadê. Fermandarên wî dibêjin, niha parastin ûhwd tune, çima em nakevinê? Ew jî dibêje, “wan li hefdehê meha donzdehan alaya me danîne û alaya xwe hildana. Ji bo ku ew roj ji bo wan nebe rojeke bîranîneke xweş, em jî di hefdehê meha donzdehê de dikevin Mahabatê û ala wan datînin û ala xwe bilind dikin.” Yanî ji bo ku ew roj êdî naye bîranîn. Bi vî awayî di hefdehê meha donzdehê de ala Komara Kurdistanê datînin û ala Îranê bilind dikin.

Qazî Muhamed û hevalên wî yên ku li wir mane, desgirtî dikin. Pişt re wan didarîzînin û di sî û yekê meha sê ya 1947’an de, li meydana Çarçira tên îdam kirin. Qazî Muhamed, Seyfî Qazî û Sadrî Qazî li ew meydana ku komar lê hatibû avakirin tên darvekirin. Bi vî rengî Komara Kurdistanê tê xirab kirin.

Bingeha Komara Kurdistan, Komeleya Jiyanewî Kurdistan çêkir. Heya 1947’an berdewam kir. Texrîben bi giştî çar-penç salan berdewam kiriye. Di wê demê de gelek rojname û kovar li Rojhilatê Kurdistanê derdikevin. Radyoyê Komarê tê vekirin. Mektebên Kurdî pêş dixin. Kurd li her çar parçayên Kurdistanê diçin û tevlî Komarê dibin. Bi vî rengî Komar dibe hêviyeke mezin ji bo giştî xelkê Kurdistanê. Di vê serdemê de, careke din hîzb û hêzên Kurdistan îtîfaqan çêdikin.

Di sala 1944’an de, li Çiyayê Dalamper bi tevlêbûna rêxistinên çar parçeyên Kurdistanê, civîna “sê sînor” tê darxistin. Ew çiya tam dikeve qûncikê sê sînoran û “Rêketina (peymana) Sêsînor” li wir îmza dikin. Niha weke gava yekem ya rêxistinbûna kongreya yekemin tê bi nav kirin. Di navbera hizba Komaleya Jiyanewî Kurdistan li Rojhilat, hizba Hîwa li Başur û Komaleya Xoybûn li Bakur û Rojava de tê darxistin. Armanca wan, bi piştgiriya hev serxistina armancên Kurd e. Di serdema amadekariyên ku Komara Kurd tên kirin de, ew peyman tê îmza kirin.

Di dema komarê de, rêxirawî (rêxistinbûna) ciwan û jinan çêdibe. Di pêşêntiya Mîna Qazî de rêxirawî jinan çêdibe û perwerdeya jinan li Kurdistanê pêş dikeve. Bi vî rengî di demeke kurt de xebateke rewşenbîrî, civakî û siyasî li Kurdistanê pêş dikeve. Hêzên leşkeri dûrûst dibin, lê pişt re diyar dibe ku kêmasî hebûn.

Arteşa komarê hate dûrûstkirin. Ji bo fermandaran pirpirkên dereceyan jî hate dayin. Çar kes dibin general; yek ji wan Mistefa Barzanî ye. Bala we kişandibe hê jî carna dibêjin General Mistefa Barzanî. Li ser pergala arteşbûnê ew kar kirine. Eşîrek anîne, hêza wan hemû tevlê kirine, li gorî wê hêza wan jî rûtbe dane serokeşîr. Wê demê çar kesan hêzên wan zêde bûne, rûtbeya generaltiyê dane wan. Yek ji wan Mistefa Barzanî ye. Yek Hamereşîdxanê Banê ye, yek Omerxanê Şikak e, yek jî Seyfî Qazî ye. Yek jî bûye mareşal, ew jî serokê hozê Herkî, Zero Behadîrî ye. Lê ji ber ku arteş li ser esasê eşîrtiyê hatiye dûrûstkirin, arteşeke xurt nîne. Dema ku êrîş tê ser Komara Kurdistanê; hê êrîş nebûye hinek wan çûn, dema ku êrîş bû hinekên wan çûn û di dawiyê de jixwe tu kes neman. Ew kêmasiyeke Komara Kurdistanê ye. Ji ber ku pergal li ser esasê eşîrtiyê ye, dema ku serokeşîr şer neke jixwe tu kes namîne. Mirov van weke kêm û kurtî binirxîne.

Ya din, Komarê pişta xwe bi Sovyetan ve girêdabû. Têkilî ne xirab in, lê li ser esasê bawerkirina Sovyetan xwe avakirin, lê dema ku piştgiriya yekitiya Sovyetan nema, êdî Komara Kurdistanê careke din berê xwe da Îranê. Gelek kes dibêjin, berê xwe dayina Îranê û çûyina Qazî Muhamed ya Tahranê, her kes bêbawer bû û komar têk çû. Ew weke mijara rexneyan tên ziman. Lê di netîceyê de Komara Kurdistanê, di sedsala bîstemîn de ezmûneke girîng bû. Rewşenbîrî, siyasetmedarî pir bû, demeke kurt bû, lê hêviyeke mezin çêkir. Lê ji ber ku pergala siyasî ya cîhanê baş nehat analîzkirin û pêşêngtiya rêbertiya tevgere têgihêştî ku her tiştî bikaribe hesap bike nebû, nikarî ser bikeve. Mirov dikare bi vî rengî binirxîne.

Piştî ku Komara Kurd têk çû, tevgera Kurd bi giştî gurzek xwar. Bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê gurz xwar. Êdî tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistan lewaz bû. Hinek hatin girtin, hinek çûn sêdarê, hinek reviyan û çûn Başurê Kurdistanê. Yên mayî jî hatin bêdengkirin. Heya salên 1952-3'yan wisa berdewam dike. Lê wê demê tevgereke demokratik li Îranê pêş dikeve.

Wê demê Muhamed Musadiqî heye, dibe serokwezîrê îranê. Kesekî demokrat e, dixwaze Îranê berv bi demokrasiyê ve bere. Jixwe piştî şerê cîhanê yê dûyemîn tevgrên çep li cîhanê pêş dikevin. Ew jî li

hemberî Brîtanya helwest datîne. Li hemberî Şah jî helwesteke wî heye û dixwaze hinek guhertinên demokratîk çêbike. Dixwaze serweriya Brîtanya li Îranê kêm bike, paşayê Îranê jî di asteke sembolîk de bihêle. Tevgereke bi vî rengî jî pêş dixe. Lê bi sedema piştgiriya dewletên weke Brîtanya û Amerîka ya Şah re, Muhamed Musadiqî tê girtin.

Di wê demê de, hem tevgerên çep di pêşengtiya tevgera Tûdeh de pêş diketin, hem jî tevgerên Kurd xwe nû dikirin. Lê mûdaxaleyên hêzên weke Brîtanya û Amerîka dibe sedem ku careke din hêzên Kurd tengbûnê jiyan bikin. Piştî salên 1954-5'an hinek kes dixwazin hizbê demokrat ji nû ve zindî bikin. Di nava wan de kesên tên naskirin; Abdurahman Qasimlo, Ahmed Tewfîq, Xanî Bilûryan û Celîl Gedanî ye. Hinek hewldanên wan yên veşartî hene, qomîteyeke çêdikin û hin xebatan pêş dixin.

Ji bo rêxistina hevkar hewl didin pêşveçûneke pêş bixin. Abdurahman Qasimlo dibe berpirsyar û yek jî dibe alîkar û dest bi kar dikin. Pişt re dixwazin têkiliyên xwe bi tevgera Tûdeh û tevgerên din yên çep re pêş bixin. Di wê demê de diyar e ku hinek pirsgirek di hûndirê wan de derdikevin. Ew dibe sedem ku Abdurahman Qasimlo ji erkê bigirin û Ehmet Tevfîq bikin berpirsyar. Di heman demê de êrîşên dewletê jî li ser wan hene.

Hejmareke kadroyên wan tên girtin, hinek jî berê xwe didin Başûrê Kurdistanê û li wir dixwazin bi cih bibin. Jixwe Abdurahman Qasimlo derketiye derve, Ehmed Tewfîq cîgir e. Di heman serdemê de li Iraqê komarek demokratîk tê îlankirin û Mele Mistefa Barzanî ji Rûsya dizivire. Mafê Kurdan dan, nasnameya Kurdan nas kirin û zemînekî din li Iraqê çêbû. Ehmed Tewfîq û kadroyên hizba demokrat dixwazin ji vê parzemînê sûd werbigirin. Careke din dixwezin xwe komî ser hev bikin û bikevin tevgerê. Heya 1963'yan hejmareke zêde ya kadroyên hizba demokrat li Başûrê Kurdistanê komî ser hev dibin. Di 1964'an de kongreya xwe dar dixin, Ehmed Tewfîq dikin serok û rêveberiyeke nû çêdikin. Biryar didin ku li Rojhilatê Kurdistanê dest bi kar bikin. Ew hewldanek nû ye.

Di sala 1959-60'î de li cîhanê peleke guhertinê heye. Li Iraq û Tirkiyê hin guhertin çêdibin. Wê demê Amerîqa ditirse ku pergala Îranê de jî guhertin bibe. Li Tirkiyê înqilap çêdibe, li Îranê Înkilap çênabe; lê hin guhertin çêdibin. Pê re dibêjin şoreşa spî. Şoreşa spî çi ye? Ji aliyê rewşenbirî, siyasî û civakî ve hinek qanûnan derdixin û hinek vebûnê çêdikin. Beşeke ji van guhertinan Kurd jî jê îstîfade dikin. Di wê demê de cara yekemîn li Îranê radyoyê Kurdî bi awayekî fermî çêdibe. Di

destpêkê li Tahranê, pişt re Kirmanşanê û hêdî bi hêdî li bajarên din jî radyo tên vekirin. Stran û çanda Kurdî ji qedexebûnê derdikeve. Hêdî hêdî ew konevaniya bişavtinê kêm dikin. Hasan Zîrek jî, hûnermendekî ku ji Rojhilat reviyaye û li Radyoyê Bexda kar dike ye. Ew jî dizivire û gelek stranên xwe li radyoyê Tahran û Kirmanşanê qeyd dike. Strana newroz li wir dibêje. Di wir de hin tişt guhertine, ji ber wê rewşenbîr wî rexne dikin.

Di wê demê de, li Îranê ew derfetan hene. Tevgerên Kurd yên Rojhilat jî bi vê derfetê dixwazin xwe nû bikin. Lê PDK di hûndirê xwe de yek nîne, lewaziyan jiyan dike. Abdurahman Qasimlo li derve ye û hinek kes girêdayî wî ne. Lê kongre dixwaze wî li partiyê biavêje. Dibêjin ew kesekî çep e û Tûdehê ve girêdayî ye û Kurdiniyê nake. Ew pirsgirekek e. Dîsa pirsgirekên serokiyê hene. Ji ber vê di 1964’an de xwe amade dikin ku gav biavêjin lê nikarin. Piştî 1965’an têkiliyên PDK ya Başûr li gel Îranê çêdibe. Hê jî heye, lê kêm e.

Jixwe 1964’an de PDK ya Başûr parçe dibe. Beşeke wan Barzanî serokatiyê dike û pê re dibêjin cemeata serok. Beşeke jî Celal Talabanî û Îbrahîm Ehmed pêşêngtiyê pê re dike. Pê re dibêjin cemeatê mektep-siyasî. Dibin dû beş û pişt re şer di navbera wan de çêdibe. Di şer de Barzanî zîrektir e. Ji ber vê Talabanî wan Iraqê terk dikin û diçin Îranê û gel hûkimeta wir.

Di sala 1965’an de Barzanî têkiliyên xwe bi Îranê re pêş dixe û dixwaze Îran alîkariya Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî wan neke û wan radestî Barzanî bike. Îran jî dibêje timam, ez ê bikim. Lê dibêje pêwîst e tu jî, piştgiriya Hizba Demokrat ya Kurdistanê (PDK-Î) li Îranê nekê û an wan radestî min bikî, an jî wan bêçalak bikî. Hevkiri-neke bi vî rengî di navbera wan de çêdibe.

Îran, ji Celal Talabanî wan re dibêje, êdî têkiliya min gel Barzanî çêbûye. Hûn dixwazin biçin gel Barzanî, an jî li vir rûnin û li hemberî Barzanî kar nekin. Ger hûn dixwazin jî biçin derve. Barzanî jî ji Hizba Demokrat ya Îranê re dibêje, pêwîst e hûn li vir rûnin. Ger hûn rûnenin jî pêwîst e hûn biçin Îranê. Bi vî rengî heya 1967’an çalakiyên hizba Demokrat çênabin. Jixwe çalakiyên wan yên leşkerî tune, lê dev ji yên siyasî jî berdidin. Di wê demê de, di nava Hizba Demokratê Kurdistan ya Îranê de, grupek derdikeve. Navê wan “Komîteya Rêvebertiya Şo-reşger e.” Endamên wan yên tên naskirin, Sûleymanê Muîînî, Îsmaîl Xerîbzede, Mele Aware, Mihoyê Herkî ye.

Her wiha hejmareke zêde ciwan û hizb dibêjin, em vê rewşe qebûl nakin û em dixwazin li Îranê xebatên xwe bimeşînin. Pêwîst e, PDK ya

Başûr ji vê re nebe asteng. Jixwe Ehmed Tewfîq, di bin çavdariya PDK de jiyan dike. Ji kadroyan hatiye dûrxistin. Dibêjin ji bo ku em biparêzin, me biriye wir; lê yên din jî dibêjin birine û kirine zindaneke bi hûrmet û ji rêxistinê qut kirine. Bi vî rengî, êdî hizba demokrat nikare kar bike.

Ji ber vê yên din dibêjin, êdî em vê rewşê qebûl nakin. Li Qendîlê şervan û peşmergeyên xwe kom dikin û biryar didin ku li Îranê dest bi xebatên xwe bikin. Wê demê PDK bangî wan dike û dibêje ger hûn rûdinin baş e, an na ez we hemûyan dişinim Îranê. Bi vî rengî kom bi kom xwe rêxistin dikin ku biçin Îranê, lê di demeke kin de ew komana hemû tasfiye dibin.

Niha li gorî dîrokê nêrînên cuda hene. Hinek dibêjin, danehevên wan kêm bûn, xwe amade nekiribûn, baş kêşf nekiribûn û bi vî awayî çûn kare siyasî û leşkerî bimeşînin. Hikûmeta Îranê jî bi tevdîr bû, ji ber vê tasfiye bûn. Hinek jî dibêjin, wê demê têkiliyên parastina PDK, li gel îstîxbarata Îranê Savak hebû. Ango PDK ew îxbar kirine.

Tene Sûleymanê Muîînî naye tasfiyekirin. Çend caran diçe Rojhilat û vedigere jî, herî dawî Îran ji PDK dixwaze ku wî radestî Îranê bike. Lewra nasekine. Wê demê Sûleymanê Muîînî, ji ber PDK direve û diçe Sûleymaniyê, li wê derê zêdetir tesîra Talabanî wan heye. Li wir xwe amade dike ku careke din vegere û biçe Rojhilat, lê bi riya hinek kesan tê girtin û radestî PDK dikin. Wê demê Barzanî li mintiqaya Dîlman e. Dîlman jî nêzikî Balayan, li mintiqaya Qendîlê ye. Sûleymanê Muîînî dibin gel wî. Li gorî belge û şahîdên heye; wê demê Îdrîs Barzanî û nûnerê Savakê jî li wir bûye. Jê re gotine rûne û radestî Îranê bibe, jixwe Îranê jî ji efû derxistibû. Lê ew radest nebûye. Li ser vê esasê piştî ku nîqaşên wan xilas bûne, derketiye û birine ku zîndanî bikin. Nêzî gundekî herêma Balayan wî dikûjin û cenazeye wî radestî Îranê dikin. Li Pîranşarê rojekê nîşanî gel didin, pişt re dibin Mahabadê jî hinek digerînin.

Pirtûka Dîroka Barzanî dibêje, Sûleymanê Malînî mirovekî zîrek bû, lê ji ber ku li gel Talabanî wan bibû caş, em neçar man ku wî bikujin. Dibêjin sedema kûştina wî ew bûye. Lê li gorî hinek kêsên din ku şahîdî bûyerê ne û niha ji PDK qut bûne, dibêjin di encama peymana PDK û Îranê de çêbû. Li ser vê esasê ew kûştin da ku tevgera Kurd careke din li Rojhalat zindî nebe. Lewra ji bo ku Îran alîkariyê bide PDK û wê li ser piyan bigre ew şert danîbû pêşaya wê. Li ser vê esasê Ehmed Tewfîq binçavkiribûn û di bihara 1968'an de jî Sûleymanê

Muîînî kûştin. Bi vî rengî ew tevger jî tê tasfiyekirin. Heya 1971’an li Rojhilatê Kurdistan bêdengiyek heye.

Di sala 1968-9’an de li cîhanê tevgerên çep û ciwan li pêş dikevin. Li Tirkiye, Iraq û Îranê jî tevgerên çep pêş dikevin. Li Îranê Tûdeh hinek xwe pêş dixe, hinek jî tevgerên Kurd xwe nû dikin. Di 1969’an de bi awayekî veşartî “Komaleya Zehmetkeşanê Kurdistan” çêdibe. Ew komale di pêşengtiya Fuat Sultanî, HemaHusên Kerîmî, Evdilah Mûhtedî, Îbrahîmî Alîzade de tê avakirin. Hinekên wan niha jiyan jî dikin. Pêşengê wan yê esasî Fuat Sultanî ye. Ciwan in, temenê wan di wê demê de di navbera bîst û çar û bîst û pencan de ye. Li Rojhilat, hêdî hêdî dest bi xebatên Kurdîniyê û çepgiriyê dikin.

Di 1971’an de bi navê Çirîkî Fedaî komek çêdibe. Ew jî xebatên partîzaniya biçûk pêş dixin. Dîsa hîzba demokrat dixwaze xwe nû bike. Li Başûr jî, PDK otonomî ji hikûmeta Iraq girtiye. Heya Kerkûkê hakîm e. Di vê demê de Abdurahman Qasimlo, ji Ewropa vedigere û tê Kurdistanê. Kongreyeke hevpar hewl didin ku çekin. Ehmed Tewfîq tevlî vê kongreyê nabe. Sedema wê pir ne zelal e. Ji 71’an, heya 72’yan hinek civînan û kombûyinan dardixin. Di 72’yan de kongreya xwe dar dixin û biryar didin ku Abdurahman Qasimlo bikin serok.

Ji ber ku Ehmed Tewfîq tevlî kongreyê nabe, biryar didin ku wî ji partiyê biavêjin û bixin lêpirsînê. Jixwe dibêjin ew çend salin rista xwe nelîstiye. Pişt re Ehmed Tewfîq, ji aliyê hûkimeta Iraqê ve tê girtin û tê windakirin. Hinek dibêjin hatiye kûştin, lê hinek jî dibêjin çi bûye ne diyar e. Iraq wî bi hevkariya darbekeran kiriye tohmet dike. Hinek kes guman dikin ku sedema girtina wî, nakokiyên di navbera wî û Abdurahman Qasimlo de be. Lewra pêwîndiyên Abdurahman Qasimlo bi Baisiyan ve baş bûye. Hinek bi vî rengî nêrîn didin û dibêjin sedem ew e. Ji bo ku Abdurahman Qasimlo bikaribe seroktî û karê hizba Demokrat bimeşîne. Lê ew ne bi belge ye.



**ABDURAHMAN QASIMLO**

Ji sala 73'yan û şûn ve hêdî hêdî hîzba demokrat dixwaze xwe komî ser hev bike. Ji 75-76'an û şûn ve piştî ku di navbera Iraq û Îranê de Peyman tê mor kirin û wisa berdewam dike. Lê piştî vê Îran bi rewşeke nû re rû bi rû dimîne. Têkiliyên Îran û Rûsya hinek pêş dikevin, li hemberî vê Brîtanya û Amerîqa li hemberî Şah helwest datînin. Piştigiriyê didin tevgerên civakî yên li Îran. Jixwe êdî tevgerên siyasî û civakî li wir pêş dikevin.

Di wê demê de, tevgerên Kurd (Komaleya Zehmetkeşan, Fedaî, Hizba Demokrat) jî zemîna xwe pêşxistinê dibinin. Heya 1978'an wisa berdewam dike. Jixwe wê demê li Îranê şoreşa gelan çêdibe, pergal ji deste şah tê girtin û pergaleke nû tê avakirin. Di wê demê de, tevgerên Rojhilatê Kurdistanê jî, beşeke Rojhilat, ji Ûrmiyê heya Kirmanşan xistin deste xwe.

Wê demê hemû tevgerên Rojhilat; Komaleya Zehmetkeşan, Fedaî, Hizba Demokrat û Sazûmana Xebat bi hev re kar dikirin. Bi hûkimeta Îranê re jî ketin nava têkiliyan da ku mûhtariyeta Kurdan qebûl bike. Hûkimeta Îranê heya tirmeha 1979'an li gel Kurdan danûstendin kir, lê ne amade bû ku mûhtariyetê qebûl bike.

Di avrêla 1979'an de hûkimeta Îranê referandûma Komara Îslamî îlan kir. Destpêkê navê komarê ne Îslamî bû. Şoreş çêbûbû, digotin şoreşa gelên Îranê. Lê dema ku referandûmê çêdikin, Kurd dibêjin ne dema wê ye û tevlê nabin. Lê yên ku tevlê dibin, piranî dibêjin bila Îran bibe Komara Îslamî. Çep jî boykot dikin. Jixwe yên dimînin jî bi piranî komara Îslamî dipêjirînin. Bi vî rengî Komara Îslamî tê qebûl kirin. Piştî vê jî demekê têkiliyên Kurdan û hûkimetê berdewam dikin, lê encam nagrin.

Di tirmeha 1979'an de hûkimeta Îranê biryar dide ku êrîşî Kurdan bike. Lewra bajarên Kurdan ku beşeke Îranê ne, ne di bin serweriya Komara Îslamî de ne. Vê qebûl nakin û êrîş dikin. Di vê serdemê de PDK ya Başûr jî li Rojhilat in. Jixwe têk çûbûn û navenda wan çûbû Rojhilat. Heta sala 1979'an li wir bûn. Mele Mistefa Barzanî jî, di bihara 1979'an de li Amerîqa wefat kir. Cenazeye wî jî anîbûn Rojhilatê Kurdistan.

Dema ku hikûmeta Îranê êrîşî hizba Demokrat ya Rojhilat û tevgerên din yên Kurd kir, PDK jî li wir piştgiriya Îranê kir. Hevalên ji Rojhilat in û gelê Rojhilat vê dizane, ji bo ku Îran piştgiriya PDK ya Başûr bike; bi alîkariya PDK, Îranê tevgerên Kurd ji bajarên Rojhilat derxistin. Tene hinek gundên sînor di destê wan de man. Van tevgeran êdî xwe kişandin milê sînor. Ew di dîrokê de, weke rexneyek ji PDK tê

kirin. PDK ew alîkariya xwe bi van sedeman dinirxîne. Yek dibêje dema partiyên Rojhilat, bi hikûmeta Îranê re danûstendin kirin, daxwazeke wan jî PDK ya Başur ji Rojhilat derxistin bû. Dibêjin li ser vê esasê me şerê wan kir. Sedemeke din jî dibêjin, me cenazeyê Mele Mistefa ji Amarîka anî û li Rojhilat veşart; lê Hîzba Demokrat ya Rojhilat çûne cenazeyê wî derxistine û bêrêzî pê kirine.

Tevgerên Rojhilat jî dibêjin sedem ne ew e; lewra ne kesî bêrêzî bi cenazeyê Barzanî kiriye, ne jî kesî xwestiye PDK ji Rojhilat derbixe, ew çîrokên PDK ne. Sedema rast, PDK berê rêxistineke şah bû. Lê şah ket û komara Îslamî hate avakirin, PDK ji bo ku xwe ji Komara Îslamî re îspat bike, ew kar kir. Ew jî wisa dibêjin. Ew heya demekê bibû pirsgirek. Lê niha ew tevgerên Rojhilat piraniya wan, ew bîr kirine.

Heya 82'yan dîsa beşeke zêde gund û herêmên çiyayî yên Rojhilat di destê hizbên Rojhilat de bûn. Hûkimeta Îranê bajar kontrol dikirin, lê ne dikarî gundan kontrol bike. Partiyên Rojhilat pevçûn û têkoşîn dikirin. Da 82'yan de hûkimeta Îranê li hemberî van hizban êrîş û operasyonên mezin kirin. Dîsa PDK alîkariya hûkimeta Îranê kir. Heya ku partiyên Rojhilat ji Rojhilat derxistin û piştî 83'yan li Başûr bi cih kirin. Hevalên çûne Qendîlê dizanin, Hizba Demokrat li Qendîlê hat bi cihkirin. Li gundê Lewjе û Enze kampê wan hebun. Niha jî hinek qampên wan mane.

Hizba Komaleyê jî li mintiqaya Bohtê hatin bi cihkirin. Hûkimeta Iraqê li wir cih da wan. Êdî partiyên Rojhilat li sînorên Rojhilat hatin dûrxistin. Piştî wî van partiyan dem bi dem dûçin çalaki dikirin û vedigeriyan. Bi vî rengî xebatên çekdarî û siyasî li Rojhilatê Kurdistan darbeyek xwar û lewaz bû.

Hûkimeta Îranê, di wê serdemê de ket şerê Îraqê. Ji sala 80'î heya 88'an şer di navbera Iraq û Îranê de hebû. Iraqê li gelek dewletên navnetewî alîkarî digirt, lê Îran li ser lingê xwe dimeşiya û ji ber vê tengav dibû. Di 87'an de hikûmeta Îranê ji bo ku bikaribe Kurdan qezenc bike, hinek gav avêtin. Di televizyona Sahar de beşa Kurdî vekir. Dîsa radyoyê Kurdî vekir. Ew radyoyê Kirmanşan wan girtibûn berê. Giranî da ser radyoyên Kurdî û li gelek bajarên Kurdan radyo vekirin. Bi vî rengî dixwastin gelê Kurd bikêşin aliye xwe. Ji aliye din ve siyaseta Besîçkirinê dimeşandin. Çawa li Bakûr Korucu hene, ew jî pergaleke wisa ye. Bi vî awayî dixwest civaka Kurd jî qontrol bike.

Di sala 89'an de di bin navê danûstendinan de, têkiliyên wan bi hizba Demokrat re pêş dikeve. Hinek têkiliyên wan li gel Abdurahman Qasimlo hene. Lê di wan danûstendinan de Abdurahman Qasimlo,

hevalekî wî û kesekî YNK'î ku bûye navbendger qetil kirin. Di 89'an de li Viyana, Abdurahman Qasimlo hate qetilkirin. Berî ku Abdurahman Qasimlo bê qetilkirin, Hizba Demokrat parçe bû.

Mijareke din ku mirov girîngî bide, dema ku di 79'an de di navbera Kurd û hikûmeta Îranê de şer çêbû, nakokî ketin navbera Hizba Demokrat û Komela û êdî şerê hev û din kirin. Dem bi dem şerê hev kirin. Yanî ew nexweşiya li Başûr ku di navbera PDK û YNK de hebû derbasî wir bû. Hizbê Demokrat jî di 88'an de bû dû beş. Bi vî rengî rêxistinên Rojhilat heya salên 92'yan berv bi lawazbûnê ve çûn.

Sadiqê Şerefkendî, hat cihê Qasimlo û ew jî li Almanya di 92'yan de hate qetilkirin. Jixwe Komeleya zehmetkeşan ku gelek bandor li ser gele Rojhilat kiriye, di salên 78 û 79'an de dû zarbe xwarin. Yek kadroyên wan pêşeng HemaHûsên Kerîmî hat şehîd kirin. Di 79'an de jî rêberê wan Fuat Sultan hat şehîd kirin. Bi vî rengî xebat û têkoşînên Kurdiniyê yên Rojhilatê Kurdistanê ber bi lewazbûnê ve çûn. Vê rewşê heya sala 92'yan berdewam kir.



**ŞEREFKENDÎ**

Weke tê zanîn di salên 91-92'yan de li Başûr serhildanên gel hebûn û hûkimeta herêmê çêbû. Berî ku hûkimeta herêmê çêbibe, Îran û Tirkiyê pir li dijberî vê bûn. Ji ber vê li ser PDK û YNK zext çêdikirin, digotin pêwîst e hûn hilbijartinan çênekin. Parlemento û hûkimet çênekin. Heya çend mehan di navbera wan de danûstendin çêbûn û herî

dawî Îran û Tirkiyê qebûl kirin ku li Başûrê Kurdistanê hikûmet çêbibe. Amerîka û Fransa zêdetir ew hûkimet dixwestin. Ji bo ku li hemberî Iraqê bikaribin siyasetê bimeşînin, cihekî weke Kurdistanê ji wan re pêwîst dikir. Ger hûkimet jî çênebe, dibe ku belavebûn hebe. Lê divê ne mayinde bi demî bûya.

Îran û Tirkiyê jî di dawiyê de qebûlkirin, lê şertên wan hebûn. Yek, ew hûkimeta ku çêbibe divê mayinde nebe, tenê heya ku Sadam bê rûxandin berdewam bike. Ango dema ku Sadam hate rûxandin, divê ew hûkimet nemîne. Duyem, ew hûkimeta ku çêdibe divê rê nede ku rêxistinên Bakur û Rojhilat ji vê hûkimetê sûd werbigirin û li dijî van dewletan şer û têkoşîna xwe pêş bixin. Ew dû şertên esasî bûn.

PDK û YNK jî ew şert qebûl kirin. Li ser vê esasê 19'ê Gulana 1992'yan de hilbijartin li Başûrê Kurdistanê çêbûn. Ew jî dîrokeke balkeş e. Di tirmehê de hikûmet hate çêkirin. Dema ku hûkimet çêbû, daxwaz ji PKK, Hizba Demokrat, Komaleya Zehmetkeşan û partiyên din yên Rojhilat kir ku xebatên xwe yên çekdarî an bidin sekinandin, an jî sînorên Başûrê Kurdistanê nedin xebatindin. Li ser vê esasê, ji van partiyan re ket danûstendinan û hizbên Rojhilat ew daxwaz qebûl kirin. Gotin, ji bo ku hikûmeta herêmê zirar nebine, êdî em şer nakin û sînoran ber didin.

Wê demê hûkimeta Herêmê Hizba Demokrat, ji herêma Qendîl girt û bir mintiqaya Koy Sancakê. Li wir wan re qamp çêkirin û li wir cih kirin. Komaleya Zehmetkeşan jî ji mintiqaya Bohtê girtin û birin mintiqaya Sûleymaniyê. Di salên 93'yan de ew li wan deran bi cih kirin. Hizbên din yên Rojhilat ji ber ku hêzên wan kêmtir bûn, ew li nava bajêr de cih kirin. Bi vî rengî hizbên Rojhilat ji sînoran hatin dûr xistin.

Heya salên 96'an dîsa car caran diçûn hin çalakiyên veşartî dar dixistin û dihatin. Lê dema ku di 96'an de, di navbera YNK û Îranê de îtîfaqeke stratejik çêbû bi giştî hatin sekinandin. Dixwazim di vir de balê bikşînim ser tiştekî. Heya 86'an têkiliyên Îranê bi piranî ji PDK'ê re bûn, bi YNK'ê re an pir kêm bûn, an jî qet tûnebûn. Mesela dema ku 79'an de Îranê êrîşî partiyên Rojhilat kir, YNK alîkariya partiyên Rojhilat kir. PDK jî alîkariya hikûmeta Îranê kir. Di 82'yan de dîsa wisa.

Ji sala 86'an û şûn ve êdî têkiliyên YNK jî bi Îranê re çêbûn. Heya 96'an PDK û YNK herdu jî mûtefîqên Îranê bûn. Piştî 96'an dema ku YNK bi Tirkiyê re hevkarî kir û PDK bi alîkariya hikûmeta Bexda Hewlêr ji YNK girt, YNK jî îtîfaqa xwe bi Îranê re xurt kir. Ew nozdeh

salin, Îran û YNK bûne mûtefîqên stratejîk; lê PDK hinek ji Îranê dûr ketiye û çûye êniya Tirkiyê. Rewş bi vî rengî ye.

Piştî 96'an ji ber ku YNK bû mûtefîqê stratejîk yê Îranê û sînorên Rojhilat jî bi piranî di destê YNK'ê de ne, êdî YNK nehilişt ku partiyên Rojhilat hereket bikin. Ew bû sedem ku hinek partiyên Rojhilat berê xwe bidin PDK. Niha jî zêdetirî tevgerên Rojhilat bi PDK re tevdigerin. Her çiqas PDK şerê wan kiribe jî rewşeke bi vî rengî pêş ket.

Tevgera me jî piştî salên 83-4'an li ser Rojhilat tesir dike. Bi taybetî mintiqaya Tilgever, Ûrmiyê wan deran tesîra tevgera me çêdibû. Piştî salên 90'î hêdî hêdî li vê mintiqayê tevlîbûna tevgera me jî çêdibû. Lê kêm bû. Piştî salên 95-6'an li Ûrmiyê, Salmas û heya Xoy tevlêbûna tevgera me zêde bû. Têkiliyên tevgera me li herêmên Erdelan û Mûkriyan wan deran jî pêş ket. Piştî 98'an jî têkilî bi herêmên Xorasan û Kirmanşah wan deran re pêş ket.

Wê demê tevgera me vekirin çêdikirin, li Rojhilatê Kurdistanê jî valatiya siyasî hebû, ji ber vê jî tesîra tevgera me zêde bû. Heya 99'an dema ku Serokatî hate girtin; hem ji ber êşa girtina Serokatî, hem ji ber tesîra tevgera me, hem jî ji ber valatiya siyasî ya li Rojhilat teqînek çêbû. Beşeke zêde yên ciwanên Rojhilat, berê xwe dan tevgerê û tevlêbûn. Ji ber vê ji bo ku li Rojhilatê Kurdistan têkoşîna Kurdînî hinek zindî bibe, hinek xebat hatin pêş xistin.

Ew ciwan û xebatkarên ku tevlêbûne, heya 2004'an amadekarî kirin. Di 2004'an de Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) hat damizrandin û heya roja îro ew xebat pêş ket. Xebata jinan, di çarçoveya KJAR de; xebatên ciwanan di çarçovêya KCR de; xebatên pergala civakî di çarçoveya KODAR de; xebatên parastinê di çarçoveya YRK de pêş ketin. Di van donzdeh salan de ew xebat gihêştine astekê.

Piştî 2004'an ew tevgerên din yên Rojhilat jî xwestin hinek bikevin tevgerê. Lewra valatiya siyasî hebû, li Rojhilata Navîn guhertin hebûn. Van guhertinan tesîr li ser Rojhilatê Kurdistanê jî kir. Lê ew tevgerên ku li Rojhilat berê hebûn, her çiqasa xwestin ku gav biavêjin jî, ji ber ku ew demeke ji têkoşînê qut bûne û girêdana wan bi deshilatdariya Başûr re heye û çavên wan li derve ne, nikarin têkoşîneke bimeşînin. Her wiha ew dibin asteng ku ew tevger bi PJAK û KODAR'ê re jî helwesteke hevbeş dûrûst bikin.

Van tevgerên Rojhilatê Kurdistanê, ji 92'an û vir ve roj bi roj lewaz û parçe bûne. Mesela Sazûman û Xebat hebû, parçe bû û du tevger jê derketin. Yekîtiya Şoreşgeran wê demê çêbû, dîsa ji wê du rêxistin derketin. Hizba Demokrat, di 88'yan de bû du beş, di 97'an de care-

ke din hev girtin, lê di 2005'an de dîsa parçe bûn. Komeleya Zehmetkeşan, di 2000'an de bû du beş; di 2005'an de bû çar beş. Niha jî sê beş in. Bi vî rengî lewaz û parçe bûn.

Heya asteke hê jî tesîra wan li ser civakê heye, lewra salên dirêj di nava civakê de kar kirine, lê niha nikarin bibin bersiv. Her wiha ne amadene ku tevgerên me yên Rojhilat re jî kar bikin. Bi giştî ji bo Rojhilat mirov dikare van tiştan bibêje.

…: Ew tevgera ku hatiye li qadên parastina Medya kîne û di demên pêş de têkiliyên me bi vê tevgerê re li ser kîjan esan bin?

…: We got, bi xwesteka Îran û Tirkiyê PDK û YNK ji hemû tevgerên Bakûr û Rojhilat xwestine ku têkoşîn nekin, wê demê helwesta tevgera me çi bû?

…: Qesî ku min bihîstiye, dibêjin dema ku tevgera me cara ewil derbasî Ûrmiyê wan deran dibe, têkilî li gel Hizba Demokrat hebûne. Yek jî dijber sekinîna Qasimlo hebûye, di vê derbarê de agahiyeke zelal heye?

…: Ew caşên 66'an hene û bertekeke wan ya tûnd li hemberî YNK heye. Yek jî ew aşbetal û îxaneta Barzanî hûn dikarin hinekî din vekin. Yek jî dibêjin navberekê Qasimlo wan ji eşîra Menguran çek didin hilgirtin û pişt re kom dikin, bertek derdikevin. Hûn dikarin vê hinekî vekin. Rastiya vê çiqasa heye?

**H. Helmet:** Hêzên ku niha hatine mintiqaya Helgurt, wê rojê em çûn û em qederekê axifîn. Ew demeke Amerîqa û hêzên hevpeyman dixwazin şerekî li ser Îran dûrûst bikin, ji aliyekî ve hevpeymana wan ya atomî hebû, ji aliyekî ve jî şer dûrûst dikin. Ji 2004-5'an ve jî dixwazin mûdaxaleyeke wisa bikin û hinek alîkarî jî didin tevgerên Rojhilat. Lê ew proje jî ser neket.

Vê dawiyê jî bi riya PDK xwestin hinek şer li ser Îran dûrûst bikin, tesîra PDK jî li ser Hizba Demokrat heye. Ji bo ku mûdaxaleyek dûrûst bibe, hinek tevger pêwîst dike. Heya ku Îran hinek tawîzan bide dê berdewam bike. Ew 4-5 mehin dixwazin Hizbên Demokrat wan amade bikin û hinek şer li ser Îran dûrûst bikin. Tiştê esas ew bû. Ji ber ku PDK'ya Başûr soz dabû ku Hizba Demokrat li ser sînorên wan re derbasî Îranê nebe û hem jî ji bo ku hinek pirsgirekan ji bo me dûrûst bike ew tişt pêk anîn.

Mişqûle çi ye? Bê destûr û bê xeber hatin, ew bû pirsgirek. Hizba Rojhilat diçe Îranê kar dike, bila bike; ji bo me ne pirsgirek e. Par danûstendinên me bi Hizba Demokrat re hebûn, me got ger hûn dixwa-

zin kar bikin, em dikarin bibin navbenkarê we û KODAR û bi hev re kar bikin. Serokê wan jî hatibû û hevalên berpirsyar re rûniştibû. Kêfxweşiya xwe anîbûn ziman. Gotin dema ku em bixwazin biçin Rojhilat, em alîkariya we dixwazin. Lê dema ku ket pratîkê, ne alîkarî xeber jî nedan. Pirsgirek di wir de derket.

Danûstendin çêbû û ew pirsgirek hal bûye. Dema pêş de em hêvî dikin ku Hizba Demokrat hinek serbixwe tevbigere. Jixwe gotibûn ji ber ku pereyên me tune û PDK pereyan dide me, em neçar in di bin siya wan de tevbigerin. Ger em li vî sînorî bimînin, hinek gtemenûk bigirin, em dikarin hinek li ser lingên xwe jî bisekinin. Dibe ku demên pêş de hinek bikaribin kar jî bikin. An na ji bo me ne xeter in, xwestin hinek bikin pirsgirek û rojev çêbikin, lê pêşiya wê hate girtin.

Ji bo meseleya têkiliyên kevn yên Hizba Demokrat û PKK, têkiliyeke wisa hebûye. Heya vê dawiyê jî her heye. Carna germ bûye, carna sar bûye. Di sala 1981’an de, dema heval Egîd û hevalê Mehmet Karasungur, ji bo keşfa van herêman tên; bi Hizba Demokrat, PDK û YNK wan hemûyan re dikevin têkiliyan. Wê demê van partiyan hemûyan danehevên wan û hêzên wan yên çekdar hebûn. Ji bo wê hem weke hêzên Kurdî, hem jî weke tevgerên xwedî ezmûn, PKK bi wan re danûstendin dike.

Mesela Heval Cuma dibêje, cara yekemîn me ji wan dît ku naylon didin şixûlandin û em ji wan fêr bûn. Di 84’an de dema ku heval Karasungur wan şehîd dikevin, heval Cuma diçe li Qendîlê Abdurahman Qasimlo wan dibîne. Di dîroka partiye de behs dike; dibêje dema ku em çûn wir çekên me hemûyan kevn bûn, yên wan jî hemû nû û paqîj bûn. Ew çekên ku Rûsya dane Iraqê, Iraqê jî dabûn wan. Dibêje me re gotin, “ew çi çekên qirêj in ku we rakirine, wan biavêjin em yên nû bidin.” Lê heval Cuma wan gotiye, “me bi keda xwe kiriye, em navêjin. Dîsa hûn alîkariya me bikin, hûn dikarin.” Wê demê li Qendîlê bi hezaran peşmergeyên wan hebûn.

Abdurahman Qasimlo bi xwe demeke dirêj li Ewropa jiyan kiribû û di bin tesîra Sosyal Demokratên Ewropa de mabû. Di mantiq û nêrîna tevgera me û ya Abdurahman Qasimlo de cudabûn heye. Dibêjin, yekem kesê ku tevgera me re gotiye terorîst e, Abdurahman Qasimlo ye. Min xwe ji cihekî nexwendiye, lê wisa tê gotin. Rastiya wê tam nizanim.

Helwesta tevgera me ya 92’yan; li hemberî bangawaziya YNK û PDK; tevgera me ji hûkimeta herême, ji PDK û YNK re got siyeseta we şaş e. Ji bo hêzên Rojhilat jî got hûn şaşî dikin. Ew kar ne xizmetî

Başûr, ne Rojhilat û ne jî Bakûr dike. Ew dibe sedema lewazbûna tevgerên Kurd yên li Rojhilat û Bakûr; dema ku ew tevger lewaz bibin, hûkimeta Başûr jî lewaz dibe. Ji bo vê PKK ew qebûl nekir, dema ku ew qebûl nekir jî şerê PKK kirin. Sedema şerê 92'yan ew bû.

Wê demê kesî bawer nekir. Bi taybetî li Başûr û Rojhilat rexne li PKK kirin. Gotin siyaseta PKK şaş e. Lewra hizbên Rojhilat qebûlkiribûn û xwe baş nîşan didan. “Ew başî dikin, PKK xirab dike.” Lê îro şaştî çibû, rastî çibû diyar dibe.

Meseleya Mengur, agahiya min li ser nîne. Lê nêzikbûnek heye, ez bahs bikim, îhtîmale ew jî girêdayî wê be. Di sala 76'an de dema ku li Başûr YNK çêbû, PDK lewaz bû û nedikarî rabe. Perspektif da eşîr û xelkên nêzîkî xwe û got “bibin caş.” Ji bo ku nebin peşmerge û YNK nikare li van herêman fireh bibe. Got, “heya ku em zindî dibin, xwe li hemberî YNK biparêzin.” Perspektîfeke bi vî rengî da xelkê xwe. Hinek fermandarên xwe jî zivirandin, da ku bibin caş wî karî bikin. Ew siyaseteke şaş bû û dibe ku Hizba Demokrat jî ji vê îstîfade kiribe.

Di 83'yan de dibe ku PDK û Îranê gotibe hûn jî biçin çek bigirin, lê xwestine di bin qontrola wan de bin. Ew çanda PDK ye. Ew çand li ser navê PDK hatiye nas kirin. Lê derveyî PKK, partiyên ku li Kurdistanê çêbûne, bi piranî ew çanda PDK jiyan dikin.

Bala we kişandibe, li Bakur jî demekê wisa bû. Dema ku PKK şerê çekdarî li Bakûr pêş xist, tesîra PDK li herêma Botanê hebû. Ji bo ku PKK li wan herêman cih nebe, ji eşîran re digotin biçin û bibin caş. Heya niha jî beşeke wan girêdayî PDK ne. Baş agahiya min tune, lê dibêtiyeke mezin ya li Rojhilat jî ew siyaset be. Ji wan re gotine çek bigirin û xwestine wan qontrol bikin. Lê dema ku bin qontrola wan derketine, eciz bûne.

Meseleya 66'an girêdayî Başûr e. Di 64'an de pirsgirek di navbera Mistefa Barzanî û Îbrahîm Ehmed de hene. Wê demê Îbrahîm Ehmed sekreterê PDK ya Başûr bû. Mele Mistefa Barzanî jî serokê PDK bû. Sedema vê pirsgirekê çibû? Wê demê Abdulselam Arif serokê Iraqê bû. Ew 63'yan de bû serokê Iraqê. Demekê danûstendin li gel PDK çêkirin. Qet mafê Kurdan neda. Danûstendina Abdulkerîm Qasim çêkiribû, nasname û mafê Kurdan qebûl dikir. Lê Abdulselam Arîf hat û dijberî wê kir û Kurd eciz bûn û ew danûstendin jî xilas bûn.

Di 64'an de Abdulselam Arîf tengav bû û careke din xwest ku diyalog bike. Wê demê polîtîk buroya PDK û Îbrahîm Ehmed wan gotin, em Abdulselam Erîf re nakevin diyalogan. Lewra ew dixwaze me

bixapîne û tiştên ku Abdulkerîm Qasim qebûl kiribûn jî ew red dike. Lê Mistefa Barzanî got, ez ê diyalog bikim.

Di emcamê de Mistefa Barzanî û Abdulselîm Arîf pêk ve daxûyanî dan û gotin em diyalog dikin. Ew bû sedem ku êdî polîtîk buroya PDK li hemberî Barzanî helwest bigre. Wan jî daxwûyanî dan, gotin ew diyalog temsîla Kurdan nake. Temsîla şexsê xwe dike û tiştekî xirab e. Ew bû pirsgirek û di tirmeha 64'an de ji hev qetiyan. Barzanî kongre çêkir û ew ji partiyê avêtin. Pişt re jî hêzeke leşkerî şand ser Polîtburo û ew jî reviyan Îranê, heya 65'an jî li Îranê bûn.

Pişt re Îranê ew radestî Barzanî kirin. Îbrahîm Ehmed radest nebû û çû Brîtanya. Lê Celal Talabanî, Elî Eskerî, Omer Dabebe û çend kesên din hatin û radestî Barzanî bûn. Barzanî soz da ku wan afû bike û car din mesuliyet bide wan. Komek zêde bûn û rêvebiriya PDK bûn. Barzanî hinekên wan afû dike û hinekên wan afû nake, dibêje bila hinek lêhûrbûn bikin. Ew jî di destpêka 66'an de têkilî bi hikûmeta Iraqê re çêdikin û diçin gel wan. Dibêjin Barzanî şaştî dike û PDK ji nû ve ava dikin.



**MUSTAFA BARZANÎ Û SADAM HÛSEYÎN**

Ew kesên ku ji Barzanî eciz bûne kom kirin û bi navê PDK ya Şoreşger hizbekî nû ava kirin. Barzanî jî li çiya bû û digot ew bûne caşên 66 û bi hikûmeta Iraqê re hereket dikin. Wan jî digot, Barzanî bi Îranê re hereket dike û li hemberî hêzên Kurd e. Bi vî rengî navê caşên 66 derket. Ger tu dîrokî lê binêrê, weke hev in, ferq di navbera siyaseta Barzanî û Talabanî de tune.

Di sala 96'an de jî ew mintiqaya Hewlerê di bin serweriya YNK'ê de bû. YNK û PDK şerê hev kirin. Beşeke zêde ya Başûr di bin serweriya YNK de bû, Sîdekan û Dûhok wan deran jî di bin serweriya PDK de bûn. Du salan ji hev dan û weke xwe man. Di 96'an de YNK xwest bi alîkariya Îranê Sîdekan wan deran jî PDK bigre, sînorê Îran û PDK qut bike û sînorê Tirkiyê jî ji bo xwe çêbike. YNK planeke bi wî rengî çêkir. YNK tengaviyên aborî jî jiyan dikirin û Tirkiye jî soz dabû YNK. Gotibû ger tû sînorê xwe bigihînê Xakûrkê, ez dikarim alîkariya te bikim û tû jî dewlemend bibê.

Ji bo vê hem bi Îranê re, hem jî bi Tirkiyê re îtîfaq kir. Bi Îranê re ji bo ku hêzên Rojhilat bêdeng bike, ji Tirkiyê re jî ji bo ku alîkariya hev bikin û PKK jî bêdeng bikin hev kiribûn. Lewra gotin tene PDK û Tirkiye nikare PKK bêdeng bike, pêwîst e YNK jî tevlî bibe. Wê demê YNK pir zêde tevlî şerê me nedibû. YNK hamleyeke bi vî rengî kir, di bihara 96'an de destpê kir. Mintiqaya Sîdekan girt û Barzanî jî kirin dorpêçê. Xwestin Barzanî bigirin. Lê Barzanî jî bi Iraqê re îtîfaq kir û hêzên Iraqê êrîşî Hewlêrê kirin. YNK ji van deran hemûyan reviya û çû Îranê.

YNK got, ger em bûne caşên 66, êdî Barzanî jî bûye caşê 96. Bi vî awayî nav li hev kirin. Girtina Hewlêr û (31-8) bi vî rengê bû, ji ber vê dema ku dibêjin (31-8) PDK'î jî ne rehet dibin.

***3-Rojavayê Kurdistanê***

Li Rojavayê Kurdistanê jî; dewleta Suriye, dewleteke nû bû. Berê li erdnigariya Suriye bi navê Suriye dewletek tûnebûye. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn li erdnigariya kevn ya Şamê çar dewletan çêdikin; Lûbnan, Fîlîstîn, Ûrdûn, Suriye. Berê ji van dewletan hemûyan re digotin Şam.

Suriye, di bihara 1922'yan de weke dewlet tê avakirin. Li gorî peymana San Rîmo, Suriye di bin çavderî û mandatiya Fransa de bû. Pergala Suriye, pergala komarê ye. Di destpêkê de li ser esasê qraliyetê hin hewldan hene, lê dema ku Brîtanya dev ji Suriye berda û Fransa weke komar ava kir. Berê bandora Brîtanya û Fransa li ser cîhanê zêde

bû, gelek dewlet ava kirine. Dewletên ku Brîtanya ava kirine, an melîktî ye, an jî qraliyet in; Fransa jî komartiyê ava dike.

Heya sala 1946'an Suriye, di bin çavdariya Fransa de bû. Lê piştî vê salê Suriye bi awayekî fermî azad bû. Dihat mahneya serxwebûnê, lê careke dîtir di bin tesîra Fransa de bû. Îro jî Fransa xwe weke xwediyê Suriye dibîne. Di pirsgirekên Suriye de, dewleta ku herî zêde xwe berpirsyar dibîne û çareseriyan pêşniyar dike, Fransa ye. Ew tesîrên wê serdemê ne. Ango dema ku bi awayekî fermî Suriye azad bû jî, bi awayekî fîlî di bin çavderiya Fransa de bû.

Heya sala 1962'yan li Suriye serbixwebûn hebû, lê deshilatekî ne bi istiqrar hebû. Gelek deshilat hatin guhertin; hinek deshilat di mehekê de tên guhertin, hinek du mehan de û hinek salekê de; bi vî awayî deshilatekî cigîr li Suriye dûrûst nabe. Hinek valatiya siyasî û bingeha xebatên demokratîk jî dûrûst dibin. Lewra di wê serdemê de, piştî şerê cîhanê yê duyemîn li gelek cihan tevgerên demokratîk û şoreşên sosyalîst pêş dikevin. Ji bo vê di nava civakê de jî hin derfet pêş dikevin.

Di sala 1962'yan de hûkimeta Bais çêbû; hizba Bais, weke partiyeke destpêkê li Suriye hate avakirin. Mîşel Eflaq û Zekî Ersozî û hinek kesayetên din; di 7'ê nîsanê 1947'an de wê partiyê ava dikin. Bi Kurdî dibêjin, "Partiya Bais û Sosyalîstên Ereb." Bi Erebî jî tê mahneya, ji nû ve vejîna Ereban. Partiya Bais, dixwaze Ereb hemû bibin yek û parçebûn di nava Ereban de nemîne. Baweriya wan bi sosyalîzmê heye, di heman demê de baweriya wan bi qewîmiyetê heye. Sosyalîstî û qewîmtî têkilî hev kirin. Di destpêkê de aliyê wan yê çep li pêş e, lê pişt re aliyê wan yê nijadperest derdikeve pêş.

Di netîce de li Iraq û Suriye dema ku hûkim digirin dest, çi siyasetê dimeşînin, tê dîtin. Di sala 1962'yan de hûkmê Suriye digirin dest. Hinek îstîkrarî çêdikin, lê pergala yek hizbî tam nikare hakîm be. Di pergalê de hinek lewazî hene. Di sala 1970'î de Hafiz Esad û Mistefa Talaz, înkilap dikin û hûkmê Bais digirin dest û Suriye dixin destê xwe. Êdî deshilatdariya Hafiz Esad û Mistefa Talaz destpê dike.

Di destpêkê de bi hin tengaviyan ve rû bi rû dimînin. Lê piştî ku di 1973'yan de li hemberî Îsraîl şer dikin û beşeke herêma Qinatan û Golanê rizgar dikin, Esad weke pêşengekî qewmê Ereb tê naskirin û li Suriye deshilatdariya wî cîgir dibe. Bi vî rengî zêdetir bingeh ji bo deshilatdariya Esad çêdibe. Heya sala 2000'î tenê Esad, bi serê xwe hûkmî Suriye kir.

Piştî 1973'yan Suriye, bû alîgirê Yekîtiya Sovyetan; heya niha jî deshilatdarê Suriye, hevalbendê Rûsya ye. Piştî salên 2000'î, dema ku

Hafiz Esad mir, kurê wî Beşar Esad bû serokê Suriye. Her çiqasa hizba Bais digotin, em hizbeke nûjen in, sosyalîst in û pêşketî xwezin jî; hêdî hêdî li Suriye hizba Bais, bû hizba malbata Esad. Di destûra Suriye de, dibêje "heya ku mirovekî/ê 40 saliya xwe nedîtibe, nikare bibe serokomar; lê ji bo ku Beşar Esad bibe serokomar, her tişt guhertin. Niha ew jî 15 salin serokomarê Suriye ye.

Di serdema hûkma Fransa de; Fransa dixwest çanda xwe li Suriye bi cih bike. Yek zimanê Fransî pêş dixist, heya niha jî zimanekî esasî ku li Suriye tê xwendin, zimanê Fransî ye. Ji aliyê din ve dixwest çanda Fransî li Suriye pêş bixe. Di heman demê de dixwest pergala siyasî ya Fransî li Suriye pêş bixe. Ew jî deshilatekî ûnîter û navendî ku ol li derveyî deshilatdariyê dihêle û hinek derfetên azadiya ragihandin ûhwd dide ye. Jixwe hinek jî di vê çarçoveyê de pergala Suriye pêş ket. Ew bû sedem ku hinek azadiya ragihandinê û çalakiyên medenî li Suriye hebin.

Ji sala 1920'an heya sala 1947'an rewşeke bi vî rengî hebû. Heya sala 1962'yan ji ber ku deshilatdariyeke xwecihî pêş neket, careke din ew rewşa hebû. Piştî salên 1962'yan û di dema hizba Bais de, derveyî hizba deshilatdar ji bo derdorên cûda bingeha azadiya ragihandin ûhwd teng bû. Hizba Bais dixwest, her tiştî li gorî berjewendiyên xwe kontrol bike. Piştî sala 1973'yan jî ew yek zêdetir pêş ket.

Piştî salên 1982'yan, bi taybetî dema ku Îxwan Mûslîmîn xwest li hemberî rejîma Esad û Bais bikeve nava hin tevgeran; Esad bi pir tûndî çû ser wan û xwestin bi giştî bajarên Hama û Humusê ji holê rakin. Lewra Îhvanî Mûslîmîn digotin, "ew deshilatdariya laîk û ya Elewiyan e; em van qebûl nakin." Piştî wê li Suriye, yekhizbî hate bi cih kirin. Li gorî qanûnên Suriye avakirina hizban hebû, lê mafê hizban ku siyaseta serbixwe bikin tune, divê hemû li gorî Bais biçin. Nêzikbûneke bi vî rengî hebû.

Li Rojavayê Kurdistan û Suriye xebatên Kurd jî wisa bûn; ji ber ku Rojavayê Kurdistan û Bakûrê Kurdistanê pir nêzikî hev bûn, ji hev û din tesîr dibûn. Mesela Efrîn û Ezaz, di sînorê dîlokê de ne û ji wir tesîr dibin. Kobanî nêzikî Pirsus û Riha ye, ji wê derê tesîr dibe. Milê Cizîrê, nêzikî Cizra Botan û Mêrdînê ye û têkiliyên jiyanî û civakî di navbera wan de hene, ji wê derê bandor bibû. Vê yekê rewşeke wisa çêkiribû ku Rojavayê Kurdistanê, her xwe weke parçeyekî Bakûrê Kurdistanê bibîne.

Parçebûnê ji bo xwe qebûl nake, heya niha jî dibêjin serxet û binxet. Xeta trenê ji navberê re derbas dibe, hinek bin xetê mane, hinek li ser xetê.

Heya salên 1940'î tevgerên Kurd, li Bakûrê Kurdistanê berdewam kirin. Êniya paş ya van tevgeran, Rojavayê Kurdistanê ye. Hemû serhildêr, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd; dema ku tengav dibin derbasî Rojavayê Kurdistanê dibin. Ji ber vê yekê têkiliya raperîn, serhildan û berxwedanên Bakûr û Rojava ji hev qut nabe. Ji ber vê yekê, civaka Rojavayê Kurdistanê jî xwe beşeke van serhildanan dîdît û hêviya wan bi van serhildanan hebû. Her dem tevlî wan serhildanan dibûn. Li gorî derfetên xwe, carna peywirên xwe bi giştî pêkanîne, carna kêm pêkanîne, lê ew mijareke cuda ye.

Ew du tişt bûn sedem ku, heya demekê serhildanên ku Rojavayê Kurdistanê eleqedar bike pêş nekevin. Hinek dibêjin, "Rojavayê Kurdistanê, ji bo xwe serhildan û xebat nekiriye." Ne wisa ye. Hebûye lê kêm bûye. Sedema kêmbûnê jî ew e; yek, pêwindiyên xurt yên Rojava û Bakûr hene. Mesela yekî/a Efrînê têkiliyên wan li gorî Kobanê, ji Dîlokê re zêdetir in. Her wiha yên Kobanê, bi Pirsus û Rihayê re zêdetir in. Sedema duyemîn, hem erdnigariya Rojavayê Kurdistanê kêm e; hem jî erdnigariya wê deşt e, dûz e. Ji bo şerên wê serdemê ne rehet e. Lê ew naye wê mahneyê ku li Rojavayê Kurdistanê serhildan nebûye.

Ji tevgera Azadî û serhildana Şêx Seîd heya, Xoybûn û serhildana Agirî û heya Berxwedana Dersîmê; civaka Rojavayê Kurdistanê, tevlî hemû serhildanan bûye. Jixwe pir caran, serhildêr hatine û li Rojava xwe tevger kirine û çûne Bakûr. Divê mirov vê mijarê baş fêm bike.

Ji aliyê din ve, hinek serhildanên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê çêdibin. Bi hevkariya Ereb û komên dîtir çêdibin. Mesela di sala 1919'an de Îbrahîm Hanano heye, li Çiyayê Zeviyê, ligel Elewiyan û Dûrziyan; li hemberî Fransiyan şer kirine. Demekê şer dikin û dişkên. Pişt re diçe milê Ûrdûn û dixwaze alîkariyê ji Brîtanya bigre, Brîtanya alîkariya wan nake, dijberî wê wan radestî Fransa dike. Demekê serhildana wan tê sekinandin, lê di sala 1930'î de carek dîtir destpê dike. Hinek dikeve tevgerê, lê di demeke kin de bi nexweşî dimre. Ew serhildaneke Kurdî, Elewî û Dûrzî ye; pêk ve çêbûye, lê kesekî weke Îbrahîm Hanano ku Kurd e, pêşengtiya vê serhildanê dike.

Xeynî wê, di destpêka sala 1920'an de çend serhildanên dîtir yên herêmî hene. Li Amûdê, Serekaniyê, Beyandur li hemberî Fransiyan serhildan çêdibin. Lewra Fransî dixwazin hemû Rojavayê Kurdistanê kontrol bikin, xelk jî li hemberî wan derdikeve û dixwazin azad jiyan

bikin. Bi vî rengî şerên herêmî derdikevin. Lê ji ber ku herêmî ye û biçûk e; rejîma Suriye û deshilatdariya Fransa pir zû wan herêman kontrol dikin. Bi vî rengî heya salên 1933'yan serhildanên eşîrî, li Rojavayê Kurdistanê çêdibin. Ji ber ku ew tevger bi refleksan çêdibin, wisa bi plan û bername pêk naye; dibe sedem ku ew serhiladan zû werin tepisandin.

Dervayî serhildanan, li Rojavayê Kurdistanê xebateke siyasî û rewşenbîrî ya berfireh pêş dikeve. Heya îro jî bandora van xebatan heye. Ji ber ku beşeke zêde rewşenbîr û siyasetmedarên Bakûrê Kurdistanê diçûn Rojava û xelkê Rojava jî ji aliyê çandî ve dewlemend bûn û li Suriye jî hinek bingeha azadiya çandî û ragihandî hebû, tevgerîneke wisa hebû. Bû sedem ku li Rojavayê Kurdistanê xebatên siyasî û çandî bi giştî nemirin û hinek jî pêş bikevin.

Me behsa Xoybûn kir; li Lûbnanê hate avakirin, Bakûrê Kurdistanê esas digirt, lê xebatên wê yên rewşenbîrî û siyasî bi piranî li Rojavayê Kurdistanê bûn. Xelkê Rojavayê Kurdistanê jî tevlê dibû. Navenda wê demekê anîn Helebê; xeynî wê jî li Efrîn, Kobanê, Amûdê, Qamişlo û cihên dîtir bingehên xwe çêdikirin û kar dikirin. Serokatiya Xoybûnê, demekê Celadet Bedîrxan, demekê jî Kadrî Cemîl Paşa û Enver Cemîl Paşa kirin.

Li Rojavayê Kurdistanê, ji sala 1932'yan heya sala 1942'yan çend kovar û rojname derxistin. Kovara HAWAR û Kovara RONAHÎ ku niha jî hevalên me li Rojava zindî dikin, di wê demê de derketin. Xeynî vê Rojnameya Stêrk, Rojnameya Roja Nû jî di heman demê li Rojavayê Kurdistanê derketin. Ger derfet hebûya, hinek dişandin Bakûr; lê bi piranî li Rojavayê Kurdistanê belav dibûn.

Aliyekî din Celedat Bedîrxan wan, li Rojavayê Kurdistanê û Lûbnanê tîpên Kurdî pêş xistin. Di destpêkê de bi Aramî dihatin nivîsandin, lê pişt re tîpên Latînî jî pêş xistin. Her wiha li Rojavayê Kurdistanê kûrsên zimanê Kurdî jî pêş xistin û ciwanên Kurd fêrî nivîsandina Kurdî dikirin. Dewleta Suriye bi xwe dibistanên Kurdî venedikirin, lê wan kûrs vedikirin. Çawa ku îro Tirkiye dibêje, hûn dikarin kûrsan vekin; li wir jî wisa bû. Rêxistina Xoybûn, kesên ku kovar û rojname derdixistin; di nava gel de kûrsên zimanê Kurdî pêş dixistin.

Ew dibû sedem ku beşeke civaka Rojavayê Kurdistanê, bi taybetî ciwan û rewşenbîrên Kurd fêrî zimanê Kurdî bibin. Bi vî rengî bi tîpên Latînî nivîsandina Kurdî, bi taybetî piştî salên 1940'î li Rojavayê Kurdistanê bi giştî belav dibe. Niha jî li Rojavayê Kurdistanê, yên ku dibis-

tanên fermî xwendine, fêrî Erebiyê bûne; lê yên ku fêrî Kurdî bûne, bi Latînî dixwînin. Lewra di wê serdemê de bingeha wê tê danîn û xelk jî tevlê dibe.

Her wiha li Rojavayê Kurdistanê, xelk tevgera çandî pêş dixe. Kom û saziyên çandê pêş dikevin. Ew dibe sedem ku hûner û sanata Kurdî li Rojavayê Kurdistanê nemire. Niha hevalên me bi henekî dibêjin, “her taxeke bajarên Rojavayê Kurdistanê, çend kom hene.” Lewra di wê demê de bingeh û derfet çêdibin, xelk vê bingehê kartîne û çand û hûnera xwe zindî dihêle. Ew mijareke girîng e ku li Rojavayê Kurdistanê hebûye. Dibe ku li Rojavayê Kurdistanê şer kêm be, lê aliyên din yên siyasî, rewşenbîrî û çandî pir li pêş bûne. Divê ew bên dîtin.

Xebatên siyasî yên li Rojavayê Kurdistanê, mirov dikare weke sê deman binirxîne; demek heya salên 1940’î ye û di bin tesîra civak û xebatên li Bakûrê Kurdistanê de ne. Dudu, piştî salên 1940-5’an hêdî bi hêdî xebatên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê, dikeve bin tesîra Başûrê Kurdistanê. Lewra Bakûrê Kurdistanê êdî serhildan tên pelçiqandin û piştî salên 1940’î serhildan neman. Lê li Başûrê Kurdistanê serhildan berdewam bû; tevgera Barzanî hebû, piştî wî PDK çêbû û tesîra xwe li ser parçeyên din yên Kurdistanê jî kir.

Jixwe di sala 1957’an de, bi vê tesîrê cara yekem, li Rojavayê Kurdistanê partiyeke siyasî çêdibe. Ew jî PDKS (Partiya Demokarat ya Kurdistanê li Suriye) ye; di dîroka 17.06.1957’an de çêdibe. Di wê demê de Celal Talabanî, Omer Debabe û çend kadroyên din diçin Rojava û demekê li wir dimînin. Li gel xebatkar, rewşenbîr û dostên xwe nîqaş dikin û vê partiyê ava dikin.



**<u>OSMAN SEBRÎ</u>**

Di destpêkê de Osman Sebrî, Nuredîn Zaza, Hemîd Hecî Derwêş û komeleyeke kesên dîtir pêşengtiya vê partiyê dikin. Osman Sebrî kesayeteke ku ji berê ve xwedî xebat e, Nuredîn Zaza li Ewropa û Rojava xebatên ciwanan dimeşîne. Ew tevlî vê xebatê dibin û partiyeke

bi vî rengî ava dikin. Dema ku ew partî tê avakirin, heya salên 1960'î xebatên Kurdînî, li Rojavayê Kurdistanê bi rengekî nû tên pêşxistin. Berê zêdetir xebatên rewşenbîrî û çandî derdiketin pêş û alîkariya xebatên Bakûrê Kurdistanê hebû.

Vê carê, di pêşengtiya PDKS'ê de xebateke siyasî tê kirin. Lê vê carê zêdetir berê xelkê, didin Başûrê Kurdistanê. Lewra li wê derê tevger heye, bi taybetî piştî salên 1961'an serhildan pêş dikeve; êdî bi riya vê partiyê bi sedan ciwan berê xwe didin Başûrê Kurdistanê û tevlî tevgera peşmerge dibin. Xeynî vê jî alîkariya madî û jiyanî li Başûrê Kurdistanê dikin. Ji aliyê din ve jî ew tevger, di nava gel de xebatên xwe yên çandî, siyasî û ragihandinî pêş dixe.

Heya salên 1964'an ew partî li Rojava xebateke bi bandor pêş dixe, lê dema ku di vê salê de PDK li Başûr parçe dibe; li Rojavayê Kurdistanê jî PDKS parçe dibe. Lewra beşeke wan di bin tesîra Barzanî de, beşeke wan jî di bin tesîra Talabanî de dimînin. Bi vî rengî dibin du beş. Li Rojava, di navbera van herdu aliyan de şer çênabe, lewra çek tune. Lê du ênî çêdibin û hev din timam nakin.

Heya sala 1970'î ew partî weke du beşan xebat dimeşîne; beşekê Osman Sebrî serokatiya wê dike, beşekê jî Nuredîn Zaza serokatiya wê dike. Di vê salê de, dema ku li Başûr Barzanî û Talabanî hev dikin; li Rojavayê Kurdistanê jî ew partî careke dîtir dibin yek. Dema ku di sala 1975'an de li Başûr tevgera PDK têk çû, an jî aşbetal bû; êdî li Rojavayê Kurdistanê jî PDKS belav bû, bû deh parçe. Her malbatek bû partiyek. Herî dawî di sala 2011'an de li Rojavayê Kurdistanê 14 partî hebûn. Ew hemû ji zikê PDKS derketibûn.

Ango her endamekî rêveberiya PDKS, bû xwediyê partiyekê. Hinekên wan girêdayî PDK Kar dikirin, hinekên wan jî nêzikî YNK kar dikirin. Heya salên 1985'an, her çiqasa ew partî parçe bibin jî, tesîra wan li ser Rojavayê Kurdistanê hebû.

Dema ku di sala 1979'an de Rêber Apo derbasî Rojava dibe, li Lûbnan bi cih dibe û li ser Rojavayê Kurdistanê xebatê dimeşîne rewş cuda dibe. Piştî salên 1985'an tesîra tevgera me li ser Rojavayê Kurdistanê zêde dibe. Di navbera me û van tevgeran de jî hinek nakokî derdikevin; lewra ew xwe weke xwediyê Rojava dibînin û PKK'ê xwediyê Rojava nabînin. Bi taybetî piştî salên 1990'î piraniya civaka Kurdistanê, dikeve bin tesîra PKK'ê û careke dîtir hêviya wan dikeve ser Bakûrê Kurdistanê.

Piştî ku PKK, li Rojava xebat dimeşîne û civakê tesîr dike jî merheleya seyemîn e. Ji bo wê min got, divê mirov weke sê merheleyan

behs bike. Li Rojavayê Kurdistanê, piştî tesîra tevgera me rista van partiyan kêm bû, civaka Rojavayê Kurdistanê berê xwe da Bakûr.

Vê rewşê heya salên 2010-11'an berdewam kir. Heya vê demê du mijarên girîng hene. Yek li Bakûrê Kurdistanê, çawa ku plana Şarq û Islahat hebû, di serdema rejîma Bais de li Suriye jî plana "Kemera Erebî" hebû. Ew plan di sala 1962'yan de ket rojevê, pişt re hêdî hêdî hate bi cih kirin. Li gorî vê planê, Ereb li Rojavayê Kurdistanê, di navbera gundên Kurdistanê de bi cih kirin. Niha jî tê dîtin, li Rojavayê Kurdistanê hejmara Ereban pir zêde bûye; hinek cihan hejmara Kurdan, ji ya Ereban kêmtir e. Ew guhertineke demografiyê bû ku rejîma Bais da meşandin.

Di heman demê de nasnameya civaka Kurd guhertin. Beşek civaka Kurd, li Suriye weke hemwelatî qebûlkirin, lê beşek jî weke biyanî-ecnebî qebûl kirin. Bi taybetî li herêma Cizîrê, gotin ew ne xelkên Suriye ne, ew biyanî ne. Beşek jî bê nasname kirin. Heya niha jî ew rewş berdewam dike; hinek hemwelatî ne, hinek biyanî ne, hinek jî bê nasname ne. Jixwe yên bê nasname, tenê xwediyê mafê jiyanê ne; tu mafên wan yên dîtir tune. Yên biyanî ne, hin mafên medenî hene, lê mafê siyasî tune. Yên hemwelatî jî xwediyê mafê siyasî ne, lê divê di nava Bais de siyasetê bikin. Siyaseteke bi vî rengî di nava civaka Kurdistanê de hate meşandin.

Xeynî vê di sala 1960'î de, hê hizba Bais nebûbû deshilatdar, li Rojavayê Kurdistanê bûyerek heye, dilê mirov dêşîne. Di sala 1958'an de di navbera Suriye û Misir de yekbûnek çêbû; jê re digotin Komara Erebî. Wê demê Cemal Evdilnasir dixwest welatên Ereb bike yek; gava yekem, di navbera Misir û Suriye de yekîtî çêkir. Dixwestin Iraq jî tevlî vê yekîtiyê bibe; Iraqê jî soz da ku tevlê bibe, lê tevlê nebû, pişt re di navbera Suriye û Misirê de jî yekîtî têk çû. Êdî yekbûn nema.

Di sala 1960'î de, dema ku ew yekîtiya Komara Ereban hebû, şoreşa Cezayîrê çêbûbû. Li Suriye jî ji bo piştgiriya Cezayîrê meş, mîtîng û çalakî çêdibûn. Li Amûdê jî di bin navê alîkariya xelkê Cezayîrê de, cara yekem sînema vedikin. Hejmareke zêde ya zarokan ji dibistanê dibin û tevlî sînemaye dikin. Di dema temaşekirina fîlm de, sînema dişewite û zêdetirî 280 zarokên Kurd di wê sînemayê de dişewitin. Ew di nava civaka me de êşeke ku heya îro jî tê bîranîn e.

Dewleta Suriye dibêje, ew tiştekî tesadûf e. Lê xelkê me yê Rojavayê Kurdistanê ku bûye şahîdê bûyerê, vê yekê weke tesadûf qebûl nakin. Dibêjin, "weke planeke tirsandina civaka Kurd e." Lewra di wê demê de hinek mafên Kurdan tên dayin, partiyên Kurd pêş dike-

vin; lê li hemberî vê zext hebûn, serokên partiyan dihatin girtin û digotin divê hûn dev ji Kurdiniyê berdin. Ji ber vê yekê dibêjin, “ew planeke ku xelkê Rojavayê Kurdistanê çavtirsandî bike bû.”

Bi taybetî Amûde çiqasa bajarekî biçûk be jî, bajarekî çalak e. Ji warê rewşenbîrî û çalakiyên siyasî û medenî ve bajarekî pêşketî ye. Hinek caran hevalên me dibêjin, “xelkê Amûdê dîn e.” Lê mesele ne dîntî ye, hişyarbûn li wê derê pêş e. Ji ber vê yekê dijmin jî Amûdê hedef digre.

Heman rewş di sala 2004’an de dubare bû. Di sala 2003’yan de dema ku Sadam ket, hûkimeta Iraqê di 8’ê adara 2004’an de otonomiya Başûrê Kurdistanê nas kir. Li ser vê yekê li Rojavayê Kurdistanê çend rojan xelkê moral û pîrozbahî pêş xistin. Di 12’ê adara 2004’an de li Qamişlo bi rengekî dîtir, li ser gel komkûjî hatin kirin. Wê demê jî hate nirxandin ku li hemberî germbûn û bi coşbûna gelê Kurd, gefan dixin. Lewra ji bo xwe xeterî dîdîtin. Suriye, ew tiştên ku li Iraqê pêk hatine qebûl nedikirin, Kurd jî kêfxweş bûn; bi vî rengî kîna xwe rijandin. Ew komkûjî di encama ew siyaseta şovenî ku dihat rêvebirin de çêbû. Ew du mijar, siyaseta dewletê ku li hemberî Rojavayê Kurdistanê tê meşandin jî nîşan didin.

Jixwe rewşa niha ya Rojavayê Kurdistanê jî em bi hev re dişopînin, pêwîst nake ku em bi berfirehî bikevin nav. Lê ew girîng e. Li ser bingeha tesîra Rêber Apo û tevgera me ku li Rojavayê Kurdistanê çêbûye; Rêber Apo xwest di salên 1997-98’an de ji bo Rojavayê Kurdistanê partiyeke pêş bixe, da ku bikaribe li bingeha Rojavayê Kurdistanê û Suriye kar bike. Di wê demê de hinek heval û kesayet jî amade kiribûn, bi hinek derdorên Ereb re jî ketibû têkiliyê; lê ji ber komplo li ser Serokatî hate çêkirin û Serokatî dîl ket, ew proje nîvçe ma.

Piştî ku di tevgera me de paradîgma û stratejî hate guhertin, piştî salên 2001’ê ji bo zindîkirina wî karî, careke din xebat pêş ketin. Di dîroka 20.09.2003’yan de jî PYD (Partiya Yekitiya Demokratîk) hate avakirin. PYD weke partiyeke ku li Rojavayê Kurdistanê û Suriye li ser fikrên Rêber Apo kar bike, hate avakirin. Li gel wê yekê xebatên jin û ciwanan hatin pêş xistin. Xebatên parastina cewherî hatin pêş xistin.

Heya sala 2011’an ew xebat bi awayekî veşartî berdewam kirin. Lewra di wê demê de rejîma Esad, bi Tirkiye ve ketibû têkiliyan û gelek zext û tûndî li ser gelê Rojavayê Kurdistanê pêş dixist. Derfetên xebat meşandinê kêm bûn, ji ber vê xebat bi awayekî veşartî pêş diketin. Di wê demê de gelek hevalên me û endamên PYD li Rojavayê

Kurdistanê dihatin girtin, bi zextan ve rû bi rû diman. Hevalên xelkê Bakûr in, radestî Tirkiye kirin. Rewşeke bi vî rengî pêş ket.

Piştî salên 2011'an rewşa Suriye hat guhertin. Ew bû zemîn ku ew xebatên ku salên dirêj li Rojava tên kirin, bi pergal bibin. Di destpêkê de KCK ya Rojava hat rêxistinkirin, pişt re bû TEV-DEM. Her wiha xebatên jin, ciwan, parastin û xebatên cur bi cur hatin pêş xistin. Wê demê partiyên ku ji PDKS qut bûne, 14 heb bûn, wan jî dixwest bikevin nava tevgerê; têkiliya PYD bi wan re hebû, lê siyaset cuda bû.

Di partiyên rojava de sê helwest hebûn; yek, dixwestin bê şert tevlî opozîsyona Suriye bibin. PYD got, em bê şert tevlî opozîsyona Suriye nabin, divê beriya ku em tevlê bibin. divê opozîsyona Suriye projeya xwe diyar bike, ger demokratîk be û mafên gelan nas dike, em ê tevlê bibin. An na em tevlê nabin. Partiyên din digotin, "em di destpêkê de tevlê bibin, pişt re em ê projeyan çêbikin." Lê PYD qebûl nekir.

Lê aliyê din ve ji bo civaka Rojavayê Kurdistanê PYD pêşniyar kir û got, "em meclîseke Kurdistanî çêbikin." Wan jî gotin, "timam em qebûl dikin." Lê di avakirinê de nêrînên cuda derketin. PYD got, "divê rêxistin û meclîsa ku em çêbikin, bila partî, rêxistinên sîvîl û komaleyan pêk bê. Bila nunerên civakê jî tevlê bibin." Lê wan partiyên din gotin, "em qabûl dikin ku meclîsek çêbibe, lê divê tenê nunerên partiyan tevlê bibin." Ne PYD projeya wan qebûl kir, ne jî wan projeya PYD qebûl kirin. Sedema qebûlnekirina wan çi bû?

Ger tenê partî tevlê bûbana, ew 14 partî bûn, lê PYD tenê partiyek bû. Dê her biryar girtinê de, gotina wan derbas bibe û divê PYD jî pêk bîne. PYD jî dibêje, "divê civak tenê bi riya partiyan neye rêvebirin, rêxistinên cuda jî di nava civakê de hene." Wan jî digot, "ger ew rêxistin û komale jî tevlê bibin, di meclîsa ku bê avakirin de giraniya PYD zêde dibe, ya me kêm dibe."

Mijareke din, wan dixwest di 2011'an de hema li Rojavayê Kurdistanê, dijberî Esad şer bê pêş xistin. Digotin, "em bangawaziya rûxandina Esad bikin." PYD jî digot, "em xeta seyemîn in, em bangeke wisa nakin. Ji bo me ne şerte ku Esad biçe, em dixwazin pergaleke demokratîk çêbibe. Em bangawaziya serhildanan li gel nakin. Em amadekariyên xwe dikin û xelkê xwe tevger dikin." Bi vî rengî ew 14 partî çûn û tevlî opozîsyona Suriye bûn. Bi navê ENSK meclîsek çêkirin û di heman demê de bangawaziya rûxandina Esad ji gel re kirin. PYD jî li gel komaleyên din yên civakê, Meclîsa Gel ava kir. Got, "ger opozîsyona Suriye mafên Kurdan û prensîbên demokrasiyê qebûl na-

kin, em tevlê nabin.” Ji civakê re jî got, “tiştê esas çûyin û mayina Esad nene, em xwe tevger dikin û xeta seyemîn pêş dixin.”

Heya salekê rewşê bi vî rengî berdewam kir. Di encamê de van partiyên ENSK nikarîn xelkê rakin, opozîsyona Suriye jî gotin em mafên Kurdan nadin. Her wiha Esad jî ma, nerûxî. ENSK jî di pratîkê de nikarî tiştekî bike. Meclîsa Gel, civak rêxistin kir û bingeha şoreşê ava kir. Di 19’ê Tirmêha 2012’an de şoreşê destpê kir. YPG (Yekîneyên Parastina Gel) û YPJ (Yekîneyên Parastina Jin) xwe îlan kirin û gel parastin. Saziyên medenî yên civakê çêbûn. Di heman demê de siyaseta PYD ku li Rojava, Suriye û derve pêş dixist her roj bi cih dibû.

Ew bû sedem ku PYD, TEV-DEM û Tevgera Azadiyê roj bi roj li Rojavayê Kurdistanê bi tesîr bibe. Wan partiyên din zêdetir li ser meseleyên dîplomasî ûhwd kar dikirin, ew jî hêdî bi hêdî lewaz bûn.



## YEKÎNEYÊN PARASTINA GEL-YPG

Di sala 2014'an de careke din nîqaş çêbûn, da ku kantonan bi hev re îlan bikin. Lê ew partî bi sedema Tirkiye û hêzên derve careke din tevlê nebûn. Kanton hatin avakirin, destpêkê hinek zehmetî kişandin, lê niha hêdî hêdî cihê xwe digre. Rewşeke bi vî rengî niha li Rojavayê Kurdistanê heye. Ji wan partiyên ENSK, 3-4 heb jê qut bûn û tevlî kantonan bûn. 4-5 heb jî qut bûne û dibêjin "em piştgiriya kantonan dikin." 3-4 heb mane, di demên pêş de an ew jî tevlê bibin, an jî wê derve bimînin.

…: Peymana Sadabat û Cezayîr heye, tesîra wê li ser Kurdan çi ye?

…: Di ev sedsala dawî de gelek komkûjî hatine çêkirin, ew jî hinek bên vekirin dê baş bibe.

…: Li Rojavayê Kurdistanê hejmareke zêde ya Êzîdiyan heye. Deshilatdariya Elewî ya Suriye çawa nêzikî Êzîdiyan bûye? Ya duyemîn jî pêwêndiyên Êzidiyan û Kurdên Rojava çawa ye?

**H. Helmet**: Êzidiyên li Rojavayê Kurdistanê, zêdetir weke Kurd tevdigerin. Rewşa wan weke ya Başûr nene. Li Başûrê Kurdistanê, Êzîdî hinekî din komî ser hev in; hûkimeta Iraqê jî bi taybetî li ser wan konevaniyek daye meşandin. Lê li Suriye Êzîdî belave ne, ji ber vê her di çarçoveya siyaseta Kurd de li hemberî Êzîdiyan tevgerîn çêbûye. Min di derheqê Êzîdiyan de konevaniyeke taybet û cuda nebîstiye.

Peymana Sadabat di sala 1937'an de pêk hatiye, di navbera Îran, Iraq, Afganîstan, Pakîstan û Tirkiye de çêbûye. Brîtanya jî çavdarî dike. Peyman li Koşka Sadabat ya Îranê hat girêdan, ji ber wê navê Sadabat lê kirine. Armanc, hevkariya siyasî û leşkerî ya di nava van dewletan de ye. Her wiha dixwazin weke koalîsyon têkiliyên xwe li gel Brîtanya xurt bikin. Hûkmê Brîtanya li van welatan hebû, ji bo ku hûkmê xwe xurtir bike ew koalîsyon pêş xist. Bi xwe jî çavdarî dikir. Di xaleke vê peymanê de jî tê diyar kirin ku Îran, Iraq û Tirkiye alîkariya hev bikin û rê nedin tevgerên Kurdî pêş bikevin.

…: Li Rojavayê Kurdistanê, li Efrîn û Helebê 22 xeretên Êzîdiyan hene. Di nasnameya wan de weke mezhep diyar kirine ku Êzîdî ne. Lê weke netew, ji xwe di nasnameya her kesî de Ereb nivîsandine. Weke heval jî got, di navbera Êzîdiyên Şengalê û yên Rojava de ferq heye. Yên li Rojava, hinekî heliyan e, hinek şibiyane Misilmanan. Lê cejnên fermî yên Êzîdiyan pîroz dikin. Jiyana wan jî weke ya Kurdên din yên Rojava ye. Dibêjin, "em di destpêkê de Kurd in, piştre Êzîdî ne." Lê yên Şengalê dibêjin, "em di destpêkê de Êzîdî ne, piştre Kurd in."

…: Li Rojava pir Êzîdî hene; li Cizîr, Efrîn û Helebê hene. Lê Êzîdîtiya xwe bîr kirine. Mesela yên Êzîdî jî pir zêde nizanin, Êzîdîtî çi ye, pêşengên wan kî ne. Dema ku li Rojava şoreş çêbû, hevalan hinek pirtûk nivîsandin û hinek civîn ji wan re çêkirin. Piştî wê hinek fêrî tiştna bûn.

Ya din jî Êzîdiyên Rojava jî, di nava xwe de girtîne, sirên xwe nadin derve. Mesela carekê min pirtûkek ji wan xwest, min got, "ez dixwazim ola we fêr bibim." Lê nedan min, nehiliştin ku ez bizanim. Di nava Sûnî û Êzîdiyan de jî mişqûle hene. Mesela dema ku diçin mala hev, çayê jî venaxin.

Li ser Suriye jî dixwazim tiştekî bibêjim. Dema ku di 1946'an de Fransa ji Suriye dikşe, sê kesên ku li ser hev Suriye rê ve dibin, bi eslê xwe Kurd in. Lê piştî wê deshilatdariyên ku tên konevaniya Kemera Ereban dimeşînin. Bi taybetî li herêma Cizîrê û Hesekê ew yek pêş xistin. Gelek navên gundan guhertine. Yek jî mahneya navê wan gundan bi Kurdî

çibe, bi Erebî dijberî wê lê kirine. Ango li gorî kêfê xwe nav lê kirine. Di dema Suriye bi Cemal Evdilnasir re yekîtî çêdike de, Kurdî axaftin jî qedexe kiribûn. Lê piştî şoreşa 8'ê adarê ya Hafiz Esad hinek serbestî çêdibe.

### *4-Başûrê Kurdistanê*

**H. Helmet:** Em li ser Bakûr, Rojhilat û Rojava sekinîn. Em hinek li ser Başûr jî biaxifin.

Me hinek behsa avakirina dewleta Iraqê kir. Ji ber wê dubare nakim. Dewleta Iraqê di meha 10'an ya 1920'an de çêbû. Ji ber ku Brîtanya çavdarî dikir, weke dewleteke melîkî hate avakirin. Dewleteke qralî bû, lê heya 10 heyvan bê qral bû. Di 23'ê tebaxa 1921'an de Faysal dikin padîşahê Iraqê û tac didin serê wî. Ew jî kurê şerîfê Meke bû.

Di dema Osmaniyan de, kesê ku bibûya çavder û waliyê Meke, jê re digotin şerîf. Ji ber ku Meke cihekî pîroz bû, kesê dibû berpirsyarê Meke dikirin şerîf. Niha jî padîşahên Sûîdiyê navê xwe dikin xizmetkarê du cihên pîroz (Medîne û Meke). Di wê demê de jî digotin şerîfê Meke. Ji malbata Mihemed, ango ji malbata Haşîmî ne. Kurekî Şerîfê Meke dikin qralê Iraqê, yekî jî dikin qralê Ûrdûnê. Yên Ûrdûnê jixwe heya niha jî melîkiya Ûrdûnê berdewam dikin. Lê yên Iraqê zû hatin derxistin.

Melîk Faysal (Faysalê yekem), heya sala 1933'yan hakimê Iraqê bû. Ji sala 1933'yan heya sala 1939'an kurê wî Melîk Xazî hakîm bû. Heya sala 1958'an jî kurê Qazî, ango Faysalê duyemîn (Faysalê Biçûk) bû melîkê Iraqê. Ji ber ku di çar saliya xwe de bû melîk, jê re digotin Melîkê biçûk. Heya demêkê jî xalê wî li cihê wasîtiya wî kir. Lê piştî salên 1953'yan Melîkê biçûk bi fîlî jî bû melîk. Pergala melîktî weke nav bi vî rengî diçû. Pergala Iraqê di bin çavderiya Brîtanya de bû. Li gorî pergala mandatiyê, divê heya sala 1932'yan Iraq di bin çavderiya Brîtanya de bimîne û di van 12 salan de Brîtanya alîkariya Iraqê bike. Li ser vê esasê dema ku Iraq fêr bû û karî xwe rê ve bibe, divê Brîtanya ji Iraqê derkeve. Lê Brîtanya nedixwest ji Iraqê derkeve. Ji ber vê yekê piştî salên 1932'an di navbera melîkê Iraqê û Brîtanya de pirsgirek çêdibe. Lewra melîkê Iraqê dixwaze serbixwe be. Pişt re Brîtanya azadiya Iraqê didê, lê gelek saziyên xwe li Iraqê dihêle. Ew dibe sedem ku nakokî û pirsgirek di navbera melîk û Brîtanya de berdewam bikin.

Di sala 1933'yan de melîkê Iraqê diçe Fransa û li wê derê dimre. Heya niha ne diyare ku ji bo çi miriye. Li wir cenazeyê wî tînin û piştî wî kurê wî dikin paşayê Iraqê. Brîtanya û Fransa dibêje, bi xwe miriye;

lê gelê Iraqê bawer nake û dibêjin, “hatiye kûştin.” Lewra di wê demê de nakokiyên wî li gel Brîtanya hebûn û kesên ku pê re çûne ziyareta Fransa jî bi piranî zilamên Brîtanya bûn. Dema ku Qazî dibe melîk, diyare dîsa Brîtanya û Iraq bi hev nakin. Ji ber vê yekê di 1937’an de li Iraqê darbeyek leşkerî çêdibe.

Fermandarê bi navê Bekîr Sidqî ku Kurd e, vê darbeyê dike. Dixwaze alîkariya Melîk Xazî bike, da ku Brîtanya ji Iraqê derbixe. Lê pişt re Bekîr Sidqî, bi plana Tirkiye û Brîtanya li Mûsilê tê kûştin. Êdî Melîk Xazî tenê dimîne û Brîtanya careke dîtir hakîm dibe. Di sala 1939’an de Melîk Xazî jî bi qezeya maşîneyê dimre. Di wê demê de Melîk Xazî ciwan e. Maşîneyên makamî hêdî diçin, lê bi tesadûfî şoforê wî bi lez diçe û maşîneyê bi dîrekekî diqelibîne û Melîk Xazî dimre. Ew bûyer jî hê zelal nebûye.

Piştî Melîk Xazî dimre, tenê kurekî wî heye; ew jî 4 salî ye. Li gorî qanûnên Iraqê dikare bibe melîk, lê divê yek bibe wasiyê wî. Ji ber vê xalê wî, Avdilîla dikin wasî. Ew jî zilamê Brîtanya ye. Heya sala 1953’yan ew dibe wasiyê melîk û pirsgirekên di navbera Iraq û Brîtanya de hal dike. Lewra li gorî Brîtanya diçe. Heya 1958’an jî Faysalê Biçûk bi xwe dibe melîk, lê her xalê wî û Brîtanya hûkim dikin.

Di 14-7-1958’an de pergala Iraqê tê guhertin. Abdulkerîm Qasim, fermandarekî arteşa Iraqê ye. Li gel komeke fermandarên Iraqê û bi alîkariya hejmarek partiyên Iraqî (Partiya (Şiuiî)Komînst ya Iraqê, partiya Demokrat ya Iraqê, Partiya Bais ya Erebî, Partiya Watanî Iraqî, PDK) înkilap dike. Pergala qraltiyê radike û pergala komarê ava dike. Komara Iraqê di 4’ê Tirmêha 1958’an de tê avakirin.

Heya salên 1963’yan deshilatdariya Abdulkerîm berdewam dike. Kesekî ku xwedî taybetmendiyên demokratîk e. Lê deshilatê derdorê, deshilatiya şovenîzma Ereb û deshilatiya êmperyalîst wî qebûl nakin û li ser wî înkilap dikin. Di 8’ê şibata 1963’yan de înkilap dikin û wî dikûjin. Avdilselam Arîf ku kesekî şoveniya Ereb e, dibe serokomarê Iraqê. Di 14-4-1966’an de ew jî bi qazaya helîkopterê dimre. Dema ku ew dimre, birayê wî Avdirehmen Arîf dibe serokomar.

Di sala 1968’an de hizba Bais înkilap dike û Avdirahman Arîf didin aliyekî. Wî nakûjin lê sûrgûnî Tirkiye dikin. Deshilatdariya hizba Bais, li Iraqê heya 2003’yan berdewam dike. Di dema Baisê de serokomarê ewil, Ehmed Hesen Bekir bû. Di wê demê de kesê yekemîn yê Baisê ew bû. Sadam Huseyîn, di nava hizba Bais de kesekî pêş û diyar nebû. Lê mirovê Ehmed Hesen Bekir bû. Ehmed Hesen Bekir, wî bi xwe re dibe û dike berpirsyarê parastina koşka komarê. Pişt re di sala

1969’an de wî dike endamê Merkez a hizba Bais û berpirsyarê rêxistina îstîxbaratê.

Pişt re meclîseke serokatiya şoreşê çêdikin; Ehmed Hesen Bekîr dibe serokê wê meclîsê û Sadam jî dike alîkarê xwe. Bi vî rengî her rista Sadam pêş ve diçe û di sala 1974-5’an de êdî bi pratîkî dibe serok. Bi awayekî fermî dîsa Ehmed Hesen Bekîr e, lê bi pratîkî Sadam dibe serok. Ehmed Hesen Bekîr, ji Sadam re dibêje “xwarzê.” Sadam jî, ji Ehmed Hesen Bekîr re dibêje, “xalo.” Di sala 1979’an de jî Sadam Hûseyîn, ji Ehmed Hesen Bekîr re dibêje, “xalo êdî tu kal bûyê, dakave.” Bi vî rengî dibe serokê Iraqê. Heya sala 2003’yan jî weke serokomar dimîne.

Di dema qraliyeta Iraqê de, Brîtanya dixwest modela xwe bi cih bike. Li aliyekî soz dabû Kurdan ku hin mafên Kurdan bide. Di pergala Iraqê de pergala parlementerî çêkirin; du parlementoyên Iraqê hebûn, yek meclîsa lordan, an jî meclîsa îxtiyaran bû. Serokên eşîr ûhwd diketin nav. Meclîsek jî ya gel bû. Lê sîstema siyasî qraliyet bû. Li gorî qanûnan, divê 4 salan careke hilbijartin çêbûbûya. Lê heya sala 1958’an 16 caran hilbijartin çêdibe û her carê jî parlemento tê feskirin. Di van 37 salan de 59 hûkimet çêdibin. Ew qesa bê îstîkrarî heye. Lê Brîtanya çavderî dikir û hûkim dikir. Ji aliyê din ve 3-4 caran darbeyên leşkerî çêdibin.

Di maqezagonên Iraqê de dibêje, “Zimanê Fermî li Iraqê Erebiye. Lê gelên din jî li Iraqê hene; mafê wan heye ku bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe rojnameyan derbixin.” Lê hûkimetê ew yek nedikirin, ger kesek bikaribe bi xwe bike, dikarî bike. Her wiha rê didan partî çêbin; lê li ser navê Erebtî, Îslam û rêolan kes nikare partiyan ava bike. Li ser navê qewimtî, ol û rêolan partî çêkirin qedexe bû. Tu dikarê rojnameyan derbixê, lê divê ne dijî hûkimetê be.

Li Iraqê, heya salên 1930’î hinek tevgerên siyasî pêş dikevin. Piştî 1930’î tevgerên demokrat û azadîxwez, piştî 1940’î jî tevgerên qewîmî li Iraqê pêş dikevin. Di van salan de, li Iraqê tevgera herî xurt, tevgera komînst (Hizbî Şûî Iraqî) bû. Di salên 1950’î de piraniya civaka Iraqê dibe Şûî. Bi awayekî fermî kar nedikirin, veşartî kar dikirin. Di sala 1934’an de tê damizrandin, li ser Iraqê pir tesîr dike.

Partiyên demokrat hebûn, tesîra wan jî hebû. Piştî salên 1950’î hizba Bais çêdibe, tesîra wan jî hinek pêş dikeve. Piştî salên 1950’î tesîra van partiyan, li ser hûkimetê zêdetir dibû. Tesîra wan ji deshilatdariya Brîtanya jî zêdetir dibe.




**Şêx Mehmud Berzencî**

Di wê serdemê de tevgerên Kurdî jî rewşên awarte jiyan dikin. Me hinekî behsa tevgera Şêx Mehmûdê Berzencî kir. Heya sala 1931'an tevgera xwe berdewam dike. Piştî ku Brîtanya li wî dide jî, vedikşe çiyan û dem bi dem hûkimeta xwe îlan dike û tevgera xwe pêş ve dibe. Di sala 1931'an de êrîş li ser wî zêde dibin û her wiha dibîne ku rewşa cîhanê jî hinek bi îstîkrar bû. Li ser xwesteka Brîtanya dev ji siyasetê berdide û rûdine. Di bin çavan de dimîne. Di dema şerê cîhanê yê duyemîn de, di sala 1941'an de careke din hewl dide ku rabe, lê hewldana wî bi ser nakeve. Di sala 1956'an de bi nexweşî wefat dike.

Di wê demê de li Başûrê Kurdistanê, kesên ku pêşengtiya tevgera çekdarî dikin, yek Şêx Mehmûd Berzencî ye. Yek jî malbata Barzanî bû, jixwe me hinek behs kir. Di salên 1931-32, 1936-37, 1943-45'an de şêxtiya Barzanî û Mele Mistefa Barzanî li Başûrê Kurdistanê, pêşengtiya tevgera çekdarî dikin. Piştî salên 1945'an ew tevger jî bi giştî hate tasfiyekirin.

Ji aliyê din ve bingeha tevgerên siyasî û medenî jî li Başûrê Kurdistanê hebû û her pêş ve diçû. Lewra qanûnan hinek derfet didan. Li Başûrê Kurdistanê, piştî sala 1925'an li gelek bajar û bajarokon dibistanên Kurdî hatin vekirin. Rewşenbîr, siyasetmedar û xelkê Kurd, bi alîkariya dewlemendan, ew dibistan bi xwe vedikirin. Mekteba yekemîn di 1925'an de li Sûleymaniyê tê vekirin, Pîremerd û komaleyek rewşenbîr tê de rista xwe dîlîzin.



**PÎREMERD**

Yekem dibistana jinan dîsa li Sûleymaniyê, di sala 1926'an de tê vekirin. Ji aliyê madî ve Hefsexanê Naqîb wan dibin alîkar, yên ku weke rewşenbîr tê de kar dikin jî Guzîdxan, Fatmaxan e. Ew di nava vê mektebê de ders didin û keçan fêrî xwendinê dikin. Hêdî hêdî li bajarên din jî xwendina Kurdî belav dibe. Lê hûkimet nabe alîkar, xelk bi xwe dike. Ew xaleke girîng e. Çawa ku me got, rojnameya yekemîn xelkê bi xwe derxist; li Rojava û Başûrê Kurdistanê jî ew tevgerên rewşenbîrî û xebatên xwendinê civakê bi xwe kiriye. Dewlet nebûye asteng, lê nabe alîkar jî.

Bala xwe bidinê, van salên dawî Serokatî em rexne kirin û got, "vaye qanûn derketiye, hûn çima van karan nakin. Ma hûn bendê ne ku hûkimet bike?" Dema ku te xebatên xwe pêş xistin; ger hûkimet bibe asteng, tu rewa dibê. Lê dema ku astengî dernexistin jî tu xebatên xwe pêş dixê. Di wê serdemê de li Iraqê jî hin qanûn hene û rewşenbîrên Başûrê Kurdistanê jê îstîfade dikin.

Li Başûrê Kurdistanê xwendin, bi tîpên Aramî hate pêşxistin. Ew wêjeya ku di serdema Babanan de pêşketibû, hate berdewam kirin. Bi vî rengî li Başûrê Kurdistanê xwendina bi Kurdî, derveyî vîna hûkimetê pêş dikeve.

Pişt re rojnamegerî li Başûrê Kurdistanê pêş ket. Gelek kovar û rojname hatin çapkirin, ew jî bi derfetên rewşenbîrên Kurd bi xwe bû. Rojnameya herî bi tesîr, rojnameya jîn(jiyan) bû. Di pêşengtiya Pîremerd de 25 salan berdewam kir. Ne hûkimet li piştê bû, ne jî tevgerek li piştê bû û ew qesa sal rojname derxistin. Vê yekê li ser bingeha rewşenbiriya Başûrê Kurdistanê kir. Kovara Gelawêj hebû, Îbrahîm Ehmed û komaleyeke kesên din pêş xistin. Ji sala 1939'an heya 1949'an tê derxistin û kovareke bi tesîr e. Demekê kovara Zarî Kurmancî li Başûrê Kurdistanê derdikeve. Hê gelek kovar û rojnameyên din ku heya sala 1958'an li Iraqê derdikevin hene. Ew xebateke cîdî bû.

Ji milê xebatên hûnerî, çandî û jiyanî ve; di vê serdemê de li Başûr vejînek çêbû. Piştî salên 1925'an Pîremerd, Goran, Bêkes wan, Newroz weke cejneke netewî zindî kirin. Lewra hêdî hêdî çanda newrozê li Kurdistanê dimir; lê van her sal mîhrîcanên newrozê çêkirin. Di van mîhrîcanan de, pişbirkên wêjeyî dardixin; şanoyan çêdikin; govend û hûnera Kurdî pêş dixin. Herî dawî di sala 1948'an de hûkimeta Iraqê neçar dimîne ku cejna newrozê, weke cejneke fermî qebûl bike. Heya wê demê her pirsgirekan derdixin, lê dema ku dibîne israr heye; fermî dike.

Vê yekê jî rewşenbîr dikin. Di wê serdemê de partiyeke siyasî ku bikaribe van tiştan bike, tune. Rêbertiyeke bi vî rengî tune. Di vê serdemê de, hem sedema van mîhrîcanan, hem jî bi hin hewldanên din; komaleyekî şaîr û rewşenbîrên cîdî pêş dikevin. Heya îro, ji bo giştî Kurdistanê berhemên hêja derxistine. Çawa ku me got, ji salên 1500'î heya 1800'î serdemeke rewşenbîriya Kurdî, di dema klasîk de pêş dikeve. Di navbera salên 1900 û 1950'î jî li Başûrê Kurdistanê, ronesanseke dîtir ya rewşenbîrî û wêjeyî pêş dikeve. Îro jî li ser Başûrê Kurdistanê û giştî Kurdistanê tesîr dike. Ew hewldan bi destê tu hizban çênebûne, bi destê hejmarek rewşenbîr û şaîr çêbûne.

Her wiha di vê demê de xebatên rêxistinî hinek pêş dikevin. Piştî salên 1922'yan li Başûr hin komaleyên siyasî pêş dikevin. Ew komale zêde ne, lê di destpêkê de tesîra wan kêm e. Heya sala 1937'an gelek komale çêdibin. Lê bingeheke esasî çênabe, her yek pêy ya din tê. Di vê serdemê de hinek rêxistinên jinan jî li Başûr pêş dikevin.

Di beşa Bakûr de me bîr kir; di dema ku di sala 1919'an de li Cemiyeta Tealî ya Kurd pêş dikeve, Cemiyeta Pêşxistina Jinên Kurd jî pêş dikeve. Ew rêxistin li Stenbolê dûrûst dibe û komaleyek jin di nav de cih digirin. Encûmxan (keça Mistefa Paşayê Yamulkî ye) dibe seroka vê rêxistinê. Ew rêxistin; perwerdekirina jinan û rêxistinkirina jinan esas digre. Di wê demê de Pîremerd li Stenbolê jiyan dike. Rojnameya Jîn ya Cemiyeta Tealî Kurdistan derdixin. Beşeke taybet di vê rojnameyê de ji bo jinan vedikin û jin di vê beşê de li ser meseleyên jinan dinivisînin. Di nava rewşenbîrên Kurd de, yê ku alîkariya wî ji bo xebatên jinan hebûye, Pîremend bûye. Hem li Stenbolê, hem jî dema ku vedigere Sûleymaniyê hewldanên wî yên bi vî rengî hene. Yekem rêxistina jinan ew e. Lê dema ku tevgera siyasî ya Kurd, li Bakûr darbe dixwe, ew rêxistin jî hêdî hêdî belav dibe.

Li Başûrê Kurdistanê, di destpêka sala 1920'an de ne weke rêxistin, lê weke tevgerîn xebatên jinan hene. Adîle Xan heye, hevjîna Os-

man Paşayê Caf e. Caf eşîreke mezin e, heya vê dawiyê jî wan re digotin, paşa. Osman Paşa, kesekî bi nav û deng bû. Di wan serdeman de li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê xwedî tesîr bû. Adîle Xan jî Caf bûye, Malbata wan diçe Sînê, li wir mezin dibe. Pişt re bi Osman Paşa re dizewice û tê Helepçe. Li Helepçe hûkimraniyê eşîra Caf dike, navenda wan jî li wê derê ye.

Osman Paşa jî serokê Cafan e. Dibêjin, Adîle Xan jî mûdira rêxistina Caf e. Her kesî jî hûrmet didaye wê. Dema ku Osman Paşa ne amade bûye, gelek kar wê îdare dikirine. Jineke çalak ku tê naskirin e. Di sala 1908'an de Osmanî, Helepçe dikin Qaza. Dema ku dibe qaza, Adîle xan jî dibe, qaymaqamê Helepçe. Di dîroka Osmanî û Kurdistanê de, cara yekem jinek dibe kaymakameke bajarekî.

Adîle Xan, di sala 1853'yan de dayik dibe. Di serdema şerê cîhanî de Osman Paşa wefat dike, êdî Adîle xan eşîr û herêmê rê ve dibe. Lewra di wê demê de du kurên wan hene; herdu jî du şaîrên bi nav û deng in. Hem jî herdu ciwan in. Heya sala 1924'an ku wefat dike, Adîle Xan eşîrê îdare dike.

Di serdema serhildana Şêx Mehmûd de, navbera Adîle Xan û Şêx Mehmûd ne baş e. Têkiliyên Adîle Xan, li gel Brîtanya hene. Di wê demê de, alîgirên Şêx Mehmûd dibêjin, "Adîle xan neketiye bin rêveriya şêx Mehmûd û bûye sedem ku Brîtanya jê îstîfade bike û Şêx Mehmûd bin bikeve." Alîgirên Adîle Xan jî dibêjin, "îdareya Şêx Mehmûd teng bûye, her xwe esas digirtiye. Bi awayekî biçûk nêzikî eşîra Cafan bûye, ji ber vê Adîle Xan bi rengekî cuda li gel Brîtanya tevgeriya ye." Jixwe di sala 1924'an de Adîle Xan wefat dike.

Ji ber ku têkiliyên Brîtanya li gel Adîle Xan pêş e, jineke bi tesîr e û da ku nakokiyên Adîle Xan û Şêx Mehmûd kûr bike; Brîtanya, Adîle xan weke şahjin îlan kiriye. Tehrîkeke bi vî rengî jî hebûye. Lê wekî din, Adîle Xan jineke di nava gel de bi tesîr û çalak bûye. Mirov dikare bi vî rengî behs bike.

Li gel vê yekê, di navbera salên 1914 û 1918'an de xebatên jinan li Başûrê Kurdistanê girîng in. Weke cewhera civaka Kurd girîng e, divê mirov li ser bisekine.  Di dema şer de seferbertî çêdibe û gel, xizan û birçî dibe. Rêber Apo gelek caran behsa rista jinê ya di jiyana komînal de dike. Di wê demê de, li Sûleymaniyê Hepsexanê Neqîb û komaleyek din ya jinan tanûrên giştî çêdikin. Bi rêxistina jinan çêdikin. Ew jin, li gel dewlemendên Sûleymaniyê û derdorê têkilî datînin, da ku ard û genim bidin wan.

Bi awayekî pergal, rojane nan tê çêkirin û li ser gel tê belavkirin. Da ku xelkên feqîr nemrin. Di dîroka Iraqê de dibêjin, “di dema şer de, xelkê ku herî kêm zehmetî dît xelkê Sûleymaniyê û derdora wî bû. Lewra ew kar hate pêşxistin.” Li cihên weke Mûsilê ku bajarên herî dewlemend yên Iraqê ne, gelek kes ji birçîna re dimrin, hinek jî goştê miriyan dixwûn. Ew mijar girîng e. Ji milê civakî û komînal ve jî rista jinê radixe ber çavan.

Di sala 1932’yan de ew jin, rêxistineke siyasî ya jinan dûrûst dikin. Di wê demê de bi navê jinên Kurd, rapor didin cemiyeta gelan; daxwaziya mafê azadî û nasnameya gelê Kurd dikin. Di dema şerê cîhanê yê duyemîn de jî danehevên xwe yên şerê cîhanê yê yekemîn dubare dikin. Vê carê ne tenê ji bo Sûleymanî û Kurdan; ji bo hemû Iraqê rêxistineke jinan çêdikin. Navê wê jî, rêxistina jinan ji bo alîkariya feqîran e. Rista jina Kurd, di wê serdemê de tê qûbûlkirin û dibêjin, “jinên Kurd, pêşengtiya jinên Iraqê dikin.”

Di sala 1952’yan de şaxê jinan ya PDK, bi navê “Yekîtiya Afiretanê Kurdistan” rêxistineke din ya jinan çêdibe. Heya niha jî heye. Weke rêxistineke jinan ku girêdayî partiyekê çêbûye. Nahîde Şêx selam yek ji pêşenga ev rxistine bu.

Piştî salên 37’an li Başûrê Kurdistanê hinek komale û partî çêdibin. Di sala 29’an de Partiya Hîva tê avakirin. 5-6 salan risteke cîdî dîlîze. Pêwindiyên wê li gel tevgerên parçeyên din yên Kurdistanê berfireh in. Malbata Barzanî jî di 46’an de risteke di nava vê partiyê de dilîze. Weke hêzên leşkerî yên vê rêxistinê tevdigerin. Piştî ku tevgera Barzanî jî têk diçe, ew tevger jî bi zehmetiyan ve rû bi rû dimîne. Gelek endamên vê partiyê jî diçin Mahabadê û tên. Hinek diçin li wir mamostatiyê dikin, hinek di nava qada leşkerî de cih digirin.

Ji wan kesan hinek vedigerin Başûr û dixwazin li Başûr PDK ava bikin. Lewra di wê demê de li Rojhilatê Kurdistanê PDK hatiye avakirin, dixwazin bi heman navî li Başûr jî partiyekê ava bikin. Di dîroka 16.08.1946’an de PDK (Partiya Demokrata Kurdistanê) ya Başûr ava dikin. Dema ku PDK li Rojhilat ava dibe, piştî salekê li Başûr jî tê avakirin. Di destpêkê de navê partiyê Partiya Demokratê Kurd bû, pişt re bû Partiya Demokrat ya Kurdistanê. Li ser çand û nêzikbûna PDK’ê, Serokatî di hinek nirxandinên xwe de li ser disekine. Em ê jî li ser wê hinek bisekinin.

Vê partiyê piraniya kom û hizbên ku li Başûrê Kurdistanê hebûn, komî ser hev û din kirin û partiyeke din avakirin. Ew jî bû sedem ku her çiqasa tevgerên Kurd li Rojhilat û Bakûr darbe bixin jî, piştî salên

1946’an li Başûr xebatên Kurdinî pêş ve biçin. Ew rewş bû sedem ku PDK hem li Başûr bibe tevgereke esasî, hem jî rista wê li ser parçeyên din yên Kurdistanê zêde bibe. Ew rewş derdikeve holê. Di bin bandora vê tevgerê de, di sala 1961’an de li Başûr tevgera çekdarî pêş ket û heya salên 1975’an berdewam kir. Serhildan pêş ket û şerê peşmergetiyê berfireh bû.

Li hemû parçeyên Kurdistanê civakê piştgirî dan û xizmetî vê tevgerê kirin. Di wan 14 salan de cih bi cih hevdîtin li gel hûkimeta Iraqê hatin pêş xistin, di wan diyalogan de hin mafên Kurdan hatin dest xistin, lê mafên esasî nediket dest û ji ber wê şer berdewam dikir. Herî dawî di sala 1970’î de ji bo Kurdan, mafê otonomiyê hat qezenckirin, lê ew jî temam nebû û careke din şer çêbû.

Di sala 1975’an de jî di encama peymana Cezayîrê ku di navbera Iraq û Îranê de çêbûye, tevgera Kurd careke din bi şikandinê ve rû bi rû ma.

Piştî sala 1976’an hinek partiyên nû hatin avakirin, lê ji ber ku serokên wan mirin, nikarîn pêşketinekê çêbikin. Piştî salên 1978’an careke dîtir YNK, Partiya Sosyalîst, Pasok û hin partiyên din hatin avakirin; lê nikarîn nûbûnekê bikin û xeta PDK berdewam kir. Ji milê hizbî ve, nakokiyên van partiyan bi PDK re hebûn; lê ji aliyê siyasî ve li ser çanda PDK meşiyan. Bi vî awayî ji salên 1976’an heya sala 1988’an tevgera Kurd li Başûrê Kurdistanê risteke çalak lîst.

Ji bo zindî girtina Kurdiniyê, di nava gel de rihekî fedakarî û xebat hebû. Lê ji ber ku nûbûnek tûnebû, dema ku pêvajoya objektîf guherî ew tevger jî di sala 1988’an de têk çû. Bi çandekî, xebat hatine meşandin, tevlêbûn û zehmetiya gel pir çêbûye, qûrbanî zêde çêbûne, gund û mal şewitandin çêbûye; lê ji ber ku xeteke rast û nû nehatiye meşandin du caran ser hev ew tevger têk diçe. Her carê 13-14 salan têkoşîn dimeşînin, lê di encamê de nikarin ser bikevin.

Di sala 1990’î de, li Iraqê rewşeke nû çêbû; ji ber ku Iraqê Sûîdî dagir kir, bi qrîzekê ve rû bi rû hat. Bi vî awayî derfetek din derket û di sala 1991’an de serhildan çêbûn. Careke dîtir heya roja îro ew çanda berê siyaset dike. Mirov dibîne derfeteke pir baş heye, lê weke ku pêwîst dike ji vê derfetê sûd naye wergirtin.

Piştî salên 1946’an heya roja me, li Kurdistanê çandeke siyasî ya nû çêbû, navenda wê jî Başûrê Kurdistanê ye. Ger em vê siyasetê baş lêkolîn nekin, em nikarin derbas jî bikin. Di van 69 salan de gelê Başûr û parçeyên dîtir gelek qûrbanî dane. Lê heya niha vê xetê nikariye çareseriya pirsgireka Kurd teqûz bike. Tiştê ku ez dixwazim li ser biseki-

nim ew e; ew çand çi ye? Gelek caran Rêber Apo dibêje, “li Kurdistanê du xetên siyasî-fikrî hene. Du xet hene.” Naye wê mahneyê ku tenê du partî hene, tu xet hene. Du xetên têkoşînê hene. Xetek PKK ye û gelek kes û hizb niha li ser wê xetê têkoşîn dikin. Xetek jî, bi avabûna PDK’ê re çêbûye û niha gelek hizb li ser wê xetê dimeşin. Dibe ku weke hizb navên wan cuda bin û bi PDK re nakokiyên wan hebin; lê ji aliyê siyasî ve nêzikî vê çandê ne û li ser wê çandê dimeşin. Ew girînge ku bê zanîn.

Ew çand çi ye? Heya avabûna PDK, piştî sala 1919’an çend partî û komaleyên çêbûne, li Kurdistanê gotine, “em li ser esasê Kurdistanê û têkoşîna Kurdistanê kar dikin.” Ji bo wê Serokatî dibêje, “projeya PDK li Kahîrê hatiye danîn.” Ne ku PDK li Kahîrê hatiye çêkirin,  projeya wê li wê derê hatiye danîn. Me berê jî got, li Kahîrê ji bo ku Mûsil bikeve ser Iraqê û çawa li ser kar bê kirin, hatibû nîqaşkirin. Her wiha çawa Kurdistan bê parçekirin, nîqaş kirine.

Lê heya sala 1946’an hemû hizb û komaleyên ku li Kurdistanê çêbûne gotine, “em ji bo Kurdiyet û Kurdistanê kar dikin.” Ango Kurdistan yek Kurdistan dîtine, doza Kurd yek doz girtine dest. Gotine, “em dixwazin Kurdistan yek be.” Lê avabûna Başûrê Kurdistanê li ser çi esasê çêbû? Pêşêngên PDK gotin, “êdî pêvajo guherî ye, li Kurdistanê dewlet hatine çêkirin; divê li gorî her parçeyekî jî partî bên avakirin û têkoşîna xwe cuda bidin. Her parçeyek ji bo xwe kar bike. Em dikarin alîkariya hev bikin, lê divê alaqaya parçeyekî, bi parçeyekî din nebe.” Vê çi bi xwe re anî? Êdî parçebûna Kurdistanê hate qebûlkirin.

Heya wê demê Kurdistan hatiye parçekirin, lê di nava siyaset û civaka Kurd de parçebûna Kurdistanê nehatiye qebûlkirin. Di avabûna PDK de hat pêş xistin. Ji ber ku ew partî hakîm bû, hizbên din yên çêbûne jî li ser vê xetê meşiyan. Heya çend sal berê, van partiyên PDK-Suriye jî digotin, “PYD, PKK ye. Tu karê wan li Rojava tune ye.” Hizbê Demokrat û Komale dibêjin, “PJAK, PKK ye. Li Rojhilat çi karê wan heye.” Li Başûr jî gotin, “PÇDK, PKK ye. Karê wan li Başûr tune ye.” Demekê şerê wê jî kirin. Li ser vê esasê jî dixwazin kar bikin. Lê ew nêzikbûn, li ser wê zîhniyetê dûrûst bûye.

Ango parçebûna Kurdistanê di zîhniyet de qebûl kirin û gotin, “ew rast e, divê em li gorî wê nêzik bibin. Êdî em nikarin weke yek milet û yek civak tevbigerin.” Ya herî girîng jî doza Kurd yek negirtin dest û gotin, “doza Kurd ne yek e, çar doz in.” Girînge ku ew bê zanîn. Di heqîqetê de doza Kurd yek e; di peymana Lozanê de çêbûye û di pey-

manên Brûksel û Enkereyê de hatiye bi cih kirin. Pergala cîhanê li ser vê hatiye avakirin.

Weke ku Îsmaîl Beşîkçî dibêje, “Kurdistan, koloniyeke nîv cîhanî ye; ne koloniya dewletekê ye.” Ji ber vê doza Kurd yek e, ger bi giştî naye çareserkirin, tenê li dewletekê derfetên çareserkirinê tune. Mînakên wê jî rehet in; di sala 1958’an de Abdulkerîm Qasim, mafê Kurdan dayê û nasnameya Kurd nas kir. Lê bû qûrbanê wê meseleyê. Ew kûştin. Di salên 1970’î de hizba Bais, li Başûr otonomî da; lê Ereb hemû li dijî wê sekinîn. Brîtanya û Îran û Tirkiye li dijî sekinîn. Vê yekê îspat kir ku tenê dewletek nikare li ser doza Kurd biryar bide.

Ew mijareke navdewletî ye. Lê di çanda ku PDK ava kiriye de hate qebûlkirin ku doza Kurd, 4 doz in. Ew ferqa me û ferqa PDK ye. Ger em îro dixwazin li gorî çanda PDK neçin, divê em Kurdistanê weke çar parçeyan nebînin. Divê em Kurdistanê yek bibînin. Ger em Kurdistanê weke çar parçe û çar dozên cuda bibînin, her çiqasa navê me PKK be jî, em ê li ser xeta PDK biçin. Encama me jî dê weke wan bibe.

Mijareke din, di çanda PDK de; ji ber ku doza Kurd parçe dibînin, gotin “ger tu cihekî, li hemberî dewletekê têkoşîn didê; ew dewlet dijminê te ye, lê yên din hemû dostên te ne. Tu dikarê dewletên din re dostaniyê bikî.” Ango dibêjin, “ger tu li hemberî Tirkiye şer bikî; Iraq, Îran, Suriye dost e. Ger tu Iraqê kar bikî, tenê Iraq dijmin e. Yên din hemû dost in.” Van partiyên ku li ser çanda PDK çêbûne, wisa nêzik dibin.

Niha hêzên weke ENSK li rojava dibêjin, “dijî Esad bin, êdî hûn bi kê re têkilî çêdikin çêkin; ne pirsgirek e.” Ew çanda seket û ne rast pêş xistin. Têkoşîn li ser vê esasê naye kirin. Ji bo vê felsefeyek jî dîtine û dibêjin, “dijminê dijminê te, dostê te ye.” Ew felsefeyek seqet e. Gelek caran em bi vî rengî hatin xapandin. Dibe ku hinek caran bibe dost, lê ne şerte ku her bibe dostê te. Ew tişt piştî salên 1946’an di pêşengtiya PDK’ê de hate pêş xistin û niha bûye çandek û zarokên Kurd jî fêr bûne. Gelek zarokên Kurd li ser vê çandê mezin bûne. Ji ber vê yekê gelek kes hene; me hez dikin lê, bi çanda PDK jiyan dikin. Lewra 70’î sala ew çand tê jiyan kirin.

Mijareke din ku weke çand pêş xistin; dibêjin, “ji bo ku tu bikaribê siyaset bikî, divê derve dewletên mezin alîkariya te bikin. Divê pişta te bi derve ve be.” Ew mijareke esasî ye û li ser kar jî dikin. Dema ku cara yekemîn Serokatî, Talabanî dibîne; Talabanî, ji Rêber Apo û heval Cuma re dibêje, “kê hûn çêkirine?” Serokatî jî dibêje, “em bi xwe çêbûne.” Talabanî dibêje, “na, hûn dixwazin min bixapînin. Li Kurdis-

tanê kes nikare xwe bi xwe çêbibe. Hinekên din hûn çêkirine.” Lewra bi vê çandê çêbûye.

Divê biçin deriyên hinek seferxaneyan bixin û destûr ji wan bixwazin, da ku karekî bikin. Ango pişta xwe bi gelê xwe ve girê nadin, pişta xwe bi derve ve girê didin. Li ser vê esasê derve jî, her dem bi wan dîlîze. Di dema ku karê wan pê hebe, dibêjin, “vaye ji we re nan û pere, pê kar bikin.” Lê dema ku karê wan pê tune be, nan û pereyan jê digre û ew jî dimrin. Bi vî rengî çandeke siyasî pêş xistin. Jixwe ji ber vê PKK tê rexnekirin û dibêjin PKK siyaset nizane, çunku “PKK destûr ji derve negirtiye.”

Heya niha jî ew çand heye; li giştî Kurdistanê tesîra vê siyasetê heye, lê li Başûr û Rojhilat tesîra vê siyasetê zêdetir e. Dîqat bikin, derveyî PYD hemû partiyên Rojava, hêvî dikirin ku demek beriya demekê ji derve êrîş bê ser Suriye, da ku Rojava kar bikin. Li Bakûr û Rojhilat jî wisa ye. Di sala 1992’yan de, PDK ji partiyên Rojhilat û PKK re digotin, “rûnin, em alîkariya we bikin, ger rojeke êrîşek bê ser Tirkiye û Îranê, dê hûn jî biçin û li wir bibin deshilat. Bi vî rengî kar bikin.” Ji ber ku wan partiyên Rojhilat li ser wê çandê kar dikirin gotin, “tamam, ger hûn îro bi vî rengî bibin deshilat, dê em ê jî sibê bibin deshilat.” PKK jî got, “ez li ser wê esasê kar nakim.”

Tiştekî din, PDK dema ku çêbû; hin rewşenbîran dixwest partiyê ava bikin. Weke me got, heya sala 1850’î tevgerên Kurd, di pêşengtiya mîran de pêş diketin. Piştî wê tevgerên Kurdî, di pêşengtiya kesên olî (Şêx, mele, seyîd) de çêbû. Piştî salên 1919’an êdî nifşekî nû xwestin rêvebertiyê bikin. Li her beşeke Kurdistanê, rewşenbîr derketin. Heya salên 1945’an piranî xelkên rewşenbîr pêşengtiya tevgerên siyasî yên Kurdî dikin. Li hemû parçeyan wisa ye.

Lê piştî salên 1946’an van rewşenbîrên Kurd, li Rojhilat gotin, “em tenê nikarin bikin.” Çûn û Qazî Mihemed anîn û kirin serokê xwe. Li Başûr jî gotin, “em tenê nikarin partiyeke çêkin; lê divê em hinek kesên bi nav û deng bikin serokên xwe.” Di destpêkê de PDK wisa ava bû. Barzanî tune bû. Dema ku PDK hate avakirin, Barzanî li Mahabadê bû, piştî wê jî çû Rûsya.

PDK, Hamza Evdilah û komek rewşenbîrên din ava kirin. Lê çûn gel Barzanî û gotin, “em dixwazin hizbeke çêbikin, lê em dixwazin te bikin serok.” Barzanî got, “ez amade me.” Heyeteke serokatiyê çêkirin; Barzanî bû serok, kurê şêx Mehmûd bû alîkarê wî, Ziya Axayê Koyê kirin alîkarê duyemîn; bi vî rengî heyeteke serokatiyê çêkirin. Ango van rewşenbîran bi aqlê xwe, yekbûnek di navbera rewşenbîr û sero-

keşîran de çêkir. Bi nêrîna wan, ger serokeşîr bikirana serokên partiyê, dikarîn bidin şûxilandin û sîvaneke ava bikin, lê ji bin ve jî xebatên xwe bimeşandina.

Dê bi vî rengî, lezgîn bûbana partiya mezin. Rêbaza wan rêbazeke rehet bû. Rast e, ger serokê partiyê Hamza Evdileh bûya; xelk wî nas nake, divê di serî de xwe bide nasîn. Êdî çend salan dirêj bike. Lê ger Mele Mistefa bikin serok, berê du salan şer kiriye û ji malbata şêxên Barzanî ye, wê demê jî li komara Mahabadê bûye general, tê naskirin. Yên din her wiha. Ger ew kes bibin serok, tên naskirin. Lê bibêjin, “me partiyek nû çêkiriye û serokê wî Hamza Evdileh e” dê xelk bibêje, “Hemze Evdilah kî ye? Çi dixwaze.” Wê demê divê xwe û fikrên xwe bide nasîn. Ew jî karekî zor e. Karê zor nedan pêşiya xwe, rêbaza rehet dan pêşiya xwe.

Di rêbaza rehet de, bi ya wan dikarîn çînên serdest ji bo xwe bidin şixûlandin. Jixwe digotin, “Barzanî li Mahabadê ye, dibe ku her neye; kurê Berzencî û Ziyad axa jî ne kesên aktîf in, em dikarin bidin şixûlandin.” Di meseleya kurê Berzencî û Ziyad Axa de, fikra wan rast derket, pir zêde neketin nava kar. Navê wan dan şixûlandin. Lê meseleya Mele Mistefa wisa derneket.



**ÎBRAHÎM EHMED**

Dema ku Mele Mistefa ji Rûsya zivirî, got, “ji ber ku hizb li ser navê min e, ez hizb didim rêvebirin. Hûn kî ne?” Jixwe piştî demekê Hemze Evdilah li PDK avêt. Tu kesî jî negot, “çima Hemze Evdilah tê avêtin.” Piştî çar salan, Îbrahîm Ehmed jî derxist. Êdî tiştê ku wan plan kiribû, di serê wan de teqiya. Gelek hevalên me jî diçin kar dikin, lê dibêjin “bila hinek kesên navdar bên û em bi hev re kar bikin.” Ma tu diçê ku bi xwe kar bikî, an bi kesên navdar re kar bikî? Jixwe ew xelkên navdar, bi navê xwe kar dikin. Wê demê pêwîst dike ku tu bi çanda wan kar bikî.

Ger Serokatî û hevalên me yên destpêkê wisa bikirana, divê Celal Bûcak bikirana serokê xwe. Ne ku bi wî re şer bikirana. Her wiha divê serokê eşîra Sûleymanan bikirana serokê xwe. Lê Serokatî û hevalên me yên destpêkê wisa nekirin. Ew jî çandek e. Niha gelek hevalên me wê çandê nizanin, ji ber vê dikevin wê xeletiyê. Tu dixwazê li ser çandeke cuda kar bikî; ew çanda wan jî, ji ya te xurtir e. Qûvetên wan, ji yên te zêdetir in. Serokatî dibêje, “rewşenbîrên bê vîn û xwe ne bawer derketin û careke dîtir serokatî dan destê çîna serdest.”



**CELAL TALABANÎ**

Modelekî xweş, ji çîna serdest re jî çêkirin. Berê çîna serdestan bi serokeşîriyê kar dikirin, piştî wê bi navê partiyê kar dikin. Êdî piraniya partiyan bi vê çandê çêbûn; navê wan partî bû, lê malbatek hakîm bû. Niha li Başûrê Kurdistanê, her kes dizane ku malbata Barzanî li ser PDK hakîm e. Malbata Talabanî dixwaze li ser YNK hakîm bibe; hinek nerazîbûn heye, lê hêdî hêdî hakîm dibe. Gelek partiyên din yên bi vî rengî hene.

Li Rojavayê Kurdistanê, her malbatekekê partiyek wan heye. Li Rojhilatê Kurdistanê, Hizba Demokrat û Komale li ser vê esasê parçe bûn. Ew xeletiya siyaseta avabûna PDK bû. Ger em dixwazin rast siyaset bikin, divê em bi wî rengî siyasetê nekin.

Ji aliyê din ve, di çanda PDK de jin, ciwan, kedkar û çînên bindest esas girtin tune ye. Ji wan îstîfade dike û dike amûrê siyaset; lê pişta xwe bi wan girê nade û wan nade pêş. Ew taybetmendiyek e.

Her wiha xebata birdoziyê pêş nexistin; civak weke xwe diçe. Cihên ku ew partiyên bi vî çandî pêş ketine, li paş civakê diçin; ne li pêş in. Ew taybetmendî bû sedem ku siyaseta baş jî nekin. Divê di siyasetê de stratejî û konevaniyek te ya rast hebe. Di heman demê de divê tu dost û dûjminê xwe, bi awayekî stratejîk û textîkî baş nas bikî. Divê bizanibê ku çawa pê re bidê û bistînê. Lê di netîceya vê siyasetê de naskirina dost û dijmin çênabe. Naxwazin çêbibe. Startejî û textîkên rast çênabin. Ji ber vê şerê çêdibe û qûrbaniyên tên dayin, nakevin xizmeta gelê Kurd.

Di encamê de hêzên derve li ser keda ku tê dayin, siyasetê dikin. Ger em dixwazin, êdî hêzên derve li ser me siyasetê nekin, divê em vê çandê derbas bikin. Bi kurtasî me xwest, em wisa vekin. Lê heval jî dikarin li ser lêkolîn bikin.

Li ser mijara enfalên Başûr û komkûjiya Helepçê pirsa hevalan jî hebû, em hinekî vekin. Enfal pengaveke dewleta Iraqê bû. Di sibata

1988’an de destpê kir. Di wê demê de, piştî 8 salan şerê Îran û Iraqê, di navbera Îran û Iraqê de hinek diyalog çêbûbûn. Di wê demê de Iraqê êdî xwest Kurdistanê bixe bin kontrola xwe. Lewra piştî sala 1981’an hêdî hêdî gundên Kurdistanê diketin bin kontrola peşmergeyan. Piştî sala 85’an jî piraniya gund û bajarokên Başûrê Kurdistanê ketibûn destê peşmergeyan. Hûkimeta Iraqê tenê li bajarên mezin hebû. Li wan deran jî şevan hûkmê wan tune bû.



**DÎMENEK JI ENFALA HELEBÇÊ**

Di sala 88’an de Iraqê xwest, careke dîtir kontrola xwe çêke. Ji ber wê biryar da ku pengavên enfalê pêş bixe. Digotin, “operasyonên paqijkirina enfalê.” Di 19’ê sibatê de destpêkirin, 8 operasyonên mezin li Başûr kirin û di 8’ê îlona 1988’an de operasyon xilas bûn. Her operasyonekê 15-20 rojan, hinekan jî mehekê dirêj kir. Her operasyonekê herêmek da ber xwe. Hêzên leşkerî dibirin wir û bi teyare, top û çekên mezin bombebaran dikirin. Hinek cihan jî kimyasal kar tanîn. Bi vî rengî êrîş dikirin.

Li hinek cihan, bi taybetî jî di operasyona yekemîn de peşmergeyan şer kirin û operasyon şikandin. Lê dema ku dîtin kîmyasal dide şixûlandin, pir kêm ber xwe dan. Milet jî cihê xwe ber didan û direviyan. Di 8 mehan de pengava dewletê timam bû. Pengava yekemîn li Dokan bû, pişt re çûn Karadax, Germiyan, Çemçemal, Koy, Hewlêr,

Şeqlewa, Ranya, Diyana, Rewanduzê, herî dawî jî li herêma Behdînan û Garê pengav pêş xistin.

Di vê demê de nêzikî 4 hezar gundên Kurdistanê şewitandin û rûxandin. Texrîben 10 hezar kes, bi kîmyasalan hatin qetilkirin. Yên ku hatine mişextîkirin û winda ne jî li gorî civakê 182 hezar in. Li gorî belgeyan texrîben 110 hezar in. Bi vî rengî xelk hatin mişextî kirin. Heya niha gora hin kesan nehatiye dîtin. Hinek keç û jinên Kurd jî, birine û firotine. Hinek belge li ser wan derketin, lê tam şopandin çênebû.

Ji vê pengavê re dibêjin, "pengava enfalê." Niha her sal, di 4'ê nîsanê de bîranîna vê komkûjiyê çêdibe. Ew roj remz e. Lewra enfal ne rojek e. Çima 14'ê nîsanê kirine remz. Lewra li herêma Germiyan, di wê dîrokê de enfal destpê kir. Enfala vê herêmê, nêzî mehekê berdewam kir. Dihatin gundên wan xirab dikirin; yên direvîn, jixwe direvîn. Yên diketin dest jî li maşîneyan dikirin û dibirin, êdî dibirin ku naye zanîn. Herî zêde di 4'ê nîsanê de li Germiyan xelkê kom dikin û dibin, jixwe herî zêde jî li herêma Germiyan xelk birine. Lewra deşt e û derfetên revînê tune ne. Herêmên din ji ber ku çiya ne, derfetên revê hene. Ji ber vê yekê herî zêde xelkên wir hatin girtin û birin. Li gorî kesên ku şahîd in, di 14'ê nîsanê de nêzikî 40 hezar mirov kom dikin û dibin. Ji ber vê ew roja, weke rojeke remzî tê zanîn.

Di pêvajoya Enfalê de, dema ku dewlet pengava yekemîn li ser Dûkan dike; têkiliyên YNK û PDK bi Îranê re xurt bûn. Di salên 1977'an de YNK û PDK şerê hev dikirin, lê Îran ket navberê û pêk ve êniya Kurdistanê dûrûst kirin. Li gel YNK û PDK heft partiyên Kurd, di vê êniyê de cih girtin. Piştî wê êniyê, şerê Kurdan yê di navxweyî nema. Dema ku dewletê êrîşî Dûkan kir, navenda YNK nêzikî Dûkan bû. 20 rojan zêdetir peşmerge û arteşa Iraqê li wê herêmê şer dikin. Dewletê hinek gundan jî çekên kîmyawî kar anîn.

Wê demê êniyên Kurdistanê, bi Îranê re jî nîqaş dikin û biryar didin ku li aliyê Helepçe êrîşî Iraqê bikin. Da ku zext li ser navenda YNK kêm bibin. Li ser vê esasê di 14'ê adarê de, bi alîkariya Îranê êniya Kurdistanê êrîşî Helepçe dike û hûkimeta Iraqê ji Helepçe derdixin. Lê piştî wê jî dewleta Iraqê, êrîşên xwe dan berdewamkirin. Di 16'ê adarê de jî bi hejmareke zêde ya balafir û teyareyan li Helepçe da û çekên kîmyawî avêtin Helepçe. Di wê demê de hejmara Helepçê, 75 hezar bû. Texrîben 5 hezar kes tên kûştin, 12 hezar kes ji çekên kîmyawî bandor dibin û yên din jî direvin. Kareseta Helepçe bi vî rengî çêbû. Dewleta Iraqê, li gelek cihên din jî çekên kîmyawî kar tîne.

Hamleya duyemîn ya enfalê, li herêma Karadax bû. Di 22'yê adarê de, bi çekên kîmyawî gundê Sewseman da. Li wir 68 kes şehîd dibin û gelek birîndar çêdibin. Pişt re êrîş dikin û wî cihî jî digirin. Gelek kes li wir jî hatin enfalkirin, lê ji ber ku mintiqaya çiyayî ye, hinek kesan xwe rizgar kirin. Pişt re êrîşî Germiyanê kirin; çekên kîmyawî kar neanîn, lê derfetên komkirina mirovan li wir pir bûn. Li mintiqaya Çemçemal, çekên kîmyawî kar anîn û pişt re pengava enfalê destpê kir.

Li mintiqaya Behdînan jî, hinek herêman çekên kîmyawî kar tîne, lê pir kes namrin. Lewra heya wê demê herêma Behdînan û herêma Soran hinek tevdîr digirin. Hem herêmên çiyayî bûn, hem jî danehevên 4-5 mehan hebûn, ji ber vê kêmtir zirar dîtin. Mirov dikare bi vî rengî behsa enfalê bike. Lê tenê li Helepçe çênebûye, li gelek cihên dîtir jî çekên kîmyawî hatine karanîn. Di heman demê de li Rojhilatê Kurdistanê, bajarê Serdeşt û wan herêman jî dixe.

…: Li Başûr partiya Pasok heye, ew jî Kurdistanê yek digirin dest; hinek hûn dikarin behsa wan bikin.

…: Li herêma Hekarî hejmareke zêde peşmerge tên kûştin. Ew ji bo çi ye?

**H. Helmet**: Pasok jî dibêje, Kurdistan yek parçe ye. Lê bi çand û kevneşopiya PDK tevdigerin. Niha jî nivîskarê herî zîrek yê PDK, kesekî kevn yê Pasokî ye. Bi kurtasî zîhniyeta wan ji xeta PDK derbas nekirine, xizmetî wê xetê dikin. Mesela Talabanî û Komale û yên din jî li hemberî PDK derketin. Lê di encamê de çûn ser wê xetê. Lewra baş şîrove nehat kirin û baş nehat derbas kirin.

Meselaya Hekarî, di sala 1976'an de YNK çêdibe; lê heya 1978'an ew û PDK şerê hev dikin. Di sala 1978'an de PDK hê xwe komî ser hev nekiribû. YNK, dixwest herêma Xakûrkê jî bixe bin kontrola xwe. YNK di bihara 1978'an de hêzeke ku ji hezar peşmergeyî pêk tê tîne herêmê. YNK dibêje, me ew hêz anîbû ku em biçin û çekên ku Suriye ji me re şandine bigirin. PDK jî dibêje, ew hêz anîbûn; da ku pê wan, me tasfiye bikin. Ew hêz derbasî herêma Şemzînan dibe. Wê demê tesîra PDK li ser herêma Şemzînan û Gerdî zêde ye. Eşîretên wan herêman û dewleta Tirkiye re dikevin têkiliyê. Dema ku ew hêza YNK diçe wê herêmê, dikevin ser wan û lêdixin. Ji ber ku berf pir e, nikarin tevbigerin. Ji 700 peşmergeyê YNK dikûjin, hinekên wan jî dîl tên girtin, hejmareke kêm jî direvin.

Di wê bûyerê de hinek fermandarên bi nav û deng, Elî Eskerî, Doxtor Xelîd, Tahîr Welîbeg jî di wê bûyerê de tên kûştin. Bi destê Îdrîs Barzanî, Samî Abdurahman, Kerîm Şengalî ku niha wezîrê karê navxweyî yê Başûrê Kurdistanê ye, tên kûştin. Wê demê PDK, kongre çênekiribû, bi rêveberiya demkî kar dikir. Di rêveberiya demkî de jî Îdrîs Barzanî, Samî Abdurahman, Kemal Kerkûkî, Kerîm Şengalî û Azad Berwarî hebûn. Bi destê van kesan û eşîrên wê herêmê, zêdetirî 700 peşmergeyan tên kûştin.

## ENCAM

Me dixwest em li ser hinek mijarên din jî bisekinin, lê derfet tune ye. Bi taybetî li ser sedsala 20'emîn û di wê demê de li ser her parçeyekî Kurdistanê divê hinekî din bihata vekirin. Hinek mijar mirov dikarî berfirehtir veke û li ser nîqaş bike. Li gorî dilê min nebû. Lê bi giştî li gorî derfetan me hewl da ku ûsûleke ku mirov jê sûd werbigre nîşan bidin.

Hêviya min ew e, heval bikaribin dîroka Kurdistanê bi rengekî nû bigirin dest. Weke Kurd, em civakeke xwedî nirxên girîng in. Hem di dîroka kevn de, hem jî di dîroka nû de; tiştên ku em ji bo avakirineke nû bikin bingeh pir in. Di heman demê de kêmasiyên me yên siyasî, fikrî û dîrokî hene. Hem kêmasiyên me hene, hem jî kêmasiyên tevgerên me yên siyasî hene.

Di şîrovekirina civak, jiyan, ol, rêol, dîrok, sosyalîzm û di her mijarekê de, em çiqasa kûr bibin û bi awayekî nû bigirin dest, ew qesa em dikarin avabûna nû çêbikin. Divê tiştên kêm jî, em bikaribin derbas bikin. Ew girîng in. Ji bo wê di destpêkê de me got, em ji nû ve dîrok û civakê digirin dest. Ji ber vê divê em zanîn û agahiyên li gel xwe jî lêpirsîn bikin.

Serokatî dibêje, "berê qeneata min dewletê hebû; lê dema ku ez baş fikirîm, ez gihêştim wê qaneatê ku dewlet ne tiştekî baş e, xirab e." Li ser vê rexnedayina xwe dide û nirxandinên xwe dike. Dibêje, "qaneata min bi dîktatoriya proloterya hebû, lê ez gihêştim wê qaneatê ku şaş e." Ger mirov baş li ser van tiştan lêpirsîn neke, mirov nikare şaştî û rastiyê jî ji nava hev derxe. Ji bo me jî girîng e.

Ne tenê di axaftinê de, di hizirandin û fikrînê de jî, divê em tiştên ku li ser me bandor kirine, lêpirsîn bikin. Naye wê mahneyê ku her tiştê me şaş e, lê divê em şaştî û rastiyên xwe bixin bin lêpirsînê. Divê em li ser vê esasê nêzik bibin. Ger em li ser vê esasê nêzik bibin, ez bawer dikim ku dê her hevalek zêdetir barê têkoşînê bide ser milê xwe.

Divê ew ezmûnên ku em ji dîrokê digirin; yên baş bikin bingeha serkeftina xwe, yên şaş divê em dubare nekin. Her hevalekî/ê jî danehevên wan hene, rêxistinê derfet dane; heval dikarin li ser kar bikin.

Hûn li vê derê di rewşeke awarte û zehmet de perwerdê dibînin. Li vê derê watedayina perwerdê zêdetir dibe. Ger mirov wate bidê, di perwerdeyên bi vî rengî de mirov dikare encamên baştir derbixe. Ger wate naye dayin, dibe ku belavabûn çêbibe. Heval ji van aliyan baldar

bin, dê baş bibe. Heya niha hin kêmasî hatibin jiyankirin jî, divê nebe sedema xwe baş tevlênekirina perwerdê. Weke çandeke PKK'ê divê em kêmasiyên xwe jî bikin bingeha çandeke baş.

Di fikrandinê de, di têkoşîna birdozîk û rêgezî de, di hevaltî û têkiliyan de, divê ji her aliyekî ve em bikaribin hevaltiyekê çêbikin û divê hevaltiya me hev û din xurt bike. Divê jiyana me hev û din xurt bike. Ger li ser vê esasê nêzikbûn çêbibe, ez bawer dikim ku dê her hevalek encamên baş ji perwerdê bigre. Ez jî bi dîtina we kêfxweş bûm. Bi nîqaş û pirsên hevalan û bi diyalogên hevalan, min jî gelek tişt girtin. Hêvîdarim di demên pêş de jî heval bikaribin, erkên xwe bi serkeftî pêk bînin.